# Çiyayê Kurmênc

## (( E F R Î N ))







Lêkolîneke Dîrokî , Civakî û Belgekarî ye

**Dr . Mihemed Ebdo Elî**

# ÇIYAYÊ KURMÊNC
# (( EFRÎN ))

DÎROK , CIVAK , BELGEKIRIN

**Dr. MIHEMED EBDO ELÎ**

**EFRÎN …….. 2007**

---

**ÇAPNIVÎSA KURDÎ**

## Xwendevanên hêja

Ji bo belgekirineke rast û durust ji navan re, me pêwîst dît ku em, çi navên kesan, çi navên xaknîgarî û tiştên din, wekî ku ji hêla şêniyê Çi.Kurmênc ve tên bilêvkirin, binivîsin.

Û ji ber ku roja îro, hin tîpên Erebî, wek: ح ، غ ، ع ketine nav zimanê Kurdî, û daku em bilêvkirina navan wek tê gotin bi xwendevanan bidin zanîn, em neçar mane ku carina tîp û nîşandekên taybet ji dêvla wan bi kar wînin, ew jî ev in:

Ĥ = ح ,   Ĝ = غ ,   ' = ع

Ji bilî wê, me hin bêjeyên ku gelek bi kar tên kurtebirî kirin, wek:

Gund = Gu.

Gelî = Ge.

Çiya = Çi.

Kanî = Ka.

Gir = Gi.

Dever = De.

Navçe = Na.

**spas**

*** * * ***

# Spasî

Em ji we venaşêrim, ku eger ne bi alîkariya dilsoz a kesên navça Çi.Kurmênc ên bi qîret ba, meyê hîç nikanî ba ewqas zanîn li ser rewşa navçê kom bikirana. Em wan hemî biraderan pir spas dikin. Bi rastî ew jî gelek bûn, lê mixabin rê li vir nîne ku em hemiyan bi bîr wînin.

Ji hêleke din ve, gelek rewşenbîran bi têbînên xwe yên zor hêja, lêkolîna me zengîn kirin. Em wan jî spas dikin…

Em mamosteyê xwe yê hêja Îbrahîm Xelîl Îsa jî pir spas dikin, ji ber ku rindiyên wî di lêvegera tevahî û zimanî ya çapa Erebî de netên jibîrkirin û têbînên wî jî bêhempa bûn.

Sipasiyeke taybet ji bo Hec Ehmed Ce'fer Şêx Îsmaîl Zade, ji ber ku ew di hin beşên pirtûkê de, hemahema bûye hevparê me.

Di çapa Kurdî de, ji hêla hûrnêrîna lêdana kompûterî de, dostê Mistefa Henan  jî ji me re bû alîkar, em wî jî pir spas dikin.

* * * *

# Pêşgotin

Li bihara sala 1982an, di şevbuhêrkekê de bi hin hevkarên min ên Ereb re, yek ji wan çêre hebûna Kurdan li Sûryê bû, bi taybetî jî Kurdên navça Efrînê. Wî got: Hebûna wan ne ji mêj ve ye, û ew ji derveyî herêmê hatine û li şûna Erebên ku rûniştvanên navçê yên resen bûn, rûniştine. Min jê xwest navê Erebekî ji min re wîne, ku berê li Çi.Kurmênc rûnişti bû, û Kurd hatin ew jê der xistin û li şûnê rûniştin. Jixwe ew bêçare ma, ji ber ku ew nikane Erebekî bibîne, ku ji binyata xwe de ji rûniştvanê Çi.Kurmênc e, û paşê jê der ketiye, çi bi dilê xwe, û çi bi darê zorê, ne berê û ne jî niha.

Ji wê rojê de ew pirs ji bala min neçû, hergav ev di mejiyê min de digerî: Gelo! Ma gengaz tuneye, ku hinek rastî di nêrîna ew hevkarê min de hebe. Eger tunebe jî, ma ne pêwîste kesên ku ew nêrîn hilgirtine, têbigihên ku Kurd rûniştvanên navçê yên kevnar in, û berî dewlet û hukmetên ku niha çê bûne bi sedsalan li wir hebûne. Birastî, min çiqas dixwest lêkolînvanekî pispor vê mijarê vekole, lê mixabin kesekî ew yek ne kir!!.

Piştî wê bi demekê, di dehsala dawîn de ji sedsala bîstan, pirtûkek ji amadekirina rojnamevanê Sûrî Nebîl Milĥêm derket, tê de hati bû, ku dîroka hebûna Kurdên Çi.Kurmênc (Efrînê) li wir nagihê dawîya sedsala nozdehan.

Li wê demê, ew gotina li ba şêniyê Çi.Kurmênc bû cihê şêtiyeke mezin, ji ber ku ew gotin yekcar ji rastiyê dûr e. Wek nimûne, ez li gundê xwe kalikê xwe yê dehan dizanim, ew dem jî dora 300 sal digire. Paşê belge û delîl hene mêlag dikin ku hebûna Kurdan li Çi.Kurmênc tewir hindik digihê serdema Eyûbiyan, ango berî neh sed sal.

Ji ber wê jî, min bi xwe re got, eger hevkarê min ê Ereb ew

rastiya nizanî bû, ne gerek e Kurd bi xwe zani bin, çima ewqas dîrok tê civlandin û badan, gereke di warê dîrokê de herdem rastiya rast were gotin, û li dûrî berjewendî û qulqewêrên nijadperestî û siyasetê bimîne.

Wê hîngê, min biryar da, ku ez bi xwe wê mijarê vekolim. Min da ber xwe ku vekolînekê li ser şênbûn û rûniştvaniyê li Çi.Kurmênc bikim.

Li destpêkê min dixwast, ez bi xwe pê bizani bim, ku li dirêjiya dîrokê, kîjan milet li navça Çi.Kurmênc rûniştine, kîjan dewlet lê destlatdar bûne û çi bûyer lê rabûne. Me di sala 1995 an de dest bi karê xwe kir. Di nava kar de, me pêwîst dît, hinek beşên din li lêkolînê zêde bikin, wek rewşên jiyana şêniyê Çi.Kurmnêc ên berê û niha jî tomar bikin. Hêviya me ew bû, ku ew kar ji nifşên werin, û ji kesên ku guh didin wan mijaran re bi sûd bin.

Me du jêderên sereke di lêkolîna xwe de bi kar anîn:

**Yek**, di warê dîrokê de: Jêderên dîrokî yên nivîskî yên kevin û nûjen ku me kanî bûn bi dest xistana. Û ta ji me hat, me hewlda ku ew Erebî û Sûrî bin.

**Didu**, di warê rewşên gelemper de: Me zora xwe da ser gerê û hevdîtina bi kesên navsal, zana û yên ku guh didin wan tiştan.

Di heft salên ku li ser lêkolînê xebitîm de, em toşî pir tiştên dijwar bûm. **Yek**: jêderên nivîskî li ser navçeke mîna Efrînê biçûk, pir hindik bûn. **Didu**: Ta ku me zanişwerek mêlag dikir, em neçar dibûm ku bêtirî carekê herin gundekî, û wilo ji bo civandina wêne û belgeyan jî.

Em carina jî raste hin kesan dihatim, ji ber sedemên têvel, wan ne dixwest tiştan hewaldin. Ji ber ku guman û xweparastin, bûye hevalcêwiyê kesayetiya mirovê Kurd. Lê ya baş ew bû, ku kesên wilo pir hindik bûn.

Lê belê, digel hemî astengan, gava me encama karê xwe dît, nemaze di hêla dîrokê de, em pir kêfxweş bûn. Çinkî em bawer in, ku bi vî karî, tarîtiyeke mezin ji ser dîroka Çi.Kurmênc hat hilanîn. Û digel hemî kêmanî, têbîn û rexneyên ku dê li pirtûka me werin kirin jî, lê em bawerin ku beşeke mezin ji rastiyê dê tê de hebe, û jivirûhade, dema ku dengkirin li ser dîroka hebûna Kurdan li Çi.Kurmênc çê bibe, tukes dê nikani be wan rastiyan bincil bike, û di ser re gav bike.

Lê em bawer in jî, ku hîn gelek tiştên dîroka Çi.Kurmênc hebûn, me nikanî bicivandana, hêviya me ew e, ku ew kar di paşerojê de, ji hêla kesine din de were kirin.

*Li gel spasiyan*

**Dr. Mihemed Ebdo Elî** - - - Efrîn 29/5/2007

# Beşê Yekem

# Çiyayê Kurmênc
# Û
# Dîrok

# Lêkolîna yekem

## Cihê Çiyayê Kurmênc

Çiyayê Kurmênc li koşeya tewir bakur ji perava Rojhilat a Derya Sipî dikeve. Ew ji koşa başûr rojava ya herêma Kevana Şov (Hilal Xesîb) û dewleta Sûryê ya niha ye. Û ji dawîneyên Bakur - Rojava yên zincîrên çiyayên Torosê ye jî.

Sirtên Çiyayê Kurmênc ji başûr rojavaya bajarê Dîlokê “Entabê”(1) de dest pê dibin, berve Başûr û Rojava berdirêj dibin û li Rojavaya bajarokê Cindirêsê bidawî dibin.

Dirêjahiya Çiyayê Kurmênc nêzîkî 100/kmî ye, pehnahiya wî jî 25km ra 45km ye.

Sirtên Çiyayê Kurmênc, Lêlûn û deşta Cûmê, ji kûraniya dîrokê de, ji aliyên kargêrî, Xaknîgarî û siyasî de herdem yekîneyeke şaristanî û hevgirtî bûn.

Ji berê de riyên herî giring di navça Çiyayê Kurmênc re derbas dibûn û beşên jorîn ji Welatê Şamê û Mezopotamiyayê digihandin Asya Biçûk, kendavên rojhilatî ji Derya Sipî û bajarê Entekê. Çiyayê Kurmênc bi av û Axa xwe jî pir dewlemend e.

Ji ber van hemî egeran, navça Çi.Kurmênc ji kevin de şên bû, û dibû sersebe jî ku gelek nakokî, pevçûn û bûyerên dîrokî yên giring di navbera dewlet û miletan de li ser navçê û li derdora wê çê dibûn.

Ji hêla nijadî de jî, Kurd wek milet, ji kevin de li navça Çiyayê Kurmênc rûdinin, wê lomê jî Çiya bi navê Kurd û Kurmanc hatiye naskirin.

---

1- Dîlok, bajarê kevin e. Ew niha gundek e, dora 10/km li bakurî Antabê ye. Şûnwarên Dîloka kevin li kêleka gund in. Dîlok di sala 1297an zayînî de hatiye wêrankirin.

Li derbarê navê Çiyayê Kurmênc jî, di navîna sedsala nozdan de qunsulê Rusan li Bêrûtê Qistentîn Bazîlî[1], navê "Çiyayê Kurmênc" bikar aniye. Berî wî, Osmaniyan jî ew nav bikar tanî û digotin “Kurt Daĝi”, yanê "Çiyayê Kurdan". ‘‘Kurmanc” jî navê zaravekî zimanê Kurdî ye[2]. Lê ya giringtir ew e, ku ji bîlî wî navî, Çiya bi tu navên din ne hatiye naskirin.

## Beşê Sûrî ji Çiyayê Kurmênc

### Taybetmendiyên Xaknîgarî:

Piştî dagîrkirina Firensiyan ji Sûryê re, navça Çiyayê Kurmênc a berê bû du perçe, perçê bakur bi ser Tirkiyê ve çû, perçê başûr jî di bin destê Firensiyan de ma, **[Nexşe 1]**. Firensiyan navê çiyayê Kurmênc ê ku Osmaniyan bikar tanî, wek berê hîştin û di warê fermî û di belegeyên nivîskî de xebitand.

Lê piştî çend salan ji damezrandin û serbixwebûna dewleta Sûryê, karbidestên wê navê navçê yê berê, wergerandin zimanê Erebî, û navê çiyê û navçê kirin (Cebel El-Kurd), yanê Çiyayê Kurd.

Di dema Yekîtiya Misir û Sûryê de jî, li salên (1958an-1961ê), navê navçê hat guhertin û bi (Navça Efrînê) hat nasîn, û ew nav ta roja îro di belgeyên fermî de bi kar tê. Lê digel wê, navê dîrokî yê berê "Çiyayê Kurmênc", demeke dirêj di pirtûkên dibistanê û di nexşeyên fermî de bi kar dihat.

Lê belê li sala 1977an, gava ku piraniya navan li Çiyayê Kurmênc hatin Erebkirin, navê Çiyayê Kurmênc jî guhertin û kirin

---

1- li ser bûyerên rojên dawîn ji dargîrkirina Îbrahîm Paşayê Misrî ji deverên Çi.Kurmênc re, di pirtûka /Qustentîn Bazîlî (1809-1884), rûp 182/ de wiha hatiye: ((Bi têvedan Siltanê Osmanî, bi koman mirov ji Kurd Daxê û Gawir Daxê, bi ser baregehên Misriyan de daketin û ew talan kirin,…))

2- Her Kurdekî bê hoz be, yan di navça hoza xwe de najî, yan jî li gundan rûdinin, pêz naçêrînin, naçin zozanan û çandiniyê dikin, jê re Kurmanc tê gotin. Di sinciyên hozane de, ew kes ji nofên civakî yên nizim tên jimartin. Êzdî jî dibêjin: Şora Kurmanc ji du bêjeyan pêk hatiye ye, Kur (law) û Manc (pak, vebjartî, bêhempa), ew jî navnîşana pêxember Şîs kurê Adem e.

"Cebel Ĥeleb", yanê Çiyayê Helebê, digel ku ew pêtirî 60km ji bajarê Helebê dûr e û ciyayê Lêlûn di navbera wan de ye.

Beşê Sûrî ji Çiyayê Kurmênc di quncikê Sûryê yê herî başûr rojava de ye. Deşta Lêçe bi pehniya 10-20 km, çiyayên Kurmênc û Gewr (Amanos) ji hev dike.

Roja îro, Çiyayê Kurmênc navçeke kargêrî ye bi ser parêzgeha Helebê ve, û bi navê "Navça Efrînê" tê nasîn. Rûbera wê li gor belgeyên fermî 2050 $km^2$ e.

Xaka Navça Efrînê di navbera van xêzên Cugrafî de ye: Pileyên berdirêj (36.33º - 33.20º) rojhilat, û pileyên berepehin (36.20º - 36.50º) bakur. Nêzîktirîn cîgehê navça Efrînê ji Derya Sipî/naverast jî, gundê Qermîtliq li roajavaya devera Şiyê ye, ew 38/km, wek çavnêrîn ji bajarê Iskenderonê li Tirkiyê dûr e.

Çend taybetîne navaça Çiyayê Kurmênc ên Xaknîgarî yên giring hene kirine ku ew bibe navçeke şên û navdar, mîna:


- Heyama wê ya Derya Sipî ye, ango sarûgerm e. Barana wê ya salane jî baş e û di navbera 400-600 mm de ye.

- Bi avê dewlemend e. Çemê Efrînê di nav re diherike. Çemê Ava Reş jî di ser sînorê wê yê rojava re derbas dibe. Ji bilî wan, bi dehan kanî û cowik di deşt û newalên wê de derdibin, û gelek ji wan li dirêjiya salê dimînin.

- Deşta Cûmê ya pir şov, bi dirêjiya pêtirî 35/km li her du aliyên çemê Efrînê raxistiye. Bi dehan dever û zeviyên şov di navbera çiyan û di zikî newal û zewran de hene û ji çandiniyên tonbiton re lêhatî ne.

- Kendûkorên wê ne pir bilind in, loma jî ew li hemî werzan(demsalan) ji rûniştinê û ji çêrê re dibin. Sirtên wê jî ne dîke ne û ji gelek rengên çandiniyê malane re dibin, wek: Zêtûn, rez, hejîr, keskayê, cureyên tene.. û hwd.

Ev teybetmendiyên Xaknîgarî yên lêhatî, kirine ku Çiyayê Kurmênc ji serdemên pir kevin de şên û cihê rûniştinê be.


T I R K I Y E
Derya Sipî
Iskenderon
Entekê
Erzîn
Îslehiyê
Entab
Nizib
Çiyayê Gewr (Amanos)
Mîdanekbes
Xasê
Reco
Qirixan
Şiyê
Efrîn
Cindirês
Darazê
Quser
Hêrimê
Çemê Asê
A v a R e ş
Çiyayê Kurmênc
Sîros
(Nebihûrî)
Çemê Efrîn
Mûsbeg
Kilis
Ezaz
Heleb
S û r y e
Çemê Ferêt
36°
37°
38°
((Nexş -1- Herdu beşên çiyayê Kurmênc-Sûrî û Tirkî ))

# Kurtegotinek
# li ser koka gelê Kurd û welatê wî

Berî ku em têkevin nav dîroka netewanî û siyasî ya Çiyayê Kurmênc û dîroka ku Kurd lê bicihûwar bûne nas bikin, me pêwîst dît, ku em kok û binyata kevin a gelê Kurd û welatê wî yê mêjoyî bibîr wînin, rewşên netewane û siyasî yên herêmên rojhilata peravên (kenarên) Derya Sipî û Asya Biçûk di demên dîrokî û berî dîrokî de jî bi kurtahî hewaldin. Ji ber ku têkliyên wan rewşan yekser bi mijara me û koka gelê Kurd re hene.

* *

## Gelên Rojhilata Nêzîk a Kevin
## û koka gelê Kurd

Derhatiyên şûnewarî û diyardeyên dîrokî destnîşan dikin, ku welatê Kurdan (Kurdistan) ji serdemên pir kevin de şên bû. Di çêroka olî ya Tofanê de hatiye, ku çiya û çolên Kurdistanê, ji dema pêxember Nûĥ de, bûye dergûşa neweya mirovatiyê ya duyemîn[(1)].

Lêkolîn û diyardeyên nûjen dibêjin jî, ku ji berbanga dîrokê de, yanê ji destpêka hezarê sisiyan berî zayînê de, deverên çiyayî ji bakur û rojhilata Mezopotamyayê, ango li çiyayên Toros û Zagrosê (welatê Kurdan yê berê û niha), ji hêla geline kevnare de şên bûn, navên wan gelan di belgeyên Somerî, paşê jî di yên Ekadî de hatine

[1]- Heştiya gundek e, li bakurê çiyayê Cûdî ye. Ew ji bajarên gelê Kurdoyîn (ji bapîrên Kurdan) e. Guman heye, ku ew li hezarê sisiyan berî zayînê, paytexta gelên Gotî û Nayrî bû. Lê ya herî dengdayî ew e, ku Nûĥ û heştê mirovê ku pê re bûn, piştî Tofanê, bajarê Heştiya ava kirine. /Dewleta Dostkî, Ebdilreqîb Yûsif, rûp 17/.

zimên. Ew milet di hemî qonaqên dîroka Mezopotamiya û Rojhilata Nêzîk de çalak bûn, ew gel jî roja îro bi (**Gelên Çiyayî**)[1] bi nav dibin. Ew milet ev bûn: Lolo, Kaşî, Gotî, Horî, Sobarto, Hasî…

Pişt re miletine din ji deverên Bakurê Deryayên Reş û Qezwînê bi ser herêmên çiyayî ji Rojhilata Nêzîk hatin, mîna gelên: Med, Kêmir, Skês... Bawariyeke mezin li ba zanyarên navdar, mîna Fledîmêr Mênoriskî, Sêdnî Smês, M.E.Zekî heye, dibêje, ku ew miletên çiyayî bapîrên gelê Kurd in.

Ji hêla binyata nijadî û koka zimanê gelê Kurd de jî, zanyar M.Emîn Zekî wê babeta wiha şirove dike, û dibêje:

((Wekî ku Ereb dibêjin, ew ji silaleta Akadiya ne, ewên ku li dawiya sedsala 23an berî zayînê ji ‘‘Nîvgirava Erebî" derketine; û Tirk jî koka xwe vedigerînin miletê (Qon) ji silaleta (Şang Yong), ku li sedsala 28an berî zayînê li Bakurê welatê Çînê dijiyan; Em jî kanin bêjin, ku gelên Çiyayên Zagrosê wek (Kaşî, Sobar, Gotî, Xaldî, Horî), ew jî bapîrên gelê Kurd ên herî kevnar in. Û piştî serdemên destpêka dîrokê, ango ji dawiya sedsala diduyan berî zayînê de, hozine cengawer ji çolên Rûsyayê berve navçeyên Balkanê, Anadolê, Kurdistanê, Faris û Hindistanê goç kirine, ew gel di çavkaniyên dîrokî de bi navê Gelên HindûEwrupî, yan Arî tên nasîn. Zimanên wan miletan nêzîk hev bûn, û bi (Koma zimanên Hind- Ewrupî) bi nav dibin. Piştî ku ew miletên nûhatî destlatdarî li ser gel û komelgehên Zagrosê kirin, zimanên wan jî belav bûn û hatin xebtandin, lê belê gelek gotin ji zimanên kevin ên herêmê ketin nav wan…)) /M.Emîn Zekî, par1, rûp91/.

Li ber roniya tiştên ku di gelek çavkaniyên dîrokî de hatine, û gelek lêkolînvanên dîrokzan û nijadzanînê (Entropolociya) jî li ser li hev kirine, em kanin wek encam wiha bêjin: Gelê Kurd, ji berhema têkilhevbûna miletên Zagrosê û Torosê yên kevnar û gelên ku di hezarê diduyan û yekê berî zayînê de bi ser wan de hatine, peyda bûye.

---

[1] - Lêkolînvan û zanyarên miletnasiyê, gelên herêma Rojhilata Nêzîk ên kevin parve sê beşên nijadî yên cuda dikin: Yek: Gelê Somerî, wî ji hêla nijadî û zimanî de wek miletekî serbixwe dibînin. Didu: Gelên Samî: Ekad, Babilî, Aramî, Ereb. Sisê: Gelên Çiyayî, gelê Kurd jî jê ye.

Emê li vir gelên Zagros û Torosê yên kevnar, û yên ku paşê bi ser wan de hatine hewaldin, ew milet bi tevahî, bi navê (Gelên Çiyayî tên nasîn) û wek binyata kevin in ji gelê Kurd re[1], **[nexşe2].**

## 1. Gelê Sobar

Ew di navbera başûrê gola Wanê û çiyayên Zagrosê de li Rojhilat û çemê Xabûrê de ji rojava dijî. Navê wî cara yekê di nivîsarên Somerî yên sala 2470yî berî zayînê de hatiye hildan. Li serdema Ekadî û di sedsala nozdan berî zayînê de jî, navê wî bi şêweyî (Sobartîm) hatiye gotin. Ji hêla Xaknîgarî ve jî, Sobarto navê herêma di navbera sînorên Îlamê li başûr li ser Kendava Farisî û çiyayên Amanosê de li nêzîk Derya Sipî ye. Yanê, tevahiya welatên Mezopotamiya, Sûrye û Asiya Biçûk jî bi wî navî dihatin nasîn.

Di serdema Babliyan de jî, ew gel mîna miletekî serbixwe hatiye zimên. Aşûriyan jî ew bi (Sobaro) bi nav dikirin. Lê zanyar bawer dikin, ku li dawiya serdema Aşorî, ew nav ji "Sobar" hat guherin û bû (Nayrî).

## 2. Gelê Lolo

Ev nava di nîvê yekê de ji hezarê sisyan berî zayînê hatiye meydanê. Vî miletî li navîna hezarê sisiyan berî zayînê, qeraltiyeke bi navê (Xmazî) li Başûrê Çiyayê Zagrosê damezrandiye. Ew gela di warê pîşesazî û hunerî de pir li pêş bû. Di dema wê mîrîtiyê de, qeraltiya (Îble) li herêma Ferêt a navîn hebû û têklî di vavbera wan baş bûn.

Zanyarên mîna Spayzer dibêjin: Lolobî bapîrê gelê Lorî yê niha ye. Rojhilatnas Hozîng jî li derbarê zimanê wî dibêje: Ew zimanekî Qafqasî bû û ji zimanê Horî ve nêzîk bû. Loriyên niha xwe wek beşekî ji gelê Kurd dibînin, warê wan li herêma Loristanê li başûrê Kurdistana Îranê ye, zimanê wan jî zaravekî Kurdî ye.

## 3. Gelê Horî

Ew li navîna hezarê sisyan berî zayînê derketiye meydanê. Wî gelek mîrîtî ava kirine. Wek: Nûzî (Kerkûk), Mardîn, Urfe,

---

[1]- Zanistên dîrokî li ser van miletan, ji pirtûka zanyar /M.Emîn Zekî, par1, rûp 61-86/ hatine birin.

Kirkamîş, Entab… Horî gihîştin Alalaxê li deşta Hemqê û navça Latqiyê li ber Derya Sipî jî. Vekolînên şûnewarî yên ku li sala 2001ê ku di girê Mozanê de li rojhilata bajarê Amûdê bi 7/km, hatine kirin, ser şûnewarên bajarê (Orkîşê) yê kevin vedane. Ew bajar paytexteke Horiyan e sereke bû li bakurê Mezopotamiya û dîroka wî ji salên 2300î û ra 1800î b.z. de ye.

Zanyar Mortkart jî di rûpela 174an de li ser Horiyan wiha dibêje: Ew devera fereh ku di navbera Armenistanê, Filestînê, sînorên Îranê yên Rojava û kenarên Derya Sipî de ye, bigelemperî bi gelê Horî mişt bû bû. Lê belê navenda wan a giran, bakurê welatê Mezopotamiyayê bû.

Piştî ku impratoriya Horî ava bû, navê Mîtanî jî vê re hat gotin û bi navê Impiratoriya Mîtanî-Horî (MîtaHorî) hat nasîn. Navê Mîtan jî ê ku di çavkaniyên dîrokî de bi navê Horî re tê gotin, navê malbata destlatdar bû di wê dewletê de.

Paytexta Impretoriya MîtaHorî bajarê Waşo Kanî bû. Şûnewarên wê li ber çemê Xêbûr li kêleka Bajarê Serê Kaniyê ne, li roja niha jî, piraniya şêniyê wê deverê Kurd in. Sînorên wê dewletê ji çiyayên Zagrosê de ra Helebê, deşta Hemqê, Edenê û Filestînê digirtin. Ew dewlet li dawiya sedsala pazdehan berî zayînê bi destê Hitîtan hat rûxandin. Lê belê piştî wê demê jî, Mîtan wek navçeke Xaknîgarî di navber gola Wanê û derya Qezwînê de naskirî ma, û ra destpêka avakirina Impretoriya Medî li sala 612an b.z. wek dewletek serbixwe hebû, wê hîngê ew bê şer tevle dewleta Medî bû.

## 4. Gotî, Cûdî, Kotî

Ji gelên Zagrosê yên kevnar e. Gelek lêkolînvan bawer dikin, ku miletê Gotî maka gelê Kurd a destpêkê ye. Li dema dewleta Somerî ya yekê, Gelê Gotî welatê Somer dagîr kir û destlata xwe 125 salan ajot. Lê qeralê Somerî yê bi navê Or, dîsa welatê xwe ji wan rizgar kir û gelê Gotî jî ji nû ve vekşî welatê xwe yê resen li Çiyayê Zagrosê. Belgeyeke Aşorî ji dema destlata qeral Şilmenesir de (1280-1261)b.z diyar dike, ku gelê Gotî gelek serxwe û bi hêz e.

## 5. Kaşî, Kasî, Kasay

Ji kevintirîn gelên Zagrosê ye. Welatê wî Kermenşa (Loristana Kurdistana Êranê) ye. Ew welat bi (welatê Xwedayê Kaşo) dihat nasîn.

Zaniyar Mortkart dibêje, zimanê Kaşiyan nêzîk ên Qafqasê bû û têkliyên wî bi Hindiyên rojavayî re jî hebûn. Kaşî gav bi gav berve Mezopotamiya dadiketin, ta li sala 1595an berî zayînê, welatê Babil standin û dawî li destlata Hemorabî anîn. Destlatdariya wan dora çar sedsalan ajot û qeraltiya (Kardonyaş) ava kirin, sînorên wê ji rojava de digihaşt çemê Xabûr. Û piştî ku dewleta Kaşiyan ket, ew dîsa vegerîn Çiyayê Zagrosê. Hêja ye em bêjin jî, Kaşî gelê yekê ye ku hesp kedî kir û di cengê de bi kar anî.

Têkliya Kaşiyan bi dewleta Axmînî re baş bû. Baweriyeke bilind heye, ku têkliyên nijadî yên xort di navber gelê Kaşî û Loriyên niha de hene. Hêza dawîn ku bi gelê Kaşî re ket şer, artêşa Iskenderê Mekdonî bû.

## 6. Orarto, Xaldî

Navê miletê Xaldî, ji navê Xwedêyê ku pê bawer dikirin «Xaldiz» hatiye. Warê wî li derdora gola Wanê bû. Navê wî di belgeyên Asorî yên sedsala 13an b.z. de hatiye gotin. Li derbarê wî miletî zanyar Mortkart wiha dibêje: Gava impretoriya MîtaHorî ket û rêberên gelê Horî têkçûn, ew bûn hozên biçûk û li welatê xwe yê resen, ku li bakur û li rojavaya dewleta Aşorî bû vegerîn û lê belav bûn. Lê li dora sala 900î b.z, ew dîsa dibin serokatiya qeral Serdorê Yekê de bûn yek û dewletek mezin ava kirin, paytexta wê dewletê bajarê Tûşa bû, ew jî bajarê Wanê yê niha bi xwe ye, ew li wê serdemê, ji dewletên mezin bû li herêmê. Orarto mîna mîrasa her du dewletên Horî û Hitît tê jimartin. Lêkolînvan diyar dikin ku zimanê Orarto şêweyekî nûjen bû ji zimanê Horî. Qeraltiya Orarto ra dawiya sala 1700an b.z. xort bû, lê ew li sala 590î b.z. li ser destê Medan hat rûxandin.

## 7. Nayrî, Nehrî


Ew neviyê gelên Sobar û Gotî ye. Warê wî li dorhêlên bajarê (Nehrî) li navça Şemzînanê li Bakurê Kurdistanê dijî.

## 8. Kurdox, Kurdo

Navçên Botan û Cûdî warên wî bûn. Diyar e ku navê “Kurda” yê ku di sala 2036an b.z. de bi navê “So” re di deqên Somerî de hatiye nivîsîn, ew navê (Kurdo, Kurdox) bi xwe ye. Navçeya li Başûrê gola Wanê û hozên ku lê rûdiniştin, bi Kurdox dihatin destnîşankirin. Kizênfûn di sala 401ê b.z. de, gelê Kurdox daye nasîn, wê hîngê ew li navça Çiyayê Cûdî û navçeyên çiyayî yên li kêleka çemê Dîcle dijiya.

## 9. Med, Kêmir, Skês

Pirtûkên olî wî bi Acûc û Macûc jî bi nav dikin. Ew sê milet in, li destpêka hezarê yekê berî zayînê ji hêla deryayên Reş û Xezerê de hatine Kurdistanê. Medan li sala 612an b.z, paytexta dewleta Aşûran (Ninewa) dagîr kir û Imperetoriyeke fereh ava kir, sînorên wê li aliyê rojhilat, ji derya Xezerê de dest pê dikirin û li Rojava jî digihîştin derya Naverast. Yanê, hemî hêrêmêm ku niha Kurd lê rûdinin di nav sînorên wê de bûn. Destlatdariya wê dewletê dora sedsalekî ajot. Lê piştî ku di navîna sedsala şeşan berî zayînê de, malbata Exmînî textê impretoriya Medî zep kir, ew dewlet bi Impretoriya Exmînî hat nasîn. Digel wê jî, gelê Medî di nava wê dewletê de hêza artêşî, kargêrî û şêniyî ya bingehîn bû.




**((nexşe-2- welatên rojhilata nêzîk û gelên wê))**

**(( ji Mortkart ))**

# Welatê Kurdan «Kurdistan»(1)

Kurd li herêmeke ferh ji Rojhilata Nêzîk rûdinin. Rûbera wê dora 500 hezar $km^2$ e. Ew herêmeke çiyayî ye. Gelek deştên fereh li nav û li derdora wê hene. Sînorên wê jî ji hêla Xaknîgarî û nijadî ve baş diyar in.

Ew sînor li Rojhilat, bilindahiyên Çiyayên Zagorsê ne, ew Çiya ji nêzîk Kendava Farisî de dest pê dikin û li seranserî sînorên Êraqê û Êranê, paşê jî Tirkiyê û Êranê bi bakur de hildikşin, û li hêla tewir bakur bi Çiyayê Araratê bi dawî dibin. Araratê mezin bilindtirîn çiya ye li Rojhilata Nêzîk, bilindiya wî 5600 mitr e.

Ev zincîrên çiyayî yên gewre ku bi Zagros tê nasîn, welatê Mezopotamiya û Asya Biçûk ji bêla Êranê dikin û sînorên Rojhilata Nêzîk ên Rojhilatî datînin. Wek tê zanîn, gelî û avrazên Zagrosê warekî zor kevine ji Mirov re, û şaristaniyên pêşketî yên sereta lê hatin afrandin.

Ji aliyê bakur rojava, rojava û başûr rojava de jî, ev navçe di nav herêma Kurdistanê de ne: Zincîra Çiyayê Torosê ya başûrî li hêla tewir başûr rojava, ji çiyayê Kurmênc(Efrînê) û ji çiyayê Gewr (Amanos 1650 m) de dest pê dike û berê xwe dide rojhilat. Zincîra Çiyayê Torosê ya bakurî jî bi aliyê bakur û rojhilat de diçe. Ew her du zincîrên çiyayî li rojhilat û li başûr rojhilat tev sirtên Zagrosê dibin.

Bi şêweyekî tevahî, welatê kurdan, ew herêmên ku li Rojhilata Nêzîk piraniya şêniyê wan Kurd in û ji hev neqetîne pêk tê, ji xwe navça Efrînê jî di hindurê wan de ye. Ew ji aliyê Bakur de digihê


---

1- Kurdistan: Stan, parkîteke Kurdî ye, wateya ‘‘Welat" dide. Û wilo Kurd+stan= Kurdistan (welatê Kurdan). Li destpêka dema Selcûqiyan, di sedsala 12an zayînî de, ew nav li herêmeke dewleta xwe kirin. Ew herêm ji navçeyên Kermenşa, Hemedan, Şarezor û Şengalê pêk dihat, paytexa wê kela Biharê ya li Rojhilata Hemedanê bû. "Qezwînî" jî navê Kurdistan di pirtûka xwe /Nizhet Elqulûb 1339an zayînî de, bi kar aniye û sînorên wê wiha gotine: li bakur Ezirbîcan, li Rojava Êraqa Erebî, li başûr Xozistan û ji rojhilat de jî Êraqa Farisî. Ew li wê demê ji 16 navçeyên kargêrî pêk dihat. Li sedsala 17an jî, Osamaniya navê Kurdistan li wîlayeteke xwe kiri bûn, ew ji senceqên Dêrsim, Mûş û Amed pêk dihat, /B.Nîkîtin, Kurd, rûp 29-30/.

deverên Kurdan li navçeyên Kilis û Entabê li Bakurê Kurdistanê.

Lêkolînvanê Sûrî yê Şamî Ehmed Wesfî Zekeriya, li salên sihî ji sedsala bîstan, navçeyên Kurdan li Sûryê bi şêweyekî pir hûrik salix dane û wiha gotiye:

((Hebûn û hejmara Kurdan li Bakurê Welatê Şamê, li parêzgehên Helebê û li Cezîrê li nêzîk Sînorê Tirkiyê bilind e, ew Kurdên resen in, Erebtî nêzîk wan nebûye… Piraniya hozên Kurdan li parêzgeha Cezîrê dimînin. Ew li aliyê tewir bakur rojhilat, ji qeza Dêrkê, li nêzîk çemê Dîcle dest pê dike, berve rojava diçe, digihê qeza Qamîşlo, devera Serê Kaniyê, qeza Kobaniyê û li dawiyê jî digihê Qeza Çiyayê Kurmênc ku bi navê wan bi nav dibe, ew qeza li bakur rojavaya Helebê ye. Paşê devera Çiyayê Kurdan li qeza Ĥeffê ji parêzgeha Latqiyê jî heye, lê belê Kurdên vê deverê, ji bilî kalepîran, bi zimanê Kurdî nizanin)), [**Nexşe 3].**




**Nexşe-3-Herêmên ku piraniya xwe Kurd in.**
**Li gor pirofêsor Şerîf Wanlî.**

# Lêkolîna Sisiyan

## Dîroka Rûniştvaniya Mirov li Rojhilata Nêzîk a Kivin[1]

### Rojhilata Nêzîk di serdemên berî dîrokê de:

Zanyar bawer dikin, ku diwemîn bapîrê mirov, ku bi (Homoarktus) bi nav dibe, berî du milyon sal li Afrika derhatiye. Pişt re, ew berve perava rojhilata Derya Sipî, geliyê çemê 'Asê û deşta Hemqê hatiye. Lêkolînên nûjen diyar kirine jî, ku şûnewarên mirovê Homoerktus li şikeftên çiyayî li Libnan, Filestîn, Kurdistan û Anadolê hene. Homoerktus ji wir de, yanê ji navçeyên herêma me de, du rê girtine, **yek**: Di nav Anadolê re çûye Ewrupa. **Didu**: Di nav Kurdistanê re berve Rojhilata Navîn û rojhilata Asiya çûye.

Wekî ku hatiye zanîn jî, ji nêzîk sed hezar sal de, curekî nû ji mirov peyda bûye, ew bi “Mirovê Niyandirtal” hatiye binavkirin. Şûnewar û qerqodeyên wî li gelek hêrêmên Rojhilata Nêzîk hatine dîtin, wek: Filestîn (şikeftên Kermêl û Tabûn), perava Libnanê (şikeftên 'Edlûn), li Sûryê (şikeftên Yebrûd, Qelemûn, Ûgarêt), li başûrê Kurdistanê li navça Silêmaniyê (şikeftên Zerzê û Şanîder), li bakurê Kurdistanê li rojavaya Gola Wanê li çiyayê Nemrûd, û li Hekarî û Qarsê jî.

Li Efrînê jî, li çiyayê Lêlûn di şikefta Duderiyê de, qerqodeyê zarokekî Niyandirtalî yî tûm hat dîtin. Zanyarên Japanî yên ku di

---

[1]- Ji bo vê mijarê li van jêderan veger: Siltan Mihêsin, Cemîl Ehmed, Fewzî Reşîd, Mihemed Ĥerb Ferzat, Valêrî Gulayêf, Entiwan Mortkart, Cêms Mîlart… Li fehresa jêderan vegerin. Rojhilata Nêzîk a Kevin ji van herêman pêk tê: Nîvgirava Erebî, Sûrya kevin, Mezopotamiya û Asya Biçûk. Ev herêm niha bi Rojhilata Naverast jî tê nasîn.

şikeftê de dixebitin dibêjin: Rûniştineke mirovan e berdewam, di hemî serdemên kevirî de li geliyê çemê Efrînê yê jêrîn (deşta Cûmê) hebûye.

Pişt re, Mirovê Hişmend ji berî dora 40 hezar salî derketiye. Li cihê (Zawê Çemê Şanîder), ku li başûrê Kurdistanê ye, kevintirîn gundê cotarvaniyê li cihanê hatiye naskirin. Ew ji sala 10000an b.z. û ra 3000an b.z. de herdem şên bû. Gundekî cotarvaniyê yî şûnewarî yî din li navça Efrînê li ber girê Endarê jî hatiye naskirin, di wî gundî de jî rûniştin ji sala 8000an ra sal 3000an b.z. herdem hebûye, **[Nexşe 4].**

Zanyar C.Mêlert jî dibêje, lêkolanên nûjen bê erêna diyar kirine, ku bi kêmanî, sê navçeyan li Rojhilata Nêzîk zayîna şaristaniya mirovatiyê dîtine. Ew jî ev in: Gelî û pesarên Zagrosê yên rojavayî, çiya û newalên Mezopotamiya yên bakur - ev her du navçe jî li Kurdistanê ne- û bêla Anadolê, ango nîvê rojava ji Asya Biçûk.

Jêder xuya dikin jî, ku ji sedsala pêncan berî zayînê de, şaristaniyeke bi kokûbinyat li navçeyên Rojhilata Nêzîk rabûye, ew bi (şaristaniya Girê Ĥelef) tê nasîn. Girê Helef li kêleka bajarê Serê Kaniyê li bakurê Sûryê li ser çemê Xêbûre, paytexta MîteHoriyan Waşo Kanî li tenişta wî ye. Ev şaristaniya, wek kevanekî ji çemê Feratê de û ra çemê Zapê li Kurdistana Êraqê belav bûye. Bawerî heye, ku motka vê şaristaniyê herêma ku di navbera her du çemên Dîcle û Feratê de ye.

Li wê demê, li bakurê Sûryê, pêşesaziya Qermît bi pêş ketiye û qermîtê ĥilo yê rengdagerî li beşê bakur ji Sûryê belav bûye. Ew qermît xuya dike, ku di hezarê şeşan berî zaynê de, têkliyên diyar ên wan navçan bi şaristaniya (Ĥesûnê) re li bakurê Êraqê hebûn, /Cêms Mêlert, rûp 82/.

Di wê babetê de, Dr.M.H. Ferzat jî dibêje: Zanyar mêlag dikin, ku ji hezarê çaran berî zayînê de navçeyên Mezopotamiya, nemaze Cizîra Jorîn, Kîlîkiya û Sûrya Bakur (beşê bakur ji Sûrya kevin a ku di navbera çemên Ferêt û Asê de ye, û deştên Metix, Hemq û Ĝabê), ji aliyê çandeyî û şaristanî de yek bûn.

Lêkolîn diyar dikin jî, ku di serdema kevirî ya nû de, jiyaneke

şaristanî e pêşketî li navçeyên Hemq û Çiyayê Kurmênc hebû[1]. Û rûniştvavên wê ji serdema berbanga dîrokê de, qeraltiyeke serbixwe li wir ava kiri bûn. Zanyar L.Wolly[2] dibêje: Jiyana mirovên deşta Hemqê ya demdirêj xuya dike, ku qeraltiya Alalaxê perçak ji navça çiyayî bû ji herêma Rojhilata Naverast û rastî jî ew e. Wê lomê jî, mera kane bêje, ku cudatiya şêniyê deşta Hemqê ji hemsiyên xwe yên li başûr (Samî), rastiyeke û ji destpêka dîrokê de ye…, /rûp 22/.

L.Wolly û koma xwe ya zaniyarî, di (Girê Tebaret El-Ekrad) de, li deşta Hemqê rastî qermîtekî hatine, ew qermît ê talankerina bû. L.Wolly bawer dike, ku ew talanker di navîna hezarê çaran berî zayînê de ji herêma Qafqasa Başûr hatine deşta Hemqê. Ew li derbarê nasnama ew miletên talanker wiha dibêje: Benzê şêniyê deşta Hemqê yê destpêkê bakurî bû, pir guman heye ku ew ji çiyayên Anadolê hati bin û bi kok û çanda xwe ji hemsiyên xwe yên başûrî cuda ne…

Nîşanên şûnewarî yên dawiya hezarê çaran berî zayînê, dest nîşan dikin, ku li wan deman mirovine din jî hatine navçê, wan gundên ku berê hebûn wêran kirine û warine rûniştinê yên nû damezrandine, cîgehê Alalaxê (Girê Etşanê) jî di nav wan warên nû de bû.

Zanyar L.Wolly, di asta kolanê ya dawiya hezarê çaran û destpêka hezarê sisiyan berî zayînê de, pêrgî çenaqên qermîtî hat, ew qermît mîna yê welatê Mezopotamiya bû, ev yek jî dest nîşan dike, ku têkliyeke xort di navbera deşta Hemqê û welatên

---

1- Serdemên berî dîrokê wiha parve dibin: Serdema kevirî ya nû /8000-4000/ sal b.z, serdema kevirî ya navîn /8000-10000/ sal b.z, keviriya kevin /10000 ta 2.3 milyon sal. Mirovê hişmend jî berî 40000 sal peyda bûye.

2- Zanyar Lyonard Wolly û şanda wî ya şûnewarî, di navbera salên 1938an û 1948an de, heft lêkolanên werzî, li deşta Hemqê, li çar cîgehan kirine: Girên Şêx, Etşanê, Tebbaret El Ekrad… Encamên kolan û lêkolînên xwe di pirtûkeke pir hêja de bi navê (Alalax qeraltiya jibîrkirî) daniye. Di wê de, roniyê ji her aliyekî de dide ser dîroka deşta Hemqê û derdorên wê, û wê parve du deman dike: **Yek**: Serdema kevirî ya nû. **Didu**: Dema dîrokî ya di navber 2700 û 1200 b.z. de, qeraltiya Alalaxê (Gi.Etşanê) di vê demê de hebû. Ew pirtûk berztirîn bûyerên ku di wê demê de li Rojhilata Nêzîk bûne hewal dide. Ew pirtûk dê ji bo naskirina rewşa kevin a navça Çi.Kurmênc di wan deman de, bibe jêdera me ya sereke. Em kanin bêjin, ew jêdera yekê ye ku li ser qeraltiya Alalaxê daxive, belkî jêdera bêmînak be jî li derbarê dîroka deşta Hemqê û navçeyên derdora wê.

Mezopotamiya de hebû. L.Wolly vê yekê wek rastiyeke dîrokî dibîne û dibêje jî, ev yek berî ku gelên Samî li dawiya hezarê sisyan berî zayînê berve Mezopotamiya hilkişin, bûye, wê hîngê şêniyên Filestîn û Sûryê jî Horî bûn, /Fîlîp Hetê, rûp 28/.

## Rojhilata Nêzîk li serdemên dîrokî yên berî zayînê:

Zanyar Mortkart di pêşgotina pirtûka xwe ya hêja /dîroka Rojhilata Nêzîk a kevin/ de, wêneyeke zelal ji vê herêmê re neqşandiye; Ew salixên gelên lê jiyane, binyata wan a nijadî, rewşên civakî, sedemên pevçûnên wan, warên wan ên resen û navçeyên belavbûna wan hewaldide û wiha dibêje:

((…Herêma Rojhilata Nêzîk, ev navça fereh, ji du perçeyên têvel pêk tê, çola welatê Şamê ji aliyekî ve û ji zincîrên çiyayên ku ji rojhilat, bakur û rojava de wê dorpêç dikin, ji aliyekî din ve. Di navbera wê çolê û wan çiyan de, deşt û zewrên şov hene, ew herêm ji hêla xaknîgarî ve şêweyekî kevanî distînin. Ew kevan li başûr rojava, ji beyabana Sînayê de dest pê dike, li bakur di ber çiyayê Torosê re derbas dibe û li başûr rojhilat li ber Kendava Farisî bidawî dibe. Gelek rûdaw û heyamên têvel di vê herêmê de hene, beyaban, deşt, çiya, liç, zevî, derya, çem… û hwd.

Ew miletên ku ji beyabana Erebî û çola Şamê pêl bi pêl derbas navça Kevana Şov dibûn, bi malbata “Gelên Samî” tên nasîn. Li hember wan, miletên çiyayî jî bi malbata “Gelên Çiyayî” bi nav dibin, ew jî ji çiyayên xwe de bi ser Kevana Şov de dadiketin. Ew her du malbatên miletan ji aliyê xwîn, ziman, asta şaristanî… û hwd de cuda bûn.

Ji navîna hezarê sisiyan berî zayînê de, li navçeyên şên ji Rojhilata Nêzîk: Çola Şamê û Nîvgirava Erebî li başûr û çiyayên Zagros û Torosê “welatê Kurdan” li bakur û rojava, pirbûnek berçav di haejmara rûniştvanên wan de çê bû bû, ji ber wê sedemê, hejmarine mezin ji neviyên wan pêl bi pêl ji navçeyên xwe yên resen derketin û berve navçeyên ku debara jiyana wan lê dibû, diçûn.

Ji xwe, û ji ber ku navçeyên herêma Kevana Şov deverine berhemdar bûn û debara jiyanê lê peyda dibû, wan miletan hewil didan, ku destên xwe dînin ser. Û herwiha, bi demê re, ew goçkirina

ku bi hêdîka û demkî dibûn, bû rûniştvaniyeke herdem û dema ku ew goçeber li wan deveran bi hêz bûn, destlat jî ji gelên resen ên kevin standin û li wan herêman bûn destlatdar. Gihîştina gelên Samî: Akadî, Babilî, Aramî, Fînîqî, 'Ibrî, Erebên misliman, li navçeyên Kevana Şov, li ser wê bingehê tê şirovekirin.

Û bi wê şêweyê, rastiya goçkirina gelên Çiyayî yên Arî: Lolo, Gotî, Kaşî, Horî, Orarto û bilî wan jî, ji navçeyên xwe yên kevin li çiyan, bo navçeyên xudî şaristaniya pêşketî li herêma Kevana Şov rave dibe.


Bi şêweyekî tevahî, em kanin van her du goçkirinan, bi goçkirinên **Navxweyî** bi nav bikin.

Dîsa, li dema berî zayînê, geline din bi ser herêma Rojhilata Naverast de hatin. Hin ji wan talanker bûn û lê rûnenitşin, hin jî lê bûn niştecih, mîna gelên: Hetît, Gelên Deryayî, Med, Skîs, Kêmer, Pars, Girîk  û bilî wan jî. Û li dema piştî zayînê, Tirk, Megol û geline din jî derbas navçeyê bûn. Ev goçkirinên jorîn jî, bi goçkirinên **Derveyî** bi nav dibin.

Di riya wan goçkirinan re, hin ji wan gelan navçene ji Rojhilata Nêzîk bi sincî û salixên xwe yên netewî yên cuda û bi şêweyekî herdem morkirin, wek nimûne: Hilkeftina leşkerî û olî ya Ereban taybetmendiya Samî li navçeyên derveya Nîvgirava Erebî terixand.

Gelên Çiyayî jî wilo kirin, wan jî taybetmendiyên xwe yên netewî li warên xwe yên kevin terixandin û ji xwe re kirin welatên netewî. Ew heyîna nijadî ya Arî, ku li navçeyê hebû, bi hatina Medan û miletine Arî yên din di hezarê yekê berî zayînê de, rastiya nijadî ya Arî ta dawiyê li ser herêmên çiyayî kuta...)).

Ji gelên ku di hezarê diduyan piştî zayînê de, wek talanker derbas navçeyên çiyayî ji Rojhilata Nêzîk bûn, tenê Tirk tê de man û li şûna Girîkên ku li rojavaya Asya Biçûk rûniştvanên resen bûn, rûniştin û zep kirin. Lê geline talanker en din, mîna Megol, Teter û Xaçperest ji herêmê vekşîn û vegerîn welatên xwe.




((Nexşe - 4-))
Riyên belavbûna mirovê berê ji Efrîka berve parzemînên din û giringtirîn cîgehên serdema kevirî ya kevinli Rojhilata nêzîk

# Lêkolîna Çaran

## Navça Çiyayê Kurmênc di serdemên dîrokî de

## Dewletên destlatdar, nasnama rûniştvanan û rewşên tevahî yên din[1]

Bi mebesta naskirina rewşên tevahî li navça Çiyayê Kurmênc di serdemên dîrokê de, pêwîst bû ku em wê têxin çarçeweke Xaknîgarî ye ferehtir. Lewre me ew xist sêgoşa bajarên Heleb- Entab- Entekê, ku Bajarê Sîrosê (Nebî Hûrî) di navenda wê herêmê de ye[2]. Di vê sêgoşeyê de, navçeyên: Deştên Hemqê û Cûmê, Entek, Çiyayê Kurmênc, deverên bajarê Sîrosê û ra Entabê…, ji hêla Xaknîgarî ve bi hev ve tên girêdan. Ew ji aliyê heyamî û kendûkorî (tedarîs) de jî mîna hev in, [**nexşe 1].**

Ew kirde û derandeyên şûnewarî yên mîna hev ên wan deveran, mêlag dikin, ku wekheviyeke nijadî û pevgirêdaneke çandewerî û

---

1- Zanistên Dîrokê yên vê lêkolînê ji van jêderan hatine birin: Mortkart, Emîn Zekî par1-2, Farûq Ismaîl, Rûdawin ji dîroka cotkaran.. par 1-2-3, Dr.Mihemed Herb Ferzat, Sibhî Sewaf, Lyonard Wolly. Ji bo zanistên bêtir li jêderên dawiya pirtûkê veger.

2- Bajarê Sîrosê navenda vê sêgoşeyê ye. Û ji bo ku em ji mijara xwe dernekvin, emê giraniya xwe bidin ser bûyerên ku bi navça Çi.Kurmênc a ku berî cenga cîhanê ya yekê ve girêdayî bûn. Ew navça di serdemên dîrokê de bi çend navan hatiye nasîn; di serdema Girîk û Îslamî de bi navê bajarê Sîrosê, di serdemên Memalîk û Osmaniyan de bi navê qeza bajarê Kilisê, di dema Firensiyan de bi navê qeza Çi.Kurdan, û di dema dewleta Sûrî de bi navên Qeza Çiyayê Kurdan û paşê jî bi navça Efrînê hatiye nasîn.

rêzanî ye demdirêj di navbera wan navçeyan de hebûn. Nemaze dema em zanibin, ku qeraltiyeke xort û Serbixwe bi navê Alalaxê di navbera salên 2700-1200b.z. de li deşta Hemqê hebû, kolandinan jî diyar kirine, ku têkliyên kûr di navbera deştên Hemqê û Cûmê, yanê di navbera deverên şên ji Çiyayê Kurmênc, nemaze cîgehê Endarê de hebûn.

## Navçeyên Sêgoşa Sîrosê (Nebî Horî):

### 1. Ji hezarê sisiyan de ra sala (1200) b.z.

Vekolanên şûnewarî dest nîşan dikin, ku di hezarê sisiyan berî zayînê de, qeraltiyên serbixwe li bakurê Sûryê hebûn, wek: Ugarêt, Îble û Kirkamîş, qeraltiya Alalaxê li deşta Hemqê jî ji sala 2700 b.z. de hati bû damezrandin(1). Herêma wan qeraltiyan bi navê Amoro (rojava), yanê welatê rojavaya çemê Ferêt dihat nasîn. Amoro bi xwe jî, binavkirinek Xaknîgarî ye, ew nav şêniyê gelek nijadên cuda ku li wan navçan rûndiştin, dest nîşan dike. **[Nexşe 5].**

Li derbarê nasnama şêniyê deşta Hemqê û qeraltiya Alalaxê li berbanga dîrokê, L.Wolly dibêje: Avahiyên Alalaxê yên kevin, ne mîna yên Sûryê bûn, ew wek ên Mezopotamiya bûn. Di navbera Qermîtê deşta Hemqê û Mezopotamyayê yê dawiya hezarê çaran û destpêka hezarê sisiyan berî zayînê de nêzîkbûnek heye, ew jî dest nîşan dike, ku wekheviyeke şaristanî û belkî mirovantiyeke nijadî jî li wê demê di navbera wan her du navçan de hebû.


Lê li sêyekê dawîn ji hezarê sisyan berî zayînê, şêniyê Alalaxê qarşiqekî ji miletên Bakurî û Rojhilatî bû. Alalax jî ji hêla rêzanî de, li dirêjiya hezarê sisyan berî zayînê serbixwe bû. Tenê li sala 2300 b.z, qeralê Ekadî Sergonê Yekê ew talan kir, wî xwast çavkaniya

[1] - Deşta Hemqê ji hêla başûr rojava de, ji nêzîk Derya Sipî de dest pê dike, û li bakur rojhilat li tenga bajarokê Şiyê bidawî dibe. Sînorên wê ji rojhilat de Çiyayên Hêrimê, Lêlûn û Kurmênc in, û ji rojava de jî çiyayê Gewr in. Şaxak jê bi rojhilat de berve beşê dawîn ji geliyê çemê Efrînê diçe, ew bi deşta Cûmê bi nav bûye. Hemq deşteke zor şov e, û ji berê de di navbera Sûryaya kivin û Asyaa Biçûk de çateriyeke girîng bû. Rûbera deşta Hemqê 45x45km= 2025 $km^2$. Li vê deştê liça Hemqê bi rûbera 22000 hêktar, û gola Entekê bi rûbera 10000 hêktar hebûn, lê dewleta Tirkiyê li sala 1970ê ew miçiqandin. Sê çem digihên Hemqê: Efrîn, Reş û 'Asê.

textên Çiyayê Amanosê ji destê qeraltiya Alalaxê derîne û têxe bin destlata xwe. Lê vekolan dest nîşan nakin, ku mirovên Ekadî li Alalaxê rûniştine.

Alalax ta dawiya 1900 b.z. serbixwe ma. Di wê çaxê de, Fer'onê Misirê Sinûsirtê Yekê, qeraltiya Yemxadê (Heleb) dagîr kir, gihîşt Alalaxê, ew jî kir bin destlata xwe û radestî qeralê Yemxadê yê bi navê Aban kir.

Li dema lawazbûna destlata Misirê li Sûryê 1870-1750 b.z, şêniyê Alalaxê li ber qeralê Yemxadê ku peyayê Misiriyan bû, rabû, lê belê şoreşa wan bi tundî hat vemrandin û Alalax yekser bi ser Yemxadê ve çû, Yarîm Lîm kurê Aban jî, baregeha destlata xwe



((Nexşe - 5))
Qiraliya Alalxê û hemsiyên wê

rakir Alalaxê.

Vekolanên wê demê diyar dikin, ku piraniya şêniyê Alalaxê ji hêla nijadî de Çiyayî bûn û neviyên malbata qeral Aban jî wek biyanî dihatin jimartin. Û ji bo ku ew baregehên xwe li bajêr biparêzin, wî bawerî bi Alalaxiyan netanî, loma jî serbazên xwe ji Helebê tanîn. L.Wolly dibêje, belkî sedem ew bû, ku malbata qeralan ji nijada Samî bû û ne Çiyayî bû.

Lê belê, vekolanan diyar kiriye, ku di wê demê de gulvedanek li Alalaxê çê bûye, digel wê jî, û ji bo ku ew serbixwebûna xwe ji Helebê bistîne, şêniyê Alalaxê li dema di navbera 1750î û 1730î b.z. de, şoreşek li dijî qeral Niqmîd Îbûx kurê Yarîm Lîm rakirine û seraya wî şewitandine.

Li dawiya caryeka yekê ji hezarê sisiyan berî zayînê, komine mezin ji nijada Horî, bi giranî li navçene fereh ji Rojhilat Nêzîk belav bûne, wek navçeyên geliyê çemê Xêbûr, Cizîr, Îbla, Ugerêt, û ra gihîştine perava Derya Sipî. Gelek belgeyên nivîskî yên wê demê li wan deveran hatin dîtin. Jê, noteke mûzîkî ye nivîskî bi zimanê Horî ji sirûdeke olî re hatiye danîn, ew nota ya nivîskî ya yekê ye ku li seranserî cihanê hatiye naskirin. Û qaserî ku Horî di sedsalên 15 û 16an b.z. de li Sûryê belav bû bûn, Misriyan nav li Sûryê û li welatê Ken'an kiri bûn welatê (Xoro)[1].

Li dawiya hezarê sisiyan berî zayînê, Horiyan, gelek mîrîtî û qeraltî damezrandin, ji wan: Qeraltiya Nûzî li Kerkûkê û Qeraltiya Entabê li rojava û Çiyayê Kurmênc jî di nava sînorên de bû.

Li nîvê diduyan ji sedsal 18an b.z, Horiyên ku li wê demê bi

---

[1]- Dr.Farûq Îsmaîl, Mamosteyê zanîna dîrokê li zanîngeha Helebê, di gotarekê de, di kovara ((Lêkolînên Dîrokî))-hejmar 49-50 sala 1994an de, li derbarê koka navê Sûryê wiha gotiye: Di belgeyên Misrî yên sedsala 14an b.z. de, navçeyên Sûryê wiha dihatine binavkirin (Xoro), û di hin belgeyên din de, deryayên Sipî û Sor jî bi (Xoro) bi nav bûne, û ji ber ku ew her du derya welatê Misrê ji welatê (Xoro), ango ji welatê Horiyan cihê dikin, wê lomê, ez bawer dikim, ku koka navê welatê Sûryê (xro) ye. Paşê (x) di zimanê Qiptî de bi (ş) hatiye guhertin, û guhertina di navbera (o) û (y) de jî nasdar e, wilo ew nav dibe (şro), Girîkan jî tîpa (ş) bi (s) guhertin, û ew bûye (srê), yanê ew nav bi darêja xwe ya niha Girîkî ye. Yê yekê ku navê Sûryê aniye zimên dîroknivîsê Girîkî Hêrodot (490-420an b.z) e, paşê jî Kizênfûn (426-355 b.z. ) bi kar aniye.

Hiksos hatine nasandin, welatê Kevana Şov dan ber xwe. Dr.Sefedî di /rûpel 103/ de dibêje, Hiksos qarşiqekî ji nijada Hind-Europî bû, ji Horî, Kaşî û Hitîtan pêk dihat. Wan li destpêkê Heleb standin û li sala 1730 b.z. Misir jî birin, û pişt re qeraltiyeke Mîtanî ye gewre li Rojhilata Nêzîk damezrandin, sînorên wê ji rojhilat de çiyayên Zagrosê, û ji rojava de Derya Sipî bûn. Herwiha bakurê Sûryê, Alalax, Ugarêt û ra Çiyayê Gewr di nav sînorên wê de bûn.

Li Alalaxê belgene bi mora qeralê Horî Şawştar hati bûn mor kirin, hatin dîtin, L.Wolly jî ser perestgeheke Xwedêyê Mîtanî Mîsra vedaye, wî di asta avakirinê ya dema di navbera 1595-1447an b.z de, pûtên mêrekî û jinekê dîtine, mîna wan li ber deriyekî Amedê ku di navenda welatê Mîtanan de ye, hebûn. Ew yek dupat dike, ku Alalax endamek bû ji yekîtiya Mîtanî û ola wan jî yek bû.

Li sala 1527an b.z, Fer'on Tehûtimisê Yekê Sûrya dagîr kir. Şûnewar xuya dikin, ku hêzek Misrî li Alalaxê bi cih bû bû. Lê dagîrikirina Misriyan dirêj ne kir, ji ber ku gelek serhildan li dijî wan ji hêla MîteHoriyan ve rabûn, û Misrî derxistin.

Li sala 1482an b.z, dîsa Misriyan Alalax dagîr kirin û destlata wan li bakurê Sûryê dora sed salî ma. Sînorê Alalaxê di bin destê wan de fereh bûn û bi qeraltiya Mokîş hat nasîn. Fer'on Tehutmisê Sisiyan qeralê Horî yê bi navê Tako kir serokê wê û ji wî de malbata Niqmî Ba ya Horî li Alalaxê wek destlatdar hat damezrandin.

Piştî ku li sala 1447an b.z, Tihûtmisê Sisiyan mir, bi têvedana qeraltiya Mîtanî, serhildanek li Sûryê li dijî Misriyan rabû, bandora Misryan pir kêm kir, û dîsa Alalax di nav yekîtiya Horî de wek qeraltiyeke nîv serbixwe ma.

Di lêkolanên Alalaxê de, seraya qeralê Mîtanî Niqmî Ba derket, avahiya wê ji mûdêla MîtaHorî (Hêlanî) bû. Yek ji belgeyên nivîskî yên ku ji dema qeral Niqmî Ba li Alalaxê hatin dîtin, salix dide ku çawa mirovekî Alalaxî ji hêla civakî ve tê bilind kirin û pileya Horî distîne[1]. Di wê belgeyê de navên Xwedêyên Mîtaniyan tên

[1]- L.Wolly di rûpela 113an. Navên nêrza mîna: Horo, Horîk, û yên mêza mîna: Horê, li nav Kurdên Çi.Kurmênc hene. Wateya wî navî ne diyar e. Lê ez bawer dikim, ku ew ji koka xwe de ji bêjeya Horî hatiye. Gava ku Kurdan ji wê hîngê de dev ji wî navî bernedaye û ra niha bikar tînin, belkî jî ji ber ku mirovê bi

bibîranîn, ew yek dîsa dide ber çavan, ku Alalax di bin sersiya Qeraltiya Mîtan de bû.

Lêkolînên L.Wolly û koma wî dîsa dupat dikin, ku li Alalaxê nijadê Horî serdar û pirtir bû, hejmarek mezin jê li navça Ugarêtê jî hebû û zimanê Horî jî serqor bû, /Dr.Ferzat, rûp 141/.

Ji hêleke din ve, firaqên qermîtî yên reş û neqşandî ji mûdêla (Nûzî), yên ji dema (1450-1350) b.z. de li Alalaxê derhatine, diyar dikin, ku yekîtiyeke xort di navbera Alalaxê û bajarên Horî yên navend de, mîna Nûzî (Kerkûk) û Girê Birak li ber beşê jorîn ji Ferêt, hebûn, û diyar dikin jî ku têkliyên wan bi mîrîtiyên bakurê Sûryê re ji yên başûrê wê baştir bûn. Têkliyên Alalaxê yên bazirganî jî bi navça rojavaya Gola Wanê (paşê Orarto) re, ku bi pêşesaziya me'den li pêş bû, pir xort bûn.

Hêjayî gotinê ye em bêjin, ku li dema sedsalên şanzdeh û panzdehên berî zayînê, Heleb navendeke Horî ye naskirî bû. Û piştî mirina Niqmî Ba, kurkê qeraltiyê kete destê kurê wî Îlîm Îlîma. Lê ji ber ku mêldariya wî bi ser Mirsriyan de bû, şoreşek li Alalaxê lê dij wî rabû û ew hat kuştin. Lê belê malbata Niqmî Ba ra sala 1370yî b.z. li ser textê Alalaxê ma û li wê salê Hitîtan Heleb û Mokîş (Alalax) dagîr kirin. Tenê wê hîngê, Alalaxê serbixwebûna xwe winda kir û bi ser Helebê ve çû. Û digel ku li sala 1280 b.z, gelek serhildan li dijî Hitîtan li Helebê û li Alalaxê jî rabûn, lê ew ji bin destê Hitîtan rizgar nebû[1].

---

wateya civakî ya dema kevin bi (gernasî û payebilindî) dihat nasîn. Ez bawer dikim jî, ku navê Pêriyên Bihuştê (Ĥorî), yên bi ciwanî û çavreşiya xwe navdar in, ji koka xwe de navekî Horî ye, û ji ciwaniya jinên Horî hatiye birin, wekî ku çawa (Nefertîtî) ya Horî, jina Fer'on, bi ciwantiya xwe wek pir navdar bû.

1- Hitît hozine HindûEwrupî ne, li sedsala hevdehên b.z, di riya herêma Qefqasê re derbas Rojhilata Nêzîk bûne. Lê ji ber berxwedana Horiyan, wan riya xwe guhertin, berve rojavaya çiyayên Tororsê çûn, û li sala 1650 b.z. dewleta xwe li herêma çemê Halîs (Kizil Êrmak), damezrandin. Ji sala 1430î b.z. de, Hitîtan zixta xwe dan ser qeraltiya Mîtanî, û berê xwe dan başûr û berve herêma Kevanê Şov, nemaze koşeya wê ya bakur rojava li navçeyên Heleb û Alalaxê (Hemqê), çûn. Û digel ku MîtaHoriyan pir berxweda, lê li dawiya sedsala çardehan b.z, Hitîtan kanîn destlata qeraltiya MîtaHorî li bakurê Sûryê têk bibirana, û destê xwe danîna ser Yemxada Horî û bajarê Alalaxê ku paytexta dewleta Mokîşê bû. Di sala 1200b.z. de, impretoriya Hitît li ser destê Gelên Deryayî têkçû, û parve

Û li derbarê nijada rûniştvanên Alalaxê di serdema Hitîtan de, avahiyên asta (1370-1346)an b.z. li Alalaxê dest nîşan dikin, ku nijada hin rûniştvanan hatiye guhertin. Xuya bû ku Hitîtan dixwastin berpirsyar û baweriyan jî li Alalaxê biguhêrin, her tiştekî bikin Hitîtî û wê ji xwe re bikin navendeke olî. Lê tiştê balkêş di wê demê de, mîna L.Wolly dibêje, ew bû ku qermîtê Nûzî yê Mîtanî bi şêweyekî pir li Alalaxê hat dîtin, xuyaye ev yek ji hêla gelê Alalaxê de wek qerezekê li dijî destlata Hitît bikar dihat.

Hîn lêkolîn dest nîşan dikin jî, ku piştî mirina qeralê Hitîtî Şobîloloma li sala 1347an b.z, şoreş li dijî destlata Hitît li Heleb û Alalaxê rabûn, lê belê ew ji hêla Hitîtan ve hatin perçiqandin. Lê digel wê, milet di riya bikaranîna qermîtê Nûzî yê Horî re nerazîbûna xwe li dijî destlata Hitîtî diyar dikir û ew wek şana qerezê didît.

Ji hêla xwe ve qeralên Mîtanî jî, ji Nûzî de bigre li rojhilat û ra Alalaxê li rojava, ji çêkirin û bikaranîna wî qermîtî re li hemî herêmên ku di bin destên wan de bûn, alîkar bûn. Lê belê, digel helwesta gelê Alalaxê li dijî destlata Hitît, demeke hêmin û aştiyane ye dirêj di bin destlata wan de peyda bû, Alalax tê de pêşde çû û Hitîtan jî navendên xwe li Sûryê xort kirin. Ew rewşa ra sala 1280yî b.z. ma, lê di wê salê de, dîsa şoreşek li Helebê û Alalaxê li dijî destlata Hitîtan rabû.

Belgeyên şûnewarî yên nîvê diduyan ji sedsala sêzdehan berî zayînê dest nîşan dikin, ku komeke mezin ji şêniyê Asya Biçûk bi ser Alalaxê de hat, wan hatiyan moda şewtandina miriyan jî bi xwe re anî, û ew ji şêniyê Alalaxê re jî bû mode, şewtandina termên miriyan mîna ku L.Wolly dibêje, teybetmendiyeke ne Samî ye.

Ji bilî wan, goçine mezin ji hin gelên HindûEwrupî, ku bi Gelên Deryayî bi nav dibin, wek Firîcî (bapîrên Ermenan), Filestînî, Skîts, Kêmir… ew jî derbas Rojavaya Anadolê û Derya Sipî bûn, wan paytexta Hitît (Hatoşa) talana kirin, û pişt re Sûrya û mîrîtiyên

---

gelek mîrîtiyên biçûk bû, ta li destpêka sedsala heştan b.z, Aşûran dest danîn ser tevahiya wan, lê digel wê, çand, şaristanî û zimanê Hitît bi sed salan li wan navçan zindî man, nemaze li deverên Meletiyê (Kabal), Kîlîkiya (Xilîlako), Meraş (Kurkum-Circim).

Heleb û Qirqamîş ketin destên wan, û qeraltiya Alalaxê jî li sala 1194an b.z. li ser destê wan ket û careke din ranebû û hat ji bîr kirin, ta li navîna sedsala bîstan L.Wolly û girûpa wî ya zanistî, Axa dîrokê ji ser rûpelên wê veda û ew daye nasîn.

### - Navça Sîrosê di navbera salên (1200-333) b.z. de:

Ew valahiya ku talana Gelên Deryayî li Rojhilata Nêzîk peyda kirin, Aşûran sûd jê wergirt û artêşên xwe wiha livandin: Li hêla bakur berve Asya Biçûk hilkişîn, li rojava jî berve Sûrya Kevin çûn[1]. Aramiyan jî fersend ji wê valahiya siyasî dîtin, ew jî ji navça Golanê berve bakur û rojava hilkişîn.

Ew her du gel li dirêjiya salan bi hev re rûbirû dibûn, lê li dawiyê Aramî li ber berxwedana Aşûran a xedar neçar bûn bi aliyê rojavaya çemê Ferêt de biçêwrin[2]. Hin ji wan hozên Aramî neçar jî bûn, ku li deverine din bigerin daku lê bi cih bibin. Loma jî, wan welatê Mîtanan ê ku bê destlateke xort mabû dan ber bêhna xwe û di navbera 300 ta 400 salî de, gihîştin ra Meraş û Meletiyê li bakur, û kanî bûn mîrîtiyên biçûk di navenda welatê Horiyan de

---

[1]- Destpêka damezrandina qeraltiya Aşûran li sedsal hejdehan berî zayînê bû. Lê ji ber ku li hezarê diduyan b.z, dewletên mezin mîna Babilî, Kaşî, Horî, Hitît li herêmê hebûn, Aşûrî ra destpêka hezarê yekê b.z, di navça xwe de li bakûr welatê Babilê man. Lihevkirinek baş li ba zanyaran li ser koka gelê Aşûrî ya Samî heye. Lê belê, ji ber ku welatê wan nêzîk navçeyên Zagros û Torosê ye, û demek dirêj bi gelên çiyayî re dane û standine, wan gelek salixên xwe yên Samî winda kirine û rengê gelên çiyayî standine. Di vê derbarê de, Dr.Hîşam Sefedî dibêje: Horiyan benzê xwe dan Aşûran, û kirin ku ji pismamên xwe yên Samî werin cidakirin. Mortkart jî wê yekê dupat dike û dibêje: Em kanin bê tirs bêjin, ku ev hemî nijadên han di gelê Aşûrî de gihîştin hev û yekîtiyeke lihevhatî çê bûye, ew gel jî ev in: Damezrawên şaristaniya Til Helf û Samerrayê, Horî û gelên din ku di nav Aramiyan de hatin pişaftin.

[2] - Aramî, komek e ji gelên Samî ye. Aramî navekî zimanî ye bêtirî ku nijadî be, /Dr.Herb Ferzat, rûp52/. Ew bi saya pirbûna hejmara xwe û neviyên xwe, di belavbûna kes û zimanê xwe de bi ser ketin, û hêdî hêdî li welatên gelên herêmê yên kevin rûniştin, wan ramanên xwe jî ji miletan hilanîn, û destlat jî ji wan stend, ta gihîşt radeyekê ku navê Hanîkalbat, yê ku bi mebesta Mîtanî bi kar dihat jî li xwe kirin û bi kar anîn. Wan pêkol kir ku baweriyên civaka Horî jî vejînin. Pişt re, zimanê Aramî li deverên fereh ji Rojhilata Nêzîk belav bû, lê piştî talana Iskenderê Mekdonî ji rojhilatê re, zimanê Aramî li hember zimanê Girîkî têk çû.

damezrandana.

Ew mîrîtiyên wan li bakurê Sûryê û navîna Anadolê dora du sed sal dirêj kirin, lê pişt re yek li dû yekê ketin destê Aşûran. Ew mîrîtiyên Aramî li Sûrya Bakur, li derdorên wê û li navîna Anadolê ev bûn: Şemel (Zednşêrly) 900-738an b.z. li derdora Entabê. Arbad an Bêt Coş (Coşî) li Tilrifadê, Efrînê û Endarê[(1)], bajarê wan ê dawîn Xezazo (Ezaz) jî li sala 738an b.z. kete destê Aşûran.

Erê ew qeratliyên Aramî hatin rûxistin, lê belê gelek nîşan hene dest nîşan dikin, ku nijadê Aramî demeke dirêj li bakurê Sûryê maye. Wek nimûne: Hîn gelek war û gund li navça Efrînê bi navên Aramî ne, wek: Bablît, Baflor…û hwd.

Herêmên Hitîtî jî, wek Hitîna (Hemq), Kirkamîş, Curcum (Meraş), Meletiye… xwe spartin qeralê Aşûrî Tîglet Pilezirê Sisiyan (745-727)an b.z, lê belê ew Hitîtî man û çanda xwe ya netewî û hebûna xwe ya nijadî jî ra dawiya serdema Îslamî li navça Meraşê parastin. Li destpêka serdema Îslamî, Hitît ji hêla olî de File bûn, û bi navê Ceracîme, li ser navê bajarê wan Circim (Meraş) bi nav dibûn, û Sûrya jî demeke dirêj bi navê Hasiya dihat nasîn.

Hêja ye em li vir bêjin jî, di salnama qeralê Aşûrî Tiglat Pilezir a sala 638an b.z. de hatiye, ku Aşûran hinek ji dîlên gelê Gotî (ev nav ji hemî miletên li bakur û bakur rojhilata dewleta Aşûrî -welatê Medan- rûdinşti bûn re dihat gotin, wek Med, Mîtan, Orarto, Skês, Kêmir…./Diyagonov, rûp 191-192/), li bakurê Sûryê û li Fînîqiyaya Bakur bicih kirin. Li ba Betlîmos jî hatiye, ku navçeyên Gotî (Med) lê rûdiniştin bi navê (Sûrya Medî, yan Sormîd) dihatin nasîn, /Diyagonov, Rûp 191-192/.

Di wan deman de, qeralên Orarto Qeraltiyeke xwe ye Gewre ava kiri bûn. Destê wê ra bakurê Sûryê, Heleb û Komecînî (Meletiye) dirêj bû bû. Lê li sala 743an b.z, Orarto û qeraltiyên Aramî yên biçûk, ên ku li bakurê welatê Şamê bûn, wek mîrîtiyên (Metî Îlo-Bêt Ecûş-Erbad) ku hevalbendên Orarto bûn, û dewleta Aşûrî rabûn hev, û di encama şer de qeralê Orarto Serdorê Sisiyan têkçû û vekşî welatê xwe û tevahiya welatê Şamê jî ket nav Impretoriya Aşûrî.

---

[1] - Bawerî heye, ku 'Endarê paytexta qeraltiya Hemqê bû, ew û qeraltiya Erbadê di demekê de hebûn, û têkliyên wan jî hebûn.


Di dema qeralê Aşûrî yê dawîn Esrehdon de, hozên HindûEwrupî, Med, Kêmir û Skês bû bûn dewletek. Wan hêriş birin ser paytexta Aşûrî (Nînewa), û bi alîkariya Babliyan di sala 612an b.z. de Nînewa standin. Wê hîngê Medan beşê bakur ji Rojhilata Nêzîk, yanê navçeyên bakurî ji Kevana Şov, Çiyayên Kurmênc û Amanosê, û ta derya Sipî xistin nav sînorên impretoriya xwe û ji hêla wan de hatin şênkirin jî, **[Nexşe 6].**

Rojhilatnasên navdar /B.Nîkîtin,rûp139- B.Lêrx,rûp13../ bibîr tînin û dibêjin, ku bi demê re, Med li ser beşên mezin ji rojavaya Asya belav bûn. Nêzîktirîn warên wan ji hêla rojava de, li nêzîk Entekê û li derdora Helebê bûn. Li Asya Biçûk jî, çemê Halîs (Kizil Îrmak) di navbera wan û qeraltiya Lîdî ya Girîkî de dibû sînor. Lê pişt re li sala 558an b.z, dewleta Medan a gewre ket destê mîrê herêma Pars (Kureş- Kêroş- Gureş) neviyê qeralê Medya[(1)], û bi wê tevgerê dewleta Exmînî ya Parsî hat damezrandin. Pars bi xwe jî, berê herêmek bû ji herêmên Impretoriya Medî.

Hêjayî em li vir bêjin jî, ku belgeyên di kelayên qeralê Parsî Daryos de hatine dîtin, diyar dikin ku li wê demê, Mîtanî bi Mediyan bi nav dibûn, ji ber ku Mîtanî keti bûn nav Medan û di nav wan de Heliya bûn, /Diyagonov, rûp 297/. Li sala 540î b.z, Exmînan dewleta Lîdî şikandin û tevahiya Asya Biçûk û herêma Helebê jî zep kirin. Û li sala din tevahiya Sûryê jî ket destê wan. Impretoriya Exmînî ra sala 330î b.z. ma,  û li wê salê li ser destê Iskenderê Mekdonî têkçû û welatê wê jî hat dagîrkirin.

---

[1]- Di dema Impretoriya Medan de, Pars satrapek (wîlayet) wê bû, û ji hêla malbata Exmîn ve dihat hokum kirin. Dema ku qeralê Medan ê cengawer Kî Eksar mir, kurê wî Estiyaks li ser textê dewletê rûnişt, û ji ber ku wî ji şer hez ne dikr, Parsî Xort dibûn, û mîrê wan Kureş li dijî dewletê rabû, û li sala 550î b.z, paytexta Medan dagîr kir, û bavê diya xwe qeral Estiyaks ji ser têxt anî xwar, pişt re, û piştî deh salan ji pevçûnan, Kureş tevahiya axa qeraltiya Med kir bin destê xwe, û gihîşt çemê Halîsê jî.



Nexşe -6- Impretoriya Medya

## - Navça Sîrosê li dema (332an b.z – 637an p.z):

Piştî ku Eskenderê Mekdonî li sala 330î b.z., welatê Girîkan kir yek, berê artîşa xwe da rojhilat û di navbera wî û qeralê Parsî Daryosê Sisyan de cenga Îsosê, ku di dîrokê de navder e, derket. Iskender di wê cengê de biserket û di riya kenarê derya Sipî re berê xwe da Misirê û ew jî vekir. Pişt re, berve welatê Mezopotamyayê çû, û di encama şerê ku li sala 331ê b.z. de ku li kêleka bajarê Hewlêrê çê bû, Iskender ew welat jî ji dest Parsan girt, bi nav welatê wan de çû û gihîşt tamximên Hindistanê.

Piştî mirina Iskender li sala 332an b.z, impretoriya wî bû sê beş, beşek jê Dewleta Rojhilatî bû li Sûrya û Mezopotamya, ew bi navê damezrawê wê rêberê leşkerî Silûqisê Nîketor bi nav dibe. Silûqis bajarê Entekê ava kir û ji dewleta xwe re kir paytext. Li dema Silûqis, bajarê Sîrosê (Nebî Horî) jî hat avakirin û bû paytexta Çiyayê Kurmênc. Lê belê ev dewlet li sala 189an b.z. ji rû ket.

Li sala 64an zayînî, Roman derbas Sûryê bûn, ew kirin herêmek ji dewleta xwe û Entek jî jê re kirin paytexk. Wê hîngê, hêza artêşa Romanî ya dehê (Frêtinsîs), paşê jî subaya çaran (Flavya) li bajarê Sîrosê baregeh girtin.

Jêderên dîrokî destnîşan dikin, ku li wê demê, û ji bo dagîrkirina her du navçeyên dewlemend, Çiyayê Kurmênc û Sem'anê, şerên dijwar di navbera Romanan û Parsan de radibûn.

Li destpêka sedsala heftan zayînî, Parsan di hêrişeke xwe de gelek gund şewitandin, dar birîn, çandinî kavil kirin û navçe wêrankirî berdan, /Dr. Ş.Şe'is, Rûp 12/. Lê belê ew şera yê dawî bû ku di navbera Parsan û Bêzentiyan de li derdoara Heleb, Çiyayên Kurmênc û Lêlûn radibû. Ji ber ku, pişt re serdema Îslamî dest pê kir û rewşeke nû li seranserê herêma Rojhilata Nêzîk peyda bû.

Em kanin nexşeya nijadî li rojhilata Derya Naverast, di dema navbera dagîrkirina Girîkan û hatina Mislimanan de wiha bikşînin:

Di serdemên Girîk û Romanî de, sînorên hozên Erebî Beyaban bûn û zimanê Erebî li Sûryê tunebû, /El Durr El-Muntexeb, rûp 27/. Zimanê gelêrî û rojane Aramî bû, zimanê rewşenbîriyê jî Girîkî bû, û Latînî jî zimanê dewletê yê fermî bû. Wê hêngê, gelek bajarên

Girîkan û baregehên wan ên leşgerî li welatê Şamê û Asya Biçûk hebûn. Û berî ku Pars di sedsal şeşan berî zayînê de werin herêmê, şêngehên Girîkî yên bazirganiyê li Sûryê hebûn, û berî ku Iskender navçê veke bi dora 125 salan, perên Girîkî (Diraxme) li Sûryê dihatin bikar anîn, û dema ku Girîkan herêm dagîr kirin, ew şêngehên wan ên ku berê hebûn, zû pêşde çûn û mezin bûn.

Li bakur û rojhilata Sûryê jî, Med û Hitît rûdiniştin. Aramî jî li navçeyên mîrîtiyên xwe yên kevin dihatin dîtin û ew li Sûrya Navîn û ya Başûr jî piraniya rûniştvanan bûn.

Lê gava ku Erebên Misliman wek hêzeke siyasî û artêşî ye nû û xort li Rojhilata Nêzîk derketin, ew rewşên kevin serûbinî hev bûn, û rê li ber guhertinên siyasî û nijadî yên kûr vebû, û careke din rûyê Rojhilata Nêzîk hat guhertin.

# Sêgoşeya Sîrosê
# Li demên Xîlafeta Îslamî

### - Li dema Xelîfeyên Raşîdîn (636an – 660î)z.:

Erebên Misliman navçeyên bakurê Sûryê di dema xîlafeta Umer bin Elxetab (634an-644an) z. de dagîr kirin. Li wê demê, Ebû 'Ubeyde Ibin El-Ceraĥ, serdarê artêşê bû. Mislimanan bi serkêşiya serleşkerekî bi navê ('Îyad Ibin 'Ebid Ĝenem) li sal 636an z. bajarê Entekê vekirin û xû ji rûniştvanên wê standin. Pişt re, hêzên Mislimanan berve Çiyayê Kurmênc û Bajarê Sîrosê çûn. Li derbarê wan bûyeran /Bilazerî di rûpela 163an de/ wiha dibêje: Siwarên Ebî 'Ubeyde gundên Cûmê, … û bajarê Entekê li sala 636an zayînî vekirin. Paşê ew berve bajarê Sîrosê meşîn, û piştî levkirinekê bi Keşeyê wê re ku li gundê Şerqîna[1] li dar ket, ew bê şer ketin bajarê Sîrosê û hemî deverên wê jî zep kirin. Piştî wê, û bi rêbertiya Hebîb bin Mislîme El-Fehrî, hêzên Ebî 'Ubeyde bi hêla bakur de berve bajarê Circimê (Meraş) li çiyayê El-Lîkam (gewir) çûn, ew jî dagîr kirin, û wilo mislimanan li sala 637an z, destê xwe danîn ser hemî navça Sîrosê. Hêja ye em bêjin, ku navê deşta Cûmê wê hîngê jî hebû, û gundên şênkirî lê hebûn.

### - Li dema Xîlafeta Umewî, salên (660î – 750î)z:

Ti bûyerên girîng di vê navberê li navçeya sêgoşeya Sîrosê çê ne bûne. Ji bilî ku di sala 707an z. de, Xelîfe Welîd Ibin Ebdilmelêk hêzeke xwe şand bajarê Circimê, ew hilweşand, cilên Mislimanan jî li şêniyê wê yên File kirin û ew anîn li çiyayên Hawar û Lêlûn

[1]- Hîn gundekî Kurdî bi navê Şerqiya li nêzîk Sîrosê heye.

(Sem'an) û li Tîzîna Hemqê bi cih kirin, hinek jî li navça Humsê bi cih kirin, /Fitûĥ Elbuldan, rûp 163 û 165/. Yanê çiyayên Hawarê û Lêlûn ji Navça Efrînê ji hinekan ji wan Circimiyên Hetîtî re bûn warekî nû.

Jêderên Dîrokî û pirtûkên dibistanê li Sûryê dibêjin, ku Maroniyên Libnanê neviyên wan Circimiya ne. Herwiha ji çêroka jidayêkbûna Mar Maron û ji jiyan û mirina wî li navça Efrînê, û rola wî di Filehkirina şêniyê Çiyayê Lêlûn re diyar dibe, ku têkliyên nijadî û mirovantiyê yên şêniyê Çiyayên Kurmênc û Lêlûn bi gelên Çiyayî re hebûn, ji xwe Hitît jî di nav wan de ne, belkî ji ber wê yekê bû jî, ew Circimiyên Hitîtî li navçeyên Kurdan hatin rûnandin.

### - Li dema xîlafeta Ebbasî (750î – 1256an) z.:

Di vê demê de, gelek tişt diyartir bûn. Sînorên di navbera dewletên Ebbasî û Bîzentî de hatin terixandin, navçeyên Sîros û bajarên li ser sînorên Ebbasiyan ên bakur jî, bi navên «Siĝûr û Paytextan» hatin nasîn[1].

Li sala 944an.z, Sêfiddîn El-Ĥemdanî mîrîtiyek li Helebê damezrand û bakurê Sûryê xiste bin destê xwe. Dema Ĥemdaniyan demek şer û cengê bû bi Bîzentiyan re. Ji ber wê jî, navçeyên Çiyayên Lêlûn û Kurmênc di nav bera her du aliyan de bû bûn deverên sînorî û cihên pevçûnan[2]. Li dema Mîr Se'id Eddewle El-Ĥemdanî, xeta şerê wan di gundên Basûfan, Kîmar, Parsê (Qestela Elî Cindo) re derbas dibû û digihîşt Merc Dabiqê, /Elyewaqît wel Dureb, rûp 128/.

Li wê serdemê, û di navbera salên 962an û 985an z. de, çend caran bajarên Heleb û Entekê di nav destên Ĥemdanî û Bîzentiyan de diçûn û dihatin, di wan salan de Se'id Eddewle kela Sem'anê ji Bîzentiyan stand. Lê belê Ĥemdanî li Helebê li sala 1001ê z. bi

---

1- Paytext ('Ewasêm): Kela bûn, li derdora navçyên di navbera Heleb û Entekê de hati bûn avakirin. Li dema Xelîfe Harûnê Reşît, Minbic, Dîlok, Re'ban, Sîros, Entek, Tîzîn û deverên di navbera wan de, navçeke serbixwe bû, bi navê 'Ewasêm dihat nasîn, Minbic jî navenda wê ya kargêrî bû.

2- Ĥemdaniyan pişta xwe bi Kurdan xort dikirin. Nasiriddewle El Ĥemdanî hevbendî bi wan re danî bû, jina wî Fatme Kurd bû, û Kurdan piştgiriya wî û kurê wî Ebû Teĝlêb dikirin. /Elwan ji Benî Hemdan, rûp 95/.

destê Merdasiyan têkçûn û mîrîtiya Merdasî li Helebê hat ava kirin[1]. Piştî wan salan, Heleb di navbera destlata Merdasî û Fatmiyan de diçû û dihat, ta li sala 1079an z. ew yekcar kete destê Selcûqiyan û ji xwe re kirin baregeheke sereke.

Li sala 1082an z, Mislim kurê Qurêşê Eqîlî xudanê Heleb û Mûsilê, hozine Ereb û Kurd komkirin û pê Heleb û çend Kela ji destê Selcûqan wergirtin, du kurên Mehmûdê Merdasî jî dîl girtin û kela Ezazê jî ji destê wan derxist, /Ji Îble ra Idlibê, Fayêz Qosere, rûp158/.

Lê belê di sala 1084an z. de, siltanê Selcûqî Silêman kurê Qetlemîş, Entek ji destê Bîzenyiyan girt, û li wê salê di navbera wî û Mislim kurê Qurêş Eleqîlî de li cîgehê Bîra Rahil (Gu.Kurzêlê) li ber çemê Efrînê şerek derket û Mislim hat kuştin, lê belê Selcûqiyan nikanîn Heleb bibrana.

Li sala 1105an z, bareya (hemla) Xaçperestan a yekê rabû, bajarê Entekê kete destê wan, mîrîtiyek lê ava kirin û navça Çiyayê Kurmênc jî demeke dirêj di bin destê wan de ma. Di wê demê de, gelek pevçûnên cengawerî di navbera mîrên Xaçperestên Entekê û Rihayê de ji aliyekî ve, û Mislimanan ji aliyê din de, radibûn.

Bi şêweyekî tevahî, em kanin bêjin, ku bûyer li navça sêgoşa Sîrosê bi wî rengî meşîn, ta li sala 1128an z, Îmadidînê Zengî Heleb stand û bi wê yekê serdema Zengî li deverên Helebê û Şamê dest pê kir[2].

## Serdema Zengiyan:

Li dema Zengiyan jî ceng bi Xaçperestan re ranewestîn. Talanên

---

[1]- Çavkaniyên Erebî dibêjin Merdasî Ereb in, ên Kurdî jî, Mina Emîn Zekî, dibêjin ew Kurd in. Lê belê, hêjayî gotinê ye, ku ra niha hozeke Kurdî ye mezin bi navê Merdasî li Bakurê Kurdistanê heye, siyastvanê Kurd Osman Sebrî ji serekên wê bû. Jêder dibêjin, gava Mîrîtiya Merdêsî li Helebê tûkçû, Merdêsî bi bakur ve çûn. Ji bilî ku (Merdas) bêjeyeke Kurmancî ye, wateya “merdî û mêraniyê” dide.

[2]- Di pirtûka /Exbar Siniyê, rûpela 37/ de hatiye, ku li sala 1122an.z, Alefiring bi ser Helebê de çûn û ew wêran kririn. Û li cihgeha (girê Efrînê) cengek di navbera Mîrê Entekê (kurê Bohîmond) û Mîrê Mêrdînê (Êligaziyê Erteqî) yê Selcûqî de rabû. Lê me nikanî cîgeha (Girê Efrînê) bicih bikira, lê belê salixa wî destnîşan dike, ku belkî ew Girê Basûtê be.

di navbera wan de du bere distandin, **yek**: Navçeyên Îmareta Rihayê ya Xaçeperstan ên li bakurê Helebê, mîna Ezaz[1], Çiyayê Kurmênc, Sîros, Rawendan[2], Entab û bi aliyê bakur û rojhilat ve. **Didu**: Xeta Helebê, Hêrimê û Entekê.

Li sala 1145an z, Îmadidînê Zengî dest danî ser Rihayê paytexta îmareta Xaçperestan û hemî arzûyên wê yên li rojhilata Ferêt zep kirin. Lê belê navçeyên îmaretê yên li rojavaya Ferêt di destê mîrê wê Coslînê Diduyê de man. Ji kela û keloşkên ku di destê Coslîn de mabûn ev bûn: Ezaz, Sîros, Rawendan, Dîlok, Meraş, Çemê Gûzan bûn[3]…, lê li sala 1155an z, Nûriddînê Zengî ew jî birin û li sala 1164an z. Hêrim jî ji Xaçperestan stand. Lê belê, û ji ber ku di wê demê de guhertinên lezok di rewşên leşkerî û rêzanî de li herêmê çê dibûn, navça sêgoşeya Sîrosê di nav destên her du aliyan de diçû û dihat.

### Dema Eyûbiyan:

Li sala 1175an z, destlat li bakurê Sûryê ji destê Zengiyan derket û kete destê Eyûbiyan. Li wê salê, siltan Selahiddîn Eyûbî berê xwe da Ezazê û piştî mehek ji heşargehkirinê, ew vekir û da destê biraziyê xwe Teqiyiddîn Umer. Wî li sala 1188an z, Dîlok jî vekir, û kelayên Derbisak û Begrasê ku li kêleka Entekê ne, ji destê Alefiringan girt û radestî xudiyê Ezazê Elemiddîn Silêman kurê Cindêr kir.

Piştî mirina Siltan Selaheddîn li sala 1193an z, mîrîtiya Helebê û deverên wê wek Hêrim, Ezaz, Girê Başir, Derbsak û hemî deverên

[1]- Cengên mezin li Ezazê di navbera Malbata Ĥemdan û Bîzentiyan de, paşê jî di navbera Nûridînê Zengî û Xaçperestan de çê bûne. Lê belê kela Ezazê bi destê Teteran hat wêrankirin.

[2] - Rawendan keleke Asê bû li ser sirteke bilind bû li ber çemê Efrînê. Ew li bakur û rojhilata kela Nebî Horî bi dora 15 km, li paş Sînorê Tirkiyê ye. Navê kela Rawendan di kilameke Kurdî ye kevin «Teyar Beg» de hatiye, li gor wê kilamê, Teyar Beg xudanê wê bû. Rawend jî navê çiçekekê ye. Di pirtûka /Elyewaqît wel Dureb, rûpel 49/ de jî hatiye, ku Rawendî miletek in, li sala 141ê g/ 758an z. li derdorên Heleb û Herranê derketine, û digotin em di refê pêriyan/fireşteyan de ne.

[3] - Belkî ew Girê Kaniya Gûzan (Tilêlaq-Qetlebiyê) be, ku niha li başûrê gundê Dêrsiwanê ye. Ew girekî mezin e, gundê Kaniya Gûzan li kêlekê ye, û aveke pir jî di geliyê wê re diherikî.

rojavaya Sûriyê radestî kurê wî Qeralê Berz Ĝiyasiddîn bûn. Li sala 1240î z. jî, ew ketin destê Qeral Eslan Şah kurê Qeralê Adilê Eyûbî, lê ew li sala din li Ezazê mir û destlata Ezazê ta sala 1258an z. di destê Eyûbiyan de ma.

Li wê salê, artêşa Teterî bi rêbertiya Holako navçeyên Ezaz, Çiyayê Kurmênc û Hêrim talan kir û hemî mîritiyên Eyûbiyan hatin rûxandin. Dîroknivîs Elĝezî di rûpela /291ê/ de dibêje, ku Eyûbiyan mizgeftek li Ezazê ava kirin. Di dema wî de ew bi navê Mizgefta Mezin bi nav dibû, û ev deq bi Erebî li ser deriyê wê nivîsandî bû: ((Bi navê xwedêyê gewre û dilovan, li sala 644g/1246an z, gewreyê me, Siltanê zana, dadmend, arzûvan, serkeftî, çêxwazê olê û jiyanê, Yûsif kurê Qeralê Xoşewîst Mihemed Kurê Qeralê Berz Ĝazî kurê Eyûb Nasir, Mîrê Bawermendan Xwedê destlata wî nemirî bike, ev mizgeft hat avakirin)).

# Navça Sîrosê

## Li dema Memalîkan (1260î - 1516an)z.

### Îmareta Mendî:

Di dema xwe de, Eyûbiyan devera Qusêrê[1] wek baxişîn dibûn mîrekî Kurd bi navê Mend. Mend jî Îmareta **Kilis û Ezazê** li wan deveran damezrand[2]. Herêma Sêgoşa Sîrosê, yanê tevahiya navça Efrînê ya niha, deverên Hêrim, bakurê deşta Hemqê, Ezaz û Kilisê jî di nav sînorên wê de bûn, **[Nexşe 7]**. Şerefxanê Bedlîsî di pirtûka xwe ya pir hêja /Şerefname/ de, ku ji nivîsandina sala 1596an z. ye, pir xweşik li ser dîroka wê Îmaretê û rewşên wê nivîsiye. Ew bi xwe jî li wê demê jiyaye û ji textê siltanê Osmanî ve jî nêzîk bû, û rewş û bûyerên wê mîrîtiyê jî baş dinasîn.

Şerefxan li ser mîr Mend û malbata wî wiha dibêje:

(( Ew sê bira bûn; Şemsidîn ji malbata destlatdarên Hekarî ye, Behadîn ji malbata destlatdarên Emadiyê ye, Menteşe yan Mend Şah jî damezrawê Îmareta Kilisê ye, yanê Mendî pismamên destlatdarên navçeyên Hekarî û Emadiyê ne...

Li destpêkê, mîr Mend hêzek ji hozên Kurd li dora xwe civand û bi siltanên Eyûbiyan re gerî. Pişt re siltanekî ji wan, devera Qussêra Entekê û kela wê wek Senceq baxişand Mîr Mend û ew û merovên

---

1- Qusêr kelak e li başûr rojhilata Entekê bi 18/km. Ew kelake girîng bû di demên Bîzentî û Xaçperestan de. Niha gundekî bi wî navî li kêleka cîgehê kelê heye.

2- Navê Kilisê cara yekê, li dema Xaçperestan hatiye hildan, wê hingê ew wek Kalsîs bi nav dibû û destlatdarê wê kurekî Şahê Selcûqî bû, /Elexbar Elsiniye…, Rûp 18/. Di sedsala heftan goçî de jî, navê wê wek Gîlze hatiye nivîsandin.

xwe lê rûniştin. Wê hîngê Kurdên Cûmê û Êzdiyên wan deveran li mîr Mend civîn, ew navdar bû û destê xwe danî ser hemî deverên deşta Cûmê, Çiyayê Kurmênc, Ezazê û Kilisê û Îmareteke taybet li wan navçan ava kir. Wê hîngê Siltanên Eyûbî ustubariya karûbarên hemî Kurdên wîlayetên Helebê û Şamê jî spartinê[1].

Li destpêka dema mîr Mend, nakokî di navbera wî û hin Şêxên Êzdiyan de, ku li navbera Hemayê û Meraşê bûn, hebû, ji ber wê yekê, pevçûneke cengawerî di navbera wan de rabû û Mend tê de bi ser ket, û herwiha carina bi rindî, û carina bi darê zorê, wî Êzdî kirin bin destlata xwe û hemî Kurdên ku li wan deveran jî dijîn ketin bin destlata wî.

Gava mîr Mend mir, kurê wî Ereb Beg li şûnê rûnişt. Dema ku ew jî mir, kurê wî mîr Cemal li şûnê rûnişt, pişt re Ehmed Kurê Cemal Begê textê Îmaretê stand.

Wekî ku em dizanin, dewleta Eyûbî li Helebê li sala 1261ê z. bi destê Meĝolan hat rûxandin. Lê berî wê, li sala 1259an z, Holako hemî navçeyên îmareta Mendî: Kilis, Ezaz, deverên Cûmê, Çiyayê Kurmênc, deşta Hemqê û bajarê Hêrimê dagîr kiri bûn. Lê belê destlata wî tenê du salan ma, li ser destê Memalîkên Deryayî şikest û berve Îranê vegerî, û bi wê yêkê hemî arzûyên Eyûbiyan jî ji Memalîkan re man[2].


Li destpêka dema wan Memalîkan, Ehmed Begê hukumdariya Kurdan li Kilisê dikir, wê hîngê ew razî ne bû ku têkeve bin destê Memalîkan, û herwiha îmareta wî ra sala 1380yî z serbixwe ma, û dema ku Memalîkên Bircî hukmê li Misrê û Sûryê standin, Mîrên Mendî jî îmareta xwe serbixwe diparastin.

---

1- Ji sala 850z de û ra navîna sedsala nozdan, Kurdan çel Îmaretên serbixwe û nîv serbixwe li ser xaka Kurdistanê damezrandin. Di sedsala sêzdehên zayînî de, Holako Selcûqî ji meydana Rojhilata Naverast rakirin, loma jî rewşên rêzanî ji bo avakirina îmaretên Kurdî, lêhatin, Îmareta Kilis jî yek ji wan Îmaretan bû. Ji bo nasînên fereh li ser îmaretên Kurdî di serdema Îslamî de, li pirtûka Emîn Zekî /Dîroka Kurd û Kurdistanê, perçe didu/ veger.

2- Gava li sala 1215an.z. hakimê Helebê yê Eyûbî Ĝiyasidîn mir, El 'Ezîz Ĝiyasidîn text stand, pişt re li sala 1236an z. El Nasêr Yûsif text stand, ew jî ra sala 1261z. li ser serê Îmareta Helebê ma, li wê salê ew û birayê xwe El Zahêr Ĝazî bi destê Holako hatin kuştin.

Li dirêjiya destlata Memalîkên Bircî jî îmareta Kilisê dîsa serbixwe mabû. Tenê li dawiya dema wan, li dema Mîrê Kilisê Qasim Begê Mendî, û ji ber ku ew mîrekî xort û jîr bû, Memalîkan xwestin wî ji ser textê mîrîtiyê rakin û wê radestî Şêx Izdînê Êzdî bikin. Hinek Êzdî jî bi dora Şêx Izdîn ketin, û ligel hinek serbazên Memalîkên Helebê bi ser bajarê Kilisê û Qasim Begê de çûn, lê belê ew di şer de bi ser nektin û herwiha Qasim Begê serbixwebûna Îmareta xwe bi sergihayî parast…)).




Nexşe-7-
Sînorên Mîritiya Kilis-Bi nêzîkahî

# Serdema Osmanî (1516-1918)

## - Dema di navbera (1516an - 1607an) de:

Dema ku siltan Selîmê Yekê karê xwe kir da ku qeraltiyên Şamê û Misirê ji destê Memalîkan bigire û xwe amade kir ku ji Helebê bi rê keve, Qasim Beg û Xeyrî Begê Çerkez jî xwastin di bin ala wî kevin, Siltên ji wan re erê kir, û destûr da daku seredana wî bikin. Piştî ku Siltan Selîm ew welat dargîr kirin, li vegerê, Qasim Begê kurê xwe yê dozdeh salî yê bi navê Canpolat[1] bi xwe re rakir û bi karwana Siltên re çû Stambûlê.

Wê çaxê, Şêx Izdînê Êzdî berê xwe da Mîrê senceqa Helebê yê Osmanî Ehmed kurê Ce'fer ku bi navê (Qerece Paşa) navdar bû, û bi alîkariya hin kesan, Qerece Paşa bi bawerkirin da, daku nerindyan li ser Qasim Begê li ba şêwerdarên Siltên hewaldin, û wî wek kesekî gefdar bidin destnîşankirin. Wê hîngê, û di encama wê neridiyê de, fermana Siltên bi kuştina Qasim Begê derket, lawê wî Canbolat jî di koşeya Siltan Selîm de hat bicihkirin û kete bin perwerdeya taybet.

Piştî kuştina Qasim Begê, birayê wî Hebîb destlatdariya Kurdên herêmê kir. Lê Qerece Paşa ew wesand Helebê û bi gunekariya ku neh jin bi hev re birine, ew jî kuşt. Li derbarê kesayetiya Hebîb Begê, Elĝezî di pirtûka xwe de dupat dike, ku Hebîb Beg Kurê Erebo ji malbateke navdar bû, ji Mîrên Qusêrê (yanê Mendî ye).

Di pirtûka Ebdilrezaq El-Ĥuseynî /Elyezîdiyûn/ de jî li ser zimanê El-Rredî El-Ĥembelî di pirtûka /Durr El-Ĥubeb/ de, ku ji sedsala dehên goçî de ye, hatiye, û dibêje ku Ezdîn kurê Yûsifê El-Kurdî El-

[1]- Canpolat (can-polat), navekî Kurmancî ye, ji mirovê xort û bi hêz re tê gotin.

'Edewî, li dawiya dewleta Çerkezî û destpêka dewleta Osmanî mîrê senceqa Helebê bû, ew ji rêola Şêx 'Edî bin Misafêr (xudê jê razî be) bû, û bi mala Şêx Mend tên nasîn… Di dema wî de, mîr Hebîb kurê Erebo li bin kela Helebê hat bidardekirin, ji ber ku Mala Şêx Mend Êzdî bû… /rûp 18/.

Piştî wan bûyeran, Siltan Selîm, mîrîtiya Kurdan radestî Şêx Izdîn kir. Lê dema ku Şêx Izdîn mir, û ji ber ku di nav zaro û mervên wî de kesekî hêja tine bû ku destlatdariya Kurdan bike, serbixwebûna Îmareta Kilis hat birîn, û bi ser arzûyên Siltanî yên Entekê ve çû, destlatdariya wê jî dan destê qeral Mihemed Beg, ku ji silaleta destlatdarên Hesenkêfa yên Kurd bû.

Piştî ku kurkê Siltaniyê kete destê Siltan Slêmanê Qanûnî (1520-1566z), wî Canpolat ji koşka Siltaniyê derxist û kire nava Şerefdarên xwe. Û ji ber ku Canpolat di hin cengan de bi karên giring rabû, dilê Siltên bi ser de çû, û dît hêja ye ku ew Mîrîtiya bav û kalên wî lê vegerîne. Lê belê wî guman kir, ku vegera Canpolat dê Kurdan bilivîne û serê wî bêşîne. Lewre rabû senceqek ji wîlayeta Helebê dayê, lê Canpolat pê qayîl nebû. Wê hîngê Siltên kurkê îmareta Kilisê radestî (Husên Xanê Xadim) kir, û jê xwast ku rewşa Kurdan li Îyaleta Kilisê binirxîne. Piştî ku Husên Xan rewş vekoland, raporek ji Siltên re hilda û tê de wiha got: ((Eger Îmareta Kurdan li vê navçê radestî Canpolat Begê nebe, kes nikane barê destlatdariya wan hilgire, şoreş û pêvçûnên wan vemrîne, çeteyên wan tune bike û şênî û rêwiyan li navbera Helebê û wîlayetên Erebî ji şerê wan biparêze…)). Vê raporê hîşt ku Siltan Îyaleta Kilisê û deverên wê bi şêweyekî bapîrane (wîrasî) bibexşîne Canpolat Begê, birastî jî, Canpolat Begê bi hişmendî û zîrekî karûbarên îmaretê ajot[1].

---

[1]- Dibêjin ((gava siltan Silêman Xanê Qanûnî diçû talana Îranê, di wîlayeta Helebê re dirbas bû, di wê navberê de, dizekî bêyî ku pasewan û xizmetkarên Siltên lê haydar bibin, derbas periya wî ya taybet bû, û şûrê wî yê zêrkirî ji erebana wî dizî. Bi sibê re ev nûçeya balkêş belav bû, û gihîşt wezîrê gewre Ristem Paşa. Ristem Paşa zikreşî ji Canpolat Begê dikir, ji lewre wî ji Siltên re got, ku ji bilî Kurdên mîr Canpolat kes gunehekî wilo mezin nake, wê hîngê hêrsa Siltên rabû, û fermana xwînrijandina Canpolêt da. Lê belê Canpolêt ji Siltên tika kir, ku pênc rojan fersendê bidê, eger wî diz negirtin, fermana Siltên

Canpolat Beg li sala 1572an mir. Wê hîngê temenê wî di navbera 90-100 salî de bû. Gelek zaro li dû wî man. Navên dehan jê hatine naskirin: Hebîb, Umer, Ehmed, Evdille, Husên, Ce'fer, Ĝedenfer, Zênel, Heyder û Xidir, hemiyan jî nîşana Begîtiyê hilgirtin.

Piştî mirina Canpolêt, û li gor weseka wî û fermana dîwana Siltan Mûradê Çarê, kurê wî Ce'fer kurkê Îmaretê wergirt[1]. Lê piştî çar salan, û dema ku Serdar Mistefa Paşa berê xwe dabû navça Şêrwanê li Kurdistanê daku wê dagîr bike, Ce'fer Beg jî bi pê ket, û gava ku gihîşt çiyayê Qerecedaxê li navbera Siwêrek û Amedê ji ser hespê xwe ket û jiyana xwe ji dest da.

Ji bilî ku Hebîb Beg ji mîrasa bavê xwe bêpar mabû, wî gelek êşek jî ji destê birayê xwe Ce'fer dîtin. Lê belê ew pir bi rik bû û tola xwe hildida, wî bi riya hinekan xwe gihand wezîrê gewre Mihemed Paşa û postê Mîrîtiya Kilisê jê xwest. Û daku wezîr nakokiyan ji bo îmaretê ji nav biran rake, wî senceqa Nablisê li wîlayeta Şamê baxişandê, lê Hebîb Beg pê qiyal ne bû û tika(rica) kir ku îyaleta Balisê ku di destê birayê wî Husên Beg de bû radestî wî bike, û wilo jî bû.

Lê dama ku Husên Begê ew ferman bihîst, hinek şandin Stembûlê, ew ferman pit kirin û Hebîb Beg ji rêbertiya îyaleta Balisê rakirin. Dema ku Hebîb Begê ew yek bihîst, pênc hezar dînarên zêrî ji bo bertîldayînê hilgirt û berê xwe da dergeha Siltan Mûrad. Li wir, bi riya Şêxê Siltên ê taybet, fermanek ji ba Siltên derket û senceqa Selemiyê danê, lê Hebîb Begê ew yek nepejirand û dîsa bi riya Şêxê Siltên fermaneke siltanî derxist, pê îyalta Kilisê radestî Hebîb Begê bû û senceqa Selemiyê jî radestî birayê wî Husên Begê kirin.

Lê belê piştî sê salan, dîsa kurkê serokatiya Kilisê ji destê Hebîb Begê hat girtin û radestî birayê wî Husên Begê bû. Husên Begê demeke dirêj hukumê Kilisê wek mîrtiyeke serbixwe kir, û li sala

---

çi be ewê bipejirîne. Hîn roja çaran ne hati bû Canpolêt diz tev şûrê Siltên anî, [Şerefname, rûp 233].

[1]- Berî ku Canpolat Beg ji jiyanê barke, kurê xwe Ce'fer ji xwe re cîgir dest nîşan kir û hemî sermyan û karûbarên malbatê û arzûyên ewqafê jî spartinê. Û ji ber ku kurê wî Hebîb Beg di xortaniya xwe de kesekî lihevketî bû, wî wesek kir, ku ew ji mal, mewal û destlatê bêpar bimîne, /Şerefname, rûp134/.

1592an kurkê Mîrmîran jî li ser Tereblusa Şamê wergirt, nîşana Paşatiyê jî stand û bû xudî şor û dewran.

Li destpêka hukmê mîr Husên, û li ser daxwaza dewletê, leşkerên Inkîşarî ji Şamê hatin Helebê û li bakurê Helebê li dijî serhildêrên Celalî şer kirin. Wê hîngê, di navbera wan û şêniyê Helebê de nakokiyên giran derketin. Qadiyê Helebê Yeĥye Efendî zanyar û mîrên Helebê kom kirin û ji Husên Paşa destlatdarê Kilisê re nivîsandin daku were û di navbera wan keve. Wê hîngê, Husên Beg ligel artêşeke mezin hat, û xwest wê firtenê vemrîne, lê Inkîşariyan pêtirî carekê sozê xwe xwarin. Ji ber wê yekê, Husên Begê ji kerba re got: «Xwedê Kûçik berdane ser Çêlan», û ligel serbazên xwe ji Helebê vegerî. Piştî wê, Inkîşarî ketine Helebê û gelek sitemkarî tê de kirin, /Elĝezî,perçe 3, rûp 211/.

Li sala 1602an, Nesoĥ Paşa bû waliyê Helebê. Lê pir neçû, di navbera wî û Inkîşariyan de pevçûneke mezin derket, li wê çaxê Husên Paşa alîkariya walî kir, û Inkîşarî berve Hemayê vekşîn. Lê wan dîsa xwe dan hev û vê carê hêrişa xwe birin ser bajarê Kilisê, ew dorpêç kirin, gundên dora wê mîna Ezaz, Bab û gundên nêzîk Helebê wêran kirin û arzûyên xelkê jî talan kirin. Pişt re derbas Kilisê bûn û karên zor xirab tê de kirin[1]. Wê hîngê Husên Paşa û Nesûĥ Paşa şerê wan kirin û Inkîşarî ji wîlayetê derxistin.

Lê gava ku kum li serê Nesûĥ Paşa vereh bû, tewatîrek belav kir, digot: Husên Paşa li ber dewletê rabûye û dixwaze Nesûĥ Paşa bikuje. Rastî jî ne wilo bû, tenê ji bo mêrantî û wêrekiya Husên Begê, dewletê qedra wî digirt û ew hinekî seribxwe dixebitî. Sedema mandina Husên Paşa demeke dirêj li ser textê Kilisê jî, ne ji ber ku ew li ber dewletê rabû bû, tenê ji ber sinciyên wî bû. Lê belê ya rast, wê hîngê dewletê hinek dijwarî jî di rakirina wî de didît, ji ber ku dewletê hesab dikir, ku hoza Canpolat dê ji bo wî rabe, lewre wê çavên xwe li ser karên Husên Begê dadimrandin û tenê bi pereyên ku jê dihatin qayîl dibû.

Û gava ku Husên Begê gefa Nesûĥ Paşa bihîst, ew rabûn hev û li derveyî Kilisê pev ketin, lê Nesûĥ Paşa şikestî û vegerî Helebê.

Li wê çaxê, ferman ji serdar Sînan Paşa de gihîşt Helebê, Nesûĥ

---

[1]- Kurtenêrînin ji dîroka Cotariyan.. perçe 3, rûp24û28. Elĝezî: per3,rûp 213.

Paşa ji walîtiyê rakir û destlat radestî Husên Paşa kir. Nesûh Paşa ji ber wê yekê pir bihêrs bû, û razî ne bû ku Helebê radestî Husên Paşa bike, û got: Eger kolekî reş bikirana walî minê pê bikira, lê tenê ji kurê Canpolêt re na!! Û ji dewletê re jî nivîsand û got: Mîrên hozan ji walîtiyê re nabin!.

Lê heftek neçû, Husên Paşa hat Helebê û piştî şerekî, Nesûĥ Paşa neçar bû xwe bispêre bedena bajarê Helebê. Wê hîngê Husên Paşa çar mehan Heleb dor pêç kir, û li dawiyê Qadî Şerîf Efendî ket navbera wan, ew li hev anîn û Nesûĥ Paşa qayîl bû ku bi qiyafeta xwe ya walîtiyê ji Helebê derkeve. Ev bûyer li sala 1604an çê bû, /Elĝezî, per 3/.

Li sala 1605an, Husên Paşa bi Sînan Paşa re çû şerê Faris. Û gava ku Sînan Paşa têkçû, çend mîrên Kurd baregehên artêşa Osmaniyan berdan û çûn welatên xwe, lê li vegerê, û bi bihaneya ku Husên Paşa dereng hatiye meydana şer, Sînan Paşa ew bi xinaniyê gunebar kir, û li navça Wanê serê wî jê kir û wîlayeta Helebê jî radestî biraziyê wî Elî Begê kir.

Gava ku mirovên hoza Husên Paşa ew yek bihîstin, û çawa ku ew bê sûc û sebeb hatiye kuştin, hêrsa wan rabû, û biraziyê wî Elî Begê tev apê xwe Xidir Beg serhildan li dijî dewleta Osmanî rakir. Wan pir mirov li xwe kom kirin, Heleb standin û waliyê Helebê yê nuh jî li nêzîk Edenê kuştin.

Wê hîngê mîrê bajarê 'Ekayê Yûsif kurê Sîva ji Dergeha Bilind re li Stembûlê şand û wiha got: Ku eger ew bibe mîrê artêşa Şamê, ewê Lawê Canpolêt ji meydanê rake, û wek wî dixwast fermana Siltên hat. Hîngê ew rabû û leşkerên xwe kom kirin, û li nêzîk Bajarê Hemayê rastî Elî Begê hat. Lê belê Lawê Sîva di cengê de şikest û revî Şamê. Kurê Canpolêt Elî jî çû bajarê Tereblusê stand, û li sala 1606an artêşa Şamê jî şekand û dikir ku Şam jî dagîr bike, lê şêniyê wê ew bi peran razî kir, û bi wê yekê ew vegerî Helebê. Lê li vegerê, ew û Kurê Sîva li hev hatin, keça wî jî ji xwe re anî, û bi wî rengî sînorên destlata xwe ji navça Xezê de û ra Edenê fereh bû û Kurdistan jî stand[1].

Li sala 1607an, Elî Begê peymanek bi Erşîdoq Fêrdînand qeralê

---

[1]- Pirtûka /dîroka dewleta Osmanî, Îbrahîm Helîm, rûp 159/.

Toskaniya Îtaliyayê re danî. Û gotar jî bi navê wî li ser menberan hatin xwendin, wî pere jî kutan, artêşeke xwe ye xort jî damezrand û serbixwebûn ji dewlet Osmanî diyar kir.

Li wê demê, Celalî (rêolek bû) li Enedolê, Me'nî jî li Libnanê rabû bûn. Lewre dewletê wezîrê gewre Quyucî Murad Paşa[1] ligel hêzek mezin şande wan, wî serhildêr li Edenê û Sîwasê qir kirin û pişt re berê xwe da Helebê.

Çaxa ku ew nûçe gihîşt Elî Begê Canpolêtî, wî arzûyên xwe yên giran danîn Helebê, dîwarên wê xort kirin û xwe ji bo pevçûna bi Murad Paşa re amade kir. Û ji bo ku rê li leşkerê Osmanî bibire, rabû komek serbaz şand ser riya çiyayê Begrasê. Lê belê, Mûrad Paşa di wê rê re nehat, û di Çiyayê Qaz re hat, ji ber wê jî, Elî Paşa hema dît ku artêşa Osmanî li dora wî ye.

Şer li roja sêşemê li meha Mijdarê (T2) ji sala 1607an li ber çiyayê Torosê li kêleka Bêlangê, li cîgehê ku jê re dibêjin Deşta Rûcê dest pê kir. Destlatdarê Meraşê Zulfîqar Rustem Paşa jî ligel 40 hezar Kurdên Dilxedar (zûlqidriye)[2] bi Mûrad Paşa re bûn. Elî Paşa jî 40 hezar serbaz ji şer re amade kiri bû, **[Nexşe 7]**.

Ew artêşa Osmanî bi Elî Paşa re ket şer. Li destpêka pevçûnê şûrê Elî Paşa bilind bû, lê belê li dawiyê, ew têkçû û dora 27 hezar serbazên wî hatin kuştin. Wê hîngê, Elî Paşa neçar bû û vekşî bajarê Kilisê, ji wir jî ligel hinek efserên xwe çû Helebê, şevekê lê ma û ji

---

1- Quyucî, yanê (nasê bîrê), ew wilo bi nav dibû, ji ber ku gava wî rikberên dewletê digirtin, ew bi ganî di bîran werdikirin û wilo hêdî hêdî dimirin. Hin jêder dibêjin, wî di gereke xwe de li Qûnyayê, dora sî hezar mirov avêt bîran.

2- Di pirtûka /pevçûn di navbera Memalîk û Osmaniyan de, rûp 23-28, ya Ibin Aca, Mirina wî li 1477an de/, Mihemed Dehman li binê rûpelê li ser îmareta Dilĝadrî wiha nivîsiye: Malbata Dilĝadrî ji hozeke Tirkmanî ye, wê hukumetek li Albistanê ava kir, û ji sala 1340î ra 1512an z. hukum kir. Ji mîrên wê yên navdar Şah Siwar e, ew li sala 1472an li Entabê bi destê Memalîkan hat kuştin. Ji navçeyên Îmareta Dilxadrî: Meraş, Elbistan. Meletiyê, Entab, Dirinde, Behnes li ber ava Reş, deverin ji deşta Hemqê… ew îmaret li sala 1512an bû wîlayeteke Osmanî. Lê belê jêderên Kurdî, Şerefname jî di nav de, dibêjin: Dilxedarî Kurd in. Koka wî navî jî ji (dil xedariyê) hatiye. Dilxedarî jî li ser xwe dibêjin, koka wan digihên Kîsrayê Enûşêrwan ji qeralên Firsan, /Mihemed Suhêl Teqûş, dîroka Memalîkan, rûp 446/. Ev gotina wan, nêrîna dibêje ku ew Tirkman in bi dûr dixe, û rastiya Kurdîtiya wan nêzîktir dike.

wir jî derket.

Mûrad Paşa jî, roja din çû Kilisê, dest danî ser hemî arzûyên Elî Paşa, ji wir jî çû Helebê kela ji dest alîgirên Elî Paşa girt, û hemî arzûyên wî jî talan kirin.

Gava ku Elî Paşa ji Helebê dirket, berê xwe da Meletiyê, ji wir jî çû ba gernasekî xwe bi (Dirêjo) bi nav dibû, ew jî li Anadolê li hember dewletê rabû bû, Elî Paşa xwast bi wî re bibe yek, lê Dirêjo razî nebû û ji Elî Paşa re wiha got: (Erê ez bi dijberiyê hatime naskirin, lê ez negihîştime radeya te).

Elî Paşa ji wir jî çû ba destlatdarê Bûrsayê, xwe pê da naskirin, û jê re got: Ez ji dijberiyê westiyam, dixazim tu min bigihînî ba Siltên. Hakimê Bûrsayê alîkariya Elî Paşa kir, û ew gihande ba Siltên.

Li nav destê Siltên, gava ku Siltên jê pirsî: Tu çima li ber dewletê rabûyî? Wî got: Ezbenî, ez li ber ranebûm, kom û komikên çetan li min civiya bûn, min jî nikanî xwe jê rizgar bikira, ta min ew avêtin devê serbazên te, eger ku tu li min biborî, tu xudiyê lêborînê yî, eger na jî şora te dê bimeşe. Wê hîngê Siltan Ehmedê Yekê (1603-1617) lê borî, û ew kir Mîrmîranê Îyaleta Tîmîşwara li Yugsleviya, diya wî jî li ba xwe hîşt, û kurê wî jî di seraya xwe de, li dibistana Siltanî ya taybet danî [(1)].

Lê diyar bû ku serbestberdana Elî Paşa li heza Mûrad Paşa ne hat, lewre wî hinek şandin, Elî Paşa li kela Belgradê kuştin û serê wî jî şand Stembûlê (Elĝezî dibêje Elî Paşa dîsa li pêş dewletê rabû û ji ber wê hat kuştin). Ev bûyer li dora sala 1611an bû. Û bi vê yekê dawî li îmareta Kilisê ya Kurdî hat, û malbata Mendî jî ku li dirêjiya çar sed sal hukumdarên wê bû, yekcar têk çû û ji hola siyasetê hat rakirin.

---

[1]- Dîroknivîsê Ermenî Grîgor Tizanagêtsî (mirin 1643an), li ser tevgera Celaliyan wiha nivîsiye: Li vê salê 1606an, gava em li Qudsê bûn, û ji ber ku xudanê Kilisê Canpolat Celalî bû, û serî li ber dewletê hilda bû, heşargeha wî zor li Şamê û li Helebê kiri bû, ra li Qudsê em jê ditengijîn. Paşê Mûrad Paşa hemî Celalî li Helebê kuştin, Canpolat jî ligel 300 kes û dê û kurê xwe yê reng ciwan, bi xwe re rakirin û çû Qustentîniyê û lêborîn ji Siltên xwast. Pişt re wî kur û diya xwe rihîn li ba Siltên danîn, û li Nesuĥ Paşa gilî kir û got, ku wî ew kiriye Celalî, /Adiyat Heleb, pirtûk 6 û 7, rûp 202-203/.

Piştî ku Elî Paşa hat kuştin, hinek ji Malbata Canpolatî li deverên Helebê û Kilisê wek Se'îd Begê Canpolatî ji destê Quyuçu Mûrad Paşa rizgar bûn. Se'îd Begê li sala 1630î xwe gihand Durûzên Me'nî mîrên Libnanê, ku ji berê de têkliyên malbatî di navbera wan de hebûn. Çimkî, wek tê gotin, gava ku malbata Mendî hati bû derdora Helebê, wan bawerî bi Ola Durzî tanî, /Mûsllî, per 1, rûp 490/. Malbata Canpolatiyên Libnanê ya niha ji Se'îd Begê dikşê. Hêjayî gotinê ye, ku hîn 17 gundên Durûzan li navça Hêrimê hene, ew dupat dikin ku koka wan Kurd e.

Dîsa, li derbarê hoza Canpolatî, Mistefa Ne'îm El-Ĥelebî ‘‘li gor Elĝezî" wiha dibêje: Ew ji hozên Kurd ên li senceqa Kilisê li nêzîk Helebê ne, Hûsên Paşa jî mirovekî xedar bû, dewleta Osmanî ew û hoza wî bi kû de dişandin diçûn û dijminên dewletê diwestandin.

## - Serdema Osmanî li salên (1607 – 1918)an:

Piştî rûxistina malbata Mendî, îmareta Kilisê ji aliyên kargêrî û rêzanî ve bi ser Helebê ve çû, rêber û kargêrên wê bi fermanên Stembûlê dihatin danîn. Yekcaran Derebegên (begên deverî - îqta'î) navçeyê jî destlatdariya wê dikirin. Pişt re, Kilis bû Senceq, senceqdar an hakimek ji hêla waliyê Helebê de jê re dihat danîn. Piştî wê, dema ku li sala 1854an Kilis bû Qeymeqamî, Qeymiqamekî destlatdariya wê dikir.

Di pirtûka lêkolînavanê Firensî Rojê Lîsko de hatiye, ku piştî Elî Paşayê Canpolatî hate kuştin, Kurdekî ji hoza Berwarî ji şaxê Robarî ku li Stenbûlê payebilind bû, li sala 1620an wek hukumdarekî şandin Kilisê. Lê piştî ku ew jê hat hilanîn yan jî mir, kur û neviyên wî li Çiyayê Kurmênc bi cih bûn, li kela Basûtê rûniştin û navça zewra çemê Efrînê kirin bin destê xwe. Destlatdariya wan Robariyan dora sed salî li wê deverê ma.

Di pirtûka /dîroka Kilisê ya Qadirî, rûp 36-84/ de jî wiha hatiye: Li sala 1724an, serokatiya hikumeta Kilisê du salan bi wekalet radestî **Aşiqli 'Elî Aĝa** kirin. Li dema wî, gelek pirsgirêk derketin û şêniyê Kilisê raperîn li dijî wî rakirin, loma jî hêzên dewletê ji Helebê hatin, û her kesê ku bi serhildanê re têkildar bû, wek Ebdîn Axa û Urbali Ismaîl Axayê Robarî kuştin, û herwiha ew raperîn hat vemrandin û hêminî li navçê dahat.

Li sala 1739an jî, hinek Kurd û Ereban fersenda mijûlbûna dewletê bi şerê Rûsan re dîtin, û hêriş birin ser çend gundên navça Idlibê, /Feyêz Qosere, rûp 244/.

Li sala 1740î, **Betal Axa** salekê bû hakimê Kilisê, lê hin nakokî di navbera destlatê û şêniyê Çiyayê Kurmênc de derketin, di encamê de Kurd du caran derbas Kilisê bûn, ziyanên mezin gihandin xelkê û sed rûniştvan jî dîl birin. Ev bûyer li dîroka 1736an, li dîroka ku R.Lîsko li derbarê hatina malbata Gênc ya navça Çiyayê Kurmênc tê, jixwe Betal Axa jî Gêncî bû. Wek ku xuya dibe, Gênciyan kela Basûtê ji destê Robariyan girt, û Betal Axa bû destlatdarê Kilisê.

Li ber roniya van bûyeran, guman heye, nakokiyên ku li wê hîngê di navbera Kurdan û destlata Kilisê de çê bûn, pêwendiya xwe bi ew pevçûnên di navbera Malbatên Gênc û Rûbarî de hebû, ji ber ku wek xuya dibe, li wê demê mêldariya şêniyê Kilisê bi ser mala Robrî destlatên Kilisê yê berê de bû.

Li sala 1747an jî, Kilis û Ezaz bûn senceqek û li sala 1752an **Ebdirehman Paşayê Fîlik (çîl)** du salan bû destlatdarê Kilisê, di dema wî de şênî pir hat êşand, wî li gor dilê xwe mirov dikuştin, serên wan jî dibirîn û davêtin cihekî naskirî.

Li vê demê, û ji ber ku dewlet bi şerê Îranê de mijûl bû bû, Kurd û Tirkmanên navçeyên Hêrim, Rûc û Derkûşê ku li derdora navça Kilisê ne, talanên xelkê dajotin, ji ber wê jî Siltên bi xwe ferman da, daku şerê wan were kirin, /F.Qosere, rûp247/.

Li sala 1780yî, **Mihemed Axayê Kurd** sê mihan bû hakimê Kilisê, lê wî xelk êşand, wê lomê jî dijberên wî pir bûn, û wê yekê kir ku şêniyê Kilisê lê rabe, û alîkarî ji Ebdî Paşa ku li deverên Helebê bi rû bû, xwastin. Û herwiha Mihemed Axa ji ser têxt danîn û **Kurê Qere Mile** li şûna wî rûnişt.

Li sala 1783an **Mihemed Paşa kurê Daldapan**[(1)], serokatiya destlata Kilisê bi şêweyekî fermî ket destê wî. Ew mirovekî wêrek û hişmend bû, loma jî li sala 1784an dewletê Başlikiya Kilis û Ezazê mîna malmîras radestê kir.

---

[1]- Ew ji gundê Tiyekê ku li Qeza Xasê bû, Xasê jî navçeke Kurdî ye li Tirkiyê, piraniya şêniyê bajarê Xasê û gundên wê Kurd in, bajarê Xasê dora 10km ji gundê Meydan Ekbezê-Sûryê dûr e.

Li dema destlatdariya xwe, Mihemed Paşa gelek talan birin ser derdorên Başlikiya xwe, û bi alîkariya şêniyê Kilisê, Kurdan, Ereban û hoza Reşwan a Kurd, hêriş birin ser Helebê û Entabê. Û herwiha wî arzûyên xwe gelek fereh kirin, û îmareteke nîvserbixwe ava kir. Hukmê wî heft salan ajot, tê de baç li ser cotariyan pir sivik kir. Wî ji ber baçê ve mûj û dims ji cotariyên Kurd dibirin, û baçek li ser dewaran jî danî, wî li serê her Qentir, Hêştir an dewarekî qebe Qurşek dibir. Lê li sala 1795an, gava dikir ku pirsgirêkekê di navbera dewletê û hin rûniştvanên Entabê de çareser bike, hat kuştin. Piştî wê kurê wî **Mehmûd Paşa** du salan li şûna wî rûnişt.

Piştî Mehmûd paşa, **Mistefa Beg kurê Topel** li sala 1801ê destlatdariya Kilisê teslîm bir, wî îmareteke sergihayî ava kir, lê belê wî şênî pir êşand, loma jî xelk lê rabû û ew kuştin.

Li wê salê bi xwe, ango li sala 1801ê, Kilis radestî **Omer Axayê mala Umê** bû. Lê belê hakimekî wê yê berê bi navê Sma'îl Axa, bi “Axa Me'cûn” dihat nasîn(1), destê xwe danî ser wê. Omer Axa jî, ji ber ku Kurd bû -mîna ku Qadirî dibêje- bi alîkariya Kurdan hîriş bir ser Kilisê, ew sê mehan dorpêç kir û darên zêtûnê ji dora wê hilkirin, lê belê wî nikanî destlatadariya wê vegeranda.

Li sala 1810an, **Fedlî Axa** bû hakimê Kilisê. Wî jî şênî êşand û pir zordarî li wan kir, lê belê hatina hêzên Ibrahîm Paşayê Misrî li Kilisê, destlata wî bi dawî anî.

Li wê çaxê, Betal Axayê duyem kurê Betal Axayê Gênc(2), ku hakimê Kilisê yê berê bû, ji kela Basûtê de li deşta Cûmê, deverên Çiyayê Kurmênc û Sem'anê destlatarî dikir. Wî Kurdên wan deveran, nemaze Kurdên Êzdî, li dora xwe kom kiri bûn, destê xwe dirêje derdora Helebê jî dikir û xû jê werdigirt, wî wekî ku ji dewleta Osmanî cuda bû bû kar dikir. Wê rewşê ra hatina Ibrahîm Paşa kurê Mihemed Elî Paşayê Misrî ajot, û navçe di destê Mala 'Umê û Gênc de dima.

---

1- Belkî têkliya malbata Me'cûno ya ku niha li gundê Qitmê ye, bi wî Axayî re hebe. Xuya ye, ji ber sedemek ne diyar, Qadirî navê wî di nav destlardarên Kilisê de ne gotiye.

2- Kilama ku li ser qehremantiya Betalê Betêl xudanê kela Basûtê dihat gotin, li ba nifşê berê ji şêniyê Çi.Kurmênc navdar bû, lê li vê dawiyê hunermendê gelerî Bavê Seleh jiserkînûve ew stra û vejand.

Gava ku Ibrahîm Paşa hat herêmê, nakokî di navbera wî û Betal Axa de li ser destlatdariya navçeyên bakurê Helebê çê bû, û gefa şerê hev kirin. Lê belê ji dêvla ku Ibrahîm Paşa dest bi şer bike, wî bi fêlbaziya daxwaza lihevhatinê bi Betal Axa re, di riya hin navbênkaran re, ew vexwend Helebê, û ew û kurê wî Îbiş[1] û çerxiciyê wî 'Eliyê Şindî ji gundê Maratê girtin û li binê kela Helebê bi dar xistin. Ev bûyer li destpêka salên sihî ji sedsala nozdan çê bû.

Hêjayî gotinê ye, ku berî Mihemed Elî Paşa waliyê Misirê li hember dewleta Osmanî rabe û Sûryê dagîr bike, pêwendiyên xwe bi Betal Axa re hebûn. Straneke kevin li ser Betal Axa heye, li ser seredana wî ji Misirê re û hevdîtina wî bi Mihemed Elî Paşa û efser û şalyarên wî re dipeyve.

Û herwiha, tenê gava ku Betal Axayê Gênc hat kuştin, Îbirahîm Paşa û dûv re jî Osmaniyan, kanîn navça Kilisê bi temamî bixistana bin destlatdariya xwe.

## **Rola Hec Omer û lawên wî**:

Hatiye zanîn, malbata Hec Omer a ku niha li Gu.Dêrswanê rûdine, di dîroka Kilisê de xudî roleke girîng e. Demezrawê wê malbatê **Hec Omer** e. Ew rêberekî hoza Reşwan bû, û li gundê Qocanliyê ku bi ser Kilisê ve ye rûdinişt. Wî li sala 1742an nîşana Derebegîtiyê wergirt û dewletê derebegitiya Çiyayê Kurdan spartê.

Piştî ku ew çû diyarê rehmetê, kurê wî **Hec Mihemed Axa** li şûnê rûnişt. Gava wî jî goçkir, kurê wî **Welî Axa** begîtiya Çiyayê

---

[1]- Xûrî Bersûm di rûpela 15an de dibêje: Navê Aĝyolê li Helebê, bi Tirkî ye, û bi mebesta (riya axê) ye. Dibêje jî, ku Misliman, famîleyên din û bazirganên komira ku ji Çi.Kurdan ji Bakurê Helebê dihatin, lê rûdiniştin. Ibin Şedad jî ku li sala 1258an zayînî miriye, gotiye ku taxake Kurdan li wê deverê hebû. Ji ber wan rastiyan, em bawer dikin, ku ew nav ji navê Betal **Axa** hatiye, yanê **riya Betal Axa**. Çinkî Betal Axa li wir hat veşartin, û gora wî û lawê wî ta demeke nêzîk li wir bûn. Gava me ji kalemêrên wê kolanê pirs kir, ji me re gotin, ku di salên heştê de ji sedsala bîstan, dema goristana wê deverê ji bo avakirina avahiya awqafê hat rêşkirin, mirovê ku avahî digirt, du gor nêzîkî şeş mehan hîştin, û dema ku kes lê nebû xudî ew jî dûz kirin. Pişt re me ji mala Gênc bihîst, ku ew ji bo rakirina wan goran hatine agahdarkirin, lê mixabin wan guh nedayê, û gorên bapîrên xwe ranekirin. Cihê wan goran li Helebê li hember dibistana “Hunerên Jinan a Şeşan” e.

Kurmênc wergirt, ew di demeke kin de bû xudanê hêz û navekî gewre, û li ber destlata Kilisê rabû. Loma jî, li sala 1832an hakimê Kilisê Hec Birahîm Paşayê Entabî, komek serbaz bi ser Çiyayê Kurmênc de bir, û di navbera wî û Welî Axa de şer derket, lê belê ew tê de bi ser ne ket.

Wê hîngê dewletê giringiyeke mezin da pirsa Welî Axa, û hêzên xwe herdem li dû wî bûn. Li dawiyê, Welî Axa neçar bû xwe ji ber çavan bide alî.

Lê piştî demekê, û ji bo ku lêborînê qezenc bike, dewletê lê merc kir, ku di hin şerên dewletê de beşdar bibe. Û piştî ku wî ew merc bicih anî, dewletê hukmeta Kilisê ta dawiya jiyana wî baxişandê. Destlatdariya Welî Axa deh salan dirêj kir, tê de karê hukmetê baş bû, lê ew li sala 1853an çû ser qedera xwe.

Piştî mirina Welî Axa[(1)], kurê wî Xelîl Axa serokatiya hozê wergirt û derebegitiyek jî ava kir. Wî di demeke kin de destê xwe danî ser destlatdariya Kilisê jî û hemî karûbarên wê bi dest xwe ve anîn. Û dema ku li sala 1854an Kilis bû Qeymiqamî, û Hebîb Paşa bû qeymiqamê wê, ji ber rola Xelîl Axa wî nikanî ustubariyên xwe pêk banîna, û hin bi hin Xelîl Axa li hember dewletê jî serî hilda.

Hîngê dewletê serbazên xwe şandinê, û pevçûn bi peyayên wî re derket, lê Xelîl Axa nikanî xwe li ber wan bigirta û neçar bû xwe radestî dewletê bike. Wê hîngê waliyê Helebê ew girt û dûrewarî (srgûnî) navça Edernê kir. Lê piştî demeke kin, ew bidizî vegeriya Çiyayê Kurmênc û ji nû ve derebegîtiya xwe xort kir.

Vê carê waliyê Helebê Derwêş Paşa li serê hêzeke giran hat Kilisê, û di riya miftiyê Kilisê Mihemed Efendî re, ku ji Xelîl Axa hez dikir, guftûgo di navbera wan de çê bûn. Di encamê de, Xelîl Axa xwe radest kir, lê ji dêvla ku Walî merca lêborînê pêk wîne, wî ew dûrewarî gundê Qozanê li devera Îslehiyê kir. Qadirî di pirtûka xwe de dibêje, ku Xelîl Axa li sala 1866an li wir bi nexaşiya Pirikê mir. Lê gotinek din heye dibêje, ku Osmaniyan ew kuşt û belkî ya rastî jî ew be.

---

[1]- Dewletê jê re digot (Dêli Xelîl - Xelîlê Dîn), lê alîgirên wî jê re digotin: Zor Xelîl Axa.

Bi mirina Xelîl Axa re, rola mala Hec Omer a rêzanî di jiyana Kilisê û Çiyayê Kurmênc de bidawî hat, û destlata Osmanî destê xwe bi xortî danî ser hemî deverên Kilisê û Çiyayê Kurmênc.

Piştî vê qonaqê, pêwendiyên hozane li Çiyayê Kurmênc lawaz bûn û rê ji pêwendî û rêxistinên civakî yên cuda re vebû, û li şûna têkliyên hozane û destlatdariya serokên hozan, pêwendiyên derebegîtiyê û Axetiyê hatin meydanê.

Li wan salan, zagona tomarkirina zevî û malan a Osmanî derket, û li sala 1861ê zagona dapiyan jî derket, li gor wan zagonan, zeviyên her gundekî yan her çend gundan li ser navê mirovekî tenê dihatin tomarkirin. Loma jî, li wê demê hin mirovên ku bi rû bûn, derfet standin û gund û zeviyên cotariyan li ser xwe tomar kirin, û herwiha gundiyên ku xwedî mal û arzû bûn, di şev û rojekê de bê arzû man û li ba hin mirovên keysebaz bûn azep, bi taybetî jî piştî ku li sala 1882an, sînorên zeviyan li wîlayetên Sûriyê hatin diyarkirin û tomarkirin. Piştî wê demê, gelek ji wan keysebazan bi (Axe) jî bi nav bûn, û li şûna navnîşanên berê, ango Beg û Paşe, Axetî hat meydanê.

Ji malbatên mezin ku li nîvê diduyan ji sedsala nozdan û li destpêka sedsala bîstan li ser binyata xwe ya hozanî mîna derebegên nû hatin naskirin, ev bûn: Şêx Sim'el, 'Umê, Robarî, Gênc… û bilî wan jî, û li demên cenga cîhanî ya yekê û dagîrikirina Firensiyan ji Sûryê re, ew malbat bûn xudan hêz û şor. [Ji bo dîroka malbatan li Çiyayê Kurmênc û hozên wê, li beşê pêncan vegerin].

Ev derebegên nûhatî, xwe ji armancên rêzanî dûr xistin, meraqên wan tenê bidestxistina arzû û gundên pir bûn. Ew razî bû bûn ku bibin perçak ji destlata dewletê. Çinkî wan bi alîkariya destlata Osmanî, paşê jî bi ya Firensî Axetiya xwe dimeşandin û keda cotariyan dimêtin.

Bûyereke girîng li derbarê navça Kilisê li vê demê heye gerek e were gotin, ew jî, Ermenên ku li deverên Kilis, Entab û navçeyên derdorê rûdiniştin, li sala 1895an serhildanek li dijî dewleta Osmanî rakirin, lê ew serhildan bi darê zorê hat perçiqandin.

# Lêkolîna Heştan

## Rewşên Çiyayê Kurmênc li dema intîdaba Firensî

Li sala 1916an, hêzên hevpeyman hêriş birin ser arzûyên dewleta Osmanî li rojhilata Derya Naverast. Li dawiya sala 1918an, hêza Osmanî ya bi serokatiya Mistefa Kemal, ji Helebê berve Edenê û navîna Anadolê vekşî[1]. Û li meha berfenbarê (Kanûna Yekê) ji wê salê, tîma Hindî ji hêzên Înglîzî derbas Kilisê bû. Pişt re Înglîzan hemî wîlayeta Helebê û ra Entabê û Meraşê dargîr kirin. Û piştî wê bi salekê, li meha Cotmeha sala 1919an, hêzên Firensî wîlayeta Helebê ji Înglîzan radest bir.

Li wê demê, hêzên Firensî ji du aliyan de derbas Çiyayê Kurmênc bûn; **Yek**: Ji hêla Meydan Ekbezê de. **Didu**: Ji aliyê Ĥemamê û Cindirêsê de. Ew her du hêz li Stesûna/rawestgeha çîmanê ya Qitmê gihîştin hev û ji xwe re kirin baregeheke sereke. Li wê çaxê, fîşeka destpêkê ku li seranserî Sûryê di rûyê hêzên Firensî de hat peqandin li Na.Efrînê bû û bi destê kesê bi navê Miĥê Îbşaşê hat avêtin[2].

---

1- Ew hêz bi meş di ber xeta çîmanê re çûn. Wê li destpêkê, li rawestgeha Çîmanê ya Qitmê danî. Mistefa Kemal ji Mixtarê gundê Qitmê Eloyê Hemadê xwast, mirovekî bişîne Helebê, da ku binêre eger hîn serbazên Înglîz lê hene yan na. Gava ew mirov çû û vegerî, ji mixtêr re got, ku serbazine hindik lê hene, lê belê, daku artêşa Osmanî zû ji wir here, mixtêr jê re got, ji efser re bêje ku Heleb bi serbazên Înglîzî dagirtiye. Wê hîngê M.Kemal û dora 40 efserên xwe, di deşta Meydana re derbasbûn û berve Anadolê çûn, ra niha hîn kalemêr kiryar û gotinên M.Kemal bi bîr tînin.

2- Edhem Alcindî: Pirtûka /dîroka şoreşên Sûryê di dema destlata Firensî de, rûp12/.

Piştî têkçûna Osmaniyan, Mistefa Kemal hêzên Qîwayî Millî(Çete) ava kirin. Kesin ji Çiyayê Kurmênc jî di civîna damezrandina wê hêzê de beşdar bûn, hinek jê ev bûn: Evdoyê Xoce, Mihê Îbşaşê, Hec Henanê Şêx Sim'el, Seydê Dîkê, Ehmedê Rûtê[1]… ji xwe, piraniya pir ji endamên wê hêzê li rojhilata Anadolê Kurd bûn.



**Ji Çeteyên Çi.Kurmênc**

Hêzên Çeta li gelek deverên Entab, Kils û Çiyayê Kurmênc dest bi çalakiyên cakdar kirin. Serdarekî wê yê bi navê Seqîb, hêrişek bir ser rawestgeha Qurtqulaqê ya çîmanê ku li bakurê Efrînê ye, û pişt re ew rêber di pevçûnekê de bi Firensiyan re li ber gundê Bêlê hat kuştin.

[1]- Jêdera vê zanînê şêxê Mirûdan Îbrahîm Xelîl e, ew bi xwe jî di wê civênê de amade bû.



**Wêneya rêberên berxwedana gelêrî li Sûryê (ji erşîfa bajarê Qirixanê-Tirkiyê). Ji rastê de bere çepê: 1. Ehmedê Rûtê (Efrîn). 2. Şêx Salih El'elî. 3.? 4. Yûsif El'ezme. 5. Şêx 'Ebdo Şêx Mihemed (Efrîn). 6. Îbrahîm Henano. 7.Mistefa Şêx Husên (Erîha-IĥsIm). Qenebe çar ji van rêberan Kurd bûn.**

Piştî ku serokê çeteyên deverê "Şehîn" jî li ser riya Entabê û Kilisê hat kuştin[1], kesê bi navê Canpolat şûna wî girt, û li dawiya dawîn Firensî neçar bûn hukumeta Kilisê ya ku mêldarê wan bû biguhêrin û Ebdirehmanê Canpolêt bikin serokê wê. E.Canpolat ji neviyên malbata Canpolatî ya Mendî ya Kurd a kevin bû, wekî ku em dizanin,wê malbatê li demên berê îmareta Kilisê ya Kurd damezrandi bû.

Li meha Mijdara sala 1920an, lihevkirinek li Anqerê di navbera dewletên Hevpeyman û dewleta Tirk a nû de li ser xeta sînor li navçeya Kilisê çê bû. Tê de, sînor di navbera navçeya Firensî û dewleta Tirkiyê de li gor Xeta efserê Firensî “Ellênbî” hat kişandin.

Li gor wê levkirinê, hêzên Çete li 7ê Kanûna Yekê sala 1920an, derbas bajarê Kilisê bûn û hukmeta wê ji Firnsiyan radest birin. Pişt re, komîteke Firensî-Tirkî ya hevbeş xeta Sînorê nû li qeza Kilisê kişand. Li gor wê xetê, sêduyê (2/3) xaka navçeya Kilisê bi ser

[1]- Li şûna ku Şehîn hatiye kuştin, li kêleka rêka di navbera Kilis û Entabê de, dewleta Tirkiyê mêravek û pûtekî mezin ji Şehîn re ava kirine.

navça destlata firensî de hat, ew dever jî ev bûn: Cûm, Şikak, Şiyê, Amka, Oqce 'Ezdîn (Bilbil) û Qerece (ez bawer dikim ew devera hoza Reşî be). [Ji bo parvekirinên kargêrî yên Osmanî, li beşê pirtûkê yê diduyan veger].

Ew dabeşkirina navçeya Çiyayê Kurmênc ji hêla şîniyê wê ve cihê nerazîbûneke mezin bû. Wan Firensî ji perçekirina civak, malbat û xaka wan re eger didîtin. Loma jî, wan sê salan li dijî hêzên Firensî çek hilgirtin û gelek şer û pevçûn di navbera her du aliyan de derketin, di encamê de ziyanên mezin çê bûn û gelek can jî wind bûn. Di nav kuştiyan de, navdarên berxwedana çiyê jî hebûn, wek: Miĥê Îbşaşê, Hecî Tekbîqli, Mistefa Çolaq, Reşîdê Resûl û hin din.

Emê li vir, çend şer û pevçûnên binavûdeng ku wê hîngê li Çiyayê Kurmênc bû bûn, hewaldin:


Li destpêka hatina Firensiyan, gelek pevçûn di navbera Miĥê Îbşaşê û hevalên wî de çê bûn, ya dijwartir li kêleka bajarê Qirixanê derket. Ji bilî wê, Miĥo, Tekbîqli û Bekir Axayê gundê Senarê, ligel çakdarên xwe, hêrişek birin ser baregeha Firensiyan li Gundê Ĥemamê û ziyaneke mezin pê kirin. Dîsa, bi keda Miĥo, Tekbîqli û hin din, Firensî ji navçeyên Kilis û Entabê hatin qewtandin, û micahid Tekbîqli li wir hat kuştin, Bekir Axa kurê Hec Mistefê jî(1), ji hêla Firensiyan ve hat girtin, û li sala 1922an li girtîgeha Xan Stembûlê li Helebê jiyana xwe ji dest da.

Li sala 1919an, gernasê Kurd Ibrahîm Henano jî artêşek û destlatek li bakurê Sûryê çê kir, navenda destlata wî bajarê Rihaniyê bû. Î.Henano ligel peyayên xwe, bêtirî 27 hêrişan li navçeyên Entekê û Çiyayê Zawiyê li dijî hêzên Firensî kirin. Lê belê, li ser daxwaza Qeral Fêsel, wî hêzên xwe belav kirin, Hêrim da Firensiyan û berê xwe da Filestînê. Lê belê Înglîzan ew li wir girt û radestî Firensiyan kir.

---

[1]- Dîploma Xaknîgariyê bi Hec Mistefê re bû. Ew li dawiya serdema Osmanî rêvebirê kompaniyeke birîna daran bû li çiyayê Gewr. Pişt re ew hat li gundê xwe Senarê rûnişt. Û ji ber ku pir ji xandinê hez dikir, wî ji kîsê xwe dibistanek li gundê xwe vekir, belkî ew dibistana yekê be li Çi.Kurmênc, û şaneyê (wekîl) xwe Xocê Bilko lê kir mamoste.

Dîsa li wê demê, rêberên deverên Biya, Şêxa û Amka civînek li dar xistin û ev mirov tê de amade bûn: Seydê Dîkê, Hec Henanê Şêx Sm'el, Ehmedê Rûtê û Eslan Axa, wan biryara berxwedanê li dijî Firensiyan da, hêzeke çekdar ji çend sed çekdaran çê kirin û bi gelek hêriş rabûn. Hêrişa giringtir li Geliyê Tîra çê bû, berxwedêran xeta hêsin birîn, çîmana serbazên Firensî teqle kirin û di gêlî werkirin û gelek serbaz û efserên hêza Firensî di bûyerê de mirin û hin jî dîl ketin.



**Eslan Axa**

Li cîgehê Hesarê jî, li nêzîk gundê Bêkê, berwxedêran avsûn ji hêzeke Firensî re ku bi ser gundê Bêkê de diçû, venan, serdarê wê dîl girtin, gelek andamên wê kuştin û hemî çekên wê hêzê jî talan kirin.

Piştî van bûyeran, û gava destlata Firensî bawer kir ku nikane şêniyê Çiyayê Kurmênc bi darê zorê kedî bike, rabû pêwendiyên taybet bi hin Axeyên navçê re çê kirin, li serê wan Hec Reşîdê Şêx Sim'el (Koreşît) bû. Wî her du serhildêr, birayê xwe yê biçûk Hec Henan û Mirovê wî Seydê Dîkê qayîl kirin ku dev ji berxwedanê berdin û wî lêborîna destlata Firensî jî ji wan re anî. Lê hinek rêberên berxwedanê, wek Ehmedê Rûtê û Eslan Axa çek danenîn, lewre, li dawiya sala 1923an, Firensiyan hêzeke gewre bi ser wan de şand û ji rawestgeha Qurtqulaqê de gundê Ehmedê Rûtê gulebaran kirin û mala wî hilweşandin, arzûyên wî jî şewitandin û li dawiyê ew bi xwe jî dîl girtin û xistin zîndanê. Lê belê, ew bi alîkariya polîsekî Kurd ji zîndanê revî û çû Tirkiyê, li wir Tirkan ew bi rindî pêşwaz kir û kurkekî evferan lê kir. Wê hîngê Şêwirdarê Firensî, kesin şandin ba wî daku razî bibe û vegere Sûryê, lê E.Rûtê qayîl ne bû. Lê belê, gava ku li sala 1926an, lêboreneke tevahî ji hêla Firensiyan de derket, ew vegerî gundê xwe.

Eslan Axa jî çeka xwe danenî û ra dawiya sala 1923an li çiyayê Hawarê berxwe da. Lê belê, dema ku lêborîn ji hêla Firensiyan de derket, wî jî fersend dît û vegerî gundê xwe. Lê helwesta wî ji destlata Firensî herdem ne baş bû, û ji ber ku wî piştgiriya tevgera

Mirûdan kir, li sala 1939an biryara bidardekirina wî derket, lewre ew neçar bû bireve Tirkiyê û ra sala 1941ê li wir bimîne. Li wê salê, lêborîneke tevahî li dermafê Mirûdan derket û bi wê yekê Eslan Axa jî vegerî gundê xwe.

Û heriwiha, piştî dora sê salan ji berxwedanê, hêzên firensî li ser van mercan derbas Çiyayê Kurmênc bû[1]:

1. Lêborîneke tevahî ji hemî kesên ku li dijî Firensyan berxwe didan re derhat.

2. Ta ku şêniyê navçê hînî zimanê Erebî dibe, dê zimanê Tirkî li navçeyê bimîne zimanê fermî.

3. Li gor biryara damezrandina dewleta Helebê, nimre 33, dîroka 3/Êlûna sala 1922an[2], Qezak bi navê (Qeza Çiyayê Kurmênc) were dmezrandin û karbidestên wê ji şêniyê wê bin[3].

Di sersiya destlata Firensî de, Kor Reşît Axa bêlûkek çekdar bi navê (Milis) çê kir. Wê hêzê alîkariya Firensiyan dikir û bi karên asayîşî radibû. Endamên wê hêzê cilên Kurmancî yên filoklorî li xwe dikirin. Wan li destpêkê alek jî ji xwe re vebjartin, ew aleke zer bû û gotina (Lêxe) li ser nivîsandî bûn.

---

1- Cemîl kinê di pirtûka xwe de dibêje (rûp 4-5): Piştî ku Cineralê Firensî Goro derbas Sûryê bû, çiyayên Dirûzan û çiyayên bakur û rojavaya Helebê çek li hember Firensiyan danenîn, û bi hezaran kuştî ji tîmên Senîgalî û Vêtnamî gêr kirin.

2- Piştî ku Firensî derbas Welatê Şamê bûn, çend dewletên biçûk, di herêma ku keti bû bin destê wan de çê kirin: Şam, Heleb, ‘Elwî, Dirûz û Dewleta Libnanê ya Mezin. Rewşeke taybet jî di çarçewa dewleta Helebê de dane Senceqa Iskenderonê, li gor wê zimanê fermî Tirkî bû. Lê li sala 1925an, Heleb û Şam kirin dewletek û yên din jî wek berê man. Pişt re, ew her du dewlet û herêma Cezîrê jî xistin nav sînorên dewleta Sûryê û wek parêzgehên otonomî bi nav bûn. Li sala 1939an jî, Iskenderon dan Tirkiyê, û careke din herêma çiyayê ‘Elwiyan û Dirûzan kirin dewletine serbixwe.

3- Rêberê cendirmên qeza Çi.Kurmnêc ê yekê Emîn Çawîş ji gundê Maratê bû. Lê ji ber helwesta wî ya li dijî Firensiyan, wan pileya wî şikand û rakirin bajarê Erîhayê.

Lê digel dijîtiya şênî û hin Axayên navça Çiyayê Kurmênc ji Firensiyan re, rewşa leşkerî û asayîşî ya navçê dora panzdeh salan hêmin ma. Piştî wê, tevgera Mirûdan ya çekdar, bi rêbertiya Ibrahîm Xelîl Sowûq Oĝlo li dijî Firensiyan û hin Axeyên alîgirên wan rabû, û ew hêminî hat birîn.



**Cilên Milîsên Firensî li Çi.Kurmênc**

Li destpêka tevgera mirûdan, pevçûnên dijwar di navbera wan û mala Şêx Sim'el û mirovên wan ji mala Dîkê de derketin. Pişt re, hêzên Firensî jî ketin nav şer û herwiha rewşek nû li navçê peyda bû.

Karên Mirûdan ên çekdar li hemî deverên çiyayî belav bûn û ra sala 1939an ajotin. Wê yekê hîşt ku Firensî hêzeke serbazî ye mezin, ligel balefirên cengê bişînin navçê, hêza Mirûdan xwe li ber hêrişa wê hêzê negirt û piraniya wan ligel malbatên xwe derbas nav sînorên Tirkiyê bûn. Û bi wî rengî, dawî li berxwedana Mirûdan a çekdar hat. Piştî wê bi çend salan, lêborîneke tevahî ji wan re derket û piraniya wan vegerîn mal û gundên xwe, yên mabûn jî, gava ku Firensî ji Sûryê derktin, vegerîn.

Û herwiha ji wê rojê de, paşeroja navça Çiyayê Kurmên û şêniyê wê bi paşeroja dewleta Sûrî ya ku nû hati bû damezrand ve hat girêdan.

Lê belê, pir girîng e em bêjin, ku li sala 1936an, dema ku dîsa Firensiyan Sûrya kiri bû çend dewlet. Wan Axeyên navçeyê vexandin civînekê li gundê Meydankê, di wê civînê de nûnerê Firensî pêşniyar kir ku herêmeke Otonomî, mîna ya Iskenderonê, li Çiyayê Kurmênc jî ava bikin, ango Senceqekê li Çiyayê Kurmênc jî

çê bike, lê hinekan ji beşdarên civatê, li ser bingeha nakokiyên malbatî, û tirsa ku serokatiya senceqê radestî mala Şêx Sim'el bibe, ew pêşniyar nepejrandin û li erdê xistin. Wê hîngê, û belkî ji qerezî rêberên navçê re, Firensî rabûn mirovekî Tirk bi navê Namiq Beg kirin Qeymiqamê navça Çiyayê Kurmênc.

Dîsa, di salên sî de ji sedsala bîstan, Tirkan xwastin Qeza Çiyayê Kurmênc bi ser Iskenderonê ve xin. Wê hîngê, Serokê herêma Iskenderonê(Hetay) Teyfûr Mirsel Oĝlo (Sûkmen), kir ku serokê artêşa Tirkî li Entabê Heyder Beg, dora 20 hezar şebqeyên ku Tirkan didan serê xwe, bişîne Çiyayê Kurmênc (gundên Dêrsiwanê û Qêsim), daku şêniyê navçê wan bidin serê xwe û ji Firensiyan re xuya bibe, ku ew ji Tirkiyê hez dikin, lê belê fetweke olî li navçê belav bû û danîna wan şebqan heram kir, lewre jî ew kum hatin civandin û bi beşdariya serekên mala Şêx Sim'el, mala Dîkê û hin nûnerên destlata Firensî, hatin şewtandin.

# Serencama
# Dîroka hebûna Kurdan
# li Çiyayê Kurmênc

Li derbarê pirsa dîroka hebûna Kurdan li Çiyayê Kurmênc, deşta Cûmê û Çiyayê Lêlûn, gotin û nêrînên têvel tê kirin.

Nêrîna nofa Netewperestên Ereb li Sûryê û hin kesên wê yên di cîgehên fermî û ne fermî de ne dibêje, ku hebûna Kurdan li vê navçeyê hebûneke nû ye, û binyateke dîrokî jê re tineye. Ew nêrîn dixweze xuya bike, ku hebûna Kurdan ji encama mişextiyeke wan e, ku di dehsala sisiyan de ji sedsala bîstan hatiye, û Kurd li wan deman, ji aliyê Tirkiyê de hatin Sûryê û lê rûniştine.

Li hêla din, piraniya lêkolînvanên dema me, yên ku di mijara dîroka hebûna Kurdan de li navça Efrîn dixebitn, bawer dikin, ku dîroka hebûna wan digihê dema Sedsalên Navîn, yanê dema di navbera salên 476an û 1453an z [(1)] û serdêmên Xaçperestan û Eyûbiyan de. Hin jêder jî, hebûna Kurdan li navçeyê vedigernîn demeke pir kevin, lê dîrokê xuya nakin.

Me jî dît, dê sûdar be eger em vê mijarê di du qonaqan de vekolînin:

**Qonaqa yekê**: Nijada rûniştvanên navça Çiyayê Kurmênc ji dawiya serdema kevirî ya nû de û ra destpêka dema Îslamî. Belkî di vê dema dirêj de, Kurd bi navê xwe yê niha ne dihatin nasîn, ew bi

[1]- Serdemên Navîn, ji sala ketina bajarê Romayê di destê hozên Cêrmenî de li sala 476an z. dest pê dibin, û di sala ketina Qustentîniyê di destê Osmaniyan de li sala 1453an z. bi dawî dibin. Hin jî dibêjin ew li sala naskirina Emerîkayê, yanê li sala 1492an bi dawî dibin.

navên bapîrên xwe yên kevin dihatin nasîn, wek: Lolo, Gotî, Kaşî, Kurdox, Horî… û li dawiyê jî Medî.

Roja îro, lêkolînvan dibînin, ku taybetmendiyên zimanî û salixên nijadî yên gelên Çiyayî yên kevin û gelên Hind-Ewrupî yên ku paşê hatine Rojhilata Nêzîk, wek gelê Med, di gelê Kurd de hatine hilgirtin û ev jî rastiyeke dîrokî ye.

Em bawer dikin, ku guhertina navan li derbara navê gelê Kurd, yekser di navbera navên «Med û Kurd» de çê bûya. Yanê, ew gelê ku ra sedsalên destpêkê piştî zayînê bi navê ‘‘Med’’ dihat nasîn, pişt re bi navê ‘‘Kurd’’ hat nasîn. Bawerî heye, ku navê "Kurd" ji binyata xwe de yê gelê Kurdox e, ew gelê ku li berî zayînê li navçeyên başûrê gola Wanê, Çiyayê Cûdî û çiyayên li derdora çemê Dîcle dijî. Ew herêm jî bi navê Kurdo û Kurda dihat nasîn, /Kizênfûn, pirtûka (deh hezaran)/.

**Qonaqa diduyan**: Rûniştvanên navça Çiyayê Kurmênc li dema ku gelê Kurd bi navê xwe yê niha hatiye nasîn. Baweriya giran ew e, ku ew nav bi şêweyê xwe yê fereh li sedsalên destpêkê piştî zayînê derketiye meydanê.

## Qonaqa yekê:

### Ji dîroka kevin de û ta hatina Îslamê:

Dîrokzanên ku li ser rewşên Çiyayê Kurmênc ên civakî û nijadî ji serdemên berî zayînê û ra serdemên Îslamî yên destpêkê nivîsandine, li hev dikin ku herêmên Rojhilata Nêzîk, nemaze navça rojhilata Derya Sipî û koşa bakur rojava ji Kevana Şov, di serdemên dîrokî û berî dîrokî de, ji hêla miletên ku ji aliyê nijadî de têvel bûn, şên bûn.

### - Di serdemên berî dîrokê de:

Herêmên çiyayî ji Rojhilata Nêzîk, ango Zagros û Toros û ra çiyayên Qafqasê, ji Gelên Çiyayî re warên resen û kevnar in.

Lêkolînên dîrokî dupat dikin, ku di serdema kevirî ya nû de, navçeyên di navbera çemên Ferêt û Dîcle de, şaristaniya mirovatiyê ya destpêkê dîtine, zanyar wê şaristaniya bi «Şaristaniya Tilĥelefê» bi nav dikin. Lê pir neçû, ew şaristanî bi rengekî kevankî li seranserî herêma di navbera çemê Zapê Mezin li Kurdistana Êraqê û çemê

Ferêt de belav bû. Wê şaristaniyê hikariyeke mezin li navçeyên Helebê û Hemqê jî kir, û herwiha di ew herêma fereh de, ango di navbera çemê Zapê Mezin li çiyayê Zagrosê li rojhilat û çiyayên Amanosê li ber kenarê Derya Naverast li rojava, yekîtiyeke rewşenbîrî, şaristanî, nijadî ye diyar û balkêş hat afirandin.

Zanyar dupat dikin jî, ku li wê demê, navçeyên Amanos û Sîrosê ji hêla geline ji binyata Çiyayî û xudî salixên bakurî de hati bû şênkirin. Ew gel jî ji çiyayên Kurdistanê hati bûn, navça Sîrosê û Hemqê jî ji destpêka serdemên dîrokî de perçak nijadî, şaristanî û herêmî bû ji çiyayên Torosê û Zagrosê. Nasnameya nijadî ya **çiyayî** yên rûniştvanên wan navçan jî, ji serdema şaristaniya Tilĥelefê de naskirî bû, û ew rastiyeke bêguman jî. Yanê ew rastî ji hezarê şeşan berî zayînê de û ra destpêka hezarê sisiyan berî zayînê herdem li cih bû.

Vekolanên asta dawiya sedsala çaran berî zayînê li Alalaxê dest nîşan kirine, ku li berbanga dîrokê, komeke din ji rûniştvanan ji herêma Mezopotamya hatine navça Sîrosê. Ew jî ji nijada Çiyayî bûn. Wan rûniştvanan wargehên xwe, li kêleka Ĥelefiyên kevnar, ku şêniyê Hemqê û Cûmê bûn, û carina jî li ser şûnewarên wan ava kirine. Ev goçkirina han, berî goçkirinên miletên Samî berve başûrê Mezopotamya bi dora heşt sed salî çê bûne.

## - Li serdemên dîrokî:

Derandeyên (mikteşefat) şûnewarî yên vê serdemê dest nîşan dikin, ku têkliyên rewşenbîrî û şaristanî yên xort û berdewam di navbera navçeyên Mezopotamya jorîn û navçeyên koşa bakur rojhilat de ji Kevana Şov hebûn. Derandeyên sêyeka dawîn ji hezarê sisiyan berî zayînê diyar dikin, ku gelê Hemqê qarşiqek bû ji gelên Çiyayî yên bakurî û rojhilatî. Wan ji sala 2700î b.z. de, qeraltiyeke taybet li deşta Hemqê ava kiri bûn, navê wê qeraltiya Alalaxê bû. Ew Qeraltî dora 1500î sal ma. Li dirêjiya wê demê, şêniyê wê qeraltiyê ji nijada Çiyayî bûn û bi xwe jî destlatdar bûn. Tenê piştî sala 2300î b.z, ew demeke kin kete destê qeralê Ekadî Sergûn, ku dixwast rêka birina darên çiyayê Amanosê ji bo welatê xwe veke. Lê belgeyên şûnewarî xuya nakin ku kesine ji nijada Ekadî li Alalaxê bicih bûne, yan jî goçine ji miletine din bi wan re hatin deşt û devera Hemqê.

Piştî sala 1900î b.z, qeraltiya Yemxed (Heleb) kete destê Fer'onên Misirê û Alalax jî dan destê hakimên Yemxedê, guman heye ku ew hakim ji nijadê Samî bûn. Lê belê hemî nîşandeyên civakî û şaristanî yên ji vekolanên Alalaxê hatine der, dupat dikin ku destlatdariya qeralên Yemxedî ya ku dora 200 salî dirêj kiriye, taximên baregehên serbazî derbas ne kiriye. Ji ber ku, her du alî ji hêla nijadî û şaristanî de ji hev cida bûn. Wê lomê jî, destlatdarên Samî û şêniyê Alalaxê yê Çiyayî hîç li hev ne dikirin.

Bi tevahî, tu derandeyên şûnewarî dest nîşan nakin ku li dirêjiya 1500 salî ji temenê qeraltiya Alalaxê, nasnama Çiyayî ya gelê Alalaxê û Hemqê hatiye guhertin.

Li du sed salên dawîn ji sedsala sisiyan berî zayînê, nijadê Horî jî li navça Sîrosê hat dîtin, ew gel jî ji bapîrên Kurdan e. jêderên dîrokî dest nîşan dikin, ku ji sedsalên destpêka hezarê diduyan berî zayînê de, goçine mezin ji gelê Horî navçeyên Sêgoşa Sîrosê, Yemxed, Hemq, Cûm û Entab dane ber xwe û li wan deveran serqorî kirine, û ji wê çaxê de, ew hemî dever bûne navendeke kilasîkî ji Horiyan re, tê de bûn nijadê herî pir û hêza destlatdar jî. Vê rewşa nijadî û siyasî ra hatina Hitîtan li Rojhilata Nêzîk berdewam kiriye.

Li qonaqa sereta (merĥela yekê), yanê ji dawiya hezarê diduyan berî zayînê de, Horiyan gelek Îmaretên xwe li ser beşê bakur ji Kevana Şov ava kirin, yek jê îmareta Entabê bû. Ji bilî wê, ew bi hejmarên xwe yên mezin gihîştin navçeyên Alalax, Ugerêt û perava Derya Sipî jî, û li wan deverên fereh ziman û çanda xwe jî belav kirine.

Piştî wê qonaqê, ew îmaretên Horiyan bûne yek û impretoriya MîtaHorî ya navdar ava kirine. Serdariya Horiyan a siyasî û nijadî ra navîna sedsala panzdan berî zayînê ajotiye. Li wê çaxê, impretoriya wan bi destê dewleta Hitît a nûhatî şikestiye. Û di gel ku, destlatdariya siyasî li navçeyên Sîrosê ketiye destê Hitîtan, lê li dirêjiya destlata wan, nijad û çanda Horî li wan navçeyan serqor maye.

Belge dest nîşan dikin, ku di serdema dewleta Hitîtan de, rewşên nijadî yên kevin pir nehatine guhertin. Ji ber ku şûnewarên li Alalaxê derhatine, bi taybetî jî qermîtê Nûzî (Kerkûk) yê Horî yê

navdar, dest nîşan dikin, ku nijadê Horî ji hêla netewî û şaristanî de li navçeyên Hemq, Sîros û Yemxedê serqor bûye. Û ev rewşa siyasî û nijadî ra nîvê yekê ji sedsala sêzdan berî zayînê ajotiye. Pêwîst e em bidin nasîn, ku gelê Hitît jî ji hêla nijadî de mîna gelên Horî, Kaşî… û hwd, ji gelên Çiyayî tê jimartin.

Dîsa vekolan destnîşan dikin ku piştî wê demê, komine din ji şêniyên Çiyayî, ji Asya Biçûk hatin deşta Hemqê. Li dû wan bi çend dehsalên din, goçine mezin en din jî, ji geline Hind-Ewrupî li herêmên rojhilata Derya Sipî û Asya Biçûk belav bûne. Ew milet di dîrokê de bi navê (Gelên Deryayî) hatine nasîn. Wan miletan destlatdariya impretoriya Hitît rûxandine, û destên xwe danîn ser tevahiya navçeyên rojavaya Anadolê û rojhilata Derya Naverast jî.

Digel ku ew guhertinên rêzanî yên gewre li navça bakur rojavaya herêma Kevana Şov çê bûne, lê tu jêder nabêjin, ku Horî yan şêniyê herêmê yê resen ji ber talana gelên Deryayî, navçeyên Sîros û Hemqê berdan û jê mişext bûne.

Ji destpêka hezarê yekê berî zayînê de, sereta goçên Aramiyan hatin navça Sêgoşa Sîrosê. Wan fersenda lawazbûna rêzanî ya Horiyan û Hitîtan standin û di navbera 250 salî de, komine mezin ji wan derbas navenda welatê Horiyan bûn û îmaretine xwe li navçeyên Torosa Horiyan ava kirin, navça Sêgoşa Sîrosê jî di nava wan de bû. Û digel ku, serdariya Aramiyan a rêzanî dora du sed sal li navçeyên îmaretên xwe dirêj kir, lê hijmareke mezin ji şêniyê îmaretên Sêgoşa Sîros û Cezîrê Horî û Hitît bûn, rola wan jî di siyaset û kargêriya wan mîrîtiyan de pir mezin bû. Loma jî, qeralên Aramiyên Samî, bê erêna, hevpeyman bi neviyên Horiyan (Orarto) re danîn û bi heve re li hember Aşûrên ku ji koka xwe de Samî bûn, şer kirin.

Ji destpêka hezarê yekê berî zayînê de, gelê Horî bi navê Orarto yan Xaltî jî hat nasîn. Wî li sedsala heştan berî zayînê, qeraltiyeke mezin li navenda Kurdistanê çê kir, ew bi navê qeraltiya Orarto tê nasîn. Wê dewletê, jiserkînûve herêmên Horiyan ên berê li bakurê Sûryê, Heleb û Meletiyê vegerandin, û îmaretên Aramî li Sêgoşeya Sîrosê û Cezîrê jî xistin bin destlata xwe. Lê belê, ew û dostên xwe yên Aramî li pêş artêşa Aşûrî yên ku bi hêla bakurê Sûryê û Helebê de hatin, têkçûn, û di encamê de hêzên Orarto vegerîn baregehên

xwe li navça Wanê, û îmaretên Aramî li bakurê Sûryê jî, li nîvê diduyan ji sedsala heştan, yek li dû yekê ketin destê Aşûran.

Tiştê ku ji hêla lêkolînvanan ve baş naskirî ye ew e, digel ku dewleta Aşûrî gulvedayî bû û sînorên wê jî ferehbûn, lê şêniyê wê yên ji nijada Aşûrî, ji navçeyên xwe dernediketin. Belkî jî, ji ber ku hejmara gelê Aşûrî hindik bû, û wê lomê jî, tenê giraniya xwe dida ser hêzên xwe yên serbazî. Carina jî, û ji bo ku kani be destlatdariya xwe li ser navçe û gelên dewleta xwe xort bike, komin ji şêniyê wan miletan, ji welatên wan ên resen radikirin û li deverine dûr bicih dikirin. Ji ber wê jî, ne dûr e, ku Aşûran komine Medî ji welatê Mediyên (bêtebat), ango ji rojhilata dewletê birin rojavaya wê. Çinkî, jêderên dîrokê mêlag dikin, ku li wê demê, Med ji gelên impretoriya Aşûrî yê herî çalak û bê tebat bû.

Ji destpêka hezarê yekê berî zayînê de, ango li dema goçkirinên Aramiyan, çiyayên Kurdistanê û avrazên rojhilatî ji çiyayên Zagrosê, ji hêla geline Hind-Ewrupî ve bû bûn berê goçine mezin, wek gelên: Med, Kêmir, Skês…û hwd. Wan gelan dest pê kirin û serê dewleta Aşûrî êşandin, û li dawiyê jî, li sala 612an b.z, impretoriya Aşûrî bi destê Medan û alîgirên wan ên Babilî hat rûxandin.

Pişt re, Medan dewleteke gewre li tevahiya beşê bakur ji Rojhilata Nêzîk û Kevana Şov ava kirin. Destlata Medan nêzîkî pêncî salî ma, lê malbata Medî ya ku li ser têxt bû, bi destê mîr Gureşê Exmînî, mîrê herêma Parsê ku berê ji wîlayetên dewleta Medî bû, ji ser textê dewletê hat avêtin, û li sala 558an b.z, Exmîniyan hemî welatê Medan, Welatê Şamê û Asya Biçûk dagîr kirin û impretoriya Exmînî ya gewre damezrandin.

Di hundur van herêmên fereh de ji Rojhilata Nêzîk, ku cara yekê bû ji hêla dewleteke yek ve dihat destlatkirin, miletên ku ji nijad û çandeyên têvel bûn, kanîn bi serbestî bilivîna, ji welatên xwe yên resen dûrketana û li deverine din bi cih bibana.

Di vê dewleta Exmînî ya nû de, gelên Pars û Med jê re stûnên bingehîn bûn. Jêderên kevnar dest nîşan dikin, ku piraniya serbazên hersê dewletên Farisî (Exmînî, Aşkanî, Sasanî) Kurdên Medî bûn. Û ji hêla civakî de jî, ayîna (ola) Medan, ango "Zeredeştî", li ba hersê

dewletan, nemaze ya Exmînî, di asteke pîroz û payebilind de bû.

Jêderên dîrokî û zanyarên mîna Lêrx, Nîkîtîn û Diyagonof dest nîşan dikin jî, ku di dema dewletên Medî û Exmînî de, Medî bi her aliyekî de belav bûne. Li rojava, navenda wan a herî navdar li nêzîk Entekê bû, bi taybetî jî li derdora Helebê. Lê li tersî wan, gelê Pars, ji bilî livên xwe yên cengewerî, hîç ji bêla Êranê derneketiye. Belkî jî ji ber ku, hevparên wan ên Medî, bi hejmara xwe ya mezin, kanî bûn karûbarên destlatê li hemî aliyên dewletê pêk banîna. Lê piştî 225 salan ji destlatdariya Parsên Exmînî, li sala 330î b.z, hemî deverên dewleta wan ket destê cengawerê gewre Iskenderê Mekdonî yê Yûnanî û dewleta Exmînî ji rû ket.

Ev tevgera Yûnanî (girîkî) ya pir gewre, sînorên dewletê ji serdema Parsî bêtir fereh kirin, û herwiha beşeke mezin ji başûr rojhilata Ewrupa jî tevlê kir. Û bi wê yekê, asoyeke livê ye ferehtir li ber gelan vebû, û wan kanîn di herêmên pir fereh de ji rojavaya Asya, rojhilata Ewrupa û bakurê Afrîka, bilivîna. Bêguman, gelê Girîkî, di çûnhatina xwe de, ji hemî gelên impretoriya xwe azadtir bû. Loma jî, li destpêkê, komine Girîkî yen mezin bi serbazên xwe yên serkeftî re bi rojhilat ve hatin. Pişt re, gava hêminî dahat, goçkirina Girîkan şêweyekî sîvîl jî stand. Wê hîngê, wan gelek bajar li ser xaka Sûryê ava kirin, çinkî baregehên sivîl ji bo destlatdariyeke dirêj li ew welatên ku ji Balkanê dûr bûn, zor pêwîst û giring bû. Nemaze di serdema dewleta Girîkan a Rojhilatî de (Silûqî), ango li sedsalên diduyan û sisiyan berî zayînê.

Roja îro, kavilên bi dehan bajar, gund û avahiyên Girîkî, Romanî û Bîzentî li ser tevahiya Axa navça Sîrosê belav dibin, dîroka wan bêtirî hezar salî digire, lewre jî ew tu gumanê nahêlin, ku ev navçe ji hemî deverên dewleta Girîkî ya Rojhilatî şêntir bû. Û dest nîşan dikin jî, ku li wê demê, li navça Sîrosê, Girîk ji hêla şênî, rêzanî û çandeyî de jî di pêş hemî gelan de bû.

Lê bê guman, li wê demê û li wê navçê, Girîkî ne bi tenê bûn. Ji ber ku, hîn navine Aramî li deverên Çiyayê Lêlûn û Deşta Cûmê hene. Hin nîşanên Hitîtî jî li navên hin gundan tên dîtin. Em ji bîr nekin jî ku serdariyeke Horiyan e zor kûr û gewre, li dirêjahiya çend sedsalan li navça Sêgoşa Sîrosê hebû.

Lê tiştê herî giring û diyar ew e, ku navên piraniya gundên navçê, wargehên wê û piraniya pir ji navên Xaknîgarî jî Kurdî ne. Hinek jê navên Kurdî yên zelal in û di hin jêderên berî Îslamê û Girîkan de jî hatin gotin, wek navê Deşta Cûmê, Çiyayê Lêlûn...

Li vê derbarê, hêja ye were gotin, ku Silûqiyan jî Kurdine ji herêma Mediya, wek şervan di nav hêzên xwe de bi kar tanîn. Ev jî dest nîşan dike, ku li wê demê, nijadê Medî li Rojhilata Nêzîk pir hebû, û giraniyeke wan e mazin ji hêla hejmarê û di warê serbazî de jî hebû.

Li wan deman, ango li sedsalên sereta piştî zayînê, gelê Med ji hêla dîroknivîsan de baş naskirî bû. Li sala 444an z, Usquf Tiyodores, usqufê navça Sîrosê, li ser Mar Sem'anê Stûnî wiha nivîsiye: (( Fars, Med, Skots û Ehbaş jî wî dinasin..)). Ji vê nivîsê tê têgihîştin, ku li Rojhilata Nêzîk, gelê Med di asta giringiya gelên navçê yên din de bû, û belkî tenê li paş Parsan dihat.

Ji bilî ku, li dema di navbera derbasbûna Romanan li Sûryê û rûxandina malbata Aşkanî[1] ji ser textê Îranê li sala 224an z, diwanzdeh ceng di navbera wan de li ser xaka Kurdan rabûn. Di navbera Bîzentî û Sasaniyan de jî, bêtirî bîst û yek şerî li ser welatê Kurdan rabûne. Ev bûyerên cengawerî yên mezin, kirin ku pêlên goçkirinê yên gewere ji navenda Kurdistanê rabin û bi çar aliyan de herin, ji xwe hin ji wan berve navça Çiyayê Kurmênc a kevin jî hatine.

Digel ew hemî rastî û zanistên ku li ser jiyana kevin li navça Sîrosê hatine zanîn, lê em bawer in, ku hîn gelek rastî li derbarê mirovê herêma Çiayê Kurmênc yê kevin ne hatine naskirin, û hîn di bin dehan gir û warên kevin de veşartîne, û li bendê ne ku rojek were, ax ji ser wan were vedan û rûpelên veşartî ji dîroka vê navçeyê diyartir bibin.

---

1- Malbata Aşkanî, li sala 224an z. ji textê dewleta Parsî hat rakirin û qeral Erdeşêr damezrawê malbata Sasanî destlat wergirt. Rêzdar Emîn Zekî di /rûpel 144, perçê 1/ de dibêje: Li serdema dewletên Aşkanî û Sasanî, piraniya serbazên Êranî kurd bûn. Di pirtûka /Delîl Heleb Elsiyaĥî, rûp 225/ de jî hatiye, ku Silûqiyan şervanên Kurd ên ji herêma Medya bi kar tanîn.

## Qonaqa diduyan:

### Ji hatina Îslamê de û ta dawiya sedsala bîstan:

Me dît dê çêtir be eger em li destpêkê tiştên ku lêkolînvanên dema me li derbarê hebûna Kurdan li navça Efrînê nivîsîne hewaldin.

Di beşê sisiyan de ji pirtûka /dîroka Xebata cotariyan…rûp 158/, wiha hatiye: ((Piştî serhildana hin hozên Kurdî li sedsala şanzdehan, Kurd mişext bûn û gihîştin bakurê Sûryê, û li navça Efrînê di navbera deşta Efrînê û çiyayên Torosê de jiyaneke goçeberî dijîn. Pişt re, destlatên Osmanî ew li sedsala nozdehan li çiyayê ku niha navê wan hildigre, bi cih kirin)). Lê belê di rûpela wê jêderê ya pêncî de, dîrokeke ji wê dûrtir hatiye gotin, ew wiha dibêje: ((Gelek milet û hindikahiyên têvel li navça sînorî ya di navbera Welatê Şamê û Anadolê de rûniştine, hebûna hinekan ji wan vedigere destpêka serdema 'Ebasî, li wê demê ew navçe tijî baregehên serbazan bûn. Wan miletan fersenda lawazbûna destlata Osmanî werdigirtin û li dijî wê radibûn. Wek nimûne, Malbata Canpolat a Kurd li navça Helebê, li destpêka sedsala hevdehan)).

Profêsor Esmet Şerîf Wanlî jî, di pirtûknama xwe ya ku ji destlata Sûryê re şandi bû[1], zanînek ji raporeke taybet ku ji hêla dayîra Durustkirina Çandiniyê şaxê Helebê de hati bû amadekirin, biriye, û li ser navça Efrînê wiha dibêje: ((Kurd ji nêzîka çarsed sal de li Efrînê dijîn)).

Rêzdar Munzêr Mûsllî jî di pirtûka xwe /Ereb û Kurd, di rûpelên 471- 472an/ de dibêje: ((Kurdên Efrînê, ji kevin de li wir rûdinin *"lê ew dîrokê diyar nake"*, xaknîgariya hêrêma wan, mîna ya welatê wan ê resen e. Pêwendiyên wan bi Kurdên wîlayeta Entabê re xort in)).

Dîsa li ser wê babetê, di pirtûka /Delîlê Geştevaniya Helebê, rûpela 135an/ de wiha hatiye: ((Ji goçên giring bo Helebê li sedsala şazdehan goça Kurdan bû, ku ji Anadolê hatin)).

Dr. Şewqî Şe'es jî, di pirtûka xwe ya li ser kela Sem'anê, di rûpela 25an de dibêje: ((Di sedsalên şanzdeh û hevdehan de, Axe û hin

1- Esmet Şerîf Wanlî, pirtûknameya /pirsa Kurdî li Sûryê, Kanûna diduyan 1968an/.

Kurdên ku bi rû bûn li kela Sem'anê Rûniştin…)). Ev jî hebûna Kurdan û serdestiya wan li wê demê û li wê navçê dupat dike. Ev dîrok, li ya ku di pirtûka /Delîl Heleb../ de li ser goça Kurdan a li derdora Helebê tê.

Baba Bûlis Yetîm jî li ser wê mijarê di pirtûka xwe /Gotar…rûp 25/ de wiha dibêje: ((Kurd li Sedsalên Navîn (476-1453)z. bi ser newala çemê Efrînê de hatine. Berî wan şêniyê navçeyê Siryanî bûn)).

Cemîl Kinê jî, di rûpela dehan de ji pirtûka xwe /Zordestiyê Firensî…/, li ser dîroka hebûna Kurdan li Çiyayê Kurmênc wiha dibêje: ((Kurdên ku ev navça bi navê wan tê nasîn, ji hozên têvel in. Dîroka wan li Sûryê vediger serdema Xaçperestan…)).

Li sala 1939an, nivîskarê Firensî Piyêr Rondo jî li ser Kurdên Efrînê wiha nivîsiye:

((Destpêka gihîştina komên mezin ji Kurdan li Sûryê, berî sedsala Şanzdehan bû. Ew ji ber talanên padşahên Osmanî goçbûne û ji sedsala şanzdehan de bi şêweyekî bêveger li Çiyayê Kurmênc û deşta Lêçe bi cih bûne. Ên li despêkê hatin jî, hoza Amka bû, ew ji navça Qûnyayê hatiye. Li destpêka sedsala Hejdehan jî, hozên Şikak, Şêxan û Oqçe Ezêdîn (Biya)...hatine)).

Hênrî Lamans jî dibîne, ku komên destpêkê ji Êzdiyan li derdora sedsala Sêzdehan gihane Çiyayê Lêlûn (Sem'an).

Di pirtûka her du bira Rasil de jî, ku li navîna sedsala hejdehan li bajarê Helebê jiyane, wiha hatiye: ((Hejmareke mizin ji Kurdan li guçeyên dora Helebê rûdinin. Yek ji wan guçeyan bi wan bi nav dibe. Bi şêweyekî serekane, ew di çandinê de dixebitin, yan jî karwanên hêştiran dajon. Ji bilî wan, Kurd li Kilisê û li piraniya çiyayên Bêlangê (Amanos) û li derdora wan rûdinin û lê dibin xudî. Ew carina, bi hejmarên mezin dertên û hêriş gundên deştê dikin. Destlatdariya wan li ser navçeyên Bêlangê heye. Li wan deveran, dewlet parêziya rêkên çiyayî dispêre wan…)), /Rasil, rûp 140-150. 259/.

Bêguman, ev hemî zanînên ku me li jor anîne, hebûna Kurdan a kevin li Çiyayên Kurmênc, Lêlûn û Gewr jî dupat dikin. Lê wek em dibînin, a rastir ew e, ku hebûna wan li wan deveran hîn pir ji mêj

ve ye.

Wek delîl, di pirtûka /Subĥ Ele'şa ya Qelqeşendî 1350î-1418an z, rûpel 50/ de hatiye, wî jî ji pirtûka /Memalêk El-Ebsar a El-Miqir El-Şihabî bin Fedlilah/ biriye, û dibêje: ((Gelek netew û milet ji Ereb, Kurd û Tirkmanan li Helebê hene…)).

Ev zanîna jorîn li zanîna pirtûka Şerefnamê tê, ew jî dibêje, ku hebûna Kurdan li deşta Cûmê û li Kilisê ji serdema berî Eyûbiyan de ye, di /Şerefname perçe 1, rûpel 44/ de wiha hatiye: ((Li sala 1106an z, bi sedema nakokiyekê di navbera wan û serokê wan de, dora 400 malên Kurd ji çiyayê Simaqê *"li bakur rojavaya Helebê ye"*, bare Loristanê kirine)). Wergêrê Şerfnamê, rêzdar Mihemed Elî 'Ewnî jî, di dûvçilka wê rûpelê de li ser wê bûyerê wiha dibêje: ((Di Ferhenga Îslamî de hatiye, ku vê hozê bi serokatiya rêberê xwe Fedlewî… welatê Sûryê berdaye… û ra gihîştiye Loristanê…)). Ev zanîn ne tenê mêlag dike, lê dibire jî ku Kurd, bi kêmanî, ji Nehsed sal de li Çiyayê Kurmênc û navça Sêgoşa Sîrosê hene.

Wekî ku nas e, ji destpêka sedsala yazdehan zayînî de, welatê Kurdan ji hêla Tirkên Selcûqî ve toşî talanên kavildar dibû, Kurdistan bû bû meydana gelek şerên fereh di navbera wan û Bîzentiyan de, û paşê jî di navbera Selcûqiyan bixwe bixwe de, û di navbera wan hemiyan û Kurdan de jî. Wekî ku Kurd rûniştvanên herêmê yên resen bûn, wan jî derfetek bernedida ku tê de li dijî talankeran li berxwe ne dida, û pişt re li dijî hozên Tirkmen mîna (Berxê Reş û Berxê Sipî…), û li hember Osmaniyan jî bi xortî berevaniya welatê xwe dikirin.

Ji bilî wan, gelek dagîrkerên din jî di welatê Kurdan re derbas bûn û ew talan û wêran kirin, wek: Xaçperest, Megol, Teter, Osmanî û bilî wan jî. Û li dawiyê, gava ku Osmaniyan Rojhilata Nêzîk dagîrkirin, xêza sînorên ku di navbera wan û Sefewiyên Êranê de hat danîn, di nava welatê Kurdan re çû û ew kir du perçe, û şerên berdewam û giran di navbera wan her du dewletan de li ser axa Kurdan radibûn.

Ev dagîrkirinên li dû hev ji Kurdistanê re, û bûyerên cengawerî yên mezin ku li ser xaka wê dibûn, kavilkirinên pir gewre bi xwe re tanîn. Di encamên wan bûyeran de, mişextbûneke Kurdan a

berdewam jî, ji navçeyên buvehdar berve navçeyên hêmin li serê çiyan û zikê newalan dibû.

Wek nimûne, gava Celalidîn Xuwarizim Şah, li sala 1229an.z, bi ser welatê Kurdan de girt, çepeliyên pir mezin kirin, lewre jî, komine gewre ji Kurdan welatê xwe berdan û berve Helebê bar kirin, /M. Zekî, per 1, rûp 150/.

Li sala 1257an z, Holako bi ser welatê Kurdan de hat, Kurdan bervaniyeke gewre ji ber welatê xwe ve li hember wî kirin. Lê hinek ji wan neçar bûn cihûwarê xwe berdin, û goçeberî Welatê Şamê û Misirê bibin(1).

Li sala 1281ê z. jî, piştî serketina Memalîkan di şerê Megolan de, Qeral Zahir Bêbers komeke mezin ji Kurdan rakir Kîlîkiya û li wir bicih kir(2).

Ji sedsala hejdehan de, Osmaniyan jî siyaseteke hovane li derbarê Kurdan ajot, wan jî bi her hawakî dikirin ku Kurd welatê xwe berdin û herin li navîna Anadolê rûnin. Mebesta wan ew bû, ku ji serhildanê wan ên herdemî vehesin, û wan bi demê re bikin Tirk. Vê siyaseta Osmanî kir ku komine Kurdan en nû ji navîna Kurdistanê werin û li navçeyên rojava ji Kurdistanê, ku ji berê de Kurd lê hebûn, mîna navça Kilisê, bihêwirîn. Em bawer dikin, ku ev bîranînên teze ku li ba hin Kurdên Çiyayê Kurmênc li ser deverên ku jê hatine hene, bi vê yekê tên ravekirin.

Ji rastiyên rast jî, Kurd li dirêjiya Sedsalên Navîn bi koman û bi şêweyekî berdewam dihatin navça Kilisê. Di wan deman de rewşên siyasî, leşkerî û aborî yên dijwar bi ser welatê Kurdan de dihatin. Ji ber wê yekê û di demên şer û beleyan de, ew neçar dibûn warên xwe berdin û berve navçeyên dûr, ên ku Kurd lê hebûn, herin. Nemaze eger li wan deveran, parastineke sirûştî û civakî ji metirsiyan pêk bihata û mercên jiyanê jî lê peyda bibana.

---

1- Hebûna du hozên Kurd Ladîn û Badîn li welatê Cezaîrê jî, ji ber sedemên goçkirinê bû. [Emîn Zekî, per 1, rûp 155].

2- Kurd jî bi xortî di şerê li dijî Megolan de beşdar bûne. Siltan Bêbers, di namekê de ku ji serokê Megolan Bereke Xan re dişîne, serê xwe bi serbazê xwe yên ji Tirk, Kurd û Ereban pêk hatiye bilind dike. [Emîn Zekî, per 1, rûp 156].

Nêrîneke xort li vê derbarê heye, dibêje: Li serdemên Îsalmî yên destpêkê, navça Sîrosê toşî nîrên awarte dibû. Hin ji wan nîran bi rewşa têkçûna leşkerî ya dewleta Bîzentî ve girêdayî bûn. Wê hîngê, şêniyê wê navçê yên Girîkî û komenijadên berê, wek Xirîstiyanên Siryan, bajar û gundên xwe berdan û jê barkirin, û herwiha di sedsala dehan zayînî de navça Sîrosê ji şêniyê xwe vala bû bû. Wê hîngê Kurdan derfeta valabûna navça Sîrosê standin, û hêdî hêdî lê hêwirîn û tê de bicih bûn.

Lê belê, em jî kanin wiha bêjin, erê ew navçe li destpêka serdema Îslamî hatiye kavilkirin û piraniya şêniyê wê jî jê barkiriye, ew rastî jî înkar nabe, lê belê pirs ev e: Ma gava ku Girîk û Siryanan ji navça Çiyayê Kurmênc barkirin, navçe yekcar ji rûniştvanan vala bû, lê kesin lê man?

Em bawer dikin, ku di wê qonaqa dîrokî de, hebûna Kurdan û bapîrên wan ên nêzîk, bi taybetî jî gelê Med, li navçê ji hev neqetiya ye û berdewam bûye. Ji ber ku, gelek nîşanên diyar û xort hene mêlag dikin, ku rûniştina Kurdan li navça Sîrosê ji dema berî zayînê de û ra niha ji hev ne hatiye birîn. Delîlên ku em kanin wînin jî, ev in:

1. Kurdên deşta Cûmê, goştê masiyên ku di kaniyên gundên wê de dijîn ne dixwerin û wek gunehkarî didîtin. Ev bawerî li sedsala pêncan berî zayînê jî li navça Çiyayê Kurmênc hebû, /Pirtûka rêwîngiya deh hezaran, Kizênfûn/. Ew yek dest nîşan dike, ku Kurd ji wê demê de bi vê navçê ve girêdayî ne û jê dûr ne ketine.

2. Bêtirî %90 ji navên Xaknîgarî û navên gundên Çiyayê Kurmênc Kurdî ne, yan jî li ba Kurdan bi kar tên. Tiştekî din î pir balkêş heye, li roja me navê mirovan "Nebo" pir li ba Kurdên Şêrewa li devera Çiyayê Lêlûn bi kar tê, Nebo jî navê Xwedêyekî Mezopotamî ye û ew ra sedsalên sereta ji serdema zayînê li devera Çiyayê Lêlûn pîroz bû û dihat perestin. Ev yek dest nîşan dike, ku Kurdên Çiyayê Lêlûn ji wê hîngê de li wir rûniştine û ra demeke nêzîk jî Xwedê Nebo, ewê ku ji olbaweriyên Zerdeştî- Êzdî ve pir nêzîk bû, pîroz û gewre didîtin, û hîn jî navê wî bi kar tînin.

3. Nêrînek heye dibêje, piştî ku li dawiya sedsala dehan zayînî navça Çiyayê Kurmênc ji Girîk û Siryanan vala bûye, wê hîngê

Kurd hatine navçeyê. Lê belê, tiştê ku wê nêrînê dikulîne ew e, ku hîn navên hin gundan ên Siryanî-Aramî û Girîkî li Çiyayê Kurmênc tên bikaranîn, Li roja niha jî, beşek ji Kurdên Efrînê navê “Çiyê yan Gir” ê Aramî bi kar tînin û dibêjin «Tir», wekî di navê Gu.Tir Tewîlê de ku li bakurê bajarê Efrînê ye. Eger em hûrik li vê yekê binêrin, emê bibînin ku: Yan Kurdên Çiyayê Kurmênc ji kevin de li kêleka nijadên Girîkî û Aramî dijîn, lê man û jê barnekirin. Yan jî, ew her du nijadên din, li dawiya serdema Erebî ya Îslamî, ji ber hin sedeman ji navçê derketin, lê Kurd man û wan navên Girîkî û Aramî û hebûna xwe jî wek Kurd li navçê parastin.

4. Tiştekî din î balkêş heye; Piraniya nivîskaran, eger em nebêjin hemiyan, ewên ku li ser mijara rewşa nijadî ya navça Sîrosê li demên piştî serdemêm Îslamî nivîsîne, li hev kirine, ku ji dehsalên sereta de ji dîroka dewleta Ebbasî, ji bilî Kurdan tukes li navça Çiyayê Kurmênc tunebû. Wek mînak, eger Ereb hebana, jêder û aliyên Erebî yên fermî û netewperest, mîna pirtûka ku Yekîtiya Cotkarên Sûryê çap kiriye û nivîskarê netewperest Munzêr Mûsllî jî, dê ew yeka hîç ji bîr nekirana û dê banîna zimên. Ji bilî wê, tu belgeyên dîrokî yan şûnewarî mêlag nakin, ku Ereb yan Tirk li navça Çiyayê Kurmênc rûniştine û paşê jî bi dilê xwe, yan jî bi darê zorê ji navçê barkirine.


5. Ti şûnewarên olî yên Îslamî ji serdema Îslamî ya sereta de li navça Çiyayê Kurmênc ne tên dîtin ta dest nîşan bikin, ku li wê serdemê, Erebên Misliman li navçeyê hebûn û lê rûnişti bûn. Wekî ku hatiye zanîn, li seranserî herêma Kilisê, mizgefta yekê ku hatiye avakirin li bajarokê Ezazê bû, ew li serdema Eyûbiyan û bi destê qeral Ĝaziyê Eyûbî hatiye ava kirin.

Delîline din jî hene dest nîşan dikin, ku li sedsala dozdehên zayînî, Kurdên Zeredeştî li gundê Endarê hebûn. Û digel ku gelê Pars jî berê Zeredeştî bû, lê tiştê naskirî ew e, ku Parsî wek şênî ji Îranê derneketine, tenê ew serbaz yan dûvçilkên serdaran yan jî serdar bûn, û hîç li navçeyên rojavaya Kevana Şov bi cihûwar ne bûne.

Lê li bervajî wê, qenebe ev navçe ji dema Horiyan de, ji bapîrên Kurdan re warekî naskirî ye. Û dema ku olbawerên Zerdeştî li sedsala dozdehan li Gu.Endarê hebûn, bêguman ewê Kurd bin. Eger

ne wilo bûya, û eger ew ji hêla olî û netewî de jî ne wek hev biwana, dê çawa Kurdên Êzdî li sedsala sêzdehên zayînî, xwe ji welatê Mezopotamiya hilgirtana û bihatana li navça Çiyayê Kurmênc bi cih bibana?!. Bêguman, bav û kalên Hogir, şehîdê pîrozgeha Qere Curnê yê ji gundê Endarê yê kevin Zeredeştiyekî Kurd bû û ji neviyên gelê Med bû.

Ji hêla avahiyan de jî, hin avahî hene mêlag dikin, ku Kurdan ji sedsalan de xanî li navçê ava kirine. Xaniyek li devera Blibilê li





**Deqa li ser driyê Pîrozgeha Qerecurnê:**
**((Şehîd Hogir û hevalên wî. Ew neviyê Kahinekî Zeredeştî ji Girê 'Endarê ye. Ew Misliman bû, tê de bû sofî û xudî keramet. Wî rêbertiya komek serbazên 'Îmaddînê Zengî kir, û li sedsala 11ê zayînî, di rizgarkirina bajarê Rihayê de ji destê Xaçeperstan beşdar bû. Li dema ku ew û hinek hevalên xwe vedigerîn, toşî hêrişa hêzeke Xaçperestan bûn û li ev warê pîroz şehît ketin…))**

gundê Topelê Mehmûd heye, li sala 1032an zayînî (li gor rojnameya zayînî ya Rojhilatî) hatiye avakirin. Em jî niha di sala 1412an zayînî ya rojhilatî de ne, yanê li sala / 2002an zayînî ne. Li gor wê dîrokê, ew xanî ji 382 salan de hatiye avakirin. Ew xanî ji mûdêla qentirme ya ku li navçeyê navdar e. Cara dawîn, em li sala 1998an çûn

seredana gund, xudanê malê Xelîlê Mehmûd deriyê wê girti bû û bare bajarokê Bibilê kiri bû. Loma jî, ew xanî bê xudî ma bû û kaviliyê dest bi sivînekên wî kiri bû.

Li gundine din jî, mîna Maratê, Gundê Mezin.. Xanîn hene, li sedsala Nozdehan hatine avakirin. Li gundê Berbenê jî, xaniyek



**((Xaniyê Xelîlê Mehmûd, gundê Topelî Meĥmûd– Bibil, dîroka avakirinê ((Azar, sal 1032)) bi nivîsa Osmanî hatiye nivîsandin)).**

heye li sala 1173an goçî ava bûye. Li gundê Sêwiya jî bêtirî gorekê heye, li ser kêlka yekê ji wan dîroka 1223an g/1807an z, nikirandî ye.

Li goristana gundê Şorbe jî, kêlika gora Bîlalê Şorbe 250 salî dest nîşan dike. Li Coqê jî, li ser gora Nasir Axa kurê Ehmed Begê dîroka 1213an g/1798an z, nîgarkiriye.

## Kurd li derdora Çiyayê Kurmênc

Kurd ji sedsala dehan zayînî de bi hejmarek mezin û li ser rûbereke fereh ji Rojhilata Nêzîk belav bûne, loma jî padişahên Selcûqî, Zengî, Eyûbî, Memlûkî û li dawiyê yên Osmanî jî, ew di nav artêşên xwe de bi kar anîne. Wê yekê kiriye, ku komine mezin ji Kurdan bi ser herêmên Welatê Şamê de werin û lê bi cih bibin, nemaze li navçeyên rojavayî ji herêma Kevana Şov, ji Filestînê de bigre û hilkişe Libnanê, Şamê, Hemayê, Çiyayên perava Sûryê, deşta Ĝabê û ta bigihê Çiyayê Kurmênc- Efrînê.

Li rohilata Çiyayê Kurmênc, li navçeyên Îmareta Kilisê ya berê jî, gelek gundên Kurd li navçeyên Ezazê, Babê û Cerablusê hene, piraniya wan bi zimanê Kurdî daxivin û sinciyên xwe yên netewî jî baş parastine. Ji bilî wan, gundine Kurdan en din jî li bakurê Helebê hene, lê şêniyê wan zimanê xwe ji bîr kirine û bi Erebî yan bi Tirkî deng dikin.

Emê niha, gundên Kurdan li navçeyên derdora Helebê, yên ku hîn şêniyê wan bi Kurmancî deng dikin bijmêrin. Piraniya wan li ser riya Babê û Çoban Begê ne, **[Nexşe 8].**

### - Navça Babê:

**Ĥedesê, Qubeşîĥ, Li'man, Şidûd, Sirsimat, Şibêran, Til Betal Şerqî, Şêx Cirĥê, Birc, Bilêxê, Ki'êbê, Qe'irkelbîn, Dêrilhewa, Kefir Ziĝîr, 'Eblê, Aq Burhan, Eĥrez, Xûzê, Tiwêsê, Tiltênê, Tiltanê, Kesarê, Qibênê yan Başkoyê, Kêndirlî, Zimkî, Tirĥînê, Qola, 'Ereb Wêran, Berşaya, Eyûbiyê, Şêx 'Ilwan, Girê Cîĥanê, Xirabî Hesê.** Hin gundikên bi çûk jî hene bi ser wan gundan ve tên jimartin, ew jî di navbera gundên Şêx Cerĥê, Simêsatê û Til Çirçî de ne.

### - Navça Ezaz:

**Til 'Inib, Til Şi'îr, Cobê, Teĥnê, Nêrebiyê, Şi'lê.**

### - Navça Sifîrê:

**Til Ĥasl, Til 'Eran, Ti 'Elem, Kîbar**. Şêniyê van gundan ji hozên Bêşalti, Dîdî, Şêxî, Kêtkî û Dina ne.

Li başûrê sînorên navça Çiyayê Kurmênc jî, li navçeyên ku bi Erebî yan bi Tirkî daxivin jî, wek Deşta Hemqê, Qusêr, Hêrim, Daraz û navça Tatan li çiyayê Lêlûn, komine Kurdan en mezin hebûn, Malbata Qusêrî li navça Hemqê yek jê ye.

Li deverên Idlibê û Hêrimê jî, Mlabata Henano, Bermede û Letûf [1] hene. Li Darazê jî Malbatine Kurd hene, mîna Qertel. Hemo, Çelo…û hwd. Ji bilî wan, 17 gundên Dirûzan jî li bakurê Idlibê hene[2], û digel ku wan zimanê xwe yê Kurdî ji bîr kirine, lê ew baş dizanin û dibêjin ku ew Kurdên resen in.

Li çiyayên 'Elewiyan, Deşta Ĝabê û navîna Sûryê jî Kurd hene, Ehmed Wesfî Zekeriya di pirtûka xwe /Hozên Şamê, rûp 657/ de baş li ser wan sekiniye. Ew dibêje, ku di navbera deverên Çiyayê Kurdan, qeza Ĥefê (li rojavaya bajarê Hemê), Cisir El-Şiĝûr, Latqê û Silinfê de, dora pêncî gundên Kurdan hene, ew li salên sihî ji sedsala bîstan navçeke kargêrî bû ji sêzdeh navçeyên herêma perava Sûryê. Ji bilî wan, gelek malbatên din jî li wan navçeyan belavkirî ne. Lê li sala 1956an gelek gundên wê navçê bi ser parêzgehên Hemayê û Idlibê de çûn.

Rola Kurdên vê navçê di berxwedana netewî de pir giring bû, micahidê navdar Nûrî Mihemed El-Ĥac Mûse ji gundê Selme yek ji wan bû. Roja îro, nûnerên wan di Encumena Gelê Sûrî de jî hene, li gera perlemanî ya dawîn, nûnerên wan di encûmenê de ev bûn: Ebdil Qadêr Bazîdo, Suhêr El-Reyês ji gundê Wadî Basor, û Mihemed Dîwanî ji gundê Riya Ebdo.

Piraniya wan Kurdan ji hoza Şêxan in. Hîn bîranînên wan ên zelal li derbarê binyata wan a netewî li bîra wan in, û ta radeke bilind salixên kesayetî û çanda komelgeha Kurdî parastine[3]. Hinek ji wan xudî hestên netewî yên rastgo ne jî. Ew hemî Misliman in û li ba komelgeha derdora xwe xudî rûmet û rêz in.

Li Şamê jî, taxake mezin bi navê Taxa Kurdan heye, û ji sedsalan de bi deh hezaran Kurd lê dijîn, piraniya wan Kurdîtiya xwe

---

1- Koka vê Malbatê ji mala Hem Reş ji gundê Kaxrê ye. Ew li bajarê Hêrimê malbateke mezin e.

2- Gundên Dirûzan li parêzgeha Idlibê ev in: Mi'erit Ixwan (Qesab Paşa), Kiftîn, Kifrînê, Elbîrê, Qelb Lozê, Binêbîl, Kiko, Ĥillê, Bişindlaya, Kefermîrîs, Til Tîna, Erşîn, Kewkenaya, 'Ebrîte. Dirûz dibêjin, hejmara wan li wan gundan pêtirî deh hezaran e, û ji dema Îmareta Kilisê de li wir in.

3- Ji gotareke bi navê (Kurd li çiyayên kenara Sûryê), ya nivîskar Ebdil Ezîz Hec Mûse ji Gu.Selme hatiye birin. [Kovara Sorgul, hej 30, Adar 2002].


parastine û bi Kurmancî daxivin.

Li gundên We'ir, li navbera Hemê û Humsê jî, Kurd hene. Kurdên gundê Ekrad Dasniye li We'ra Humsê ku 17km li başûr rojhilata devera Teldo ye, ji koka xwe de li ser ola Êzdî bûn û dibêjin em ji hoza Millî ne. Li destpêka sedsala bîstan, wan ji wir barkirine û çûn li gundê Mixerrem Foqanî ku li rojhilata bajarê Humsê ye rûniştin, lê wan zimanê xwe ji bîr kiriye.

Malbata Berazî jî li Hemê, ji nêzîkî du sed sal de ji Rihayê hatine. Gundê Ekrad Îbrahîm jî, ku li bakur rojavaya bajarokê Ĥerb Nefsê ye û dora 37/km li başûr rojavaya Hemê ye, ew jî ji koka xwe de Kurdên Êzdî ne û ji nêzîkî 150î salî de ji derdora Sirocê hatine. Komeke din jî ji Kurdan heye, bi navê Ekrad Osmanlo tên nasîn, warên wan li parêzgeha Hemê, li gundên 'Eşarnê û Til Selhebê û li deverên derdora çemê Asê ne. Kurd ji zûde hatine wan deveran. Belkî waliyê Humsê Şibil Eldewle Nesir bin Mirdas li sala 1032an z. ew anî bin wir, hinek ji wan jî ji bo parastina rêka ku di navbera Humsê û Tereblusê de ye ji Xaçperestan li keloşka Husin El-Ekrad ku li navça Tilkelexê ye hatine bi cih kirin. Û pişt re, di dema dewletên Zengî û Eyûbî de, Kurd bi koman ji bo şerê Xaçperestan bi ser wan navçan de hatine, yên ji wan erka xwe bi dawî kirin vegerîn welatê xwe, hinek jî li wan welatan bi cih bûn û di nav Ereban de hatin pişaftin. Ew Kurdên ku di sedsalên dawîn de hatine wan deveran, ji destpêka sedsala bîstan de zimanê Kurdî ji bîr kirin û di nav Ereban de heliyane.

## Kurd li Libnanê:

Kurd ji sedsalên şanzdeh, hefdeh û hejdehan de li Libnanê bi cih bûne. Malên Canpolat, Îmad, 'Ebûd ji wan in, malbata El-Fedil jî li başûrê Libnanê rûdine. Mala Mir'ibî jî li bajarê 'Ekarê ye, ew berî sê sed sal ji herêma Hekariyê hatiye, û mala El-Mu'îtat jî ji Kurdên Efrînê ne, /M.Mûsillî, rûp 492/.




Nexşe-8- Gundên Kurdan li navçeyên Ezaz û Babê

# BEŞÊ DUYEM

# Çiyayê Kurmênc

## Dewletên pê ve hatî girêdan

## Û

## Dabeşkirinên Kargêrî li Navça Efrînê

# Lekolîna yekê

## Rewşên kargêrî li Çiyayê Kurmênc Di serdemên kevin û Osmanî de

### - Rewşên kargêrî li serdemên berî Osmanî:

Bi demê re, navça Çi. Kurmênc a îro bi gelek navan hatiye naskirin. Kurdan jê re gotiye Çiyayê Kurmênc, Osmaniyan jî navê Kurdaĝ lê kiriye. Û piştî ku Ci.Kurmênc kirin du perçe, Sûrî û Tirkî, Ereban jî ew nav wergerand zimanê xwe û jê re gotin ((Cebel El-Kurd)). Lê li roja îro, beşê Sûrî bi navê Navça Efrînê tê nasîn, ew jî li ser navê bajêr û çemê Efrînê ku di nava bajêr re diherike ye.

Çi.Kurmênc di serdemên têvel de ketiye bin destê çendîn dewlet û gelên ku ji hêla nijadî û şaristanî de ji hev cuda bûn. Lewre her yekî ji wan mora xwe lê daye û şûnewarên xwe li dû xwe hîştin, roja îro di riya wan tiştan re, em têkildarî û girêdana navçê bi milet û dewletên berê re nas dikin.

Wek xuya dibe, têkildariya siyasî û pêwendiyên kargêrî yên destpêkê yên ku hatine naskirin, ji serdema Yûnanî de ne.

Li serdema **Yûnanî**: Di sedsala sisiyan berî zayînê de, rêberê Yûnanî Slûqis Nîketor, bajarê Sîrosê (Nebî hûrî) di navenda herêma Çiyayê Kurmênc de ava kir. Gumana bêtir ew e, ku wê hîngê Sîros û herêma wê ji hêla kargêrî ve serbixwe bûn[1].

Di serdema **Romanî** de: Li wê demê, bakurê Sûryê ji sê herêmên kargêrî pêk dihat; Yek jê Sîrostîk bû, paytexta wê bajarê Sîrosê bû[2] û bajarê Bîriwa (Heleb) jî pê ve girêdayî bû[3]. Lê di sedsalên

1 - Ebdela Ĥeccar: Kovara Elfeysel.
2 - Sibĥî Sewaf: Dîroka Heleb, rûp – 51.
3 - Ibin El-Şuĥnê: Eldurr Elmuntexeb, rûp -30.

diduyan û sisiyan zayînî de, girîngiya bajarê Minbicê bêtir bû, bû paytexta satrapa (wîlayet) Ferêt û bajarê Sîrosê pê ve hat girêdan.

Di serdema **Bîzentî** de: Piştî sedsala çaran zayînî, herêma Sîrosê mîna perçekî ji satrapa Ferêt bû. Hîngê şarûçkên Şêx Xoros (Şêxorz), Meydank, Ezaz, Kilis, Cibrîna Ezazê, Ekidê, Niyara û Şêx Rîĥê pê ve girêdayî bûn[1].

Li serdema **îslamî**: Li vê serdemê, bajarê Qinisrînê bû navenda Kargêrî ya sereke, Sîros û deverên wê jî carina bi Qinisrînê carina jî bi Entekê ve dihatin girêdan. Lê xuya ye, ku di dema îslamî de, deverên Cûm, Şiyê û Cindirêsê bi ser navçeya 'Entekê ve bûn[2].

Li dema **Xaçperestan**: Navçeya Sîrosê bi mîritiya Rihayê ve girêdayî bû.

Di dema **Zengiyan** de: Navça Sîrosê bû meydana şer di navbera Xaçperestan û Zengiyan de, ta li dawiya sedsala dozdehên zayînî, Selahidînê Eyûbî dest danî ser û ew xist nav sînorên dewleta xwe.

Em kanin bêjin, ku di sedsalên deh, yazdeh û dozdehên zayînî de, têkildariya Sîrosê ya siyasî û kargêrî di navbera îmaratên Heleb, 'Entek û Rihayê de, yanê di navbera Misliman, Bîzentî û Xaçperestan de diçû û dihat.

Li serdema **Eyûbiyan**: Jêder xuya dikin, ku li destpêka dema Eyûbiyan, girîngiya bajarê Sîrosê kêm bû û li dawiya sedsala dozdehên zayînî ew kavil û vala jî bû bû. Li wê serdemê navçe parve çend mîritiyên biçûk bû bû û li ser mîr û serdarên artêşên Eyûbiyan hati bûn belavkirin. Çiyayê Lêlûn û perçê başûr ji deşta Cûmê û ra devera Hêrimê, keti bû destê Xalê Selaĥdînê Eyûbî.

Li derbarê sînorên navça Hêrimê ya wê demê, di pirtûka "El Durr El-Muntexeb" de wiha hatiye: ((…Li rojhilat çiyayê Lêlûn e, gelek kanî tê de derdibin û bi darûber e, ew ji bakur de li ba pira Qîbarê ya ku li ser ava Efrînê ye bi dawî dibe)).

1 - Bûlis Yetîm: Gotarin di şûnewarên Sûrî de, rûp 80.
2 - El-Durr El-Muntexeb, rûp- 206.

Beşê Çi.Kurmên yê bakur jî, bi ser Ezazê ve çû bû, ew jî wê hîngê keti bû destê Teqîyidîn Umer biraziyê Selahdîn[1].

Lê belê, li dawiya serdema Eyûbî, beşê başûr ji Çi.Kurmênc û devera Cûmê, bû bûn para mîrekî kurdan bi navê Mîr Mend. Ew Mîr li keloşka Qussêrê, ku li deşta Ĥemqê li başûr rojavaya bajarê Hêrimê ye, rûdinişt[2]. Lê ji destpêka sedsala çardehên zayînî de, piştî ku dewleta Eyûbî hat rûxandin, mîrên Mendî navenda destlatdariya xwe rakirin bajarê Kilisê ku li rojhilata Sîrosê bi dora 15 km ye. Û ji wê hîngê de, sînorên mîritiya Mendî bi bakur û rojhilat de fereh bûn, Cûm û Çi.Kurmênc jî bûn du dever jê[3]. Hêja ye em bêjin jî, ku mîritiya Mendî serbixwe bû û destlatdariya Memalîkan li ser tunebû, **(Nexşe 7).**

## - Dabeşkirinên Kargêrî li serdema Osmanî

Di serdema Osmanî de, yanê ji destpêka sedsala şanzdehan de, bajarê Kilisê bû navenda Îmareta Kilisê ya nîvserbixwe, deverên Çiyayê Kurmênc, Cûm, Ezaz û deverine din jî bi ser wê ve bûn. Destlata wê jî di destê malbata Mendî û neviyên wê yên Canpolatî de bû. Li wê demê, mizgefta Canpolêt li sala 1554 an li Kilisê hatiye avakirin, ji wê tê naskirin, ku di wan salan de, Canpolatê Kal li ser têxtê Îmaretê bû.

Dema ku li destpêka sedsala hefdehan malbata Canpolatî têkçû, Kilis bi Helebê ve hate girêdan û wek Qesebe bi nav bû. Lê piştî demeke kin, û ji ber kiryarên rêkbirîn û talanê, ewên ku bi piranî bi destê Kurdên ku li çiyayên wan derdoran rûdiniştin, dihatin kirin, Kilis bû herêmeke serbixwe (Senceq)[4], û ji hêla Derebegekî[5] ve hat birêvebirin, ew jî ji mîr û Aĝayên herêmê dihatin binavkirin. Lê ji nîvê sedsala nozdehan de, Senceqa Kilisê ji hêla Senceqdarekî,

1 - Du bihişt, El-Meqdisî (1200-1268), rup – 71.
2 - Şerefname - rûp - 230.
3 - Şerefname - rûp – 230.
4 - Herdu bira Rasil: Dîroka Helebê ya Sirûştî, rûp 218.
5 - Binavkirineke Kurdî ye, Der: cih, dever + Beg .

Waliyekî yan Muteserifekî ve dihat birêvebirin, ew jî ji hêla waliyê Helebê de dihate danîn[1].

Di parkirina Osmaniyan a dawiya sedsala nozdehan de, Kilis bû Qeza(navçe) û ev dever pê ve hatin girêdan: **Munbic, Feleh (Sem'an yan Tatliq[2]), Tirkman, Cûm, Şêxler, Amkî, Oqce 'Ezdîn (Bilbil), Şikaka, Mûsbekli.** Ew her şeş deverên dawîn, navên hozên Kurdî ne li Çiyayê Kurmênc.

Lê belê, li sala 1921ê, li dema ku sînor di navbera Sûryê û Tirkiyê de hat danîn, piraniya devera Mûsbegli û hin gundên ji devera Tirkman jî bi ser Tirkiyê ve çûn, deverên din jî li aliyê Sûryê man.

Me dît, dê bi sûd be, eger em navên dever û gundên ku berê bi ser Kilisê ve bûn, û niha jî di nav sînorên navça Efrînê de ne, wekî ku di pirtûka /Salanama Osmanî ya sala 1904an/ de hatiye binivîsin, û hejmara rûniştvanên her gundekî jî li gor serhejmara sala 1892an, ku di pirtûka /Elĝezzî, perçe 1, rûp 282/ de hatiye, li ber dînin:

1. **Devera Cûmê:**

**'Erşqîbar 166. Turindê 88. Kurzêl 98. Basût 198. Birc 133. Xezîwê 116. Şadêr 81. Îskan 108. Celemê 205. Til Silor 45. Dêwa 37. Firêre 57. Hacîler 25. Tilqiraq 19. Ĥemêlk 15. Remadiyê 28. Til Hemo 35. Keferzît 55. Tilif 35. Keferbetrê 23. 'Enderiyê 20. Keferdelê Jêrin 9, û Jorin 129. Kewrikan 115. Qerebaşlo (Feqîra) 119. Çolaqan 152. Ebû Ki'êbê 15. Xerza 65. Qoceman 49. Coqê 290. Kokan 65. Satiyan 101. Aşkan Şerqî 103. Kimûş Birc 53. Çeqelî 54. Miskê 24. Koran 70. Xaltan 91. Gordan 92. Kefirsefrê 118. Yalanqoz 69. Baflor 26. Zindîkan 55. Îkî Axor 166. Hacî Ĥesenlî û Remedanlî 136. Rûtanlî 133. Birîmce 154. Xazyanlî 127. Şêtanlî û Mîrkan û Şîrkan(Şîtka) 124. Merwanê 111. Darkîr 254. Byûk Obe 111. Tepe (Gazê) 51. Maratê 246. Xelnêr û Keferşîl 72. Bablît 51. Kokebê 29. Bilĝîte (Pitêtê) 9. Kersantaş 21. Cidêdê 26. Omer axa qişlesi 355(3). Hêkiçê 72. Aşkê şerqî 86. Nisriyê 102. Sifriyê 48. Ĥec Iskenderê 122. Cindirês**

---

1- Zanişwerên serdema Osmanî yên berî sedsala bîstan, ji pirtûka ((Dîroka Kilis a Qadrî)) hatine birin.
2 -TAT, navê miletekî Arî ye, li Kurdistanê û Qafasê dijî. Piraniya Tat çîl û çav şîn in.
3 - Gundê Omer Axa bû, niha tuneye.

**171. Midaya 87. Qurbiyê 56. Col bor 141. Şêx Sîdî Cûm 43. Betlîman 93. Dêrmişmiş 41. Bênê 178. Çetel zaretê 79. Aqîbê 92. Xaldiyê û Ereb 43.** (Hejmara rûniştvanan a tevahî 7049 kes bû).

2. **Devera Şêxan,** ji gundên hoza **Şêxan** a Kurdî pêk dihat. Ew gund jî ev in:

**Çeqilme 81. Çerxûtli 32. Kolanlî (Goliyan?) 47. Şêxbilanlî 48. Kurkê jorin 149 , Kurkê jêrin 146. Sarî ûşaĝî 109. Sate ûşaĝî 88. Si'ûlcik 84. Gomît 26. Encirli 213. Şediyanlî 232. Kela 32. Kumreşê 78. Xelîl 23. Hesen golkawî 71. Qudeko 122. 'Umerûşaxî 112. Me'milûşaxî 427. Dunbilî 205. Gundî mûskê 216. 'Etmanlî 73. Be'dinlî 421. Hopkanlî 38. Recoobesi (Reco) 113. Kûranlî 50. Hecî Xelîl 250. Mosko 62. Memalî 118. Çeqmaqlî 224. Çençelî 224. Bolli 39. Qerebaba 44. Firfirik 49. 'Eltanlî 25. Çe'nikanlî 55. Ele wêran 12. Bilêlko 12. Tepe (Gazê) 73. Kewende 94. Welîklî 46. Dodîko (dodo) 121. Sêmalklî 104. Kosanlî 93. Benderklî (penêreka) 33.** (Bi tevahî 4869 kes bû).

3. **Devera Oqce 'Ezedîn ( Bilbil),** ji gundên hoza **Biyan** pêk dihat:

**Berkaşê 157. Bilbil 289. 'Uganlî 112. 'Elîkera 107. Şingêl 50. Balobesî 96. Qurnê 104. Şerqiyanlî 130. Xidiriyanlî 157. Berben 63. Oxsûzlî 205. Mabetlî 726. Qenterê 165. Ĥecîqasmlî 159. Me'sercik 135. Erebûşaxî 186. Ĥemşlek 145. Solaqlî 328. Bêĝçe seĝîr 44. Ze'rê 74. Bêkobesî 181.**(Bi tevahî 3629 kes bû).

Deh gundên din jî hene li aliyê Tirkiyê man e.

4. **Devera Minbicê,** gundên ku niha bi ser Efrînê ve ne:

**Îkîdam 92. Dêrsiwan 99. Wêregan 103. 'Erebwêran 73.** Ev (Bi tevahî 367 kes e)..

5. **Devera 'Umkî (Amka),** ji gundên hoza **Amka** pêk tê:

**Kişk (Qestela Kîşk) 27. 'Ênhecer 39. 'Emarlî 42. Abraz 173. Tirmûşkanlî 159. Senarê 161. Anqelê 69. Şêxilĥedîd 591. Qermîtliq 375. Şêxçeqelî 157. Erendê 99. Ĥecbilal 80. Xelîlgolko 189. Çetel Qoyo (Gundî qêsim) 70. Zerkanlî 57. Kêla 65. Kurzêl (Çiyê) 90. 'Elend ('Elendara) 27. Qaşoĝlî 52. Qurtûşaxî 84. Saĝrobesî 215. Xilalûşaĝî 94. Qurîgol 141. Kotanlî 107. Bêlankoy 163. Ĥesendêrlî 99. Şorbeoglî**

**179. Biyûk Qerqîn 57. Kuçik Qerqîn 51. Tirtewîl 14.**(Bi tevahî 3687 kes bû).

6. **Devera Şikaĝî (Şkaka),** ji gundên hoza **Şikaka** pêk tê:

**Zêtûnek 54. Se'rîncek 134. Alîcî 90. Toraqlî 41. Belorsink 65. 'Elîbizanlî 137. Cemanlî 94. 'Umeranlî 72. Mîdankê 246. Nazûşaĝî 80. Dûderlî 85(1). Gumrik 207. Ĥilûbî 97. Gobelek 31. Keferom 40. Qurtqulaĝî (mezin) 189. Qere qurtqulaĝî 37. Qeretebe 43. Kefermiz 24. Meş'ele 118. Metînlî 78. Kortik 32. Şeranlî 277. Silkanlî (Senkerlî) 227. Qestel 98.** (Bi tevahî 2614 kes bû).

7. **Devera Mûsbeklî,** ji gundên wê ku bi navça Efrînê ve ne:

**Şêx Xoroz 105. Hayoĝlî 33. Şîlteĥ 17. Mersewa54.**(Bi tevahî 209 kes bû). Gundin ji vê deverê li aliyê Tirkiyê man. Ew niha bûne navçek ji wîlayeta Kilisê.

8. **Devera Feleĥ (Tata):** Ew niha bi navê navça (Sem'anê) tê nasîn. Ji gundên wê yên ku niha bi ser Efrînê ve ne:

**Qitmê 215. Me'ristê 11. Mezre'tilxetîb 20. Meryemîn 320. Enab 166. Şewarxa 65. Sêceraz 44. Başemrê 37. Zoq Kibîr 72. Bircilqaz 24. Fafirtîn 36. Şêx 'Eqîl 8. Basûfan 80. Birc Ĥêder 15. Kefernebo 12. Berad 33. Soĝanê 38. Meyasê 17.** (Bi tevahî 1213 kes bû).

9. **Devera Tirkman:**

**Yazibax 66, Dêkme daş76, Ze'relî 123.** (Bi tevahî 265 kes bû).

Gava mera bala xwe dide van parvekirinên kargêrî, mera dibîne, ku ew li ser binyata warên hozan hatine danîn. Devera Şikaka (Şera ya niha) hemî gundên Şikaka tê de ne. Devera Şêxan (Reco) hemî Şêxî ne. Oqce 'Ezdîn (Bilbil) ji hoza Biyan e…û hwd. **[Nexşe 9].**

Mîna ku ji wan parvekirinan xuya dibe, navendên bajarî ji deveran re tune bûn, gundên deverê yekser bi bajarê Kilisê ve girêdayî bûn. Lê belê, gundên serokên hozan û Axan mîna navendên deveran bûn û yekser bi Kilisê ve girêdayî bûn.

## - Binavkirina gelêrî yên deverên navça Efrînê

1 - Ev gund li rojavaya Meydankê bû, kavilên wê li ber girê Dudêrê ne.

Birê başûr ji navça Çi.Kurmênc (beşê Surî), li gor warên hozên wê hatine naskirin û binavkirin. Çar hozên sereke li wir hebûn, deverên wan jî ev in: **Şikak**, **Biya**, **Amka** û **Şêxan**.

Deverên Çi.Kurmênc ên di navbera devera Şêxan û deşta Cûmê de jî, parve du beşan bûye, **Xastiya** li bakur û **Heştiya** li başûr.

- **Xastiya**: Jê re **Çi.Xastiya** tê gotin. Bîst û sê gund li ser sertên wî çiyayî belav dibin. Ew gund ev in: **Kaxrê. Tirmûşa. Birka. 'Ereba. Me'serkê. Çomezna. Şiketka. Mîrka. Şîtka. Reca. 'Elcara. Qenterê. Remedana. Ĥecqasma. Birîmce. Xaziyanê jorin û jêrin. Şêtana. Dela. Mist'eşûra. Rûta. Baziya. Tetera.**

- **Ĥeştiya**: Bi Çiyayê **Ĥeştiya**[1] bi nav dibe. Bîst û du gund li ser sirtên wî hene. Ew gund ev in: **Çoqê. Dargirê. Gewrika. Keferdela jorin û jêrin. Aşkê şerqî. Kefirsefrê. Kora. Miskê. Satiya. Çolaqa. Çobana. Xalta. Gazê. Gundî Mezin. Xerza. Kokanê jorin û jêrin.**

Çiyayê **Lêlûn** jî parve du beşan dibe:

1. **Devera Robarî** li bakur: Hoza Robarî lê rûdine. Gundên wê ev in: **Cilbir. Kişti'ar. Basilê. Zirêgat. Bênê. Aqîbê. Dêrmişmişê. Gobelê. Xalta**.


2. **Devera Şêrewa** li başûr [2]: Şêrewa navê deverê ye, ne navê hoza ye. Gundên Şêrewa ev in: **Soĝanekê. Kîmar. Berad. Kefernebo. BircĥêDer. Basûfan. Kilotê. Gundî mezin. Keferlab. Xirabî şêx 'Eqîl. Kibêşîn. Meyasê. Xirabî şemsê**.

- **Devera Cûmê**: Cûm navekî xaknîgarî ye. Ew deşteke fereh e, di navbera çiyayên Xastiya, Heştiya, Lêlûn û deverên Amka û Şikaka de ye. Bi dehan gund li wê deştê hene. Şêniyê wê ji gelek hozan e. Û digel ku şaxê hoza Dina ji tevan mezintir bû, lê hozekê ji wan serdarî li devera Cûmê ne kiriye.

---

1 - Heştiya, navê gundekî ye li bakurê Çiyayê Cudî jî. Ew bajarekî gelê Kurdoyîn ê Kevin e. Dibe jî ku ew di hezarê sisiyan b.z. de paytexta Gelê (Gotî û Nayrî) bû. Lê tiştê ji hêla olî de naskiriye, gava ku gemiya (Nûĥ) li ser Çiyayê Cûdî rawestî, wî û heştê mirovên ku pê re bûn, ew gund ava kirine. [Dewleta dostkî, Ebdilreqîb Yûsif, rûp 17].

2- Li sala 662an goçî, mîrîtiyeke bi navê (Şêrewa) li herêmên Botan û Bêtlîsê hebû. Kurdên wan her du navçan bi dilêrî û mêraniyê dihatin nasîn, [Dewleta dostkî, 'Ebdilreqîb Yûsif, rûp37]. Ew her du sincî li ba Kurdên Çi.Şêrewa jî hene.




Nexşe -9-

**Dabeşkirina gelêrî û hozane li Çi.Kurmnênc**

# Lekolîna Duyem

## Parkirinên kargêrî li Çi.Kurmênc li demên Serdestiya Firansiyan û piştî serbixwebûna Sûryê

Li gor peymana meha Cotmeha sala 1919an ku di navbera destlata Anqerê ya nû û dewletên Hevbend de hat morkirin, xêza efserê Ferensî Allênbî wek sînor di navbera dewleta Tirkiyê û navça destlata Ferensî (Sûrye) de hat danîn. Û li gor levkirina 20-10-1921an jî di navbera Tirkiyê û destlata Ferensî de, sînor li Çi.Kurmênc jî hat danîn. Li gor wan levkirin û peymanan, bajarê Kilisê kete destê Tirkiyê, Ferensî jê kişîn û hatin li bajarokê Ezazê bicih bûn û ew ji deverên Ezaz, Lêlûn û Çi.Kurmênc re kirin navenda destlata xwe.

Piştî wê bi demeke kin, Ferensiyan bi rêberên Kurdan re lev kirin daku berxwedana xwe ya çekdarî rawestînin. Li gor wê Levkirinê, lêborîneke tevahî ji çekdaran re derket, hêminî li Çi.Kurmênc pêk hat û bi biryara jimar 33, dem 4-9-1922an, qezak/navçek bi navê ((Kurdaĝ)) hate damezrandin.

Ew navçe ji çar deveran pêk hat: Hemam, Qitmê, Reco û Bilbil[1], /Behrî Kinê - rup 4/. Wê hîngê Kurdaĝ navçek bû ji deh navçan ku Senceqa Helebê jê pêk dihat. Dewleta Heleb jî ji senceqên Heleb, Iskendron û Dêrazorê pev diket.

Ji sînorên navça Çiyayê Kurmênc ya wê hîngê û niha jî xuya dibe, ku Ferensiyan taybetiya Çi.Kurmênc a netewî baş dizanîn. Ji

1- Birêvebirê devera Bilbilê yê yekê Ebdilĝenî Ĝezal bû. Di sala 1923an de, Menan Axa Îsmaîl zade bû birêvebirê wê. Li 3-6- 1923an jî Cemîl Kinê ji Gu.Gorda bû kargêrê deverê. [pirtûka Kurtegotin li ser setemkariyên Ferensî… Behrî Kinê, rup 4-5].

ber wê jî, wan hemî gundên Kurdan li Çiyayên Kurmênc, Lêlûn û Deşta Cûmê xistine nav qeza Kurdaĝê. Pişt re, wan biryar da ku ji dêvla bajarê Ezazê, navendeke bajarî ji Qeza Çiyayê Kurmênc re ava bikin.

Ferensiyan li destpêkê, baregeha xwe li gundê Qitmê, ku li kêleka rawestgeha çîmanê ye danî. Pişt wî bi nêzîk du salan (1922an ra tebaxa 1923 an), çûn li gundê Meydankê cih girtin. Paşê jî baregeha xwe rakirin û birin li gundê Mabeta danîn û Elî Axa birayê Fayiq Axayê Şêx Sim'el jî kirin serokê şaredariya Mabeta, Namiq Beg jî kirin Qeymeqamê Qezê.

Lê belkî ji ber ku Mabeta ji rêkên deşta Cûmê dûr bû, û kendûkor û xaknîgariya cihê wî jî teng bû, wan piştî du salan Mabeta jî berda û çûn li Gu.Gewrika û paşê jî li Gu.Maratê bicih bûn. Lê wek tê gotin, wan ji sala 1923 an de biryar dabû, ku li cihê bajarê Efrînê yê niha navendeke bajarî ji qeza Çiyayê Kurmênc re ava bikin. Û herwiha wan ji wê salê de dest bi damezrandina avahiyên rêverbirya xwe ya sîvîl kiri bûn, û pişt re kirin baregeha sereke ji navça Çi.Kurmênc re.

Ev e deqa biryara binavkirina navenda navça Kurdaxê:

*((1-ji dîroka wergirtina vê biryarê de, dê navenda Qeza Kurdaxê ji Gundê Mabeta dê rabe ber pira Efrînê.2- Şalyarê Navxwe wê vê biyarê cêbecê bike. Ehmed Namî- Dîmeş li 10.11. 1926. Di bin nimre 295 de hate dîtin û ereêkirin… Bêrût li 13.11 1926an… serdarê bilnd (Bonso).*

وهذا نص القرار. ((١- ينقل مركز قضاء كرداغ من قرية المباطلي الى جسر عفرين اعتبارا من تبليغ هذا القرار. ٢- وزير الداخلية يقوم بتنفيذ احكام هذا القرار الوزير احمد نامي- دمشق في ١٠/ تشرين الثاني/١٩٢٦. شوهد وصدق عليه تحت رقم ٢٩٥.. بيروت في ١٣/ تشرين الثاني ١٩٢٦ز المفوض السامي (بونسو).

حينها بدأوا ببناء الأبنية الحكومية، وحين الانتهاء منهنا أصبحت مركزا لإدارة القضاء.


Piştî ku bingeha bajarokê Efrînê hat damezrandin û bû navenda qeza Kurdaĝê, gundê Qitmê, ku wek navenda deverekê bû, hilhat, û ew jî bi ser devera Efrîna navend xistin.

Û piştî ku li dawiya salên sihî ji sedsala bîstan sînorên nû li senceqa Iskenderonê hatin danîn, Gu.Ĥemamê jî bû du perçe, yek li aliyê Tirkiyê û yê din jî li aliyê Sûryê ma, wê hîngê navenda devera Ĥemamê jî ji Gu.Ĥemamê rakirin û anîn Gu.Cindirêsê.

Ev parkirina kargêrî ya Firensî ji qeza Çi.Kurmênc re, ra sala 1975 an ma û bi kar hat.

Li wê salê (1975an), sê deverên nû li navça Efrînê hatin çêkirin, ew jî Mabeta, Şiyê û Şera bûn. **[Nexşe 10-11-12-13-14-15-16-17].** Di vê parkirina nû de, çend gundên Şêrewa ku bi ser De.Navend-Efrînê ve bûn, ji sînorên Çi.Kurmênc hatin birîn û bi ser navça Ezazê ve xistin. Ew gund jî ev in: Meyasê, Gundî Mezin, Başemrê, Kilotê, Xirabî Şêx 'Eqîl.

Ew parkirina nû jî nêzîk ya gelêrî ya berê bû. Li gor wî jî, hemî gundên Şikêk li devera Şera man, gundên Xastiya jî çûn ser devera Mabeta, û deverên din jî mîna berê man.



Nexşe -10 - Deverên navça Efrînê

## Dîroka Bajarê Efrînê û cîgehê wê


Çavkaniyên dîrokî dest nîşan dikin, ku di serdema Romanî de, rêkeke kevirkirî ya lezok di çîgeha bajarê Efrînê re diçû. Li dema me jî, gava ku li başûrê bajêr li ber perava çemê Efrînê yê rastê, bingehên avahiyan dihatin kolan, kevirên girs ên şekirî, kûzên qermîtî yên mezin û qerqodeyên mirovan dihatin der. Mirov guman dike ku, ew destnîşana demên pir kevin dikin.

Çavkanî diyar dikin jî, ku di Sedsalên Naverast de, pireke bi navê (pira Qîbarê), li ser navê xudiyê kela Qîbarê (Elî Qîbar) li ser ava Efrînê hebû. Li serdema Osmaniyan jî, gelek xanên rêwiyan li ber cihê pirê li şûna bajarê Efrînê yê niha hebûn.

Piştî ku di sala 1922 an de, sînor di navbera Tirkiyê û Sûryê de hat danîn, bajarê Efrînê li ber pira ku berê hebû, hat avakirin, loma jî bajarê Efrînê ra demeke nêzîk bi navê (Kopriyê) bi nav dibû.

Li dema destpêkê, tenê gundê Zêdiyê yê biçûk li ser rûyê başûr ê girê Efrînê hebû. Pişt re, li sala 1923an, dest bi avakirina avahiyên fermî li binê girê Efrînê bû. Avakirina qereqol, girtîgeh û serayeke bi du tebeqan û 24 odan, li sala 1925an bidawî hatin, û avhaiya dibistana seretayî ya yekemîn jî li sala 1927an kuta bû.

Li wê demê, tenê Kolana riya Cindirêsê hat vekirin, û her du aliyên wê kirin firoşgeh. Du ûtêlên biçûk jî li Efrînê hatin avakirin. Hêjayî gotinê ye, ku pilankirina nexşeyên bajarên Qamîşlo û Siwêdayê û Efrînê, ji karê her du endezyarên Ferensî ((Mîşêl Îkoşar û Danjê)) ne.



**«Sera», avahiya fermî ya yekê li Efrînê**

Li destpêkê, Axeyên Çi.Kurmênc xanî li bajarokê Efrînê ava kirin, mîna Mala Seydê Mîmê, Robarî, serokê Êzdiyan Dewrêşê Şemo, Ehmedê Xelîl Axa, mala Şêx Sim'el û bilî wan jî. Û pişt re, ew Ermenên ku ji qirkirina Tirkan direvîn, wan  jî li dora baregehên Ferensiyan xanî ava kirin û lê rûniştin.

Gava ew avahiyên fermî bi dawî bûn, nivîsgehên: Kotikê nifûsê, diravî û îfta hatin vekirin. Û ji ber ku hemî belgename, dapiyên arzû û zeviyan û her tiştên nivîskî li bajarê Kilisê mabûn, ji nû de dest bi serhejimara şênî û tomarkirina mirovan û gelek tiştên din jî bû.

Wê hîngê, li gor lihevkirina Ferensiyan bi gernasên Çi.Kurmênc re, hemî berpirsên fermî yên diravî, kutik, şaredarî, qeymiqam, serdarên cendirman û hemî karker ji xelkê navçê bûn.

Serokê Nivîsgeha Nifûsê yê yekê li bajarê Efrînê li sala 1932an Xoce Reşîtê 'Elî Qehwe(Mihemed Reşad) ji Gu.Turindê bû, Mixtarê yekê jî mixtarê Gu.Turindê Heskê Silo bû, Miftiyê yekê jî Şêx Fadilê Tirk bû, li dû wî Ibrahîmê Ne'so ji Gu.Mîrka hat, pişt re di salên şêstî de ji sedsala bîstan, ewqaf radestî rêzdar Mihemedê Şamî bû.



دولة سورية

ETAT DE SYRIE

تذكرة النفوس

Carte d'Identité

| | |
|---|---|
| Nom et prenom | الاسم والشهرة |
| Prénom du père | اسم الاب |
| Prénom de la mère | اسم الام |
| Date et Lieu de naissance | تاريخ ومحل الولادة |
| Rite | المذهب |
| Profession | الصنعة |
| Lettré ou illettré | |
| Marié ou célibataire (enfants) | متأهل او عازب (اولاد) |
| Domicile (1) | محل الاقامة (1) |
| Sanjak | لواء |
| Caza | قضاء |
| N° du domicile | رقم المسكن |
| N° du Registre | رقم السجل |
| Date de l'Enregistrement | تاريخ القيد |

(1) pr. les villes
Indiquer le quartier, la rue et le No.

الاشكال

Signalement

| Taille | Yeux | Cheveux | Nez | Sourcils | Visage | Barbe, Moustache | Signes particuliers |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | |

**Nasnama berpirsyarê rewşên sîvîl (nifûs) ê yekê li bajarê Efrînê Reşîtê 'Elî Qeĥwe ji Gu.Turundê, ew ji sala 1932an de ye, û bi destê wî hatiye nivîsandin.**

Bajarê Efrînê demeke dirêj biçûk ma, xaniyên wê bi rengekî ciwan û lihevhatî li binê pesarê sirta Efrînê raxistî bûn. Hemî avahiyên wê bi kêvir bûn, ban jî axî bûn. Lê ji dawiya dehsala şêstî de ji sedsala bîstan, gelek rûniştvan lê hêwirîn, ew zû mezin bû û kuçeyên nû lê vebûn, ji wa kuçeyan:

- Kuça **Meĥmûdiyê:** Li bakur rojavaya bajêr e, ew li ser navê rûniştvanê wê yê destpêkê Mehmûdê Kurtancî ye.

- Kuça **Zêdiyê:** Gu.Zêdiyê yê kevin niha bûye kuçek ji bajêr, û avahiyên wê kuçeyê gihîştine serê sirta Xemrevînê û cihên ferehbûna wê nemaye.

- Kuça **Eşrefiyê**: Ew li rojhilat li ser bena Empêlkê ye. Ew ji bakur de digihê rêka Helebê û li başûr jî digihê Gu.Turindê û dora 3km dirêj dibe.

- Kuça **Qeraçê Gênco**: Li ser navê Gêncoyê Eĥmo ye, ew li başûr rojavaya kuça Eşrefiyê ye, ew niha bûye kuçeke fereh, û bi kuça Riya Turindê jî tê nasîn.

**- Gundê Turindê:** Niha bûye kuçek ji bajarê Efrînê.

- Kolana **Bobeniyan**: Kolaneke biçûk e, li bakur rojhilata bajarê kevin û li ber çemê Efrînê ye.

Cigeha Bajarê Efrînê xweşik e, kolanên wê xaçî ne, ew bi heyam û ava xwe ve bajarokekî pir ciwan e. Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî li ser Efrînê dibêje, ku ew ji ciwantirîn bajarên biçûk e li Sûryê.

Efrîn niha paytexta Çi.Kurmênc e, û navenda karên aborî, civakî û îdarî ya serek ye.

Ji destpêka dehsala dawîn de ji sedsala bîstan, çalakiyeke avedankirinê ye giring li Efrînê rabûye. Li her du aliyên riya Reco gelek avahiyên pirasteyî hatine avakirin, û gelek xanên bazirganiyê yên baş jî lê hatine vekirin, û herwiha ew kolan bûye navenda bazirganiya bajêr. Ji bilî wê, bazareke rojana û yek jî heftana li Efrînê tê girêdan, û gelek berhemên çandinê û dewêr jî lê tên firotin.


Çend karxaneyên Bêrîn û Sabûnê û gelek karxaneyên biçûk ji bo amadekirina pêdviyên avakirin û xwarinê jî lê hene. Meyxenek ji sala 1927an de jî lê heye û hîn jî kar dike. Pir karxeneyên

pêşesaziyên biçûk mîna necarî, hesinkarî û durustkirina alav û makînan lê hene, û devereke taybet jê re hatiya avakirin.


Û ji ber ku, bêtirî nîvê şêniyê navça Efrînê li Helebê bicih bûne, çûnûhatineke pir mezin di navbera Efrînê û Helebê de heye. Ew jî girêdaneke civakî, aborî û rewşenbîrî ye xort di navbera navça Çi.Kurmênc û Helebê de peyda dike.

Bajarê Efrînê navenda navçê ye, 363 gund pê ve girêdayî ne. Li gor texmîna şaredariya wê, serhejimara bajêr li dawiya sala 2001ê 80000 hezar mirov bû, lê li gor kutikê nifûsê hejmara rûniştvanên wê 43076 kes e.


Hêja ye em bêjin jî, ku bilindiya bajarê Efrîn li ber pirê 192/m in, û li ser sirta xemrevînê 392/m in.




Nexşe - 11- Efrîn, devera navend




Nexşe -12- Devera Şera




Nexşe-13- Devera Mabeta





**Nexşe-14- Devera Bilbilê**




Nexşe-15- Devera Reco




**Nexşe-16- Devera Cindirêsê**




**Nexşe-17- Devera Şiyê**

## Hejmara rûniştvanan li Navça Efrînê:

Li sala 1847an, Osmaniyan nivîsgeha nifûsê li wîlayeta Helebê vekir, û li sala 1892an serhejmara yekê çê kir. Li gor wê serhejmarê, hejmara rûniştvanên Qeza Kilisê 72 hezar kes bû, û hejmara şêniyê gundên ku bi ser navça Efrînê ve ne 23893 kes bûn. Di serhejmara 1922an de jî, hejmara şêniyê Qeza Kurdaĝê û zayenda şêniyê wê wiha bûn: Nêrza 10434, Mêza 11389 (bi tevahî 21823) kes bûn, /El Ĝezzî- cild 1- rûp258/. Lê di serhejmara 1932an de, hejmara şêniyê Qeza Çi.Kurmênc gihîşti bû 42 hezaran(1).

Bawerî heye ku ew serhejmar pir ne durust bûn, ji ber ku ji tirsa leşkeriyê û vêrgê û tiştine din re xelkê, namaze mêran xwe ne didan nasîn, û hejmara rast ne digotin.

Pişt re, li dema serbixwebûna Sûryê, çend serhejmar hatin kirin. Emê li jêr, tenê lîsteyên serhejmarên 1994an, û hejmara şêniyê Na.Efrînê li gor kotikê nifûsê ya wê salê, û hejmara kotikê nefûsê ya dawiya sala 2001ê li pêş we dînin.

| Dever | Navenda deverê | Gundên Deverê | Tevayî |
|---|---|---|---|
| Efrîn | ٢٨٦٩٨ | ٥٣٤٢٨ | ٨٢١٢٦ |
| Şera | ٦٨٧ | ١٣٠٤٨ | ١٣٧٣٥ |
| Bilbil | ٢٠٣١ | ١٣٧٥٣ | ١٥٧٨٤ |
| Reco | ١٥٣٦ | ٢١٤٢٨ | ٢٢٩٦٤ |
| Şiyê | ٢٨٤٦ | ٩١٥٣ | ١١٩٩٩ |
| Mabeta | ١٩٧٤ | ١٢٣٣٧ | ١٤٣١١ |
| Cindirês | ١٠٤١٤ | ١٩٤٩٥ | ٢٩٩٠٩ |
| Tevahî | ٤٨١٨٦ | ١٤٢٦٤٢ | ١٩٠٨٢٨ |

**«Lîste -1- Serhejmara 1994an»**

1- Ev hejmar ji Elî Ekremê Çirûsî hatiye birin. Ew li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan, nivêskarê Misteşarê Firansî bû li Çi.Kurmênc.

| Dever | Mêza | Nêrza | Tevayî |
|---|---|---|---|
| Efrîn | ٥٢١٩٩ | ٥١٦٩٩ | ١٠٣٨٩٨ |
| Şera | ٢٠٥٨٠ | ٢٠٣٨٩ | ٤٠٩٦٩ |
| Bilbil | ١٩٩١٠ | ٢٠٠٦٢ | ٣٩٩٧٢ |
| Reco | ٢٧٩٧٥ | ٢٨٤٨٨ | ٥٦٤٦٣ |
| Şiyê | ١١٨٣٠ | ١١٨٣٠ | ٢٣٧١٤ |
| Mabeta | ٢٣٩٣٣ | ٢٣٤٢٥ | ٤٧٣٥٨ |
| Cindirês | ٢١٥٤٥ | ٢١٦٤٧ | ٤٣١٩٢ |
| Tevahî | ١٧٨١٧٨ | ١٧٧٣٨٨ | ٣٥٥٥٦٦ |

**«Lîste -2- Hejmara kesên Na.Efrînê li dawiya 1994an li gor kutikê nifûsê ».**

| Dever | Mêza | Nêrza | Tevayî |
|---|---|---|---|
| Efrîn | ٦٢٠٢٤ | ٦١٧٠٧ | ١٢٣٧٣١ |
| Şera | ٢٣٩٨٩ | ٢٣٩١٤ | ٤٧٩٠٣ |
| Bilbil | ٢٣٣٢٣ | ٢٣٢٧٩ | ٤٦٦٠٢ |
| Reco | ٣٢٣٥٢ | ٣٣٠٠٩ | ٦٥٣٦١ |
| Şiyê | ١٣٧٤٨ | ١٣٧٤٥ | ٢٧٤٩٣ |
| Mabeta | ٢٨٤٥٣ | ٢٨٠٥٢ | ٥٦٥٠٥ |
| Cindirês | ٢٤٦٤٢ | ٢٥٠١٧ | ٤٩٦٥٩ |
| Tevahî | ٢٠٨٥٣١ | ٢٠٨٧٢٣ | ٤١٧٢٥٤ |

**«Lîste-3- Hejmara kutikê nifûsê li Na.Efrînê li dawiya 2001ê».**

**Mişextbûn li Na.Efrînê:**

Gava em bi hûrnêrînî li hejmarên di van xişteyên jorîn de binêrin û beramberî hev bikin, dê sê tişt diyar dibin:

**Yek:** Serhejmar ne durust in, ji ber ku wek nimûne, di serhejmara 1994an de, navên 25 gundan nehatine gotin.

**Didu:** Mişextiyeke fereh ji navçê çê bûye, pileya wê %53an derbas dike.

**Sisê:** Mişextbûn li dever û gundên dûr û çiyayî, mîna Reco, Bilbil û Mabeta bilintir e, li deverên deştî jî wek Efrîn, Cindirês û Şiyê nizimtir e, gelek sedem ji bo vê yekê hene, em kanin sedemên sereke wiha bijmêrin:

**1.** Berê, piraniya şêniyê gundên deverên Bibilê û Reco pezê reş (bizin) xudî dikirin, û komir jî dikirin. Lê ji salên pêncî de ji sedsala bîstan, kirina komirê û xudîkirina bizinan li deverên çiyayî hatin qedexekirin. Û ji ber ku li ew deverên çiyayî, çandiniyeke berhemdar ne gengaz e, gundî xizan dibin, jiyana wan teng dibe, û hejmareke mezin neçar dibin, gundên xwe berdin û bi dû pariyê nên kevin.

**2.** Sebareta Devera Mabeta (Xastiya), ew herêmeke çiyayî ye, piraniya xaka wê rez diçandin, lê li navîna sedsala bîstan nexwaşiya wêranê bi mêwan ket û piraniya zeviyan wêran bûn. Wê yekê jiyana gundiyan dijwar kir, û pirek ji wan neçar bûn li derveyî gundên xwe, û li derveyî navçê jî li jiyandina xwe bigerin.

**3.** Karûbarên xizmetguzarî li deverên çiyayî pir kêm bûn, ew jî ji barkirina gundiyan re dibû sedemeke giring.

**4.** Li deverên deştî rewş li bervajî deverên çiyayî bû. Berê, piraniya rûberên deştî ne dihatin çandin. Lê gava ku alavên cot û çandiniyê derketin, ew deşt bûn zeviyên berhemdar, rewşa gundiyan baş bû û bi gundên xwe ve hatin girêdan. Ji bilî ku karûbarên xizmetguzariyê jî li wan gundan peyda dibûn.

# Beşê Sêyem

# Cihên Şûnewarî
# Li navça Efrînê

# Lêkolîna Yekê

## Cîgehên Şûnewarî li Na.Efrînê

### Destpêk

Bi dehan, na belê bi sedan cihên şûnewarî yên giring, ji hemî serdemên dîrokî û berî dîrokê jî li navça Efrînê hatine naskirin. Wekî ku hatiye zanîn, ev navçeya xaknîgarî ya biçûk, ji serdemên herî kevin de ji mirov re cihûwar bû. Berî nêzîkî milyonek sal, mirovê pêşin Homoarktos, tê re derbas bûye, û bi rojhilat de berve Asyayê, û bi rojava de jî berve Ewrupayê çûye. Li çiyayê Lêlûn li şikefta Duderiyê, mirovê Niyandirtalî jî berî sed hezar sal jiyaye, **[nexşe 4].** Berî niha bi 40 hezar sal jî, mirovê hişmend li Çi.Kurmênc, li ber girê Endarê gundikekî çandiniyê yî herî kevin li Rojhilata Nêzîk ava kiriye.

Piştî wan demann, navça Çi.Kurmênc afrandeyên şaristaniya Til Helefê, ku li navenda Mezopotamyayê li welatê Kurdan ê Kevin hati bû afrandin, hembêz kiriye, û li ser axa navçê û li kêleka wê li deşta Hemqê gol vedaye.

Wek tê zanin jî, li serdemên dîrokî û li destpêka hezarê sisyan berî zayînê, qiraltiyeke bi navê Alalaxê li navçê hatiye avakirin, ew li serdemên dîrokî yên berî zayînê, ji dewletên herî sereta bû li Rojhilata Nêzîk, û belkî ya yekê bû li baeşê rojava û bakur rojava ji herêma Kevana Şov.

Di pêvajoya dîrokê de, gelek milet û dewletan jî destlatdarî li navça Sêgoşa Sîrosê kirine, jê: Alalax, Horî, Mîtan, Hitît, Asûr, Aram, Med, Pars, Girîk, Roman, Erebên Misliman...û hwd.

Li serdemên Îslamî yên dereng jî, li gel gelê Kurd, wekî ku ew rûniştvanê navçê yê resen bû, gel û dewletine din jî dest danîne ser navça Sêgoşa Sîrosê, wek Xaçeperst, Megol, Osmanî, ...û bilî wan.

Ev dîroka dirêj a jiyana mirov li çiya û newalên navça Çi.Kurmênc, û cîgeh û warên ku ji kevin de avakirin, kirine ku navçe ji hêla şûnewarî de bibe dewlementirîn navçe li seranserî Sûryê.

Lê belê, digel ew dîroka pir dewlemend, lêkolanên pir hindik li ser cihên şûnewarî li navçê hatine kirin, ew jî bi destê hin şandeyên biyanî çê bûne, û piraniya wan cîgehan jî, berê li ser rûyê zemînê bûn û bi xwe xwe didan nasîn.

Tiştê ku hîn cihê mixabiniyê ye, ew şûnewarên ku ax ji ser hatin vedan, bi xemsariyeke pir balkêş lê hatiye nêrîn û kes lê miqate ne bûye. Wek nimûne, ew hunera zor ciwan a pûtên girê Endarê ku ji kevirê reş hatine çêkirin, piştî ku ji bêtirî sê hezar sal de hati bûn parastin, roja îro, piraniya wan ji ber kirdeyên heyamê û civlandina mirovan, perçe berçe bûn.

Ji hêla dîrokî de jî mirov kane bêje, ku tevahiya şûnewar û cîgehên şûnewarî li navça Efrînê ji serdemên Alefiringî (Bîzentî, Romanî û Ggirîkî/Yûnanî) de ne. Dema ku artêşên Alefirngî herêma Rojhilata Nêzîk dagîr kirin, wan şêniyê xwe jî bi xwe re anîne û lê bi cihûwar kirin, lê belê Aşûr û Parsan wilo ne kirine, û destlatên wan jî li van deveran pir dirêj ne kirine.

Em baş dizanin, ku Iskenderê Mekedonî, û pişt re serkêşekî artêşa wî yê bi navê Silûqis Nîketor, bi dehan bajar li navça rojhilata Deryaya Sipî ava kirine, bajarê Sîros (Nebî Horî) jî yek ji berhemên serdema S.Nîketor bû. Lê bajarê herî navdar, ku li dema S.Nîketor hatiye avakirin bajarê Entekê ye, pişt re ew bajar bû paytexta dewleta Silûqî û paşê jî ya wîlayeta Romanî ya Rojhilatî (Sûrye û Asya Biçûk). Ji hêla hejmara rûniştvanên Entek de jî, ew bû bû bajarê sêyem di Impretoriya Romanî de, hejmara şêniyê wê gihîşti bû 600 hezar kesî, li navçeyên derdora wê jî şênî pir bû bû û jiyan pir pêş de çû bû.

Lêkolînvan mêlag dikin, ku herêma çiyayî ya kilsî ya li bakur rojavaya Sûryê, ku navça Efrînê di nava wê de ye, ji hêla şûnewarî de, giringtirîn navçe ye li Rojhilata Nêzîk, û hejmareke pir mezin û giring ji cîgehên şûnewarî lê hene. Kavilên bi sedan bajar, gund û

avahiyên ciwan lê tên dîtin, piraniya wan jî ji dawiya serdema Romanî de ne.

Lêkolînvan dibînin, ku kavilên bêtirî 700 gundî li ew herêma Kilsî hatine naskirin, piraniya avahiyên wan jî hîn ciwaniya xwe ya hunerî winda ne kirine. Ew avahî dest nîşan dikin, ku li wê demê, jînferehî û hunereke zor balkêş û hostetiyeke pir bilind di hêla endezyariya avakirinê de hebû.

Li sedsalên berê, kêşeya parastina şûnewaran û pirsa vekolanê, ji hêla dewletên ku li navçeyê destlatdar bûn tu guhdan ne didît. Lê ji dawiya serdema Osmanî de, hinek rojhilatnas û geştevan li van welatan geriyan û tiştê ku didîtin tomar dikirin û salix didan. Nivîserên wan rojhilatnasan, ji lêkolînvan û zanyarên şûnewarî yên sedsala bîstan re dibûn bingeha kar, û dilgermeyek li ba wan diafirand, daku biçin wan welatan, şûnewaran derînin û dîroka mirovantiyê û afrandeyên şêniyê Rojhilata Nêzîk ên kevnar nas bikin.

Guhdana balkêş bi şûnewaran li Sûryê li dema destlata Firensî dest pê kir. Li wê demê, hin rojhilatnas û lêkolînvanên dîroka kevin hatin Sûryê û lêkolîn kirin.

Biryara fermî ya sereta li derbarê şûnewaran li Sûryê, li serdema Firensî hate derxistin. Li gor wê biryarê, çend avahî li çiyayê Lêlûn wek cîgehên şûnewarî ku gerek bû bihatana parastin, hatin tomarkirin. Deqa wê biryarê û ew şûnewar ev bûn(1):

1- Pirtûka (Dîroka Helebê û Şûnewarên wê, rûp 178).

Avahiyên şûnewarî yên li navça Kurdaxê, li gor biryara şalyarî nimre 220, dîrok 14.4.1945an hatin tomarkirin:

| Xudan | Salix | Navê bajarok |
|---|---|---|
| **Komara Sûryê(K.S)** | **Komek cîgehên şûnewarî** | **basûfan** |
| Nesro Erebo<br>K.S<br>=<br>= | - kinîse<br>- Du Pîrozgeh<br>- Kinîseke mezin<br>- Kenîseke ketidraî | Birc Ĥêder |
| K.S<br>=<br>= | - Kinîse<br>- Gor û şûnewar<br>- Du Cewasêq | Kîmar |
| Reĥmo<br>K.S<br>=<br>= | - Kinîse<br>- Kinîse<br>- Zêrzemî<br>- Du Cewasêq | Xirabî Şemsê |
| K.S<br>K.S û mala Zeyêt<br>K.S<br>=<br>= | - Kinîse<br>- Pîrozgeh<br>- Du Me'serên zêtê<br>- Ûtêl<br>- Cewasêq | Kefer Nebo |
| K.S<br>=<br>= | - Du Kinîse<br>- Cewasêq<br>- Derine Mezin | Kilotê |
| K.S<br>= | - Kinîse<br>- Gor û şûnewar | Kela Kilotê |
| K.S | - Kinîse | Fafirtînê |

Li sala 1981ê jî, şalyariya çandê, bi biryara nimre 244, dîrok 3.10.1981ê, çend girên navçeya Efrînê wek cîgehên şûnewarî tomarkirin, lê belê, hîn gelek girên şûnewarî yên din hene, ne hatine tomarkirin.

Emê li jêr, girên ku li gor wê biryarê hatine tomarkirin, û yên giring ku ne hatine tomarkirin binvîsin:

### - Li devera Cindirêsê:

**Tomarkirî**: Girê Îska, Gi.Dupişk, Gi.Qirmiz, Gi.Silor, Gi.Cêcê- Gu.Dêrbelûtê, Gi.Hemo, Gi.Firaq- Gu.Firêriyê, Gi.Şêx Evdirihmên, Gi.Qurbê, Gi.Cindirêsê, Gi.Kaniyê- Gu.Keferdela Jorin.

**- Li devera Mabeta:**

**Tomarkirî**: Gi.Dirûmiyê- Gu.Kurkê Jorin, Gi.Bîra Xaziyanê- Gu.Xaziyana Jêrin, Gi.Berbe'ûşê- Gu.Qenterê.

**- Li devera Reco:**

**Tomarkirî**: Gi.Baliya, Gi.Kêşûr.

**Ne tomarkirî**: Gi.Qewaqa li ber Gu.Çerxûta, darên zêtûnê li ser hatine çandin.

**- Devera navend - Efrînê:**

**Tomarkirî**: Girên Gundên Bircê, Basûtê, Endarê, Turindê, Qîbar, Cûmkê, Maratê. Gi.'Endîbê- Gu.Coqê, Gi.Xelê- Gu.Tirtewîlê, Gi.Zonterî- Gu.Qurtqulaqê, Gi.Şorbe Gu.Şorbe, Gi.Mistoyê Hesen-Gu.Sêmalka, Gi.Mistoyê Hesen ê Jêrin-Gu.'Emara, Gi.Ziravkê-Gu.Ên Hecerê, Gi.Bîrê- Gu.Avrazê, Gi.Kitixê-Gu.Qopê.

**Ne tomarkirî**: Gi.'Endîbê, xaniyek li ser hatiye avakirin, yê mayî jî tê çandin.

**- Devera Şera**:

**Tomarkirî**: Girên gundên Qeredepe, Qitmê, Dêrsiwanê.

**Ne tomarkirî**: Girê Tilîlaqê li kêleka Gu.Qetlebiyê ye, Girê Dudêrê li rojavaya Gu.Meydankê ye.

**- Devera Şiyê:**

**Ne tomarkirî**: Gi.Cirnas-Gu.Merwanê Jêrin, Gi.'Elûş li başûrê Şiyê ye, tê çandin, Gi.Gu.Erendê tê çandin, Gi.Ĥsîkê-Gu.Qermîtliq.

# Lêkolîna Duyem

Emê di rûpelên werin de, li ser cigehên şûnewarî yên giring li navça Efrînê deng kin, **[nexşe 18]**. Lê emê di vê mijarê de giraniya xwe bidin ser aliyê dîrokî, ji ber ku babetên hunerî û avakirinê ne mijarên lêkolîna me ne.

## Şûnewarên Çiyayê Lêlûn[1]


Em bawer nakin ku navçek din wek Çi.Lêlûn li Sûryê hebe, ku ewqas bi şûnewarên ciwan û giring dewlemend be, birastî jî, mera kane bêje, ku Çi.Lêlûn çiyakî şûnewarî ye. Ew mîna mûzexaneke dîrokî ye li nava sirûştê. Ji mirovê Niyendirtalî de bigire, û bigihê perestgehên pûtperestî û di serdema ola Fileh re derbas be, şûnewarên wan hemî serdemên dîrok û şaristaniya mirov lê hene û hatine naskirin. Lê zor mixabin, ew şûnewar bi şêweyekî zanistî ne hatine parastin, loma jî ew roj bi roj kavil û winda dibin.

Ji hêleke din ve, piraniya ew cîgehên şûnewarî, li roja îro gund li ser yan li nav hatine avakirin, û gelek avahiyên ku hîn mane jî, ji bo pêdviyên gundiyan bi kar tên.

Piraniya wan şûnewaran li ser beşê çiyayê Lêlûn yê başûr in, ew beşa bi çiyayê Şêrewa bi nav dibe, û ji bilî Gundê Dêrsem'anê, hemî rûniştvanên gundên Şêrewa Kurd in.

---

1- Jêderan zanînên dîrokî: /Dr.Şewqî Şe'is: Kela Sem'anê. Baba Yûsif Qoşaqcî: Lehengên Xwedê. Ebdella Heccar: Kinîsa Mar Sem'an. Baba Bûlis Yetîm: Gotarin di şûnewarên Sûriyê de/.




Nexşe-18-Cîgehên şûnewarî

## Kela Sem'anê:

Kela Sem'anê li ser dawiya başûr ji beşê Şêrewa ji çiyayê Lêlûn dikeve, ew dora 20/km ji bajarê Efrînê û 40/km jî ji Helebê dûr e.

Kela li ser kuçarekî kevirî hatiye avakirin, bilindiya cihê kelê ji ser rûyê deryayê de 564/m e. Sê aliyên cîgeha wê, nemaze ji aliyê rojava de, benên zinarî û bilind in, ji aliyê bakur de jî, bi kendûkorên çiyayê Lêlûn re dûz dibin.

Kela ji aliyê rojava de li deşta Cûmê dinêre, çemê Efrînê jî mîna marekî zîvî di nava deştê re diherike, çiyayê Gewr (Amanos) jî ji aliyê rojava de aso digire.

Qidîs Sem'an, ji bo ku ji Xwedêyê xwe ve nêzîk bibe û perestvaniya wî bike, cihekî ji şênî dûr vebjart, stûnê xwe lê çêkir li ser rûnişt. Mîna ku Baba Qoşaqcî dibêje, gava ku Mar Sem'an ji ser stûnê xwe de li ew tabloya sirûştî ya zor ciwan dinihêrî, û sibehîtiya xwezayê ya zor şêrîn didît, ew matmayî dibû û bi her hilhatineke rojê û avabûneke wê re, agirê bawermendiyê di dilê wî de hêgintir dibû.

### - Dîroka avakirina Kinîsê (Kelê):

Wekî ku jêder dibêjin, kinîsa Mar Sem'an mizintir kinîse ye li cihanê. Avakerên wê, stûnê Mar Sem'an ji avahiya wê re wek motik birine û kinîse bi şêweyekî xaçkî li dora wî avakirine. Baskê kinîsê yê rojhilat, ji her sêyên din ên ku bi qaserî hev in, dirêjtir e. Rûbera kinîsê 5000/$m^2$ e. Ew di salên di navbera 476an û 490an z. de hatiye avakirin. Paşê jî ev avahî bi ser ve hatin avakirin: Dêra mezin, mala avsûnkirina zarokan, goristan, hinek mal ji bo xwendevavan û ûtêlek ji bo mêvanan, û bi wan ve, rûbera wê ya tevahî digihê 12000/$m^2$.

Li salên 528an z. û 536an z. erdhezjine xort li navçeyê bûn, û ziyaneke mezin gihandin kinîsê, belkî bana wê ya textî li wê demê keti be.

Piştî ku herêm ket destê Mislimanan, kinîsa Mar Sem'an di destê xudanên xwe yên File de ma, lê wan cizye dida mislimanan, û ta dewleta Îslamî lawaz bû, rewş wilo dimeşî.

Li navîna sedsala dehan zayînî, piştî ku Niqfûrê Bîzentî li hember Hemdaniyên Helebê bi ser ket, wî jiserkînûve dest danî ser Kinîsa Sem'anê, û bedenek ji 27 bircan jê re ava kir. Bi wê yekê, kinîse û avahiyên wê li ew navça ku bû bû sînor û bereya ceng û pevçûnan, bû cîgeheke arêtşî û ji wan rojan de bi navê Kela Sem'anê hat nasîn.

Bi tevahî, Kela Sem'anê di van rewşên siyasî re derbas bûye:

Li sala 983an z, li dema destlala Se'didewlê El-Hemdanî, û gava ku artêşa Bîzentî ji Helebê vedigerî, di kelê re derbas bû, ew vekir, û dêra wê ya gewre wêran kir, [El Yewaqît weldureb, rûp 136]. Lê li sala 985an z, dîsa Se'didewle kurê Sêfiddewle, ew dagîr kir, nasikên wê kuştin û hinek jî wek kole firotin, [E.Heccar, Rûp 4].

Li sala 1017an z, Fatimiyan dest danî ser kelê. Û ji sedsalên yanzdeh û donzdehan û bi şûn de, kela di navbera hêzên ku li herêmên Helebê û Entekê dibûn destlatdar, dibû devereke şer û pevçûnan, wek: Bîzentî, Xaçperest, Zengî, Eyûbî, Memalîk û pişt re jî Osmanî. Lê bi demê giringiya serbazî ya kelê pir kêm bû.

Pişt re, li sedsala Şazdehan, Kurdekî bi rû li kelê rûnişt, û avahiyeke ji du tebeqan bi ser beşê kinîsê yê rojhilat de zêde kir, [Dr.Ş.Şe'is, rûp 25]. Rewşa kelê wilo ma, ta ew li navîna sedsala bîstan ji hêla dewletê ve hat valakirin, û wek şûnewarekî dîrokî yî zor giring hat nirxandin û parastin.

Roja îro, salê bi hezaran geştevanî ji hemî deverên cîhanê tên seredana kela Sem'anê, û ew wek şûnewarekî pir hêja tê zanîn.

## Gundê Dêr Sem'anê (Têlenîsos):

Piştî mirina Mar Sem'anê Stûnî, navçe bi saya wî, navdartir bû û meqameke olî yî payebilind stand. Ji ber wê yekê, Gu.Dêr Sem'anê bû bajarekî nasikan û sê dêr lê hatin avakirin, her dêrek jî ji kinîsekê û ji tiştên ku pê ve girêdayî bûn pêk dihat. Û ji bo bixêrhatina Hecî û mêvanên payebilind, ku ra sedsala yazdehên zayînî dihatin ber kinîseya Mar Sem'an, çend ûtêl jî hatin avakirin.

Di serdema Bîzentî de, Gu.Tîlenîsosê dibû navendeke naskirî ji bo zanîna ola Fileh, û ji şêniyê Entekê re jî wek havîngehekê bû. Kesên ku ne dixwestin vêrgê bidin, yan ji ber xizmeta serbaziyê direvîn, bê tirs dihatin li wir diman û dikatin bin parastina olî.

Herwiha, ew gund pir geş bû, nemaze li sedsala pêncan û destpêka ya şeşan zayînî, bi taybetî jî, ji ber ku ew li ser riya bajarên Efamiya û Sîrosê bû.

Di serdemên Îslamî de, û ji ber hoyên siyasî yên ku li herêmê peyda bû bûn, Têlenîsos û hemî navçe berdayî man. Pişt re Erdhejên giran jî li navçeyê çê bûn û gelek avahiyên Têlenîsosê hatin hilweşandin. Avahiya ku ra niha hinekî li ser xwe maye, dêreke biçûk e li başûrê gund, ew jî li ser xatirê Mar Sem'an li sala 550î z, hatiye avakirin.

Bajarê Tîlenîsos, dora 500m li rojavaya kela Sem'anê bû, bûyerên ku kelê dîtine Dêr Sem'an jî tê re derbas bûye, û ew jî di sedsalên 11 û 12an z. de valabûye û bê xudî maye.

Roja îro, Gu.Dêrsem'anê gundekî biçûk e, xaniyên xwe yên ji çîmento di nav şikavlên bajarê dîrokî de hatine avakirin. Ew her du cure ji avahiyan, nakokiyeke pir beloq di navbera kevnariya Tîlenîsosê ya bi binyat û dewlemend û Dêrsem'ana niha ya xizan de, bi şêwekî balkêş diyar dikin.

### Şûnewarên Beradê:

Berad ji gundên çiyayê Lêlûn ên mezin e, ew 25/km li başûr rojhilata bajarê Efrînê ye.

Berad wargehekî kevin ne. Guman heye, ku ew ji sedsalên diduyan û sisiyan zayînî de şên bûye. Ji şûnewarên wê yên giring, perestgehek, gorine kevirî yên bi devik û serşokek jî lê hene. Çend firoşgeh jî ji salên 202-203an z. de û guvaşxaneyên zêtê yên kevin jî li nava gund hene, ew hemî jî ji serdema Romanî de ne.

Belgeyên dîrokî destnîşan dikin, ku di sedsala çaran zayînî de, Beradê gundekî pir li pêş û şên bû. Tawdora, Babayê Sîrosê li ser Berada wan deman dibêje, ku ew mezintirîn bajarê Çi.Lêlûn e, û navenda kargêrî ya navça Çi.Sem'anê ye, û ji hêla rûberî de jî mezintirîn gundên bakurê Sûryê ye.

Gelek avahiyên ciwan li Berada kevin hebûn. Xaniyên xwe ji hev dûr bûn. Kevirên wan ên ta niha mane rind şenekirî ne, piraniya wan ji serdema Romanî û ji sedsalên didu û sisiyên zayînî de ne.

Kinîsa Endezyar Yolyanos jî, di navbera salên 399an û 402an z. de hatiye ava kirin, xuya ye ku ew jî mîna gelek avahiyên olî li Çi.Lêlûn, li ser perestgeheke pûtperestî ye kevin hatiye avakirin. Ji aliyê mazinbûnê de jî, kinîsa Yolyanos di rada sisiyan de ye piştî kinîseyên Sem'an û Kirentîne ya li rojhilata bajarê Mi'erit Nu'man.

Bawerî heye, ku damezrawê rêola Maronî, Mar Maron (347-410)an z, di wê kinîsê de hatiye veşartin, çinkî koşeke taybet bi ser de hatiya avakirin, guman heye, ku ew ji bo veşartina wî hati bû avakirin, hîn jî goreke kevirî li wir heye, baweriyeke xort heye ku ew gora Mar Maron bi xwe be.

Di sedsalên pêncan û şeşan zayînî de, kuçeyên gund ên rojava hatin avakirin. Du kinîse li wir jî hene, yek ji sala 541an z. de ye, ya din jî biçûktir e û wek perestgehekê ye, ew jî ji sedsala heftan zayînî de ye.

Wargehên fermî jî li beşê bakur rojavaya gund in, ew li sala 496an z. hatine avakirin. Li hêla başûr rojava, li dûriya dora 500m, nasiktiyek (rihbaniyek) jî li sedsala şeşan zayînî hatiye avakirin, roja îro ew bi Serayê bi nav dibe. Du dêrên wê nasiktiyê, bircek û stûnekî perestvaniyê jî hebûn, dirêjiya stûn 8/m bûn, hinek ji perçeyên wî ra niha hene.

Li sedsala heftan zayînî, Berad fereh bû bû, şêniyê wê pir bû bû, rêkên nava gund baş û fereh bû bûn, û ew bû bû navendeke pêşesaziyê û çandiniyê ye navdar û tene, zêtûn û rez lê dihat çandin. Di ber wê re, pêşesaziyên mîna derhanîna zêtê û berhemên tirî jî li pêş bûn.

Di sedsala dehan zayînî de, Berad bû navendeke leşkerî ya Bîzentî, avahiyên wê jî bûn baregehên serbazî û artêş tê de dihat bicihkirin.

Roja îro, Berad gundekî mezin e, xaniyên wê di nav şikavlên şûnewarî yên fereh û pir hêja de hatine avakirin. Xaka derdora wê zinarî ye. Şêniyê wê hemî Kurd in û di perîşaniyê de dijîn.

Li çarê meha gulana 2002an, cara yekê bû ku pêgirên rêola Maronî, mehrecaneke mezin bi yadeya bîranîna Mar Maron li Beradê li dar xistin û soz dan, ku dê her sal li ber gora wî were lidarxistin.

## Kefer Nebo

Navê gund ji Xwedêyê Mezopotamî-Aşûrî Nebo hatiye. Li serdema Romanî, yanê li sedsalên yekê û diduyan zayînî, pûtgehekî mezin ji Xwedê Nebo re li wir hebû û dihat perestkirin. Lê bi saya Mar Maron, şêniyê çiyayê Nebo perestiya Xwedê Nebo berdan, bûn Fileh, pûtgeh jî hilweşandin û li sala 398an z. bi kevirên wê kinîsa Kefer Nebo, ku kevintirîn kinîse ye, ava kirin.

Pişt re, Filehan li sala 525an z. kinîsek, bircek, dêrek ji bo nasikan û ûtêlek mezin jî ji bo ĥecî û mêvanan ava kirin. Kaviline xaniyên ji sedsala pêncan zayînî de li gund hene. Guvaşgeheke zêtê ji sala 224an z. de jî lê heye. Ji bilî wan, du pûtên jin û mêrekî li kêleka kinîsê hene, gundî dibêjin, komîteke şûnewarî ye fermî ew pût ji bîra ku li kêleka kinîseyê ye derxistine, lê mixabin ew her du pût bê serî ne.

Yaqût El-Ĥemwî, li derebarî giringiya Kefer Nebo wiha dibêje: ((Tewrat çêrê wê bûye, Nebo jî navê pûtekî bû li wir. Qubeke mezin lê heye, dibêjin ew quba Pût Nebo ye)).

Kefer Nebo sê kîlomitran li bakur rojhilata gundê Beradê ye. Ew gundekî biçûk e, çend malên Kurd lê dijîn. Pîrozgeha Şêx Qesab li kêleka wê ye. Li sala 1907an, keşe Hênry Lamans riya xwe bi Kefer Nebo xisti bû, wî gotiye ku daristaneke Sindîgan û Tîbê ye zor ciwan li dora gund heye. Lê mixabin li roja me darek jî jê nema ye.

## Kîmar

Di navbera Gundê Kîmarê û Basûtê de dora 2/km navberî heye. Berê, nemaze li serdemên Romanî û Bîzentî, Kîmar ji şêniyê Basûtê re wek havîngehekê bû. Gelek sera û malên şûnewarî li Kîmarê hene û ra niha dergehên wan lipê ne. Sê kinîse jî li Kîmarê hene:

**Yekem**: Ji sedsala pêncan zayînî de ye, lê ji bilî Menbera wê (pêma), û pêplûkên xwînrêjê tiştek jê nemaye.

**Diwem**: Li başûr rojhilata gund e. Ew li sala 573an z. hatiye avakirin. Ji bilî quba ku li ser xwînrêjê û çend pêplûkan tişt jê nemaye. Li ser quba wê neqşên du Têrtawûsan li hember hev hatine nîgarkirin.

**Sêyem**: Perçak ji avahiyên nasikxanê jî ye, ew li derveyî gund li aliyê başûr e, ew ji van tiştan pêk tê: Kinîse li sedsala şeşan zayînî ava bûye, stûnê perestvaniyê jî 13 mitran ji kinîsê dûr e, dirêjiya wî 16/m in, û perçên wî hîn ji roja ku ketine de li cihê xwe ne. Dêr jî, 50/m li bakur rojavaya stûn ye, lê tenê odak jê xuya dibe, yên din jî tev goristanê, di bin axê de mane. Birceke perestgehî jî li nava gund heye. Şêniyê gund hîn se'rîncên avê yên wan serdeman bi kar tînin.

Kîmara niha, gundekî mezin e, xaniyên wê yên biçûk di nava şûnewarên kevin û zor hêja de rabûne. Lê mixabin, piraniya wan şûnewaran bi demê re, û bi destêdana mirovan kavil bûne.

## Soxanekê

Ev gunda li bakur rojhilata Gu.Kîmarê bi 2km dikeve. Du kinîse lê hene, yek li başûr e, ew hilweşî ye, ya din jî li ba kur e, avahiya wê hinekî sax e. Li rojavaya gund bi dora 2/km jî, avahiyeke şûnewarî ye din heye, jê re "sera" dibêjin, ew bircek e, şûnemayên kinîse û dêrekê, ligel sehrînceke avê lê hene, guvaşgeheke zêtê, goristanek û du serînc jî li kêlekê ne. Soxaneka îro gundekî Kurdan î biçûk e.

## Birckê Terpê/Bircilqazê

Gundekî Şêrewa yî biçûk e, bircek û kinîsek ji sala 393an z. de lê hene. Li ser hin necefeyên xaniyan dîroka salên 313 û 494an z. nikirandî ye.

## Dêrmişmiş

Li ser çiyayê Lêlûn li rojavaya Gu.Basilê bi dora 3/km ye. Ji şûnewarên wê yên ku ra niha mane, ev in:

Zêrzemîneke veşartina miriyan ji serdema Romanî û ji sedsala sisiyan zayînî, birceke nasiktiyê, du kinîse ji sedsala şeşan zayînî de, vêleke Bîzentî, sehrînc û guvaşgehên di tehtê de kolandî hene. Ew gundekî şûnewarî yî mezin e, hîn bi dehan dergehên malên kevin lipê ne. Niha hin malên Kurd yên xudî pez ji Gu.Kurzêlê lê rûdinin. Ew şûnewarine ciwan û zor giring in, pêwîst e her merovekî ku guh dide şênewaran seredana Dêrmişmişê bike.

## Gubelê

Li bakur rojavaya Gu.Basilê bi 2/km ye. Şûnewarên wê di dema şûnewarên Dêrmişmişê re ne. Kinîsek ji sedsala çaran û destpêka ya pêncan zayînî de lê heye, hîn dîwarên wê lipê ne.

## Gundî Mezin-Şêrewa:

Xaniyên vî gundî di nav kavilên şûnewaran de hatine avakirin. Kavilên dîwarên kinîsekê, stûn, gor û bîrên di tehtê de kolandî ji serdemên Romanî û Bîzentî de li gund tên naskirin.

## Xirabî Şemsê

Xerabî Şemsê dora kîlomitrekê li rojavaya Gundî Mezin e. ew berê gundekî biçûk bû, lê şêniyê wê barkirine Gundî Mezin. Ji navê gund diyar dibe, ku ew ji serdemên pûtperestiyê de maye. Li ser necefa avahiyekê, wêneyên Ga û toka Royê hatine nikirandin. Ev gunda di serdema Filehî û di navbera sedsalên çar û şeşan zayînî de, pir şên bû. Du kinîse li Xirabî Şemsê hene:

**Yek**: Ji sedsal çaran zayînî de ye, ew ji kevintirîn û giringtirîn kinîse ye li navçê, ku hîn avahiya xwe li ser hev e.

**Didu**: Ji sedsala şeşan zayînî de ye.

Li ser kevirên dergeha perestgehekê jî Tabloyek heye, neqşên Royê û Hêvê û serê ga û guloverekê pêk tê. Li ser her du stûnên dergehê jî, wêneyên du mirovan bi şêweyekî suryalî hatine neqşandin. Wek jêder dibêjin, ew dergeha perestgeheke putperestî ji sedsala sisiyan zayînî de ye.

## Kilotê

Gundekî biçûk e, sê kîlomitran li bakurê Gundê Mezin e. Şûnewarên du kinîsan lê hene.

**Yek**: Li rojhilat e, li sala 492an z. hatiye avakirin.

**Didu**: Li rojava ye, li sedsala şeşan zayînî ava bûye. Avahîne din jî hene ev dîrok li ser hene, sal 243, 376 û 545 z.

**Kela Kilotê**: Ew kinîsek e, li rojavaya gund li ser girekî ye. Li sedsala yekê yan diduyan zayînî, perestgeheke pûtperestî li wir

hebû. Li sedsala pêncan jî, bi saya Mar Maron kinîsek li ser kavilên wê pûtperestgehê hatiye avakirin. Pişt re, di sedsala dehan zayînî de, li dema cengên Xaçeperstan û Hemdaniyan, bedenek li dora kinîse hatiye avakirin û bûye baregeheke artêşî û bi kela bi nav bûye. Hîn sê gorên kevirî tev devikên wan li koşa başûr rojhilat a hewşa kinîsê hene. Ebdela Heccar dibêje, ji bo ku Mar Maron şêniyê wê deverê ji pûtperestiyê bibira ser ola Filetiyê, ew li çolê, li cîgeha vê kelê li bin konekî ji eyarên bizinan dijiya.

### **Fafirtîn**:

Gundekî biçûk e. Berê, riya Romanî ya kevin a ku ji Çi.Lêlûn diçû Helebê tê re dierbas dibû, ew rê niha ziftkirî ye. Ev gund li nava devereke şûnewarî ye fereh e. Kinîseke ji sala 372an z. de lê hatiye naskirin, ew li Sûryê ji kevintirîn kinîseyên ku dîrokên wan li ser nivîsandî ne û ji kevintirîn kinîse ye li cihanê. Ji bilî wê, kavilên malekê, gorekê û gorinen zêrzemînî jî lê hene. Gu.Fafirtînê 23/km ji Efrînê û 7/km jî ji kela sem'anê dûr e.

### Birçka Silêmên:

Gundekî biçûk e, ev şûnewar lê hene: Birceke ji çar tebeqan, kinîseke ji sedsala şeşan zayînî, vêle û odene di tehtê de kulandî ji serdema Romanî de, ew ode wek axur û çalên gênim jî bi kar dihatin.

### Basûfan:

Li bakur rojhilata kela Sem'anê ye. Sê kilomitran ji kelê û 19/km ji bajarê Efrînê dûr e. Şikavlên avahiyên kevin lê hene: Keleke biçûk, kinîseke ji sala 491ê z, gorên zêrzemînî, sehrîncên di tehtê de kolandî, çarşiyek, guvaşgehên zêt û meyê…û hwd.

Gu.**Bi'îyê** jî dora 2/km li bakurê Basûfanê ye, li wir jî kevirên mezin yên avahiyan, gorên zêrzemînî û bîrên di tehtê de kolandî hene, ew jî ji serdema Romanî de ne.

### Birc Hêderê:

Gundê niha li nav şikavlên kevin hatiye avakirin. Ew li bakur rojhilata Gu.Basûfanê bi 3/km dikeve. Kinîseke biçûk lê heye di

navbera salên /340-352/z. de hatiye avakirin. Ji bilî wê, du kinîseyên din, dêrek û birceke perestgehî bi bilindiya 11/m lê hene.

Li başûrê gund, li cigehê **Keferlabê** jî kinîsek heye. Jêder dibêjin, navê vî gundî yê berê Keferkîra bû.

## Duderiyê:

Şikefta Duderiyê, yek e ji sedan şikeftên zewra çemê Efrînê û çiyayên Kurmênc û Lêlûn. Ew li navbera gundên Bircê û Xezîwê li ser avraza Çi.Lêlûn di geliyê Duderiyê de ye. Şikeft 13/km li bakurê Efrînê û dora 2/km li rojhilata riya ziftkirî ye. Li rojava jî di navbera wê û çemê Efrînê de, nêzîk 4/km dûrbûn heye. Bilindiya cihê wê ji ser rûyê deryayê de 450/m e.

Geliyê Duderiyê ji nav çavê çiyê de, bi tûjî bi rojava de dadikev, ew geliyekî kûr û pir dîke ye, her du keviyên wî bilind in. Eger mirov di nîvê gelî de bisekine û li başûr binêre, dê li bilindahiya dora 100/m, deriyê şikefta Duderiyê yê bakur bibîne.

Du deriyên şikefta Duderiyê hene[1]:

**Yek**: Li bakur e bi ser gelî de vedibe, pîvanên wî: Pehnahî 8/m û bilindahî 5/m in.

**Didu**: Li Başûr e, mîna pixareke fereh e, û bi rûyê çiyê re dûz dibe, ji ber wê jî eger mera nigihê ber ew xuya nabe, pîvana wî derî ya nîvbirê(qutir) dora 8/m ye. Kûraniya şikeftê jî dora 30/m ye, bilindiya wê li tenga deriyê başûr jî dora 8/m ye.

Li sala 1988an, şanda Capanî ya şûnewarî, şikefta Duderiyê mîna cihekî vekolanê dest nîşan kiri bû, û li sala 1989an dest bi kolanê kir. Di navbera du salan de, 70 perçe ji hestiyên mirovên Niyandirtalî ji serdema kevirî ya Kevin a navîn de ji binê şikeftê hatin der. Li dawiya wan du salan, wê şandeyê li sala 1993an encama karê xwe di raporekê de li Capanê belav kir[2].

1- Alavên ragihandinê li Sûriyê xwastin navê (Ĥidêriyê) ji şikeftê re bikar wînin, lê zanyar Ekezewa navê wê yê Kurdî yê resen Duderiyê bikar anî.
2- Zanînên li derbarê salên 1989an û 1990î ji rapora (Anthropol Sci)10"4"-1993, rûpelên 361 ra 387an a ku li Capanê belav bûye, hatine birin.

Lê nişkavî li havîna sala 1993an bû, li wê salê, karkerên kolanê raste qerqodeyê zarokekî hatin. Rewşa qerqode diyar kir, ku termê wî zarokî bi zanebûn hati bû veşartin. Zanyaran diyar kirin, ku ew qerqodeyê zarokekî mirovên Niyandirtalî ye, û ew li seranserê cihanê yê herî tûm e ku ra niha hatiye dîtin. Zanyaran temenê wan hestiyan bi 100 hezar sal texmîn kirine(1).

Piştî ku giringiya şikefta Duderiyê hat naskirin, şandeya Capanî deriyên hesinî jê re danîn û wek cihewarekî yekta û zor giring, ne tenê li Sûryê, lê belê li seranserî cihanê, hat tomarkirin.

1- Zanîn ji koreke zanyarê Capanî Ekezewa, ku li sala 1996an li hola Komela "Adyat" li Helebê hati bû dayîn, û ji kovara El-Ĥîwar, hejmara hevbeş 16 û17an hatine birin.

# Cîgehên Şûnewarî
# li deşta Cûmê

## Kela Basûtê:

Gundê Basûtê neh kîlomitran li başûrê bajarê Efrînê ye. Ew gundekî şên û ciwan e, û ji her çar aliyan de bi baxçeyên meywan pêçandî ye. Kaniya Basûtê ya navdar 15L/S avê dide. Ew kanî ji qontara çiyayê Lêlûn dizê. Çi.Lêlûn Basûtê ji başûr û rojhilat de hembêz dike. Ava Efrînê jî di rojavaya wê re bi çend sed mitran diherike û di derbendeke di navbera çiyayên Lêlûn li rojhilat û çiyayê Bûzîkê re li rojava, derbas dibe.

Li her du aliyên Basûtê yên bakur û rojava deşteke dûz û berhemdar heye, li ber sînorên gundên Endarê û Kurzêlê kuta dibe.

Kela Basûtê li ser girekî zinarî yî mezin hati bû avakirin. Xaniyên gund ên niha û berê jî li dora gir belav dibin. Bilindiya gir li aliyê rojhilat dora 40/m ye, û li aliyê rojava jî wek benekê ye û dora 50 m bilind e. Rûbera pişta gir dora heft hezar mitrên çargoşeyî ye, û diyar e ku gir di serdemên ciyolocî yên kevin de ji Çi.Lêlûn perçe bûye, û di deştê de cûm bûye.

Û digel ku roja îro avahiyên kelê kavil û winda bûne, û şûna wan dûz bûye, lê hîn şêniyê gund ji gir re dibêjin "kela".

### - Avakirina kelê û dîroka wê:

Dîrokek naskirî ji avakirina kelê re ne hatiye naskirin. Lê mîna hatiye zanîn, navê wê cara yekê di pirtûka /dîroka Helebê ya Mihemed Elî El-'Ezîm(1090-1161z)/ di rûpela buyerên sala 1245an de hatiye gotin, ew di wê rûpelê de li ser bûyereke cengewerî ku bi (xudanê

Basûtê) re bûye deng dike[1]. Lê belê ew tiştekî li ser miletê ku wê hîngê li Basûtê dijiya, yan dewleta ku lê destlatdar bû nabêje. Lê ji gotina wî tê bînkirin, ku Basût devereke serbixwe bû û bi destlata Zengiyên Helebê ve ne girêday bû, guman jî heye, ku ew destlatdar ji şêniyên navçê yên resen bû, yan jî rêberekî Bîzentî yan jî Xaxçeperestan ew hukum dikir. Çinkî wê hîngê navça Sîrosê di nav destên Bîzentî û Mislimanan de digerî. Lê tiştê naskirî ew e, ku li wê demê, yanê li sala 1145an z, navçeyên Kilis û Çi.Kurmênc di destê xudanê îmareta Rihayê Coslînê Diduyan ê Xaçperest de bû.

Li serdema Euyûbî, yanê li sedsala 12an û li destpêka sedsala 13an zayînî, Eyûbiyan devera Qussêrê û navça Cûmê, radestî malbata Mendî ya Kurd kiri bûn. Û destlatdariya wê ra destpêka sedsala 17an di destê wê malbatê de ma.

Lê xuya ye, ku giringiya kela Basûtê li sedsala 14an pir kêm bû bû, ta radekê, dîroknivîs Ibn El-Şuĥnê (1402-1485)an z, di [El Durr El-Mintexeb, rûp 127] de li derbarê wê dibêje, ku kela Basûtê ya di derbendê de wêran bûye, û bûye gundekî ne hum e û ne gum e.

Li sedsala 16an, dîsa kela bi destê Kurdan hatiye avakirin, û dora sê sed sal di destê malbatên Kurd de maye. Li nîvê yekê ji sedsala hejdehan, hoza Robarî ya Kurd lê hukum kiriye, û malbata Gênc û Omer Axa jî li nîvê diduyan ji sedsala hejdehan û çaryeka yekê ji sedsala nozdehan lê hukum kirin. Rewşa kelê ra dema Siltan Osmanî Mehmûdê Diduyan wilo ma. Li dema wî, piraniya malbat û derebegîtiyên Kurd li welatê Kurdan hatin rûxandin û kela Basûtê jî hat wêrankirin û kavil bû.

Gundî dibêjin, berê bîreke avê di nava kelê de hebû, lê ew niha hatiye xetmandin. Li dora kelê jî xendekek hebû, li dema hêrişan ew tijî av dikirin. Aşekî avê jî li aliyê kelê yê bakur hebû.

Li gor rûbera belavbûna avahiyên Basûtê li sedsalên 17 û 18an, texmîn dibe, ku hejmara şêniyê wê ji 2000 ta 3000 kesî de bû.

---

1- El-'Ezîmî dibêje: Siwarên Basûtê hêriş birin ser Keferbisîlê, lê mîr Sêfiddin li wan rabû, û ra 'Eqebeya Şamê da pê wan. Û li roja 24 meha Zîl Qe'dê, siwarên Tirkman ji Helebê derketin, bi ser siwarên Basûtê de girtin, xudanê wê dîl kirin, û birin Helebê radestî Sêfeddîn Siwar kurê Îtkîn kirin...

Avahiyên kelê ra destpêka sedsala Bîstan hebûn, lê mixabin, xelkê avahiyên ku mabûn hilweşandin û bi kevirên wan xanî ava kirin. Ji wan malbatan, mala Sefer a Helebî bi kevirê kelê qonaqa xwe ya li gundê Endarê ava kirin. Mala Gênc jî, ji ber ku xudana kelê ya berê bû, hin kevirên kelê birin Gu.Celemê, û pê serak ji xwe re ava kirin.

Roja îro, ji bilî çend mirtoyan ji sûra kelê li aliyê rojhilat, û Maĝek(xanek) li hêla bakur nemane, ew xan jî niha bi ser malekê ve ye û dîsa ji dewêr re bi kar tê. Di van çend salên dawîn de, avahiya şaredariya Basûtê li şûna kelê hatiye avakirin.

Cigehine şûnewarî yên din jî li derdora Basûtê hene, ew jî ji demên pir kevin de ne.



Maxa ku ji ber kela Basûtê maye

**Yek**: **Girê Basûtê**, li aliyê gund yê bakur rojava li nêzîk çemê Efrînê ye, gelek alavên ji kevirê Çeqmaqî lê tên dîtin, ew jî dest nîşan dikin, ku ew cigeh ji serdemên kevrî de ye.

**Didu**: **Gomitk**, ev şûnewara ji serdemên nêzîktir e, rengê kevirên ku di avahiyên wê de bi kar hatine, mîna yên demên Romanî û Bîzentî ne. Wekî ku hatiye zanîn, li wan serdeman Basût bû bû navendeke kargêrî ye giring li navça Çi.Kurmênc.

Carcaran, kevirên gorên kevin jî li dora Basûtê ji bin axê dertên, şêweya nivîsê, bêje û biwêjên ku li ser kevirên wan bi kar hatine, mîna yên dawiya serdema 'Ebbasî ne, û texmîna mezin ew e, ku ji demên Zengî û Eyûbiyan bin.

## Girê 'Endarê(1)

Cîgeha şûnewarî yê 'Endarê 1/km li rojavaya Gu.Endarê û 7/km li başûrê Bajarê Efrînê ye. Zeviyên çandiniyê ji sê aliyan de dora wê digerin, çemê Efrînê jî di aliyê wê yê rojava re diherike. Gir 240/m bi ser rûyê deryayê dikeve, bilindiya gir 40/m e. Cowika ava kaniya Endarê ku ji gola Endarê derdikeve, di ber gir re diherike, tibaba herikandina wê 12L/S av dide.

Ew cigeha şûnewarî ji du şûnan pêk tê: Yek, li **başûr** e, kevintir û biçûktir e. Didu, li **bakur** e, ew mezintir e, û dema wê jî nêzîktir e.

**1. Beşê Başûr:**

Girkekî axî ye biçûk e, rûbera wê dora 1000m$^2$ e. Şûnewarvan dibêjin, ew gundikekî ji serdema kevirî ya nû de ye, ku ji deh hezar sal de ava û şên bûye. Ti lêkolanên fereh lê çê nebûne, tenê ji bû pelandinê xendeke lê hatiye kolan, û di encamê de hinek alavên Çeqmaqî û kevirên avakirinê ji serdema kevirî ya nû de hatin dîtin.

**2. Beşê Bakur**, ew ji du cîghan pêk tê:

**- Perçê Başûr**:

Ew girê Endarê yê navdar e. Rûbera wê 7500m$^2$. Şûnewarvan jê re dibêjin (Bajarê Jorîn). Perestgeha Endarê a navdar li ser gir li aliyê wê yê bakur e.

Li derbarê dîroka avakirina vê perestgehê û avakerên wê, nêrînên cuda hene, lê piraniya lêkolînvanan guman dikin, ku ew ji destpêka xwe de Horî û Hitîtî ye.

Dr.Şewqî Şe'is di rûpela 58an de dibêje: Perestgeh bi şêweyê Hêlînî (MîtaHorî) hatiye avakirin. Ev şêwe ji avahiyan li dema di navbera 700-1200an b.z, yanê ji berî serdema Aramî li Sûrya Bakur hebû. Lêkolanên Endarê diyar kirine jî, ku têkliyên şaristanî yên xort di navbera navçeyên bakurê Sûryê û şaristaniya Hitîtî de hebûn.

Pirtûka Delîl Heleb El-Siyaĥî jî li ser perstgeha girê Endarê nivîsiye, û wê rastiyê wiha dupat dike: ((Ew Perestgeheke Hitîtî ye,

---

1- Jêderên nivîskî li ser vî cihî, /Dr. Ş.Şe'is:kela Sem'anê. Intwan Mortkart: Dîroka Rojhilata Nêzîk. Dr.Farûq Sma'îl: Lêkolînên komcivînên gerdûnî. Ebdela Heccar: Kinîsa Mar Sem'an. Tewfîq Silêman: Şaristaniyê Rojavaya Asya. Delîla geştevaniya Helebê 1997…

ji sedsala yekê berî zayînê de ye)). Lîkolanvanan perçenivîsên Hîroglîfî bi zimanê Hitît ji hezarê yekê berî zayînê, û wêneke nîgarkirî ye Xwedê (Eştar) bi qilafeta sirûştî ji binê axa gir deranîne. Endamê şanda lêkolanê Dr.Ebû 'Esaf dibêje: Seredaniyên perestgeha Endarê hez dikin zanibin, ew Xwedyê ku ev perestgeh jê re hatiya avakirin kî bû, lê mixabin tu belge li derbarê wê pirsê ne hatin dîtin.

Lê belê, hebûna pûtên Şêrên bi bask li ber derî, dergeh û li derdora perstgehê, tu gumanê nahêlin ku ew perestgeh ji mûdêla avakirina gelên Çiyayî ye [Mortkart, rûp 229], ji ber ku, wan miletan her du aliyên dergehên avahiyên xwe bi Şêran û bi lawirên evsaneyî fodil dikirin, mebest jê ew bû, ku avahiyên xwe bi riya avsûnbaziyê piparêzin. Ev yek jî, avakirina perestgehê vedigerîne dema berî 1200î b.z, yanê çaxa hebûna dewleta Hitîtan.

Ya ku hîn vê yekê dupat dike ew e, ku perestgeha Alalaxê ya sereke ku ji demên dawiya qeraltiya Alalaxê (1347-1283)an b.z hatine dîtin, ew jî bi pûtên "şêrên baziltî" hati bûn fodilkirin. Lê nimûndeyên herî kevnar ji wan pûtan re, li ber dergehên Bajarê Qirqamîşê (Cerablûsê) hebûn û navdar bûn.

Bedena ku li serdema Bîzentî li dora perstgehê hati bû avakirin jî, li ser bedeneke ji serdema Girîkî hatiye avakirin.

Perestgeh bi kevirên reş hatiye avakirin û bi neqşên beloq hatiye fodilkirin. Zanyar dibêjin, ew neqiş baweriyên olî û evsaneyî dinmînin.

Lê ya herî balkêş, tabloya şêrê bi bask û neqşa pêyên mezin in, ku li ser kevirên dergeha perestgehê ne.

Du dergehên perestgehê hene, ji her yekê re êşîkek ji kevirekî bitenê heye, pîvanên wî kevirî 365cm×270cm.

Zanyar dupat dikin, ku asteke perestgehê ye din jî hebû, ew li ser stûnên mezin ku navbira her yekî 90/cm e, hati bû avakirin.

- **Perçê Bakur**:

Li roja îro, beşê bakur bûye zeviyekî dûz, rûbera wî 180m×280m= 50400m$^2$. Şûnewarvan jê re dibêjin “Bajarê Jêrîn”. Dr.Ebû 'Essaf li ser wî bajarî wiha dibêje: Li dawiya hezarê diduyan

b.z, ew bi beden û bi bircên bervaniyê hati bû sînorkirin. Li her aliyekî bajêr jî dergehek hebû. Bermahiyên bedenê hîn li aliyê rojava hene. Lê belê, lêkolan tenê li ber dergeha bakur, û li hin cihên ji bedena rojava, hatine kirin. Wekî ku xuya bûye, merov ji hezarê çaran b.z. de li girê 'Endarê rûniştiye û ra serdema Osmanî lê maye, û di wê navberê de tenê demine kin vala û bêkes bûye.

Me pir hewilda, ku em jêderine rastgo û diyar li ser dîroka Endarê di serdema destlatdariya gelên Çiyayî de bibînin, lê mixabin me nikanî ew bi cih bikirana, ji bere wê jî, emê bi ya ku Dr.'Essaf li derbarê rûniştina mirov li girê Endarê gotiye, bes bikin. Dr.'Essaf ji dema Aramiyan de dest pê dike û wiha dibje:

- Serdema **Aramî** ya dereng 740î-530î. b.z: Ji şûnewarên vê demê yên ku hatine dîtin: Gor, kûz, mor, firaqên qermîtî, li aliyê perestgehê yê rojava jî bingehên malan hatine dîtin.

- Ji serdema **Parsî** ya Exmînî (540î-330î) b.z, ev tişt hatin dîtin: Pûtikên Xwedê 'Eştar, entîkeke biçûk ji kevirê camî, neqşa Xwedêyê Zeredştî-Medî Ehoremezda ku bi roya bi bazik re dibe yek, li ser hati bû neqşandin, [Dr.Farûq, EbĥAs…]. Hin bermahiyên avahiyan jî li nav kavilên perestgehê hene.

- Serdema **Girîkî-Silûqî** (330î-80yî)b.z: Ew di wê demê de, bajarekî parastî û gulvedayî bû. Qermîtê Girîkî û komek mezin ji zîvê Silûqî hatin dîtin.

- Dema **Romanî-Bîzentî**: Şûnewar dest nîşan nakin, ku girê Endarê li vê demê şên bû. Xuya ye li vê demê, Basût bû bû navenda kargêrî ya giringtir.

- Serdemên **Umewî û 'Ebbasî**: Dîsa jiyan li vî cîgehî vejiyaye. Diyar dibe ku, şêniyê Endarê di çandiniyê de dixebitî, û hevcarên bi gîsnên hesinî û cercer jî bi kar tanîn.

Li sala 969an z, dema ku Bîzentiyan Endar ji destê Hemdaniyan girtin, bajar dîsa şên bû, avahî baş bûn, avahiyên fermî, guvaşgehên zêtê, firnên nên û yên ĥelandina hêsin jî lê hatin dîtin. Ji bilî wan, gelek Xaçikên Bironzî li nav şûnewarên kinîsa gund, li malan û li ser alavên cotarvaniyê mîna gîsin, qalûç, meqesên hesinî û bilî wan jî hatin dîtin.

Ji derandeyên giring ên wê serdemê, komek pereyên Bîzentî yên zêrî di xaniyên şewtandî de hatin dîtin. Li vê serdemê, beden û berevaniyên bajêr xort bûn, gelek birc lê hebûn, keloşkek jî li aliyê gir yê başur hati bû avakirin.

- Serdema **Selcûqî**: Ji 1086an z. de, Bîzentî li bakurê Sûryê li hember Selcûqan têk çûn. Li wê demê gundê Bîzentî li Endarê hat şewtandin, û li ser kavilên wê maline nû hatin avakirin. Lê pir neçû ew jî vala bûne û gund bûye şikavlên wêrankirî, û mîna ku Kurd dibêjin: Ceh li Şûnê hat çandin.

Lêkolîn li sala 1954an, ji hêla şandeke Sûrî ve li girê Endarê hatin kirin. Pişt re, di navbera çend salan de, gelek tişt hatin der. Perestgeh jî li dawiya salên şêstî ji sedsala bîstan bi ber roniyê ket.

Tiştê ku şûnewarvanan pir xemgîn dike, rewşa ku niha perestgeh tê de ye, ji ber ku ew hunerê zor ciwan û hêja, roja îro toşî gelek kirdeyên heyamê dibe û tu kes guh nadê, ji ber wê jî, gelek şêr û pûtên baziltî yên ku ax ji ser hatine vedan, li ber germa royê peqîne û perçe jê ketin. Hêja ye em bêjin jî, ku hinek ji şûnewarên Girê Endarê li mûzexana Helebê hatine bi cih kirin.

## Kurzêla Cûmê[1]:

Gundê Kurzêla Cûmê li ber çiyayê Lêlûn e, û 5/km li başûrê bajarê Efrînê ye. Wekî ku Baba Bolis Yetîm dibêje, Kurd ji Sedsalên Navîn de li Gu.Kurzêlê rûniştine.

Şûnewarên Kurzêla kevin li ser rûbereke fereh belav dibin, ew jî dupat dike ku ew li serdema Bîzentî gundekî şên bû, û hejmara şêniyê wî bêtirî çar hezaran bû, û li wan srdeman navendeke olî û bajarvanî ye giring bû. Li başûrê kaniyê bi nêzîka 100/m, kinîsek û dêreke mezin li ser riya karwanan hati bûn avakirin, dirêjiya wan 70/m bû. Stûnê nasikan jî li rojhilata gund li ser pesarê çiyê bû.

Kurzêl li ber çemê Efrînê li dirêjiya sedsalan, ji nasikan re baregeheke navdar û navendeke zanîna olî ye giring bû.  Ji ber wê, di sedsala dehên zayînî de, du Petriyerk ji nav stûnvanên wê

1- Du gund li navça Efrînê bi navê Kurzêlê hene, yek li çiyê ye, yê din jî li deşta Cûmê ye. Zanînê şûnewarî û dîrokî ji pirtûka [Baba Bolis Yetîm: Gotarin di şûnewarên Sûryê de] hatine birin.

derketine: Yûĥeneyê Çaran /910-922/z, û Yûĥeneyê Şeşan /945-957/an z.

Yaqût El-Ĥemwî di beşê diduyan û di rûpela 242an de, li ser Kurzêla Cûmê wiha gotiye: Ew ji deverên Ĥemqê ye, li sala 1086an zayînî, mîrê Şamê Mislim kurê Qurêş El-'Eqîqlî bi destê Silêman kurê Qetlemîş li Kurzêlê hate kuştin.

Kurzêla niha gundekî şên e, xaniyên xwe li ser pesarê çiyayê Lêlûn bi rojava de serberjêr dibin. Şêniyê wê Kurdine cefakêş in. Hejmara şêniyê wê ya niha bêtirî 2000 kes e.

## **Keloşka Qîbar**ê:

Qîbar ji gundên kevin û ciwan e li deşta Cûmê. Xaniyên wê li ser avraza Çi.Lêlûn rêz dibin. Ew sê kîlomitran li rojhilata bajarê Efrînê ye. Geliyê 'Erşê wê dike du perçe: Beşê bakur Qîbar e, yê başûr jî 'Erşê ye. Li başûrê beşê 'Eerşê ji gund, li cihê bêderan, gelek xaşxaş û zêrzemînên fereh hene, lê piraniya wan hilweşîne. Li wê semtê, kevirên avakirinê yên mezin bi kolandinê re tên der û dest nîşan dikin, ku ew cih li demên kevin şên û ava bû.

Li nava dûzahiya li bakur rojavaya gund jî, û li navbera dora 700/m, girek heye, kavilên keloşka Qîbarê li ser in, ji rengê kevir û avahiyên wê xuya dibe, ku ew ji sedsalên navîn de ye. El-'Ezîmî di pirtûka xwe “Dîroka Helebê”, di bûyerên sala 1030î z. de çêre wê bûye û gotiye, ku ew baregeheke Mislimanan bû li hember Alefiringan, xudanê wê jî Elî Qîbar bû, û ew ra destpêka sedsala sêzdehan zayînî keloşkeke giring bû. Yaqût El-'Ĥemwî jî li derbarê wê gotiye, ku ew keloşkeke zor parastiye.

Li başûr rojavaya keloşkê bi dora 1/km, cihekî din heye bi navê 'Eldewranê tê nasîn. Belkî têkliya wî cihî bi bi Eliyê Qîbarê xudanê wê keloşkê re hebe?.

Hêja ye em bêjin, ku li nîvê yekê ji sedsala bîstan, Qîbar navenda rêbertiya Êzdiyên navça Çi.Kurmênc bû, û ra dema me jî hîn nîvê şêniyê wê li ser ola Êzdî ye.

## Girê Cindirêsê

Girê Cindirêsê ji girên şûnewarî yên Kevin û giring e li Na.Efrînê. Rûbera wî: 400m×500m= 20000m$^2$. Cihê wî li başûrê

Bajarokê Cindirêsê ye, û ew mîna girekî şûnewarî bi nimra /266/ li parêzgeha Helebê hatiye tomarkirin.

Gu.Cindirêsê yê kevin, li kêleka gir bû. Gumana pir ew e, ku ew li ser kavilên Cindirêsa şûnewarî hati be avakirin.

Jêderên dîrokî dest nîşan dikin, ku cigehê girê Cindirêsê ji warên şênbûyî yên pir kevin û giring bû li Deşta Cûmê. Ew li nava deşteke dûz e û gelek kanî li ber hene, çemê Efrînê jî di başûrê wê re diherike. Li serdema Romanî riyeke sereke ye kevirkirî di cihê Cindirêsê re derbas dibû. Wan tiştan hîştiye, ku cîgehê Cindirêsê bibe giringtirîn warê rûniştinê li beşê başûr ji Deşta Cûmê.

Çavkaniyên dîrokî giringiya Cindirêsê ya berê dupat dikin û dibêjin, ku di sedsalên zayînê yên sereta de, Cindirês dergûşa Nasiktiya olmendên ola Fileh bû, [Bûlis Yetîm, rûp 16], û li dawiya destlatdariya Impretor Qustentîn (306-337)an zayînî jî, şagirtekî Mar Yolyenûsê Rehawî dêreke mezin li Cindirêsê ava kir, [Heccar: Kinîsa Sem'an, rûp16].

Ibin Şedad jî pir pesin û salixa Cindirêsê daye û wiha nivîsiye: ((Li devera Cûmê, kaniyên Kibrîtî hene diherikin Hemamê. Hamam jî gundek e jê re dibêjin Cindaris, avahiyên wê dûraqil in ('ecêb in), û kevirên wê bi şêweyekî bê mînak bi hev ve hatine girêdan. Xelk ji dûrwelatan ji bo nexwaşiyan tên xwe di ĥemaman de dişon)), [El Durr El-Muntexeb, rûp131].

Xaknîgarvanê gewre yê kevin “Strebon” jî, navê wê di serdema Romanî-Hilînî de bi şêweyê Cîndaros gotiye. Hinek bawer dikin, ku salixên cihê Cindirêsê mîna cîgehê bajarê Kînalowa paytexta qeraltiya Unkî/Batin ya Hitît e, ew qeraltiya li hezarê yekê berî zayînê hebû. Çinkî, di jêderan de hatiye, ku li sala 876an b.z, Impretorê Aşûrî “Aşor Nasir Be'ilê Duyem”, berê xwe da Kirkamîşê û paşê Ezazûm (Ezaz), pişt re çemê Efrînê derbas kir û şevekê li aliyê wî yê rojava danî, û roja din jî gihîşt Kînalowa.

Ji hêla şûnewarî de jî, qermîtên ji girê Cindirêsê derhatine, dest nîşan dikin, ku ew navçe ji seredema Helefî de şên bû.

Şanda hevbeş a Sûrî û Almanî ji sala 1993an û ra 1996an, lêkolan li sê cihên gir kirine, û ser rûyê rûbera 3150m$^2$ vedane. Di encamê de, pênc astên avakirinê li ser hev hatine naskirin, ew aste ji nîvê

hezarê diduyan berî zayînê de dest pê dibin û li serdema Bîzentî li sedsala şeşan berî zayînê kuta dibin.

Astên **yekê** û **diduyan** xaniyên biçûk in, û ji destpêka serdema Bîzentî ne. Li astên **3an** û **4an** jî, binyatên avahîne gewre, derandeyên qermîtî, fîsikên(çireyên biçûk) zêtê, pere… û hwd derketine. Ew her du aste jî dîroka Bîzentiyan di sedsala şeşan de tomar dikin. Di bin wan her çar astan de, perçeyên qermîtî yên mezin, perçeyên çînçiq û fîsikên zêtê yên ji dawiya serdema Hêlînî de, yanê ji dema sala 100î b.z. de hebûn. Ew dîrok bi riya pere û wêneyên li ser qermîtên ku Xwedêyê Meyê (diyonîros) dinimînin wênekirî ne, diyar bûye.

Li sala 1996an, li şûna bazara Cindirêsê ku 200/m li bakurê gir e, û gava ku zemîn ji bona avakirinê dihat kolan, gelek alav û pûtên Bironzî û me'denî hatin der û şûnerwarvanan ew cih mîna karxaneke ji serdemên kevin nasandin.

Beşek ji bedena (sûr) kelê ya bingehîn li aliyê gir ê rojava derket, ew bi kêmanî heşt mitran pehin e, û ji hezarê diduyan berî zayînê de ye. Herwiha ew dest nîşan dike jî, ku Girê Cindirêsê bikêmanî, ji hezarê diduyan b.z. de bajarekî mezin û baş parastî bû.

Ji bilî wan, derandeyên qerîmîtî jî dest nîşan dikin, ku Gi.Cindirêsê ra navîna serdema Îslamî şên bû. Li salên sihî ji sedsala bîstan jî, hêzeke artêşa Firensî baregeha xwe li pozê gir ê bakur û rojhilat danî bû.

## Şûnewarên Şiyê

Şiyê bajarokekî şên e. Ew li hêla herî rojava ye ji navça Efrînê û nêzîk sînorê Tirkiyê ye. Kaniyeke avê ya navdar li nava Şiyê derdibe. Gelek binyatên avahiyan, bîr û bermayên şûnewarî yên bajarvaniyeke ku ji serdemên berî Îsalmê de ye, li rojhilata kaniyê hebûn. Lê mixabin ew hemî dibin avahiyên nû de man û tu lêkolîn li ser ne bûn.

Şiyê li demên kevin gundekî zor parastî bû, keloşkek li cihê goristana gund hebû. Ibin El-Şuĥnê di rûpela 127an de ji Ibin

Şeddad biriye, û wiha dibêje: ((Şiyê ji kargêrên Ĥemqê ye û Koreke xwe heye[1])).

Li sala 1268an z, qeralê Memalîkan Zahêr Bêbers di riya peymanekê bi Xaçperestan re dest danî ser Şiyê[2]. Lê li dema Ibin El-Şuĥnê Şiyê û keloşka wê jî wêran bû bûn.

Gelek şikeftên kevin li Şiyê hene, ya navdartir şikefta Zerê ye. Hinekan ji şêniyê Şiyê derandeyên şûnewarî yên gelek hêja tê de dîtin, jê: Entîkeyên ji qermîtê şewtandî ku neqşên nivîskî, wêneyên serên ga li ser bûn û meymûnekî bi du seriyan jî tê de hat dîtin.

Li serdemên berê, çandina li ser sewkiyan (midercat) jî li Şiyê hebû, carcaran lûlikên avê yên qermîtî bi cot re li deşta wê derdikevin, ew jî destnîşan dike, ku Şiyê ji aliyê şêweyên çandiniyê de, li serdemên berê, pir li pêş bû.

### Sîros (Nebî Horî)[3]

Şûnewarên bajarê Sîros/Nebî Horî li koşa bakur rojhilat ji navça Efrînê dikevin. Nebî Horî 45/km li bakur rojhilata bajarê Efrînê ye, û 10/km li rojhilata bajarokê Bilbilê ye, sînorê Tirkiyê jî 2/km li bakurê wê ye. Ava Sabûn Sûyê di rojhilata wê re bi 1.5/km diherike, Ava kaniya Germikê jî li wê tengê derdibe û tev ava Sabûn Sûyê dibe.

Şikavlên bajarê Sîrosê li ser rûyê bakur û rojava yê sirteke çiyayî ne, şûnewarên Kela Sîrosê jî li ser wê sirtê ne. Sirtên çiyayî li hêla Sîrosê yê başûr nizim dibin, û darên zêtûnê wan dipêçin. Li aliyê rojhilat jî, newala ava Sabûn Sûyê û çemê Efrînê wê sînor dikin, ji aliyê Rojava de jî sirtên Çi.Kurmênc bilind dibin û ji aliyê bakur de bêlên Çi.Kurmênc ên li paş Sînorê Tirkiyê bilind xuya dibin.

---

1- Hîn jî dibêje: Dupişk li devera Şiyê tinene. Û eger mirovekî ji Şiyê cilên xwe bi ava kaniyê bişo, û here dereke din, dîsa cilên xwe şil bike, û biguvêşe, ew ava guvaştinê dermanê pêdadana dupişkan e, û dilopek jê dupişkekî dikuje. Kore jî, parkirineke kargêrî ya Îslamî ya wê demê bû.

2- Pirtûka El-Exbar El-Siniye di cengên Xaçeperstî de rûpel 176, ya Seyêd Elî El-Herîrî 1899.

3- Nebî Horî, binavkirineke gelêrî ye. Hin jêderên nivîskî li ser bajarê Nebî Hûrî ev in: El-Durr El-Muntexeb. Ebdela Heccar- Kovar El-Feysel. Sibhî Sewaf- Dîroka Helebê. Bûlis Yetîm-Gotar…

Ji avahiyên kela Sîrosê, tenê çend beş ji bedena wê mane, pîvanên dîwarê wê bedenê dora 150×200cm in, hîn binyat û odeyên bircên ku li ser koşeyên wê bedenê bûn, hene, ew hemî jî ji mûdêla qentirme ne.

Bêleke din li rojavaya bêla kelê heye, şûnewarên avahiyekê li ser wê jî hene, tê gotin ku di navbera wê û kela mezin de, berbeqek hebû û ew digihandin hev.

Li dema me, Nebî Horî bi çend navan tê nasîn, wek: Kela Horî, yan Kela Nebî Horî, navê wê yê Girîkî jî bajarê Sîrosê ye. Li serdema Bîzentî jî navê wê Aciya Polîs bû, yanê Bajarê “du keşeyên pîroz” (Kozma û Dimyanos), wê hingê kinîsek li ser gorên wan hat avakirin. Şêniyê Sîros li ser destê Sema'anê Ĝeyûr derbas Filetiyê bû. Wî kinîsek lê ava kir, li wir mir û hat veşartin jî.

Dîroknivîsên Misliman jî, navê bajêr bi şêweyê Qoriş yan Koriş nivîsîne, ew jî ji cudatiya tîpa /C/ ya Latînî di nivîsê û bilêvkirina Erebî de hatiye. Têkliyên van navan jî bi dîroka avakirina bajêr û bûyerên ku li devera wê bûne re hene.

Ji bo binavkirina Horî, çêrokeke olî heye dibêje: Ew ji navê Orya kurê Ĥenne hatiye, Ĥenne jî efserekî artêşa Pêxember Dawûd bû, ew li sedsala yekê berî zayînê, di şerekî de hat kuştin û li wir hat veşartin, /El-Durr El-Muntexeb, rûp 225/[(1)]. Wekî ku nas e jî, li destpêka hezarê yekê berî Zayînê, herêma Helebê keti bû destê Qeralê Pêxember Dawûd, lê destlata wî li bi destê Babiliyan kuta bû.

Lê belê Horî navê miletekî Çiyayî ye jî, çiyayên Zagros û Torosê warên wî bûn, û dîroka wî jî li Rojhilata Nêzîk baş naskirî ye. Wî miletî li navîna hezarê diduyan berî zayînê, impretoriya MîtaHorî ya gewre ava kiriye û destlatdarî li tevahiya beşê bakur ji Rojhilata Nêzîk kiriye. Wek tê zanîn, ew milet bapîrekî kevin e ji gelê Kurd re. Warine din jî li Çi.Kurmênc bi navê Horî hene, wek: Şikeft û kavilên Horiyan li Gu.Coqê, û navê Çi.Hawarê jî ji navê Horî ve

---

1- Çêroka olî dibêje: Pêxember Dawûd ji jina efserê xwe Orya hez dikir, loma jî wî ew şand şer da ku were kuştin û jina wî jê re bimîne. Lê hinek dibêjin ev bêbextiyek e, li meqama pêxemberan netê.

nêzîk e. Yanê bi wî rengî, bingeha navê bajêr dê ji kûraniya dîroka Kurdî-Horî hati be.

Li derbarê navê (Sîros) jî, hin jêder dibêjin, ew binavkirineke Girîkî ye, yê qiralê Parsî “Kureş” e, û herwiha belkî bajar ji dema wî de hebû?. Lê ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî dibêje, ew li ser navê bajarê Sîrhosê ku li Mekedonyayê bi nav bûye.

Li derbarê dîroka avakirina bajêr jî, hin jêder wiha dibêjin: Bajarek ji serdemên berî Girîkan de li wî cîgehî hebû, gumana bêtir ew e, ku ew bajar ji serdema Horiyan de be. Lê belê, kavilên şûnewarên ku niha hene, yên bajarê Sîrosê ne û ji dema rêberê Girîkî Silûqis Nîketor de ne, jêder dupat dikin jî, ku bajar li dema wî hatiye avakirin.

### - **Bajarê Sîrosê li dema Girîkan (312-64) b.z**:

Wek ku me dît, bajarê Sîrosê li dema destlatdariya S.Nîketor (312-280) b.z hatiye damezrandin. Û ji ber ku cihê wê yê leşkerî giring bû, hêzeke artêşî ye mezin lê bi cih bû bû. Lê netê zanîn, ku wê hîngê Sîros navçeke serbixwe bû, yan jî bi herêmeke din ve girêdayî bû. Lê belê, bajarê Sîrosê zû pêş de çû, pere lê hatin kutan û bû navendeke giring ji bawermendên Xwedêya “Esîna” re (şana wê dara zêtûnê ye) ku welatê Girîkan diparêze!, û ji Xwedêyê Birûskê Ziyûs re jî. Bawerî heye, ku perestgeha Ziyûs li ser bêla rojavaya Kelê bû.

Piştî ku, li sala 188an b.z, bi riya peymana Efamiyayê, Asya biçûk ji dewleta Silûqî veqetî, Sîros bû bajarekî sersînorî, giringiya wê kêm bû û bû navendeke komkirina artêşê û bicihkirina serbazên hêzdar ji qeralên Entekê re.

Li sala 83an b.z. jî, qeralê Ermenistanê Tîgranê Gewre, Sîros dagîr kir, li dema wî hêminî li navçê nema, lê li sala 69an b.z. Romanan ew ji destê Tîgran derxist.

### - **Li serdema Romanî**:

Piştî ku li sala 64an b.z. rêberê Romanî "Bumbay" derbas Sûryê bû, Sîros bû wîlayeteke Romanî. Û li destpêka serdema Romanî, dema ku li sala 40î b.z. Farisan Sûrya dan ber xwe, navça Sîrosê şerên dijwar di navbera wan û Romanan de dît. Û li dema ku

Romanan destê xwe danîn ser Sûryê, Sîros wek baregeheke serbazî ji xwe re bikar anîn û artêşa xwe ya dehan jî lê bi cih kirin.

Û herwiha, li dirêjiya sêduyên(2/3) destpêkê ji sedsala yekê berî zayînê, rewşa siysaî ne hat guhertin, lê gava ku taximê dewleta Romanî bi rojhilat de fereh bû, Sûrye parve sê herêmên kargêrî kirin, wê hîngê Sîros bû navendeke kargêrî bi navê Sîrostîka, bajarê Bîriwa (Helebê) pê ve hat girêdan û cîgirekî Imprator lê rûnişt û destlatdarî lê kir.

Navça Sîrosê li serdema Romanî pir şên û gulvedayî bû, bi taybetî jî li dema ku bi (aştiya Romanî) bi nav dibe. Li wê çaxê, Sîros bû kilîta herêma Mezopotamyayê û mofirka di navbera Entekê û Zeugam (Nizib) de li rojhilata Entabê, û pere jî lê hatin kutan.

Lê belê, piştî ku riya Romanî ya lezok di navbera Bîriwa û Minbicê de vebû, navenda kargêrî ji Sîrosê çû Minbicê û Sîros pê ve hat girêdan. Lê belê giringiya wê ya bazirganî kêm ne bû, û li dirêjiya sedsalên duyem û sêyemên zayînî, wek bajarekî çategirêyî û giring bû li herêmê, şeş rê jê derdiketin û li herêmên derdorê belav dibûn.

Piştî ku li sala 227an zayînî, malabata Sasanî textê qiraltiya Parsî radest kir, berê hêzên xwe dan Sûryê û li sala 257an z Sîros û Entek dagîr kirin. Lê wê yekê pir najot û Romanan ew zû jê deranîn.

Digel ew hemî bûyer û rewşên şer û dagîrkirinê ku bi ser bajarê Sîros de hatin, lê bajarê Sîrosê gulvedayî ma û ra dawiya serdema Romanî, wek navendeke siyasî û olî ya Filehî ya rêzdar dihat nasîn. Wek nimûne, li dema Qeyser Anastas, kinîsa Diyonîsiyos bû bû malpera kesên ku ji ber destlatê direvîn, û tu kesî nikanî dest di wan bida, /El Durre El-Muntexeb, rûp 62/.

### - Li Serdema Bîzentî:

Roma û Bîzenta li sala 330î zayînî ji hev cuda bûn û dewleta Bîzentî ya Fileh hat damezrandin. Li sala 423an zayînî, Keşe Tiyodora (Tawdora) bû Usqufê Sîrosê, û bi saya pirtûka wî (Dîroka Olî), zanînên pir hêja li ser dîroka Sîrosê ya wê hîngê hatin nasîn.

Tawdora di pirtûka xwe de li ser Na.Sîrosê wiha gotiye: Navça Sîrosê beşek e ji wîlayeta Ferêt, ew navçeke fereh e, dirêjiya wê 80/km e, û berê wê jî 50/km e. 800 kinîse lê hene. Navça Sîrosê ji

hêla kargêrî de, ji van deveran pêk tê: Çi.Kurmênc, Şêxorz, Meydank, Ezaz, Kilis, Cibrîna Ezazê, Niyara, Şêx Rîĥ, Ekide, li gel gelek gundên din ên şên û mezin, û Sîros jî peaytexta wê bû, /Baba Bûlis, rûp 80/.

Li dema Impretor Gostinyan, Sîros bû baregeheke serbazî ye mezin û Kela Sîrosê, sûra wê û gelek avahiyên xizmetgûzariyê yên din jî lê hatin avakirin. Bajar li wan deman toşî talanên Parsan bû, lê belê ew şer bi peymana sala 532an zayînî, di navbera her du aliyan de rawestî. Lê piştî çend salan, Parsan ew peyman qul kir, dîsa hêriş anîn ser Sûryê û bajarên Helebê û Entek dagîr kirin.

Ew rewşa şer û aştiyê di navbera Parsan û Bîzentiyan de dora sed salî ajot. Carê aliyekî navçeyên bakurê Sûryê dixistin bin destê xwe, ta li dawiyê, impretorê Bîzentî Hurqul li sala 630î zayînî, Pars yekcar jê qewitandin.

Di encama wan bûyeran de, Sîros li salên 540î û 574an zayînî, du caran hat wêrankirin. Ji ber wê jî, wê giringiya xwe ya bazarvanî ji dest da, lê rêzdariya wê ya olî ya payebilind ma, û li sedsala şeşan zayînî bi navê Aciya Polîs (bajarê pîroz/pîrozan) hat salixdan.

**- Li Serdema Îslamî**:

Li sala 637an zayînî, bajarê Sîrosê li ser dayîna peran (Cizye) xwe radestî rêberê hêzên Îslamî (('Îyad kurê 'Ebid Ĝenem)) kir. Û ji ber ku bajarê Sîrosê nêzîk sînorê Bîzentiyan bû, giringiyeke wê li serdemên Umewî û 'Ebbasiyan hebû.

Li serdema Umewiyan, xelîfeya Umewî Welîd Ibin Ebdilmelêk ferman da, ku kevirên kinîsa Sîrosê bibin Helebê û mizgefta Umewî ya mezin pê ava bikin. Ibin El-Şuĥnê li ser wê kinîsê gotiye, ku ((ew li cihanê ji yên dûraqile. Wê hîngê impretorê Bîzentî 70 hezar Dînar da Umewiyan, daku sê stûnên kinîsê vegerîne, lê Xelîfe Welîd daxwaza wî şikand)).

Li dema hukmê Xelîfeya 'Ebbasî Haronê Reşît jî, Sîros bi bajarê Minbicê ve hat girêdan û bû yek ji heft baregehên leşkerî li ser sînorên Bîzentiyan û hêzeke serbazî ye mezin lê bi cih bû.

Li sala 905an zayînî, Bîzentiyan Sîros stand, û pişt re Xaçperestan dest danî ser û navê "Korîsê" lê kirin, navça wê jî kirin derbegîtiyek û bi îmareta Rihayê ve girêdan. Li wê demê, roleke

Sîrosê ye giring di navbera her du îmaretên Riha û Entekê yên Xaçperestî de hebû.

Li sala 1150î zayînî, rêberê Bîzentî Coslîn bi destê hin şêniyê navçê dîl hat girtin, wê hîngê Nûriddinê Zengî çû Sîros dagîr kir û destê xwe danî ser hemî kelayên li wan deveran, mîna: Ezaz, Rawendan…û hwd. Û piştre, li sala 1157an zayînî, û ji bo ku dîsa Sîros nekeve destê Xaçperestan, Nûriddîn fermana wêrankirina wê da, ew hilweşand û jê vekşî. Piştre, li sala 1140î zayînî erdhjeke xort jî li navçê çê bû, wê jî ziyaneke mezin gihand tiştê ku ji bajarê Sîrosê mabû, û herwiha ew li sala 1157an zayînî yekcar vala bû, û bû şikavleke wêrankirî.

Hêja ye em bêjin jî, ku li sala 1314an zayînî, waliyê Helebê 'Eladdîn Eltûnbeĝayê Memlûkî mizgeftek li Helebê li Meydan Reş ava kir, û wî jî bo wê mizgeftê, stûnên gewre ji nav şûnewarên Sîrosê anîn, /El Ĝezzî, per 1, rûp 143/.

Li sala 1925an, rêberê Kolîca Şûnewarî ya Firensî li Bêrûtê /Hênrî Sirîng/, li cihê Sîrosê dest bi lêkolanê kir. Xebata wî heft havînan ajot, di encamê de rûyê bajêrê Sîrosê yê bingehîn xuya bû û hin avahiyên giring jî hatin naskirin. Û bi yekê, jiserkînûve bala lêkolînvan û xemxarên şûnewar û dîrokê kişand ser bajarê Sîrosê.

Ji şanên şûnewarî yên Sîrosê yên balkêştir, şanogeha zor ciwan a ji serdema Romanî de ye. Ew ji ciwantrîn hol û pêplûkgehên Romanî ye. Di nav rûneştekên pêplûkgehê de, hin jê nav li ser nivîsandî ne, diyar e ku ew taybet ji hinek gernasên Sîrosê bûn. Ji bilî wê şanogehê, kolana bajêr a sereke, serşok û goristanên zêrzemînî jî hene, ew jî hemî bi şêweyekî zor nazik û afranvanî hatine çê kirin.

Li aliyê kavilên Sîrosê yê başûr, gora serkêşekî Romanî heye, avahiya wê birceke şeşperî ye, dora deh mitran bilind e û hîn jî lipê ye. Lê xuya ye ku li demeke nêzîktir, di oda biçûk ya ku di bin bircê de ye, mêravek hatiye avakirin, dîroka avakirina wê 1303g/1885an zayînî ye. Û li ĥewşa bircê, li kêleka mêravê jî, mizgeftek li dîroka 1859an hatiye avakirin, şêniyên gundên derdorê li rojên înê û cejnan nimêja xwe lê dikin. Ew mizgeft, li salên sihî ji sedsala bîstan, cihê kombûna alîgirên Tevgera Mirûdan bû.

Lê belê digel giringiya mezin a şûnewarên bajarê Sîrosê, zor mixabin! Ew roja îro berdayî mane, û herkes kane pê bilîze û bidize… Lewre jî, tê xwastin, û gerek e jî ew şûnewar ji hêla her keseî û aliyekî de werin parastin.

Hêja ye em bêjin jî, ku devera Nebî Horî ji cîgehên seyranê yên şêrîn e li parêzgeha Helebê. Salê bi hezaran seyranvan tên seredana wê, gelek komikên biyanî yên geştevaniyê jî berê xwe didin bajarê Sîrosê û li şûnewarên wê yên bêmînak dibin mêvan.

Ma em bêjin, ku mehrecana helbesta Kurdî ya yekê, li meha dehan ji sala 1993an, li ser şanogeha Nebî Horî li dar ket.

**Kela Canpolat**:

Cihê vê kelê li ser çiyayê Parsê ye, bilindiya wî çiyayî 850/m e. Ew li bakur rojavaya Bajarê Ezazê bi nêzîka 5/km ye. Navbera kelê û deşta Merc Dabiq dora 13/km e. Wekî ku tê zanîn, cenga Merc Dabiqê ya di navbera Memalîk û Osmaniyan de li sala 1516an li wê deştê rabû, û di encama wê de Osmaniyan tevahiya herêma Rojhilata Deryaya Naverast dagîr kirin. Bajarê Kilis, bi nêzîka 7/km li aliyê wê deştê yê bakur rojhilat e, bajarê Helebê jî dora 40/km jê dûr e, li hêvarê roniyên Helebê ji kelê de xuya dibin. Navbera Çiyayê Parsê û bajarê Efrînê jî dora 15/km e. Rûbera pozê çiyayî ku kela li ser hatiye avakirin jî dora 4/hêktaran e, roja îro ew serûber bi darên merxê hatine çandin.

Sê aliyên Çi.Parsê û cihê kelê, ango rojhilat, bakur û rojava pesarine çiyayî û daristanî û pir dîke ne, gundê Qestela Elî Cindo jî li aliyê rojava li binê çiyê ye. Kavilên Kelê û bedena wê, ra navîna sedsala bîstan hebûn, lê mixabim, şêniyê gundên derdorê, ew hilweşandin û pê xanî ava kirin.

Avahiyên ku ji kelê mane jî, sê Sehrîncên avê ne. Didu li ser kenarê çiyê yê rojava li ber bedena kelê ne. Ya sisiyê jî, Sehrînceke zor ciwan e, li hêla herî başûr ji dawiya avraza cîgeha kelê dikeve. Bana wê serîncê qentirmekî ye û nêzîk du mitran bi ser rûyê zemînê dikeve, pîvanên wê: 15/m dirêjî, 10/m ber, kûraniya ku niha heye jî 8/m in, lê kuraniya wê ya rastînkî ne diyar e, ji ber ku ew tijî ax û kevir bûye. Lê belê şêniyê wan gundan dibêjin, ew bi çil pêplûkan dadiketin binê wê, ew pêplûk jî li ser qentirman hatin danîn. Niha

tenê du qentirme jê mane û /15/ pêplûk li ser hene. Dîwarên sehrîncê yên hindur hîn sax in û siwaqeke axî ye sor li ser e.

Li aliyê sehrîncê yê rojhilat jî, goristaneke kivin û pîrozgeha Parse Xatûnê ya Êzdiyan heye.

Di jêderan de hatiye, ku ew kela li demên Alefiringî jî hebû. Lê tiştê tekûz jî ew e, ku ew li sedsala sêzdehan zayînî, ji hêla malbata Mendî ya Kurd ve hatiye vejandin û bikar anîn. Li dema wan, Kilis, Ezaz, Çi.Kurmênc û Cûmê wek mîritiyeke serbixwe bû, û ra destpêka sedsala Hefdehan di destê mîrên wê malbatê de bû. Kela jî bi navê navdartirîn mîrê wê "Canpolat" hatiye bi nav kirin. Pişt re, dema ku Barût û çekên agirî hatin afrandin û di şer de bikar hatin, ew kela bê sûd bû, bêxudan ma û paşê jî wêran bû.

## **Keloşka Hawarê**:

Şikavlên wê li nîvê çiyayê Hawarê li aliyê başûr li ser bêleke zinarî û bi daran pêçayî ye. Ji aliyên rojhilat, bakur û rojava de kendûkorên zinarî, kelem û darên daristanî wê dorpêç dikin. Li aliyê başûr jî, pesarê çiyê pir dîke dibe, bi dar û pir dijawr e.

Keloşka Hawarê li başûrê Gu.Çiyê bi 1.5/km ye. Binyatên avahiyên wê dora 2000m$^2$ girtine, ew binyat tijî ax, kevir û darên kelemê bûne. Kevirên avahiya wê girs û şekirî, mîna yên serdemên sedsalên destpêkê yên berî zayînê ne.

Deriyê keloşkê bi rojava de ye, dûzeke zinarî ye biçûk li pêşiya wê heye, sehrînceke avê ye kûr li ber deriyê wê yê rojava kolandî ye. Mirov kane ji cihê kelê de, nêrevaniya hemî beşên bakurî ji deşta Cûmê bike. Ji deştê de jî, Pozê Keloşkê wek mitê herî bilind ji çiyayê Hawarê xuya dibe.

Lêkolînvanê Firensî Rocê Lîsko wê kelê bi (kela Nûriddîn) bi nav dike, û dibêje, ku wê şerên dijwar di navbera hoza Amka ya Qizilbaş û hemsiyên wê yên Sinne de ji hozên navça Efrînê û reolên din dîtiye, lê belê zanînên li ser wan pevçûnan ne hatine belgekirin, û me jî tiştek di jêderên nivîskî de li ser dîroka avakirina keloşkê û navê Nedriddîn û bûyerên ku pê ve girêdayî ne, dît.



**Xirabî Şemsê: Dergeha perestgeheke pûtperestî, nexşeyên rojê û hêvê li nîvî, li dora wan jî du serên ga û du gloverik hene, belkî ew destnîşana Gozemînê dikin.**



**Girê Endarê: Perstgestgeha ji serdema Hitît.**



**Kefer Nebo: Pûtê jinekê bê serî ye, li kêlekê nîvê jêrin ji pûtê mêrekî, li kêleka kinîsekê ne.**




**Dêrmişmiş: Goreke Romanî, û li pişt wê birceke perestvaniyê.**



**Fafirtîn: Xwînrêja kevintirîn kinîseya dîrokirî li Sûryê, di bin de zêrzemiya goristanê.**



**Berad: Gora Mar Maron, li paş wê xwînrêja kinîsê.**




**Şikefta Duderiyê, di ser wêneya nivîskar e.**




**Birc Ĥêder: Kinîse.**



**Kîmar: Xwînrêja kinîsê, li paş wê jî stûnê perestvaniyê.**


**Nebî Horî: Şanogeha ji serdema Romanî.**


**Piraya ji serdema Romanî li ser ava Sabûnê.**




**Wêneya du Tawûsan li kevana Xwînrêja Kinsê li Gu.Kîmarê.**



**Çiyayê Parsê: Şikavlên kela Canpolêt**



**Kela Mar Sem'anê: Bermahiyên stûnê wî di nîvî de**



**Qerqodeyê zarokê Niyandirtalî li şikefta Duderiyê**

Lêkolîna Çaran

# Pira û riyên kevin li navça Çiyayê Kurmênc

## Rêkên Kevin

Dewleta Romanî ya yekê bû ku rêkên kevirkirî û lezok li herêma Rojhilata Naverast çê kir. Romanan şebekek ferh ji wan riyan ji bo armancên serbaziyê û bazirganiyê li Sûryê çê kirin, hin jê sereke û kevirkirî, hin jî tenê dûzkirî bûn.

Wan ji bona parastina karwanan, jêderên avê, deboyên mûnetê û ji bo sivîl û serbazan, bircên parastinê jî li kêleka rêkan, li ser cihên bilind ava dikirin. Ava vexwarinê jî ji wan bircan re ji bîran, gol û sehrîncan, yan jî bi berbeqan ji çem û kaniyên nêzîk tanîn. Birastî jî, navça Çi.Kurmênc bi bîr û sehrîncên kevin pir zengîn e. Gelek ji wan hîn li ser çateriyên kevin hene.

Ji bilî wê, gelek gund li deşta Cûmê û çiyayê Lêlûn bi navê (birc) tên nasîn, wek Bircikê, Bircê, Birckê Terpê, Bircilqazê… Gelek cîgeh li ser rêk û dedorên gundan jî hene ku navê (Birc) hildigrin. Guman heye, ku gelek ji wan li ser riyên Romanî bûn. Ji bilî ku, birc li kêleka cîgehên perestgehên bawermendan jî hebûn.

Li serdema Romanî, bajarê Entekê paytexta wîlayeta Romanî ya Rojhilatî bû. Têkliyên Entekê yên çolbirî jî di riya sê derbendên sereke re dibûn.

Derbenda **yekê:** Di ber Derya Sipî, di ber dawîneya başûr ya Çiyayê Amanosê re bû.

Ya **diduyê**: Derbenda Bêlangê, ew li rojhilata bajarê Iskenderonê di ser çiyayê Amanosê re diçe.

Ya **sisyê**: Di deşta ku di navbera Çiyayên Amanosê li rojava û Çi.Kurmênc li rojhilat bi bakur de hildikşe û digihê nêzîk bajarê Meletiyê, pişt re, li wir firkê dide xwe û bi rojava de berve rojavaya Anadolê diçe. Dema ku her du riyên jorin dihatin girtin, ev rê bi kar dihat.

Çûnhatina Entekê bi rojhilat re jî, di van derçûnên sereke re dibûn:

**Yek**, di navça Hêrimê (Bab El Hewa) re berve Helebê diçû.

**Didu**, di deşta Cûmê re, ew jî ji bo çûna Cezîrê û navîna Anadolê bikar dihat.

Ji bo ku em rêkên kevin li çiyayên Kurmênc û Lêlûn li serdemên Romanî û Girîkî nas bikin, emê li nexşeya A.Biwadorbar[1] a riyên Romanî li Sûryê, ku li salên di navbera 1925an û 1942an de daniye, û li pirtûka (Qehremanên Xwedê) ya Yûsif Qoşaqcî vegerin, **[nexşe 19]**:

## 1. Rêkên sereke

### Ji bajarê Enetkê de:

- Riyeke sereke di navbera bajarên Entekê û Îslehiyê de hebû. Riyek li nêzîk Meydan Ekbezê jê vediqetî û diçû gundên Meydana û çiyayê Qerebêlê, wê hîngê navendeke şên û mezin li wan deveran hebû, hîn jî gelek şûnewar li devera Meydana hene.

- Riyeke sereke di gundê Hemamê û Cindirêsê re derbas dibû, di Şêx Evdirehmên û Efrînê re diçû[2], û berî ku ava Efrînê derbas bike, rêkek jê vediqetî, di deşta Coqê re û di ‘Endîba kevin re derbas dibû, û li rojavaya Gu.Keferomê bi 1/km, di ser pirekê re derbas aliyê Çemê Efrînê yê rojhilat dibû, hîn jî lengerên wê pirê di nîvê rêçûna çêm de hene. Ew rê baş fereh bû, kevnerêça wê li ser pesarê rojhilat ê kendalê çemê Efrînê, li ber Gu.Keferomê baş xuya dibe. Gumana pir ew e, ku ew rê diçû bajarê Sîrosê. Em ji bîr nekin jî, ku li nêzîk cihê pirê, li aliyê çem yê rojava, kavilên avahiyên şûnewarî û

1- Adyat Heleb, pirtûkên çaran û pêncan, rûp223.

2- Ew rêkeke giring bû, û ra navîna sedsala bîstan bi kar dihat, û jê re Rêka Bazirgana digotin.

goristaneke kevin jî hene, ew jî diyar dikin, ku ew cihekî kevin û şên bû.

**Ji bajarê Sîrosê de:**

Çar rêk ji bajarê Sîrosê derdiketin:

**Yek**: Diçû Îslehiyê.
**Didu**: Berve Helebê diçû.
**Sisê**: Berve bajarê Simêsatê, ku li bakur rojhilat li ser çemê Ferêt e.
**Çar**: Berve Ezazê diçû, ew jî li wir tev riya ku ji Entekê dihat, û di Efrînê û Qitmê re derbas dibû, û pişt re berve bajarê Nizibê, ku li bakur rojava ye, diçû.

**Ji kela Sem'anê de**:

- Riyeke sereke ji devera kela Sem'anê derdiket, di gundên Basûfan, Kilotê, Beradê, Kefer Nebo û Xirabî Şemsê re derbas dibû û diçû Helebê. Hin perçe jê di navbera Basûfanê û Kefer Nebo de, û li rojhilata Xirabî Şemsê hene, /'Adiyat heleb, pirtûk 4û5, rûp 222/.

**2. Rêçik**:

- Rêçikek li ber Gu.Qitmê ji riya sereke vediqetî, di ser çiyayê Lêlûn re bi başûr de diçû, û di van gundên wan deveran re derbas dibû, wek gundên: Dêr Mişmiş, Kîmar, Berad, Kefer Nebo, Birc Hêder…

- Rêçikek li ber Gu.Qîbarê, ji rêka sereke vediqetî û diçû Gu.Kurzêlê û deverên kela Sem'anê.

- Rêçikek li ber Gu.Hemamê ji ya sereke vediqetî û diçû gundên Celemê û Xezîwê, û li wir digihîşt rêçika ku ji Gu.Qîbarê dihat.

- Rêçikin ji van gundan derdiketin û berve rojhilat diçûn: Kîmar, Berad, Birc Hêder…

Ji van hemî rêkan, tenê hin şûnewarên biçûk û navên wan mane.

Pêwîste em bêjin, ku şêniyê bajarokê Şera dibêjin, şûnewarên riyeke kevirkirî li devera wan jî hebû, lê mixabin me nikanî ew bicih bikira.

Li sala 1868an, dewleta Osmanî biryar da, ku riyekê di navbera Helebê û Iskenderonê de veke, ew rê di (Kela Gobelê) re, ku li nêzîk Gundê Cilbirê ye, diçû.

Pişt re, pirak jî li ser ava Efrînê, li cihê bajarê Efrînê hat avakirin, û ahengek ji bo vekirina rêkê û pirê li sala 1882an hat li dar xistin.

Li wê salê bi xwe jî, dest bi vekirina riyekê di navbera Kilisê û Iskenderonê de bû, wan ji Qitmê de dest pê kir, di Efrînê re derbas bû û bi rojava de çû, /El Ĝezzî, p3, rûp205/.

Li destpêka serdema Firensî li Sûryê jî, riyek bi dirêjiya 12/km, di navbera rawestgeha Qitmê û Gu.Meydankê, ku wê hîngê navenda Qeza Kurdaxê bû, hat vekirin.

## Pire

Sê çem di nava navça Çi.Kurmênc ya kevin re diherikîn, Efrîn, Reş û Sabûn Sû. Ji bilî ku navçe xudî cîgehekî xaknîgarî yî giring bû jî di navbera bakurê sûryê û Anadolê de, ji ber wê jî, hebûna rêkan û piran pirseke zor pêwîst bû.

### - Pireyên serdema Romanî:

Pirayên herî kevin li navçê, du pirayên ji serdema Romanî de ne, ew li sedsalên yekê yan diduyan zayînî hatine avakirin[1]. Lê xuya dibe, ku ew pêtirî carekê hatine nûjenkirin, nemaze di serdema Bîzentî de. Ew her du pira hîn jî xizmeta çûnûhatinê dikin, lê mixabin rewşa wan roj li dû rojê xirab dibe, û tirsek îjdil heye ku ew bikevin. Ew pira jî ev in:

Pira **yekê**: Li ser ava Sabûn Sûyê, li rojhilata Nebî Horî bi 2/km ye. Dirêjiya wê 120/m e. Ew li ser şeş lingan û heft qentirman radibe.

Pira **diduyan**: Ew li ser çemê Efrînê li rojhilata pira yekê bi nêzîka kîlomitrekê ye. Dirêjiya wê 92/m in. Ew li ser du lingan û sê qentirmên mezin hatiye avakirin.

Pişta her du piran kevankî ye, berê wan pênc mitir û nîv in, û bi keviran raxistîne.

---

1 - 'Adyat Heleb, pirtûkê 4û5, rûp 219.

- **Pira li Keferom**:

Ji bilî wan her du piran, lingerê pireke din jî li nêzîk Gu.Keferomê di nîvê rêçûna çemê Efrînê de heye, hîn cihên lingên wê li ser kendalê çem yê rojhilat tên dîtin. Li gor şêweya keviran û avakirina lengeran, guman dibe, ku ew jî ji serdema Romanî de ye.

- **Pire li cihê bajarê Efrînê**:

Dîroknivîs Ibn El-Şuĥnê di rûpela 167an de hebûna pira Qîbarê li ser çemê Efrînê tîne zimên. Belkî jî ew pira ji serdema Romanî de bû, û li ser riya Romanî (Entek-Nizib) hati bû avakirin.

El Ĝezzî jî di / beş1, rûp 39/ de li derbarê pirên li ser çemê Efrînê wiha dibêje: ((Li sala 1300î g/1882an z, pirek li ser çemê Efrînê, li ber gundê Zêdiyê ji devera Cûmê ku bi ser Kilisê ve ye, hat avakirin; Ew pireke kevirî, gewre, zor ciwan û bi hostetî hati bû avakirin. 4480 zêrên Osmanî lê xerc bû bûn. Ew pere ji sandiqên şaredariyên Heleb, Kilis, Entekê û Iskenderonê hati bûn xerc kirin. Roja ku hat vekirin rojeke cudawaz bû, encûmena şaredariya Kilisê tekelifeke mezin çê kir, mîrên destlatê û serbazan, zanyar, navdar û hemî xanedanên wîlayetê hatin vexandin.

Dirêjiya wê pirê /259/ pê û ber jî /23/ pê bûn. Li dawiya pirê ya rojava li hêla bakur, ev deq li ser kevirên pirê hati bû nivîsandin:

“Ev pira xort, li dema siltanê siltanan, xelîfeya gewre, xudanê tacê, siltanê qehreman Ebdilhemêd Xanê Diduyan hat avakirin”.

Li roja diduyan ya cejna Qurbanê, li sala 1298g/1880an zayînî, waliyê Helebê Cemîl Paşa kevirê bingeha wê danî. Û bi qîreta serokê endezyarên wîlayetê Qustentîn Madirdîs Efendî, ew di salekê de hat avakirin. Herwiha, vekirina pirê dîsa raste roja cejna Qurbanê ya sala din 1299an goçî hat.

Lê belê li wê salê, baran pir ket, û lêmiştên mezin ji çiyan û newalan daketin, ava çemê Efrîn rabû, bi xwe re bi hezaran dar anîn û li ber pirê sekinîn, û di bin zora wan de, du qentirme ji wê pirê hatin xwar û kevirên wê jî bi avê de çûn.

Û ji ber ku, li wê salê, riya Iskenderonê jî di wi re vebû bû, pêwîstî bi wê pirê pir hebû, lê ji ber ku sandiqa şaredariyê têrê ne dikir ku dîsa ew pire bi keviran were avakirin, wan darên mezin

anîn, bi hêsin bi hev ve girêdan û avêtin ser keviyên du qentirmeyên ku mabûn, û herwiha pire ji nû ve bi kar hat.

Lê belê, gava ku havîn hat, agirek bi pirê ket û ew kir xalî. Lê dîsa ew wek berê bi textan hat avakirin)). Belkî wê lomê jî, hîn navê (pira texta) li ser zimanê mezinên navçê tê hildan.

Li sala 1898an, pireke nû bi destê Almanan li cihê bajarê Efrînê hat avakirin. Lê bi sedema rabûneke avê, ew li 16/2/1974an hilweşî.

Ta berî vê bi dora 15-20 salan, hin lengerên pirên berê li bakurê pira niha bi 30/m, û li başûrê wê jî bi nêzîka 50/m, hebûn, lê me nikanî bizanîba ew yên kîjan piran bûn.

Roja îro du pire li bajêrê Efrînê li ser çemê Efrînê hene, yek li sala 1975an hatiye avakirin, ya din jî li sala 1985an ava bûye.

- **Pira Meydankê**:

Li dûriya kîlomitrekê li başûr rojhilata Gu.Meydankê, pirek li ser çemê Efrînê hebû, ew niha di bin ava gola Meydankê de maye. Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî dibêje, ku ew pira ji serdema Romanî de ye.

Di şerê Cihanê yê diduyan de, Înglîzan pirek li kêleka Gu.Kifêrê jî ava kir, wê xizmeta çûnhatina di navbera deverên Sem'anê, deşta Hemqê û Efrînê de dikir. Hîn jî lengerên wê ra roja me hene. Li wê demê, riya sereke ya ziftkirî ya ku niha di Basûtê re diçe, tenê bi kêrî çûnhatina meşê û dewêr dihat.

Li dema me, şebekeke fereh ji riyên zifkirî li navçê hatiye vekirin, û piraniya gund û bajarên navça Efrînê digihînin hev. Pênc pirên nû jî li navça Efrînê hene, didu li bajarê Efrînê ne, ya sisiyan li Gu.Tilsilorê ye, ya çaran jî li başûrê benda Meydankê ye û bi navê pira Gemrûkê bi nav dibe, ya pêncan jî li ser geliyê Qerecurnê ye.

## Riya Hêsin li Çi.Kurmênc

Li destpêka sedsala bîstan, rêka Çîmana Rojhilatî a Lezok, giringtrîn rêka çolbirî bû di navbera Asya û Ewrupa de, û ya yekê bû ku Awrupa û Rojhilata Navîn digihand hev. Navê wê rêkê jî bi gelek bûyerên navça Çi.Kurmênc û herêma Rojhilata Navîn ve hatiye girêdan.


Li ser stûnên hesinî yên wê rêkê, ku li navça Efrînê hatin raxistin, dîroka salên 1911ê û 1912an hatiye neqşandin. Ji wê tê têgihîştin, ku ew rêk di wan salan de hatiye raxistin.

Drêjiya perçê ku di navça Efrîne re diçe, ji rawestgeha Qitmê de û ra ya Meydan Ekbezê 61.5/km in. Çar rawestgehên sereke li ser riya hêsin hene: Qitmê, Qurtqulaqê, Reco û Meydan Ekbez ku li ser sinorê tirkiyê ye, û rawestgeheke biçûk li Kitixê jî heye.

Rêka hêsin di çar tunêlan re derbas dibe, dirêjiyên wan jî wiha ne: Tunêla Meşalê 235/m. Recoya yekê 540/m. Recoya diduyan 165/m. Recoya sisiyan 130/m.

Xeta çîmanê di ser pênc pirên hesinî re derbas dibe, ew jî ev in: Cûmkê li ser çemê Efrînê, Astêr û Ziravkê li ser ava Ziravkê, Kitix li ser ava Kitxê û Ĥeşargê/Heredere li ser geliyê Ĥeşargê. Her du tûnêla Reco jî bi riya Pira Heşargê digihîne hev, pîvanên wê pirê wiha ne: Dirêjî 450/m û bilindî jî ji binê gêlî de 95/m, **[Nexşe 19].**

Hêja ye em bêjin jî, ku ev rê û pire ji danîn û avakirina Aleman e, lê karkerên avakirinê ji şêniyê Çi.Kurmênc bûn. Yê ku qentirmeyên tûnêl û piran jî avakirine, Evdirehmanê Elîkê ji Gu.Meşalê bû.




Nexşe-19- rê û rêçik li Çi. Kurmênc di serdemên Roman û Yûnan de

# Beşê Çaran

## Taybetiyên Netewî û civakî
## Li navça Çiyayê Kurmênc

## Destpêk

Emê di vê beşê de, li ser rewşa nijadî ya navça Efrînê rawestin, hoz û malbatên wê bidin nasîn û rewşa civakî ya her kom û komikeke kevin û hevdemî nas bikin.

Ji bo pêkanîna vê lêkolînê, me giraniya xwe da ser:

**Yek**: Gerê û hevdîtina bi xelkê re.
**Didu**: Jêderên nivîskî.

Hêvîdar in, em kani bin di mijareke wiha dijwar de, ku piraniya zanînan ji bîrweriya gelêrî hatine girtin, bigihên rastiyê. Armanca me ew e, ku em beşekî ji dîroka civaka Kurdî li navçekê ji navçeyên welatê wî li Sûriyê belge bikin.

Di vê babetê de, bi tevahî û li destpêkê em kanin bêjin, ku li ev nofên nijadî li navça Efrînê hebûn-hene:

**1. Kurd**: Piraniya şêniyê navçê Kurd in, û ew ên herî kevnar in li navçê.

**2. Ereb**:Guman heye ku hatina wan li navçê ji nîvê diduyan ji sedsala nozdehan û ji destpêka sedsala bîstan de ye.

**3. Tirkman**: Hejmara wan çend sed mirov e, ew bi Kurdî daxivin. Piraniya wan li gundê Celemê rûdinin, li roja me ew xwe Kurd dibînin.

**4. Ermen**: Li destpêka sedsala bîstan, dora 200 malbatên Ermen, ku ji ber qirkirina artêşa Tirk direviyan, li Efrînê bi cih bû bûn. Lê piraniya wan li salên çelî û pêncî ji sedsala bîstan, barkirin bajarê Helebê, hin jî çûn Ermenistanê, û li roja îro tenê çend mal jê li Na.Efrînê mane.

**5. Çelengîr (Qurbet):** Ew bi şêweyekî liserhev li navçê Rûnanin.

Ev nofên nijadî, li dirêjiya salan bi hev re rûniştine û bê pirsgirêkên berçav bi hev re jiyane. Gelek têkliyên civakî yên xort jî, nemaze di navbera Kurdan û Ereban de çê bûne, wek jinanîn… û hwd.

Emê di lêkolînên li pêş de, li ser nofên civaka Na.Efrînê baxivin, dîroka hebûna hoz û malbatên wan li navçê nas bikin û hin taybetiyên wan ên civakî bidin nasîn.

# Lêkolîna Yekê

## Kurd û hozên wan

Li dirêjiya sedsalan û ra sedsala nozdehan, Kurd bi tenê li Çi.Kurmênc hebûn, / li beşê dîrokê vegere /. Li roja îro jî, dora 338 gund û warên şên li navça Efrînê hene, ew li ser heft deveran belav dibin. Di pênc deveran de %100 ji şêniyê wan Kurd in, ew dever jî ev in: Şiyê, Reco, Bilbil, Şera û Mabeta. Li diduyên din, yanê li deverên Cindirêsê û devera Navend-Efrîn, hejmarin ji nofên din jî hene.

Kurdên navça Efrînê li ser  çend hozên sereke belav dibin, wek: Şêxan, Amka, Reşî, Biya, Mila, Dina, Şikak, Robarî... Lê belê gelek komehozên din jî li navçê hene, emê di nav rêzên vê lêkolînê de li ser rewşa wan jî rawestin.

Wekî ku hatiye zanîn, rêxistina civakî ya hozane, ra dawiya serdema Osmanî li navça Çi.Kurmênc xort bû, lê pişt re, ew pêre pêre ji hev şelî û ji holê rabû.

Lê ji dawiya sedsala nozdehan û destpêka sedsala bîstan de, rêxistina derebegîtiyê li şûna hozîtiyê peyda bû, ew rêxistina civakî ya nû, destlatdariya rêxistina civakî ya berê ji dezgeha hozê stand û ket destê Aĝeyê nû, hinek ji wan Aĝan bi xwe jî, li ser pêşkoka xwe ya hozane ya kevin radibûn.

Ji destpêka nîvê diduyan de ji sedsala bîstan, piştî ku zagona durustkirina çandiniyê li Sûryê pêk hat, rêxistina derebegîtiyê pir lawaz bû, û têklîne civakî yên nû li ser bingeha wê guhertinê peyda bûn. Bi wê guhertinê re, guhertinên civakî yên pir kûr û giring li navçê hatin darijtin. Di wan têklî û sazûmana aborî û civakî yên nû de, sermiyanê û sermiyandaran rola giring û destlatdar di rewşa civakî ya nû de wergirtin. Emê di rûpelên lipêş de, li ser wan guhertinan jî rawestin.

# Çiyayê Kurmênc
# Hoz û Malbat

Gava ku em lêkolînê li ser hoz û malbatan dikin, mebesta me ne pesendkirina hozîtî û malbatiyê ye. Çinkî em baş dizanin, ku hozîtî wek darêjeke civakî, ji bêtirî pêncî salî de li navça Çi.Kurmênc hilweşiye, nemaye û nema vedigere jî.

Ji bilî ku, navê hozîtiyê li navçê, bi gelek şer û pevçûnên xirab ve hatiye girêdan, û bi sedan, belkî bi hezaran jî kes, di wan bûyeran de hatine kuştin.

Lê digel wan tiştan, vekolînên civakî û dîrokî ji Çi.Kurmênc re sergihayî nabin, eger rewşên hoz û rêberên wan ne tên naskirin. Ji ber ku, li dirêjiya salan, bandoreke wan e mezin li navçê û li deverên derdora wê jî hebû, û navên wan bi gelek bûyer û guhertinan ve hatine girêdan. Ev tişt jî pêwîst dikin, ku mera li ser vê mijarê raweste, baxive û wê wek rûpelekê ji mêjoya navçeya Çi.Kurmênc tomar bike.

Di demên berê de, dewleta Osmanî sazûmana hozîtî ji bo xortikirina destladariya xwe bi kar tanî. Ji bo pêkanîna wê yekê, dewletê rengine kargêrî ji bo destlatdariya navçe û herêmên xwe dafirand, bingeha wê jî li ser bilindkirina destê serokên hozan û derebegîtiya rêberên wan radibû.

Ji bo pêkanîna wan armancan jî, destlata Osmanî ew rêberên hozan bi xortî bi xwe xwe ve girê didan, wê gelek navûnîşan ji wan re peyda dikirin û bi wan dixistin[(1)]. Paşê jî, ew kes ji bo pêkanîna fermanên Siltên û destlatê, civandina vêrgê, peydakirina serbazan û pêdviyên wan bikar tanîn. Li berdêla wê, ew serok hoz di destlatdariya hoz û navçeyên xwe de serberdayî dibûn.

Li ber roniya van rewş û têkliyan, zulma Axan û destlatê,

---

[1]- Ew navnîşan wiha bûn: - Axe: Bi wateya Rêzdar e. - Derebeg: Begên deveran. - Beg, Baybeg: Nîşana wê (kurk) bû, ji hêla dewletê de dihat dandin. - Paşe, Mîrmîran: Wek nimûne, li sala 1600, Mîr Husênê Canbolatî ku bû bû waliyê helebê, nîşana (Mîrmîran) hilgirti bû.

pevçûnên hozan û ziyana ku jê peyda dibûn, û 'urf û 'adetên hozane yên giran, wan hemî tiştan, serok hoz, derebeg û dewlet jî li ber çavê gel reş dikirin.

Gelê Kurd ji hêla siyasî ve jî, ji ber ezeziya sazûmana hozîtiyê pir kişand, ji ber ku gelek rêberên hozan xwe bi pêlanên dewletên destlatdar ve girê didan, û dibûn sedemek bingehîn ji perçekirina gelê Kurd û têkçûna serhildanên wî.

Di bin bandora ew guhertinên tevahî de ku li dawiya sedsala nozdehan û destpêka sedsala bîstan çê bûne, pêwendiyên hozane berebere lawaz bûn û hatin pişaftin, û li navîna sedsala bîstan, pêwendiyên hozane yên ku mabûn jî, bi bandora Tevgera Mirûdan têk çûn. Lê belê, hîn piraniya Kurdên navça Efrînê, binyata xwe ya hozî baş nas dikin û bi bîr tînin.

Li van çend salên dawîn, hin hoz û malbatan dil dikirin, ku jiserkînûve pevgirêdana hozîtî û malbatiyê vejînin, hin rewşên civakî, aborî, siyasî yên ne baş jî jê re alîkar bûn, ji ber wê jî, hinek malbat û hozên kevin, komîteyên malbatî û hozane damezrandin, lê belê em bawer nakin ku ew dilxazî dê bi ser keve.

### Hozên Çi.Kurmênc li nîvê yekê ji sedsala bîstan:

Li ser rewşa hozên navça Çi.Kurmênc li destpêka dehsalên çelî ji sedsala bîstan, her du lêkolînvanên Firensî, Rojê Lîsko û Piyêr Rondo, baştirîn nivîsar li derbarê wê mijarê nivîsandine, wan hejmar, war û giringiya hozên nasdar dane nasîn.

P.Rondo, di nivîsara xwe de li ser Kurdên Sûriyê, û li ser hozên Kurdên Çi.Kurmên, û hejmara kesên wan li sala 1939an, wiha nivîsiye [(1)]:

| **Hoz** | Amka | Şkak | Okce Ezdîn | Cûm | Şêxî | Goçer û yên din |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hejmar/kes** | 4000 | 6000 | 10000 | 10000 | 9000 | 2000 |

Di mijara warên hozan de jî, Osmaniyan li sedsala nozdehan navça Çi.Kurmênc li gor deverên ku hoz lê rûdiniştin parkiri bûn, wek: Amka, Şêxa, Biya, Şikaka. Warên van hozan piraniya deverên

[1]- Kovara El-Hîwar: Hejmar 5-6, sal 1994.

çiyayî ji Çi.Kurmênc digirtin. Deverên başûr rojava jî, yanê Xastiya û Heştiya, ligel deverên deşta Cûmê û Çiyayê Lêlûn, çend komehozên Kurdî yên din lê rûdiniştin, wek: Dina, Şerqî, Milî, Goçer, Rojkî, Bêskî, Kosî, Xaltî…, û hd, [**Nexşe 9**].

Emê di lêkolînên vê beşê de, li ser rewşên civakî û dîrokî yên hozên navça Çi.Kurmênc rawestin, giringî û rola wan hewaldin û berztirîn malbat, rêber û peyayên wan yên berê û niha jî bidin nasîn.

Di vê navberê de, pêwîste were zanîn, ku lidûhevhatina hozan di lêkolînan de, dê ne li gor giringiya her hozekê be.

# Hoza Reşî(Rewşwan)

Reşî, hozeke Kurdî ye mezin e, ew ji gelek binehozan pev dikeve. Warê wê di navbera navça Kilisê li başûr, çiyayê Gewr û Na.Qûnyayê li rojava, Meletiyê li bakur û Semsûrê li rojhilat de ye.

Rojhilatanasê Rûsî Lêrx di rûpela 60î de ji pirtûka xwe wiha li ser wê hozê dibêje: Ew hoza Badvîlî ye, ku bi navê Reşwan tê nasîn, belkî ew hoza ku Nêbûr li sala 1774an li ser deng kiri bû bi xwe be jî, wî goti bû ku 12000 konên wê hene. Li dema Nêbûr, ew hoz li havînan diçû Sîwasê û li zivistanê jî dihat li derdora Helebê datanî.

Her du bira Rasil, li sedsala hejdehan gotine, ku Reşî Kurdine goçeber in û mirovine baş in, ew li zivistanê tev pezê xwe ji Erziromê berve başûr diçin, û ra digihên Şamê û derdorên dawiya çemê Ferêt, û li havînê jî vedigerin navçeyên bakurê Helebê, /rûp 150-219/.

Gelek malbatên Reşî li hin gundên deşta Cûmê û Çi.Lêlûn hene, wek gundên: Bircê, Kurzêla Cûmê, Qîbarê, Turindê, Ebû Ke'bê, Gundî Mezin….û hwd. Reşî li navçeyên Hêrim û Idlibê jî hene, mîna mala Bermede û Henano. Nofên Reşî yên mezin li navça Ezazê jî hene, wek li: Ezaz, Soran, Kidrîş, Tilalîn, Keferĝan, devera Çoban Begê, Dûdiyan, Şêx Kêf, Qere Koprî, Ĥercelê, qere Mezre'e. Li navça Babê jî li gundên Ebû Gelgel û Borazê, û li navça Sifîrê jî li Til'eranê û Til 'Elemê hene.

Li roja me, rêberên Reşiyan yên navdar li aliyê Sûryê ji Çi.Kurmênc mala Hec Omer in, ew li Dêrsiwanê û li gundên derdorên wê rûdinin.

## - Mala Ĥec Omer[1]

Navsalên mala Hec Omer dibêjin, bapîrên wan berî dora 450 salî, ji derdora bajarê Qûnyayê hatine. Ew li destpêkê li gundê Kêla, yan jî li Qocanliyê (wek nivîskar Qadirî di dîroka Kilisê de dibêje) rûniştine. Wê malbatê li sedsala hejdehan serkêşiya hoza Reşî li deverên Kilisê û Cûmê dikir.

---

[1]- Jêderên li ser vê malbatê: Pirtûka "Dîroka Kilis" a Qadirî. Evdile Axa Hec Omer. Lêpirsîn ji gundiyên ku pê dizanin.

Qadirî di rûpela 72an de ji pirtûka xwe "Dîroka Kilisê" dibêje: Ku Hec Omerê Reşî, hin bi hin hêzdar bû, û li sala 1743an wek derebekekî binavûdeng li Çi.Kurmênc derket meydanê, wê hîngê dewleta Osmanî derebegîtiya Çi.Kurmênc radestê kir û ra mirina wî di destan de ma, û pişt re kurê wî Mihemed Axa li şûna wî rûnişt.

Li wan deman, Mihemed Axa li gel hezar siwarî ji Çi.Kurmênc, di pevçûna Baxdadê de beşdarî bû û tê de bi serket, û ta mirina wî li ser derebegîtiya xwe ma û bi camêrî serkêşiya hoza Reşî kir.

Wek adetê, piştî mirina wî, kurê wî Welî Axa şûna wî girt. Welî Axa siwarekî dilêr û nîşandar bû, van salixan kir ku ew di demeke kin de bibe xudanê hêzê li Çi.Kurmênc û li hember destlata Osmanî û li dijî fermanên wê bisekine.

Li sala 1823an, Îbrahîm Paşayê Entabî hakimê Kilisê bû, wî xwast destlatdariya xwe xortir bike, loma jî, û da ku Welî Axa ji meydanê rake, serbazên xwe ajotin ser Çi.Kurmênc, lê ew di pêvçûna bi Welî Axa re bi ser ne ket. Wê yekê hîşt ku dewleta Osmanî xema Welî Axa bixwe, û kar bike da ku ji meydanê rake, û ji wê hîngê de serbazên dewletê herdem li dû wî bûn, ta li dawiyê neçar bû ku tevgera xwe rawestîne û xwe ji ber çavan bide alî.

Wê çaxê, dewletê destê xwe danî ser arzûyên Welî Axa, û ew radestî encûmena Kilisê kirin. Lê belê li sala 1836an, jina wî Zêneb Xatûn çû serdana encûmena Kilisê û jê re xuya kir, ku beşek ji arzûyên Welî Axa yên wê ne, û herwiha hin arzû lê vegerandin.

Li wê demê Welî Axa, xwe li ba dostekî xwe yî paşe veşarti bû. Wê hîngê ew di pêşbirkeke salane ye çekan de (Sîlehşor), bi navekî ne nas tê de beşdar bû û pileya yekê stand, wê çaxê dostê wî navê wî yê rast xuya kir, û ji Sedirê E'zemê Osmanî (Serek Wezîr) lêborîn ji Welî Axa re xwast. Sedir El-E'zem li ser daxwazê erê kir, lê belê, lê birî ku hîrişekê bibe ser Êzdiyên Şengalê, Welî Aĝa jî ew hêriş bi serkeftin bir serî[1]. Û piştî ku Welî Axa vegerî Kilisê,

[1]- Ew hêriş di dema siltan Ebdilmecîd de bû (1839-1861). Di wê cengebarê de, wî du jinên Êzdî yek ji xwe re û yek ji kurê xwe Lutfî Axa re anî, navê bûka wî Gulê Xatûn bû. Guman heye ku ew keç ji malbata Mîrza begê yan xûşka wî bû. Mîrza beg Mîrê Êzdiyan û li sala 1894an jiyana xwe ji dest da.

dewletê ew şand wîlayeta Şamê da şerê Dirûzan bike, ew di wê ustubariyê de jî bi ser ket û serkeftî vegerî Kilisê.

Wê hîngê, fermana Siltên derhat, û hukmê Kilisê ta mirinê da dest Welî Axa. Lê belê wî tenê deh salan hukumdarî kir, û li sala 1853an ji cîhanê bar kir. Welî Axa di wan salan de, hukumdariyeke baş kir, û bîranîneke baş di dilê şêniyê Kilisê de hîşt.

Çar law li şûna Welî Axa man: Lutfî Axa, Mihemed Axa, Mecîd Axa û Xelîl Axa. Li dema mirina wî, helbestvan Ĥeqî Efendî bi vê helbestê ew verê kir. Emê deqa wê bi Tirkî dînin, û li bin jî wergera Kirmancî bêjin:

*Deqa Tirkî:*

*Seri bevvabi dergahi mualla hec Omer zade*
*Cihanda kamiranlik hayli dem sürmüştü bî perva*
*Melai ziri destanî melce olmuştu mesakine*
*Nevali her vakitta herkese mebzul idi hakka*
*Dokundu gülistani ömrine badi hazan âhir*
*Kuruttu berkii bari işini doktü, yere heyfa*

*Akittim abi çeşmim soyledin mucemle tarihin*
*Irüp fevze cinane nail oldu hem veli âĝa*

*Sal: 1269g*

**Wergera Kurdî[1]:**

**Dergeha wî herdem bilind bû Hec Omer Zade**
**Li cîhanê destlatdarekî bêtirs bû**
**Wek ''Mileyî Cizîrî'' dibêje mala belengazan bû[2]**
**Herdem her tişt ji bo rastiyê dida**
**Gulên gulistana temenê te mîna dawiya payîzê çelmisîn**
**Mixabin, pelên xwe çelmisîn û weşîn**
**Bi cameriya te kanî diherikîn**
**Te bihuşt qezenc kir Welî Axa**

**Sal: 1269g/1852z**

[1]- ji wergera Erebî ya Endezyar Hemîd Dede ji Gu.Qtmê ye, wergera Kurdî jî ya xudanê pirtûkê ye.

[2]- Mileyê Cizîrî helbestvanekî Kurd î binavûdeng e, wî bi Kurdî dinivîsî, ew di navber salên (1570-1640) de jiyaye, û li Cizîra Bota ji dayîk Bûye. Guman heye ku Ĥeqî Efendî Kurd bû, û helbestên Cizîrî jî dizanîn.

Piştî mirina Welî Axa, kurê wî Xelîl cihê wî di nava hozê de girt. Di civîna yekê de bi gernasên hoza xwe re li Kilisê, wî kargêriya derebegîtiyê damezrand, hêzek ava kir û aleke taybet jî ji xwe re rakir. Di çûnhatinê de bi sedan siwar vê re bi rê diketin, û aldar li gel pufkerên tirombêtê li pêş dimeşîn. Xelîl Axa di demek kin de bû xudanê şorê li Kilisê, wî mirov dixistin girtîgehê, berdidan, seza dikirin, vêrge dicivand... û hukmdarên Kilisê jî li gor daxwaza wî dimeşî.

Li wê demê, hejmara peyayên Xelîl Axa ên çekdar jî gihîşt hezaran û ji sînorên Entabê, çiyayê Lêlûn û Gewr de bigre û ra deşta Ezazê, hemî keti bûn bin şora wî, û xwe mîna xudan dewleteke cuda didît, û ra niha jî gotin (dewleta Dêli Xelîl) li nav şêniyê Çi.Kurmênc wek mînak tê gotin. Qişla Kilisê ya kevin, ku niha wek nexweşxana dewletê bikar tê, mal û baregeha wî bû. Û dema ku li sala 1854an Qeymiqamtî li Kilisê çê bû, û Hebîb Paşa bû qeymiqamê wê, ew ji ber destdirêjiya Xelîl Axa nikanî bi karê xwe raba.

Û herwiha pir neçû, Xelîl Axa serhildan li hember dewletê rakir. Wê hîngê, hêza Xelîl Axa gihîşti bû dora pênc hezar çekdar. Li wê demê, dewletê serbazên xwe şandin Çi.Kurmênc û li kêleka gundên Qernebiyê, Çeqela û Quzêniyê pevçûnê dest pê kir. Şer rojekê dirêj kir, lê peyayên Xelîl Axa nikanîn xwe li ber serbazên dewletê yên rahênankirî ragirtana, lewre ew têkçûn, û Xelîl Axa jî neçar bû ku xwe radestî dewletê bike. Wê hîngê waliyê Helebê ew dûrewarî Bajarê Edirnê kir.

Lê belê pir neçû, Xelîl Axa bi dizî vegerî Çi.Kurmênc, ji nû ve derebegîtiya xwe vejand û dîsa dewlet mijûl kir.

Vê carê waliyê Helebê Derwîş Ağa bi xwe, li ser serê hêzeke mezin bi ser Çi.Kurmênc û Xelîl Axa de hat. Lê belê bi riya miftiyê Kilisê Salih Efendî, ku pir ji Xelîl Axa hez dikir, kir ku Xelîl Axa xwe bê şer radest bike, tenê merca wî ew bû, ku lêborîn li dermafê wî derkeve û li navçê bimîne. Lê belê Walî sozê xwe xwar, û ew dûrewarî Gu.Qozinê li devera Edenê kir… Qadirî di pirtûka xwe de dibêje, ku Xelîl Axa li sala 1866an bi nexwaşiya Pirikê (Kulêra) mir û temenê wî 27 sal bûn. Lê mala Hec Omer dibêjin, ku ew li gundê Zilîfkê yê bi ser Mêrsînê ve ye mir, û şêniyê gund cilên wî wek

yadîgar li ba xwe hîştin, ji ber ku wan ew wek serokê hoza xwe didît.

Nêrîneke din jî heye dibêje, ku ew li gundê Qeyebaşê yê bi ser devera Îslehiyê ve ye, bi destê dewletê hat kuştin. Di baweriya me de, ev yek dê rastir be, ji ber ku destlata Osmanî kiryarên wilo li dijî rikberên xwe pêk tanîn û tê de navdar e.

Dema ku nûçeya mirina Xelîl Axa belav bû, gelek stran li derbarê wêrekî, camêrî û navdariya wî hatin gotin. Jê, ev helbest di pirtûka Dîroka Kilisê de bi Tirkî hatiye:

*Deqa Tirkî:*

*Şu yalan dünyada bir arslan yetti ...*
*doymadi Omrüne tez gündan gitt...*
*Derviş Paşa zül kader ettî Zalim...*
*Düşmana kala idin haci Omer oĝlu...*

*Odasina kara bayrak dikildi...*
*Sarayleri güldür güldür yikil*
*küldü bendi Elinî aişretin...*
*Düşmana kala idin haci Omer oĝlu...*

*odasina Kahveler kaynamaz oldu...*
*Farforî fincanler oynamaz old...*
*Helil aĝa yaylasin yaylamaz oldu...*
*Düşmana kala idin haci Omer oĝlo...*

*Odasinda arzuhallar yazilir...*
*Çatmasinda çatal kurbani yüzütü...*
*Kendisi giderse meclis bozulur*
*Kilis benim derdi Haci Omer oĝlu...*

*Arabistan olkesinde bir arslan yetti...*
*Doymadi omrüne tez günden tuta*
*Bir oĝlu olmadi yurdunu tuta*
*Ocaĝi kör giden zor Halil aĝa...*

Wergera Kurmancî[1]:

**Şêrekî ji va dunya fanî bar kir**
**Ji temenê xwe têr ne bû û zû çû**
**Derwîş Paşa Zelîl kir**
**Tu kela bû li hember dijmin lawê Hec Omer**

**Ala reş bi ser oda te ket**
**Seraya te bi ken û kîn hilweşî**
**Bingeha milet û hozê hilweşî**
**Tu kela bû li hember dijmin lawê Hec Omer**

**Qehwe li mêvanxana te nakele**
**Fîncana Ferafirî tê de nalîze**
**Xelîl niha li havîngehan nagere**
**Tu kela bû li hember dijmin lawê Hec Omer**

**'Erdĥal li mêvanxana te netên nivîsandin**
**Çengel tê de avceniyê nakin**
**Bi çûna te encûmen ji hev ket**
**Kilis derdê me ye lawê Hec Omer**

**Şêrekî ji welatê Erebistanê bar kir**
**Ji temenê xwe têr ne bû û bar kir**
**Zaro jê ne bûn û çû**
**Korûcaq çû Zor Xelîl Axa[2]**

Bi mirina Xelîl Axa, stêrka mala Hec Omer vemirî, bira û mirovên wî toşî çavsoriya dewletê bûn, rola wan hat birîn û ew bi xwe jî vekşîn gundên xwe yên ku niha li her du aliyên sînorê Sûryê û Tirkiyê ne. wê hîngê, rêbertiya wê deverê ket destê Şêx Sim'el, ew jî mirovekî oldar bû, ji binehoza Biyan ji Reşiyan bû û zavayê Xelîl Axa bû.

Lê belê, piştî şerê Cihanê yê yekê, gava ku Firensî ketin navça Çi.Kurmênc, mala Hec Omer li dijî wan sekinî. Û dema ku Ibrahîm Henano şoreşa xwe li dijî Firensiyan rakir, gundên Hec Omeriyan ji

---

1- Bavê min ew wergerand Kurdî.

2- Jê re Dêli Xelîl jî dihat gotin, yanê (Xelîlê dîn), xuya bû ku Osmaniyan ew nav ji nerindî  lê kiri bû, lê ew li nav gel bi "Zor Xelîl Aĝa" dihat nasîn.

peyayên Henano re vekirî bûn, çinkî Ibrahîm Henano bi xwe jî Reşî bû, û pêwendiyên mirovantiyê di navbera wan de hebûn.

Li wê çaxê, pevçûneke çekdar di navbera serbazên Firensî û çekdarên Henano de li geliyê Çêlbawîrê li devera Hec Omeriyan rabû. Û ji ber wan sedeman, hin merovên mala Hec Omer ji hêla asayîşên destlata Firensî de hatin binçavkirin. Li destpêkê, Mecît Axa û Sebrî Axa neviyê Lutfî Axa hatin girtin. Mihemed Diran jî dûrewarî bajarê Hemayê bû. Pişt re Xelîl, Mihemed û Mecît Axa jî penaberî bajarê Edirnê li Titrkiyê bûn.

Têkliyên xort di navbera rêberên mala Hec Omer û rêberên Kitla Wetenî de li Helebê hebûn, wek Se'della Cabrî, Reşîd Kîxya û hin din jî.

Li gor gotina Evdille Axayê Hec Omer, li dema hukumeta Fîşî ya Firensî li sala 1940î, civîneke welatperweran li Helebê li mala Mihemed Berî hat girêdan, Evdille Axa jî lê amade bû, di civînê de doz li serbazên Sûrî yên di nav artêşa Firensî de bûn, hat kirin daku wê artêşê berdin û tev rêzên welatperweran bibin.

Li dema tevgera Mirûdan jî, piraniya mirovên mala Hec Omer bi wê re bûn, û li dijî Firensiyan sekinîn, û hin mirovên wan tev mirûdan jî bûn, tenê Cemîl Axa kurê Sebrî Axa, ji ber kiryarên ne durust ên şêxê Mirûdan bi mirûdên xwe re, wî Şêx bi sîxurtiya Tirkan gunehbar dikir û li dijî wî disekinî.

Mala Hec Omer Mislimanên Sunne ne û li ser rêola Henefî ne. Helwesta wan ji olên din, wek Êzdiyan, pir rind bû. Di dema qirkirina Ermenan de jî, Hec Omeriyan gelek ji wan parastin û jin jî jê birin.

Ji aliyê hilbijartinan de, Hec Omerî yekser di hilbijartinên Sûryê de beşdar ne dibûn, di hilbijartinên destpêkê de, wan dengên xwe didan rêberê hoza Şêxan û alîgirê Mirûdan Husên 'Ewnî. Pişt re, ew li kêleka mala Robarî û mala Cirûsan a Şikakî disekinîn.

Pêwendiyên zavatiyê di navbera mala Hec Omer û gelek malbatên Çi.Kurmênc ên naskirî de hene, mîna Malên: 'Umê, Hesenefendî rêberên Heştiyan û Gênc. Diya Zor Xelîl Axa jî ji begên Entabê bû.

Ji rêberên mala Hec Omer li aliyê Tirkiyê, li destpêka sedsala bîstan, mala Milĥim Zade û Mûrad Axa Hec Omer li gundê Qernebiyê bûn.

## - Mala 'Umîkê

Navsalên malbata Mala 'Umîkê dibêjin, ku ew bapîrên wan berî dora çar sed sal destlatdarên Meraşê bûn. Piştî ku ew li pêş dewleta Osmanî rabûn, ew neçar bûn ku warê xwe berdin, û hatin li deverên çiyayên Kurmênc, Gewr û deşta Hemqê bi cih bûn.

Ev malbat bi bapîrê xwe yê navdar 'Umîkê Kalê yan Kal Axa tê nasîn. Wî bi hişmendî û dilêrtiya xwe, destê xwe danî di ser gelek nofên hozî li navça Çi.Kurmênc û destlateke xwe ya herêmkî di sersiya dewleta Osmanî de ava kir. Lê pir ne çû, li destpêka sedsala hejdehan, Osmaniyan bi alîkariya hoza Şêxan ew destlat wêran kir. Wê hîngê, malbata Kal Axa li deverên derdor belav bûn, hinek jê jî li cihê Gu.Sêwiya yê niha man.

Piştî ku 'Umîk Axa mir, kurê wî Xelîl Axa şûna wî girt, lê dijmantiya wan bi dewleta Osmanî û hoza Şêxan re venemrî.

Piştî wê, Ehmed Axa rêbertiya Malbatê wergirt, wî mirovên xwe yên ji mala Qilîç li çiyayî Gewr, Hec Omer li Kilisê û Hesen Efendî li Heştiya li dora xwe kom kirin, û bi destlata Osmanî ya herêmê û alîgirên wê ji hoza Şêxan re ket nakokiyan, gelek pêvçûn di navbera her du aliyan de li geliyê Tîra û deşta Kitxê rabûn. Lê li dawiyê, serbazên dewletê hîrişek mezin birin ser Gu.Sêwiya û dora 40 mirovî jê kuştin, hîn gorên hinekan ji wan li Gu.Sêwiya ne, û dîroka destpêka sedsal nozdehan li ser nivîsandî ye.

Wek tê gotin, di encama wê têkçûnê de, ji bilî jin û zarokan tukes di gund de nema. Yên reviyan jî li deverên Şiyê, deşta Cûmê û gundên Gorda û Aqîbê bicih bûn. Maline wan en nasdar li Bajarê Degirmanqurşê (Rîhaniyê) jî hene, û mala Kalê li Gu.Qerqaniya ku bi ser Hemayê ve ye, û Mala Paşê li Niblê jî ji wan in.

Ji zarokên Ehmed Axa, tenê zarokekî şîrmij xweş ma, navê wî Mihemed bû. Mirovên wî ji mala Hesen Efendî ûû Hec Omer, û Xalanên wî ji mala Qilîç li çiyayê Gewr li wî bûn xudî, wan mêr û mewdan jê re şandin, û maleke mezin mîna keloşkekê jî jê re ava

kirin, ew mal ra sala 1980î hebû. Û bi wê yekê, Mihemed warê malbata xwe û destlata bavê xwe vegerand û dîsa şên kir.

Piştî mirina Mihemed Axa, kurê wî 'Umîk (Umer) bû rêberê malbatê. Wî jinek ji mala Hesen Efendî ji xwe re anî. 'Umîk Axa mirovekî hêmin bû, li karûbarên mirov û malbata xwe miqate bû, loma jî ew dewlemend bû, û aşek û meyxanek jî li ser ava Kitxê ava kirin. Di riya dandina jinan re, pêwendiyên wî yên mervantiyê bi malbatên navçê yên mezin re jî, mîna malên Heyder Axa, Gênc û Êmir ji hoza Amkan, xort kirin.

Sê gor li nava mezelê gundê Sêwiya hene, paşnavên wan (Hec Omer) e, li ser kêlikên wan goran wiha hatiye kutan: 1-Mihemed kurê Qasim Axa Hec 'Umer zade mirina wî (6.ş.1223g/1808z). 2-Ehmed kurê 'Umer Axa Hec 'Umer zade, mirina wî (1225g/1810z). 3-Zîzê diya Ehmed Axa mirina wê 1225g. Mala 'Umîkê dibêjin, ew di şerên bi hoza Şêxan û bi serbazên Osmaniyan re hatin kuştin. Ew dîrok li dema serhildana Welî Axa Hec Omer li hember dewleta Osmanî jî tên.

Goreke din li nav goristana gund heye, li ser kêlka wê wiha nigirkiriye: “Xudanê vê gorê şehîdê pevçûna Bilbilê ye”. Wekî ku tê zanîn, pevçûna Bilbilê jî li destpêka sedsala nozdehan, li nêzîk bajarokê Bibilê, di navbera hozên Şêxan û Biyaniyên Reşî de bûye, û tê de rêberekî Şêxan bi navê Bekir Axa hatiye kuştin. Li wê demê, mala Hec Omer û mala 'Umîkê piştgirên hev bûn.

Goreke din jî li goristana Gu.Sêwiya heye, li ser kêlikên wê wiha nivîsandine: “Îbrahîm Axa, mirina wî 1234g/1818z”. Şêniyê Sêwiya ji me re gotin, ku ew jî ji kalikên wan e.

Li dawiyê em dixwazin bêjin, digel ku hinek ji mala 'Umîkê dibêjin ew ji hoza Milî ne, lê nêrîna ku bêtir cih digre, ew e ku ew ji binehoza Biya û ji hoza Reşî ne[1].

---

[1]- Rêzdar Endezyar Mihemed Misto ji mala 'Umîkê dibêje, hoza wan Mila ye. Lê navsalên ku me jê pirsîn, û endezyar Beĥhrî Ehmed jî ku ji mala Umîkê ye, dibêjin hoza wan Reşî ye, ne Milî ye.

# Hoza Amka

Amka, hozeke kevin û mezin e li Çi.Kurmênc. Mirovên wê bi dilsozî, rastgoyî û mêraniya xwe navdar in. Warê wê hozê çiyayê Hawarê û gundên li derdora wî ye. Gundine Amkî yen din jî li devera Şiyê û li Bakurê deşta Hemqê hene. Lê di demên teng de, Çi.Hawarê û keloşka wî, baregeha Amkiyan a sereke bû.

Rêzdar Wesfî Zekeriye di rûpela 673an de li derbarê hoza Amka dibêje, ku ew li demên berê li ser sînorên Faris goçeber bûn, pişt re, Siltan Selîmê Osmanî ew ji wir rakirin û li deverên Çi.Kurmênc bi cih kirin, lê belê ew navê vê hozê bi şêweyê “ 'Emîqî ” dinvîse.

R.Lîsko jî li derbarê wê hozê di rûpela 56an dibêje: Ew hoza tewir kevin e li Çi.Kurmênc. Ew nofek e ji bineola Qizilbaşî “ Şî'e ”, û paşê bûne Sunnî. Guman heye, ku ew ji derdora sedsala hevdehan de li Çi.Kurmênc bicih bûne, û mirovine wan li Dêrsimê jî hene.

Mala Şorbe jî, ku niha ji malmezinên Amka tên jimartin, li ser hebûna Amkiyan li Çi.Kurmênc, ji R.Lisko dûrtir derin û dibêjin: Gava ku ew li gel keriyên pezê xwe yê Fîlik, li navîna sedsala şanzdehan hatin li rûyê başûrê Çi.Hawarê danîn, mirovekî Amkî bi navê Çamo li Gu.Sêmalka rûndinişt, û destê xwe danî bû ser tevahiya wê deverê. Li destpêkê, ew mirov razî ne bû ku mala Şorbe li wir dîne, û mêrên xwe şandin da ku wan ji wir rakin, lê mala Şorbe bi camêriya xwe kirin ku Çamo razî bibe ew li deverê bimînin, û warê Mirêşa “gu.Şorbe yê niha” da wan, hinek ji wan jî çûn li Gu.'Emara rûniştin.

Li derbarê wateya navê “Amka” jî, di pirtûka /Mediya, ya Diyegonof, rûpel 153-154/ de hatiye, ku “Amka” mîrîtiyek bû li welatê “Zamwa” , çiyayê Cûdî jî di nav de bû. Ew Mîritî li sala 883an b.z, toşî hêrişa Aşûran bû, kela wê hat hilweşandin û bi dehan mirovên wê hatin kuştin, yên man jî mişext bûn.

Ji bilî wê, navê Amkan nêzîk navê “Mamikan” e, ew jî hozeke Kurdî ye mezin e, warên wê li derdora gola Wanê û Çi.Araratê ne. Lêkolînvan li derbarê wê dibêjin, guman heye ku ew hoza ji koka xwe de Ermen be, û paşê bibe Kurd /Emîn Zekî/. Wekî ku tê zanîn, Kurd jî carina tîpa ‘M’ bi ‘A’ diguhêrin, û vajayî wê jî dikin. Taybetiyeke roja Yekşemê li ba Amkiyan heye, ew jî hîn gumana

tamarên Amkan ên Fileh ên kevnar xortir dike. Amkî bi xwe jî dibêjin, mirovên wan li deverên gola Wanê û li bajarê Beyazîdê hene.

Li sedsalên hevdeh û hejdehan, mala Dîkê rêbera hoza Amka bû. Lê piştî ku serkêşê wê Cîhangîr hat kuştin, rêbertiya hozê kete destê mala Êĥûka. Li wê demê, deverên ku di navbera Kilisê û deşta Hemqê de ne, hemî di bin destê Amkiyan de bûn.

Di sedsala nozdehan de jî, pevçûnên dijwar li ser rêbertiya hoza Amka di navbera her du malbatên Amkî de ku wê hîngê sereke bûn, Êmir li Gu.Qizilbaşa û Şorbe li Gu. Şorbe, rabûn.

Di pevçûnên ku li nîvê yekê ji sedsala nozdehan di navbera hoza Şêxan û Biyan de dibûn, Amka li kêleka Biyan disekinî.

Piştî ku Osmanî ji vî welatî çûn û Firensî hatin, Amkî li dijî wan sekinîn, ew hoza yekê bû ku bi rêbertiya Seydê Dîkê, Ehmedê Rûtê û Eslan Aĝayê Şorbe komikên çekdar ava kirin, û şerê "cihadiyê" kirin. Li wê demê gelek pevçûnên çekdar di navbera wan û serbazên Firensî de derketin û pir qurbanî jî ji her du aliyan ketin.

Li dema hêginiya pirsa senceqa Iskenderonê di navbera dewleta Tirkiyê û Sûriyê de, kemalîstên Tirk xwestin Amkiyan bi aliyê xwe xin, wan li sala 1938an kumên ku şana Ataturkiyê bû, ji Seydê Dîkê re şandin, daku li ser şêniyê navçê belav bikin, û ji Firensiyan re xuya bikin, ku ew mêldarê Tirkiyê ne, lê Sydê Dîkê bi alîkariya Firensiyan ew kum li ser sergoyê gund şewitandin.

Mala Dîkê, wekî ku rêberên Amka bûn, û zavayên mala Şêx Sim'el bûn, li dijî tevgera Mirûdan jî sekinîn.

Li derbarê rêberên hoza Amka, ew rêbertî di navbera du sed sal de, wiha di navbera du malbatan de diçû û dihat:

**1**. Li dawiya sedsala hevdehan: Rêbertiya hozê di destê mala Dîkê û serokê wê Cîhangîr de bû. Cîhangîr bi destê mirovekî ji Gu.'Edema hat kuştin. Hîn şûnewarên mêvanxana mala Dîkê ya wê demê li Gu.Dîkê ye û bi Oda mala Dîkê bi nav dibe.

**2**. Li destpêka sedsala hejdehan: Rêbertiya Amka ji mala Êĥoka li Gu.Qêsim re çû. Li dema wan, dîsa serdariya Amka li ser deverên

fereh di navbera Kilisê û deşta Hemqê de hebû. Sê yan çar mirovên wan pileya Baybegîtiya Osmanî jî wergirtin.

**3**. Li dawiya sedsala hejdehan û destpêka sedsala nozdehan: Ew ji hoza Amka re demeke ne baş bû. Her du malên Êmir û Ê̂ĥûka bi salan li ser rêbertiya hozê girtin hev. Bi egera wan nakokiyan, çend mirov ji mala Şorbe li ser destê serbazên Ibrahîm Paşayê Misrî hatin bidardekirin, ew kiryar li berjewendiya mala Dîkê ku li gundên Xelîlaka û Qirigolê rûdiştin, hat, û serokatiya hozê di destê wan de ma.

Piştî ku hêzên Misrî ji herêmê kişîn, dîsa nakokiyan di navbera rêberên hoza Amka de dest pê kir. Lê vê carê di navbera mala Şorbe û Dîkê de rabûn, di wan nakokiyan de Bekir Axa bi destê mala Şorbe hat kuştin[1].

Ew rêbertiya hozê ya duserî, li dirêjiya nîvê diduyan ji sedsala nozdehan ma. Lê ji destpêka sedsala bîstan de, belkî bi alîkariya mala Şêx Sim'el a ku li wê demê bi rû bû, rêbertiya hoza Amka ji mala Dîkê re çû.

Li derbarê **Mala Şorbe**, ew li ser koka xwe ya hozane wiha dibêjin: Ew ji nêzîka 450 salî de, ji navîna Anadolê, ji welatê Heymanê hatine. Ew ji koka xwe ya hozane ya kevin de Reşî ne, ne Amkî ne. Lê ji ber ku ew demeke dirêj di nav Amkiyan de rûniştine, ew bi ser wan ve tên jimartin, na belê bûne ji xanedanên Amka jî.

Malbata Şorbe bi hişkiya helwestên xwe li hember Osmaniyan navdar bû. Ji ber wê jî, gelek mirovên wê li navîna serdema Osmanî bi destê dewletê hatin kuştin. Tê gotin, ku gelek ji wan li ser girê Bîrê, ku di navbera gundên Şorbe û Germrûkê de ye, hatin bidardekirin.

---

1- Li derbarê koka navê (Dîkê), çêrok wiha dibêj: Piştî ku Bekir Axa hat kuştin, waliyê Helebê ji bo ku jiyana kurê wî biparêze, ew bir ba xwe. Û gava ku ew hinekî mezin bû, mirovên wî çûn seredana walî, û jê tika kirin ku lawê serokê malabata wan bide wan. Û gava ku wan daxwaz ji walî dikir, çend mirîşk li wan deran diçêrîn, yekî ji wan bi walî re got: Ezbenî, waliyê me, ma niha ev mirîşk bê dîk dibin? Hîngê walî kenî, û li ser daxwaza wan erê kir. Û ji wê hîngê de ji wî kurikî re (Dîk,Dîko) hat gotin, û malabat jî pê bi nav bû.

Li vê dawiyê kêlikek li goristana Girê Bîrê derket, ew nivîs li ser hebû: “Bîlal Şorbe”, Ew kes bi xwe jî berî dora 250 salî miriye. Kêlikeke din jî li ba mala Şorbe heye, ya Mihemed Emîn Axa ye, dîroka mirina wî jî 1230g/1814z ye.

Li navîna sedsala nozdehan, Mamad Axa mirovê mala Şorbe yê herî navdar, lingê xwe li yê Xelîl Axayê mala Hec Omer digirt. Lê belê ew di nakokiyekê de li ser zeviyan bi gundên derdorê re hat kuştin, û tenê lawekî deh salî jê ma.

Ji neviyên Mamedê yê herî navdar Eslan Axa bû .Eslan Axa di gelek şerên Qiwayê Millî (Çete) de li dijî hêzên Firensî beşdar bû. Û piştî ku şerê serhildêrên Kurd li dijî Firensiyan li Çi.Kurmênc rawestî, Eslan Axa xwe avêt aliyê Tirkiyê û gava ku lêborînek tevahî ji hêla Firensiyan de derket, ew vegerî gundê xwe, lê belê ew û birayên xwe tev Tevgera Mirûdan bûn, ji ber wê jî Firensiyan biryara bidardekirinê pê stand, loma jî ew neçar bû dîsa derbas Tirkiyê bibe û li ba serokê senceqa Iskenderonê bû mêvan. Lê piştî ku biryara lêborîna sala 1942an ji hêla Firensiyan de derket, ew dîsa vegerî gundê xwe û li sala 1959an jiyana xwe ji dest da.

Jineke navdar jî ji mala Şorbe derket, navê wê Emîna Şorbe bû[(1)].

Berztirîn mirovên **mala Êmir** jî li destpêka sedsala bîstan Omer Aĝa bû, pişt re her du kurên wî 'Elûş Û Midewer derketin. Midewer alîgirekî xort bû ji Mirûdan re, û dijîtiya destlata Firensî li Çi.Kurmênc kir.

Bi tevahî, em kanin rêberên Amka yên li destpêka sedsala bîstan navdar bûn, wiha rêz bikin: Seydê Dîkê û birayê wî Henan Axa li Gu.Qêsim, mêvanxana wan li gundê Dîkê bû, ew li sala 1903an hatiye avakirin. Eslan Axa Şorbe ji mala Şorbe. 'Elûş Axa Êmir li gundê Qizilbaşa. Elî Axa û Bekir Axa li Gu.Senarê. Xelîl Axa Duşêr, Ehmed Axa û 'Elûş Axa li Şiyê. Ehmedê Rûtê û Henan Axa li Gu.'Emara.

Mirovên hoza Amka, pergal û salixên xwe yên netewî bi şêweyekî pir zelal parastine. Ew di warê rêzanî û xebata ji bo mafên

---

[1]- Wê jinê mirovekî eşqiya girt, û bi darê ve bidar xist. Ew dara merxê hîn li ber gund e.

gelê Kurd de navdar in. Ji wan Horîk Ehmed û Tayîrê Silêmanê Seydê Dîkê baş naskirî ne. Tayîrê Dîkê, ji sala 1973an ra 1981an, du caran li pê hev ji ber Tevgera siyasî ya Kurdî ve di hilbijartinan de bi ser ket, û bû endamê encûmena Parêzgeha Helebê. Ji mala Êmir jî wêjevan û nivîskar Heyder Umer heye.

Ji bilî wan, bi sedan xudî dêplomeyên bilind ji Amkan hene. Parêzer Esmet Umer Şorbe, siyasetvanekî naskirî ye, û demek dirêj di biryargeha Partiya Komonîst a Sûrî de bû, û bû endamê ecûmena gelê Sûrî jî.

Gundên Amka li derdora Çi.Hawarê ev in:

**Çobana, 'Elendara, Kêla, Gu.Kerê, Qota, Bîbaka, Qaşa, Qorta, Kotana, Qizilbaşa, Gu.Bêlê, 'Upila, Zerka, Zivingê, Qirigolê, Gu.'Eşûnê, Gu.Dîkê, Avrazê, Gu.Çiyê, Gu.Şêx, Şêx Bila, Gu.Çêqilme, Ĥesen dêra, Gu.Şorbe, Gu.Qêsim, 'Emara**.

Amkî li gundine dun jî hene, wek:

**Bajarokê Şiyê, Senarê, Anqelê, Erendê, Çeqelê Jorin (Salên), Til Silorê, Hec Bilêl, Gundî Xelîl, Kokanê Jêrin, Mistika, Şiketka**.

# Hoza Şikaka

Şikak ji hozên Kurdan ên kevin û mezin e, ew hoz li seranserî Kurdistanê navdar e [(1)]. Jê li Êranê, Êraqê, Sûryê û Tirkiyê heye. Navê hoza Şikaka bi serhildanên li dijî dewletên Osmanî û Êranî tê nasîn. Rêberê wan yê gernas Simko Axa, li destpêka sedsala bîstan, şoreşeke gewre ji bo damezrandina dewleteke Kurdî li navçeyên Kurdistanî li Êranê, Tirkiyê û Êraqê rakir, lê Rûsan pûştî lê kir, şoreşa wî têkçû, û ew bi xwe jî bû qurbana xinaniya hin Kurdan û bêbextiya destlata Êranê.

Warê Şikaka li navça Efrînê li aliyê wê yê herî rojhilat e. piraniya gundên devera Şera Şikakî ne. kendûkorên devera wê sirtî ne, lê ew sirt ne bilind in, û ji gelek cureyên çandiniyê û darên bi ber re dibin. Sînorên hoza Şikaka wiha ne: Ji bakur de deverên hozê Biya û Reşî, ji rojhilat û başûr de Amka, li başûr devera Cûmê, ji rojhilat de jî digihê navçeyên Kilis û Ezazê.

Gundên devera Şikaka 36 in[(2)], ew jî ev in:

**Diraqliya, Şera, Xirabî Şera, Dêrsiwan, Qestela Kîşik, Qestela Elî Cindo, Qitmê, Keferomê, Hilûbiya Biçûk, Hilûbiya Mezin, Qurtqulaqa Çûçik, Qurtqulaqa Mezin, Meydankê, Qerqîna, Zêtûnekê, Çema, Kortikê, Metîna, Naza, Şêxûtka, Gemrûk, Qeredepe, 'Erebwêran, Sînka, Meşalê, Serê Kaniyê (kefircenê), Baflûnê, Kefermizê, Omer Simo, Omera, Alciya, 'Elîqîna, Gabeleka, Gundî Dêwrîş, Me'riskê.**

Çend gundên Şikakî li devera Şiyê jî hene, perçak ji bajarokê Şiyê bi xwe bi Şikaka bi nav dibû.

Warê hoza Şikaka yê destpêkê li Çi.Kurmênc Xirabî Şera bû[(3)]. Şikakiyên Çi.Kurmênc dibêjin, ew gund ji destpêka sedsala 15an

---

[1]- Qiralê Aşûrî Tîglat Blazir, di rojnama bûyerên sala 738an b.z. de dibêje, ku di navça "Oşkakan" re derbas bûye. Guman heye ku ew navçe geliyê çemê "Qereso" be, /Diyagonof, rûp193/. Qereso jî çemekî biçûk e tê ser Ferêt. Hîn hoza Şikêk li wan deveran û li Rojhilata wir dijî.

[2]- Rojê Lîsko dibêje gundên Şikaka 39 ne.

[3]- Gelek şikeft û zêrzamîn li Xirabî Şera hene, hinek ji wan ra roja îro hene, ew ji bo rûniştinê û paşê jî ji bo dewêr dihatin bikaranîn.

şên bûye. Bapîrê wan ê tewir kevin ku tê bîra wan jî, bi navê Dûmir yan Dûbir bû.

Piraniya Şikakiyan niha Îslam in û li ser rêyola Henefî ne, lê hîn çend gundên devera wan li ser ola Êzdî ne.

Li piraniya demê, têklî di navbera hoza Şikêk û dewleta Osmanî de ne baş bû, û gelek bûyerên çekdar di navbera wan de rabûne.

Carina pêwendiyên wan bi Cîranan re jî li hev diket. Li sedsala nozdehan di navbera wan û hoza Amka de nakokî rabûn, di encamê de Şorbe Axa bi destê mirovekî Şikakî hat kuştin(1) û guman hebû ku destê waliyê Helebê yê Osmanî tê de hebû.

Lê têkliyên Şikakan bi hoza Reşî û mala Hec Omer re baş bûn. Ehmed Axayê Şikakî zaveyê Xelîl Axayê Hec Omer bû(2).

Û ji ber ku gelek Şikakî ji koka xwe de Êzdî ne, pêwendiyên wan bi Êzdiyên Cûmê re baş in.

Hin ji mirovên Şikakî, mîna Osê Ĥebo, bi camêriyê hatine naskirin, û ji bo wê yekê Osmaniyan Kurkekî Begîtiyê diyarî wî kir, lê wî jî ew diyarî Axayên xwe yên Şikakî kir(3).

Di nav Şikakiyên Çi.Kurmênc de nîşan "Paşe" jî hene, xuya ye ew nîşan li destpêka sedsala hejdehan ji dewletê wergirtine.

Ji malbatên Şikakî yên ku roja îro navdar in, malên: Çirûsa, Xelbaş, Hemkulekê/Topel Hemo û Ĥemdoş.

Ji destpêka sedsala nozdehan de, Mala Çirûsan serkêşiya hoza Şikêk li navça Çi.Kurmênc dikin. Rêberê wan ê yekê Elî Begê Kor Osmên bû. Di dema wî de, gelek nakokî di navbera hoza Şikêk û hozên Kurdî yên cîran de derketin, mîna mala 'Umîkê, Şorbe û şêniyê deşta Hemqê.

Elî Begê vêrge ji destlata Osmanî re ji Kilis û Helebê distand(1), û çiqasiya wê vêrgê jî bi nav dikir(2).Lê gava ku destê wî dirêj bû, wî

1- Li navîna sedsala nozdehan, mirovekî Şikakî li mala Şorbe qehwecî bû, wî Şorbe Axa kuşt.

2- Ji ber ku Ehmed Axa para xwe ya ji zad neda Xelîl Axa, wî mêvanxana Ehmed Axa şewitand, lê paşê wek lêborîn, rabû paldûza xwe da Ehmed Axa.

3- Dibêjin wî kurk sparte Elî kurê Kor Osmên, û ji wê rojê de bû Elî Beg.

setemkarî li xelkê kir[3], ji ber wê yekê, belkî jî ji ber ku rola wî li ba Osmaniyan bi dawî hati bû, waliyê Helebê ew girt û biryara bidardekirina wî derxist, lê paşê lêborî û li şûnê sezaya bidûrxistinê dayê û ew dûrewarî Misirê kir. Elî beg pênc salan li Misirê ma, û pişt re vegerî gundê xwe. Piştî wê demê, rola rêberên Şikaka pir kêm bû.

Ji mirovên Şikakî yên gernas li nîvê yekê ji sedsala bîstan, Menan Niyazî naviyê Elî Begê bû. Wî li dibistana Erkan Ĥerba Osmanî li Stembûlê xwend, Kurkê evseriya (Milazim) stand û li şerê cihanê yê yekê di eniya şerê Êraqê de beşdar bû. Ew li gundê xwe Sêcerazê rûdinişt, û li dawiya sedsala bîstan serê xwe danî.

Cemîl Axa Çirûsî jî, li dawiya salên bîstan ji sedsala bîstan, û ra navîna salên sihî serokê şaredariya bajarokê Efrînê bû, bazara Efrînê di dema wî de hat vekirin. Cemîl Axa li sala 1987an goç barkir[4].

Gava ku Firensî derbas navça Çi.Kurmênc bûn, rawestgeha gundê Qitmê ku li devera Şikêk e, ji xwe re kirin baregeheke kargêrî û serbazî. Pişt re wan navenda xwe ya kargêrî rakirin Gu.Meydankê, ew jî li devera Şikaka ye. Hêzeke serbazî ye Firensî li Xirabî Şera li cihê Qereqola niha jî bi cih bû bû. Bitevahî, helwesta Şikakiyan ji Firensiyan ne baş bû, lê belê ew bi wan re ne ketin nakokiyên çekdar, tenê mirovê Şikakî yê bi navê Evdoyê Xoce ji Gu.Meydankê, bû endamê Qiwaya Millî ya Kemalîstan. Lê Axeyên

---

[1]- Di şerê Elî Ağa de bi mala Şorbe re, waliyê Helebê 70ê serbaz jê re şand.

[2]- Tê gotin, ku vêrga gundê Meydankê ji 50 şimil genim rakir 100î.

[3]- Destlata Osmanî ew şand deşta Hemqê da ku xûkê bicivîne. Wî rabû kesên ku xûk ne didan girtin, bi hespan ve girêdan, û bi meşê birin Helebê. Dibêjin Walî ew kar baş nedît û biryar da ku wî li devera Şikaka li ser Çi.Parsê bi dar deke, lê belê ji dêvla bidardekirinê, ew dûrewarî Misirê kir. Û piştî ku ji dûrewariyê vegerî, ew nexwaş bû, naxwaşiya wî dirêj kir, canê wî maşî û tenê çavên wî di serê wî de dibrûsîn. Dibêjin, Ji ber wê yekê jê re gotin (Çirûsk), û paşê jî ew nav bi Erebî bû (Cilûs- Cilûsî). Hinek jî li derbarê navê (Çirûs/Cilûs) dibêjin, gava ku birayê wî yê mezin 'Umer li gundê Qîbarê hat kuştin, Elî biçûk bû û tek bû. Wê hîngê Şikakiyan gotin: Gereke em vî “Çirûskî” biparêzin, û navê Çirûsan jê hatiye.

[4]- Li sala 1935an, dema ku Cemîl Axa serokê şaredariya Efrînê bû, wî serokekî Milîsên Firensî bi navê Êĥo Zêno, berê jî çetekî navdar bû, vexwend mala xwe, û ew li verêkirinê hat kuştin, wê hîngê hat gumankirin ku destê Cemîl Axa ligel Firensiyan di kuştina wî de hebû.

Şikêk, mîna piraniya rêberên Çi.Kurmênc, li dawiyê neçar bûn ku rewşa nû û hebûna Firensiyan li navçê bipejrînin.

Sebaret tevgera Mirûdan, helwesta Şikakiyan têvel bû; Axeyên wan dijîtiya wê tevgerê dikirin, belkî ji ber wê jî li sala 1938an Gu.Qestela Elî Cindo ket bin dorpêçkirina Mirûdan. Şikakiyên ku li kêleka Mirûdan sekinîn jî, ji Şêxên Meydankê bûn.

Axeyê Şikakan li her du navçeyên Efrîn û Ezazê bi çalakî di hilbijartinên Perlemanî de beşdar dibûn. Li sala 1932an Menan Niyazî, li sala 1947an jî Henan Axa ji ber navça Ezazê ve bi ser ketin û bûn endamên Perlemanê. Li salên 1954an û 1961ê jî, Elî Ekremê Çirûsî navê xwe da hilbijartinan, lê ew bi ser ne ket. Di warê helbijartinan de, em kanin bêjin, ku herdem hevkarî di navbera mala Cirûsan û Şêx Sim'elan de hebû, belkî sedem jî mirovtiya ku di navbera wan de hebû, çinkî diya Koreşîtê Şêx Sim'el ji hoza Şikêk bû.

Mirovên Şikakî yên di sedsala bîstan de naskirî bûn, ev bûn: Meman Niyazî û Ehmed Axa li (Şera), Ehmed Axa (Kortikê), Dr.Ehmedê Çirûsî ji rewşenbîrên Kurd tê jimartin, wî li sala 1996an jiyana xwe ji dest da. Îbrahîm Xelîl Axa (Gemrûk), Cemîl Axa (Qitmê), Şêx 'Îs (Meydankê) ew di salên sihî de ji sedsala bîstan bi destê Mirûdan hat kuştin.

Bi sedema sînorên navdewletî yên ku piştî şerê cihanê yê yekê li Rojhilata Navîn hatin danîn, têkliyên Şikakiyên Çi.Kurmên ji yên deverên Kurdistanê yên din hatin birîn. Lê li destpêka sedsala bîstan, mirovekî bi navê Mîrê Zirav hat seredana Şikakiyên Çi.Kurmênc, dibêjin ew birayê Simko Axa yê biçûk bû, wî dixwast tevahiya hoza Şikêk ji bo serhildana Kurdan li dijî dewletên Osmanî û Farisî amade bikira, û dewleteke Kurdî ava bikira(1).

Lawên Şikêk baş guh dane xwandinê, û roja îro bi dehan xudanê diplomayên bilind jê hene.

---

1- Di strana Siyamend û Xecê de hatiye, ku Xec ji mala Mîrê Zirav ji hoza Şikaka ye. Lê ji ber ku demek dirêj di navbera serhildana Simko Axa û bûyerên destana Siyamend û Xecê de heye, guman ew e, ku mîrekî Şikakî yî kevintir, bi navê Mîrê Zirav hebû.

Şikakî siyasetê jî dikin, xebatkarên Kurdperwer, û Komonîst û di nav Partiya Be's de jî di nav wan de hene, Dr.Ruşdî Mixtar ji gu.Qitmê, endamê şaxa wê partiyê ye li parêzgeha Helebê û rewşenbîrekî naskirî ye.

Hejmareke mezin ji Şikakiyan barkirine Ewrupayê, nemaze Şikakiyên Êzdî ji gundê Qestela Elî Cindo.

## Hoza Robarî[1]

Li sala 1607an, serhildana Canpolatiyên Kurd li Helebê li dijî Osmaniyan têk çû, Elî Begê Canpolatî jî, wekî ku mîrê malbata Mendî yê dawîn bû, hat kuştin. Piştî wê demê, destlatdarên mîrîtiya Kilisê ji Stembûlê de dihatin binavkirin.

Li wê demê, destlata Osmanî Kurdekî li Stembûlê bi rû bû şand Kilisê û Îmareta wê radestê kir. Ew Kurd ji hoza Berwarî ji şaxê Robarî (Urballi-binavkirina Osmanî) bû[2]. Berwarî bi xwe jî ji hozên Kurd ên li Hekarî ne, /Lêrx, 46-47/.

Robarî dibêjin: Bapîrê wan ê destpêkê **Mihemed Paşayê Robarî** bû, wî kurkê Baybegîtiyê hilgirti bû û ji navça Sêrtê ji bakurê Kurdistanê bû, dibêjin jî ku hatina wî ya Kilisê ji sê çar sed salî de ye. Ev dîroka jî, li dîroka ku R.Lisko li derbarê ew Robariyê ku bûye hakimê Kilise tê, /R.Lisko, rûp 18/. Robarî dibêjin jî, ku neviyekî wî bi navê Mûse Axa kurê Qêsim kurê Mihemed Paşa kurkê Baybegîtiya Osmanî wergirti bû.

Li ber roniya tiştê ku li jor hate gotin, em kanin bêjin, ku piştî Mihemed Paşa ji destlatdariya kilisê hat rakirin, yan jî piştî mirina wî, nevî û komehoza wî li deşta Cûmê û devera Robariyan ya niha rûniştin û kela Basûtê jî kirin navenda destlata xwe, lê belê destê wan di hukumdariya Kilisê de jî hebû.

---

1- Robar bi wateya (çem) e.

2- Rojê Lîsko- Çiyayê Kurmênc û tevgera Mirûdan, rûpel 17. Di riya dostekî Robarî re jî, namak ji rêzdar Behcet Hirûrî ji Kurdistana Êraqê giha me, ew dibêje: Çar gund li navça Berwarî Bala li Kurdistana Êraqê hene jê re Robarkî dibêjin, ew jî ev in: Bêqolik, Cidêdik, Seferya, Dergelek. Ev jî gotina R.Lîsko ya li derbarê Mihemedê Robarî yê Berwarî dupat dike. Hêja ye em bêjin jî, ku Robarî navekî navça Hekarî û bajarê wê ye jî.

Di pirtûka "dîroka Kilisê" rûpela 63an de hatiye jî, ku li dema destlatdariya Elî Axayê Aşiq li Kilisê (1724-1736), Isma'îl Axayê Urballi û Ebdîn Axa li ber hakimê Kilisê rabûn, lê waliyê Helebê hêzeke mezin bi ser wan de şand û Isma'îl Axa û Ebdîn Axa hatin kuştin. Lê digel wê, Robarî li kela Basûtê nîvserbixwe man.

Li sala 1737an, nofeke Kurd ji hêla navça Qûnya hat Çi.Kurmênc, ew bi navê "Gêncî" tên nasîn. Wek xuya dibe, ew li deşta Cûmê bi Robariyan re ketin dijîtiyê û destê xwe jî danîn ser kela Basûtê, û li sala 1740î, rêberê wan Betal Axa destlat li Klilsê jî stand, /Dîroka Kilis, rûp 64/.

Lê belê di dema wî de, Kurdên Çi.Kurmênc du caran hêriş birin ser Kilisê, ketin hundurê wê, û gelek kes jê dîl birin(1). Belkî têkliya vê bûyerê bi pevçûna di navbera Robarî û Gênciyan de jî hebû. Lê belê piştî wê, guman heye ku Robarî neçar bûne ji deşta Cûmê derkevin û hilgerin devera Çi.Lêlûn ku li nêzîk Kilisê ye, û li wir bi cih bibin.

Lê belkî guman heye ku ev nêrîna jî rast be, yanê, piştî ku Robarî ji destlatdariya Kilisê hatin dûrxistin, ew dîsa li devera xwe ya berê ya kevin, ku niha lê dijîn, vegerîn. Tiştê vê nêrînê piştrast dike jî ew e, ku xaniyek li Gu.Basilê heye, li ser eniya wî wiha hatiye neqşandin: Xaniyê Xelîl Axa 1200g/1786z, ev dîroka jî li dema wan pevçûnan tê. Li wê demê, rêberên Robariyan li van gundan danişti bûn: Îse Axa li Bênê û Cilbirê, Mûse Axa li Xurêbkê û Basilê û hinek jî li bajarê Kilisê ma bûn.

Ji dûvrêziya pêkhatina bûyeran diyar dibe, ku piştî Betal Axayê Duyem li sala 1832an hat kuştin, û destlata wî li deşta Cûmê têk çû, Robariyan bêhin vedan, ji nû de meydan bi wan ma û destê xwe danîn ser hin deverên deşta Cûmê, Şêrewa û hin deverên ku şêniyê wan Ereb bûn jî, mîna: Niblê, Tininb, Dêrcimêl, Tilrifad û ra deverên ber çemê Qiwêq li bakur û rojhilata Helebê.

Li serdema Osmanî, pêwendiyên Robariyan ,bi tevahî, bi şêniyê navçeyên derdora xwe û bi destlata Osmanî re jî baş bûn.

---

1- Dîroka Kurd û Kurdistanê- Emîn Zekî, beş2, rûpel 376.

Û li dema dagîrkirina Firensiyan ji Sûryê re, Robarî di rêza welatperweran de sekinîn, rêberên wan piştgiriya partiya Kitla Wetenî û Tevgera Mirûdan dikirin.

Piştî serbixwebûna Sûryê, Robarî derbas nav gelek partiyan bûn, wek Komonîst, Be's û Tevgera Demokratik a Kurd jî.

Bi şêweyekî tevahî, û digel ku devera Robarî li ser sînorên deverên Erebî ye, lê Robariyan zimanê xwe yê Kurdî û kesayetiya xwe ya netewî baş parastin.

Roja îro, Robarî nofeke çalak e ji civaka Kurdî li Çi.Kurmênc. Piraniya wan li gundên xwe rûdinin û bi arzû û zeviyên xwe ve girêdayî ne. Lê ji ber rewşa jiyanî ya dijwar, hejmareke mezin ji Robariyên sêfîl bare bajarê Helebê kirine û lê kar dikin.

Robarî li devera ku bi navê wan tê nasîn rûdinin, û gundên wan ev in:

**Cilbirê, Basilê, Bênê, Xurêbkê, Zirêgatê, Kişti'arê, Zaretê, Dêrmişmişê.** Li deşta Cûmê jî: **Gundên Cûmkê, Kersanê, Keferbetrê,** ji bilî ku gelek malên wan li bajarê Efrînê jî rûdinin û li Gu.Celemê jî hene.

Robarî Mislimanên Henefî ne, û herdem pêwendiyên xwe bi bawermendên olên din re, wek Êzdiyan, baş bûn.

## Rêberên Robariyan:

Rêbertiya Robariyan a nû, li nîvê Yekê ji sedsala nozdehan hat meydanê. Ji rêberên wan li destpêka sedsala bîstan: Mistefa Axa û kurê wî Mihemed Axa li Gu.Bênê, Osman Axa û kurê wî Erif Axa, û Ezetê Qasim Axa jî li Gu.Cilbirê bûn. Rêbetiya wan li ser 17 gundên Êzdiyên Çi.Şêrewa û hin gundên deşta Cûmê jî hebû, mîna gundên: Turindê, Kurzêla Cûmê, Endarê, Cûmkê û gundên Ereb ên li rojhilat û başûrê devera wan jî.

Li dema dagîrkirina Firensiyan ji Sûryê re, rola Robariyan di civaka navçê de kêm ne bû, û destlatdariya wan li deverên derdora xwe jî kêm ne bû. Ji aliyê siyasî de, wan hêla tevgera welatperweriya Sûrî girt, û pêwendiyên xwe bi Partiya Kitla Wetenî re danîn. Rêberê wan Mihemed Arif Robarî, şaxek ji Partiya Kitla Wetenî li Çi.Kurmênc ava kir û bû serokê wê. Bi wê boneyê, û ji ber

pêwendiyên wî bi Se'dela Cabirî û Tevgera Mirûdan re, ew çend caran ji hêla Firensiyan de hat girtin, lê belê ew di hilbijartinên perlemana Sûryê yên sala 1947an de bi ser ket û bû endamê perlemana Sûryê.

Birayê wî Mihemed Zihnî Robarî jî, li dema yekîtiya Sûryê û Misirê, ji sala 1958an de û ra sala 1961ê, bû endamê perlemana Herêma Sûryê. Pişt re, parêzer Esmet Robarî biraziyê Erif Axa, ji sala 1973an de û li dirêjiya bîst salan, endamê encûmena gelê Sûryê bû. Robariyê bi navê Ebdilhemîd Robarî jî, ku berê evserekî artêşa Sûryê bi pileya ragir ('Emîd) bû, wî jî kursiyek di encûmena gelê Sûrî de standiye.

Roja îro destlata Sûryê bi çavekî baş li rêberên Robariyan dinêre, bi taybetî jî ji hêla morkirina di artêşê de. Ji ber wê jî, gelek evserên Robarî di artêşê de hene, ew jî rewşeke awarte ye bi taybetî qebûlkirina Kurdan di artêşa Sûryê de. Em bi awakî gelemper kanin bêjin, ku têkliyên mala Robarî bi destlatan re herdem baş bûn, ew herdem wê têkliyê diparêzin û ferehtir dikin.

Li dema niha, mezinê mala Robarî Osman Axa ye, ew jî gelek caran ji ber Na.Efrînê ve bû endamê encûmena parêzgeha Helebê.

Piraniya malbatên rêberên Robariyan çotarî ne, lê li vê dawiyê wan guh dane xwendinê û gelek parêzer, bijîşk, endezyar û rojnamevan jî mîna Dr.Ebdil Mecît Şêxo, jê hene.

Mala Robarî adetên/gerdişên xwe yên kevin diparêzin, wek: Li boneyên civakî û malbatî, mîna mirinê, cejnan…, li mêvanxana malbatê li Gu.Cilbirê dicivin. Ya balkêştir jî ew e, ku ew ji hêla jinanînê de, ji çarçewa malbat û netwa xwe dernakevin.

# Mala 'Umê - Gênc

Koka van her du malbatan "'Umê û gênc" yek e. Lê belê nêrînên têvel li derbarê bingehên wan yên nijadî û hozî hene. Emê yên giringtir bêjin:

Rojê Lîsko dibêje ku koka vê malbatê Tirk e[(1)], û ew li destpêka sedsala nozdehan ji herêma Qûnyayê hatine navça Çi.Kurmênc[(2)]. Gava ku ew hatin, pevçûn di navbera wan û xudiyên kela Basûtê yên Robarî de derketine, û di encamê de, Robarî neçar bûn Basûtê berdin, biçin li ser Çi.Lêlûn bi cih bibin û ra niha jî hîn li wir in.

Nêrîneke din e gelêrî heye jî, dibêje ku mala Umê ji nijada Ernwît (Elban) e.

Lê belê guman heye, ku ev her du nêrîn ji hêla hin malbatên Çi.Kurmênc ve hati bin tewatîrkirin, mebest jî jê ew bû, ku navê mala Umê biçûk bikin, wê lomê jî em dibînin ku ew nêrînine lawaz û bê bingeh in.

Li debarê hatina vê malbatê li navça Çi.Kurmênc, rêzdar Wesfî Zekeriya di rûpela 673an de, li ser hoza (Cûmê) wiha dibêje: Ew li devera Qûnyayê bûn, li destpêka sedsala şazdehan, Siltan Selîmê Yekê fermana goçkirina wan da, û niha li başûrê navçê li Devera Hemamê rûdinin, hejmara wan 4500 mal e, ew li ser 82 gundan belav dibin. Ew hoz bi pez, mange û hespên xwe dewlemend e, û ji çend nifşan de bi hêz û peyayên xwe navdar e.

Ji gotina W.Zekeriya mirov guman dike, ku ew çêre koma malên Gênc û Umê dibe, ji ber ku tu hoz bi navê (hoza Cûmê) tunene. Cûm, navekî xaknîgarî yî deştekê ye, ne yê hoza ye. Lê guman heye, ku gava Mala Gênc li deşta Cûmê bi cihûwar bûn, û bûne destlatdar, şêniyê navçeyên derdora Çi.Kurmênc guman kirine, ku şêniyê gundên Cûmê hemî ji hozekê ne, û ew bi “hoza Cûmê” bi nav kirine, digel ku gelek komehozên din jî li deşta Cûmê hene.

---

[1]- Rojê Lîsko: Pirtûka Çi.Kurmênc û Tevgera Mirûdan, wergerandin ji Firensî Mamed Cimo, rûp 8.

[2]- Osmaniyan gelek Kurd mişextî deverên Qûnyayê û orta Anadolê kiri bûn.

Pirtûka /Dîroka Kilisê ya Qadirî, rûpel 72/ jî Kurdîtiya Omer Axayê mala 'Umê diçespîne û wiha dibêje[1]:

((Kilis radestî Omer Aĝa bû. Lê belê hakimê wê yê berê Sma'îl Axa, ku bi navê (Axa Me'cûn) tê nasîn, “belkî ew bapîrê malbata Me'cûn a li Gu.Qitmê be”, dîsa Kilis wergirt. Lê li sala 1808an Omer Axa, û ji ber ku Kurd bû, Kurd livandin, û hêriş bir ser Kilisê û ew sê mehan dorpêç kir)). Bi rastî jî, ev daxuyaniya Qadirî hîç tu gumanê li ser Kurdîtiya mala 'Umê û Gênc nahêle.

Ji nivîsarên din ên ku li ser vê mijarê axivîne, nivîsara rêzdar “Mamed Cimo” ye, gava ku wî pirtûka “Çiyayê Kurmênc û Tevgera Mirûdan” a R.Lîsko ji Firensî wergerandiye Kurdî, wî li binê rûpela 18an, li ser vê malbatê ji devê neviyekî Betal Axa biriye, û wiha nivîsiye:

((Bapîrê vê malbatê yê yekê û naskirî Gênc e. Gênc lawek anî, navê wî 'Um bû (ji 'Umer). 'Umê jî sê law li şûna xwe hîştin: Gênc, Betal û Omer[2]. Ji Betêl re digotin Betal Axayê Milî, li ser navê hoza Milan a Kurd. Gênc bi xwe jî ji deverên Qûnyayê hati bû, koka wî Kurd e û Êzdî ye. Ra niha mirovên wî li derdora bajarê Rihayê hene û li ser ola Êzdî ne. Hin ji wê malbatê li bajarê Zaxo jî rûdinin û ji wan re jî dibêjin (Mala 'Umê). Û gotina dibêje ku ew tirk in, ji nakokiyên malbatî ku di navbera malbatine navçê û mala Gênc de hebûn, hatiye, ew ji Rojê Lîsko re wilo hatiye gotin û wî jî wek bihîstiye tomar kiriye)).

Ji hêla hozî de jî, mala Gênc û Umê ji hoza Millî ne, ji xwe Êzdî jî di wê komehozê de hene.

Li derbarê gumana Êzdîtiya mala Gênc, li sedsalên hejdeh û nozdehan, gelek Kurdên Êzdî li derdora bajarê Qûnyayê hebûn. Ji bilî wê, serbazên Betal Axa ji Êzdiyên navça Çi.Kurmênc bûn, [li beşê jiyana olî li Çi.Kurmênc binêr]. Wekî ku hatiye zanîn jî, ku li

[1]- Pirtûka (Dîroka Kilisê). Nivîskarê wê "Qadirî", mêldarê dewleta Osmanî bû, eger Omer Axa Tirk yan Albanî ba, dê bigota û ne digot ew Kurd e.

[2]- Eger ew rast be, dê were wê wateyê, ku navê bavê li kurê wî kirine.

sedsala nozdehan, mala Gênc û 'Umê herdem piştgirî ji Êzdiyên navçê didîtin û di nava serbazên wî de şer dikirin[1].

Piştî hevdîtinên me bi hin mirovên wê malbatê re, wek rêzdar Fayiq kurê Rif'etê Mala 'Umê, ku bi dîroka malbata xwe mijûl dibe, û me zanîşwerên wan dan ber ên ku me ji jêderên dîrokî yên ku em li jor çêrê bûne, em kanin li ser dîroka wê malbatê li navça Çi.Kurmênc wiha bêjin:

Li gorî ku rêzdar Wesfî Zekeriye dibêje, ev malbat ji dema Siltan Selîmê Yekê de hatiye navça Çi.Kurmênc. Tiştê din ê tekûz jî ew e, ku beşek ji wê malbatê ji ber sedemekê ew berve herêma navîna Anadolê hatine goçkirin, hîn jî hinek ji wan ra niha li navîna Anadolê bi malbata (Pêlewan) tê nasîn.

Dîroka vê malbatê ya naskirî li Çi.Kurmênc, ji sala 1740î de dest pê dike, ango ji dema ku Betal Axayê Gênc hukmê Kilisê bi destê xwe xisti bû de.

Piştî mirina Betal Axayê Yekem, kurê wî 'Um/Omer serkêşiya malbatê kir û destlatdariya Kilisê radestî wî bû. Lê belê pir nema ji destê wî hat girtin. Lewre, wî li sala 1808an hewil kir ku dîsa destlata wê vegerîne, lê ew bi ser ne ket û dîsa vegerî deşta Cûmê.

Li wê demê, mala Umê destê xwe danîn ser tevahiya beşê başûr ji deşta Cûmê, û li kêleka gundê Hemamê wargehekî parastî ava kirin, û bi navê Qişla Omer Axa hat nasîn.

Gava ku Omer Axa mir, sê kur jê man: Betal, Qasim û Îbrahîm (Îbiş). Yê mezin Betal bû, ew li Gu.Celemê rûnişt, Qasim jî kes çêre nabe, Îbiş jî çû li Gu.Îska rûnişt. Pişt re, wan avahiyeke şûnewarî ku li ser Çi.Lêlûn li rojhilata Gu.Îska ye û bi navê Kela Teqilkê tê nasîn, durust kir û ji xwe re kir baregeh.

---

[1]- Ew dîroka li dema hebûna kalikê kalkê min tê, navê wî 'Elqehwe bû, ew Êzdî bû û ji hoza Dina bû. Bavê min digot, bapîrên wan ligel Betal Axa xûk ji derdora Helebê distandin. Hewe Xatûn jina Omer Axayê diduyan jî, li dehsala şeşan ji sedsala nozdehan ji bo gefa Xelîl Axayê Hec Omer ji ser gundê xwe Qişlê vegerîne, bangîna xwe kir Êzdiyên Kefersefrê, ji ber wê jî wê zeviyên di navbera Kefisefrê û Cindirêsê de baxişandin wan, hinek ji Axayên Kefesefrê yên niha, neviyên wan Êzdiya ne.

Wê hîngê şêniyê gundên deşta Cûmê ku bi piranî Kurdên Êzdî bûn, li dora wan kom bûn, bi taybetî jî kesên ji hoza Dina, û rêberê wan ê bi navê Soro dihat nasîn. Û bi wî rengî destê wan ra Çi.Şêrewa li rojhilat û gundê Tirmanînê li başûr dirêj bû. Wan kelaya Basûtê ji destê Robariyan girt, û kela Sem'anê jî kirin bin destê xwe.

Ew liva mala 'Umê, bala destlata Osmanî kişand, lê ji ber ku ew li wê demê di rewşek lawaz de bû, wê geh bi peran û geh jî bi zorê mala 'Umê razî dikir.

Li wê demê, Îbrahîm Paşa kurê Mihemedê Elî Paşa waliyê Misirê Sûrya dagîr kir û Osmanî bi rojavaya Anadolê de têvedan. Mala Umê dibêjin, li dema ku Îbrahîm Paşa ji cengeke serkeftî vedigerî, Betal Axa ew vexwand kela Basûtê, tê gotin, ku wî ji Gu.Turundê de û ra Gu.Basûtê berx şerjêkirin. Li dawiya tekelifê, wek camêriyekê ji aliyê Îbrahîm Paşa de, wî ji Betal Axa re got, ku ew ji dayîna xûkê rizgar e. Ev gotina li xweşiya Betal Axa ne hat, û lê vegerand û got: Tu bi wê yekê destlatdariya xwe li ser min jî ferz dikî…!? Dibêjin, wê hîngê Îbrahîm Paşa di dilê xwe de hîşt û çû Helebê.

Piştî wê bûyerê, û di riya navbênciyên ku dixwastin wan li hev wînin re, Îbrahîm Paşa, Betal Axa vexwand Helebê û bi xinizî ew û kurê wî Îbiş û çerxciyê wî 'Eliyê Şindî ji Gu.Maratê li binê kela Helebê bidar xistin, û termên wan li derveyê Helebê veşartin. Ra niha jî cihê veşartina wan, ku niha bûye kucek ji bajarê Helebê, bi navê “Axyol” ango “riya axê” tê nasîn, ew jî li ser navê Betal Axa ye.

Ra roja me, hîn stranek heye Betalê Betêl xudanê kela Basûtê dipesine, min bi xwe hin kît jê ji pîrika xwe bihîstin, dapîrka min jidayîkbûna dawiya sedsala nozdehan bû. Ew stran li ser qehremaniya Betal Axayê Duyem kurê Betal Axayê Yekê dihat gotin, ewê ku "Qadirî" di pirtûka xwe "Dîroka Kilisê" de çêrê bûye.

Xuya ye jî, piştî ku li sala 1808an Kilis ji destê Omer Axa, apê Betal Axa hat kuştin yan jî mir, Betalê Duyem destlatdariya kela Basûtê wergirtiye.

Li ber roniya van bûyeran, guman xort dibe, ku ji wê salê de û ra sala 1832an, sala kuştina Betal Axayê Duyem, kela Basûtê di destê wî de bû û li wan deveran xudan şor bû.

Piştî bidardekirina Betal Axa li Helebê, biraziyê wî Omer Axa mirovên xwe û şêniyê navça xwe amade kirin, û xwast tola apê xwe ji Îbrahîm Paşa hilde. Lê li wê demê, li gor peymana Kutahiya, hêzên Misirê ji Sûryê kişîn û dîsa Osmaniyan Sûrya vegerand.

Di rewşa nû de, Omer Axa destlatdariya xwe li navça Cûmê û derdorên wê xort kiri bû, û ra ji deverên sînorê Helebê xûk distand.

Mala Umê dibêjin, carekê ji caran, Siltanê Osmanî Meĥmûdê Duyem (1808-1839), di bakurê navça Çi.Kurmênc re derbas dibû, û gava ku Omer Axa bihîst, wî xwe lê girt û çû, li derdora bajarê Islehiyê raste karwana Siltên hat û daxwaza hevdîtina Siltên kir.

Gava ku daxwaza wî hat pejirand, Siltên jê re got: Omer, çend hukmên bidarvekirinê li ser te hene, lê ji ber dilêrtiya te, min ew hemî ji ser te rakirin, û ezê te bikim waliyê Helebê. Lê wek mala 'Umê dibêjin, Omer Axa jê re got: Siltanê min, tiştê ku tu didî min, berê di destê min de ye, ez ra Şamê dixwazim. Siltên wê hîngê bersiva wî ne da, û jê re got, ewê li daxwazê binêre û paşê bersivê bişîne. Lê ji dêvla ku Siltan fermana xêrê bişîne, hêzeke mezin bi ser Omer Axa de şand, ew dîl girt, û berê wî da Şamê. Lê gava ku karwana wî li ser riya Şamê bû, toşî hêrişeke Erebên ji hoza Şemmer bû, û hêza ku karwan diparast ji hev belav bû, Omer Axa jî azad bû û bi siwarên Şemmer re çû wargehên wan.

Pişt re, Omer Axa demeke baş li ba hoza Şemmer ma, û bi wan re talan jî dajotin. Dema ku dewletê bihîst ku Omer Axa li ba hoza Şemmer e, wê hewilda ku wî bigire, lewre Omer neçar bû ji Şemmer biqete û here navça Mûsilê. Li Mûsilê, ew bi jinek ji hoza Milan a Kurd re zewicî û du zarok jê bûn.

Dema ku Siltan Mehmûdê Duyem ji ser têxt hat avêtin, û kurê wî Ebdilmecîd (1839-1861) li şûnê rûnişt, lêborîneke tevahî ji bo hemî çete û mehkûman derxist. Wê hîngê, Omer Axa jî derfet dît û vegerî Çi.Kurmênc.

Li wê demê, kurê wî Heyder şûna wî girti bû. Û gava Omer Axa bawer kir, ku lêborîna Siltên îjdil e, wî biryar da ku here jin û her du

zaroyên xwe ji Mûsilê wîne. Lê belê ew li derdora Dêrazorê mir û li wir hat veşartin.

Pişt re, kurê wî Heyder û peyayên wî riya xwe ajotin û çûn Mûsilê, lê jina Omer Axa razî ne bû bi wan re vegere û zarok jî nedan wan. Wê hîngê Heyder vegerî Çi.Kurmênc û rêbertiya malbatê kir.

Heyder Axa ji mala 'Umîkî Kalê ji Gu.Sêwiya zewicî, kurê wî Omer ji wê jinê bû, du kurên wî yên din jî, Îbiş û Ehmed ji jineke din hebûn, Axeyên Gu.Îska Ehmed û Xalid Axa ji wan in.



**Elî Heyder/Heyder Aĝa (1866-1921)**

Ji Omer Axa kurê Ĥeyder Axa jî li sala 1866an lawek bû bi Elî Ĥeyder hat binavkirin. Gava ew mezin bû û zewicî, wî gundê Îska berda û çû li gundê Firêriyê rûnişt, ew gund li dawiya şerê cihanê yê yekê bû navendeke derebegîtiyê ye şên li Çi.Kurmênc, Elî Ĥeyder/Heyder Axa jî li ba dewleta Osmanî pir bi rû bû bû. Û tiştê ku ew bêtir pê hatiye naskirin ew bû, ku dema Ermen bi destê artêşa Osmanî dihatin kuştin, wî bi dehan malbatên Ermenan li gundê xwe bi cih dikirin û sersiya xwe lê dikir.

Heyder Axa li sala 1921an mir û du law li şûnê man: Umer Feydî (Omer Axa) û Mihemed Ruf'et (Ruf'et Axa), ji her yekî wan jî heft kur çê bûn.

Malbata Heyder Axa li dema Firensiyan jî bi rû bûn. Li wê demê, Ruf'et Axa bû endamê partiya (Kitla Wetenî). Ji nasdarên malbatê yên wê demê, Mehmûd Şewket û Elî Heyder kurên Ruf'et Axa, û Mistefa Kemal û Elî Heyder lawên Omer Axa.

Li dema me, ev malbat bi mala Heyder Axa (kurê Omer Axa) tê nasîn. Gundê wê yê serke Firêriyê ye. Ew xudanê zeviyên fere ne.

Bi saya serejmara mala Heyder Axa ya pir, û payebilindiya wan li ba destlatê, piraniya zeviyên wan ji zagona durustkirina çandiniyê rizgar bûn û ji wan re man.

Mala Heyder Aĝa di gelek hilbijartinên Sûryê de beşdar bûne, ew piraniya caran bi malbata Robariyan re pêwendîdar bûn. Beredamên malbatê di hinek hilbijartinan de ev bûn: Ruf'et kurê Heyder Axa li sala 1947an, Heyder Axa kurê Ruf'et Axa li sala 1954an. Û li sala 1998an jî, Kemalê mala 'Umê bû endamê encûmena gelê Sûryê. Pêwîst e em bêjin jî, ku herdem têkliyên mala Heyder Axa bi destlatên Sûryê re rind bûn.

Mala Heyder Axa li bajarê Efrînê Rûneniştin, û ji destpêka sedsala bîstan de, têkliyên wan ên xort bi bajarê Helebê re hebûn, û jinên Helebî anîne. Bi tevahî, mirovên vê malbatê camêr in, beden dirêj in û pir li jiyana xwe ya rojane miqate ne.

### Mala Gênc:

Li derbarê mala Gênc (neviyên Betal Axayê Duyem), piştî ku Betal Axa hat bidarvekirin, lawekî wî bi navê Mihemed li şûnê ma, jidayîkbûna wî li dora sala 1830î bû. Gava ku ew mezin bû, Osmaniyan kurkê Baybegîtiyê dayê, mala Gênc a niha ji wî ye.

Bi tevahî, mala Gênc li navîna sedsala bîstan, derebegên mezin bûn li beşê Rojava ji deşta Cûmê û Hemqê. Ji mirovên mala Gênc ên ku li destpêka sedsala bîstan naskirî bûn: Hersê bira Ehmed, Mistefa û Elî Axa.

Lê belê, piştî ku senceqa Iskenderonê bi ser Tirkiyê ve çû, piraniya zeviyên mala Gênc li aliyê Tirkiyê man, ji ber wê jî, wan dilkirin ku li aliyê Tirkiyê bimînin. Lê hinek ji wan li aliyê Sûryê man û li gundên Celemê, Dêrbelûtê, Dêwa, Mile Xelîla û li gundên ku arziyên xwe lê hene, rûniştin. Lê belê li salên şêstî ji sedsala bîstan, û li gor zagona durustkirina çandinê, piraniya zeviyên wan hatin zepkirin, hinek jê li ser cotariyan hat belavkirin û hinek jî bûn arziyên dewletê.

Hêjayî gotinê ye, ku Nûrî kurê Şêx Mihemedê Gênc, Kurdê yekê bû ji navça Çi.Kurmênc, ku li destpêka sedsala bîstan rojnamak bi zimanê Osmanî bi navê (Doxru Yol) li bajarê Helebê diweşand, ew rojname li dema şerê cihanê yê yekê hebû, û ra sala 1930î derdiket,

lê ji ber ku xudiyê wê dixwast wê bi zimanê Tirkî biweşîne, destlata Helebê ew qedexe kir û weşandina wê rawestand.

Ma em bêjin, ku li sala 1949an Mistefayê Ehmedê Betêl, ji ber Çi.Kurmênc ve bû endamê perlemana Sûryê.

## Hoza Şêxan

Şêxan ji hozên Kurd ên mezin û belavkirî ye li Kurdistanê û li derveyî wê jî. Warên wê di navbera Riha, Wêranşar, Oeredağê, Sirûcê, başûrê Erziromê û Çi.Kurmênc de ne. Şêxî li parêzgeha Latqiyê li devera ‘‘Çiyayê Kurdan’’ li rojavaya bajarê Cisrilşuxrê û li navça Qesatêl û Firiluq jî hene.

Şêxan hoza mezintir e li navça Çi.Kurmênc, em kanin bi şêweyekî tevahî bêjin, ku devera Reco devereke Şêxî ye sade ye. Û digel ku gelek malbatên Şêxî li deverên hozên din jî hene, lê sînorên Şêxan li navça Çi.Kurmênc baş diyar in. Ew li rojhilat geliyê Meydana Şêxan û hoza Biyan ji hev dike. Li hêla başûr jî, hoza Amka dibe sînordarê wê, û ji başûr berve bakur jî ev gundên Şêxiyan dikevin ber sînorên devera hoza Amka: **Cela, Çençelî, Çeqmaqê Mezin û Çûçik, Çerxûta, Kûra, Çeqilme, Şêx Bila.**

Gundên Şêxan li başûr, li ber taximê devera Xastiya jî ev in: **Kurkê Jorin û Jêrin, Be'dîna, Sariya, Gu.Xelîl, Gu.Hebo, Alkana, Çeqela.**

Hejmara gundên Şêxan 75 in, çar gundên Şêxî li aliyê Tirkiyê jî hene: **Gomît, 'Encara, Tilbîr, Xirab Camûs.** Ji bilî ku malbatên Şêxî li gelek gundên deverên din jî tên dîtin.

Li sedsal hejdehan, û nîvê yekê ji sedsala nozdehan, carcaran nakokî di navbera Şêxan li alîkî û Reşî û Biyan li aliyekî din derdiketin, ew pevçûn li salên pêncî ji sedsala nozdehan bi serkeftina Şêxan kuta bûn. Pevçûna dawîn li sala 1850î yan 1852an di navbera hozên Reşî û Amkan li hêlekê û Şêxan bi alîkariya Osmaniyan ji alîkî din ve, rabû. Şêxî di wê pevçûnê de bi ser ketin, û gihîştin ra Bilbilê, lê belê du rêberên Şêxan di wê pevçûnê de hatin kuştin: Bekir Axa kurê Reş Axa û birayê wî Omer Axa, û li mezelê Gir yê ku li kêleka Reco ye, hatin veşartin.

Gelek caran nakokî li ser rêbertiya hozê di nav Şêxan bi xwe de jî derdiketin, ew di navbera mala Ce'fer de ji Me'mila û mala Reş Axa de li Gomîtê radibûn, lê ew nakokî bi serkeftina mala Reş Axa bi dawî hatin.

Hêja ye em bêjin ku, li dirêjiya salan, tu carî rêbertiyek yekgirtî ji hoza Şêxan re li Çi.Kurmênc peyda ne bûye, herdem rêbertiya wê li ser çend malbatan hatiye belav kirin. Emê li jêr, malbatên Şêxan ên ku navdar bûn bidin nasîn, û bûyerên ku pê ve girêdayî bûn bi kurtî hewaldin:

- **Mala Diwîkê(Tawid):**

Ew mala ji kevintirîn malbat û rêberên Şêxan e li Çi.Kurmênc. Gundê wan 'Etmana ye, hinek jê li aliyê Tirkiyê jî rûdinin. Li dema Osmaniyan, beg jî ji vê malbatê hebûn, mîna Elî Beg, neviyê wî ê bi navê Tawid jî, kurkê Baybegîtiya Osmanî wergirti bû. Arziyên mala Têwid li deşta Lêçe[1] li aliyê Tirkiyê hene, welatiyên Tirkiyê wan bikar tînin. Roja îro, rewşa mala Têwid pir hatiye guhertin, û tenê pêşeroja wan, wan dide nasîn. Ĥesenê Elê mixtarê Gu.'Etmana ji wê malbatê ye û ji nêzîk heftê salî de Keyayê (mixtarê) gund e.

- **Mala Reş Axa:**

Warê vê malbatê Gu.Gomîtê bû, ew li sala 1938an li paş sînorê Tirkiyê ma, û bi behaneya ku ji sînor ve nêzîk e, Tirkan ew gund hilweşand û şêniyê wê ji wir rakirin.

Tê gotin ku mala Reş Ağa ji Reşê Şivan dikşê, ew mirovekî xudan ûcaq(keramet) bû, û ne Axe bû[2].

---

[1]- Lêçe, navê beşê bakur e ji deşta Hemqê, û li rojavayê Çi.Kurmênc e. Lêçe navekî Kurdî ye: Liç yan jî Lîç bi wateya ava ketî, ya ku naherike, û bi wateya çipil jî tê. Ew salix jî li xaknîgariya wê deverê tê, ji ber ku ew tenê çend deh mitran bi ser rûyê deryayê dikeve, û ava çemê Reş û kaniya Betamê tê re diherikin, û golan (liçan) lê çê dikin

[2]- Dibêjin, Reş şivanê mala Têwid bû. Hinekan dît ku şîr li mala wî heye, lewre guman kirin ku ew şîr didize, loma jî rabûn lê pan. Wan dît ku keriyek Xezal tê ser avê, û Reşê şivan diçe wan didoşe. Ev nûçe li nav gundiyan belav bû, û ji wê rojê de ew bû xudan Ûcaq, rêzdariyeke wî ye payebilind çê bû, û bi Reş Axa jî hat binavkirin. Piştî ku Reş Axa mir, ew di xaşxaşekê de hat veşartin, gora wî jî

Ji rêberên Şêxan li sedsala nozdehan, Bekir Axa kurê Reş Axa bû. Ew li devera Bilbilê di şerekî de bi mala Hec Omer re hat kuştin.

Rêberên mala Reş Axa di sedsala bîstan de, Husênê 'Ewnî bû, ew li salên 1932 û 1936an bi alîkariya Mirûdan di hilbijartinan de bi ser ket û bû endamê perlemana Sûryê. Husên 'Ewnî ji piştgirên çûna Iskenderonê bi ser Tirkiyê ve bû, lewre jî piraniya malbata wî li Tirkiyê man. H.'Ewnî li sala 1994an di temenê 90 saliyê de mir, û du law jê man; yek Kemal, yê din jî bijîşkekî neşterkar ew her du jî li tirkiyê dimînin.

Du birayên Husên 'Ewnî hene; **Reşîd**: Du lawên wî hene: Elî û Mûrad li Anqerê rûdine. **Osman**: Du lawên wî jî hene, jê **Se'îd** ji ber partiya Gel ya Ataturk ve bû endamê perlemana Tirkiyê. Mirovekî din jî ji mala Reş Axa bi navê **Umer Fewzî** heye, Umer jî ji ber wîlayeta Hatay ve bû endamê perlemana Tirkiyê.

Mala Reş Axa xudanê zeviyên fere ne li deşta Hemqê, ew di nava civaka xwe de jî navdar e. Xûşka Husên 'Ewnî ya bi navê Şêx Fehîme Xatûn, nod salî ye û li Na.Efrînê li Gu.Mîrka dijî.

### - Mala Sînê û Elî Soro:

Malbateke Şêxî ye kevin e, ew li devera Meydana Rûdine û li demên berê Beg jî jê hebûn. Ji rêberên wê malbatê, Xelîl Axa bi Mirûdan re girt, birayê wî Mûse Axa jî li dijî wan sekinî, û li sala 1937an bi destê wan hat kuştin.

### - Mala Mûsî 'Eynê:

Ev malbata ji mirovekî bi navê Mûsê 'Eynê dikşê. Ew li Reco û li Gu.Maseka rûdinin. Rêzdar Mûsê Ne'sên ku roja îro rêbertiya bermayên Tevgera Mirûdan li Sûryê û Tirkiyê dike, û li Helebê rûdine, ji wê malbatê ye. Mirovên çete yên xedar jî ji vê malbatê derketin, wek Ĥecîkê Şomê û Kêl Meĥmûd.

### - Mala Bilî Reşê:

ji xelkê re bû mêrav û pîrozgeh, lê li dema hatina Kemalîstan, wan devê xaşxaş xetimand, û qedexe kirin ku kes here ber gora wî.

Ev malbata ji kevnarên Şêxan e, ew li gundên Kurê û Kum reşê, ku li rojavayê Reco ne, rûdinin. Heyder Axa ji gernasên wan bû.

### - Mala Henîf Axa:

Ev malbata li gundê Hec Xelîl rûdin e. Ew ji malbatên Şêxan ên naskirî ye. Nivîskar Cemîl Kinê li sala 1923an, Henîf Axa wek rêberê hoza Şêxan nasandiye.

### - Mala Ce'fer:

Navê vê malbatê li dawiya sedsala nozdehan derketiye. Ew û pismamên xwe yên ji mala Îbiş, Simo û Elî Begê li Gu.Me'mila rûdinin. Pismamine wan li devera Cisrilşixûr ji parêzgeha Idlibê jî hene jê re (mala Şe'ban) dibêjin, Şe'ban jî birayê Îbiş, Ce'fer û Simo yê çarê bû.

Navê mala Ce'fer li destpêka sedsala bîstan, bi bûyerên civakî yên xwîndar ve hatiye girêdan, û bêtirî heştê mirovî bûn qurbana wan nakokiyan[1].

Li navîna sedsala bîstan, Ehmedê Xelîl ji peyayên mala Ce'fer yê naskirî bû, ew li sala 1984an mir. Li dema Firensiyan bi dehan peyayên wî yên çekdar hebûn. Ehmedê Xelîl navê xwe di hilbijartinên 1954an de da, lê tê de bi ser ne ket, lê belê li dema yekîtiya Sûryê û Misirê, ew ji ber Çi.Kurmênc ve bû endamê “encûmena netewî ya yekîtiyê”. Ew li wê demê bi cilên Kurmanckî çû Misirê, loma jî wî bala Serok Cemal Ebdilnasir kişand, û hevedîtineke taybet vê re çê kir. Kurê wî Xelîl Mixtarê Gu.Me'mila ye, ew hîn di xaniyê kalê xwe de rûdine, ew xanî jî li sala 1900î hatiye avakirin.

### - **Mala Simo**:

Ev malabata li M'emila û li her sê gundên Çeqela rûdine, mirovê wan yê gernas Enwer Simo ye, ew li sala 1976an ji ber tevgera netewî ya Kurdî ve di hilbijartinan de bi ser ket û bû endamê encûmena parêzgeha Helebê. Ji mala Simo Mihemed Bekir syasetvan û rewşenbîrekî hêja bû, bi wêjeya Kurdî jî mijûl dibû, wî

---

1- Carekê stranbêjek ji hêla Kobaniyê hat mêvanxana Ehmedê Xelîl li Gu.Me'mila, û strana Ûsibê Şer ya çoşdar stira, li dawiya stranê dijminên hev yên ji gund û ji gundên derdorê, rabûn hev û di encamê de çend kuştî ketin.

li sala 1994an jiyana xwe ji dest da û li mezelê gundê Çeqelê Ortê hat veşartin. Çeteyê navdar Hesenê Îbiş jî ji vê malbatê bû, bi dehan çekdarên wî hebûn û gelek pevçûn bi hêzên Firensiyan re rakirin.

- **Mala Kor EĤmed:**

Malbateke nû ye, li dawiya sedsala nozdehan û destpêka ya bîstan derketiye, ew bi navê mala Mistikê tê nasîn. Ji mirovên wê yên naskirî, Ezet Xelîl li sala 1954an bi Menanê Fayiq û Ehmedê Ce'fer re di hilbijartinan de bi ser ket û bû endamê perlemana Sûryê. Mala Mistikê li Gu.Be'dîna rûdine. Lawê wî Xelîl bi xebata siyasî ya netewî ya Kurdî hatiye naskirin, û bi saya wê yekê li sala 1976an di hilbijartinan de bi ser ket û ji ber navça Efrînê ve bû endamê encûmena parêzgeha Helebê.

- **Mala Çêqilme:**

Malbateke Şêxî ye kevin e. Ew di sedsala nozdehan de bi rû bû. Roja îro, Cemîlê ÊĤo ji Gu.Çêqilme, ji mirovên wê yê naskirî ye. Ew li sala 1971an, li gel çend Kurdên Sûriyê çû Kurdistana Êraqê, lê belê ew hatin girtin û çend mehan di girtîgeha "Nîhayê" de li Bexdadê man.

Dema ku hêzên Firensî derbas devera Şêxan bûn, Şêxiyan li deşta Baliya li kêleka Reco, hêriş birin ser, lê belê serbazên Firensî bi dû wan ketin û çend mal li Gu.'Etmana şewitandin.

Bi tevahî, devera hoza Şêxî bi Tevgera Mirûdan re bûn, gelek gundên wan li Reco û Meydana baregehên wê bûn. Ji ber wê yekê, rêberê Şêxan Husên 'Ewnî di hilbijartinên perlemana Sûriyê yên salên sihî de ji sedsala bîstan, bi ser ket.

Navça Şêxan çiyayî û bi darûber e, û ewqas ji çandiniyê re nabe.

Şêxî Kurdine Misliman in, û bi tevahî li ser rêola Ĥenefî ne, hinek şêxên wan jî (xudan dest) in, ji wan: Şêxên Bablîtê ku li ser rêola Rifa'î.

# Hoza Biya

Binehoza Biyan şaxek e ji hoza Reşî[1], ew di belgeyên Osmaniyan bi van navan (Oqçe 'Ezdîn, Oqçe 'Ezenlî, 'Ezê) dihat nasandin. Zanyar B.Lêrx /rûp59/ ji sedsala nozdehan de ye, dibêje, ku hoza Oqce 'Ezinlî 500 mal e, û warê wê li nêzîk Kilisê ye. Osmaniyan devera Biyan -Bilbila niha- bi 'Ezê bi nav dikir. Belkî navê 'Ezê dest nîşan bike, ku têkliya wê bi mîritiya Sasûnê ya Kurdî re hebe. Ew mîrîtî li sedsala panzdehan bi destê mîr 'Ezdîn hati bû damezrandin, û bi navên 'Ezo, 'Ezê, Ĥezo bi nav dibû[2]. Bêjeya Oqçe ya ku bi wî navî re tê jî, di zarava Kurdî ya Soranî de bi wateya "Rêber yan mezinê malbatê" tê, û bi Tirkî jî bi wateya (tîravêj) tê.

Li derbarê koka navê Biya jî, guman heye ku ew ji dara "Biyê'' hati be, ji ber ku devera Biya bi avê û bi hebûna darên Biyê navdar e.

Gundên Biyan 95in, jê 45 li aliyê Sûryê ne, û 40 jî li aliyê Tirkiyê ne. Malin jê li van gundan jî rûdinin: **Sêwiya, Şêx Kêlê, Mabeta, Şiyê, Meydan Ekbez, Remedana, Hec Qasma, Dela.**

Ji gundên Biya yên li aliyê Tirkiyê jî ev in: **Qaziqli, Dêli Osman, Ĥesarê, Çaçilê, Bûlamac, Qumurli, Kulgîman, Pêrtekli, Mam 'Ereb, Martewan, 'Eliyanli, Qernebiyê, Qeyebaşê, Tenûr, Tesbiĥ, Golbaşi, Maxercak, Mazar Şêr, Alti, Sabqanli, Bekira.**

Sînorê hoza Biya li rojava ji gundê Bêkê de dest pê dike û ra deverên Ezazê û Kilisê dirêj dibe, ango hoza Biya tevahiya devera Bilbilê digre. Bi tevahî, sînorên vê hozê wiha ne: Li rojhilat Şikak, li başûr Amaka, li rojava Şêxan û ji bakur de jî sînorê Tirkiyê.

Devera Biya Çiyayî ye, pir ji çandinê re nabe, lê ava wê pir e, çiyayên wê bi darûber in, sirûşta wê pir xweş e û her gundekî devera wê wek havîngehekê ye.

---

1- R.Lîsko guman dike, ku Biyan binehozeke Millî ye, rûpel 58.

2- Mîrîtiya Sasûnê ji dema Hukmeta Berxê Gewr a Tirkmanî de bi destê mîr Ebû Bekir hati bû avakirin. Malbata wê ya destlatdar ji resenê Mîr 'Ezdîn bû, ew bi wî navî û bi navê 'Ezê, 'Ezdîn jî dihat nasîn. Ew ji çar binehozan pêk dihat: Şêrewî, Babosî, Tamoqî û Sosanî. Navça Xerza jî di nav wê mîrîtiyê de bû. Ew mîrîtî demeke dirêj li dema Osmaniyan ma… /M.Emîn Zekî, beş2, rûpel 369/.

Hejmareke pir mezin ji gundiyên devera Biya, ji ber xizantî û bêkariyê, bare bajarên Helebê û Şamê kirine.

Ji navîna sedsala nozdehan de, mala Şêx Sim'el rêbertiya Biyan dike, navê “Zade” jî li dema Firensiyan bi dawiya navê wan ketiye[1].

**Mala Şêx Sim'el[2]:**

Şêx Sim'el mirovekî oldar bû, li navîna sedsala nozdehan bi xûşka Xelîl Axayê Hec Omer re zewicî, û dema ku li sala 1866an Xelîl Axa ji jiyanê bar kir, û ji ber ku Şêx Sm'el ji aliyekî de ji binehoza Biyanî ya Reşî bû, û zavayê mala Hec Omer bû, û ji aliyekî din de mirovekî oldar û hişmend bû, û ji ber ku şûna rêbertiya mala Hec Omer jî vala bû bû, wê lomê tevahiya dewrana mala Hec Omer û rêbertiya wan jî  bi Şêx Sim'l ma.

Li dema wî, hêminî daket navçeyê û têkliyên wî bi destlata Osmanî re baş bûn[3]. Li dawiya sesdsala nozdehan û destpêka ya bîstan, rola mala Şêx Sim'el baş bilind bû, û Kurê wî Ehmedê Şêx Sim'el (mirin 1916) bû endamê destlatdariya Kilisê. Şêx Sim'el li nêzîk Gu.Meydan Ekbezê hat kuştin, neviyên wî Osmaniyan di kuştina wî de gunehbar dikin.

Hin mêrên mala Şêx Sim'l, bi jinên ji malbatên navçê yên navdar re zewicîne, mîna mala Çirûsa ku rêberên Şikêk bûn û Mala Seydê Mîmê Axeyên Cûmê, li aliyê din, wan keçên xwe jî dane mala Dîkê ku Axeyên Amka bûn, wê yekê kir ku rola wan di jiyana civaka Çi.Kurmênc de bilindtir bibe.

---

1- Navê Zade li dema Firensiyan ji hêla Seydê Dîkê ve ji bo qedirdayînê hat gotin.

2- Berê ji vê malbatê re mala Serkut jî digotin, ango mala (yê serî qut). Dibêjin, di şerekî de bi gawiran re, serê siwarekî vê malbatê hat birîn, lê ew ji hespê ne ket, û şer berdewam kir!! Ev rûdaw jî tiştekî Fizyolocî ye, gava ku mirovek toşî lêdaneke mirinê dibe, masûrkên wî hişk dibin, govde jî di rewşek bê liv de hişk dibe, lê bêguman ew nikane şer bike.

3- Ehmed Axa kurê Şêx Sim'el li sala 1915an ji biraziya Mir'î Paşa waliyê Helebê zewicî bû. Jineke wî ye din jî ji mala Misetet a Helebî bû. Ehmed Axa heft law li şûna xwe hîştin, ên navdartir ev bûn: Hec Henan, Kor Reşît, Ce'fer , yê mezintir jî Şêxo bû.

Piştî şerê cîhanê yê yekê, dema ku Firensî hatin navçê, helwesta rêberên Şêx Sim'elan têvel bûn. Hec Henan kurê Ehmed Axa li gel Qîwayên Millî li dijî Firensiyan şer kir. Li bervajî wê, birayê wî Hec Reşît (Kor Reşît), bû dostê Firensiyan û ta li dawiya salên sihî ji sedsala borî mir, ew herdem ji wan re dilsoz ma.

Dema hêginiya Tevgera Mirûdan di jiyana mala Şêx Sim'l de, demeke pir lihevketî û dijwar bû. Li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan, şêxê Mirûdan Îbrahîm Xelîl Sowiqoĝlu li ba Şêx Sim'lan radibû û rûdinişt, lê piştî ku xelk li dora wî civî, mirûdên wî pir bûn û bi hêz bû, di navbera wî û Şêx Sim'elan û zavayên wan ji mala Dîkê de dijmantiyeke mezin peyda bû, û gelek pevçûnên xwînî di navbera wan de rabûn, di pevçûnekê de li sala 1939an Ce'fer Axa li nêzîk Bilbilê bi destê mirûdan hat kuştin. Berî wê bi salekê, birayê wî Kor Reşît jî li bajarê Efrînê toşî hewldaneke kuştinê bû bû. Li wê demê, mala Seydê Dîkê jî li Gu.Qêsim toşî hêrişeke mirûdan bû bû, û di encamê de çend mirûd hatin kuştin.

Ew dijmantiya di navbera her du aliyan de ra piştî serbixwebûna Sûryê ajot. Li sala 1947an, li rojên hilbijartinên perlemana Sûryê, rêberê mirûdan Şêx Henîf, wekî ku namzetê mirûdan bû, berî roja helbijartinê li bajarê Efrînê hat kuştin û Ehmed Zemçî Kurê Ce'fer ji Axeyên Şêx Sim'elan bi kuştina wî hat gunehbarkirin[1].

Li wan deman, Mala Şêx Sim'el, maleke mezin û dewlemend bû, û roleke wan e giring û xort di hilbijartinên perlemanên Sûryê de hebû û ew herdem kanîn tê de bi serketana û bigihîştana perlemanên hilbijartî û ne hilbijartî jî, /ji bo wê, li beşê jiyana perlemanî li Çi.Kurmênc veger /.

Wek me li pêş jî got, ji destpêkê de kirasekî olî li ser mala Şêx Sim'el hebû û ji berê de gelek mirovên wan navên Şêx an Hecî hilgirtine. Niha jî oldarên wan pir in, lê baweriyên wan ên olî ne

[1]- Dema ku Şêx Henîf li bajarê Efrînê ligel Xelîl Axayê Robarî ji bo hilbijartirna digerîn, mirovekî Mirûd agir berdayê û ew kuşt. Peyayên Şêx Henîf jî ew mirov kuştin. Wê hîngê hat gotin, ku ew bi destê mala Şêx Sim'el, wek tolhildan, hat kuştin.

hişk in, ji ber wê jî têkliyên wan bi hemî olên ku li Çi.Kurmênc hene re baş bûn, nemaze jî bi Êzdiyan re[1].

Piraniya malên Şêx Sim'el li gundên xwe rûdinin û di çandiniyê de kar dikin. Lê gelek ji wan li Helebê jî bi cih bûne. Bi tevahî, ew baş guh didin xwendinê û gelek xudî xwendina bilind ji nav wan derketine. Lê digel wê, ew ji karûbarên dewletê dûr in, nemaze jî ji karkirina di artêşê de.

Bi şêweyekî giştî, mirovên mala Şêx Sim'el siyasetê nakin, û xwe ji civaka Kurdî dûr xistine, belkî jî ew ji ber rewşa wan a malbatî ya dewlemend a kevin hati be. Lê bi tevahî, wan kesayetiya xwe ya netewî ji hêla zimên, gerdiş û jinanînê de parastine.

Ji mirovên mala Şêx Sim'el yên navdar li sedsala bîtan, em kanin van bijmêrin: Hec Henan, Kor Reşît, Fayiq Axa, Ehmed Zemcî, Şêxo Axa, parêzer Mihemed Menan…

## Hoza Goçeran

Goçerên Çi.Kurmênc ji Goçerên Mîr Şem in. Wan ra salên çelî ji sedsala borî pez xudî dikir, û hez dikirin ku di konan de rûnin. Ew li her du aliyên sînorê Sûryê û Tirkiyê belav dibin. Warê wan ji Kilisê de dest pê dike û digihê Çi.Gewr û bajarên Qirixanê, Îslehiyê, Albistan û Meletiyê, ew hemî jî li aliyê Tirkiyê ne. Goçer bi rengekî pir sade dijîn, pir li wan zor e, ku bi zimanekî ji bilî Kurmancî deng kin, hîn kalepîrên wan her du tîpên (ح،ع) bilêv nakin. Jinên goçeran jî bi ciwanî û comerdiyê navdar in.

Goçer li ser bineola 'Elewî ya Atmî ne. Ew bi rêberê xwe yê civakî "Mîr", û bi rêberê xwe yê olî "Dede" ve girêdayî ne, lê ew di baweriyên xwe yên olî de ne hişk in. Li roja îro gelek ji wan bûne Mislimanên Sunne.

Li dema hilweşandina dewleta Osmanî û hatina Firensa li navça Çi.Kurmênc, mirovên Goçer li dijî artêşa Firensa li ber xwe dan, ji

---

[1]- Bûyerek li sala 1919an bû. Kesin ji gundên Dargirê û Mîrka hêriş birin ser Gu.Mabeta yê li ser binola 'Elewî, wan gund dorpêç kir, û mirovek jî kuşt. Wê hîngê Henan Axayê Şêx Sim'el, ligel hin çeteyan hatin hawara Mabetiyan û hêrişkar vegerandin. Li ser wê bûyerê şêniyê Mabeta stranek çê kirin, digot:
**Rabin sekin Dargir ço dişewitê … Ne gotin çete Ĥenan Aĝa tê.**

wan berxwadêran: Mihê Îbşaşê, Îbê Cindêr, Silêman Pîşo… Ew li wan salan li herêma Çi.Kurmênc bû bûn destlatdarên rastînkî. Lê piştî ku sînor di navbera Sûryê û Tirkiyê de dahat, Goçerên ku li aliyê Sûryê ma bûn, li çend gundan bicih bûn, wek: **Dêrsiwan, Şilt'et, Qurta, Qurtqulaqên Mezin û Biçûk, Gabeleka, Avraz, Gobekê, Gulîka, Şingêlê, Çeqmaqa, Meydana, Reca, Aşkê Şerqî û Xerbî, Hemamê, Şiyê, Kîmarê, Coqê, Kurzêla Cûmê,** sê gundên **'Ên Ĥecerê, Çolaqa**.



**Gêncoyê Ehmoyê Feyo,**
**ji Goçerên bajarê Efrînê**

Hin malbatên Goçeran, ji destpêka dema Firensî de li bajarê Efrînê jî bi cih bûn. Wek mala Feyo û mirovê wê yê naskirî Gêncoyê Ehmoyê Feyo, ku li salên heftê ji sedsala borî mir.

Têkliya gernasên Goçeran bi têkoşerê Kurd Dr.Nûrî Dêrsimî re li Helebê hebû. Wî bi piştgirya Bedirxaniyan, bi taybetî jî Kamîran Begê, Goçer li dijî siyaseta Tirkên Kemalîst tûj dikirin. Belkî wê lomê jî, rêberên Goçeran li rapirsîna sala 1938an, dengên xwe ji bo mandina Senceqa Iskenderonê di çarçewa dewleta Sûrî de dan.

Roja îro, rêbertiyeke Goçeran e naskirî li Çi.Kurmûnc tuneye. Lê ji mirovên wan ên ku niha naskirî ne: Dr.Ehmed Resûl, Dr.Ehmed Zemçî (her du li Aleman dijîn), Qadî Osman Mihemed, û siyasetvanê Kurd Miĥidîn Şêx Alî.

# Binehoza Milî Dawûdî

Milî Dawûdî, binehozek e ji hoza Milan. Mala 'Umer Sefûna li Gu.Maratê Rêbertiya wê dike. Hajmara vê komehozê bêtirî çar hezar mirov e, ew li gundên Maratê, Dargirê û Gu.Mezin Rûdinin. Lê hoza Milî li gundine din jî hene, wek gundên: **Celemê, Soĝanekê, Turindê, Aqîbê**…

## Mala 'Umer Sefûna:

Ew ji malbatên Çi.Kurmênc ên kevin e. Wê malbatê ji navîna sedsasla hejdehan de û ra navîna sedsala nozdehan serdarî li beşekî mezin ji deşta Cûmê û devera Çi.Heştiyan dikir. Bapîrê vê malabtê yê yekê û naskirî Qelender Efendî bû. Efendî jî, ji kesên ku xwendin û nivîsandin dizanin re dihat gotin, lewre tê wê wateyê ku ew mirovekî xwende bû, û belkî karmendekî dewletê jî bû. Ew li sedsala hevdehan li Gu.Mezin, ku li rojavaya Gu.Maratê ye, rûdinişt. Li ser kevirê deriyê xaniyekî wê malbatê li Gundê Mezin, dîroka 1830î neqşandî ye. Xaniyekî wan î din jî li gundê Maratê ye, ew jî li sala 1857an hatiye avakirin(1).

Tê gotin, ku Mistefa Aĝa kurê Qelender Efendî bi destê mala Hesen Efendî hat kuştin, wê hîngê kurê wî 'Umer biçûk bû, diya wî Sefûn jî jineke jîr bû, Sefûnê li dû mêrê xwe rêbertiya malbatê kir, û ji ber wê jî 'Umer bi navê diya xwe hat nasîn.

Dema vê malbatê ya herî geş, nîvê diduyan ji sedsala hejdehan û destpêka sedsala nozdehan bû. Li wê demê, nîvê jorin ji deşta Cûmê û devera Heştiyan di bin destê wê de bû(2). Li wan deman, şer di navbera wê malbatê û Betal Axayê Gênc de derket, û Betal Axa tê de bi ser ne ket.

Xuya ye ev bûyer li dema Mistefa Axa çê bûye, çinkî piştî mirina wî, Betal Axa daxwaza zewaciyê ji Sefûn Xatûnê kir, lê wê ew şikand û gotineke wê ya binavûdeng li ser wê daxwazê heye(3). Ji

---

1- Li rûyê xanî stêrkeke şeşper heye, gelo têkliya Olî di navbera stêrka şeşper ku ola Mûsewî dest nîşan dike, û navê "hoza Dawûdî" de heye? Lê hostekî Cihû ew ava kiri be? Yan jî, tenê neqşeke fodilkirinê ye?

2- Aşekî wan î avê li ber girê 'Endarê hebû ra sala 1958an kar dikir, hîn kavilên avahiya wî hene.

3- Got (Eger ez bimîzim kela Betalê Betêl, dê li ber lêmiştê here).

bilî mala Gênc, mala Hesen Efendî jî li ber 'Umer Sefûnan rabû, emê di rûpelên pêş de li ser wê malbatê jî deng kin.

Di dema geşbûna vê malbatê de, destlata Osmanî sist bû bû, loma jî tu nakokiyên cengawerî bi dewletê re derneketin. Lê tu kesan ji vê malbatê postên bilind ji dewleta Osmanî wernegirtine, ji bilî ku Mihemed Nûrî Paşa, ku li salên çilî ji sedsala bîstan miriye, digot nav û navnîşana wî yên xalê wî ne, ew jî li dawiya sedsala nozdehan hakimê navça Der'ayê bû ku niha li başûrê Sûryê ye(1).

Mala 'Umer Sefûna ji destpêkê de li dijî hebûna Firensiyan li Navçê sekinîn. Rêberê malbatê Îbram Axa, yek ji rêberên Qiwayê Millî bû li Çi.Kurmênc û berxwedanek tund li dijî artêşa Firensî rakir. Dora sê sed çekdarên wî hebûn, û deverên Heştiya û Xastiya di bin destê wî de bûn. Îbram Axa piştgiriya Tevgera Mirûdan jî kir, û ji bo wê yekê, û bi bihaneya lêgerîna li çekan, gelek mirovên mala 'Umer Sefûna hatin girtin û êşandin, Îbram Axa bi xwe jî li gel kurê xwe û peyayê wî Soro, li navbera gundên Maratê û Dargirê bi xinanî hatin kuştin. Tê gotin ku destê hin Axeyên navçê û destlata Firensî di kuştina wî de hebû.

Mala 'Umer Sefûna Mislimanên Sunnî ne, li ser rêola Henefî ne, û têkliyên wan bi hemî nofên olî re ku li navçê hene, baş bûn.

Çar mêvanxaneyên mala 'Umer Sefûna hebûn: **Yek** li Gu.Dargirê ya 'Umer kurê Îbram Axa bû. Ya **diduyan** li Gu.Mezin a Şêx Axa kurê 'Umer Axa bû. Ya **sisiyan** li beşê Gu.Maratê yê başûrê bû, ew ya Evdille kurê Qere Misto bû. Ya **çaran** jî li bakurê Maratê bû, ew jî ya Osman Axa kurê Îbram Axa bû û mêvanxana sereke bû ji malbatê re.

Li roja îro, pêwendiyên hozî li ba Milî Dawûdî û mala 'Umer Sefûna nemane, lê li vê dawiyê wan jî wekî malbatine din, encûmaneke xwe ye malbatî çê kiriye.

Gelek mirovên vê komehozê ji gundên xwe derketine, lê belê bi tevahî, wan kesayetiya xwe ya zimanî, netewî û civakî baş parastine.

---

1- R.Lîsko dibêje: Li salên sihî ji sedsala bîstan, Mihemed Nûrî Paşa navserê Gu.Maratê bû, wî rewşa malbatî û hozî ya navçê baş dizanî. R.Lîsko gelek zanîn li ser dîroka Çi.Kurmênc û malbatên wê jê birine. M.Nûrî Paşa bi çar zimanan dizanî: Tirkî, Firensî, Erebî, ligel zimanê xwe Kurdî.

Mirovên malbatê yên di warê xebata netewî de naskirî jî hene, wek: Îbrahîm Arif û birayê wê Edîb, Zekeriye Mistefa... Ji bilî wê, wan baş bala xwe daye xwendinê, û bi dehan xudan dîplomeyên xwendina bilind di nav wan de hene. Çend nivîskar jî ji vê komehozê hene, wek her du rêzdar Mihemed Nûrî Xorşîd û Şekîb Bekir.

## Mala Hesen Efendî

Li gor temenê her nifşekî, ku di navbera 25 û 30 salî de ye, texmîn dibe, ku Hesen Efendî li destpêka sedsala hejdehan hatiye meydanê. Hesen Efendî kurkê Baybegîtiyê ji dewleta Osmanî wergirti bû.

Gotineke gelêrî heye dibêje, dema ku mala Gênc li sedsala hejdehan hatin deşta Cûmê, destûr ji mala Qedûr -ji Hesen Efendiya ye- ji gundê Keferdelê xwestine, ji ber ku wê hîngê, ew mala li wan deveran xudî dewran bû. Lê pişt re, li sêyeka sisiyan ji sedsala hejdehan, hin nakokî di navbera wan de derketin.

Li sala 1793an, Hesen Efendî li hember destlata Osmanî rabû, û destê xwe danî ser hin deverên Çi.Kurmênc. Dibêjin, wî li demeke kin serbixwebûn nîşan da û xûk ji deverên navçeyê derdora Helebê distand. Lê li dawiyê, waliyê Helebê ew bi dibare dîl girt, û li cîgeha Serê Kaniyê (Gu.Kefercenê) bi darve kir.

Li derbarê binyata hozî ya mala Hesen Efendî, tiştekî tekûz tuneye, lê kesên malbatê yên ku bi mijarê mijûl dibin dibêjin: Hin bapîrên me digotin ku em Aştî ne, guman heye ku Aştî binehozeke Reşî be, jê li ber Çi.Cûdî hene. Hêjayî gotinê ye jî, ku pêwendiyên mirovantiyê di navbera mala Hesen Efendî û mala Hec Omer a Reşî de hebûn(1). Lê di vê babetê de, belkî ya rastir ew be, ku mala Hesen Efendî jî mîna mala 'Umer Sefûnan ji hoza Millî bin, mala 'Umer Sefûna jî vê yekê dibêjin û dipejirînin.

---

1- Navsalên mala Hec Omer dibêjin, mirovekî ji mala Hesen Efendî, ji Gu.Gazê, bi navê Mihemedê Gazê, çar mirov kuşti bûn û hati bû li ba xalanên xwe ji mala Hec Omer li Dêrsiwanê rûnişti bû, wî pir baş dida tembûrê, û bi saya wî sazê tembûrê li nav Kurdên deverên Kilisê belav bû. Ev bûyer ji bêtirî sed salî de ye.

Hesen Efendî li devera Heştiya li Gu.Gazê ku dora ٩/km li rojavaya bajarê Efrînê ye rûdinin. Du lawên Hesen Efendî hatine nasîn, **Mistefa Axa**: Gundên Til Hemo û Şêx Evdirehmên ên wî bûn û neviyên wî li Gu.Gazê rûdinin. **Îs Axa:** Du kurên wî hatine nasîn, yek **Omer Axa** ye, jina wî ji Robariyan bû, hinek ji neviyên wî li Gu.Gazê rûdinin, ê diduyan jî **Elî Beg** bû, diya wî jî ji mala Hec Omer bû, ew bavê Zênel e, Mala Zênelê ku niha li Gu.Tilifê dimînin, ji wî dikşê.

Elî Begê beşê rojhilat ji Çi.Heştiya kiri bû bin destê xwe. Wî mirov digirtin, dikirin Hebsê û bi darve jî dixistin. Sêdara wî dareke merxê ye mezin li ber gund bû, ew dar ra van salên pêşîn ji dûr ve xuya dibû. Roja îro rêzdar Xelîl Ebdî di xaniyê Elî Begê de rûdine[1].

Li nîvê diduyan ji sedsala bîstan, piraniya kesên Hesen Efendiyan bi Komonîstiyê hatine nasîn, û gelek xortên wan di wê partiyê de dixebitîn. Ji ber wê jî, gelek ji wan li dewletên Sosyalîst ên berê, bi taybetî jî li yekîtiya Sovyetistanê xwendina bilind qedandine.

Malbata Hesnefendiyan a ku roja îro navnîşana Axetiyê hilgirtiye, mala Betal Axayê Zênel li Gu.Tilifê ye.

## Mala Seydê Mîmê

Mîm, navê jinekê ye li Gu.Gazê li ba mala Hesen Efendî rûdinişt, paşê jî ji wir barkir û çû li Gu.Çolaqa li ba mala Elî Begê, ku ji kevinên gund bûn, rûnişt. Seyd jî lawê Mîmê ye.

Mala Mîmê ji koka xwe de Kokcî ne, kurên Mîmê di hilkirina daran de dixebitîn, û paşê jî şûna wan daran diçandin û dikirin rez û zêtûn. Ev nofa ji mirovan ji deverên Albistan, Dêrsim û Meletiyê dihatin Çi. Kurmênc û ji koka xwe de Kurdên Zaza ne.

Pişt re, lawên Mîmê zengîn bûn, wan li destpêkê Gu.Kanîgewrkê kirîn, û li dawiya sedsala nozdehan Xelîl (1877-1958)Z kurê Seydoyê Mîmê bi nîşana Axe jî hat nasandan, û wî û birayê xwe Betal Axa, û pişt re kurê wî Mihemed, bûn xudanê van gundan:

---

[1]- Elî Begê mirovekî ji ola Êzdî ji Gu.Feqîra bi wê darê ve bi dar xist û laşê wî çend rojan bi dar ve ma, û kesekî newêrî ew laşe ji dar daxista.

**Miskê Jorin û Jêrin, Bircikê, Sindiyankê, Til Hemo, 'Endîbê, Tilifê, Çeqelê Cûmê, Çolaqa, Kanîgewrkê, Qujûma.**

Lê li gor zagona durustkirina çandiniyê, ku li destpêka salên şêstî ji sedsala borî derhat, dewletê destê xwe danî ser piraniya arziyên wan û li cotariyan belav kir. Û bi wê yekê Mihemed Axa Kurê Xelîl Axa û zaroyên wî dewlemendiya xwe winda kirin.


Xelîl Aĝayê Seydê Mîmê

Pêwendiyên mirovatiyê di navbera mala Seydê Mîmê û Şêx Sim'el de hebû, ji ber wê jî, ew herdem di hilbijartinan de piştgirên hev bûn.

Li sala 1947an Xelîl Axa di hilbijartinê de bi ser ket û bû endamê perlemana Sûryê. Parêzer Mihemed Nûrî Arif di salên 1961-1962an de, bû endamê encûmena nûneran li Sûryê. Birayê wî Betal jî, ji sala 1986an ra 1998an, ji ber partiya Be's ve, nûnertiya Na.Efrînê di encûmena gelê Sûryê de kir.

Ji Malên Seydê Mîmê yên ku niha naskirî ne, mala Erif Axa li Gu.Bircê. Gelek malên wan li Gundên Çolaqa, Kanîgewrkê û Bircikê rûdinin.

Axeyên Seydê Mîmê, mîna piraniya Axeyên navçê, hezkirina gel ne standin, lê Kemalê Cemîl Axayê Seydê Mîmê, ji mirovên rêza yekê bû ku di warê siyaseta netewî ya Kurd de li Çi.Kurmêmc xebitî, û ji ber ve kar kir, ew niha li Ewrupa dimîne û derhênerê Sînemê ye. Xûşîka wî Sebah jî jina Kurd a destpêkê ye ji Çi.Kurmênc, ku dîplomeya zimanê Înglîzî wergirtiye.

Ji hêla binyata hozî de, mala Seydê Mîmê dibêjin ew ji hoza Xerza ne, gundekî bi navê Xerza li kêleka gundê wan Çolaqa heye, û mala 'Elîncika li wî gundî xalanên mala Seydê Mîmê ne.

# Axeyên Kefirsefrê

Ji ber ku Axeyên Gu.Kefirsefrê berî dora sed salî ola xwe ya Êzdî berdabûn û bibûn Misliman, loma jî ew berê bi navê Mehmediyan dihatin naskirin.

Tê gotin, ku dema li navîna sedsala nozdehan, bapîrên Mihmediyan ji ber Hewe Xatûna mala 'Umê ve li hember Xelîl Axayê Hec Omer sekinîne, wê zeviyên di navbera Gu.Kefisefrê û Cindirêsê de baxişandin wan, û ji wê demê de rewşa wan baş bû, ew dewlemend bûn û ji destpêka sedsala bîstan de bi navnîşana Axe hatin nasandin, lê belê roleke wan e giring di karûbarên navçê de tunebû. Tenê du gundên wan hebûn Kefirsefrê û Mehmediyê.

Aĝeyên Kefirsefrê ji tiştên beloq û ji çaliman hez dikin, ew sincî jî pir caran wan dixe tengiyên diravî[1].

Axeyên Kefirsefrê guh dane xwendinê, li roja me bi dehan kesên wan xwendina bilind bi dest xistine.

# Hoza Dina

Hoza Dina ji hozên Kurdî yên kevin û gewre ye. Navenda wê ya sereke li deşta Sirûcê li devera Rihayê ye. Çend gundên Dinan li bakur û rojhilata Helebê jî hene, wek Til Ĥasil, Til 'Eran[2]…

Li dirêjiya sedsalên hejdehan û nozdehan, hoza Dina ya tewir mezin û hêzdar bû li deşta Cûmê û Çi.Lêlûn. Li destpêka sedsala hejdehan, hêza sereke ya Betal Axayê Duyem xudanê kela Basûtê ji mirovên hoza Dina bû.

Dina ji hêla olî de Êzdî ne, gundên wan li deşta Cûmê li ber perava çemê Efrênê yê çepê, û li ser beşekî mezin ji Çi.Lêlûn belav dibin.

Rêbertiya Dina ya berê li Çi.Kurmênc bi zelalî ne nas e, lê ya ku tê zanîn, ew li dora mala Gênc dicivîn, û li dawiya sedsala

---

1- Yekî ji wan diranekî bizina xwe zêr kir. Wan dîkên biha jî dikirîn û berdidan hev.

2- Malên Nebhan û Xeyata li Helebê mêlag dikin, ku ew Kurd in ji hoza Dina ne, û pismanê Dinayên Kîmarê û Bircê ne.

nozdehan, hin ji Dinayên Gu.Xezîwê bi navê Axa hatine destnîşankirin.

Roja îro gelek mirovên gernas û xudan diplomayên bilind ji Dinan hene.

Piraniya malên Dina li deşta Cûmê û li Çi.Lêlûn, li ser van Gundan belav dibin:

**Qîbarê, Turundê, Kurzêlê, Basûtê, Xezîwê, Şadêrê, Qurbê, Kîmarê, Gu.Mezin-Şêrewa, Dêwa, Basûfanê.**

## Hoza Çeqelî

Çeqelî binehozek e ji hoza Milan[1], /Emîn Zekî, beş1, rûp 398/. Kesên wê li Çi.Kurmênc li van gundan rûdinin: **Coqê, Xelnêrê, Çeqela Cûmê, Keferşîlê, Ênhecerê, Çeqelê Jêrin û Ortê, Şiketka, Keferdelê Jêrin, Qermîtliq, Çolaqa, Aşkê Xerbî, Îkîdamê, Mi'erînê, Dêrsiwanê, Dêrbelûtê, Celemê, Cindirêsê..**

Mirovên Çeqelî di hemî karên civakî, siyasî, aborî û pêşeyî de çalak in. Ew ên destpêkê ne ku li van salên dawîn pêwendiyên hozî vejandine, mixtarê Xelnêrê Seydê Qûşo kirin rêberê xwe.

Komonîstê naskirî Wehîdê Mehmûd ji Gu.Coqê jî ji hoza Çeqelî bû, ew li salên heftê ji sedsala bîstan heşt salan ji ber Partiya Komonîst ve endamê encûmena gelê Sûrî bû.

Ji gernasên Çeqeliyan di sedsala bîstan de li Çi.Kurmênc, Osmanê Hido bû. Ew Xoce bû û di şerê cihanê yê yekê de hat dîlkirin. Di dema dîlîtiyê wî de bi ramanên Belşefîkan têkar bû. Lê ji ber ku ew berê Xoce bû, û paşê jî erkên xwe yên olî berdan, dihat gotin ku bûye (Fermesûn), ango Masonî.

---

1- Çeqeliyên navça Çi.Kurmênc dibêjin, ew şaxek in ji hoza Reşî ku ji dozdeh binehozan pêk tê.

# Komehozine din

Ji bilî hoz û malbatên ku li jor hatine gotin, gelek komikên hozane yên din jî li gundên navçeyê hene, bi taybetî jî li gundên Cûmê û Şêrewa. Emê niha yên ku me kanî bû nas bikirana, û gundên ku lê rûdinin, bêjin:

-**Hekarî**: Li Gu.Qîbarê û Feqîra.

- **Şerq**î: Gu.Mezin "Şêrewa’’, Feqîra, Birckê silêmên, Turindê.

- **Xendeqî**: Li Basûfanê.

- **Porî:** Li Beradê, Kurzêla Cûmê, Birc Hêderê. Warê wê yê resen li navbera Amedê û Mêrdînê ye.

- **Qîtreş:** Dora 50 malî li Cindirêsê hene, çêroknivîs Ebdirehman Seydo jê ye.

- **Kirafî:** Li gundên Bircka Silêmên, Fafirtînê û Kibêşînê rûdinin. Warê wê yê resen navça Çi.Cûdî ye.

- **Kûsî**: Hejmara kesên wê dora 2000 mirov e. Ew li van gundan rûdinin: Aĝcelê, Senarê, Kosa, Cindirêsê, Firêriyê, Ebû Ke'bê Xerbî, Meydan Ekbez. Ew li Rewendozê û li Diyala ji Kurdistan Îraqê jî hene. Kûsî yan Kasî navê miletekî kevin e jî, ew ji bapîrên Kurdan tê jimartin, /Emîn Zekî, beş 1, rûp 65/. Kûsî binehozek e ji hoza Reşî.

- **Rojkî**: Li van gundan hene: Şêxorz, Se'rîncek, Birîmce, Diraqliya. Ew hoza Şerefxanê Bedlîsî ye, mirovên wê bi dilêrî, wêrekî û camêriyê navdar in, /Şerefname, beş1, rûp 65/.

- **Hevîdî**: Li gundên Tirmûşa, Goliyê Jorin û Çeqelê Jêrin hene.

## Nofine Kurdî yen din li Çi.Kurmênc

Nofine Kurdî yen din li nav civaka Çi.Kurmênc hene, ew xudî taybetiyên civakî ne, bi karên taybet radibin û pê hatine naskirin. Ew jî ev in: **Krîf**, **Şêxemok**, **Bûd**, **Sepetcî**.

Hin caran civak bi çavekî biçûk li wan dinêrin, kesin jî hene bawer nakin ku ew Kurd in. Belkî ji ber wê jî, wan bi demê re xwe ji nava civakê vekişandine û li aliyekî wê sekinîne.

Berê piraniya malên wan nofan goçeber bûn, û di konan de rûdiniştin. Lê di dehsalên dawîn de, piraniya wan li navendên bajarên navçê bi cih bûne, nemaze li Efrîn û Cindirêsê, beşekî jî jê bare Helebê kiriye. Piraniya wan jî, ew karên taybet ku berê dikirin berdane û di warine din de dixebitin, û rewşa aborî ya hinekan jî baş bûye, ji ber wê jî, nêrîna civakê li ser wan hinekî nerm bûye û hatiye guhartin, ne tenê wilo, hejmareke hêja ji wan guhê xwe didin pirsa siyasî ya Kurdî ya netewî û pê mijûl jî dibin.

Emê bi kurtî li ser rewşa her nofekê ji wan rawestin:

### - Kirîf

Kirîf, nofeke Kurdî ye taybet e. Ew zelal dibêjin em Kurd in, hin ji wan di rêxistinên Kurdî yên Siyasî de jî dixebitin.

Rola Kirîfan di parastina kelepûra Kurdî ya hunerî de, nemaze ji hêla saz û awazê ve, pir giring e. Wan ji berê de ahengên şahiyan û dawetên Kurdî şên dikirin.

Li demên berê, her Axakî Kirîfên xwe yên taybet hebûn, ew tev malên xwe li ba Axê rûdinştin, xizmet Mala wî dikirin û ahengên wî şên dikirin, û ji ber ku Kirîf bi tinziyên xwe navdar in, ew bi rola xemrevandinê jî di civatên Axê de radibûn, gelek serpêhatiyên wan di wî warî de hene[1]. Ji ber wê jî, dema ku Axetî lawaz bû, Kirîf jî ji ew rewşa nîv koletî rizgar bûn.

---

[1]- Rojekê Axek rûnişti bû, zarokek di wir re derbas bû. Axê ji kirîf pirs kir: Kirîf ew zarok ê kê ye? Kirîf got: Ê me ye Axe ê me ye. Axe dibêje: Ew çi mîna çêlkî Axa ye!? Kirîf lê vedigerîne û dibêje: Dayîna Xwedê ye Axe dayîna Xwedê ye! Zarokên me li we tên, ên we jî li me tên!!

Piştî ku şêweyên ahengên dawetan hat guhertin, rola Kirîfan jî di jiyana civakî ya hunerî de hinekî kêm bû. Ji ber wê yekê, piraniya kirîfan gundên ku lê diman berdan, û bare bajarên Efrîn û Cindirêsê kirin, lê hejmara mezin ji wan berê xwe dane Helebê û Şamê, yên ku li navçê mane jî, di ber şênkirina ahengan re, karine rojane yen din dikin û debara jiyana xwe dibînin.

Hejmara Kirîfên ku hîn li navça Efrînê dimînin dora 2000 kes e, ew li bajarên Efrînê û Cindirêsê û gundên mîna Kefirsefrê, Bircikê, Kora… rûdinin.

Ji Kirîfên ku di sedsala bîstan de, bi lêdana zurnê û pîkê navdar bûn:

**Silêman**, li Gu.Turundê rûdinişt, pişt re, li salên Şêstî ji sedsala borî çû li Îzgeha Şamê wek zurnevan kar kir.



**Hunermend: Henanê Nêsir**

**Henanê Nêsir**, ew jî bi sazkirina zurnê pir navdar bû, rêzdariyeke wî li ba civaka Çi.Kurmênc hebû, û wek rêberekî Kirîfan dihat nasîn.

Digel ku rewşa Kirîfan a civakî, û jiyana wan pir hatiye guhertin, lê hîn nêrîna civakî ya neyînî bi temamî ji ser wan ranebûye. Û bi tevahî, Kirîf ji nofa xwe dizewicin.

Şêweyê dengkirina Kirîfan balkêş e, û ew yekser pê tên naskirin. Kalemêrên Kirîfan cilên Kurdî yên filiklorî, kumê qulik û şelwer li xwe dikin.

Ma em bêjin, ku hin Kirîf bi nêçîra lawirê Kipri navdar in, û gelek serpêhatiyên wan yên şêrîn di wî warî de hene.

## - Şêxemok

Hejmara Şêxemokan nêzîkî 120 malan e, bi piranî li bajarê Efrînê li taxa Eşrefiyê rûdinin. Dora 300 mal jî bare Helebê kirine. Malbatên wan yên sereke li Na.Efrînê ev in:

**Şaşoler, Gemarler, Serqot, Kawî, Derwîş Elî, Şêx Hesen.**

Li demên berê, Şêxemokan karên taybet dikirin, wek: Li defikan didin, şîş li xwe dixistin û li gundan digerin, nemaze li şevên meha Rojiyê[1], ango wan tu karên berhemdar ne dikirin, û piraniya wan li ser camêriya xelkê dijiyan. Lê niha wan ew kar berdane û karên berhemdar ên têvel dikin, wek: Karên çandiniyê, kirînfirotanê, rêwîngiyê, barhilanînê… û hwd. Ji ber wê jî, wan rûmeta xwe ya civakî standiye.

Şêxemok ji hoza Şêxî û wek Kurdên resen xwe dibînin, ne tenê wilo, li salên nodî ji sedsala borî, ew hemî dostên Partiya Karkirên Kurdistanê bûn, û hin Şehîd jî di wê rêkê dane.

Bilêvkirineke Şêxemokan e taybet ji bêjeyên Kurdî re heye û pê tên nasîn. Ew jî, bi piranî, mîna Kurdên Zaza tîpa (j) bi (z) diguherin.

## - Bûd:

Wek biçûkirina vî navî, ji wan re Bûdik jî tê gotin. Hejmara wan li Na.Efrînê di navbera 20 û 30 malî de ye. Hemî jî li bajarê Efrînê rûdinin. Lê hejmara wan ya mezin bare Helebê kirine. Piraniya wan di barhilanînê de kar dikin.

Bi şêweyekî tevahî, Bûd Esmer in, benzê wan mîna yê mirovên Hindistanê ne. Ji ber wê jî, guman dibe ku navê wan ji navê rêberê Ola gelê Hindistanê (Bûza) hati be. Lê mirov dikare bêje jî, ku belkî têklî di navbera navê Bûd û Hoza Bûdkî ya Kurd de hebe. Ew hoza

[1]- Du mirov bûn, li defikê didan, yekî distira, yê din jî gotinên wî yên xweşik û bi awazên şêrîn lê vedigerand, wê tobloyê, di derengiya şevê de, hestekî bêmînak ji tirsê û kêfxweşiyê li ba me zarokan çê dikir.

li dema siltan Silêmanê Qanûnî, ji hozên Bedlîsê bû, /Şerefname, rûp 388/.

Ji hêleke din ve, di salnameya sala 738an/B.Z. ya qeralê Aşûrî Tîglat Pilezir de hatiye û dibêje, ku wî hinek dîlên gelê Gotî (ji bapîrên Kurdan e) rakirine û birine li bakurê Sûryê û Finîqiya Bakur bi cih kirine, di nav wan de komeke bi navê Bûd jî hebû, loma jî guman heye ku Bûd ji hozên gelê Med bin. Hîrodot jî li ser wê yekê deng kiriye û Bûd wek komek ji miletên Rojavaya Medyayê dîbine, /Diyagonof, rûp 191-192/.

## - Sepetcî

Vê nofê berê sepet çê dikirin, loma jî bi wê pîşeyê hatine nasîn, lê piştî ku alavên plastîkî derketin, wan ew pîşe berda û karên têvel dikin.

Hejmara wan dora sed malî ye, ew li bajarê Efrînê rûdinin. Ew li ser Bineola Qizilbaş in. Li roja me, piraniya wan di çêkirina diranan de dixebitin û diranan zêr dikin.

# Ereb li Çiyayê Kurmênc û komehozên wan

Serhejmareke fermî ji netewan re, Ereb jî di nav de, li Na.Efrînê çê ne bûye. Serhejmara Ereban a yekê, ji sala 1904an de ye, ew di salnama wîlayeta Helebê ya Osmanî ya sala 1904an di /rûp 282/ de hatiye. Li gor wê, li qezeyên Kilis, Minbic, Sem'an û deverine din jî bi serve bûn, 500 kon bi tevahî 4000 Ereb hebûn. Ew jî ji 'Umêrat, Micademî, 'Icêl û Bettoş bûn.

Lêkolînvan Ehmed Wesfî Zekeriya jî di pirtûka xwe /hozên Şamê, rûp 556/ de li derbarê hozên Erebî li Çi.Kurmênc dibêje: ((Ji bilî binehoza Finde ya 'Umêrat, Ereb lê tunene, warê 'Umêratan ê resen li Na.Kobaniyê ye, ew Ereb jî li gundên Basûtê, Bablîtê, Kokebê û Tilhemo rûdinin, lê hin malên Ereb ji hozên têvel li gelek gundên din jî hene)). Ew dibêje jî ku ((Hejmara malên 'Umêratan dora 1000 î ye, hemî jî bûne cotarî û di kutik de hatine tomarkirin)). Lê belê baş diyar e, ku ev hajmara dawîn ji rastiyê dûr e, çinkî piştî heftê salî ji nivîsa Ehmed.W.Zekeriye, hîn hejmara 'Umêratan ne gihîştiye hezar malî.

Nêzîk nîvê Erebên navça Efrînê li çar gundên ku bi tevahî Ereb in rûdinin, ew gund li ser taximê navçeyê yê Rojhilat in, ew jî ev in: 'Inabkê, Mêremînê û du gundên bi navê Şewarĝa. Nîvê Erebên din jî, li nav gundên Kurdan, li deverên Efrînê û Cindirêsê belav dibin.

Dema em bi dû dîroka hatina Ereban li navça Çi.Kurmênc ketin, û me ji kalemêran pirs kir, xuya bû, ku Ereb li dirêjiya dehsalan, bi hejmara malekê yan çend malan hatine navçê. Ango, bi tevahî em kanin bêjin, ku ew di çar pêvajoyan de û bi van şêwe û rewşan de hatine navça Çi.Kurmênc:

**Qonaqa yekê**:

Komên destpêkê ji kesên Ereb li nîvê yekê ji sedsala nozdehan û li destpêka sedsala bîstan hatine navçê. Li destpêkê mal in ji hoza Ni'êmî, paşê ji Cês û li dû wan jî 'Umêrat hatine. Ew bi şêweyên malane, yan jî çend kon bi pezê xwe re ji bo çêrê, yan ji ber sedemên civakî ji hozên xwe vediqetîn û dihatin navçê, li destpêkê ew li derveyî gundan rûdiniştin.

Malên ji hozên Ni'êm û Cês ji demeke dirêjtir de di nav Kurdan de dijîn, zewacî jî di navbera wan û Kurdan de çê bûye, û loma jî piraniya wan bi Kurdî daxivin û xwe wek Kurd dinasin. Mînakên zelal ji kurdbûna Ereban: Ni'êmên gundên Ereba, Dêwa û Cêsên 'Ênhecerê, û gelek ji bilî wan jî hene. Û ji ber ku 'Umêrt ji demeke ne dûr de hatine navçê, wan taybetiyên xwe yên netewî û hozî parastine, lê ji ber têkliyên wan ên demdirêj û di riya zewaciyê re jî bi Kurdan, ew jî di gelek war û sinciyên xwe yên civakî de mîna Kurdan bûne.

**Qonaqa diduyan:**

Berî ku deşta Hemqê bi ser Tirkiyê de here, li salên kêmbaran, Erebên xudî pez, ji warên xwe yên li rojhilata Helebê û Berriya Şamê dihatin, û li deşta Hemqê datanîn. Piştî ku Senceqa Iskenderonê ji Sûryê hat qetandin, ew Ereb dihatin navça Çi.Kurmênc, nemaze deşta Cûmê, û pişt re hinek ji wan bi şêweyekî herdemî li navçê man, û piraniya wan li çend gundan ji devera Cindirêsê û deşta Cûmê bi cih bûn.

Disa di wan deman de, gelek mal û kesên Ereb dihatin li ba Axan kar dikirin. Axan jî xebtandina karkerên Ereb ji yên Kurd baştir didîtin, çinkî wan bawer dikir, ku tirs ji karkerên Ereb tuneye, û kengî bixwazin dê kani bin wan ji kar biqewtînin. Lê gava ku zagona durustkirina çandiniyê pêk hat, ew Erebên ku hîn li navçê bûn, sûd jê wergirtin, bûn xwedî mal û zevî û li wan gundan bi cih û mal bûn.

Dîsa li wê demê, hin Erebên Senceqa Iskenderonê jî hatin navçê û li bajarê Efrînê bi cih bûn, mîna malên 'Ecan, Qut, Ĥerkûk… Ew li ser binola 'Elewî ne û bi navê "Lîwaî" tê nasîn. Li dema niha, hin mirovên wan bûne berpirsyariyên peyebilind li parêzgeha Helebê,

wek: Rêzdar 'Eladîn 'Ecan bû endamê şaxê partiya Be'is li Helebê, û sekretêrê parêzgerê Helebê jî, du birayên wî jî di artêşa Sûryê de evserên payebilind in.

**Qonaqa sisiyan**:

Ew li dema pêkanîna zagona durustkirina çandiniyê li salên şêstî ji sedsala bîstan hatin Na.Efrînê. Wê çaxê, zevî li ser malên Ereb yên ku nû ji berriya derdora Helebê hati bûn û xudan pez bûn, hatin belavkirin. Hin endamên P.Be'is ên wê demê mêlag dikin, ku bicihkirina Ereban li wê demê li Na.Efrînê pêlaneke Erebkirinê bû û bi şêweyekî fermî û bi biryar ji hêla P.Be'is ve dihat kirin, çinkî wê eşkere biryar dabû, û doz dikir ku "malên Ereb di herêmên Kurdan de werin çandin". Li ber roniya wê pêlanê, endamê Ereb di komîteya bicihkirina zagona durustkirina çandiniyê û belavkirina zeviyan de li devera Cindirêsê, zevî li ser bi dehan malbatên ku mervên wî bûn, belav dikirin, ango pir malên Ereb bi şev ji rojhilata Helebê dihatin, konên xwe datanîn û bi rojê re jî dibûn xudî zevî. Pişt re wan war girtin û gelek ji wan niha pir dewlemend jî bûne.

**Qonaqa çaran**:

Beşek ji Ereban piştî salên pêncî ji sedsala bîstan hatin li bajarê Efrînê rûniştin, piraniya wan ji gundên navça Sem'anê ne, wek: Niblê, Darazê, Ĥeyanê… Lê belê ew bi şêweyekî xwezane û ji bo karê bazirganiyê hatin li navçê bi cih bûn. Roja îro rewşa wan ya aborî baş e, û piraniya wan dewlemend bûne.

Em ji hêla xwe de li sala 1998an, bi serejimareke texmînkî rabûn, û me kanî hejmara Ereban û binyata wan a hozî û malbatên wan wiha binasiya:

| ***Navê gund*** | ***Hoz û jimara malan*** | ***Navê Gund*** | ***Hoz û jimara malan*** |
|---|---|---|---|
| **Ĥemam** | Cês 4 | **Qîlê** | Ĥesanî 2 |
| **Nisriyê** | Bûselah 10 | **Coqê** | 'Umêrat 2 |
| **Mile Xelîla** | 'Icêl 2 | **Ereb Şêxo** | 'Umêrat 15 |
| **Dêwa** | Bûxemîs 2 | **Tirtewîl** | 'Umêrat 10 |
| **Qîbar** | 'Icêl, Bobene 7 | **Qeredepe** | Micedemî 50 |
| **Firêriyê** | Ĥidir, Benî Zêd 26 | **Miskê jêrin** | Micedemî 3 |
| **Merwanê Jorin** | Umêrat 1 | **Miskê Jorin** | Micedemî 1 |
| **Bircikê** | Xeracî 1 | **Tilsilorê** | Selaĥî, Ĥedîdî, Cinêdan,'Ecac10 |
| **Merwanê Jêrin** | Benî zêd, Begarî 8 | **Celemê** | Ni'êm 27, 'Icêl 9 |
| **Ĥemêlkê** | Ecacî,Benî Se'îd 9 | **Îska** | Sebxat, Ĥedîdî 8 |
| **K'anî gewrkê** | Xeracî 1 | **Tilhemo** | 'Umêrat, Benî Se'îd 6 |
| **Dêrbelûtê** | Umêrat, Selaĥî 7 | **Mehmediyê** | Selaĥî,Siltanî, Benî Nayêf, Ĥidr14 |
| **Hecîler** | Selaĥî, ‘Ecac, Demlexî 30 | **Heciskenderê** | 'Îsewî, Ĥidir 6 |
| **Ebû Ke'b** | 'Icêl, Ecac 5 | **Aşkê Xerbî** | 'Îsewî 4 |
| **Remadiyê** | Benî Zêd 1 | **Qurbê** | Ĥidir 1 |
| **Wêregan**[1] | 'Icêl 35 | **Qujûma** | ٣= |
| **Turindê** | Ni'êm 7 | **Mersewa** | Bobene 35 |
| **Kefermiz** | ١٠؟ | **Ereb wêran** | Micedemî 5 |
| **Bircê** | 'Umêrat, Heyderî 10 | **Gu.'Elkê** | ٤ ؟ |
| **Maratê** | 'Umêrat 10 | **Basût** | 'Umêrat 93 |
| **Bablîtê, Mezre'et Ĥesûn** | 'Umêrat17 | **Efrîn** | 'Umêrat200, Boben50, Tat100 |
| **Gu.Astêr** | 'Umêrat 16 | **Cindirês** | Ecac,Benî Nayêf 50 |
| **Firêriyê** | Ĥidir 4 | **Xezîwê** | Benî Zêd 1 |
| **Şewarxa** | Lihêb,Ĥesanî 51 | **Inabkê û Mêremînê** | Tat 300 |
| **Kurzêla Cûmê** | Tat 3 | **Qestelê Kîşik** | 'Icêl |
| | | **Kifêr** | 'Umêrat 14 |

[1]- Erebên gundên Wêregan, Mersewa û Ereb wêranê, Axan ew ji bo karên xwe anîn, û piştî bichanîna zagona durustkirina Çandiniyê, zevî standin û li wir rûniştin.

Li gor wê serhejmara texmînkî, 1400 malên wan li navçê hebûn. Li gor hejmara mala Sûrî ya gundî ku digihê heft kesan, hejmara Erebên N.Efrînê li wê salê wiha bû: 1400 mal x 7 kes = 9800 kes. Ango rêjeya/nisba Ereban ji şêniyê navçeyê digihê dora %5, ew jî li ser bêtirî 26 nof û komehozan belav dibe.

Piraniya Ereban li gundên deşta Cûmê rûdinin. Ji bilî yên gundên Mêremînê, 'Inabkê û Şewarĝa, piraniya wan bi du zimanan deng dikin, Erebî û Kurdî.

Li salên kêmbaran, hin Erebên xudan pez jî tên Na.Efrînê, hejmara wan li sala 2000an gihîşt 3000 kes, lê ew li dawiya payîzê vedigerin warên xwe. Hejmareke ne naskirî jî li dema berefkirina zêtûn û pembo, û ji bo karên çandiniyê ji gundên derdora Helebê tên Na.Efrînê, hejmara wan jî li hin salan digihê çend hezaran.

Emê li vir li derbarê du komikên hozên Ereb ên sereketir, ku niha li navça Efrînê rûdinin, baxivin, ew jî **'Umêrat** û **Bobenî** ne.

## Komehoza 'Umêrat

Guman heye ku gihandina 'Umêratan li Na.Efrînê, ji nîvê diduyan ji sedsala nozdehan de be. Rêberê wan li nîvê yekê ji sedsala bîstan kesê bi navê Ĥemûd Ĝezal bû.



**Mihemed Elî Qer'a**

Li dema ku Firensî li Sûryê bûn, kesê bi navê Zikra, ku milîsekî Firensî bû, û bi Kor Reşîtê Şêx Sim'el ve girêdayî bû, xwe wek rêberê 'Umêratan didît.

Pişt re, mirovê bi navê 'Elî Têrî derket û xwe wek rêberê 'Umêratan dît, wî li destpêkê xwest ji bin destê mala Şêx Sim'el derkeve, lê nikanî û dîsa serê xwe ji wan re danî.

Roja îro, rêbertiyeke 'Umêratan e yekgirtî li Na.Efrînê tineye. Lê malbatên wan yên naskirî ev in, wek: Ĥesûn, 'Ernê, Qer'a, Ĝezal…

'Umêrat di çandiniyê, bazirganiyê û xudîkirina pêz de jî kar dikin.

Roja îro, hejmareke baş ji xwendevanan di nav wan de peyda bûye, ji mirovên wan yên naskirî mamoste Mihemed Elî Qer'a ye, ew ji mamosteyên dibistanê yên destpêkê û jêhatî bû, û bû endamê encûmena gelê Sûrî jî, kesayetiya wî jî cihê rêzdariya rûniştvanên navçê bû.

## Komehoza Bobenî

Kesên Bobenî ji destpêka sedsala bîstan de hatine navça Çi.Kurmênc. Li wê demê, kesê bi navê Saliĥê Benawî bû bû şaneyê/wekîlê Cûzêf Xewam Fileh xudanê zeviyên ku li rojavaya bajarê Efrînê ne, û pişt re wî mervên xwe jî li xwe civiandin.

Li destpêkê, piraniya wan li Gu.Zêdiyê rûdiniştin, paşê jî xaniyên xwe li ser milê çemê Efrînê yê rojava ava kirin, û ew kolan bi wan hat nasîn.

Piraniya Bobeniyan di tîmarkirina pêz û çêlan de kar dikin, hinek ji wan di bazirganiyê û çandiniyê de jî dixebitin, lê hinek jî karê fayîza peran dikin.

Li vê dawiyê, Receb El-Sifîrî bûye nûnerê Bobeniyan ê herdem di encûmena şaredariya bajarê Efrînê de.

Bi tevahî, mirovên Bobenî pir guh nadin xwendinê û di warê civakî de jî li şûn in.

Warê hoza Bobenî yê resen li parêzgeha Reqayê li ber çemê Ferêt e. Ew bi serokê hoza xwe Diyab El-Maşî ve girêdayî ne, ew jî li Na.Minbicê rûdine.

# Qurbet û malbatên wan[1]

Qurbet an Qerecî, ji hêla benz û zimên de nofeke cudawaz e. Berê ew goçeber bûn, di konan de dijîn, hîn jî hindik ji wan jiyana konan bernedane, lê li roja me piraniya wan bûne xudî mal, û li bajarên Cindirêsê û Efrînê rûdinin.

Qurbet, ji bilî zimanê xwe, bi gelek zimanan dizanin, wek Kurmancî, Erebî û Tirkî, lê ew zimanê xwe yê taybet hîç bernadin.

Naskirina binyata Qurbetan a nijadî dijwar e, lê guman heye ku têkliya zimanê wan bi zimanên HindûEwripî yên kevin re hebe.

Mirovê Qurbet ji hêla benz û taybetiyên govdê xwe de, mîna mirovên herêma Hindistanê ne. Lê navên mal û malbatên wan Kurdî ne, wek: Gemarî, Lawir…

Hin lêkolînvanan li ser koka wan a nijadî gotiye, ku ew li dema Iskenderê Mekdonî ji Hindistanê berve Rojhilata Navîn hatine.

Berê, Qurbetên Çi.Kurmênc li dora gundan di konan de rûdiniştin. Lê niha rewşa wan hatiye guhertin, û piraniya malên ku li navçê mane, li bajarên Cindirêsê û Efrînê rûdinin. Dora 50 malên Qurbetan li Cindirêsê hene, ew ji malbatên Gemarî û Lawir in. Nêzîk 100 malî jî li bajarê Efrînê li kuça Zêdiyê rûdinin, ew jî ji malbatên Reqreq û Gemarî ne.

Li demên berê, rêberên Qurbetan yên gernas û naskirî hebûn, wan cihê xwe di civaka Çi.Kurmênc de baş girti bûn.

---

[1]- Bawer dikim, ku têklî di navbera navê Qurbet û bêjeyên (xerîbî, xurbetî) de hebe. Li herêma Balkanê jî çiyayên Karbat hene.

Roja îro hejmara Qurbetan li navça Çi.Kurmênc kêm bûye, û giraniya wan jî di warên civakî de kêm bûye.

Berê, Qurbetan bêjing ji çermê dewêr çê dikirin. Lê niha piraniya mêrên wan di karên destlepê de dixebitin.

Tiştê wan yê herî balkêş ew e, ku ew zimanê xwe yê zikmakî bernadin, û hemî kesên wan pê dizanin û daxivin.

# Lêkolîna Çaran

## Ziman li navça Efrînê

Hemî şêniyê Na.Efrînê bi zimanê Kurdî dizanin û pê deng dikin. Rûniştvanên navçê yên Ereb jî, ji bilî şêniyê gundên ('Inabkê, Mêremînê û Şewarxa-du gund in), zimanê Kurdî dizanin û pê daxivin.

Li Na.Efrînê zaravê Kurmancî tê xebtandin. Lê rengê bilêvkirina wê naskirî û hinekî cuda ye. Ji ber wê jî, gava ku yek ji Efrînê deng ke, eger ew li binê dinê be jî dîsa tê naskirin.

Bi tevahî, dengkirina şêniyê Efrînê bi lez e, ta ji wan tê bêjeyan diguvêşin û hin tîpan jê dêxin, ji ber wê jî şor kurt û têkilhevkirî derdikevin.

Kurmanciya beşê başûr ji Na.Efrînê, di awaza bilêvkirinê de berve Erebî diçe, û gelek şorên Erebî tê de hene. Li deverên bakur jî, nemaze li deverên Dêrsiwan û hoza Biya, bilêvkirina wan xwe berve Tirkî badide, û gelek bêjeyên Tirkî tê de tên dîtin.

Emê li ser hinek cudatiyên ku di çarçewa bilêvkirina zaravê Kurmancî de, li hin dever û gundên navçê hene, bisekinin:

Li deverên **bakurî**, mîna deverên hozên Şêxan, Biyan û Amkan, daçeka “**Ji**” bi “**Li**” tê guhertin, dengkirina wan jî berve bilêvkirina Tirkî dere, û gelek şorên Tirkî tê de tên dîtin, ew yek jî ji dema dewleta Osmanî de maye.

Şêniyê devera hoza **Amka:** Dengkirina wan sert e, ew giraniyê datînin ser dawiya hin gotinan û wan diguvêşin. Bi tevahî, ew cinavê peyvdar “**Î**” û yê nediyar “**E**” li dawiya şorê dikin "**Ê**". Mînak: **Tu dixwazî**, dibe: **Tu dixwazê. Ew dixwaze** dibe **Ew dixwazê**.

Lêkera bûnê **BÛ** jî bi şêweya **BÎ** bilêv dikin. Lêkera **HATIN** jî bi şêweya kevnar vediguhêzin, û di raweya dema niho de dibêjin: **Ew**

**DITÊ**. Cinavê destnîşankirinê **WIN** jî bi şêweya **HÛN** dibêjin. Em kanin, van têbînan li seranserî deverên çiyayî belav bikin. Lê belê bi tevahî, dengkirina amkiyan xort û şêrîn e.

Li Gu.**Be'dîna** û gundên Şêxî yên derdora wê, tîpa dengdêr "**u**" bi dengdêra "**I**" diguhêrin, û ji berdêla ku bêjin: **Tu Dikuxî,** dibêjin: **Ti Dikixe**/dikixê. Û ji dêvla **Gund** dibêjin **Gind** …û hwd.

Piraniya **Êzdiyan** jî: Cinavê xwemalîn "**Ê**" wek "**E**" bilêv dikin, wek mînak, ji berdêla: **Ê te ye**, dibêjin **E te ye**. Û raweya: **Tu dê- tuyê werî**, Êzdî wê wiha bilêv dikin: **Te werî- werê**, ev tişt li gundên Şikaka, bitaybetî jî yên ku hîn Êzdî mane, wek Baflûnê, Qestelê,… rind xuya dibe. Di rewşa veqetandina bêjeyan de jî, hin caran ji rêzikên rêzimên derdikevin. Wek mînak, ew di navê nêrza yê yekejimar de, ji dêvla tîpa "**Ê**" ya veqetandekê tîpa "**E**" bi kar tînin. Mîna, ji berdêla bêjin: **Ew bavê te ye**, dibêjin: **Ew bave te ye**.

Li gundên deverên başûr ji deşta **Cûmê** jî: Mera bi tevahî kane bêje, wan rêzikên rêzimên parastine û baş bi kar tînin, lê belê gelek bêjeyên Erebî ketine nav Kurmanciya wan, bi taybetî jî li ba nifşê nû.

Kurdên devera **Robariya** jî: Şêweyekî wan î naskirî di dengkirinê de heye. Ew tîpa dengdêr a dawiya şorê dirêj dikin, û wilo şor tevde dirêj dibe. Ew şorên xwe ji kûraniya gewriya xwe derdixin, tu dibêjî belkî gewriya wan bi tiştekî hatiye guvaştin. Şoreke Robariyan a taybet jî heye, ew jî **KE** ye, ew bêje bi tîpa "**K**" ya nerm tê bilêvkirin. Ew KEya, ji bo gelek mebestan tê xebtandin, lê bi tevahî, ji raweya pirsyariyê re bikar tê, wek: **Ke tê herî** ?.. **Ke tê werî**?.

Yeka Robariyan a din jî heye, ew gelek caran tîpa "**X**" bi ya "**Ĥ**" diguhêrin, û dibêjin: **Dikuĥê** ji dêvla: **Dikuxê**, ev yek di dengkirinê rind xuya dibe.

Ango bi tevahî, gava ku mirovê Robarî hevokeke tenê bêje, tavilê Robartiya wî tê naskirin.

Li çiyayê **Şêrewa** jî: Gelek bêjeyên Kurdî yên kevin û resen di dengkirina Şêniyê Şêrewa de mane. Şorên Erebî û Tirkî pir hindik in. Dengkirina şêniyê Şêrewa naskirî ye, ew lêvên xwe zêde vedikin, û tîpa dengdêra dirêj "**A**" piçekî nizim dikin, bi wî rengî bilêvkirina wê tîpê dikeve navbera van her du tîpan "**A**" û "**E**".

Şêniyê gundên Şêrewa û gundên Cûmê yên di ber çiyayê Lêlûn re, wek: Basûtê, Bircê, Kurzêla Cûmê, Xezîwê, Şadêrê … cinavê destnîşankirinê: **Ev,** wek: **Evene** dibêjin.

Û digel ku Şêrewî ji hêla başûr û rojhilat de digihên warên Ereban, lê wan zimanê xwe yê Kurmancî baş parastiye û bêjeyên Erebî pir hindik bikar tînin.

Hin bêjeyên şêniyê Şêrewa yên taybet jî hene, wek: Birako(keko), 'Ecî (kurikê biçûk), Nîvre (firavîn)...

**Tewandin:** Em kanin bêjin, ku Kurmancên Efrînê pir bi zelalî rêzana tewandina bêjeyan di dengkirinê de bi cih tînin. Şêniyê deverên Çiyayî hîn bêtir pê de derin, û carina bêjeyekê ducarkî ditewînin, mîna: Navê **Henan**, tê çivandin û dibe: **Henên**, lê hin ji wan dibêjin **Hênên**, **Menan- Menên- Mênên**… û hwd.

**Veqetandek:** Praniya Kurmancên deverên Cûmê û Şerewa li şûna nîşandeka "**Ê**" ya zêdera navê nêrza yê yekejimar, nîşandeka "**Î**" bikar tînin, wek: **Bavî te**, ji dêvla: **Bavê te**.

Ew ji berdêla nîşandeka zêdera gelejmariya her du zayendan (ên) jî, parkîta (êd) bi kar tînin, ew di vê rewşa rêzmanî de mîna Kurdên Behdînan diçin. Dibêjin: **Malêd me** ji dêvla **malên me….**

Rengekî dengkirina **Kirîf û Şêxemokan** jî heye pê tên nasîn. Şêxemok mîna Kurdên Zaza tîpa "**Z**" ji berdêla "**J**" bi kar tînin.

Li gor em dibînin, dengkirina herî xweşik li Çi.Kurmênc ya şêniyê Gu.Basûtê ye, bilêvkirina wan sivik, tenik û sade ye, belkî jî ji ber ku ew di dengkirinê de tîpa "**R**" ya nerm zêde bi kar tînin. Û belkî jî, ji ber ku wan sûd ji van du kirdeyan wergirti be, **yek**: Ew mîna şêniyê deşta Cûmê rêzikên rêzimên baş dixebitînin**, ya din jî**: Ew şorên resen ên şêniyê Şêrewa bi kar tînin.

# Beşê Pêncan

## Rewşên Aborî, Civakî û Rewşenbîrî
## Li Çiyayê Kurmênc

# Lêkolîna Yekê

## Çiyayê Kurmênc
## Rewşên tevahî

### Rewşên tevahî berî sala 332an b.z.:

Ti lêkolînên têrkirî li ser serdemên berî Yûnanî, ango berî sala 332an.b.z, li derbarê rewşên aborî û civakî yên şêniyê Çi.Kurmênc tunene. Em bawer dikin, sedem jî tunebûna lêgerîn û vekolîna ne li ser cih û şûnewarên Çi.Kurmênc. Ji ber ku piraniya wan şûnên şûnewarî û kevin, ra roja îro mîna girên kerûlal li deşt û ciyayên navçê belavkirî ne, bê lêkolîn mane.

Lê belê lêkolînên ku li hin cîgehên sereke hatin kirin, wek şikefta Duderiyê, girên Cindirês, Endarê…, û ji derandeyên şûnewarî yên ku ji xwe berê, yan jî bi destên dizên şûnewaran ji binê zemînê dertên, û ji şiroveyên hin zanyarên ku lêkolîn li cîgehên şûnewarî yên li derdora Na.Efrînê kirine, mîna zanyar Liyonard Wolly li deşta Hemqê, mera ji wan hemiyan kane, gelek salixên jiyana aborî, civakî û rewşenbîrî yên rûniştvanên Na.Efrînê li serdemên berî Yûnanê nas bike, nemaze jî olbawerî, mûdêlên avahiyan, huner, jiyan, karên rojane û hwd.

Ji wan lêkolînan xuya dibe, ku li serdemên kevin, **aboriya** jiyanê li Çi.Kurmênc li ser xudîkirina pêz û çandiniya rûberine hindik bi cureyên tene radibû.

Ji aliyê **avahiyan** de jî, piraniya gel di qabûskên biçûk de rûdiniştin. Ew jî bi axê û pûş dihatin avakirin, bana wan dîrek û şaxên daran bûn, rûniştvanan, nemaze li deverên çiyayî, şikeft jî bi kar tanîn.

Ji hêla **olbaweriyan** de jî, tenê pûtperstî hebû, mirovên gelên Çiyayî rûdawên sirûştê pîroz dikirin, û ew wek Xwedêyan bi nav dikirin. Wan bawer dikir, ku ew Xwedêyan jiyanê û rûdawên wê bi rêve dibin. Ji ber wê jî, perestgeh jê re ava dikirin, û berger û lave ji wan re dikirin. Bandora wan baweriyên olî li ser jiyan, şêweya ramanê û rewşên civakî pir xort bû.

Ji Xwedêyên ku li Çi.Kurmênc dihatin pîrozkirin: Mîsra Xwedêyê Horiyan, Nebo Xwedêyê welatê Mezopotamiya, Xwedêya Eştar, Ziyosê Yûnanî û jina wî Reye, û bilî wan jî hebûn.

Li navîna hezarê yekê berî zayînê, ola Zeredeştî li herêma Medya derket û li seranserî herêmên Rojhilata Nêzîk belav bû, pişt re ew bû ola impretoriya Farisî û hemî gelên ku di bin destê wê de bûn, jixwe Kurd jî yek ji wan bûn.

Li dû Zeredeştiyê, ola Fileh û paşê jî ya Îslamî hatin der, û li herêmên fereh ji rojhilat û ji rojava belav bûn. / Ji bo hin hûrmûrên jiyana aborî û civakî li dema berî Yûnanî, baştir em li beşên dîrokê û yê jiyana olî vegerin/.

## Rewşên tevahî li serdemên di navbera 332an b.z û dawiya sedsala 19an Z. de:

Li sala 332an b.z, Iskender Mekdonî rojhilata nêzîk dagîr kir. Bi hatina Yûnanan re, rewşên Rojhilata Nêzîk ji hemî aliyan de ketin nav guhertineke mezin, û nûbûneke şaristanî ye balkêş dest pê kir.

Gelek lêkolîn li ser serdemên Yûnanî, Romanî û Bîzentî hatine kirin, û gelek zanîn jî hatine naskirin. Ew zanîn ji navîna sedsala çaran zayînî de û ra dawiya sedsala sêzdehên zayînî dajon, ango ew ra dema derketina serbazên Xaçperestî ji herêma Rojhilata Derya Sipî, didin ber xwe.

Şaristaniya wan hersê dewletên Alefiringî (Yûnanî, Romanî, Bîzentî), hikariyeke giring, piralî û kûr di jiyana Çi.Kurmênc de kirin, û bandorên wan ên şaristanî, çandeyî û baweriyên olî jî, ra rojên îro di nava çivaka me de xuya dibin.

Li **serdema Yûnanî**:

Ji aliyê **avakirinê** de: Ji destpêka dagîrkirina Iskenderê Mekdonî ji herêma Rojhilata Derya Naverast re, û piştî wê jî, yanê li dema

Silûqis Nîketor damezrawê Împiretoriya Silûqî ya Rojhilatî, bi dehan bajar li nava sînorên dewleta Silûqî hatin avakirin, wek: Sîros (Nebî Hûrî), Entek, Latqiyê…û hwd. Di wê serdemê de, kesên Yûnanî û mirovên Rojhilatî baş têkel hev dibûn. Yûnaniyan mirovên xwe têvedidan daku biçin li herêmên ku vekiri bûn de rûnin û ji xwe re bikin war. Ew gelina, di ew rewşên nû de, di gelek hêlan de têkil hev dibûn, mîna jinanînê û hwd[1].

Ji hêla **Çandiniyê** de: Çandinî pir pêşde diçû, li serê wê çandiniya Gênim dihat, cureyên baştir jê ji herêma Medya û Sûryayê derdiket. Yûnanan guh didan çandina Rez û Zêtûnan jî, li serdema wan, dara zêtûnê bû bû giringtirîn û navdartirîn çandinî li herêmên Rojavayî ji Împretoria Silûqî[2]. Zêta ku li wê demê ji Asya Biçûk û Sûryê derdiket, baştirîn cureya zêtê bû.

Wê hîngê, pêşesaziya giringtir û ferehtir li herêmê jî, çêkirina inbîtê bû. Bilindbûna tibaba berhema inbîtê û zêtê, dikir ku pêşesazine din jî wek “qermît” li Sûryê û Asya Biçûk pêşde herin.

Hêja ye em bêjin jî, ku çandina dara Fistiqê bi riya Farisan derbas Bakurê Sûryayê bûye[3].

Li **serdema Romanî**:

Li serdema Romanî, li wîlayetên Rojhilatî, Sûrya û Asya Biçûk, nemaze li serdema ku bi navê (Aştiya Romanî) tê nasîn (14-193an).z, jiyan pir gulvedayî bû bû. Navça Çi.Kurmênc ya niha, bi çandinê nemaze ya daran û tîmarkirina pêz û mêşên hunguv navdar bû. Ji bilî wan, zêt, inbît û meye jî bûn berhemên sereke, û li hemî herêmên impretoriya Romanî, paşê jî li ya Bîzentî, dihatin firotin. Hebûna gelek guvaşgehên kevirî li deverên navçê wan tiştan dest nîşan dike.

Li wê demê, piraniya çandiniyê li ser baranê bû, li gelek cihan ava baranê di se'rîncan de dihat girtin û avdan pê dibû. Û ji ber ku li

---

[1]- Iskender bi xwe, bi Roksana ya Medî re zewicî.

[2]- *Evsaneya Yûnanî dibêje: Xwedêya Gernasiyê (El Hikmê) Esîna, dara Zêtûnê diyarî Yûnanan kir, û dara zêtûnê dewlemendî û jînferehî jî dinimûnad, /Dr.Ilyas Bîtar, nivîs û neqş li ser pereyên Erebî, rûp 15/.*

[3]- Kurd jê re dibêjin Fistiqên Çiyayê Reşa, li ser navê navça Çiyayê Reşa li Kurdistana Tirkiyê.

serdema Romanî, rûbera zeviyên çandiniyê li gor hejmara rûniştvanan hindik bû bû, gundiyan li ser deverên pesarî zemîn mîna sewkiyan dikirin û ji bo çandiniyê bi kar tanîn.

Rêzdar Corc Tat[1], şiroveyeke pir giring û zelal li ser rewşên civakî û aborî yên wan serdeman li navça Kitla Kilsî ya li bakurê Sûryê (navça Efrînê jî di nav de) nivîsandiye, û wiha dibêje:

((Gava mera bi hûrnêrînî li gundên şûnewarî yên ku hene binêre, wê xuya dibe ku li dirêjiya pênc sed sal, nemaze di navbera sedsalên diduyan û şeşan zayînî de, şênbûneke pir fereh ji hêla rûniştvanî û aboriyê ve li navça Sîrosê çê bûye. Ew şênbûn jî parve du bergehên ji pêşdeçûn û paşdeçûnê dibe.

**Bergeha Yekê**: Ji destpêka serdema zayînî de dest pê dibe, li navîna sedsala sisiyan zayînî digihê pileya xwe ya bilind, û li dora sala 250î zayînî jî, ji nişkave radiweste. Ev gulvedana bi dagîrkirina Romanî ve girêdayî bû, nemaze jî di sê sedsalên ku Aştiya Romanî hebû de.

Vê geşbûnê, heyamek lêhatî ji bo pirbûna şênî afirand. Li vê serdemê, zagona dewletê rê dida ku ew zeviyan demke dirêj bi kirê bide cotkaran, lewre ew cotariyên ku bê arzî bûn, zevî ji dewletê kirê dikirin û ji xwe re vedikirin. Di vê navberê de, gundiyan kevir ji nav zeviyan kom dikirin û didan ser hev, hîn jî gelek qûçên keviran li nav zeviyan hene ji wê demê de mane.

Lê belê ew şênbûn ji nişkave rawestiye, guman heye ku ew bi sedema peydabûna nexwaşiya Ta'ûn -Qirim (Qirima Reş yan Qirana Reş) a ku bi navê Sîbîriyan tê nasîn, bû. Wek tê zanîn, wê nexwaşiyê li navîna sedsala sisiyan piştî zayînê, wîlayetên Rojhilatî ji impretoriya Romanî dabû ber rewşine xirab.

**Bergeha diduyan:** Ji sala 330î zayînî de dest pê kiriye, û li sedsala pêncan piştî zayînê gihîştiye pileya xwe ya bilind, lê ew ji destpêka sedsala şeşan de serberjêr bûye, û li salên di navbera (540î

---

*[1]- Corc Tat, endamê şanda Amojgeha Firensî ya Şûnewaran li Rojhilata Nêzîk e, ku li Sûryayê dixebite. Wî lêkolîna xwe di belavokên Komela Adiyat a Helebê, di pirtûkên şeşan û heftan, di rûpelên 185an û ra 197an de belav kiriye.*

û 550î) zayînî de rawestiye. Ev bergeha ji ya berê dirêjtir û hikardartir bû.

Di navbera salên (330î û 550î) zayînî de, hejmara xaniyan (4-5) caran zêde bû bûn. Rûbera ku her malekê diçand di navbera (3 û 5) hêktaran de bû. Rewşa cotkaran xweş dibû, û dewlementir dibûn. Berhemên xwe ji zêtûn, zêt, tirî û dewêr difrotin, û aboriya wan di ser re dirjî.

Lê belê piştî demekê, aboriya ku li ser çandiniyê radibû digihîşt dawiyeke girtî, û rewş xirab dibûn. Gelek sedem ji peydabûna ew rewşên nû re hebûn, wek:

Hejmara şênî bilind bû bû, rûbera zeviyên ku dihatin bikaranîn kêm dibû, mercên heyamî xirab dibûn, dewletê jî li nîvê yekê ji sedsala şeşan xûka ku ji cotaryan distand bilind kiri bû. Ji ber wan hemî sedeman, gel xizan dibû, qeyranên/kirîzên birçîbûnê peyda dibûn, û rewşên lêhatî ji bo peydabûna nexwaşiya Qirimê ya bi navê Gostinyan jî li sala 450î zayînî peyda bû.

Li wan deman, gelek pevçûn jî di navbera Faris û Bîzntiyan de çê bûn, li encamê, Farisan navçeyên bakurê Sûryê dagîr kirin, û ji ber wê û ji qereza Farisan re, Bîzentiyan jî kirîna berhemên zêt, inbît û hiriyê ji navçeyên ku keti bûn bin destên wan birîn. Û wilo ew berhem bi ser xudanan de diman, û bi demê re berhemdana wan bi xwe jî pir kêm dibû.

Ji ber wê yekê, dewlemendiya şênî bi şûnde diçû, û rûniştvanên gund û bajaran neçar dibûn li rêkine jiyandinê yen din bigerin. Ji avahiyên ku wê demê zêde bûne, ji bilî çend kinîseyên ku li dawiya sedsala şeşan hatine avakirin, tu avahiyên nû ne hatine avakirin.

Lê ji ber ku gelek mirov bi sedema nexwaşiya Qirimê dimirin, kesên ku diman û neweyên nû, zeviyên ku bêxudî diman diçandin û sûd jê werdigirtin. Lê digel wê, navça Kitla Kilsî ya bakûrê Sûryê, nikanî careke din bigihîşta asta pêşdeçûna xwe ya ku di sedsalên pênc û şeşên zayînî de giha bûyê. Ji ber wê jî, gelek rûniştvanên wê, warên xwe berdidan û dadiketin deverên deştî yên nêzîk, ewên ku ji çandina genim, ceh û çanidiniyên zivistanî yên din re lêhatî bûn. Hinek jî di gundên xwe de diman û jiyana xwe ya rojane bi şêweyekî ji şêweyan berdewam dikirin.

Bi rastî, li dawiya hukmê Bîzentiyan li bakurê Sûryê, gel ji ber kavilbûna aborî pir perîşan dibû. Hatina Îslaman ya navçê jî hîn rewş kaviltir kir, lewre encama wan rewşan li ser rewşa gel pir bi êş dibû. Şerên ku li sedsalên nehan û dehan jî di navbera Bîzentî û Mislimanan de li navçeyê radibûn, hîn ew rewş xirabtir dikirin.

Li wê demê, barkirina xelkê ji navça Kitla Kilsî gihîşt pileya xwe ya herî bilind, cotkar berve deverên deştî mişext dibûn, hinek jî ji bo xweparastinê bare bajaran dikirin, û herwiha roj li dû roj navçe ji şênî vala dibû)).

Li ber roniya ev şiroveya Corc Tat ya zor hêja û giring, mera jî kane wiha bêje:

Wendabûna bajarên şên û barkirina xelkê ji navça Çiyayê Kurmênc, ji hilbûna hukmê Bîzentiyan û hatina Milimanan de dest pê kiriye. Lê belê şênî di demeke kin de jê winda ne bûye, ew sal li dû salê ji navçê hilbûye, û gelek kes jî ra dema Xaçperestan mane. Hin dîroknivîs dibêjin jî, ku şêniyê Çi.Lêlûn peyman bi Xaçperestan re danîn û bi xwe gundên xwe radestî wan kirin û jê derketin.

Herwiha, em kanin bêjin jî, ku dema dawîn û giran ji barkirina şênî ji navçeya (Çi.Kurmênc û Lêlûn), li dema hatina Xaçperestan çê bûye. Nemaze jî ji ber ku li wan deman, herêma perava rojhilata Derya Sipî û Bakurê Sûryê bû bû meydana şer di navbera Xeçeperest û Mislimanan de. Pirtûka /dîroka xebata cotkaran…beş3, rûp 155/ wê yekê mêlag dike, û wiha dibêje:

((Li dawiya cengên bi Xaçperestan re, telaja(şirîta) peravî ji Welatê Şamê yekcar ji rûniştvanan vala bû bû. Û dema ku li sala 1516an Osmanî hatin van welatan, rûniştvanên bajarên mîna Latqê û Iskenderonê pir hindik bû bûn)).

Em bawer dikin, ku ji dawiya sedsala sêzdehan de, navça ku roja îro bi Çi.Kurmênc tê nasîn, ji aliyên rûniştvanî, siyasî û nijadî de, bê hevaltiya tu kesên din, Kurd lê serdar bûn, û ji dawiya serdema Eyûbî de û ra destpêka serdema Osmanî, Îmareteke Kurdî ye serbixwe lê hati bû avakirin.

Ji wê demê de, û li dirêjiya heşt sedsalan, ango ji sedsala sêzdehên zayînî de û ra roja me, civaka Kurdî li navça Çi.Kurmênc xwe ragirtiye û roj bi roj xortir bûye.

Hejmara Kurdan, li wan deman bi du rêkan li navçê zêde dibû: Yek: Zêdebûna xwezayî. Didu: Hatina mal, malbat û komhozên nû ji nava Kurdistanê. Û bi wî rengî, newe li dû newe, û sedsal li dû sedsalê, pêgeha rûniştvanan li Na.Çiyayê Kurmênc vegerî mîna serdema Bîzentî û civakeke Kurdî ye hevgirtî, xudî salixên netewî û zelal lê peyda bû. Ew malbat û binehozên Kurd ku bi ser Çi.Kurmênc de dihatin, taybetiyên xwe yên cuda jî bi xwe re anîne, û bi wê yekê têkelî, jiyan, çand û zarava Kurdên Çi.Kurmênc nû dibûn, û herwiha her demekê Xwîneke nû didan civaka Kurdî li navçê. Lê ji hêleke din ve, rewşên çiyayê yên taybet ên sirûşta Çi.Kurmênc, civaka wî dixist nav dorpêçkirineke şaristanî ye rastînkî, û ta radeke berçav, dibû asteng li pêş pêşketina wê.

Lê digel her tiştî, ew civak, li roja me bûye xudî salixên civakî, aborî, çandeyî û filoklorî yên taybet di çarçewa civaka Kurdî ya fereh de, û pergalên naskirî jî jê re hatine peydakirin.

Lê belê li dirêjiya sed salan, û digel ku navça Çi.Kurmênc gelek bûyer û serpêhatî û destlat jî dîtine, mixabin! Tiştên ku li derbarê rewşên wê yên aborî û civakî hatine nivîsandin pir hindik in, bi taybetî jî li dema di navbera sedsalên sêzdeh û hejdehên zayînî de, ew nivîs, bi tevahî, ne bêtirî hin hevok û hin biwêjan e, û di nav hin nivîsarên ku li ser deverine din hatine nivîsandin de hatine gotin.

Wek mînak, axaftina Şerfxanê Bedlîsî li ser seredana Siltan Silêmanê Qanûnî li navîna sedsala şanzdehan, û ji rapora Husên Begê ku li wê demê li ser rewşa siyasî ya Çi.Kurmênc ku ji Siltên re pêşkêş kiri bû, tê têgihîştin, ku navça Çi.Kurmênc çateriyeke navgîniyê ye giring bû di navbera Welatê Şamê û Anadolê de, û riya bazirgan û karwanên artêşan bû jî. Û digel ku mîritiyeke Kurdî ye serbixwe lê hebû, lê diz û rêbiran kiryariyên xwe di derbendên çiyayên wê de dikirin, û xwe di wan çiyan de vedişartin.

Ew rewşên tevahî li dema berî sedsala hejdehan, li gel zordariya artêşa dewleta Osmanî jî ku li ser herêmên Kurdan dihatin kirin, dihîştin ku hebûna piraniya gundên navça Çi.Kurmênc li serên çiyan, û di zikên newalan de werin avakirin(1).

---

1- Her du bira Rasil (ji sedsala hejdehan) di rûpela 225an û 226an de ji pirtûka xwe ya hêja /Dîroka Helebê ya Tebî'î/ dibêjin: Hukmê xazûqkirinê hema wekî

Li wan deman, malbatên Kurd li dirêjiya çend sedsalan mîna goçeberan dijîn, di kon û şikeftan de rûdinştin. Ewên ku li deverên çiyayî dijiyan, bizin xudî dikirin, û yên li deştê jî mî xudî dikirin û di kon yan jî di malên ku bi qamîş û axê dihatin avakirin de rûdiniştin.

Li wê demê, ji bo her malekê yan malbatekê warekî naskirî hebû, û bi tevahî kanî, se'rînc, bîrên kevin lê peyda dibûn, yan jî wan bi xwe hinek nû dikolan, û ji bo civandina ava baranê bi kar tanîn.

- **Rewşên tevahî ji dawiya sedsala 18an de û ra niha:**

Ji destpêka sedsala hejdehan de, şêniyê Çi.Kurmênc hêdî hêdî dest ji jiyana goçeberiyê û tîmarkirina pêz sist kir, û berê xwe da çandiniyê û malbat bi cih û war bûn.

Li destpêkê, gundiyan rez, zêtûn û tene çandin, û ew hersê berhem bûn kevrê koşê di jiyana wan a aborî û rojane de. Û herwiha bi demê re, gelek malbat bûn xudanê keriyên pêz û zeviyên fere, rewşa aborî jî pêş de çû, sermiyan peyda bû, gelek mal dewlemend jî bûn û di nava civatê de hatin nasîn. Ji bilî wan hemiyan, gundên taybet, bi nav û naskirî jî hatin avakirin.

Ji navîna sedsala hejdehan de, rewşa îdarî û tevahî ya dewleta Osmanî jî bi paş de diçû. Li ber hikariya wê yekê, destên hin komên hozî di nava civaka Çi.Kurmênc de bilind dibû, mîna hozên Reşî, Şêxan, Amka, Şikak, Mala Umê, Milî Dawûdî, Hesen Efendî û bawermendên ola Êzdî jî.

Lê bi tevahî, nemaze jî di warê siyasî de, rêberên wan hozan arzî û berjewendiyên xwe yên taybet diparastin. Xemên sînorên hoza xwe û serbixwebûna wê dixwarin, û hewil didan jî, ku destê xwe dînin ser deverên derdora xwe, warê hoza xwe feretir bikin û xwe wek destlatdar bibînin.

---

ku tenê ji Kurdan re tê kirin. Ew mehkûm mecbûr in xazûqên xwe hilgirin û herin meydana bidardekirinê. Li navîna sedsala hejdehan, Husên Paşa bîst Kurd bi hev re li derveyî sîpera bajarê Helebê xazûq kirin, hinek ji wan demeke dirêj li ser xazûqan xweş man. Lê ji bo ku tirs di dilê gel keve, Husên Paşa destûr neda ku wan ji ser xazûq dînin, tenê li ber tika xelkê, û ji bo êşeka wan rawestînin, destûr da ku wan bi fîşekan bikojin.

Hin ji malbat û hozên mezin bi kardayînên dewletê jî radibûn, wan xûk li ser berhemên çandiniyê, pêz û kesan datanî, û carina ji xwe re, carina jî ji dewletê re distandin.

Ji dawiya sedsala hejdehan de, dilxwazî bi destlatadriyê û dewlemendiya hozane li ba hin rêberan bilind dibû. Ew dilxwazî li ba hin malbat û hozan bi aliyê pêkanîna armancên civakî û siyasî de çûn. Ji bo pêkanîna wan armancan tundî jî bi kar dihat.

Bi tevahî, ew dilxwazî û çalakiyên rêberên hozan bi du şêweyan dihatin kirin:

**Yek**: Rabûn li ber dewletê, wekî Welî Axa, paşê jî kurê wî Xelîl Axayê Hec Omer û Betal Axayê Gên.

**Didu**: Nakokî di navbera hozan de, wek nakokiyên di navbera hozên Şêxa, Amka û Biya de çê dibûn.

Ji aliyekî din ve, rewşên nû û pêşdeçûnên tevahî ku li cîhanê peyda dibûn, wan jî hikariyên zor giring li warên civakî, aborî, ewlehî û rewşenbîrî yên civata navça Çi.Kurmênc dikirin. Di bin bandora ew guhertinên tevahî û kûr de, rûniştina malbatan a berdewam di mal û gundan de roj bi roj cih digirt. Ji hêla aborî de jî, çandinî dibû pileya yekê di jiyana gundiyan de.

Di van rewşên tevahî yên nû de, pêdvî bi gelek tiştan çê dibû. Ji hêlekê de pêdvî û dilxwazî li ba kesên dewlemend û derebegên navçê bi avakirina xaniyên fere û ewlehîtir çê bû. Ji hêleke din ve, pêdvî bi xebitandina hacetên çandiniyê jî bilind bû, mîna hacetên cotkariyê, durstkirina berhemên çandiniyê, kelûpelên avakirina guvşxanên zêtê, avakirina aşên avê û hin pêşesaziyên destkarî yên biçûk. Wê yekê pêdvî bi hebûna hostan û pîşesazan pêwîst dikir, wek avakerên xaniyan, necar, hesinkar û gelek pîşesazvanên destkarî ku gerekî jiyana gundiyan dibûn.

Ew hoste, bi tevahî, ji bajarên derdorê dihatin peydakirin, wek Kilis, Entab, Qirixan, Heleb[1]. Di riya ew hosteyên bajarî û

---

[1]- *Malbata Qedîbilban/Kurtancî ji koka xwe de ji Helebê ye, ew li destpêka sedsala bîstan hat navçê, kesên wê li gundan digerîn û kurtan çê dikirin, loma jî ew malbat bi navê Kurtancî hat nasîn.*

Çerçiyê/'Etarên ku li gundan digerîn re, û têkliyên kesane yên yekser bi bajêr re, pêwendiyên nû û berdewam bi civakên derdora Çi.Kurmênc re, nemaze bi civakên bajarî re, hatin girêdan, ev jî di pêşdebirinên civakî û aborî de, kirdeyeke zor giring û kûr bû.

Piştî wan guhertinan, kombûna sermiyanê jî dest pê kir, û hemî pêşdeçûnên civakî yên giring ku bi sermiyanê re tên jî dest pê kirin.

Di navbera ew pêngava nûh de ji pêşdeçûna civaka Kurdî li Çi.Kurmênc, guhertina civakî ya ku dihat xwastin jî çê bû, ew jî guhdana serekhoz, Axe û dewlemendên nû bi pêdviyên jiyana xanedaniyê bû. Bi rastî jî, ew şêweyê jiyandinê yê balkêş di komelgeheke gundî û nîv şivanwerî de ku nû ji binê newalan derdiket, û çav û hişên xwe li cihana fere vedikir, ew şêwejiyan ji bo payebilindiya civakî ya derbegên nûgihayî û Axan, pêdviyeke zor gerek bû.

Li ber roniya wan guhertinan, ji nofên civakî yên têvel bi ser gundên Axan de hatin. Wek nimûne, gundekî mîna Gu.Çolaqa ku yê mala Seydê Mîmê bû, û gundê Firêriyê jî ku yê mala Ĥeyder Axa bû, mînakên zor balkêş bûn ji navendên derebegîtiyê re li Çi.Kurmênc. Ew gund, ji dawiya sedsala nozdehan de bû bûn navendên derebegîtiyan. Li wan gundan li kêleka mala malbata Axê, cotkar, azep, avaker, hesinkar, pîşesaz, bijîşk, xoce (mamoste) û hunermend jî diman.

Ji bilî wan hemiyan gelek xizmetkarên mala Axê ji jin û mêran jî hebûn. Ligel wan, kirîfên Axê yên taybet jî hebûn, wan hemî şêweyên huneran pêk tanîn, wek saz, sema, qeşmerî û hemî boneyên/minasebeyên şahî û ahengên mala Axê û mêvanên wî şên dikirin.

Ligel wan hemiyan, hejmarek Cihû jî li Çolaqa hebû, belkî wan jî di navenda derebegîtiyê de rola (Bengê) dilîstin?.

Ango, komlgeha navendên derebegîtiyan ji wan hemî cure mirovan pêk dihat, û qedexe jî bû, ku kesên wê bê destûra Axê ji gundê navend derkevin, yan jî hinên nû lê rûnin.

Di navenda derbegîtiyê de, her sê destlat, dad, biryargeh û bicihanîna biryaran di destê Axê de bûn. Dewleta Osmanî û piştî re

jî a Firensî, ta radeke bilind, sazûmana derebegîtiyê diprastin û piştgiriya wê dikirin.

Ev rewşên civakî yên nû, û ewlehiya ku peyda bû bû, dikir ew kesên ku goçeber mabûn jî, biryara bicihbûna herdemî bistînin, û li gundan rûnin. Û herwiha, gundên navçê her diçûn şên bûn, pêşde diçûn û hejmara rûniştvanên wan jî pir dibû.

Li wan deman, gundiyên du karên sereke dikirin, li rade yekê **çandinî** û li rade diduyan **xudîkirina sewalan**, ev guhertina xelkê bi ser çandiniyê de, dikir ku jiyana gundiyan were guhertin û berve başiyê biçe.

Ew nofên civakî ku rewşên jiyana wan baştir dibûn, wan dest pê dikir û guh dida jiyana xwe ya rojane, wek avakirina xaniyên baş, xwarina pak, lixwekirina balkêş, guhdana bi huner û şahiyan. Di ev rewşa nûjen de, sazbend û stranbêj jî derketin, hatin nasîn û gelek stran û awazên şêrîn jî dihatin afirandin.

Wek nimûne, dawet û şahiyên Axe û dewlemendan, dibûn mehrecanên rastînkî, tê de hemî rengên hunerê û tiştên xweşik dihatin pêşkêşkirin, cilên xweşik dihatin lixwekirin, sema û stranên filiklorî dihatin pêşkêşkirin, pêşbirkên bezandina hespan, nîşandarî û qutê jî li dar diketin, ango her tiştên civakî yên xweşik û şêrîn lê dihatin dîtin.

Ji bo ku şêweya jiyana şêniyê Çi.Kurmênc, û rewşên civakî ji dawiya sedsala hejdehan û ra dawiya nîvê yekê ji sedsala bîstan werin naskirin, emê di lêkolînên li pêş, wan mijaran vekolînin û bidin nasîn, û çi tiştên ku destê me gihîştê, û ewên ku hîn li bîra xelkê ne, li gel rewşên aborî, civakî û rewşenbîrî belge û tomar bikin. Hêvîdar in tê de biser kevin.

# Rewşên Aborî

## Çandin

Çi.Kurmênc ji berê de bi çandiniyê navdar e. Li ber girê Endarê, gundekî çandiniyê ji berî deh hezar sal de hatiye naskirin.

Li serdemên Yûnanî, Romanî û Bîzentî jî, navçeyên bakur rojavaya Helebê, Çi.Kurmênc jî di nav de, bi çandina zêtûn, rez, tene û gelek çandiniyên din navdar bû, û baştirîn tene, zêt û meye jê derdihat. Vê rewşa aborî ya gulvedayî, ra dawiya serdema Bîzentî ajot.

Li serdema Osmanî jî navça Çi.Kurmênc bi hin cureyên çandiniyê, wek dara zêtûnê navdar bû û baştirîn zêt û zêtûn ji navça Kilisê derdihat. El-Ĝezî bi bîr tîne û dibêje, ku dora 2000 zeviyên darên zêtûnê û mêwan û nêzîkî sed jî yên darên meywan li navça Kilisê hebûn, ji bilî ku tibabeke mezin ji Birincê jî jê derdihat. Berî ku kompaniya Rêcî vebe, cureyên titûnê yên pir baş jî ji devera Cûmê derdihatin.

Lê belê çandina fere li navça Çi.Kurmênc, ji çaryekê diduyan de ji sedsala bîstan dest pê kir. Li wan salan tirektorên zincîrî hatin navçeyê, û zeviyên fere vekirin. Bi rastî jî, wan tirektoran şoreşeke çandiniyê ye gewre li navçeyê pêk anî, û rûbera zeviyên ku dihatin bi kar anîn çend carkî fere bûn.

Roja îro, çandinî warê berhemdanê yê yekê ye ji şêniyê Çi.Kurmênc re, merc û kirdeyên navçê jî ji çandinê re lêhatî ne, wek: Axa şov, heyama lêhatî, ava binzemînî û serzemînî, ji xwe

çemê Efrînê jî di nava navçê re diherike, çemê Reş jî deverên deştî yên di navbera Çiyayên Kurmênc û Gewr de av dide.

Ji hêla barîna baranê jî, navça Efrînê ji navçeyên rawestiyayî yên yekemîn e li Sûryê. Barana wê ya salane di navbera 350 û 600/mm de ye.

Roja îro, gavên dawîn ji projeya avakirina benda Meydankê li ser çemê Efrînê tên avêtin. Hêvî heye, ku ew piroje dora 30 hezar hêktar zevî av bide.

Tevahîya rûbera navça Efrînê 202775 hêktar e, ew jî wiha li ser deveran belav dibin:

| **Efrîn** | **Şera** | **Mabeta** | **Bilbil** | **Reco** | **Cindirês** | **Şiyê** | **Tevahîya navçê** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ٣٧٧٧٦ h | ٣٣١٣٥ h | ٢٤٥٧٤ h | ٢٢٩٩٥ h | ٣٥٢٣٥ h | ٣٢٥١٠ h | ١٦٥٥٠ h | 202775h |

Ji hêla bikaranîna wan rûberan de jî, ew rûber wiha parve dibin:

- 127000 hêktar ji çandiniyê re dibin.
- 75980 hêktar ji çandiniyê re nabin.

Gelek cureyên **çandina salane** li navçê têne çandin, wek genim, ceh, nîsk, nok, çelem, pembû, kartol, titûn, garisê zer û gewr, berbero, kuncî, şînkahî ...û hwd. Li nîvê yekê ji sedsala bîstan, Çeltîk/Birinc jî li deşta Lêçe dihat çandin(1).

Li derbarê **darên berdar** jî, Çi.Kurmênc ji serdema Yûnanan de pê navdar bû, û li serê wan zêtûn û rez dihatin. Berhemên wan li hemî deverên impretoriya Bîzentî belav dibûn, çandina wan li navça me ji wan rojan de, û ra roja me herdem heye û pêdviyên rûniştvavan bi cih tîne.

Piştî ku dewleta Osmanî ji navçê derket, zêtûn û rez bi şêweyekî aborane û fere hatin çandin, û herwiha zêta (Kurdî) ji nû de li bazarên navçê û derdora wê hat dîtin, û piştî bêtirî hezar û pênc sed salî, dîsa navdariya xwe vegerand.

1- Çeltîk bi pêgeha Ga dihat hûrkirin, paşê jî bi alaveke textî bi navê "Tîng" dihat kutan.

Li gor serhejmarên fermî yên destpêka sedsala 21an, hejmara darên zêtûnê li navçê 12 milyon dar bû. Dora neh milyonan jê di bêr de bûn.

Tibaba zêtê jî di salên berhemdar de digihê 180 hezar ton û di salên din de digihê dora 50 hezarî. Ji xwe tibabine mezin ji zêtûnên xwarinê jî dertên.

Cureyên darên berhemdar ên din jî ku li navçeyê hene ev in: Hinar, sêv, mişmiş, gûz. be'îv, hejîr, lêmûn, porteqan, bûyîk,… Darên tuyê jî li her malekê hene, û darên simaqê jî li dedorên zevî û çiyan pir hene û bi xwe şîn dibin.

Hejmara hin cureyên darên berdar li navça Efrînê li dawiya sala 2000an, li gor zanînên dayîra çandinyê û yekîtiya cotkarên Efrînê, her du jî ji saziyên fermî ne, wiha bû:

| **Be'îv** | **Mişmiş/zerdele** | **Bûyîk** | **Sêv** | **Mêw** | **Ĥenar** | **Zêtûn** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 9000 | 22000 | 70000 | 75000 | ٢٢٠٠٠٠ | 1.3m | 11milyon |
| **Hejîr** | **Gûz** | **Çifteli** | **Hurme** | **Ĥilûk** | **Fistiq** | **Kêrez** |
| [1]١٠٠٠ | ٣٠٠٠ | ٣٥٠٠ | ٥٠٠٠ | ٥٠٠٠ | ١٠٠٠٠ | ٥٠٠٠ |

Rêxistina Komeleyên Cotkaran a dewletê jî li Na.Efrînê heye, hejmara komeleyên wê li sala 2000an 180 bûn. Yekîneyên amojgehkirina çandiniyê jî 14 bûn, endezyarên çandiniyê di wan de kar dikin û şêweyên çandiniya yên zansitî û durust raberî cotkaran dikin.

Li gor serhejmara fermî, hejmara alavên çandinyê û bîrên avê li navça Efrînê, li dawiya sala 2000an wiha bû: **Dîrektor 3056, patoz 105, matorên avê 1135, bîr 3500.**

Tibaba berhemên çandiniyên yên salane yên sereke jî li navçê, di navbera salên 1995 û 2000an de, wiha bû:

**Genim = 30624.5 ton.** **Pembu = 1082 ton.**
**Çelem = 55355.85 ton.** **Titûn = 293.17 ton.**

[1]- Ez guman dikim, ku ev hejmar texmînkî ye, û ji rastiyê dûr e.

### -Damezrawên çandiniyê yên dewletê:

Digel ku gelek kelûpelên çandiniyê li Na.Efrînê tên berhemdan, lê tu damezrawên dewletê yên çandiniyê yên giring li navçê ne hatine avakirin.

Li salên heştî ji sedsala borî, dewletê sê guvaşgehên zêtê li navçê ava kirin. Li salên heftê jî, benda Gu.Eşûnê hat avakirin, lê ava wê bi binê zemînê de çû û proje hat berdan.

Li sala 1984an jî, dest bi avakirina benda Meydankê li ser çemê Efrînê bû, hêvî heye ku eger ew bi dawî bibe û bi kardayîna xwe rabe, wê gavê, tibaba berhemên çandiniyê dê pir bilind bibe û asta jiyana gel jî dê baştir bibe.

Li sala 2000an, dewletê diwanzdeh lodên hesinî jî ji bo hilanîna gênim li ser riya Helebê, li cihê Kortikê ava kirin.

### -Kurtegotineke li derbarê dapikirina zeviyan[1]:

Tomarkirina zeviyan li dawiya salên pêncî ji sedsala nozdehan li serdema Osmaniyan dest pê kir. Berî wê, tenê sîstema “ĥiyaze” yan “teseruf” hebû, û arzîvaniya zeviyan a taybet tunebû. Li gor wê sîstemê, tenê mafê bikaranîna zeviyan hebû, lê kirînfirotan, yan mîraskirin çê ne dibû, ji ber ku hemî zevî arziyên Bêtilmal û Siltên yan jî yên waliyan bûn.

Li kêleka wan, zeviyên hozê û gundan jî hebûn, ew zevî ne yên kesekî bûn, û hemî gundiyan sûd jê werdigirtin.

Ji bilî wan, zeviyên Ewqafê jî hebûn, berhemên wan ji karên çêxwaziyê re dihatin danîn.

Li sala 1858an, zagona zeviyan a Osmanî derket, û arzî û çarenûsa zeviyan li saz xist.

Li sala 1961an jî, qanûna dapiyan û zagonên pê ve girêdayî derketin, wê rê da ku zevî werin nasandin, tomar kirin û dapî jî werin dandin.

---

[1]- Çavkaniya zanînên dîrokî, pirtûka /çêroka xak û cotkarên Sûrî, Bû Elî Yasîn/, û rapora encûmena komela cotkaran li Efrînê li dawiya sala 2000an,

Komîteyên ku zevî dinasandin û tomar dikirin, ji hêla walî ve dihatin binavkirin. Danasîna zeviyan û rûbera wan jî, bi şêweya endezyarî û zelal ne dibû, sînorên wan bi riya texmînê û pirskirina ji mixtar, rêberên gundan, hozan, şêxên bineolan û Axan dihat nasîn. Bi wê yekê, rola wan hemiyan di dapikirina zeviyan û danasîna rûbera wan de hebû. Û herwiha, gelek kesan arziyên xwe li ser hesabê arzîvanên biçûk, çi bi riya nezaniyê û çi bi darê zorê fere dikirin. Carina jî, gelek cotkaran ji ber astengan, yan ji bo nedana xûkê, yan jî ji bo ku neçin leşkeriyê, wan bi xwe arziyên xwe li ser navê rêberekî, yan li ser navê Siltên tomar dikirin.

Bi taybetî zeviyên bûr(netên çandin) jî, ku ji hêla tu kesî ve ne dihatin xebitandin, zagona Osmanî ya sala 1868an, rê ne dida ku li ser komekê were tomarkirin, wê rêdida ku li ser mirovekî bi tenê werin tomarkirin. Bi wê yekê, arzivaniya zeviyan bi şêweyekî zagonî û rastînkî dibû arziyê mirovekî bi tekûtenê.

Li ber roniya cêbecêkirina wan zagonan, gelek mirovan li sala 1870yî li wîlayetên Osmanî yên Sûrî, dapiyên zeviyan birin, di demeke kin de bûn xudî zeviyên fere û gelek xudî arziyên biçûk jî bê zevî man û li ba derbegên nû, ku leqeba Axetiyê jî wergirtin, bûn cotkar û rubcî, yan jî bûn azep û bi mafekî pir erzan kar kirin. Lê ew tomarkirina zeviyan, ra dawiya serdema Osmanî dirêj kir û bidawî jî ne bû.

Li sala 1926an, Îdara Firensî, rêzanên nû li derbarê arzî û tomarkirina zeviyan derxist. Li gor biryara 170yî, arziya ku bi rengê tevane hati bû tomarkirin, li ser malbatên ku sûd jê werdigirtin hatin belavkirin. Li wê salê, biryara 168an ji bo danasîn û tomarkirina sînorên zeviyan jî derket. Pişt re, zagonine din jî derhatin, li gor wan, hemî zevî li gundan bûn Emîrî, ango milkê dewletê, lê mafê kesan hebû ku ew wek dixwazin pê bikin, û herwiha ew şêwe nêzîk mafê arzivaniya tekûz bû.

Li sala 1929an, "Dayreyên 'Eqarî" li Sûryê hatin damezrandin û dest bi dana dapiyên zeviyan kir, û herwiha rewşa arzivaniya zeviyan ra sala yekîtiya Sûryê û Misirê bi wî rengî ajot.

Li dema wê yekîtiyê, Zagona Durustkirina Çandiniyê derket, li gor wê zagonê, rûberên mezin ji xudî zeviyên fere û ji derebegan hatin standin û li ser cotkarên biçûk û yên bê zevî hatin belav kirin.

Pişt re, li gor mersûma nimer 88 dîrok 23-6-1963an, asta bilind a arzîvaniya kesane ya zeviyan wiha bû: Zeviyên avî 16/hêktar, zeviyên bejî 40/hêktar, zeviyên bejî û bi darên zêtûnan 40/hêktar. Û çi rûberên ku ji wan bêtir bûn jî, ji xudiyên wan hatin standin.

Bi bicihkirina wê zagonê, hejmerine baş ji mirovên ku karê cotkariyê li ba Axan dikirin, yan jî li ba wan rûbcî bûn, bûn cotkarên xudî zeviyên biçûk. Li hemberê, malbatine derebegî ku xudanên zeviyên fere bûn, tişt bi wan nema û hilweşîn, mîna mala Seydê Mîmê û mala Gênc. Hinekan jî kanîn bi şêweyên têvel, piraniya zeviyên xwe ji zagona durustkirina çandiniyê û belavkirina zeviyan biparastana.

Ji hêla danasîn û tomarkirina zeviyan, navça Efrînê ya dawîn bû li Sûryê ku ew kar lê bû. Komîteyên Rûberpîvanê li destpêka salên nodî ji sedsala borî li Na.Efrînê dest bi karê xwe kirin. Ew kar di navbera deh salan de bi dawî hat, lê mixabin hin komîteyên rûberpîvanê, belkî ji ber sedemên nijadî bû jî, karê xwe bi durustî ne kirin, û gelek pirsgirêkên dijwar li şûna xwe hîştin. Em niha li destpêka sedsala bîst û yekê ne, û hîn jî hejmareke mezin ji şêniyê navçê dapiyên zeviyên xwe bi dest ne xistine.

Roja îro, kirîn û firotina zeviyan û dapikirina wan li navça Efrînê zor dijwar e û pir dirêj dike. Gelek şalyar destê xwe dixinê. Navên her du alî, yê dikire û yê difroşe jî, di dezgehên ewlekariyê re derbas dibin, û dapikirina zeviyan bi salan dirêj dike, û pir caran bi dawî nabe, bihane jî ew e, ku Efrîn navçeke sersînorî ye!?

## Xudîkirina sewalan

Li dema berê, xudîkirina pêz û dewêr li Çi.Kurmênc jêdera jiyandinê ya yekê bû. Lê ji dawiya sedsala nozdehan de, xudîkirina sewalan hêdî hêdî dakete asta diduyan ji giringiyê û li paş çandiniyê ma.

**Pez**: Li gundên çiyayî, **bizin** dihatin xudîkirin, nemaze ên Fîlik (mû sipî û dirêj). Li gundên Cûmê û yên deştî jî **mî** dihatin

xudîkirin. Li sala 1954an zagonek derket, çêrandina bizinan li deverên daristanî qedexe kir, û herwiha hejmara wan pir kêm bû.

Li dema me, rûberên çêrê pir kêm bûne, loma jî hejmara pêz, ji bilî devera Şêrewa, pir hindik bûye. Lê belê hîn piraniya malên gundî, çend sewalan ji bo şîr û pêdviyên malê xudî dikin.

**Mang/çêl:** Ew ji berê de li navçê hebûn û her gundekî naxirek lê hebû, lê li dema niha, hin mal bi şêweyên yekane, yan bi hejmarine hindik mangan xudî dikin. Tenê ew li gundên Şêrewa bi şêweyekî feretir tên xudîkirin, û dibe jêderek aborî ji gelek malan re.

**Mirîşk**: Mirîşk li her maleke gundî tên xudîkirin. Lê mirîşkxaneyên tîmarkirinê li navçê hindik in.

**Mêşên Hunguv**: Sirûşt û jîngeha Çi.Kurmênc ji xudîkirina wê re zor lêhatî ye. Xelk hejmareke baş ji oğilên mêşan tîmar dikin. Piraniya malên gundan çend qendîl mêşên xwe hene. Hinek jî xudîkirina mêşan wek karekî aborî û ji bo firotina hunguv xudî dikin. Serhejmareke oğilên mêşên hunguv e rastînkî li navçeyê peyda nabe, lê cotkarên ku li dawiya sala 2000an endamên komeleyên cotkaran bûn li navça Efrînê, 5372 oğilên mêşan li ba wan hebûn.

**Dewarên Qebe** jî li malên gundên çiyayî hene, mîna Qantir/Qatir, Hesp û Ker, ew ji bo cot û barhilgirtinê tên tîmarkirin, lê ji ber pirbûna tirektor û makînan, hejmara wan pir kêm bûye.

Li piraniya malên gundan, kûçik û pisîk jî hene. Kesin hene, kevokan jî xudî dikin.

Ev e lîstek bi hejmara pêz û dewarên malîn li navçê, li gor serhejmara fermî ya sala 1998an:

| Mî | Bizin | Çêl | Mirîşk | Ker | Qantir | Hesp |
|---|---|---|---|---|---|---|
| ٦٨٤٧٦ | ٣٤٢٦٥ | ٣٥٥٦ | [1]٦٧٠٠ | ٢٤٧٥ | ١٤٦٨ | ١٧٦ |

[1]- Xuya ye ev hejmara mirîşkan ne rast e, ji ber ku deh caran bêtirî vê hejmarê li navçê hene.

# Pêşesazî

Di civateke ku li ser çandiniyê û çêrê radibû û ji bajarên mezin ve dûr bû, pêdvî bi hosteyên ku li gundan rûdiniştin pir hebû. Ew hoste, bi tevahî, li gundên Axan dihêwirîn, hin jî li gundan digerîn, karên xwe didan nasîn, pêdviyên malan çê dikirin û difrotin jî.

Alavên ku bi destan li gundan dihatin çêkirin û di karûbarên çandiniyê û yên malê de dihatin xebitandin, hinek jê ev bûn: Tevir, Qazme, Kuling, Mer, Merik, Palte, Bivir, Misas, Gîsin, Das, Qalûç, Kêr… û hwd.

Piraniya **hesinkaran** li navçê Ermen bûn, ew li gund û cihine naskirî rûdinştin. Ji hesenkarên naskirî li destpêka sedsala bîstan: Şêxoyê hesinkar, ew Kurdekî 'Elewî bû li gundê Bircikê rûdinişt. Ji Ermenan jî mirovê bi navê Kerkiyan li Kefersefrê datanî. Kêrên baştir jî li gundê Coqê ji hêla 'Eliyê Xoce ve dihatin çêkirin, ew kêr bi navê pêşesazkerê wê yê bi navê Suxte dihatin naskirin, hîn jî çêkirina wan kêran ji hêla mala Goçer û kurê wê Eslan ve tê kirin.

Pêşeya **necariyê**: Necar li piraniya gundan hebûn, wan ew pêşe ji bav û kalên xwe biri bûn û piraniya wan Kurd bûn. Darên ji bo xebtandinê ji daristanên çiyê dihatin peydakirin. Tiştên ku dihatin çêkirin, her tiştên textî yên malê bûn, û alavên ku di çandinyê de dihatin xebitandin.

Necar û hesinkar û berberan ji ber karê xwe ve tişt dibirin, wek nimûne, karên malê yên salane bi du kêl genim dikirin, ew jî li dema bêderan dihat dandin.

Emê navên hin necarên ku li nîvê yekê ji sedsala bîstan naskirî bûn, û navên gundên wan hewaldin:


**Hec Mûse, Hesen û Eliyê Dêĝli li Şiyê. Reşîtê Umerê Hemo li Erendê. Heydo li Hec Qasma. Hesenê Elî li Tirmûşa. Hemedê Osmanê Hido li Şiketka. Xelîlê Camo li Hesendêra. Mihemedê Xatê li Gewenda. Xelîlê Şêxoyê Osmên li Gu.Kerê. Adîk û bavê wî û kalkê wî ji Milexelîla. Reşîtê Taşkê li Çolaqa. Mihemedê Necêr li TilĤemo. Bekirê Ĥesnecarê li Xerza...**

Hin alavên çandiniyê û yên malan jî, ku ji hêla wan pêşesazvanan ve dihatin çêkirin ev bûn:

## - Alavên karên çandiniyê

### Hacetên cot:

**Hevcar**: Ji darê hişk dihat çêkirin, lê ew niha ji hêsin e. Çend perçeyên wî hene, her yekî jî bi navekî ye /li wêneya hevcêr binêre/. **Nîr**: Darekî rast e, dirêjiya wî nêzîk 2/m ye. Li her aliyekî çend qulik hene, darik tê de ne, ew diket ustuyê dewêr û hevcar pê ve dihat girêdan. **Darik**: Neçelekî darî ye, datînin ser ustuyê dewêr û nîr pê ve girêdidin. **Kedene yan Klopîn**: Ji kulêv û çêrm çê dibû û tijî pûş dikirin. Rengê wê wiha ye ( Ω ), ew diket ustuyê dewêr paş Dêrik û her du dawîneyên wê li bin ustuyê dewêr bi benikekî bi navê **Sîrim** dihat girêdan. **Misas**: Destikê wê darî ye bi dirêjiya Mitrekê ye. Perçekî hesinî çargoşe dora 7×7/SM an di serê wî de heye, pê ax û geye ji ber gîsnê cot tê pakirin. **Başîpe**: Benekî dirêj e, bi serê dewêr ve girê didin, ew liva wan serast dike. **Bestek**: Benekî




kin e, ji mûyê bizinan çê dikirin, pê nîr tê girêdan.

### - Hacetên pale û bêderê:

**Qalûç**: Hacetekî hêsinî ye, destikê wê darî ye. Yek din jî mîna wê heye jê biçûktir e, jê re **Dasik** dibêjin. Qalûçek mezin jî hebû navê wê **Kef** bû, kef li gel hacetekî textî yî din karê palê pê bi leztir dû. **Kişandina Sêp**: Ew bi Ĥêştir, Qantir, Hesp û carina jî bi Ga dihat

kirin. Hacetekî darî bi navê **Şiĝre** hebû, li ser pişta dewêr dikirin, û bi hacetekî din jî bi navê **Şeyale**, ku bi şêweya (∠) bû, sap li dewêr dihat barkirin, û bi bên û **bi heçiyan** dihat girêdan.

Berê, kutana sêp, nemaze çeltîk, bi textekî pehin bi navê **Gam** dihat kirin. Ew bi dewarekî ve dihat girêdan, barekî giran yan mirovek li ser disekinî, û bi wî rengî di ser sêp re li dora bêderê digerî. Pişt re, **Cercer** derket, loqên wê hesinî bûn, ew jî bi dewêr di ser sêp re digerî, û wilo sap hûr dikir û tene jê derdiket. Ji bo karê sêp, du hacetên din jî bikar dihatin, yek **Milêb**/Melêb, yek jî **Sîrĝe** bû.




**Cercer**

Piştî ku sap hûr dibû, bi **Milêba Darî** dihat libakirin, tene li aliyekî dima û ka jî li alîkî din.

Cudakirina tene ji axê û qirêja bêderê jî bi karê Serdandinê dibû. Ew jî bi **bêjingan** dihat kirin, tara bêjingê ji têxt bû, deziyên wê jî ji çerm bûn. Du cure ji bêjingan hebûn, yek qulik hûr bû, pê ax ji tene dihat veqetandin. Didu, **Serad**, qulkên wê ferehtir in, pê tene ji bermahiyên sêp û bêderê cuda dibe.

Piştî wê, tene dikirin çiwalên bi navê **Xirar**, yan jî **Çal** di zemînê de dikolan, tene dixistinê, dar datanîn ser, pûş li ser daran rêdixistin û ax bi ser de dikirin. Ew şêweyê veşartinê, netenê ji bo parastina tene bû, ew ji ber hêrişên cendirmeyên Osmanî û dûv re yên Firensî jî dihat parastin.

## - Hacetên şîvpêjê/metbexê yên darî û hacetên malê:

**Fîşeka Dêw**: ji bo keyandina dêw bi kar dihat.

**Kevçiyên darî**: Çend cureyên wan hebûn, wek: Kevçiyên şîvê û yê dêw (Kûr), Kevçiyê Simêlan jî hebû, kesên ku simbêlên wan dirêj bûn bikar tanîn. Hesk: Ji bo biroşên mezin tê xebitandin. Kefgîr: Destik dirêj e û serê wê qulqulî ye, gava kelandina şîvan, nemaze kelandina dimsa şêrîn, kef ji ser rûyê biroşê pê tê girtin.



**Fîşeka Dêw**

### - Alavên hunerî yên sêz:

Mîna: Tembûr, pîk, zemir, bilûr… çêkirina wan hostetiyeke taybet dixwaze. Ji hosteyên navdar di sedsala bîstan de ku me kanî bû nas bikirana: **Ĥus Xel** ji Gu.Xezîwê li sala 1936an miriye. **Ĥes Necar**. **Adîk** li gu.Kora rûdine.

# Pêşesazkirina berhemên çandiniyê

Ew karine taybet in, li ser tene, zêtûn û tirî tên kirin, mebest jê ew e, ku ew bibin xwarin û werin hilanîn û firotan.

## Zêta zêtûnan:

Derhanîna zêtê pêşesaziyeke pir kevin e li Çi.Kurmênc. Şûnewarên guvaşgehên zêtê yên kevirî, bi hejmareke mezin ji her sê demên Alefiringî (Yûnan, Roman, Bîzentî) de li navçê tên dîtin.

Li dawiya sedsala nozdehan, 72 guvaşgehên zêtûnan li navça Kilisê hebûn(1). Li wan deman, damezrandina guvaşgehên zêtê nîşana dewlemediyê bû û ji bo avakirina guvaşgehekê destûra Axeyê deverê gerek bû.

Guvaşgehên berê ji van hacetan pêk dihatin: Loqekî kevirî yî mezin, li ser curnekî kevirî yî mezin bi dewêr digerî û teneyên

1- Pirtûka/salnama wîlayeta Helebê ya Osmanî/, sala 1332/G=1903/Z, rûpel 274.

zêtûnan dihêra. Pişt re ew zêtûnên hêrandî dikirin telîzên taybet, bi riya dewêr dihatin guvaştin, zêt li gel ronavê(saêl) jê dadirvî, û pişt re ji hev dihatin cihêkirin.

Roja îro pêtirî 250 guvaşgehên nûjen li navçê hene, ew li dema berefkirina zêtûnan digerin. Ji bilî wan karxanek ji bo pakirina zêta tehil ku ji bêrînê dertê jî heye.

## Meyxane[1]:

Pêşesazkirina Inbît û Meyê ji pêşeyên pir kevin e li Çi.Kurmênc. Hebûna gelek guvaşgehên kevirî li seranserî navçê, giringiya wê dest nîşan dike. Li serdemên berî Îslamê, şêniyê herêmê cureyên zor baş ji meyê li hemî herêmên Impretoriya Girîkî belav dikirin.

Li dawiya sedsala nozdehan û nîvê yekê ji sedsala bîstan, çandina mêwan li Çi.Kurmênc pir bû, ji bo çêkirina meyê, hin zengînên navçê meyxaneyên biçûk ava kiri bûn. Ev in war û navên hin meyxanan:

Meyxana **Hilûbiyê**: Li kêleka girê Hilûbiyê, li nêzîk aşê ku li ser geliyê Qerecurnê bû, ew a Henan Axayê Çirûsî bû, û li navîna sedsala bîstan rawestî. Meyxana **Mala 'Etêr**: Li Gu.Erendê li ser Ge.Şiyê bû, ew jî li navîna sedsala bîstan rawestî. Meyxaneyên **Xelîl Axa**: Didu bûn, yek li ber girê Endîbê li ber kaniyê bû, kavilên wê ra salên şêstî ji sedsala borî hebûn, ya din jî li Gu.Çolaqa bû. Meyxana **Bozant Kîwaniyan**: Ew li bajarê Efrînê ye, li sala 1927an hatiye avakirin û hîn jî kar dike. Meyxana **Bîra Gûzê**: Ya mala Fîlik ji gundê Birîmce bû. Meyxana **Mehmed Axayê Kiso** li Gu.Xilalka.

## Hêrandina tene:

Xelkê navçê avên kanî, cowik û çemên Efrînê û Reş ji bo avakirina aşên avê bi kar tanîn. Hejmara wan aşan bi dehan bûn. Di pirtûka /salnama Osmanî ya wîlayeta Helebê, rûp 274/ de hatiye, ku li sala 1903an, 31 aşên avê li navça Kilisê hebûn. Sê aşên bi bê digerîn jî li ser Çi.Lêlûn hebûn, 25 aş jî bi dewêr digerîn, 32 firne/nanpêj yên nankirinê jî li Na.Kilisê hebûn. Piraniya wan aşan ra berî pêncî salî di kar de bûn, lê peydabûna matorên ku li ser Mazotê digerin,

---

[1] -Meyxane, cihê ku meye lê tê çêkirin e.

ew rawestandin û avahiyên wan jî hilweşîn, lê hîn cihên gelek aşan naskirî ne û kavilên wan jî hene. Ji wan aşan, aşê 'El-Kûrê ku ra sala 2000an li ber pira Meydankê digerî, ew li bihara wê salê di bin ava gola Meydankê de ma. Aşên avê ji çalakiyên şêniyê Çi.Kurmênc ên aborî bûn û kavilên wan wek şûnewar tên jimartin.

Emê li vir aşên ku me naskirin, û ava ku li ser digerîn binasînin:

- Li ser **ava Tilîlaqê:** Ew gelî di navbera gundên Erebwêran û Dêrsiwanê de ye. Aşê mala Hec omer li ser kaniya Ze'delînê li rojhilatê pira Gu.Erebwêranê bû. Aşê Mihemed Diran ji mala Hec Omer jî li rojavaya wê pirê bi nêzîkî 200m bû. Aşê Çawîş Oĝlu jî li ser wî gelî li nêzîk çemê Efrînê bû.

- Geliyê ava **Serê Kaniyê** (kefercenê): Ji gundê Serê Kaniyê de û ra gundê Qeredepe, ev aş li ber wî gelî hebûn: Du aş li ber gu.Serê kaniyê. Li dû wan aşên Oliq, Misto, Piskuli, 'Elî Îbrêm û Ĥenên, kavlên avahiya aşê dawîn hîn hene. Ew aş tev ên mala Hemdoş û Ĥemkulek bûn. Ji pira Qerdepe de û ra ava çemê Efrînê jî ku bi geliyê Coĥişkê tê nasîn, du aş li ser hebûn: Aşê Bêremoĝli, hîn kavlên wî li ber pira Qeredepe ne, û aşê Çamorlo li rojava Gu.Qîbarê.

- Ava **Sabûn Suyê**: Du aş li başûrê pira Romanî hebûn, yek jê yê mala Şêx Sim'el bû.

- Geliyê **Qerecurnê**: Aşê Henan Axayê Çirûsan.

- Li ser **Çemê Efrînê**: Aşê 'Elkûrê ji Gu.Naza li ber pira Meydankê bû, piştî ku mala Mideris ji Helebê ew kirîn, ew bi navê Aşê mala Medê hat nasîn. Aşê Mirteze jî li başûrê Aşê 'Elkûrê bû. Aşê Sêçavî û Aşê Hesen Seydî li rojhilata Gu.Gemrûkê li ber solavê bû. Aşê Sor û Aşê gewr jî li navbera gundên Kifêrê û Keferzîtê bûn.

- Kaniya **Basûtê**: Aşê Kusik li bakurê kelê bû.

- Kaniya **Endarê**: Aşê mala Umer Sefûna ji Gu.Maratê, li aliyê girê Endarê yê başûr bû, hîn jî şûnewarên wî xuya dibin.

- Geliyê **'Endîbê** li deşta Gu.Coqê: Sê aş hebûn, yek li ser Kaniya Êş bû, avahiya wî hîn heye.

- Li ser **Ava Reş**: Aşê Firfirkê hîn avahiya xwe heye.

- Kaniya **Betmanê** li deşta Lêçe: Sê aş li ser digerîn, yek jê Aşê Qopê li ser navê xudiyê wî bû.

- Aşek li ser kaniya **Berbe'ûşê** li bakurê Gu.Mabeta, li kêleka zareta Berbe'ûşê bû.

- Geliyê **Xastiya**: Heft aş li ber digerîn, jê aşê Elî Axa li ser Ge.Circim, û aşê Mala Me'mîkê, hîn jî kavilên wî hene.

- Li ber ava **Kanîgewrkê**: Aşek bi navê kaniyê hebû, hîn kavilên avahiya wî li ber pîrozgeha Şêx Ebdrehmên in.

- Li ber **geliyê Şiyê**: Du aş li binê gundê Mistka hebûn.

- Aşek li ber kaniya **Gu**.**Tilsilorê**.

- Aşek li ber kaniya **Gu**.**Kela**.

- Aşek li ber **Gu**.**Xidiriya** li ser Ge.Sor.

- Aşek li **Gu.Kêla** li ser ava sarîncekê hati bû ava kirin.

Piştî salên çelî ji sedsala bîstan, gelek ji wan aşan rawestîn, û roja îro ji bilî şûnewarên wan nemane.

## Nankirin:

Nan li malan dihat kirin, nanê navdar **Nanê Tenikî** yan **Nanê Sêlê** bû. Hevîr li ser textê nên bi **doxê/tîrkê** dihat pehinkirin û li ser **sêlê** dihat bijartin. Nanpêj jî li salên sihî ji sedsala bîstan li bajarê Efrînê hatin vekirin. Roja îro nanpêj li gelek bajar û gundên mezin hene. Nanpêjeke dewletê ya otometîkî li bajarê Efrînê heye.

## Kutana Dên:

Wekî ku tê zanîn, gava genim tê kelandin dibe **danî**, ew danî tê kutan û **kepek** û **dan** jê dertên. Gava dana jî tê hêran **savar** û **simût** jê derdikeve. Dan, Savar û Simût stûnê Pîjgeha/metbexa Kurdî ya berê bûn.

Ji bo pêkanîna karên jorîn, alaveke taybet hebû, jê re **delûb** tê gotin. Delûb curnekî kevirî mîna yê guvaşgehên zêtê ye, loqekî kevirî bi dewêr li ser li curnekî kevirî digerî, û kepek ji dên dikir, ew loqê kevirî niha bi aletê tê gerandin. Li dema berê, danî di **soqê** de bi **Mêkut/Toqmaq** dihat kutan, û kepeka ku bi dên ve ye, jê dibû.

## - Pêşesazîne din


Delûba kutana Dên li Gu.Ĥebo

Li dawiya sedsala nozdehan, gelek pêşesaziyên destane li Qeza Kilisê hebûn. Di pirtûka /El-Memalêk El-'Usmaniye, rûp 167, sal 1904/ de hatiye, ku 120 **dezgehên** bi destan digerîn li Qeza Kilisê hebûn, wan qumaş ji pembû û hiriyê çê dikirin. Deh **boyexane** jî lê hebûn. Pîneyên **Kosere** jî ji pêlavan re çê dikirin.

Piştî serdema Osmanî, pêşesazî li Na.Efrînê bêtir bûn, ew li gor peydabûna berhemên navçê û nîr û kirdeyên lêhatî peyda dibin, ji wan pêşesaziyan:

### Komirkirin:

Ji ber ku Çi.Kurmênc çiyakî bi darûber e, bi taybetî jî darên Merxê û Sindêganê, çêkirina komirê ji berê de ji karên kevin û giring bû li ba şêniyê çiyê. El-Ĝezî li destpêka sedsala bîstan dibêje, ku baştirîn komir ji qeza Kilisê û deverên wê dihat Helebê. Lê belê, komirkirina bê sînor, bû sedema ku rûberine fere ji daristanên navçê kûr bibin û çiya rût bibin, nemaze li deverên Xastiya, Me'mila, Çeqela û Çiyayê Hawarê.

Piştî ku Firensiyan dest danîn ser navçê, karê komirkirinê li saz xistin. Wan destûrên fermî dan hin kesan, daku daran bibirin û komirê bikin. Ew şêwe ji kirina komirê, ra navîna salên pêncî ji sedsala bîstan berdewam kir. Roja îro, hîn kirina komirê bi rêdana dewletê tê kirin. Lê hin kesên gundên çiyayî bi dizî jî komirê çê dikin.

### Pêşesaziyên birîna keviran û pedviyên avakirinê:

Berê, kana keviran a tek li rojhilata bajêrê Efrînê li ber kendalê çêm bû, xaniyên bajêr ên berê bi kevirên wê hatine avakirin, lê ew kan niha bikar ne tê. Roja îro, bêtirî heft kanên kevirên avakirinê yên sipî û zer li çiyayên navçê hene, nemaze li Çi.Lêlûn.

Çend karxaneyên birîna keviran hene, û berhema wan li Na.Efrînê û li dedora wê tê firotin. Sê karxaneyên hêrandina keviran ji bo kevirên hûr û niĥatê jî li navçê hene.

Li devera Bilbilê jî, pênc kanên kevirên **Rixama** rengîn, nemaze yê reş li bogira Gundên Şêxorzê û 'Elendara hene. Hinek jê ji hêla dewletê de, hin jî ji aliyê kesan ve tên bikaranîn. Li derbarê kevirê Rixamê, her du bira Rasil di pirtûka /dîroka Helebê…/ de, bi bîr tînin û dibêjin, ku li sedsala hejdehan, Rixam ji Kilisê dihat Helebê.

Pênc karxanên Bilatan û çend ên pêşesazkirina Kelpîçan avakirinê jî li baharê Efrînê hene.

## Ber (Cil):

Karxeneke dewletê ji bo pêşesazkirina **beran** û yek ji bo **xaliyan** li bajarê Efrînê hene, ew li navîna salên şêstî ji sedala borî hatine damezrandin, ew ji karxaneyên destpêkê ne li Na.Efrînê û berhemên wan zor baş in.

## Pêşesazên Bêrîn û sabûnê:

### Bêrîn:

Piştî ku zêtûn li guvaşgehê tên hêrandin û zêt jê derdikeve, bêrîn ji ber dimîne. Texmîn dibe, ku tibaba Bêrîna salane ku li navçê dertê digihê dora 120 hezar tonî. Dora 12 hezar ton zêta Sabûne ji wê bêrînê derdikeve, 25 ton komir jî jê çê dibin. Karxana bêrînê ya yekê li Çi.Kurmênc li sala 1978an, bi şêweya komeleyî hat damezrandin. Niha dora 13 karxaneyên bêrînê yên taybet li Na.Efrînê hene.

### Sabûn:

Deh karxaneyên sabûnê li navçê hene. Tibaba sabûna ku li navçê tê çêkirin digihê 4000 tonî. Sabûna navçê ji berê de navdar e. El-Ĝezî dibêje, ku sabûneke baş li Kilisê tê kelandin, û li welatê Şamê tê firotin.

## Bazirganî

Li dirêjiya serdema Osmanî, bajarê Kilisê ji navça Çi.Kurmênc re navenda bajarvanî û bazirganiyê bû. Karûbarên bazirganiya şêniyê Çi.Kurmênc li wê û li bajarê Entabê dihatin kirin. Şêniyê gundên rojava yên li derdora deşta Hemqê û Lêçe jî, berê xwe didan bajarê Qirixanê. Beşekî baş ji bazirganiya Kurdên navça Çi.Kurmênc li bazarê Helebê jî dibû. Li wan deman, rola zimên di vebjartina sûka bazirganiya Kurdan de pir giring bû. Çinkî piraniya Kurdan bi Tirkî zanîn û bi Erebî nizanîn.

Kelûpelên sereke ku dadiketin bazaran, ev bûn: Pez û berhemên wê, berhemên çandiniyê, komir…û hwd. Pêdviyên malan jî, ji bazarên bajaran û ji çerçiyên ku li gundan digerîn dihatin kirîn, û piraniya kirînfirotina tiştan bi berdêlî dihat kirinfirotan, ango çerçî hem difrot û hem jî dikirî.

Piştî cenga cihanî ya yekê, û parkirina herêmê di navbera dewletên nûbûyî de, têkliyên şêniyê navça Çi.Kurmênc ji bazarên bakur û rojava hatin birîn. Lewre ew neçar bûn berê xwe bidin bazarên Helebê.

Li demên berê, birina berheman bo bazarên Heleb, Hemq û bajarên Çi.Gewr, bi riya hêştiran dibû. Kesê ku hêştirekî xwe yî baran heba, nanê mala xwe pê derdixist. Wek nimûne, keriyek Hêştirên Xalit Axayê Îsak hebû, û kelûpel û komira ku ji deşta Hemqê û Çi.Kurmênc diçû Helebê di destê wî de bû.

### - **Bazar li navçê**:

Li serdema Osmanî, bazarên navçeyê yên sereke li Kilis û Qirixanê bûn. Ji bilî wan, bazarine hefteyî li hin gundên mezin ji navça Çi.Kurmênc jî hebûn, wek Hemamê û Bilbilê, şêniyên gundên derdorê, li wan bazaran dihêwirîn. Lê piştî danîna sînoran di navbera Sûryê û Tirkiyê de, giringiya bazara Bilbilê çû bazara Reco, nemaze piştî ku Reco bû navenda deverekê. Şêniyên gundên rojhilata Bilbilê jî berê xwe dan bazara bajarê Ezazê.

Li dawiya sedsala nozdehan, bazara Hemamê bazareke navdar bû, lê piştî ku Gu.Cindirêsê li şûna Hemamê bû navenda kargêrî ya

deverê, ew bazara ji wir rabû, û niha li bajarokê Cindirêsê li dar keve.

Roja îro çend bazarên hefteyî li navendên deverên navça Çi.Kurmênc hene, gelek berhemên navçê lê tên kirînfrotan.

Bazareke hefteyî û yek rojane (Sûq El-Hal) li bajarê Efrînê hene, û berhemên navçê lê tên firotan. Bazareke zêtê, tene û dewêr jî li Efrînê heye.

Ev e lîstek bi bazarên ku li dema me li Na.Efrînê hene, dîroka damezrandina her yekê ji wan û roja wê ya ji hefteyî:

| **Bajar** | **Efrîn** | **Reco** | **Cindirês** | **Şiyê** | **Mabeta** | **Bilbil** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Sala vebûnê** | ١٩٢٧ | ١٩٣٠ | ١٩٤٠ | ١٩٩٤ | ١٩٩٤ | |
| **Roj** | Çarşem | Şemî | Duşem | În | Yekşem | în |

Lê belê bazara navdartir a bajarê Efrînê ye, lewre me xwast gotineke biçûk li derbarê dîroka damezrandina wê bêjin.

## Bazara Efrînê:

Bi mebesta damezrandina bazareke nû li bajarê Efrînê ku nû hati bû avakirin, li Bihara 1927an Firensiyan xelk agahdar kir, ku dê li Kopriyê (navê Efrînê yê destpêkê yê wê hîngê) bazareke nû ava bibe, û ji wan xwestin li wê rojê li Kopriyê amade bibin. Herwiha, li wê rojê şêniyê gundên nêzîk bi def û zurnê hatin û bazara Efrînê vekirin. Hêja ye em bêjin, ku wê hîngê Cemîl Bafî serokê şaredariya Efrînê bû.

Çima roja **Çarşemê**?

Baweriyeke kevin li ba şêniyê navçê heye, ew roja çarşemê wek rojeke pîroz dibînin, bi taybetî jî li ba Kurdên li devera Cûmê yên Êzdî. Li roja Çarşemê hemî karên malê radiwestin û mîna roja fehesê dihat nasîn[(1)]. Tê bawerkirin, ku Firensiyan jî ew tişt dizanî,

[1]- Di pirtûka Şerefname rûpel 128an de hatiye: Gava ku Husên Begê Ozon serokê hoza Berxê Gewr a Tirkmanî, destlat li Êranê radest bir, li sala 1470î zayînî, ajot ser Îmareta Hekarî ya Kurd, li wê çaxê her gava ku parêzerên sînoran hakimê îmaretê Mîr Ezdîn Şêr bi hatina dijmin agahdar dikir, wî digot: (Îro çarşema, ne roja pevçûn û rijandina xwînê ye). Wiha heya Tirkmanan ajote ser, ew kuştin û mîritiya wî jî dagîr kirin. Di wê rûpelê bi xwe de, wergêr Mihemed

lewre wan ji aliyekî de rêzdariya baweriyên şêniyê navçê girtin, ji aliyekî din ve jî, bazarek ji wan re ava kirin, lê ji berî her duyan, wan bingeha navendeke bajarî ji destlata xwe re danî, û hebûna xwe ji xelkê re kirin tiştekî bê rev û baş jî.

Giringiya aborî û civakî ya bazara Efrînê ta roja îro heye, bi sedan firoşkarên biçûk li ser karê rojên bazaran dijîn, gelek kes ji navçên derdora Efrînê û ji Helebê jî tên bazara Efrînê, û bazirganiya xwe dikin.

## Geştevanî

Sirûşta Na.Efrînê pir xweşik e, gelek cihên şûnewarî yên pir giring lê hene, loma jî hejmarine mezin ji geştevan û seyranvanan tên seredana wê.

Ji cigehên şûnewarî yên giring: Kela Sem'anê, Girê 'Endarê, Kela Nebî Horî, şûnewarên Çi.Lêlûn…û hwd.

Piştî ku gelek rêk li deverê hatin vekirin, nemaze li devera Şêrewa, hêvî heye ku gelek cih, nemaze jî gundên Şêrewa, bibin cihên geştevaniyê yên xweş û pir balkêş.


Ji cigehên geştevaniyê yên herî navdar li Na.Efrînê: Serê Kaniyê (kefercenê), Meydankê û gola wê, Basûtê, Endarê, Ziravkê, Nebî Horî, solavên Gemrûkê…û gelekên din jî hene, **[Nexşe 20]**.

Hejmarek baş ji qehwexane û xwaringehan jî li wan ciha hatine vekirin û xizmeta geştevana dibînin.

Lê belê, ew deverên şûnewarî û geştevanî yên zor hêja û giring, ji aliyê rewşên xizmetgûzarî de pir xizan in, û guhdana dewletê bi wan pir kêm e, ji bilî ku, ew pir caran ji hêla xelkê ve jî tên civilandin û pir bi xemsarî lê tê nêrîn.

---

Elî 'Ewnî nivîsiye, û dibêje: Hîn roja çarşemê bi roja çarşema sor bi nav dibe, nemaze eger Çarşema dawîn be ji meha Seferê bi demnasiya heyvê.




**Nexşe - 20 -**
**Seyrangehên girîng li Çî. Kurmênc**

# Rewşên Civakî

## Xanî , Malbat , Karûbar , Gerdiş , Şêweya jiyanê , Şêweyên teselebûnê ...

### Gund û xanî li Çi.Kurmênc

Dema ku rewşên tevahî hêmintir bûn, û ewlehî li nav sînorên dewletê peyda bû, nemaze di serdemên hin siltanên Osmanî de, hejmara şênî li Çi.Kurmênc bilind bû, kom û komikên malbatî û hozî yên mezin pêk hatin û kanîn berevaniya xwe li hember talan û metirsiyan bikirana. Û herwiha bi demê re, şênî hin bi hin jiyana kon û şikeftan berda, û dest bi avakirina xaniyan kir.

Guman heye ku wan guhertinan ji navîna sedsala şanzdehan de de dest pê kiriye, û gundên sereta li deverên çiyayî hatin avakirin.

Lê li deverên deştî, nemaze li deşta Cûmê, gund ji berê de hebûn, û ew jî di wan rewşên nû de her çûn şên bûn.

Gundên çiyayî yên destpêkê, li ser pesarên çiyan û kenarên geliyan hatin avakirin. Ji ber wê jî, xanî di ser hev re dihatin girtin, û rengê pêplûkan distandin, ango pişta xaniyekî ji yê din re dibû wek sewkiyekê.

Bi tevahî, gundên navçê li ber jêderên avê hatine avakirin. Gelek gund jî, li ser yan li ber kavlên avahiyên şûnewarî hatine damezrandin, çinkî xelkê sûd ji kevirên kavilên avahiyên kevin û ji bîr û serîncên kivin werdigirt. Ji bilî ku, gelek şikeft jî li ew warên kevin hebûn, ew jî ji jiyana gundîtiyê û xudîkirina dewêr re pir gerek bûn.

Piraniya pir ji xaniyan li cihên kaşî dihatin avakirin. Bingehên di zemînê de xaniyan kûr dihatin kolan, û bi wê yekê, dîwarê paş di zemînê de winda dibû, û piştа xanî jî bi rûyê zemînê re dûz dibû. Çend rindiyên vê cureya avakirinê hebûn, wek: Mirov kanî bi hêsanî bigihîşta ser xanî, û durustkirina serbana wî, wek dûtin, loqkirina[1] ji bo baranê û rêşkirina berfê jî hêsan dibû[2].

Bana xanî jî bi dîrekan dihat çê kirin, bi piranî, dîrekên darên Spîndarê (qewaqê) û şaxên daran datanîn ser, pişt re ax li ser dûz dikirin, û bi ĥeriya ku ji ax û kayê çê dikirin, dihat dûtin.

Dîwarên xaniyan dora mitrekê stûr bû, wê yekê hindurê malê ji germa havînê û serma zivistanê diparast. Hin pencereyên biçûk (yarîk, yêwrîk, êwrîk) jî ji bo guhertina bayê hundur di dîwarên xanî de vedikirin. Vê şêweya avakirinê, mal ji diz û lawiran diparast, ji ber ku li wan deman, bi piranî, dizan dîwarê xanî yê paş qul dikir, û derbas hindur dibûn. Bi tevahî, em kanin salixên mala çiyayî li sedsala nozdehan wiha hewaldin:

Berê xanî bi başûr de bû, yan jî li gor berê zemînê dihat avakirin, xanî ji hindur de bi şêweyê qentirmekî dihat avakirin. Kevirek li ser kevana derî siwar dikirin, navê xudanê malê, dîroka avakirinê, navê hoste û hin biwêj û laveyên olî jî li ser dineqişandin. Carina, ji bo fodilkirinê çenaqên xezefî yên rengîn li kêleka wî kevirî bicih dikirin, carina stêrkên şeşper an jî hêvkevanek û stêrkeke heştper li ser dineqişandin. Me gelek xaniyên kevin bi wî rengî li navçê dîtin, bi tevahî, ew xanî ji sedsala nozdehan bûn.

Li hindurê malê jî li aliyê derî yê çepê, Kevrê bîbalkê hebû, ew ji bû rawestanê dihat bikaranîn[3]. Xanî jî, li gor dewlemendiya xudanê malê, li ser qentirmekê yan du qentirman dihat navakirin, û hindurê wî parve çar beşan dibû, her beşek jî ji bo kardayînekê bi kar dihat:

---

1- Ji wî kevirî re digotin Loq, destikê wî kevankî bû, jê re jî dogotin Darloq.

2- Dîrokeke naskirî li Çi.Kurmênc heye, bi Çil Berfê tê nasîn. Dibêjin berf çil rojî ket, û şênî çil rojî, her sibê berf ji ser xaniyan rêş dikir, ew berf li zivistana salên 1910/1911an ketiye.

3- Guman dikim, ku navê wî kevirî ji “Bê Balgî” hatiye. Rûniştina mêvanekî li ser wî kevirî dest nîşan dikir, ku ew tiştekî dixwaze û gerek destvala venegere.

**Beşê pêşiyê**: Odeya li hêla rojava ji bo rûniştinê û mêvanan dihat bikaranîn. Carina daniştekeke kevirî yan textî ye dirêj tê de dihat avakirin. Beşê pêşiyê yê rojhilatî jî pixare tê de bû, şîv lê dihat kirin, û li zivistanê dibû cihê rûniştina li ber êgir. Li dorçêwirma wan her du odan, refikên textî li ser lingikên bi rengên balindeyan dihatin bicihkirin, firaqên baqirî û yên din bi şêweyekî fodil li ser rêz dikirin.

**Beşê paş**: Oda paşîn a rojava, bi taybetî ji bo danîna pirtiyan/nivînan (stêr) û mala mûnetê bû. Korteke kûr bi navê 'Udik li quncekî wê dihat kolan, ava ku ji lihêma binyata xanî dadirvî tê de kom dibû. Oda paşîn ya rojhilatî jî, ji bo dewêr, kayê û tiştên din dihat bi kar anîn. Di navbera kevana her du qentirman de jî, benekî ristî (kejî) û rengîn dihat girêdan, desmalên serdestan û tiştên paçî ku li malê dihatin xebitandin, bi ser dixistin.

Ew şêweyê xaniyan gundan ku baş parastî bûn, pêdvî bi hebûna sîperekê li dora malê ne dihîşt. Ji ber wê jî, tenê dîwarekî kevirî yî nizim li dora xanî dihat gerandin, û geyayê belanê yan şaxên dara zêtûnê li ser dihat danîn. Dergeh jî text bû, biçûk bû, û tenê ji bo rêbirîna dewarên malîn sûdar bû.

Ji dawiya sedsala nozdehan de, xaniyekî cuda (axur) ji dewêr re hat ava kirin. Piştî wê, ango ji dawiya nîvê yekê de ji sedsala bîstan, avahî hîn pêş de çûn. Mûdêla xaniyê qentirme hilhat, metbex cihê bûn, ode pir bûn, û xanî serûber bi çemento, hêsin û keviran hatin avakirin. Hêjayî gotinê ye, ku berê xaniyên gundên çiyê bi keviran dihatin avakirin, ên deştê jî, nemaze li deşta cûmê, bi kelpîçên axî bûn.

Piraniya avaker/hosteyên avakirinê Cihû û Ermen bûn, lê gelek hosteyên Kurd jî hebûn, hin hosteyên ku xelk bibîr tîne ev bûn: **Şêx Birîm ji Gu.Eşûnê. Ûsibê Ĥîto, Silêmanê Faroq û Bilalê Toko ji Şiyê. Mistefayê Feqê û Hemedê Henên ji Şîtka. Mihemedê Hûsên ji Erendê. Şêxoyê Hebeş ji G.Dîkê. Mihemedê Mecît û Hec Hemîd ji Gu.Dela. Ebdirehmanê Xintik ji Şêxorzê. Mihemedê Hesenê Hec Xelo ji Be'dîna. Ûsibê Huso ji Tirmûşa. Reşîtê Kero ji Gu.Hec Hesna. Mistefayê Êso ji Senarê. Hemê Elîkê ji Qirigolê. Henîf Isma'îl ji Gu.Hebo…**

## Mal , Malbat

Navên komikên binyata civakê li Çi.Kurmênc wiha ne: **Mal** (bav û dê û zarok). **Malbat** (ji çend Malên ku mirovên hev in pêk tê) û jê re **Famîle** jî tê gotin.

Berê, gava ku law dizewicîn, ew di mala bavê xwe de rûdinştin, zarok tê de mezin dikirin, bi hev re dixebitîn û jiyaneke hevbeş dijîn, belkî ji ber wê jî, piraniya şêniyê gundên Çi.Kurmênc ji malekê yan ji çend malan dikşên. Û li dema ku malekê yan lawekî bixwasta cihê biba, gerek bû destûra mezinê malê bibira.

Li destpêkê, malekê yan çend malan li warekî datanî, û bi demê re ew war dibû gund, lewre gelek caran, gund bi navên ew mirovên ku li destpêkê li wir rûdiniştin dihatin binavkirin.

Gelek salix, gerdiş şêweyên jiyandinê û taybetiyên Mala Kurdî li Çi.Kurmênc hene û pê tên nasîn. Cudawaziyên wê di warên xwarin, vexwarin, cil û gelek tiştên din hene. Lê li roja me, gelek ji ew taybetiyên kevin bûne ji Filoklora civaka Kurdî û kelepûra kevin ji Çi.Kurmênc re.

## Mal û Jin

Li gor salix û gerdişên civaka Çi.Kurmênc, hîn destlatdariya malê di destê mêran de ye. Lê belê, jin di nav endamên malê de cihê rêzdariyê ye û di ber mala xwe de berpirsiyar e. Wek nimûne, ew kane li şûna mêrê xwe biryaran bistîne, û gelek ustubariyên malê bi rê ve bibe, mîna pêşwaziya mêvanan, karên çandinê û xudîkirina pêz, kirîn û firotan, çareserkirina nakokiyên malê, malbatê û gelek tiştên din jî.

Ji aliyê cilûbergan de, bi tevahî, jina Kurd li Çi.Kurmênc cilên dirêj li xwe dike, desmalê dide serê xwe, lê rûyê xwe nagire, xwe ji mêran û xerîban venaşêre, û ew bi parastina rûmeta xwe jî navdar e.

Bi demê re, gelek jinên navdar li Çi.Kurmênc hatine naskirin, wek Hewe Xatûn ji mala 'Umê, Sefûn ji Maratê, ew her du jî ji sedsala nozdehan de ne.

Ji jinên ku li dema me naskirî, Nazli Xatûn jina Es'ed Axa ji Îska, ew bi pêkanîna karûbarên mala xwe radibe, û rêzdariya civaka xwe wergirtiye.

Li dema berê, derfetên xwendinê ji jinan re peyda ne dibûn, lê digel wê, hin jinan li Çi.Kurmênc heştê sal ji temenê xwe derbas kirine, û baş xwendin û nivîsandinê dikin, ji wan: Meyroya Reşîtê Gênco ji Turundê, Zêneb ji Bilbilê ku hîn pirtûkên xwe yên bi Osamaniya kevin dixwîne.

Li çareyekê dawîn ji sedsala bîstan, piştî ku dibistan li piraniya gundan hatin vekirin, bi hezaran keçên Kurd fêrnameyên zanîngeh û amojgehan stendine, û derbas hemî warên kar bûne, wê di hêla zewaciyê de jî, bi tevahî, biryara xwe xistiye destê xwe.

Jina Kurd li Efrînê guh dide pirsên siyasî jî, gelek ji wan di nav rêxistinên siyasî de cih girtine, çi partiyên netewî û çi wekî din, û bi dehan ji ber doza gelê xwe de ciwanemergî jî bûne.

Lê mixabin, tiştek heye wê dikulîne, ew jî ew e, hin jinên ku li bajarên Erebî rûdinin, zû dev ji zimanê xwe yê Kurdî berdidin, û di malê de bi zaroyên xwe re bi zimanên din deng dikin, ev jî ustubariyeke dîrokî datîne ser milê wê.

# Cil û Berg

## Cilên jinan:

Berê cilên jinan ên her nofeke civakê ji hev cuda bûn. Cilên jina mala xanedan ji qumaşê buha, wek Qedîfe û Hevrîşmî bûn. Cilên jina sêfîl/xizan jî Xamî bûn. Lê belê cilên her du nofan rengîn bûn.

### - Cilên serî:

Li dawiya sedsala nozdehan û destpêka a bîstan, cilên serî yên pîrejin û jina bi mêr, ji yên keçikan cuda bûn.

### Jina temen mezin:

Wê **kofî** dida serê xwe. Kofî bi deziyên hevrîşmî û tayên zîvî dihat dirûtin. Pişt re kofî hilhat û desmalê/şalê şûn girt, di bin wê de, desmaleke biçûk/**berenî** jî dihat danîn, ev cil hîn li ba hin jinên navsal hene.



**(Jina Seydê Dîkê)**
**Cilên serî û govde li ba pîrejinan, ji destpêka sedsala bîstan**

### Jina biçûktir:

Ji bilî şal û bereniyê, wan di hin minaseban de, kumên bi zêr, zîv û peran fodilkirî didan serê xwe. Ew kuma ji kofiyê biçûktir bû. Carina jî wê xwe bi **Çêwrê** dixemiland.

### Keçik:

Desmaleke bi navê **Çêwra** morik/Oye/Şaşi dida serê xwe. Ew ji qumaşê sipî bû, dorçêwirma wê bi zerîfeya rengîn û pûlikan dihat

xemlandin. Her koşeke wê jî topikeke biçûk ji hiriya rengîn pêve dikirin, /li benda xemla bûkê vegere/.

### Cilên govde/xeftan:

**Fîstan**: Rengîn bûn, dirûtineke wan ye taybet û şêrîn hebû, ew bi ser Kirês û Hevalkirês de dihatin lixwekirin.

**Keras**: Devzendkên kirês û yaqa wî bi deziyên hevrîşmî yên rengîn, û bi zirîfeyên rengîn dihat xemlandin.

**Hevalkiras**: Ji qumaşê rengîn bû. Tenê kirasê jinên Êzdî ji qumaşê sade sipî bû.



**Cilên keçikan**

- **Pêkirin/pêlav**:

Jinan jî mîna mêran **Tasûm** û **Qabqab** pê dikirin.

## Cilên mêran:

Cilên gelêrî yên mêrekî ji qada orte li sedsala nozdehan û ra nîvê yekê ji sedsala bîstan, wiha bûn:

### - Kincên govde:

**Keras**: Ew bi tenê, û di bin cilan de jî dihat lixwekirin, ew ra kabê dirêj bû.

**Miltan**: Bi dirêjiya çaketekî bû, û nîv pî bû, ji pêşiyê ve vekirî bû, rengê wî sor yan reş bû, û bi deziyên reng zêrîn dihat neqişkirin.

**'Eba kizinî**: Bi ser kirês û miltên de dihat lixwekirin, ji mûyê bizinan û bi destan dihat çêkirin. 'Eba kizinî ji cilên gelêrî yên navdar bû.

**Şelwer**: Ji qumaşê reş e, ew bi ser derpiyê sipî de dihat lixwekirin. Şelwerê mirovê Çi.Kurmênc navran/ navrewan/peyîk dirêj e, û li bin kabê teng dibe, benê girêdana navê jî **(Pizî**) ji mû yan ji hiriyê dihat ristin.

Ji bilî wan, mirovê berê, **Pişta Surme** dida nava xwe û xençer, şeşer û şiva cixarê di ber re dikir. Mêran **Palisxe**, ku ji çêrm çê dikirin, di ber pişta surme re datanî, ew wek bi berîkê bû û tiştên kesane dixistinê.

Lê piraniya xelkê tenê **Kiras û Derpiyê Sipî** li xwe dikirin. Ew jî du perçe bûn, û ji xama sipî bûn, kirês ta kabê digirt, û derpî jî ji navê de û ra ser gozikan dirêj bû. Ew cil baş fere bûn, ew mîna yên ku niha li Pakistan, Avganistanê… tên lixwekirin bûn. Hîn kalemêr in hene, wan di bin şelwer de li xwe dikin.

**Kurkî Şivên**: Ji hiriya miyan û mûyê bizinan dihat çêkirin. Ew bê pî bû. Şivên ew davêt ser milê xwe û ra nîvê kabê digirt.




**Cilên mirovên ji qada navîn**

## Cilên serî:

**Kumê Qulik**: Kumekî berdirêjûk bû, dora 10/sm bi ser serî diket. Ji xasê sipî dihat çêkirin, û bi Pîjikên Kiprî (lawireke) dihat qulkirin, paşê jî bi derziyeke taybet[1] û bi deziyê hevrîşmî dihat dirûtin. Pişt re piskulkek ji dezî yan ji hiriyê bi serî dixistin. **Şe'ra Surme** yan **Şe'ra Mor** jî, li dora kum digerandin. Pir caran kum ji kulêv dihat

[1]- Çar cure ji derziyan hebûn, bi navên tiştên ku pê dihatin dirûtin binav dibûn: Derziya dirûnê, derziya 'Eba, derziya Melefa (ya doşek û mitêlan), derziya Kuma.

çêkirin, û jê re **Kumkuleh** digotin. Her du bira Rasil di rûpela 96an de ji pirtûka xwe, li ser dana serî ya Kurdên Helebê û derdora wê li sedsala hejdehan wiha gotine: Wan kumekî dirêj û kulavî dida serê xwe, û şaşikeke sipî jî li dorê digerand.



**Kumê Qulik û Şe'ra Surme**

Zarok û xortan jî guhar dikirin guhên xwe. Ew 'adet ra destpêka sedsala bîstan hebû. Gotineke gelêrî li derbarê guharên mêran li navçê heye, wiha dibêje: ((Ne kalê bi guhar, ne pîra bi yar û ne sala du buhar)).

**Pêkirin**:

Mêran ev pêlav pê dikirin:

**Tasûm** yan **Fîler**: Ji pêlavên Kurdî yên klasîkî bûn li Çi.Kurmênc. Ew ji çermê sor, zerê dagerî, mor yan jî reş dihatin çêkirin, pîne ji kosere û bê kerik bû. Li salên pêşîn pîneyên lêstîkî hatin xebtandin û mêr û jinan ew pê dikirin.

**Çarûx**: Ji çerm çê dibû. Bi kerik yan jî bê kerik û poz dirêj bû.

**Sol**: Ew pêlava şivan û cotariyan bû, serûber ji çêrm bû, ra binê kabê dirêj bû û bi benikên çermî(Sîrim) li lingan dihat girêdan.

**Qabqab**:

Ji têxt dihat çêkirin, li Zivistanê ji bo parastina ji avê û heriyê bikar dihat.

**Gorên Rîsî**: Bi destan dihatin ristin.

Ev cilên Kurdî yên kilasîkî ku li Çi.Kurmênc dihatin bi kar anîn, ta radeke bilind, nêzîk cilên bapîrên wan ên gelên Lolo, Mîtanî, Horî, Kaşî û Medî dibin. Lêkolînvanê Sovyêtî Diyegonov di pirtûka xwe ya hêja /Medya, rûpel 348an/ de, cilên wan miletan wiha salix dane:

((Mêrê miletê Lolo li hezarê sisiyan berî zayînê, kirasekî ra ser kabê dirêj li xwe dikir, piştek dida nava xwe, 'eyarê lawiran datanî ser milê xwe, kumê kulavî yê dirêj dida serê xwe, û pêlavên çermî ji her du aliyan de dirêj û bilind bûn, pê dikir, û cilên gelê Mîtanî jî wilo bûn.

Cilên mêrê Medî jî li nîvê yekê ji hezarê yekê berî zayînê wilo bûn: Kirasekî dirêj û pî kin, şelwerekî bi qirme û navran dirêj, miltanekî kin û rengîn û kumê dirêj dida serê xwe)).

Li ber roniya salixên cilên mirovên gelên çiyayî, diyar dibe ku nêzîkbûneke balkêş di navbera wan cilan û cilên Kurdî ku ra navîna sedsala bîstan li navça Çi.Kurmênc bi kar dihatin de, heye.

## Nav û navnîşanên kesan:

Li ba Kurdan jî gerdişa serdar ew e, ku zarokan bi navên bav û bapîran, mirov, dostan û bi navên Îslamî yên dîrokî bi nav dikin. Lê belê piraniya wan navan li gor bilêvkirina Kurdî tên hildan. Wek nimûne, ji Miĥemed re dibêjin: Mem, Memo, Ĥemo, Ĥemed, Miĥo, Mamed, Memed… Ji Ĥesen re: Ĥeso, Ji Leyle: Leylê… û herwiha. Ango bi gelemperî, nîşana bangê (o) ji bo nêrza, û (ê) ji bo mêza bi dawiya navan dikeve.

Hejmareke baş ji navên jinan ên kevin jî hene, hîn bikar tên, wek: Fîdan, Naz, Gul, Gulîzar, Taw, Keçûn, Bes, Hor, Bihar, Qedîfe, Binefş, Xanim, Med, Sînem, Kîbar… û hwd.

Ji destpêka nîvê diduyan de ji sedsala bîstan, şêweya navan bere bere têne guhertin, gelek navên Ku roja îro tên xebitandin, xudî wateyên netewî, civakî û navên sirûştê ne, wek:

Navên **keçan**: Roşîn, Narîn, Hêvîn, Hevî, Mizgîn, Mîdiya, Zozan, Hemrîn, Bêrîvan, Mehabad, Newroz, Kurdistan, Şêrîn…

Navên **lawan**: Kawa, Azad, Ciwan, Siyamend, Dêrsim, Metîn, Egît, Amed, Hawar, Şoreş, Lewend, Hozan, Rêzan, Şiyar… û hwd.

Me lêkolînek li ser navên zarokan (133 law û 130 keçan), li mehên Kanûna Diduyan û Hezêrana sala 2000an, ku li kutikê nifûsa bajarê Efrînê hati bûn tomarkirin, çê kir, jixwe malên Ereb jî di nav de ne, encamên wê serhejmarê wiha bûn: %16 ji navên lawan û %34.5 ji navên keçan Kurdî bûn. Li gundan jî rêje wiha bû: %25 ji

navên lawan û %45.5 ji navên keçan Kurdî bûn. Herwiha, tevahiya rêjeya navên Kurdî li navçê li sala 2000an, wiha bû: Nêrza %20.5 û mêza %40.

Tiştê balkêş ew e, ku ev rêje li destpêka salên heftê ji sedsala bîstan wiha bûn: Nêrza %3.2 û mêza jî %17.3.

Navnîşanên kesên malê û mirovan jî wiha li nav Kurdên Çi.Kurmênc tên hildan:

Kesên ji **aliyê bavê** de:

Şêniyê çiyê ji bavê bavê û dayîkê re dibêjin: **Bapîr**/bapîrk, ên deştê jî dibêjin: Kalik. Ji mirovên mezin re dibêjin: Kalo. Ji birayê bavê re dibêjin Apo, ji kurên Apê re (Pismam), Pisê Pismaman (kurê kurê apê), Met (xûşka bavê), li devera Şêrewî jî dibêjin Meto. Bira, Birak, û ji bo bangê dibêjin Keke, yan keko, ji zaroyên biran re jî dibêjin Birazi.

Kesên ji **aliyê dayîkê** de:

Pit. Pîrê. Anê yan Dêk. Xalo. Lawê Xalê, Qîza Xalê yan Qîzxalê. Xaltîk û ji zaroyên wê re jî, çi keç çi law, dibêjin Xaletî. Li gundên deştê, nemaze li ba Êzdiyan, dibêjin Pisxaltî. Xak yan Dot[1], lê li gundên çiyê ji bo bangê dibêjin: Xakê yan Xûçê yan Xûşkê, li gundên deştê jî dibêjin: Ûçê, Dadê. Ji zaroyên xûşkê re jî dibêjin Xarzi.

Bûk, xûşka jinê (Paldûz), diya jinê (Xasu) û bavê wê (Ap). Zave, şêniyê çiyê jê re dibêjin Ênişte. Birayê mêr (Tî) û xûşka wî Gorme yan Gorim.

Zaro yan Qiçik, şêniyê De.Şêrewa jê re dibêjin Kiloz jî. Qîz. Law. Jina bavê (Dêmarî). Mêrê dê (Bavmarî). Jina diduyan (Hewî). Jina bê mêr (Jinebî)[2].

1- Gotineke gelêrî heye dibêje: Dê û dotê girtin hev, aqilkêman înan kir.

2- Bawer dikim ev bêje ji du bêjeyan pev ketiye "Jin + Nebî) ango jina Pêxember, ew jî ji ber ku piraniya jinên Pêxember Mihemed bê mêr bûn, ji ber wê jî, û li gor çanda olî ya Îslamî, her jineke bê mêr wek jina Pêxember lê hatiye nêrîn, û jê re jina Nebî, ango jina Pêxember hatriye gotin).

# Boneyên malbatê

## Jinanîn (zewacî)

Bi tevahî, Kurd jinan ji miletê xwe tînin, lê belê jinanîna ji netewên din jî heye, nemaze li gundên tevlehev û li bajarên mezin.

## Cureyên jinanînê:

- **Jinanîna asayî**: Bi tevahî, jinanîn di navbera merivan de dibû. Berê, ya bêtir di navbera zaroyên apan, pişt re met, xal û zaroyên xaltîkan de dibû. Bi tevahî, mala zêve bûk ji kurê xwe re vedibjart[1].

- **Jinanîna bi berdêl** /Guhertin: Du keç bi hev dihatin guhertin, her yek ji birayê yê din re diçû[2].

- Jinanîna **ji ber xwînê** ve: Keçek ji ber xwîna kuştiyekî ve didan. Ew ji bo çareserkirina tolvedanên malbatî dihat kirin. Bêguman, niha ev yek nemaye.

- **Revandin**: Ev rengê jinanînê ji ber sedemên nezanî, sêfîlî û astengên civakî û olî –Êzdî..Îslam- ve çê dibû. Ew li destpêka sedsala bîstan pir bû, û carina bê dilxwaziya keçikê jî dibû, û ew bi darê zorê dihat revandin. Ew şêwe hîn jî heye, lê pir hindik bûye. Bi tevahî, piştî revandina keçikekê, xudiyên wan li hev dihatin. Lê gelek caran kuştin û dijmantî jî dihat meydanê.

---

[1]- Di warê vebjartina bûkan de, gotineke gelêrî heye, dibêje: Eger tu jineke peyvdar dixwazî ji hoza Rojka bibe, ew kane Axekî ji hoza Biyan bêdeng bike. Jina ji hoza Şêxa jî çeleng e. Jina Şikakî ji aliyê camêrî, mêvandarî û şîvkirinê de kebanî ye. Jina Biyan nizane deng ke, û pejmorde ye. Tê gotin, ku ev tişt ji bo xatirê êşandina mirovên hoza Biya hatine gotin. Pir gotin ji bo xwastina keçan hene, wek: Bala xwe bide dê, bibe qîzê. Keçê mexwaze, diya wê bixwaze… û hwd.

[2]- Her aliyekî bûka xwe li hespekê dikir, mirovên wê û hin ji şêniyê gund bi dora hespê diketin, û diçûn cihê guhartinê. Tiştên pir balkêş li wir çê dibûn; carina her aliyek li cihê xwe disekinî, û dixwast aliyê din berve wan were. Carina jî, jinan dev davêtin hev, û dibû sedema nebûna berdêlê. Yan jî ji bo tinaziyan, aliyek radibû bûka aliyê din direvand. Ev tişt hemî bi stran û tekirmeyên şêrîn û balkêş dihatin kirin, û her aliyekî pesna ciwanî û sinciyên bûka xwe dida, û bûka aliyê din û xudiyên wê qedirsivik dikirin, lê herdem jî guhertin diçû serî.

## Rêwresmên jinanînê:

### - Xwazgêncî û Şêranî:

Piştî ku xudiyên xort xwazgênciya keçikê dikirin, û her du alî bi hev razî dibin, **şêranî** dihat kirin, mirov û dostên her du aliyan dihatin vexwendin, ahengeke biçûk li wê boneyê li dardiket, û li gor rewşa aborî ya mala xort, zêr û li demên berê zîv jî bi keçikê dixistin. Di şêraniyê de, **qeleng** dihat birîn. Li demên berê, birîna qeleng bi katan dirêj dikir, carina jî li hev ne dikirin û xwazgêncîtî ne diçû serî. Ji ber wê jî, û ji bo birîna qeleng, bavê zêve hin gernasên gund, wek Keye û Axê gund bi xwe re dibirin. Û bi tevahî, bavê keçikê qeleng dibir û dixawr.

Ji bo qelengê bûkan, li sêyekê yekê ji sedsala bîstan, bi pereyên Osmanî yên zêrî, Mejdî, Hemîdî û Reşadî yan jî bi (Kîse) dihat nirxandin[(1)]. Çiqasiya qeleng jî li gor asta civakî ya xudiyên keçikê bû. Wek nimûne, qelengê keçeke ji maleke sêfîl dora 15 kîsan bû.

Li xudiyê xort dihat birîn jî, ku tişîtên malê peyda bike, wek: Nivîn, mitêl, balgî, cil, text û sêla nên û nex... û sandiq û neynika bûkê û derzî jî ji pedviyên bûkê yên giring bûn.

Li roja berî derxistina bûkê, meriv, cîran û dost tên vexwendin daku li **Sertêr**/Sercihêz amade bibin, wan jî hin diyarî mîna ber û xalî ji bûkê re tanîn[(2)].

### Şahiyên Dawetê:

Gelek salixên taybet û balkêş ên dawetan li navça Çi.Kurmênc hene. Lê bi tevahî, şahiya daweta berê bi vî rengî dibû:

Berî dema dawetê bi çend rojan, xudanê zêve xilat ji meriv, dost û nasên xwe re dişandin û ew vedixwendin zemawendê. Ji bo

---

[1]- Pereyên Osmanî: Werqeke zêrî= 5 Mejdî. Mejdî- Hemîdî, Reşadî= 100 Quriş. Mejdiyekî zîvî= 19q. Nîv Mejdî= 9.5q. Rub Mejdî=4.75q. Bêşlik= 2.5q. Berĝût= 1.9q. Berĝûtê Biçûk=0.95q. Quriş= 40 Pere. Metelîk= 10 Pere. Pere= 5 Baqir. Kîse jî pereke Osmanî bû ji navîna sedsala hejdehan de hat bikaranîn, her Kîseyek 20 Mecdî bû û 500 qurşên zîvî jî dikir.

[2]- Têr, bi destan ji mû û hiriyê dihat çêkirin, ew mîna Xurcekê ye, li dewêr dikirin, û tiştê bûkê dixistinê.

bicihkirina mêvanan li gundê zêve, û bicihanîna xwarina wan, xudanê dawetê li ser malên gund digerî û ew bi **xwandiyên** wan agahdar dikir, û herwiha vexwandiyan pêş de dizanîn ku ew mêvanên kê ne.

Li siba berî dawetê, şandek jin, ligel mirovekî (şopiltirk), berxek bi xwe re dibirin û diçûn mala bûkê. Li wê hêvarê, di ber stirana **Hevalokan** re, bûk dihat **ĥenekirin**, destên bûkê û carina ling jî dihatin ĥenekirin. Jinan jî pere bi navê **Şabaşa nava ĥenê** diyarî bûkê dikirin.

Li siba roja din, jineke ku dizanî bûk bixemlanda, nemaze kumê wê, bûk dixemland, û ji ber karê xwe ve du kêl û nîv genim, ango nêzîk 25/kg dibir. Xemla bûkê jî wiha bû:

**Kumê Meraşê**:

Kumekî biçûk û kulavî bû, sê darikên qamîşî li dorê hebûn, bi zêr, zîv û perên berê dihat xemilandin û bi desmalên rengîn dipêçan, carina jî perê Maman di ber re dikirin. Me kumek jê dît, bi deziyên zîvî hati bû çêkirin, xudanê wî kumî li destpêka sedsala bîstan bû bû bûk. El-Ĝezî jî li destpêka sedsala bîstan di pirtûka xwe de gotiye, ku bûkên Kurdan bi kumên Qamîşî dihatin xemlandin.

**Sorika bûkê**: Qumaşekî pembî yî sor datanîn ser serê bûkê û rûyê wê digirt, jê re Kulik jî dihat gotin.

**Fîstan**: Ji Qedîfe bû.

**Pişta Tereblusê**: Hevrîşmî bû, didan nava bûkê.

**Miltan**: Kurtikekî bê pî, yan pîkin bû, digihîşt jêrî piştê.

**Hungulk an Çarik**: Ew çargoşe bû, wê navê xwe ji wê şêweyê biriye. Bi piranî, ew ji qumaşekî sor û gulgulî û bi keşkeş dihat çêkirin, û bi benikekî jî li nava bûkê dihat girêdan, Hungulkê nîvê pêşin û jêrin ji govdê bûkê û ra gûzikên lingan vedişart.

**Tasûm**: Şêniyê çiyê jê re dibêje Fîler. Ew soleke sereke û navdar bû li Çi.Kurmênc, bi taybetî jî Tasûma sor.

Piştî henekirin û xemlandina bûkê, roja din li sibehê (ya pir li rojên pêncşeman), dawetcî ji bo derxistina bûkê dihatin, û amadekariya birina wê dibû. Li destpêkê têr û hekîb ku hurmûrê

bûkê yê taybet tê de bû, li hespê dikirin. Li wê gavê, eger xudiyên zêve, zêr yan per nekirina sola bûkê, wê pêlava xwe pê ne dikir, û eger zêrek nekirina berîka wê, ew li hespê jî siwar ne dibû.

Berî ku bûk ji malê derketa, birayê wê li ser sandiqa bûkê rûdinişt, yan jî li paş derî disekinî û ne dihîşt bûk derkeve ta **paşqapî** wergirta, wî yan şeşarek yan jî pere dixwastin, lê li dawiyê bi hindikî qayîl dibû.

Piştî ku bûk li hespê siwar dibû, mirovekî ku jê ve nêzîk bû, bi serê hespê digirt, û daku tukes mûyên dûvê hespê jê neke, du jin li dû dimeşîn [1].

Piştî ku karwana bûkê ji gund derdiket, şivanên gund rê lê dibirîn, wan girantirîn pezê xwe yan beranek datanî nîvê rê, û ji bûkê dixwast wî ji rê derîne, wan bi wê yekê doza **Ke'rî 'Ewîlan** dikir. Ji xwe bûk ji bo wî karî ji hespê peya ne dibû, lê wê şivan bi desmalekê, tûrkekî titûnê yan jî bi diyariyeke biçûk razî dikir.

Piştî ku karwana bûkê ew asteng derbas dikir û ji gund derdiket, siwar dadiketin cirîta hespan. Dema ku karwana bûkê nêzîk gund dibû, mirovê ku neynika bûkê hildigirt, dilezand û berî gişan digihîşt gund, û herwiha diyariyek li bûkê heq dikir.  Ji ber wê jî, ew di karnava wê boneyê de mirovekî giring bû, wê lomê jî dibêjin: Ma te neynika bûkê aniye!. Dema ku bûk digihîşt gund, û bi hêviya ku bûk lawan wîne, lawekî biçûk li paş wê dikirin, û herwiha bi stran û şahiyan digihîşt mala zêve.

Li meydana malê, ta bavê zêve sozê pez, çêle, baxçe, perçak zevî û tiştine wek wan nedaya bûkê, ew ji hespê peya ne dibû. Piştî ku bûk ji hespê peya dibû, xortekî gund ku bi siwariyê navdar bû, li hespê bûkê siwar dibû, û ew ji hewşê derdixist, hevalên wî jî bi tiştan davêtinê, û pişt re wî diyariyek ji bûkê werdigirt.

Li wê demê, zave li ser xaniyê malê disekinî, û gava ku bûk digihîşt ber deriyê malê, wî şekir yan pere bi ser de belav dikirin, ew yek jî bi mebest û hêviya peydabûna dewlemendî û jînferehiya bû.

---

[1]- Bawerî hebû, ku eger mûyek ji dûvê hespê were jêkirin, û Fatĥe bervajî were xwendin, û ew mû were şewtandin, yan dê zarokên bûkê nabin, yan jî dê mêrê wê li ser bizewice.

Piştî wê demê, xortan nîşanek li derveyî gund datanî, piraniya caran nînika bûkê ya biçûk bû, û bi tivingan davêtinê, kê lê bida wî diyariyek ji zêve dibir, bi piranî jî diyarî Kumekî Sipî yî hevrîşmî bû.

Pişt re, vexwandî dihatin, her vexwandiyek azad bû çend dost û hevalan bi xwe re wîne. Hinekan kirîf, stranbêj û boke jî bi xwe re tanîn, ango şandeke civakî û hunerî ye sergihayî pê re dihat. Li şûna pereyên ku niha wek şabaş tên dan, berx, rûn û tiştên xwerinê ji mala zêve re tanînin.

Gava ku vexwandî dighîştin derveyî gund, wan ji bo agahdarkirinê fîşek davêtin, xudanên dawetê jî lê vedigerandin, û bi dahol, zurne, stran û sema berve wan diçûn, ew pêşwazî dikirin û dibirin mala mêvandariyê. Li wir, kirîfan ew şabaş dikirin û mezinê wan şabaş dida. Li mala mêvantiyê, aheng ta sibê li dar diket, fîşek dihatin avêtin, xudanê malê jî neçar bû ku bi şev û rojê û bê westan xizmet xwandiyên xwe bike.

Li sibehê, xudanê dawetê li gel kirîfan mal bi mal digerî, û bi dahol û zurnê mêvanên xwe tanîn meydana dawetê. Li wir, cil radixistin, doşek datanîn, mêvan bicih dikirin û şahiyên dawetê dest pê dibûn, pirbûna daholan li dawetekê nîşana dewlemendiyê bû.

Li dîlanê semavanekî **Sergovend** li ber dahol û zurnê serê govendê dikşand, steranbêjan jî stranên giran ji dest hev digirtin, yan jî bi stran û tekirman radibûn hev.

Hin lîstikên navdar jî hebûn, wek **Sîngsîngê**, agirê wê li nava govendê dihat dadan, dawetvan li dorê dibezin û xwe di ser re davêtin.

Lîstika **Qeşmer** jî hebû, mirovekî postekî miyan li xwe dikir, rû û çîpên xwe bi teni dikirin, yekî din jî rola jinekê dibir, wî xwe dixemiland, pişt re Qeşmer ew jin direvand û şênî bi pê diket. Ew ji lîstikên şêrîn bû, û bi kêfxweşî dihat lîstin.

Pêşbirkên Qutê jî dihatin kirin, **boke** dadiketin korê(meydanê), û li ber dengê daholê diçûn hev, ji bokeyên navdar li gundên deşta Cûmê, li sêyekê yekê ji sedsala bîstan, ‘Elqeĥwe ji Gu.Turindê bû.

Li şeva dawetê ya dawîn, li ber strana şêrîn (werzava), zave dihat henekirin. Roja din li nîvro jî, xwarina **Keşk**ê ji vexwendiyan re dihat danîn. Û li katên dawetê yên dawîn, hemî vexwandî di dîlanê de beşdar dibûn, kirîfan jî dest bi şabaşa xwe dikir, û bi wê yekê dawiya dawetê dihat. Jixwe dawetin hebûn heft roj û heft şevan dirêj dikir.

Dawetên Çi.Kurmênc mehrecanên hunerî û filoklorî yên zor ciwan bûn, bazareke biçûk jî li kêleka wê çê dibû, nemaze li dawetên gundên Axan. Çerçiyan gelek tişt tanîn firotanê, di nav de Barût û Kebsûnên ku ji bo fîşekan jî hebûn. Lê carina xudiyê dawetê Barût belaş dida mêvanên xwe, nimûna gelêrî ku dibêje: “Barût ji kîsê zêve ye” ji wê hatiye.

Piştî dawetê bi çend rojan, bûkê hin diyarî li şêniyê gund, nemaze ewên ku mêvan hilgirti bûn, belav dikirin. Piştî çend heftan, û ji bo ku malbatên bûkê û zêve hevdu baş nas bikin, wan hevdu tekelif dikirin.

Lê li roja me, şêweya zewaciyê ji hêla hevdunasîna bûkê û zêve, xwestin, qeleng û dawetê de pir cuda bûye. Dawet li qehwexanekê tê çêkirin, tenê çend katan dirêj dike, û sazbend û stranbêj wê şên dikin.

Xemla bûka niha jî hatiye guhertin. Xebtandina dahol û zurnê jî kêm bûye. Henekirin, mêvandarî û rêwresmên dawetan ên xweşik nemane. Hin semayên kevin tenê ji hêla hin kesan ve tên pêşkêşkirin. Li dawiya dawtê, kesên vexwandî li gor kanîna xwe pereyên xilata xwe dide.

## Jidayîkbûna zarokan

Anîna zarokan ji minasebeya malbatê yên şahiyê ye. Zarok di malan de bi alîkariya **Pîrika** gund dibû. Li wê katê, mêr ji malê derdiket. Ji xwe hêviya malê herdem lawik bû. Gava ku lawik dihat, hevalên mêr guhê wî dikşand û ew dipesinand.

Lê ji kevneşopên ne baş, ne dihîştin ku jina bi zêstanî 24 katan avê vexwe, baweriyek hebû digot, ku bi avê re **Pîrhebûk** dikeve zikê wê û wê nexwaş dike. Û ji bo parastina ji Pîrhebûkê, derziyeke 'Eban di cilên wê, yan di balgiya wê re dikirin, û eger dem havîn an

zivistan ba, mitêl û tiştên stûr bi ser de dikirin. Xwarina jina bi zêstanî jî tiştên şêrîn bûn.

Pişt zandinê/zarokanînê, mêrê jinê **hevalçûk** dibir di axê de vedişart, yan jî davêt aveke ku diherikî. Hinekan jî, piştî ku **navika** zarok diket, ew davêtin mala mirovekî gernas, an cihê karê wî, bi hêviya ku ew zarok jî wek wî serkeftî bibe.

Zarok bi qundaqê dihat pêçan, ew paçek sipî bû, bi wêneyên gul û balindeyan, nemaze Tawûz, dihat xemlandin. Gelek caran ji bo ku zarok sinciyên camêrî û dilêrtiyê wergre, pariyek nan yan kêrek dixistin nava qundaqê. Morikek şîn, **Kevrekî Sîva** /ji baweriyên Êzdiyan e/, û du darikekên xaçkî jî bi ser milê zarok dixistin. Bi hêviya ku çavên zarok mezin û belek bibin jî, ew kildidan. Jinan dora du salan zarokên xwe dimêjandin, wê yekê vebûneke xweristî ji ducanbûnê peyda dikir.

Zarokan mehên şîrmijiya xwe di **dergûşê** de derbas dikir. Wêneyên xweşik li ser ew dergûşên textî dihatin nexşandin. Carina, ji bo hêviya mêrkirina paşerojê, navê kurên apan li ser dergûşên keçikan dihatin nexşandin. Dergûşa zarokê delal jî, bi **Serdergûşê** dihat pêçan, serdergûş jî bi topikên rîsî yên rengîn dihat xemlandin. Di ber hejandina dergûşê re, dayîkê stranên herî ciwan, rastgo û vîndar ji zarokê xwe re dilorandin.

Li roja me, piraniya jinan li ba bijîşkan û pîrikên xwende dizên. Parastina zarokan ji çavan, bi morika şîn û kevirên Sîva dihat kirin, û hîn jî wilo ye. Piraniya dayîkan jî, li vê demê, zarokan namêjînin û şîrê Firingî didine wan.

## Sinetkirin

Sinetkirina zarokan ji boneyên şahiyê bû. Sinetkirina lawê yekê li ba malbatên dewlemend, şêweyeke ahengî ye mezin distand. Roja îro sinetkirin di jiyana malê de tiştekî asayî ye.

Piraniya caran, û bi sedema ku sinetcî herdem peyda ne dibûn, her çend law li gundekî bi hev re dihatin sinetdikirin. Dema lêhatî ji sinetkirinê re, çaxa vebûna çîçekên Be'îvan bû. Ji rêwresmên sinetkirinê, gerek bû mirovekî ne ji mala kurik ew di hembêza xwe kira, wê hîngê di navbera malbata wî kesî û xudiyên kurik de

pêwendiya “Kirîftiyê” çê dibû, û jinanîn di navbera wan her du malan de qedexe dibû. Jixwe sinetkirina keçikan jî li ba Kurdan hîç tuneye.

## Rêwresmên mirinê

Rêwresmên mirinê û veşartina mirov ji demên dirêj de wek xwe mane û nehatine guhertin. Gava ku kesê Misliman dikeve ber candanê, wî dirêj dikin, serê wî berve bakur dikin, Quranê li ber serî datînin, carina hin Ayetan jî dixwînin.

Gava ku mirov can dida û dimir, çav û devê wî didin hev, û ji bo rastkirin û nêzîkirina lingên wî, her du pêçiyên lingan ên mezin bi hev ve girê didin.

Mirî li mala xwe tê şuştin, û piştî kefenkirinê, wî datînin ser **darebestê** (niha dikin tabûtê), û dibin li mezelê gund vedişêrin û jin jî diçin nav mêzel. Kurdên Çi.Kurmênc miriyên xwe bi şev venaşêrin.

Piştî telqînê, xudî û mirovên mirî li rêz disekinin, şênî serxweşiya wan dike, û bi tevahî, ev biwêj tên gotin: **((Serê we xwaş be. Win û zarokên xwe xweş bin. Ciyê xwe cinet be. Xwedê sebrekê bi we de...û hwd))**, xudanên mirî jî wan biwêjan vedigerînin, û pişt re xudanên mirî û şêniyê gund mêvanan tekelif xwerinê dikin.

Berê, Serxweşkirinê heftekê û carina jî bêtir dirêj dikir, lê niha bi tevahî, sê rojan dimîne. Li şeva yekê piştî mirinê, Quran tê xitim kirin, hinek jî li dawiya rojên serxweşkirinê Mewlîdê didin xwendin. Li civaka serxweşiyê jî, bi tevahî, rêberên olî gotinan dikin.

Li rojên sisyan û heftan û çelî ji mirinê, xudiyên mirî xwarinê dikin, yan jî xwarineke şêrîn weke ĥelawê belav dikin. Hêja ye em bêjin, ku şêweya rêwresmên mirinê li ba Kurdên Êzdî jî di vê çarçewê de ne. (Li beşê jiyana olî veger).

Hêjayî gotinê ye, ku li demên berê, piştî ku korta gorê dihat kolan, li binê wê, kêleka wê ya Başûr dihate xewrandin ta têra termê mirî dikir. Paşê termê wî dixistinê, kevir didan ber û korta gorê tijî ax dikirin. Ji wê xewrê re (Bergor) dihat gotin. Belkî ji ber wê jî Kurdên Çi.Kurmênc dibêjin (mirî veşartin), ango binax kirin.

## Boneyên komelgehî

### - Cejna Rojiyê û Cejna Qurbanê:

Meha rojiyê bi tiştên balkêş di ser malên Kurdên Çi.Kurmênc re derbas dibû û ta radeke bilind hîn jî wilo ye. Dayîk xwarina Si'ûra û Fitara amade dike, û li fitara hemî endamên malê li ser sifrê rûdinin û fitara xwe vedikin. Tu xwarinên bi taybet li van her du danan tunene, lê li dema berê, nanê tenikî û dimsa şêrîn, di xwarina Si'ûra de du stûnên bingehîn bûn.

Ji tiştên ku herî balkêş di rojiyên berê de, şeva **Qadir**ê bû, ango Şeva El-Qedrê. Ji bo Qadirê, li nîvê diduyan ji meha rojiyê, şêniyê gund her rojekê li mlekê kom dibûn, û fitara xwe vedikirin, wê yekê heyameke hezkirinê û civakî ye baş peyda dikir.

Li şeva cejna rojiyê jî, cureyên têvel ji şîvan dihatin amadekirin, wek dolme, sarme, kufte, xewre û hwd. Amadekirina şîvan ta derengiya şevê dajot, û hemî endamên malê şiyar diman, çimkî xewa li şeva cejnê ne baş dihat dîtin.

Li siba cejnê û ji berbanga sibê de, yên ku dizanîn Quranê bixwînin, diçin li ber gorên miriyên xwe dixwînin, hin jî xwarinê, şêkir yan jî peran li nav goristanê belav dikin.

Pişt re, mêr li mêvanxana gund dicivin, cejna hev pîroz dikin, û eger hin ji hev dilgiran bû bin jî, ew li hev tên. Piştî wê, hemî mêrên gund xwe didin hev, li malan digerîn û cejn pîroz dikirin. Pişt re, herkesek vedigere mala xwe û xwe ji bo bixêrhatina li mêvanan amade dike. Rêwresmên cejna Qurbanê jî wilo ne, tenê sivra wê dewlementir e.

Her du cejn, Rojî û Qurban, li ba xelkê giring û şêrîn bûn, û hîn jî wilo ne. Ew cejn dibûn boneyên şahiyê yên zor xweş, û xelkê berî wê bi sê rojan, bi tevahî şeş rojan, şahiyên fere li dar dixistin.

### **Cejna Newrozê**:

Newroz (Nû Roj, Roja Nû), rêzdariyeke vê cejnê ye civakî û siyasî ye payebilind li ba gelê Kurd heye. Rêweresmên wê yên sereke, dadana êgir li serê çiyan e, û derketina nava sirûştê ye.

Di pêvajoya dîrokê de, xelîfeya 'Ebbasî El-Mu'tesêm, hewil kir ku dadana agirê Newrozê qedexe bike, hinan jî ji bo rêdana şahiyên wê xûkek taybet bi navê wê ji xelkê distand. Lê belê ew ji wan biryaran dagerîn, û li dirêjiya sedsalan Newroz wek cejneke gelêrî û civakî ma, û li roja me jî bi coşeke mezin tê li dar xistin.

Mîna ku gelek jêder dibêjin, pêwendiyek xort di navbera Newrozê û dîroka gelê Kurd de heye. Hin gotinên Kurdî Newrozê bi ketina Nînewa paytexta dewleta Aşûrî ve li ser destê Medan li sala 612an/BZ girêdidin.

Hewaldaneke din jî heye, wê bi şêweyekî evsaneyî bi koka hebûna gelê Kurd ve girê dide. Li gor wê evsanê, qeralekî bi navê Ejdihak hebû, du mar li ser milên wî derketi bûn. Ji bo çareserkirina wê janê, zaniyaran ew şîret kiri bû, ku rojê mejiyê mirovekî bide her marekî. Lê kuştarê wan mirovan dilovan bû, wî her rojê li şûna mejiyê mirovekî mejiyê pezekî bi kar tanî û mirovek serbest berdida. Ta li dawiyê, Kawayê Hesinkar rabû û ew qeral kuşt, mirovên ku bi çiyan keti bûn jî agir li serê çiyan dadan û nîşana serkeftinê bilind kirin. Evsane dibêje, gelê Kurd neviyên ew kesên ku ji kuştina Ejdehak rizgar bûne, û agir vêxistine ye.

Lê belê, eger binyata dîrokî, olî yan civakî ya Newrozê çi be, ew niha ji Kurdan re wek cejneke netewî ye û şana heraftina setemkariyê û serkeftina azadiyê ye.

Li şeva 21ê meha Avdarê, komên xortan derdikevin ser sirt û çiyan, û agirê Newrozê dadidin. Li roja din jî, bi deh hezaran xelkê navçê derdikevin hembêza sirûşta Çi.Kurmênc û bi hunerên ciwan Newrozê pîroz dikin.

### Seredana Pîrozgehan

Ew ji sinciyên civakî yên kevin e. Ew li demên berê ferzeke olî bû, şêniyê gundekî yan çend gundan diçûn ber pîrozgehan, û her malekê qurbanek dibir, li ber pîrozgehê şerjê dikir û xwarin çê dikir. Hatina mêvanekî li wê rojê bextewariyeke baş bû. Pişt re, dîlan li ber dengê dahol û zurnê dihat gerandin, û şahiyan ta hêvarî berdewam dikirin.

Seredana Pîrozgehan li destpêka meha Nîsanê dibû, rêwresmên wê jî wek derketina nava sirûşt, şahî û ahengên wê dest nîşan dikin, ku ew bone pir ji mêj ve ye, û têkliyên wê bi Newrozê û bi cejna sersala Êzdî-Zeredeştî re heye.

Lê ew bone niha pir hindik li dar dikevin, ew hin salan ji hêla Êzdiyên Gu.Qîbarê ve li ber pîrozgeha Çêlxanê tê kirin.

Li salên bê baran jî xelk diçin ber pîrozgehan, qurbanan dikin û tika barîna baranê dikin.

## Hin baweriyên kevin li ba şêniyê Çi.Kurmênc

Gelek bawerî û gerdişên kevin li ba nofine mezin ji şêniyê navça Çi.Kurmênc hebûn û di jiayana wan de hikardar bûn, ew hîn jî di ageh û jiyana hin kes û nofan de mane, ev in çend ji wan:

- Derketina Sersalê: Ew yeka bi tevahî, wek lave û berger ji bo barîna baranê dihat kirin. Li wê boneyê, Xoce şagirtên xwe bi dû xwe dixistin, yan jî çend xortan xwe didan hev, li nav mal û gundan digerîn, sirûdên olî digotin û tiştên xwarinê dicivandin, gundiyan jî av bi ser wan de direşand, pişt re jinan şîv li ber pîrozgehekê ji wan re dikir. Li derbarê binavkirina wê boneyê bi (sersal) jî, guman heye ku têkliya wê bi sersala Êzdiyan a serê meha Nîsanê û sarsala (Newrozê) re jî hebe.

- Her kesê ku di bin Keskesorê re derbas be -ew jî ne gengaz e- zayenda (cins) xwe tê guhertin.

- Li dema Erdhejê, mirovê ku destê xwe sê caran li zemînê bide û navê çend nexweşiyan bêje, dê li paşerojê kani be wan nexwaşiyan çaerser bike. Ji bilî ku dilxwaziyên wî jî dê bi cih werin.

- Gava Roj û Hêvê tên girtin, dêw wan daduqurtîne, ji bo tirsandina dêw û nehêlana daqurtandinê, xelkê li defê û tenekan dida û fîşek jî davêtin.

- Her mirovekî stêrkek xwe li ezmên heye, gava tîrêj ji ezmên dikevin, dibêjin: Stêrka kesekî rijî, ango temenê mirovekî bi dawî hat.

- Kurd bi êgir, royê, stêrkan û roniyê sond dixwin û wan pîroz dikin.

- Cihekî Marê Reş î taybet di baweriyên gelêrî de heye. Ew Mîna lawirekî bê ziyan û pîroz tê dîtin. Guman dibe, ku ew bawerî ji bingeha xwe de ji ola Êzdî hati be, çinkî ew bawerî dibêje, ku gava gemiya pêxember Nûĥ qul bû, marê reş dûvê xwe xiste qulikê û xwe li ser kilor kir, û wilo av derbas gemiyê ne bû.

- Eger mêvanekî xwîngiran bi ser malekê de hat, hinek xo dixistin sola wî, bawerî hebû ku ewê zû here.

- Wêneya xaçekî çarperî û qaserî hev, li ser tiştan dihat resimkirin, û ji bo parastina zarokan û dewarên malê yên giranbuha jî, xaçekî darikî ji dara Sicê dikirin stuyê wan. Em dizanin, xaça ku çar baskên wê bi qaserî hev, xaçeke Mîtanî ye û destnîşana Xwedêyê Mîtanî MÎSRA dike, belkî jî sonda (bi çar qulbeyên dinê), ku li ba Kurdan pir tê gotin, ji serdema Mîtanî ya pir kevin de mabe.

- Bi tevahî, hîn baweriya xelkê, bi nivîşt, şêxan û tiştên wek wan heye.

- Hîn Baweriya gelek kesan bi hikariya çavan tê, ew bawer dikin, ku çavin hene kanin tiştan "çavînekî' bikin, û gerek e mera xwe ji wan biparêze[1].

- Derxistina sabûnê, pîvazê, xoyê bi tevahî hemî tiştên tûj ji malekê li dema hêvarê, ji karên ne pîroz e.

- Gava ku baran nebare, sê jinên jinebî, serê kerekê dişoştin, bawerî hebû, ku ew kar dê baranê bibarîne!.

- Perçak pere dikirin bingeha avahiyên nû, bawerî hebû, ku ewê bextewarî û jînferehiyê peyda bike.

- Li destpêka havînê, berî ku Nêrî berdana nav keriyê bizinan, keçeke biçûk lê siwar dikirin, bi hêviya ku ew karikên mê bibin.

Gelek baweriyên mîna van hene, lê karekî taybet ji bo tomarkirin û vekolandina wan gerek e.

---

1- Her du bira Rasil di rûpela 298an de ji pirtûka xwe dibêjin, wan bihîstiye, ku Kurdek li navîna sedsala hejdehan li Helebê hebû, guldankeke ji kirstalê bi awirên xwe şikandiye.

# Pêşesazî û karên mala gundî

Çêkirina pêdvî û kelûpelên malê, ji berhemên pêşesaziya malîn bû. Hemî kesên malê bi wan karan radibûn, lê ya bêtir li ser milê jinan bû. Karên giringtir jî ev bûn:

**Ristin**:

Ristin ji karên mala gundî ya sereke bû. Deziyên ku di çêkirina kelûpelên paçikî (nesîcî) de dihatin bikaranîn, ji hiriya miyan û mûyê bizinan bûn.

Li destpêkê, ew hirî û mû dihatin pakirin û jenandin, pişt re bi **Teşiyê** (ji dara benîştokê bû) dihat ristin û dibû dezî. Paşê jî, dezî dihat boyekirin yan jî bê reng dihat xebtandin. Piştre, dora karê **Tevinê** dihat. Mera kane bêje, ku di her maleke xudî pez de tevnek hebû, eger zivistan ba, di beşê xaniyê qentirme yê paş de, û eger havîn ba li derve dihat venandin. Piştî ku tevinkirin bi dawî dibû, û dezî dibû **Tej**, ew li gor tiştê ku dihat xwastin dihat birîn û dirûtin. Ji kelûpel û pêdviyên ku bi wê şêweyê dihatin çêkirin, ev bûn:



Teşi

**Cil û Ber**: Ji deziyên rîsî, mûyî yan jî ji herduyan dihatin çêkirin, û bi wêneyên rengîn dihatin xemlandin. Ew berhema ji destpêkê de û ra dawiyê ji karê jinan bûn.

**Xirar**: Çiwalekî mezin bû, ji deziyên rîsî yan pembî dihat hunandin, û ji bo girtina savar, ard, tene.. û hwd dihat bikaranîn.

**Keji**: Benekî pehin û rengîn e, di navbera stûnên qentirmeyên malê de dihat girêdan, û cil û tişt bi ser dixistin.

**Hekîb** û **Têr**: Ji rîs û mû dihatin ristin, li dewêr siwar dikirin û tişt dikirtinê.

**Kurkê şivên**: Ji deziyên rîsî û mûyî û kulêv dihat çêkirin.

**Qolan**: Benek bû, ji mûyê bizinan dihat ristin, pê kurtan li pişta dewêr dihat girêdan.

**Bestek**: Em berê çêrê bûne.

Bi tevahî, tiştek ji rista tevnê li arê ne diçû; Ra deziyên dawiya tevnê jî, ku bi **Qetek** yan **Nex** bi nav dibû, ji bona dirûtina dawîneyên beran, benan (wek benê Bûkê), kejî… bi kar dihat.

## Firaqên çermî:

Ji 'eyarê bizinan, nemaze 'eyarê nêrî dihatin çêkirin, ji ber ku ew nerim û çir e.

Piştî ku dewar dihat şerjêkirin, ji dûv de berve ustu dihat guran. ji bo ku mû jê were kirin, ew dikirin ariyê, pişt re bi qaliqê tamarên dara Sindîganê, yan qaliqê dara Hinarê **ridar** dikirin, bi ridarkirinê don û goştê ku pê ve mabû dihat rakirin û sert jî dibû. Li dawiyê, qulikên dûv û lingan dihatin girêdan, û wilo ew ji bikaranînê re amade dibû.

Nav, Cure û xebitandinên wan firaqan ên taybet hebûn. Firaqên berê yên çermî ev bûn: **Kunê avê**. **Meşka dimsê**. **Meşka Dêw** ji bo Keyandina dêw. **Dewçink**, ji çermê karikan bû, li taştê û firavînê/nîvre pê dew dibirin çolê. **Hîzê Rûn**, pê dimis û zêt jî bar dikirin. **Qelaz** jî hebû, şivanan û cotkaran pê av dibirin çolê.

# Amadekirina xwarinê

## Şîr û berhemên wî:

Şîr ji giringtirîn berhem bû li ba şêniyê Çi.Kurmênc. Gelek xwarinên malê û ji bo firotinê jê çê dikirin[1]. Cureyên wan ev bûn:

- **Firo**: Şîrê pezê ku nû dizê, tê kelandin û dibe Firo.
- **Qeymaq**: Ji ser rûyê şîrê kelandî tê girtin.

- **Teleme**: Çend dilop ji şîrikê geya Xuşîlê, yan ji dara Hejîrê berdidin ser şîrê nekelandî, ew pê dimeye û dibe Teleme. Ew xwarina şivana ye, û wek taşte ji mêvanan re dihat danîn.

**Mast**: Şîrê kelandî û sarûgermkirî, piçek dew tevlê dibe, çend katan sergirtî dimîne, û wilo xwe digire û dibe mast. Ji mêst bixwe jî, ev berhem dertên:

Gava were keyandin **Rûn** û **Dew** jê dertên. Gava ku av ji dêw dadirve, tîr dibe û dibe **Sûzme**. Gava dew jî were kelandin **Lêri** bi ser dikeve, dema ew lêri li ber rojê hişk bibe, dibe **Keşk**, ev jî li zivistanê di avê de nerm dibe, diĥele û şîv pê çê dibin. **- Penêr**: Ji şîr çê dibe. Gava av ji bermahiyên penêr darive, ew jî dibe **Lorik**, gengaz heye ku Rûn jî jê derwere, û yê ji ber dimîne jî jê re **Çortan** yan **Sûrik** tê gotin.

## Mêw û berhemên wê:

- **Çiloyê mêwê**: Dibe Sarme, tê girtin û kelandî jî tê xwarin.

- **Tirî**: Gelek cureyên xwarina malê ji tirî çê dibe. Ew tişt li gel berhemên pêz, stûna bingehîn bû ji xwarina mala Kurd re. Ji berhemên tirî: **Dimisa Şêrîn**, **Mûj**, **Bastiq**, **Sinciq**, **Kêsme**, **Ti'ek**, **Xuşav**. Ji **Qoriq**(jûr) jî **Tirş** çê dibe. Emê bi kurtî li ser çêkirina hinekan ji wan deng kin:

**Mûj**: Trî ji çilo û teneyên xirab tê pakirin, û teneyên tirî li gel piçek zêta zêtûnan dikin nav Sefiyê [2], paşê jî li ser devereke axî ye

---

[1]- Her du bira Rasil dibêjin: Li sedsala hejdehan, rûnê Helebê li ser hoza Reşî (Kurd), Tirkman û şêniyê beriyê bû, rûpel 105.

[2]- Sefye, ava ariya dara ye, sefya baştir ji şewtandina şaxên Mêwan û geya Şirtê derdikeve, çiqas dar ter be ewqas Sefye baş dibe. Paşê, wê ariyê dikin avê,

dûzkirî (Miştaĝe) tê raxistin, çend rojan dihêlin ta baş biçelmise û pişt re radikin û ji bo zivistanê tê hilanîn.

**Dimsa Şêrîn**: Tiriyê bihurî/kemilî tê çinîn, ji teneyên xirabûyî û ji çilo tê pakirin, pişt re di guvaşgehên kevirî de bi lingan tê civlandin, ava wê tê girtin û kelandin, û ji bo ku çêşa hunguv jî jê were, ew bi geya Xuşîlê tê tevdan. Çêkirina dimsê bi rojan dirêj dikir, û ji rojên malê yên giring bûn.

**Bastiq**: Ji Qetandina şerbeta (ava tirî) de dest pê dibe. Piştî ku ava tirî tê kelandin, 1/kg Nişa + 3/kg Ard + tenkek ava tirî têkilhev dikin, û ta mîna pelûlê dibe tên kelandin, pişt re, li ser paçekî sipî vala dikin, lê dihêlin, û li ber tavê dimîne ta şêweyê lêstîk distîne, wê çaxê wê ji pêçik dikin, didin hev û hiltînin.

**Sinciq**: Dilikên Gûzan bi çar perçan dikin, yan dilikên tûm ên dendikên Be'îvê dixin avê ta nerim dibin, hîngê her çar pênc tenan di deziyekî re dikin, û di navbera her yekî de û yê din de girêkekê çê dikin, paşê her 4-6 deziyan bi darikekî ve girêdidin, û herwiha hejmareke mezin ji wan li kêleka hev li ser Senceqê yan Îskelekê datînin, ta baş ziwa dibin. Li wê katê 2/kg ard û 3%kg nişa û tenekek ava Tirî ya kelandî tev hev baş dikelînin ta wek pelûlê dibe. Ew tayên gûzê û be'îvan di wê pelûlê de dikin, û li ber royê dihêlin ta ziwa dibin. Dema baştir ji çêkirina Sinciqan re hênikiya sibê ye.

**Kêsme**: Simûtê gewr ligel biçek ard tev ava tirî dikelînin ta mîna pelûlê dibe, pişt re gûz û be'îvan tevê dikin, li ser siniyekê vala dikin, û li ber royê dihêlin ta xwe digire, wê hîngê bi kêrê dibirin û dikin kabikên biçûk. Ew şêraniyeke zor xweşik û sûdar e, û dimîne zivistanê jî.

**Ti'ek**: Ji tiriyê baş bihurî yan ji mûjan çê dibe. Wan tenan dikin Kunekî, hinek av berdidin ser, û demekê wilo dihêlin. Yan jî piştî ku ji kun vala dikin, hinek dimsa şêrîn berdidin ser û wilo dihêlin.

**Xuşav**: Ji mûjên hûrik yên bê dendik çê dibe. Wan dikin ava germ û dihêlin ta wek şerabê dibe. Çêşa wê zor xweş e, li zivistanê nemaze bi kuftan re dihat xwarin. Xuya ye ew li Helebê, li nîvê

---

dikelînin, û dihêlin ta bine û avê wê zelal bibe û bibe Sefye. Sefye li şûna dermanê kincan jî dihat xebtandin.

yekê ji sedsala nozdehan xwarineke naskirî bû, Ne'ûm Bexxaş di /defterên cem'iyê beş 2 û rûpel 405/ de dibêje: “Ew ji xurme, şekir û avê tê çêkirin, û navê wê Tirkî ye”. Lê ya rast, navê wê Kurdî ye û bi wateya Ava Xwaş/ Xwaş Av/ Xuşav e.

**Hejîrên Hişk**: Hejîrên baş bihurî li ber rojê datînin ta ziwa dibin. Û ji bo ku kurmî nebin, wan bi sefyê û zêtê dikelînin, paşê di benikan re dikin, û bi dardixin. Hejîr û mûj, ji hêla nirxa xwarinê de zor dewlemend in, ew ji bona nerimkirin û normalkirina destava mezin jî pir sûdar in.

## Pêjgeha Kurdî li Çi.Kurmênc

Mala Kurd baş guh dide xwarina xwe, jina Kurd jî kebaniyeke şîvkir, jîr û destxweş e. Berê, giraniya metbexa Kurdî li ser mewadên xwarinê ku ji berhemên çandinê, pêz û jîngehê dihatin, bû. Ew berhem jî, bitevahî, ev bûn: Genim, tirî, zêt û zêtûn, geyeyên sirûştî, keskahî, dewar û berhemên wan.

Sê danên xarinê yên asayî hene: Taşta sibê, Firavîn/Nîvre li nîvro û Şîv li hêvarê, danê malê yê sereke şîv bû, ew li destpêka hêvarê dihat danîn.

### Xwarinên ji gênim tên çêkirin:

Xwarinên ku ji **gênim** peyda dibin: Ard, Savar, Simût, Dan û Kepek. Ji wan jî ev şîv û xwarin tên çêkirin:

- Ji Dan:

**Kutayî**: Dan ligel goşt, rûn û qerebîberan tên kelandin ta bi hev de diĥelin, û wilo ji bo xwarinê amade dibe. **Şorba Dên**: Dan bi dêw tê kelandin, nok jî tevê dibin. Ew xwarineke gelêrî ye navdar e. **Boranî**: Nîsk, Bacanên Reş û Sor, yan jî kundirên kose yên hûrkirî û dên bi dêw tên keladin. Ew şîveke navdar e. **Şorbeşîra dên**: Dan bi şîr tê kelandin.

- Ji Savarê:

Savar tev tiştine din tê kelandin û dibe Gêrmî. Ew gêrmî bi tiştên ku tevê dibin bi nav dibin, wek: **Gê.Be'can, Gê.Şi'êre, Gê.Dimsa Be'cana "Sorik, Binda", Gê.Kundiran û Nokan, Gê.Nîskê (Ser bi zêr,**

**micedere), Gê.Pincêr**. Di amadekirina van şîvan de, geyeyên mîna: Tolik, Kereng…û hwd jî bi kar tên.

- Ji Simût (Savarê Hûr):

Gelek xwarin û cureyên hevîr jê tên çêkirin, wek:

**Danik**: Dankê bi ava sar, Dankê bi ava germ, Hevîrê bi zêtê ku dibe cûmik. Hevîrê Rûn. Hevîrê Simût: Simût dikin cûmik û bi rûnê sar tê xwarin. Cureyên Dênik ên din jî hene, bi tiştê ku tevê dibin bi nav dibin, wek: Hevîrê Be'cana, H.Dimsa Be'cana, H.Nîskan. **Kufte**: Simût tê histiran, dibe hevîr, gulok dikin û bi nanê qemirandî, gûz, goşt û don tê dagirtin, û tê qewrandin. **Kuftên Dêw, Bêz**: Ew bi don û goşt tên dagirtin û bi dêw tên kelandin. **Xewre**: Ji simûtê sade tê amadekirin û qewrandin. **Gulîlîkên Mêst**: Ji simût tên amadekirin û di dêw de tên kelandin, ew xwarineke kevin e. **Pelûl**: Simûtê hur bi rûn yan zêtê tê qewrandin, û bi dimsa şêrîn tê kelandin.

- Ard:

Ardê gênim, carina cehe jî tev gênim dihat hêran û dibû Ardê Qarşiq, Ardê Garisê Gewir jî hebû.

Ev xwarin bi Êrd tên çêkirin:

**Nan**: Nanê navdar, Nanê Sêlê yan Nanê Tenikî ye. Ew stûna xwarina malê bû. Jinan ji berbanga sibê de dest bi amadekirina wî dikir. Kurdên navçê pir hindik tenûr bi kar tanîn. Cureyên nanê ku li ser sêlê dihat bijartin ev bûn: Nanê Tenikî, Bizilme: Nanekî stûr e, du cure jê hene, bi kuncî û bê kuncî, ew hezkirina ji bo zarokan dihat kirin û bizilmên bi kewsanan jî dihatin çêkirin.

**Şîşperek**[(1)]: Perçeyên hêvîr in, bi nanê qemrandî, goşt, qerebîber û teneyên Hinarê tên dagirtin û di dêw de tên kelandin.

**Sermîsak**/sermûsak: Hevîr bi şêweyekî gulover tê birîn, li tiştê ku dikeve nav didin hev, û bi zêtê tê qewrandin, yan jî li ser sêlê tê bijartin. Sermîsak bi tiştê ku dikeve nava wê tê binavkirin: Tirşok û Sîrdim (geye ne), Lorik, Lêri, mastê kemandî, goşt, birinc... û hwd.

---

1- Koka vî navî Kurdî ye, ji "şeş perik" hatiye. Ji ber ku alava birîna hêvîr şeş perikî ye, hevîrê wê jî şeş guçilî ye, û şeş perikên xwe hene.

**Qetmer**: Nanê tenikî yê nîv bijartî, zêtê yan rûn di rûyê wî didin, hinek şekir jî li ser rûyekî wî belev dikin, didin hev û li ser sêlê sor dikin.

**Nanê Rûn**: Dimsa Şêrîn ligel rûn û hinek geya Meyanê diqewrînin û dihêlin ta sar bibe, paşê boşe ser nanê tenikî yê nerm dikin, didin hev û dixwin.

**Doĝirme**: Nanê sêlê yê nerim, parîparî û gilok dikin, hunguv an dimsa şêrîn an şêkir, li gel hinek av dikelînin, û dihêlin ta sar dibe û bi ser wî nanî de dikin, gelek caran hin Darçîn yan Meyane jî tevê dikin, ew zor xweş û şêrîn dibe. Şêniyê Şikaka jê re dibêjin **Cemalî**.

**Şilik**: Piştî ku hevîr di siniyekê de germ dibe, wî dibirin dikin parî, paşê jî şîr bi ser de dikin û dikelînin.

**Zengilok** yan Vijvijk: Perçeyên hêvîr ên gulok û biçûk bi zêtê diqewrînin û dikin nav dimsa şêrîn yan ava şêkir, yan jî ji destpêkê de hêvîr bi dimsê distrên.

- Ji <u>Kepekê:</u>

Perxac û Sêxur jê tên çê kirin. Kepeka gênim yan a cehê bi avê distirên, û pehin dikin, û li ser êgir dibjêrin. Bi taybetî, ew ji koçikan re dihat amadekirin, lê li salê xelayê, mirovan jî dixwar.

- Ji <u>geye û keskahiyê:</u>

Gelek cure ji geye û keskahiyan ji bo şîvkirinê tên bikaranîn, wek: Bacanên sor û reş, bamî, fasûle, êsot, kundir bi sê cureyên xwe (kose, mêst, herdem), xiyar, xitik, ligel gelek geyeyên ku li buharê şîn dibin, û xavî yan jî wek şîv tên xwarin, mîna: Kardî û tirşa wê ya navdar, sarme, dolme… pêwîstî nîne ku em hemiyan li vir hewaldin

- <u>Xwarinên girtî</u>**:**

ji **Şîr**: Rûn, penêr, Mastê kemandî ('adî û gulîlîk). Keşk. Li gelek malan, şîr jî dihat kelandin, dikirin kûzên camî, tê de dimeyandin dibû mast û ra dema zivistanê dihîştin.

Ji **Meywan**: Dimisa şêrîn, Mûj, Bastiq, Sinciq, Ti'ek. Hejîr û Mişmişên hişkirî, be'îv, fistiqên Çiyayê Reşa, kizwan, zêtûnên şîn, 'etûn bi ze'terê û zêtê... û gelek tiştên din.

Ji <u>Keskahiyan</u>:

Gelek cure jê hişk dikirin û ji bo zivistanê dihatin girtin, wek: Bacanên reş û sor (temetûz), êsotên sor yên tûm û yên hûr, bamî, kundir, fasûlên tene. Kerikên bacanan jî dikirin kayê û dihîştin zivistanê.

Ji **Tene**: Genim, savar, simût, dan, nîsk, nok, baqil…

Ji **Leçeran**: Leçerên zerdel, gûz, bacanên reş, kundir, hejîr…

Ji **Tirşoyan**: Yên êsot, xiyar, xitik, kerkê bacanên sor…

**- Qawirme**: Goştê pêz bi donê wî ve rind tê qewrandin, û bi germî dixin kûzekî, devê wî baş digrin û radikin zivistanê. Ew ji xwerinên navdar bû.

**- Hunguv**…

# Xwendin , Tendurustî , Kargêrî

## Xwendin û perwerde

### Xwendina li ber Xocan:

Xwendina li ber Xocan li nîvê diduyan ji sedsala nozdehan li navçê hebû. Şagirt di odekê de dicivîn, li ser postan yan cilan rûdiniştin, û xoce ew fêr dikirin. Jixwe, xwendina keçan jî pir hindik bû.

Pirtûka xewndinê ya sereke Quran bû. Çend pirtûkên din jî hebûn, wek ên olî, ziman, înşa û nivîsandina nameyan (Guldeste), hesabên sivik, ew hemî jî bi zimanê Osmanî bûn.

Bi xitimkirina Quranê û hînbûna bingeha xwendin û nivîsandinê û hesabên biçûk dawî li xwendina li ber Xoce dihat. Ji ber wê jî, ne tê gotin, ku li demên berî sedsala bîstan, kesekî ji navça Çi.Kurmênc diplomeyek bilind wergirtiye.

Xoce jî Kurd û Tirk bûn, û piraniya wan rind bi Erebî nizanîn. Ji xoceyên navdar li serdemên Osmanî û Firensî, me kanî ev nas bikirana:

**Xoce Şitlo** ji Coqê**. Xocê Evdoyê Eşê** ji Şîtka**. Mihemedê Eliyê Xoce** ji Mabeta**. Xelîl Efendî** ji Qujûma**. Osmanê Hido, Bekirê Hido û Ebdilkerîmê Qaso** ji Şiketka**. Reşîtê Hemo û Ibramê Qêdir** ji Hopka**. Xocê Reş** ji Senarê**. Cemîlê Kinê** ji Gorda**. Xoce Mehmûd** ji Kurzêla Cûmê**. Xoce Reşît** ji Turindê**. Beşîrê Gedro** û bavê wî **Reşît** ji Bênê**. Mile Raĝib** ji Cilbirê**. Xocê Mûsê û Mihemedê lawê Dedî Memedê** ji Bilbilê. **Îbrahîmê Ne'so** ji Mîrka**. Xocê 'Eyşê** ji Be'dîna**. Mihemedê Îbiş** ji Qenterê**. Xocê Ling û Xocê Femdîn** ji Gemrûkê**,** evê dawîn pirtûkeke sirûdên olî bi navê **(Mewlîda Mihemedê henîfî)** bi Kurmancî çê kiri bû…

Li dawiya sedsala nozdehan, perwerdeya dibistanî li bajarê Kilisê hebû, di pirtûka /salnama Osmanî ya sala 1903an, rûpel 274/ de hatiye, ku 25 polên xwendina seretayî û 8 pirtûkxane li Kilisê hene.

El Ĝezî jî dibêje, ku li dawiya serdema Osmanî, çar dibistanên seretayî li bajarê Kilisê hebûn, û li sala 1910an dibisteneke seretayî û navendî jî li rojhilata bajêr li nav baxçan hat avakirin.

## Li dema intîdaba Firensî:

Piştî hatina Firensiyan, sîstema hînkirinê ya xocetiyê berve têkçûnê çû. Destlata Firensî ya nû, dest bi vekirina dibistanên nûjen li şênewarên mezin û li bajarê Efrînê kir. Fêrkirina bi zimanê Osmanî jî hat rakirin û ya Erebî û Firensî li şûnê hat danîn. Dibistana yekê ku li navçê hatiye vekirin, li sala 1923an li gundê Meydankê bû, li sala 1926an dibistanek li gundê Mabeta jî hat avakirin û hîn avahiya wê heye. Li sala 1927an dibistanek ji zarokên Êzdiyan re jî li Gu.Qîbarê hat vekirin. Li wê salê, dibistana seretayî ya yekê li bajarê Efrînê hat avakirin û şagirtan lê xwend. Li sala 1930î li Bilbilê û li sala 1933an li Reco jî dibistanên seretayî hatin damezrandin û xwendinê lê dest pê kir.

Li gor ev rewşa nû, şagirtê ku xwendina seretayî, ango pola pêncan derbas dikirin, du rê li pêş wan hebûn: Yan dê xwendina xwe li Helebê kuta bikira, yan jî dê dev jê berda, mixabin ên pirtir jî wilo dikirin, û dev ji xwendinê berdidan.

Piştî wê, ji dawiya serdema Firensî de, guhdan bi xwendinê bilind bû, nemaze li ba malbatên xanedan. Wan lawên xwe ji bo xwendinê dişandin Helebê û Şamê jî.

Li Çi.Kurmênc, ji kesên destpêkî ku fêrnama Bekelorya standine, ev in: **Cemîlê Kinê** ji Gu.Gorda, ew li sala 1928an rêvebirê yekê bû ji dibistana Efrînê ya sereta re. **Xelîl Edîb** ji Gu.Qujûma demeke dirêj rêvebirê dibistana Efrînê bû. **Heyderê Hemdî** ji Gu.Keferdelê. **Mihemed Ebdo Tirko** ji Gu.Hemamê. Çend kesan jî li salên Çelî û pêncî ji sedsala bîstan, fêrnameyên parêzeriyê ji zanîngeha Şamê wergirtine, ji wan: **Mihemed Osman, Mihemed Menan û Hesen Îsma'îl.**

## Li dema piştî serbixwebûna Sûryê:

Dibistana navendî û lîse ya yekê li bajarê Efrînê li sal 1958an hat avakirin. Lê piştî sala 1970yî, sîstema pêbendî di perwerdekirinê de li Sûryê hat pêk anîn. Li gor wê, her zarokek pêbend dibe, ku ra pola şeşan bixwîne. Piştî wê, gelek dibistanên seretayî li navçê hatin avakirin. Li sala perwerdeyî ya 2000/2001ê, hejmara dibistanan li navça Efrînê wiha bû: 249 dibistanên seretayî, 50î yên navendî, heft yên Lîseya tevahî, didu jê li bajarê Efrînê, yek a lawan û yek a keçan ne.

Çar Dibistanên Pêşeyî jî li bajarê Efrînê hene: Bazirganî, çandinî, pêşesazî û ya hunerên jinan.

Dibistaneke Şer'î jî ji sala 1962an de li bajarê Efrînê heye. Piştî ku bi sedemên nijadperestî Amojgeha Perwerdekirina Mamostan a Efrînê çend salan hat girtin, ew li sala 2000/2001ê, dîsa hat vekirin.

Ev xişte/cedwel hejmara şagirtan li sala xwendiniyê ya 2000-2001an li Na.Efrînê xuya dikin:

| Pol | Yekê | Diduyê | Sisiyê | Çarê | Pêncê | Şeşê | Tev |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Kur | ٢٦٠٢ | ٢٣٧٥ | ٢٤٤٦ | ٢٤٦٤ | ٢٤٠٨ | ٢٢٦٦ | ١٤٥٦١ |
| Keç | ٢٣٩٩ | ٢٣٣٨ | ٢١٢٨ | ٢٠٧٠ | ٢٢٤١ | ٢١٨٤ | ١٣٣٦٠ |
| Tev | ٥٠٠١ | ٤٧١٣ | ٤٥٧٤ | ٤٥٣٤ | ٤٦٤٩ | ٤٤٥٠ | ٢٧٩٢١ |

**Şagirtên polên seretayî**

| Pol | Heftê | Heştê | Nehê | Tev |
|---|---|---|---|---|
| Navendiya tevahî | ٤٠٩٤ | ١٧٣٥ | ١٧٥٤ | ٧٥٨٣ |
| Navendiya Olî | ٥٦ | ٢٤ | ٤٥ | ١٢٥ |
| **Pol** | **Pol 10** | **Pol 11** | **Pol 12** | **Tev** |
| Lîseya Olî | ٣٣ | ٣٠ | ٣٦ | ٩٩ |
| L.Tevahî | ٤٥٨ | ١٨٧ | ٢٣٩ | ٨٨٤ |
| L.Bazirganî | ٨٥ | ٨٠ | ٦٣ | ٢٢٨ |
| L.Hunerî | ٢٥ | ٢٤ | ٣٠ | ٨٤ |
| L.Çandiniyê | ٥٠ | ٤٥ | ٤٦ | ١٤١ |
| L.Pêşesazî | ٦٩ | ٨٨ | ٣٧ | ١٩٤ |

**Şagirtên polên navîn û lîseyê**

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Amojgeha amadekirina mamostan** | Pol(1)=124 | Pol(2)=59 | Tev=183 |

**(Tevahiya Şagirtan li sala 2000/2001 li Na.Efrînê = 37442)**

- **Têbînin li ser rewşa perwerdekirinê li Na.Efrînê:**

Roja îro xwendin bi şêweyekî fere li navçê belav bûye. Hemî zarok, law û keçên ku digihên şeş saliya xwe diçin dibistanê.

Lê ji cedwlên jorîn tê dîtin, ku tenê dora %32 ji şagirtan digihên dawiya asta navendî, ango %20 ji şagirtan di asta seretayî de dibistanê berdidin, û %12 jî gava ku ji asta seretayî diçin a navendî dibistanê berdidin.

Piraniya hejmara ku dibistanê berdidin keç in, sedemek jê, ji ber ku dibistanên asta navendî li gundan nînin. %36 ji şagirtan jî di asta navendî de ji dibistanê dûr dikevin. Ango tenê %10 ji tevahiya hejmara şagirtên pola sisiyan navendî digihên pola dehan/yekê ya lîseyê.

Û digel ku ev nisbene gelek bi êş in, lê tiştê balkêş ew e, ku hejmara law û keçan di hemî polên xwendinê de nêzîk hev in, ew jî pêşketinekê di tenga helwesta civakê ji xwendina keçan re diyar dike.

Lê digel wan rêjeyên jorîn yên pir nizim û xemgîn, dîsa jî civaka Kurdî li Çi.Kurmênc ji civakên ku baş haya xwe dide xwendinê tê jimartin.

Li salê bi sedan keç û xortên navça Efrînê dikevin zanîngehan û xwendina bilind çi li Sûryê û çi li derve kuta dikin. Ev jî ji bo paşeroja civaka Kurdî şanikeke zor baş e.

Li roja îro, hejmareke bilind ji xudî şihadeyên zanîngehî û xwendina bilind ji her du zayendan heye, ev yek li navçên parêzgeha Helebê yên din netê dîtin.

# Tendurustî

Pirtûka /Salnama Helebê ya Osmanî ya sala 1903an, rûpel 274/ dibêje, ku pênc dermanxane li navça Kilisê hene, ji wê zanîn tê têgihîştin ku bijîşk jî lê hebûn. Lê wekî hemî civakên rojhilatî, komelgeha Kurd jî giraniya xwe dida ser bijîşkiya gelêrî, û geye û tiştên sirûştî ku li çiyê hebûn, bi kar tanî.

Di bijîşkiya berê de, **Lebxe** dermanekî serke bû, ew bi çend curan bû; Lebxa şîr û êrd, lebxa dara merxê, lebxa xurmê, lebxa goşt, pîvaza bijartî… û hwd. Ew lebxe, bi taybetî, ji bo nexwaşiyên derveya govde bi kar dihatin, wek kûnêr, kulbûn... û hwd. Karên mîna, xoya germkirî û kulavê germkirî jî ji bo janên Bê û hilpekînên derban… û hwd bi kar dihatin.

Ji bilî wan, Daxdan/Kewandin ji bo nexwaşên Bawî, êşekên mofirkan û sanciya zarokan re dihat kirin. Xwînberdan jî ji bo êşekan, Zerikê û Mêristanê/êkzîme dihat kirin. Birîn jî bi pîvazê û zêtê yan bi şêkir û zêtê dihatin kewandin… û hwd.

Ji bo şikandina hestiyan jî, kesin hebûn cebariya hestiyan dikirin, ên niha di wî warî de naskirî ne: Evdoyê Huskê ji Gu.Miskê û Kemal ji Gu.Xalta.

Nexweşiya Wêranê/Jana Zirav jî li navçê pir bû. Ew ji nexwaşiyên xedar û kuştar bû. Mirovê ku pê dike, ji malê dikirin, yan jî ji gund dûr dixistin, li bin darekê yan di şikeftekê de datanîn, nan û av jê re dibirin û wilo ta ew dimir yan sax dibû. Lê giringiyeke hinguv di dermankirina hemî nexwaşiyan de hebû, nemaze jî ji bo wêranê.

Jana Tiraxoma ya çavan jî, pir li navça Kilisê belavbûyî bû, salê gelek mirov pê kûr dibûn, ji ber wê jî, xaneke taybet ji kesên Kûr re li Kilisê hati bû avakirin.

Ji bilî wê, nexweşiyên kuştar mîna Pirik(Kolêra) û Qirim/ta'ûn jî hebûn[1].

---

[1]- Her du bira Rasil di (rûpel 407) de dibêjin: Li sala 1641an, Qirim li Na.Kilis, Entab û Ezazê belav bû, ji wir gihîşt gundên çiyayên derdorê û li dirêjiya zivistanê ma, pişt re, ew bi riya Kurdên ku dihatin li derdora Helebê pale dikirin, gihîşt Helebê jî, û her rojê bi dehan kes pê dimirin.

Em ji bîr nekin ku cihê Niviştan, ligel hinek baweriyên kevneşop ên din, hîn li ba nofine fere ji xelkê heye[1].

Li hêleke din, bawerî hebû ku sedema gelek nexweşiyên zarokan Serûbinî mihan bû! Ew nexwaşî bi guhertinên hêvê ve dihatin girêdan, û li ba "Xudan Destan" bi riya vegirtinê çareser dibûn. Ji bo wê yekê, şêweya xaçê bi teniyê li ser enî û zikê zarokê nexwaş dihat çêkirin, û hin lava dihatin gotin. Û gava ku zarok pir dadigirî û ranediza, yan jî fetqoyî dibû, pitikên êgir bi zikê wî ve didan.

Cihekî geyayê Ûrzelkê yî taybet di baweriya tendurustî ya gelêrî de hebû, ji bo her nexwaşiyekê, nemaze eger zarokek Çavînî biba!, teneyên wê datanîn ser pariyek teneke, û li ser serê zarok dihat şewtandin, bawerî hebû ku bi wê yekê, ew zarok ji çavan û hesûdiyê tê parastin.

Ji bilî wê, nexweşiyên zarokan ên ku vedigirin, mîna Kuxka Qîqî, Xurî, Sorik…û hwd, hejmareke mezin ji zarokan dikuştin.

Herdem kesin jî hebûn karê bijîşkiyê dikirin, hin ji kesên ku li destpêka sedsala bîstan di warê bijîşkiya gelêrî de navdar bûn: Xelê Ĥekîm ji Qerdepe, Sema'îlê Ĥekîm, lawekî wî heye li gundê Me'mila rûdine, bijîşkiya gelerî dike û jehra maran dimije…

Ji bijîşkên ku ra niha navên wan tên bibîranîn, Tuxtirê Kêl Li Gu.Çolaqa rûdinişt, Xurên: Bijîşkekî diranan bû, li kerê xwe dinûşt û li gundan digerî.

Piştî wan, Dr.Mistefa Nûrî li Stembûlê xwendi bû û li bajarê Efrînê kar dikir, ew li salên pêncî û şêstî ji sedsala bîstan pir navdar bû, bavê wî Tahir Kurdekî ji Amedê bû, û li Efrînê malmidûr bû. Hesen Efendî jî hat naskirin, birayê wî bijîşk bû û ew li ber destê wî fêrî karê bijîşkiyê bû.

Em niha li destpêka sedsala bîst û yekê ne, 56 bijîşk, 56 dermanxane, 30 bijîşkên diranan, dora bîst navendên tendurustiyê yên dewletê û çar nexweşxaneyên taybet li Na.Efrînê hene.

---

[1]- Ji bo dermankirina Balûkan, Beqek dikuştin, paçek têwerdidan, û li ser çateriyekê binax dikirin.

# Damezrawên Kargêrî

Mîna ku em dizanin, naça Kilisê ji dstpêka destlata Osmanî de bi ser wîlayeta Helebê ve bû, rêber û karbidestên wê bi fermanên Siltên dihatin danîn. Carina jî derbegên herêmê destlatdariya wê û deverên wê dikirin.

Piştre, Kilis bû Senceq û senceqdarek an waliyek ji hêla waliyê Helebê ve jê re dihat binavkirin.

Li sala 1854an sîstema Qeymeqamiyê hat danîn, Kilis bû qeymiqamî yan Qeza (wekî ku paşê bi nav bû) û qeymiqamekî ew bi rê ve dibir.

Li wan deman, li navenda her qeymeqamiyekê encûmenek hebû bi navê Encûmena Mezin dihat binavkirin, hemî karûbarên Qezayê, dad jî di nav de, di destê wê de bûn. Û piştî vekirina nivîsgeheke dadê li Kilisê, ew encûmena mezin bi “encûmena rêvebirî” bi nav bû.

Bi tevahî, ev kargêrî li dawiya serdema Osmanî li Kilisê hebûn: Qeymiqamî, encûmena rêvebirî, encumena şaredariyê, dadgeha sereta, komîteya ewqafê, şaxeke zanînê/perwerdê, encûmen û bengeke çandiniyê, mekteba rişdî (dibistaneke hindurînî bû), û serbazên alîkar/iĥtiyat bi rêbertiya du Bînbaşan lê hebû, /El Ĝezî, beş 1,rûpel 281/.

Hêjayî gotinê ye, ku navenda têlêgrafê ya destpêkê li bajarê Kilisê hat danîn, piştre li sala 1887an yek li gundê Omer Axa, li Firêriyê jî hat venan, /El Ĝezî, beş 1, rûp 271/.

Li destpêka serdema Firensî, navçeke bi navê navça Çiyayê Kurdan (Kurd dax) ji hin deverên Qeza Kilisê ya berê pêk hat, ew navça nû ji çar deveran pev ket: Qetmê, Bilbilê, Reco û Hemamê, Misteşarê Firensî, Qeymiqam, serokê şaredariyê jî li navenda navçê, li bajarokê Efrînê rûndiştin, û kutikê nifûsê û nivîsgehên kargêrî yên din jî lê vebûn. Piştre, li serdema netewî ya Sûryê, îdareyên dewletê li navçê fere bûn.

Roja îro ev îdarexaneyên dewletê li bajarê Efrînê hene: Rêvebirê navçeyê/Qeymiqam, kutikê nifûsê, diravî, temwîn, dadgeh (nûnerê tevahî, dadmendê Şer'î û medenî, lêkolîn, ceza), şaredarî, çandinî,

av, karguzarî, kirîna zad, tecnîd, benga gelêrî, benga zîra'î, perwerde, poste û têlefûn, eletrîk, gumrik li deverên Reco û Cindirêsê, bineşaxa partiya Be's, asayiş ( Polîs, cînaî, siyasî, leşkerî, dewletî, ezmanî), û zîndaneke ji serdeman Firensî de jî lê heye.

Ji hêla xizmetgûzariyê ve, hîn pêdviya navçê bi gelek tiştan heye. Wek nimûne, em di sala 2001an de ne, û hîn jî gelek gund hene bê ava vexarinê, rêkên zifkirî, têlefûn û eletrik in. Li dwiya sala 2000an, gund û gundikên ku eletrîk dîti bûn 262 ji tevahiya 360 warên şên li navçê, /rapora kongira pevgirêdana cotariyan li Efrînê ya sala 2000an/.

Hêjayî em bêjin jî, ku bajarê Efrînê di sala 1951an eletrîk dîtiye. Li destpêkê ew bi matorê dihat berhemdan û hejmara sûdgirên wê 248 mal bû. Berî wê, xelkê çirên Qazê bi kar tanîn, kolan jî bi çirên "Luks" dihat ronîkirin û bi Qazyaqê dihatin vêxistin, karkirekî luksan î taybet hebû, wî ew hêvarê vêdixistin û li sibê vedimrandin, yek ji wan Reşîtê Lukiscî bû.

Ji destpêka sedsala bîst û yekê de, dewletê baş guh da ziftkirina rêkan li navçê.

Projeyên ava vexwarinê jî li gelek gundan hantine damezrandin, lê mixabin, ji ber ku ew baş nehatine avakirin, û netên durustkirin jî, sûda wan hindik bûye.

Di navbera her demekê û demekê de, hin Çete jî li navçê derdiketin. Li dawiya sedsala nozdehan û destpêka ya bîstan, Ebdella 'Etûn û 'Elqijik navdar bûn. Li nîvê diduyan ji sedsala bîstan, Xilfo ji gundên navça Tilebeydê, Golik ji Meydana, Şêxo ji Gu.'Elbîskê, Ne'so ji Dargirê, Milazim ji Şiyê derketin.

Lê çeteyê herî navdar Salan ji gundê Çeqela bû, ew gelekî dilêr bû, carina polîs bi balefira hêlokoptirê dihatinê, lê ew li sala 1973an, bi têvedana dewletê, bi destê nasekî wî hat kuştin.

## Çande , Hunera gelêrî

## û Çalakiyên Civakî

Qadirî di pirtûka xwe de, gelek mirovên gernas di warên civakî, wêjeyî û kargêrî de li navça Kilisê û deverên wê bi bîr tîne. Lê ew nijadê wan, yan cihê jidayîkbûna wan hewal nade.

Em guman dikin, ku sedemên xizaniya zanişweran/me'lûmat li Çi.Kurmênc, bi rewşên aborî û civakî yên komelgeha Kurdî ve girêdayî bû, ji ber ku li demên berê, Kurdên Çi.Kurmênc di gundên biçûk û dûrî jiyana bajar û bajarvaniyê de dijîn.

Tiştên ku li ser xwende û zanayên navçê tê bîra xelkê, tenê navên hin Xoceyên ku li dawiya sedsala nozdehan naskirî bûn. Û digel ku ji navîna sedsala bîstan de xwendin bi şweyekî sazekar li navça Çi.Kurmênc hebû, xudanên fêrnameyên zanîngehî ji navçê derketin, lê tu kesên navdar di warên zanîn û wêjeyê de ne hatin dîtin.

Guman heye, kesê sereta li navçê ku nivîsarên siyasî û wêjeyî bi her du zimanên Kurdî û Erebî nivîsandine rêzdar Reşît Hemo bû, nivîsarên wî di belevokên Partiya Demoqrat a Kurd de li Sûryê hatine weşandin.

Kesê yekemîn ku helbest bi Kurmancî nivîsandiye jî, parêzer Şewket Ne'san bû, wî li sala 1961an helbesteke xweşik li ser bûyerên Newroza wê salê nivîsî ye û di kovara ÇIYA de ku li Aleman derdiket, weşandiye.

Lê belê pêwîst e em ji bîr nekin, ku li dawiya serdema Osmanî, Nûrî Gênc, rojnameke bi navê “Doĝru Yol (Riya Rast)” bi zimanê Osmanî li Helebê diweşand, ew ra dawiya salên bîstan ji sedsala borî derdiket, lê gava ku zimanê Osmanî hat qedexekirin, ew jî hat rawestandin.

Piştî barkirina Firensiyan ji Sûryê, qelewîzên hin çalakiyên sîvîl û rewşenbîrî bi riya hin xortên xwendevan re li navça Çi.Kurmênc hatin dîtin. Mebesta wan ew bû, ku rewşenbîrî û zanînê di nava gelê xwe de belav bikin. Ew çalakî ji binî de xebateke netewî bû. Ji nav wan hewildanan, damezrandina “Nadî El-Şebîbe El-Kurdiye/nadiya ciwanên Kurd” li havîna 1939an, Komeleya Durustkirina Civakî li 1949an û Komeleya Çandeyî li 1951an hatin damezrandin.

Li sala 1951ê, hinek ji xwendeyên Kurd, dibistaneke taybet li bajarê Efrînê vekirin, ew kes ev bûn: **Osman Mihemed, Şewket Ne'san, Ehmed Resûl, Henan Mihemed û Reşît Hemo** jî rêvebirê wê bû. Pereyên dibistanê ji hêla wan xortan de dihat dayîn, hinek jî bê pere tê de dixebitîn, wek: **Parêzer Ednan Qereçolî** ji Kurdên Şamê, **Îbrahîm Qadir** ji Hopka, **Îbrahîm Ne'so** ji Mîrka “Miftiyê Efrînê”, **Reşît Hemo** û dadmendê Şer'î li Efrînê **Ehmed Mehdî El-Xidir**. Lê belê, bi behaneya ku ew dibistan ramanên netewa Kurdî belav dike, destlatê ew girt, destê xwe danî ser hemî tiştên wê û rêvebirê wê Reşît Hemo jî zîndan kirin.

Piştî wê, rêxistinên siyasî meydana karên civakî û rewşenbîrî standin, û ji destpêka salên şêstî de ji sedsala borî, rê li ber belavbûna rewşenbîriyê di nav ciwanên Kurd de vebû. Li wan deman, partiyên siyasî yên Kurdî û Partiya Komonîst belavokên bi zimanê Erebî belav dikirin, nivîskarên wan belavokan endamên partiyan bûn, lê zor mixabin, ji ber ku ew partî hemî bi dizî dixebitîn, navên wan nivîskaran ne dihatin diyarkirin.

Ji navîna dehsala şêstî de ji sedsala bîstan, Tevgera Siyasî ya Kurdî kovarek bi navê Gulîstan derxist, ew li navçeyên Kurdan li Sûriyê dihat belavkirin, wê jî navên nivîskarên xwe yên rastînkî diyar ne dikir, lê belê rêzdar Reşît Hemo yek ji nivîskarên wê bû.

Piştî dehsala heştan ji sedsala borî, rewş hat guhertin. Navên gelek helbestvan, nivîskar û hunermedên afranevan di hemî warên rewşenbîrî û hunerî de bilind bûn. Guman heye, ku yekemîn mirov ji Çi.Kurmênc çêroka kurt bi Erebî nivîsandiye Nîroz Malêk ji Gu.Qîbarê ye, yekemîn helbestvanê ku bi Erebî jî nivîsandiye Hamêd Bedirxan ji Şiyê bû. Mixabin, em nikanin navên hemî afranevan û berhemên wan li vir bi bîr wînin.

Ji bilî wêje û nivîsandinê, herdem mirovên ku di warên hunera nîgarkirinê û şêwekariya li ser têxt de jî hebûn. Wan hacetên textî, yên ku pêşesaziyeke hunerî ye taybet nîşan dida, çê dikirin, wek qundaxên çekan, destikên kêr û xençeran... Ji wan kesan: Osmanê Hido ji Şiketka. Hinekan jî huneriyeke zor ciwan di warê şêwekariya li ser têxt de dafirandin, mîna: Meĥemed Simo "Mihemed Çûçik" ji Me'mila.

## Hunera gelêrî

Gelek minasebe ji bo pêşkêşkirina hunerên gelêrî hebûn. Pir caran, gundiyan bi xwe, ji bo ku bêhna xwe vedin, boneyên şahiyê û aheng çê dikirin. Ji boneyên şahiyan ên sereke, ku şahî tê de dihatin lidarketin, ev bûn: Cejinên olî, sineta zarokan, hebûna mêvanan, rojên sayî ku li dû baranê dihatin, ew jî ji rojên vehesa gundiyan bûn wan şahî tê de li dar dixistin… û hwd.

Di warên stran û zargotinê de jî, mirovin hebûn ristên gelêrî, çi bi deng û çi bi stran digotin, mîna: Srtanbêj Mihemedê Elî Tico ji Gu.Hesendêra, Mislimê Elî Bexdadli li Şiyê, Reşît û Mihemdê Eliyê Temo ji Şîtka, Mûradê kûr ji Kaxrê, Hesenê Bêrem ji Kêla… û hwd.

## Stran

Srtanên Kurdî li Çi.Kurmênc parve du cureyan dibin, **giran** û **sivik**:

**Kilamên giran:**

Ew stiranin dirêj in, naveroka wan çêrokî ye. Tê de lehengî, evînî, dîrok û evsane tevhev dibin. Lê her kesek nikane wan stranan bistirê, ji ber ku dengekî xort, bîriyeke zelal û behrek gerek in, çinkî stranin ji wan bi katan dirêj dikin.

Apê Adîk tembûrvanê bi nav û deng digot, ta kilamcî biba srtanbêjekî jêhatî, gereke çar stranan ji stranên dirêj, ku wek dayîkên stranan tên jimartin, baş bizani bana, ew jî ev in: **Mem û Zîn** paşayê stranê ye**, Delal "Dewrêşê 'Evdî"** kilîta stranê ye**, Siyad Eĥmed, Teyar "Xezala Mendan".**

Ji stranên giran ku li Çi.Kurmênc dihatin stran, ev bûn:

**Memê Alan. Dewrêşê 'Evdî- Delal. Teyar Aĝa. Siyad Eĥmedê Zilîfî û Xeca Mama. 'Eyşa Îbê. Meyrema Miĥo Begê. Saliĥê Naso. Cebelî-Xelîl Beg. 'Ereba Saliĥ Begê û Ûsibê Terkoxli. Kulikê Silêmên. Dêli Dotmam - Ĥesen Begê Zîla. Kela Dimdimê. Ĥesenê Dêmez û Têli 'Eyşan. Bêrîvana Cindî û Ĥesenê Meyrê. Heycan. Ûsibê Şer. Melek Can. Xemê Zalim. Xana Dinê. 'Ereb Ĥemadî. Şerîf Beg û 'Edûla 'Emer Begê. Xezala Reşît Begê. Xelîlê Xazî. Bêmal. Êma Ĥemo. Taymûr Begê Lawîn û Lewend Paşa. Kela Beyazîdê. Gureş. Ûs û 'Ezîz. 'Ezîzê Tek Mistefê. Zêneba Osê û Îbramê Eyşê. Ce'ferê Qurbet. Bîlal Beg. Hey la Dilî. Qember û Arzî. Devecî. Xezala Siwêrekê. Feteĥ Beg. Ĥelwecî Gûzel. Ĥûtê Çolê. Ĥelûm Xatûn. Dêli Beg. Sînema ser bi Dûman. 'Elê Mamed. Memê 'Ewan. Mistefa Çolaq. Gênc Osman. Zêno Zênebê. Zêba Ĥemo. Şêx Se'îd. Filîtê Quto. Bedo Canê. Kalê Bilo. Lo bavo. Lê Anê. Nayle Canê. Mihemed Emîn. Mihemed Henîf.**

**Kilamên sivik**:

Awazên wan sivik in, rîzmên wan naskirî ne û gengazî heye ku pir dirêj bibin û stranbêj kanin bêjeyên wan jî biguhêrina. Stranên sivik li dawet û şevbêrkan dihatin gotin, û sema jî di ber re dibû. Stranên sivik ên navdartir ev bûn:

**Gula Zer. Meyro. Pisûkê. Wey Gulê. Çûm ser bîra Alkana. Kalê Şetê. De durme durme lê Êmo. Narê. Zeriyê. Germa havînê tîng da. Neylo neylo fîstan e. Ax anê lingê min. Tozil banê. Ax lê 'Eyşê. Xilfano. Şûjinê. Mirîşkê. De bi me din. Wey lo lawo. Şefo - Çûm Cizîrê. Kewik. Pepûkê. Reşo Can. Yek yek ismê Cebar. Xezalê. Zave-Ĥene. De yarî Ĥemdo yarî. Ela daholek lêketa li ser şiketa Mabeta. Çeçeno. Narînê. Gelînê. Tosino. 'Edlê.**

Lê mixabin roja îro, piraniya wan netên stran, û gelek jî hatine jibîrkirin. Lê belê mala Ekadêmîkê Kurd Celîlê Celîl ava, ew li destpêka salên heştê ji sedsala bîstan li Çi.Kurmênc gerî, gelek stran tomarkirin û di pirtûka xwe ya zor hêja bi navê (Zargotina Kurdan) de belav kirin.

Li demên berê, stranbêjên herî navdar ji Berazên Kobaniyê û derdorên navça Urfayê dihatin Çi.Kurmênc. Wan demên dirêj li mêvanxaneyên Axan derbas dikirin û stranên xwe yên ciwan pêşkêş dikirin. Apê Adîk li derbarê wan digot, ku stranbêjê herî navdar Mişoyê Bekebûrê ji herêma Berazan (Kobaniyê) bû.

Hin stranbêjên ji nîvê yekê ji sedsala bîstan ku me kanî navên wan nasbikirana, ev bûn:

**Mişoyê Bekebûrê. Ĥemûş Kurik** ji Aşkê Şerqî**. Îbramê Tirko** ji Çeqla Cûmê. **'Evdê Şe'rê, Ĥes Nazî, Kundir û Şêx Simaq** ji Naza. **Eliyê Miqdêd** ji 'Uga. **'Elî 'Egêl û 'Eliyê Ĥemê Demircî** ji Şiyê**. Mehmûdê Berazî** ji Erendê**. Mihemedê Eliyê Bedel** ji Keferdelê**. Hec Nayêf** ji Bênê. **Bekir Xirar** ji gu.Dîkê**. Reşîtê Me'im Çûçanê** ji Kotana**. Omerê Cemlo** ji Xezîwê**. Xelê Bûd** ji Bilbilê**. Mistê Qilûz** ji gu.Mam 'Ereba li aliyê Tirkiyê ye. **'Evdê Qenterê** ji Qenterê**. Cemîl Horo** ji Se'rîncek**. Mihemedê Eltico** ji Hesendêra**. 'Eliyê Kapê û Beytaz (Ehmedê Mihemedê Sim'el)** ji Xilalka, bav û kalkê wî tembûrvan bûn, didan Kemaçê û distiran jî. **Mihemedê Qûşo. Cewher** ji Kobaniyê, ew di salên Şêstî de ji sedsala bîstan li gu.Turundê mir û lê hat veşartin.

Ji stranbêjên kilamên kevin, ku xudî behrek, pêkan û deng xweş e, hunermend Ebdirehman bavê Selaĥ ji Gu.Gorda.

Gelek srtanbêjên din jî hene, ew aheng û zemawendan şên dikin, mîna Xebat Teyfûr xudanê dengê şêrîn, û gelekên din jî.

Ji danerên saz û helbestên stranên Kurmancî jî, mamoste Mihemed Ebdo (Perîşan) ji Gu.Qitmê.

Ji xwe, herdem jinên dengxweş jî hebûn û di ahengên taybet de distiran, lê ji ber astengên civakî, tu stranbêjên jin navdar ne bûne.

Ji bilî stranbêjiyê, gelek mirovên dengxweş srûdên olî li mewlîdan digotin û dihatin naskirin, ji wan:

**Mihemedê Nezmî Xoce** ji Gu.Gemrûkê, destnivîseke wî bi navê (bûna hezretî Mihemed) li sala 1369/G=1949z hatiye nivîsîn. **Ehmedê Cewdet (Xoce Xelîfe)** ji Gu.Dimilya. **Xocê Memkalê** ji Gu.Senarê. **Şêx Emînê** ji Şiyê. **Xocê Qorta** sirûdbêjê Mirûdan bû. Hîn jî gelek kes hene mewlîdan li dar dixin.

## Sazbendî

Tembûr alava sazkirinê ya herî navdar e li Çi.Kurmênc. Belkî ew hîn jî di her malekê de tê dîtin.

Alavên sazkirinê yên din jî hene, wek Pîk, Zemir, Bilûr. Zurne jî alaveke şêrîn e, lê ew bitaybetî ji hêla Kirîfan de tê bikaranîn û li dawet û şahiyên fere tê xebtandin.

Berê, nofeke sazbend hebû bi navê 'Ecemoĝli dihat binavkirin, ew jî hunermendên hêja bûn, li gundan digerîn, li tembûrê didan û hunera xwe, çi bi peran û çi belaş, pêşkêş dikirin.

Hinek ji tembûrvanên navdar li sedsala bîstan, ev bûn:

**Şêxoyê Koroĝli** ji Xezîwê**. Osê Xelo, Osê Ĥemgemarî** ji Tirmûşa**, 'Eliyê Mûsê** ji Mabeta**, Topoyê Xişût** ji Kora**, Adîk** ji Milexelîla**, Eliyê 'Igêl û Ehmedê Dêxli** ji Şiyê**, Eliyê Kapê, Mihemedê Eltico, Rustemê Mihmed Elî, Mihemedê Bilêl, Menanê Tirk…**

## Sema (reqs)

Semayên gelêrî yên Kurdî curecure ne. Hin jê **komelî** ne, gelek mirov tê de beşdar dibin. Hin jî **tekane** ne, mirovek wê pêşkêş dike, û di ahengên taybet de yan jî di serê govendan de, tên pêşkêşkirin.

Li gor liv û çivên govde û awazan, sema parve du cureyan dibin, **Sivik** û **Giran.** Her curekê jî saz, awaz û boneyên wê yên cuda hene. Semaya giran di govendan de tên pêşkêşkirin, wê hîngê derfet dikeve kesê sergovend û semayên yekane pêşkêş dike. Semaya serê govendê, ji bilî hin awartan, ne karê jinan bû. Gelek semayên filoklorî yên kevin hîn mane, û li hin dawetan tên pêşkêşkirin.

Ji semayên Kurdî ku li Çi.Kurmênc navdar bûn, ev bûn:

**Govend. Yaĝli Kenar. Nehli (Duquzli). Qurbetkî. Nofê. Qertel. Qebe. Ĥewcelê. Çiftetêliyê (Awşer)[(1)]. Berçepkî. Sûsankî. Rişko ('Ebe daweşandin). Sêlingkî. Ĥelebkî. Demirckî. Giran. Beledî. Şêxanî (Xatûn). Seyran. Ĥemo. Qaser. Goçerkî.Xezalê. Emîne. Sanci. Esmerê…**

---

[1]- Ev nav ji du bêjeyan pêk tê, AW û ŞER, ango AWÊ ŞER, di vê reqsê de gelek îjdilî û hêzdarî diyar dibe.

Piştî ku li destpêka salên şêstî de ji sedsala bîstan, lidarxistina dawetên kilasîkî kêm bû, hin xortan komikên hunerî damezrandin û stran, sema û şanoyên xweşik li hin boneyan pêşkêş dikirin.

Ew komik di warê semayê de, sûdê ji semaya Kurdî ya kevin werdigirin, û navên saz û stranên ku di ber re pêşkêş dibû, lê dikin. Ji bilî ku reqsin ji jiyana rojane jî hatine afirandin, wek tabloyên: Pale, Qertel, Merê, Destar… û hwd.

Koma hunerî ya gelêrî ya destpêkê ku li navçê hatiye çêkirin, "koma Gu.Qermîtiliq" bû, serokê wê Mihemedê Îbrêm/Qertel ji Gu.Qermîtliq bû, ew niha li Tirkiyê dijî, lê roleke Menan Axayê Koreşît jî di wê komê de hebû.

Koma duyem "Koma Efrînê a Hunerên Gelêrî" bû. Ji xwe rola Ferîdê Sirûr û Xelîlê Qonderecî, di koma Efrînê û rahênana endamên wê de nayê înkarkirin.

Ew her du komik, li seranserî navçeyên Kurdan navdar bûn, û cihekî payebilind di gelek mehrecanên hunerî yên Sûrî de standin. Endamên wan komikan cilên Kurdî yên kelepûrî li xwe dikirin, lê ew tev mêr bûn.

Hejmara komikên hunerî ku ji dsetpêka salên heftê de ji sedsala bîstan hatin naskirin digihê sihî. Piraniya wan di dehsala dawîn de ji sedsala bîstan hatine avakirin. Ew hemî bê rêdana destlatê hatine avakirin, ji ber wê jî rastî astengên destlatê tên, û nikanin hunêra xwe eşkere bi navê Hunera Kurdî pêşkêş bikin. Piraniya wan komikan ji keç û xortan pêk tên û partiyên siyasî wan palpişt dikin.

Ev in navên hin komikan û sala damezrandina wan:

**Koma Qermîtliq** li destpêka salên şêstî ji sedsala borî hat avakirin, **Koma Efrînê ya Hunerên Gelêrî 1969, K.Zozan 1979, K.Newroz, K.Aştî 1988, K.Azadî 1992, K.Jîn 1986, K.Bihar, Armanc…**

## Şanogerî û Lîstikvanî

Diyar e, ku li serdemên Alefiringan, nemaze di ya Romanî de, hunereke şanogerî ye pêşketî li navça Çi.Kurmênc hebû. Ew di riya şûnewarên şanogeha gewre ya li bajarê Sîrosê re xuya dibe. Û diyar e ku hunereke şanogerî ye zor bilind lê dihat pêşkêşkirin û xanedan û berpirsiyarên Sîrosê jî lê amade dibûn, ji ber ku ra niha, hîn daniştekine kevirî hene, navên mirovan li ser nîgarkirî ne.

Li serdemên Îslamî, hunera şanogeriyê li Çi.Kurmênc û tevahiya herêmê wêran bû. Mislimanan avahiya şanoya bajarê Sîrosê û bajar bi xwe jî wêran kirin.

Di rewşên gundkî yên dijwar û teng de, gundiyên Kurd jî lîsk û huner ji jîngeha xwe dafirandin û li boneyên xwe yên komelgehî pêşkêş dikirin, wek lîstika **Qutê** ku li meydanên dawetan û li malên Axan dihatin lîstin. **Qeşmerî**, ew jî li dawetan dihat lîstin. Lê ev her du huner niha rabûne û bûne kelepûra kevin.

Ji destpêka salên heftê de ji sedsala bîstan, hin xortan komikên şanogeriyê yên biçûk çê kirin. Li destpêkê hin şanoyên kin û devkî li dawetan, seyranan û li cejna Newrozê pêşkêş dikirin, tê de giringiya hin mijarên civakî, çi baş û çi xirab didan zanîn, wek pesindana xwendinê, rexne li zewaciya keçan ya zorane û lîska kabê, ziyana vexwarina meyê … û hwd.

Pişt re, ew şano hinekî pêş de çû, deqên nivîskî bi kar hatin, û mijar jî nêzîktirî rewşên mirovê Kurd bi taybetî û yê Sûrî bi tevahî, bûn, hêja ye em bêjin, ku jin jî di hin lîstikên şanoyan de beşdar dibin. Lê belê, ji ber ku pêşkêşkirina çalakiyên sîvîl yên Kurdî û ne kurdî jî, li derveyî çarçewa saziyên dewletê qedexe ye, şanoya Kurdî jî raste asteng û qedexeyên destlatê tê, û derfetên pêşdeçûna hunera şanoya Kurdî peyda nabin.

Ji komikên şanogeriyê yên ku ji destpêka salên heftê de ji sedsala bîstan li Efrînê damezrîne, ev bû: **Aştî, Armanc, Zozan, Rohilat, Xormal, Şano1989, Niştiman, Efrîn, Agirî, Zîlan, Kurdax...**

Ji lîstikvanên Sûrî yên ku ji navça Efrînê ne: Ĝesan Sadiq, ew biserfirazî di hin lîstikên TVya Sûryê de lîstiye. Ji yên ku di warê derhênana hunerî de jî dixebitin, Nedîm Ado ji Gu.Xezîwê ye.

# Şêweyên demborandin û teselbûnê

## Şevbêrk

Li şevên zivistanê yên dirêj, gundî bêkar û vala diman. Ji ber wê jî, çi gava ku derfet çê dibû, mêr li maleke gund, yan li mêvanxana Axê yan jî li oda mixtêr rûdiniştin û çêrok, bûyer û serpêhatî hewaldidan. Stran jî li wan şevbêrkan dihatin gotin. Li wan deman, kilamcî jî li gundan digerîn û hunera xwe ya ciwan pêşkêş dikirin.

Para zarokan jî di şevbêrkan de hebû. Pîrikê û dayîkê yan jî xûşkê, çêrokên xweşik ji zarokan re hewaldidan. Lê mixabin, gelek ji wan çêrokan winda bûn, yên man jî li ber windabûnê ne, erê belkî civandina wan pir dijwar be, lê belê ew pir giring û pêwîst e jî.

## Lîsk:

Mirovên berê, li gor rewşên xwe yên civakî, xaknîgarî û jîngehî, gelek lîsk dafirandin. Hin caran taybetiyên netewî û şêweyên raman û mjûlbûna civakê jî tê de diyar dibin.

Bi tevahî, lîsk li ser raman û lebata mirov radibe. Di lîstikên berê de, hin tiştên ku li jîngehê peyda dibûn dihatin bikaranîn, wek şaxên daran, kevir û hwd.

Gelek lîstikên kevin li nava xelkê hebûn, hinek jê di boneyan de dihat lîstin, wek Ĥêlikê li cejnan. Hin jî yên rojê bûn, wek Ĥokê. Hin din jî yên şevê bûn, wek Dizkî… û hwd.

Ev in navên hin lîstikên kevin:

**Gustîlkê, Çavşirtonek/Qurçonek, Çete û diz/Dizkî, Mêşê lempê, Kum revîn, Tûşê, bîre bîr, Kerkî dûv drêj, Ce firîk/ce û genim, Qaq paş ,Sêkêlê, Firfirînkê, Pênc kevirkî, Ço ĥokê (1-Kortê, 2-Topê), Qîntê, Ĝilçê/Gilçê, Çeq fiz, Pûltiqe, Bên, Çatma, Ĥêlkê, Qutê"1-Dest, 2-ling", Feqrovi, Şekalê, Tepê(1-Çav, 2-Dest), Tolê, Damê, Nihe berkê/pelkê, Sêberkê, Dûberkê, Gîsneçir/Te'ilûbir, Zolêfer, Destgêrkirin, Pîpê, Tiştekî/maleka min heye … û hwd.**

Ji lîskên teselebûnê yên berê, berdan hev a dîkan jî hebû. pêşbirka dengê xwendina Kewan jî hebû, malbatên hoza Amka pê navdar bû. Bi tevahî, tîmarkirina Kewan ji gerdişên pir kûr û kevin e li ba şêniyê Çi.Kurmênc, lê belê ew niha pir kêm bûye.

Lîstikên nûjen jî, ji salên şêstî ji sedsala bîstan de li navçê hatin dîtin. Nadiya yekê bi navê (Nadiya Efrînê ya Gelêrî, Çandeyî, Civakî û Hunerî) li sala 1969an bi biryara nimre 900, ku ji hêla Şalyara Karûbarên Civakî û Kar a Sûrî de hati bû dandin, hat lisazxistin. Ew Nadî bi serkêşiya rêzdar Menanê Miçko bû, navenda wê jî bajarê Efrînê bû.

Nadî di demeke kin de, çalakiyên werzişî û hunerî yên hêja kirin. Koma nadî ya hunerê, li salên 1972 û 1973 ahengên serkeftî li Helebê li dar xistin, û di gelek mehrecanên hunerî yên din de jî li Sûryê û Libnanê başdar bû. Semavan û rahênerê koma hunerî Ferîd Sirûr bû. Ji bilî tiştên hunerî, çalakiyên nadî yên fêrkirina şagirtan jî hebûn. Lê belê, ji ber sedemên ewlehî (Emnî), ku bi taybetiya netewî ya navçê ve girêdayî bûn, nadî li sala 1974an bi biryareke ne rewa ('Urfî) hat girtin[1].

Li van çend dehsalên dawîn, gelek yaneyên/nadiyên gelêrî yên werzişî yên Fotbolê li gundan hatin saz kirin.

Roja îro, nadiyekî werzişî yî fermî yê Yekîtiya Ciwanên Partiya Be'is li navça Efrînê heye.

Du holên werzişî yên taybet jî ji bo rahênana kesane li bajarê Efrînê hene.

---

[1]- Endamên desteya nadî ya yekê ev bûn: Menan Miçko-serok, Mistefa Qedûr-cîgirê serok, Heyder Umer-sekiretêr, Hesen Oso perpirsyarê diravî, Emîn 'Elo, Mihemed Elî Oso û Fewzî Mislim Endamên encûmena nadî bûn.

# Beşê Şeşan

# Jiyana Olî
# li Çiyayê Kurmênc

# Lêkolîna Yekê

## Destpêk

Gava ku mirov xwe nas kir, li jîngehê û hawîrdora xwe nihêrî, dît ku bi sedan tiştên mitêl li dora wî dibin; wek: Hilhatina rojê û çûna wê ya rojava, derketina hêvê û çûna wê, barîna baranê, ketina berfê, xumîniya ewran, lêdana birûskê, hatina lêmiştan, girgînbûna çeman, agirên hêgin, avên şor û şêrîn, şovî û meĥlî û hemî rûdawên jiyanê û gerdûnê yên din… hin ji wan tiştan xweşik, hin jî bi tirs û şewat in, hin sûdar, hin jî ziyandar in, lê belê mirov bi çavên xwe nabîne ku kî wan tiştan dike, dafrîne, pê radibe û bi rê ve dibe.

Ji ber wê yekê, mirovê berê bawer kir, ku gereke hêzin an hêzek hebe ew wan tiştan çê dike, û ew hemî kar û bûyer ji ba wan Xwedêyan û ji diyardeyên wan bin. Wî guman kir, belkî nakokî û dijîtî jî di navbera wan hêzan/xwedêyan de hebin. Mirov nav li wan hêzên gewre kir XWEDÊ, ango ewên “xwe dane” kesî ew nedane, ew XWEDA ne û XUDANên her tiştî ne.

Li destpêkê, mirov bawer kir, ku gelek Xwedê hene, û her yek ji wan bi delametekê radibe, û herwiha wî navên cida li wan dikirin û pê didan nasîn, wek Xwedêyên: Royê, hêvê, birûskê, ewran, baranê, ezmên, berhemdariyê... û hwd. Vekolanên ku li cihên şûnewarî yên kevin hatine kirin, navên bi dehan ji wan Xwedêyan dane nasîn, ta radekê, her miletekî, herêmekê, bajarekî û gundekî xwedêyekî xwe û belkî bêtir jî hebû.

Lê, piştî ku serdemên dirêj di ser mirov û ew baweriyên olî yên destpêkî re derbas bûn, ola pêxember Zeredeşt hat. Zeredeşt ew hemî Xwedê di Xwedêyekî tekûbitenê de da nasîn, û baweriyek danî, digot ku wî Xwedêyî her tişt li gerdûnê afrandiye, û her tiştê li ser zemînê, li ezmên û di navbera wan de jî, bi vîna wî digerin. Li gor ew olbaweriya nû, ew Xwedêyê gewre gelek Teşeyên Pîroz (Pêrî/firîşte) jî afirandine û karûbarên afrandeyan, sirûşt û hemî endamên gerdûnê yên din xistine destên wan.

Jixwe piştî wê, olên ezmanî (cihû, fileh, îslam) derhatin û ew baweriyên olî yên mirovê berê, bi taybetî jî yên ola zerdeşt, ji xwe re kirin bingeh û li ser rabûn.

# Hin rûdanên baweriyên olî li navça Çi.Kurmênc li serdemên berî zayînê

Lêkolînvan mêlag dikin, ku li dirêjiya deh hezar salî, herdem jiyan li zewra çemê Efrînê hebû, û ew herdem şên bû.

Li Çi.Lêlûn, qerqodeyê zarokên mirovê Niyandirtalî ji binê Şikefta Duderiyê hate der. Li ser wî qerqodeyî, serê rumeke kevirî hebû, di bin serî de jî kevirekî dûzkirî hebû. Zanyar dibêjin, ji wan tiştan diyar dibe, ku ew mirî bi zanebûn hati bû veşartin, ew dest nîşan dikin jî, ku mirovê Niyandirtalî ji berî 40000 salî de miriyên xwe bi rêzdarî û bi rêwresêm olbawerî veşartine, ango ew xudî bawerî û ramanine olî û giyanewerî bûn. Belkî bawerî û perestinên wî pir destpêkî bûn jî, lê gengaz hebû ku bû bûna bingeha baweriyine olî yên pêşketîtir.

Û ji ber ku hin qafên Hirçan jî li wargehên mirovê Niyandirtalî hatin dîtin, guman heye, ku ew mirovê Niyandirtalî perestvaniya Hurçê jî dikir. Ji bilî wê, pîroziyeke Xezalê jî li ba wî hebû, çinkî li kêleka qerqodeyên jinekê û zarokekî Niyandirtalî, qerqodeya xezalekê jî hebû, ew jî bi wan re hati bû veşartin[(1)].

Ji serdemên berî dîrokê yên nêzîktir, gundikekî çandiniyê yî destpêkî ji serdema kevirî ya nûjen de /8000-5000 /sal B.Z, li kêleka girê 'Endarê heye. Bi dehan gir û cîgehên şûnewarî ji serdemên dîrokî û berî dîrokî de jî li navça Çi.Kurmênc hene, piraniya wan hîn bê lêkolan mane, û qet ne dûre ku belge, şan û şûnepêyên gelek baweriyên ku niha naskirî ne, di nava wan de hebin.

Perestgeha Endarê li Na.Efrînê, ji kevintirîn perestgehên berî zayînê ye ku avahiya wê ra roja îro maye. Erê Xwedêyê ku ji bo wî hatiye avakirin ne nas e, lê şûnewarvan dibêjin, ew perestgeh ji serdema Hititî ya nûjen de ye û digihê hezarê yekê berî zayînê[(2)]. Di perestgehê de, nimêjgehek heye, şûnên lingine mirovan bi pîvanên

---

[1] - D.r.Siltan Mihêsin: Welatê Şamê li serdemên berî zayînê, rûpel 38 û 101.

[2] - Ebdella Heccar: Kinîsa Mar Sem'an, rûpel 139. Serdema nû: Ango piştî sala 1200 BZ.

mezin li ber deriyê wê nîgarkirî ne, neqşa wan pêyan û lidûhevhatina wan dest nîşan dikin, ku rêwresmine derbasbûna perestgehê yen taybet hebûn.

Perestgeh ji derve û hindur de bi pûtên Şêrên ji kevirên reş û mezin, mirovên bi rengê ga û bi hin pûtên din jî hatine fodilkirin û parastin. Hin lêkolînvan dibêjin, ew pût dest nîşan dikin, ku Xwedêya Çiyan Eştar, û Xwedêyê Heyamê Hudud (nîşana wî ga bû), li wê perestgehê dihatin pîrozkirin[(1)].

Di asta girê Endarê ya pêncan a Exmînî de jî, tilasimeke çînciqî hat dîtin, wêneya Xwdêyê Zeredeştiyê yê çêxwaz Ehoramezda, li gel roja bi bask li ser hati bûn neqşandin, /lêkolînê komcivîna zanistî, rûpel 179/.

Li ser Çi.Lêlûn li gundê Xirabî Şemsê jî, wêneyên serê Ga û Rojekê li ser necefeyên hin malan hene. Li ser kevirên dergeha perestgehekê ku ji bilî wê tişt jê nemaye, wêneya Hêvê û Rojê hatine nîgarkirin, û li kêleka wan serê Gakî û gulbazeke ji gulan hene. Li derbarê wan neqşan, lêkolînvan guman dikin, ku ew dergeha perestgeheke pûtperestî ye, û ji sedsala sisiyan piştî zayînê de ye, /E.Heccar, Mar Maron, rûpel 105/.

Perestvaniya rûdan û endamên sirûştê li Kurdistanê ji perestvaniyên gelên Arî yên kevinar in. Zeredeştiyan jî didîtin, ku Roj û Hêv li aliyê çêxwaziyê ne, û li dijî şer in[(2)]. Ji ber wê jî, cihekî rojê yî payebilind di Zeredeştiya kevin de hebû, ew li ba Zerdeştiyan çavê Xweda Ehoramezde bû. /Diyagonov, rûp375/. Berî wan, mirovên Horî jî roj wek Xwedê didîtin, bi Mîsra bi nav dikirin û wek kana ronî û rastiyê dibirin. Roja îro Êzdî jî berê xwe didin rojê û nimêja xwe ji Xwedêyê xwe re dikin.

Ji bilî van tiştan, jêderên dîrokî dibêjin, ku ra dawiya sedsala zayînê ya çaran, Xwedê NEBO jî li Çi.Lêlûn dihat pîrozkirin, /Bûlis Yetîm, rûp81-83/. Gelek pût û perestgehên wî li Çi.Lêlûn hebûn, yê

---

1- Wênekêşana wêneyên Şêran û lawirên evsaneyî li ser derî û lîwanên xaniyan, ji sinciyên gelên Arî bûn, wan bawer dikir, ku ew pût wan cihan bi şêweyên avsûnbazî diparêzin. /Dr.Elî Ebû ‘Essaf, Perestgeha Endarê/, rûp19.

2 - (Sîn) li welatê Mezopotamiya Xwedêyê mezin bû, ew Xwdêyê Hêvê û avê bû, miletê Îbrahîm Xelîl li bajarên Or û Heranê ew pîroz dikirin, /El Rimûz, Fîlîp Sêrc, rûp 382/, /Dr.Ferzat, rûp 116/.

mezintir li gundê Kefer Nebo bû, hîn jî navê NEBO li nav Kurdên Çi.Lêlûn bi kar tê[1]. Nebo jî ji Xwedêyên kevin bû li ba gelên Mezopotamiya, lê kesayetî û kardayîna wî li ba Aşûran sergihayî bûne û mîna “kaniya hişmendiyê” hatiye nasandin, /Corc Hebîb, Êzîdîtî bermahiya oleke kevin/.

Ji hêla xwe de, Kizênfûn jî di pirtûka xwe /rêwîngiya deh hezaran, rûpel 55/ de dibêje, ku rûniştvanên ber çemê Kalos “Efrînê”, masiyên çêm pîroz dikin.

Ji dizên şûnewaran jî hat bihîstin, ku gava wan li ber gundê Satiya goristaneke kevin vekirine, wan pûtê dîkekî bi rengê sor di binê xaşxaşê de dîtine. Bêguman, ev jî ji rewresmên perestvaniya pûtperestiya kevin e, û paşê bû ya Filehan jî.

Li hêleke din, Kurdên Çi.Kurmênc navê Şêxo pir bikar tînin, ŞÊXO bi xwe navê Xwedêyekî gelê Kaşî ye, ew Siltanê Xwedêyan û Xwedêyê zemînê bû, gelê Kaşî jî ji bapîrên Kurdan tê jimartin, /Diyagonov, Mediya/.

Di ber wê re, lêkolînvan Corc Hebîb dibêje /rûp51/, perestvaniya Xwedê MÎSRA ra sedsala diduyan piştî zaiyînê li Rojhilata Nêzîk hebû, nîşana wî jî Têrtawûs bû[2]. Perestvaniya Mîsra bi riya Romanan ji rojhilat de ber ve rojava çû. Li sedsala sisiyan zayînî, Zeredeştî û Mîsrayî pir hatin pejirandin, nemaze li ba serbazên Romanî, ji ber ku olbaweriyên wan her du olan û nakokiya di navbera çêxwazî û şerxwaziyê de wek bingeh ji jiyanê re didîtin, ta radekê Mîsrayî li demekê bû bû hempayê Filetiyê, /Fîlîp Hetê, rûpel 369/.

Di baweriyên Êzdiyan de jî, Têrtawûs destnîşana serokê Pêriyan “Tawûs Melek” dike. Li ser xwînrêja kinîseke kevin li Gu.Kîmarê,

---

1 - Ra dema çend sedsalên piştî zayînê, Çi.Lêlûn li ser navê Xwdêyê Mezopotamî Nebo dihat binavkirin. Hîn jî navên mîna Nubul (navê bajarokekî ye), Kefer Nebo (gundek e), li ser û li derdora çiyê hene.

2- Mîsra Xwdeyê şovî, şîndanî, rojê û ronahiyê bû. Evsaneya Arî, Mîsra bi xortekî dinimîne, ew xort gayekî mezin bi xençera xwe dikuje, bi xwîna wî darûberên çolê av dide, û ji perçeyên laşê wî jî hemî lawiran dafrîne. Jidayîkbûna Mîsra li 25 kanûna yekê ye (roja cejn û sersala zayîna Îsa bi hesabê rojhilatî), roja vejîna wî ji mirinê jî di 21 adarê de ye (roja Newrozê).

Neqşa zok Têrtawûsan heye, û di navbera wan de guloverikek heye, di hundurê wê de jî xaçeke ku her çar perên xwe bi qaserî hev in, heye, ew kinîse li sala 537an zayînî hatiye avakirin. Li gor baweriya Êzdîtiyê, ew guloverik û xaça ku di hindurê wê de, zemînê û çar aliyên wê dest nîşan dikin. Wek tê zanîn, xaça ku her çar destên wê bi qaserî hev in, navnîşana ola MîtaHorî ye, xaça Filan jî destê xwe yê jêrîn dirêjtir e.

Di warê hin pîrozgehên ku li navçê hene de jî: Pîrozgeha Şêx Berkat, ku li ser Çi.Şêx Berkêt e, û Êzdî û Dirûz wê pîroz dikin, ew li serdema berî Filetiyê û ra dawiya sedsala yekê piştî zayînê, li ba Alefiringan perestgeha Xwedêyê birûskê ZÎYOS bû, /Dr.Şe'is, kela Sem'anê, rûpel 46/. Bajarê Sîrosê jî navendeke giring bû ji perestvaniya her du Xwedêyan Yûnanî Ziyos û ESÎNA re.

Pîrozgeha Parse Xatûnê ya Êzdiyan, ku li ser Çi.Parsê ye û dora 20km li bakur rojhilata Efrînê ye, jêder li ser wê jî dibêjin: Ew war û perestgeha Pêxember Dawûd bû, /Ibin El- Şuĥnê, rûpel 96-97/.

Bi taybetî Pîrozgeha Henên ya navdar li ber gundê Meşalê jî, Ibin El- Şuĥnê wiha dibêje: Gora birayê Pêxember Dawûd li wir e. Pîrozgeha Nebî Horî jî gora Orya kurê Henan e, wek hatiye zanîn Orya evserekî artêşa Pêxember Dawûd bû, li wir hat kuştin û hat veşartin, /Ibin El-Şuĥnê, rûp225/.

Tiştekî din î balkêş li hin gundên navçê tê dîtin, stêrka şeşper a ku destnîşana ola Cihû dike, li ser gelek avahiyên ku li sedsala nozdehan li navçê hatine avakirin tê dîtin. Min bi xwe ew li ser xanîne li van gundan dîtin: Maratê, Çobana, Gazê, Turundê û li ber pîrozgeha Qere Curnê li ser gorekê jî dît(1). Ji wê yekê tê têgihîştin, ku ola Cihû jî li sedsalên nozdehan li navçê hebû.

Ji bilî van tiştan, Kurdên Efrînê bi gelek endamên xwezayê sond dixwin, wek: Av, ar, ax, roj, hêv… û pîrozgehan jî bi êgir ronî dikin.

---

1- Ew gora Xelîlê Hesenê Fatikê ye, ew li sala 1332an g/1913an z. miriye. Guman heye, ku ew stêrkên şeşper ji çêkirina hosteyên Cihû bin, û haya xwediyên mirî ji wateya wan tine bû. Lê belê tê gotin, ku têkliya Xelîl bi Masoniyê re hebû. Nemaze li wê demê, Masonî rêxistineke serbest bû, û li sala 1885an baregeheke xwe ye eşkere li Helebê li taxa Ezîziyê hebû.

Em bawer dikin, ku ev tiştên ku me li jor, li derbarê rewşa olî li navça Efrînê gotine, destnîşana du bergehên olî yên sereke dikin:

**Berî Zeredeştiyê**: Li vê serdemê, sirûşt, rûdawên wê û Xwedêyên wan tiştan dihatin pîrozkirin. Şanên wan Xwdêyan jî hîn li ba kesên navça Efrînê ji bo hin tiştan û li hin boneyan tên pîrozkirin, wek: Xaça ku her çar destên wê bi qaserî hev, ew li ser govdeyên zarokên nexwaş û li ser firaqan tê resimkirin, xaçên darikî jî ji bi zarok û sewalên malîn dixin. Morika şîn, ku ji bo (parastina ji çavan) tê bikar anîn, guman heye, ku têkliyên wê bi cilên şîn yên rêberên olî yên Arî yên berî Zeredeştiyê re hebe.

Xwedêyekî gelê Medî bi navê NAZATIYA jî hebû, tiştê balkêş ew e, ku li ba Kurdan bi tevahî û Kurdên Çi.Kurmênc bi taybetî, navê jinan: Nazê, Nazo, Nazli, Naz… pir bi bikar tên, guman heye ku têkliyên wî navî, bi Xwedê Nazatiya re hebe û ew têklî xort be jî.

**Serdema Zeredeştî**: Cihekî rojê û êgir î payebilind di ola Zeredeştî de heye, ew jî li ba xelkê Çi.Kurmênc hîn cihê pîroziyê ne.

Li ber roniya bawerî û sinciyên civakî ku me li jor bibîr anîne, em kanin bêjin, ku hîn gelek rêwresmên baweriyên olên pûtperestiya Arî, sinciyên olên Zeredeştî, Cihû û Filetiyê li Na.Efrînê tên dîtin.

Tiştê ku gotina me piştrast dike, ew e, gel û dewletên ku bawerî bi olên Arî yên kevin tanîn, mîna Horî û Hitît, an jî yên li ser ola Zeredeştî bûn, wek Med û Pars, an jî yên Cihû wek gelên Samî, yan jî ewên ku perstvaniya Xwedê Nebo dikirin, wek Aşûr û gelên Mezopotamiyayê bi tevahî, yan jî yên ku Xwedê Ziyos pîroz dikirin, mîna Yûnanan, û li dawiya wan hemiyan jî ola Îslamî, ew hemî gel û ol, çi bi rûniştinê û çi bi dagîrkerinê, gihîştine Çi.Kurmênc, û her yekî ji wan mora olbawerî û çanda xwe li navçê xistine û hikariyên kûr li jiyana rûniştvanên wê de kirine, û hîn jî mane.

# Ola Fileh

Li destpêka derhatina wê, Ola Fileh zor û bergiriyeke pir giran ji hêla impretoriya Romanî, bawermendên ola Zeredeştiyê û ji bilî wan jî dît[1]. Lê belê li sala 331ê/Z, Impretor Qustentîn impretoriya Bîzentî ji Roma cihê kir û Filetî kir ola wê ya fermî.

Wekî ku hatiyae nasîîn, ola Fileh ji sedsala sisiyan piştî Zayînê de li navça Çi.Kurmênc belav bûye. Ew ola nû di demeke kin de hêgin bûye û bi dehan kinîse, dêr û cîgehên perestvaniyê, mîna birc û stûnên perestvaniyê li seranserê navçê hatine avakirin[2].

Li destpêka belavbûna xwe, bajarê Cindirêsê bû wargeha nasiktiyê li bakurê Sûryê ji ola Fileh re. Sîros "Nebî Horî" jî, bû Ebereşiye, 800 kinîse pê ve girêdayî bûn û Usqufekî taybet jî rêbertiya dêrê, bawermend û nasikên wê dikir[3].

Li wan deman, navçe bi xwe jî zor pêş de çû bû û şêniyê wê pir bû bû. Kavil û şûnewarên avahiyên ku ji wê demê de mane, wê rastiyê dupat dikin. Ew şûnewar, radeya nirxdariya olî û şaristaniya Çi.Kurmênc li demên destpêka hatina ola Fileh dest nîşan dikin. Ew rewşa gulvedayî li navça Çi.Kurmênc, ra destpêka serdemên Îslamî ajot.

Lê pişt re, kavilbûnê li navçeyên bakur rojavaya Sûryê dest pê kir, bi taybetî jî li dawiya serdema Îslamî ya 'Ebbasî. Li wan deman, mîrên deveran guh ne didan Xilafeta Bexdadê, û li herêmên xwe destlatdariyên serbixwe dimeşandin.

---

[1]- Li sala 228an/z, Zeredeştî bû ola fermî ji impretoriya Faris re.

[2]- Li ser şopa Sem'anê Stûnî, sinciya perestvaniya li ser stûnan li Çi.kurmêmc belav bû bû, Baba Bûlis Yetîm dibêje, navçe bû bû daristaneke ji stûnan.

[3]- Bawer dikim, (nasik) gotineke Kurdî ye, ji (nasîn) hatiye, (ik) jî nîşana biçûkirin û şêrînkirinê ye.

Şerên Xaçperestan jî kavilbûneke gewre bi ser gund û perestgehan de anî. Piraniya şênî pejmorde bûn, û warên xwe hîştin û mişext bûn. Li wan deman, ew herêma di navbera bajarê Idlibê û Dîlokê (Entabê) de, Çi.Kurmênc jî di nav de, bû bû herêmeke sînorî û meydana şer û talanan di navbera Alefirengan û Mislimanan de.

Ji hêleke din ve, digel ku şêniyê Çi.Kurmênc derbas ola Îslamî bû bû, lê Filetiyê hikariya xwe bi kûranî li jiyana olî ya gel kiri bû. Ji wan bandoran, wek mînak: Xebtandina xaç di warên pîrozkirin û vegirtina ji nexwaşiyan, pêkanîna rêwresmên heftekê û çel ji bo miriyan, pîrozkirina cihên Filehan ên olî, mîna kavilên kinîseyên kevin, cihên Filehan ên pîroz… û hwd.

Di nav sedsalan de, gelek navdarên ola Fileh ji Çi.Kurmênc derketine, û bandorên tevahî di warên olî, zanistî, rewşenbîrî û dîroka navçên bakurê Sûryê û Çi.Kurmênc de zor giring bû.

Emê jînengariya hin mirovên olî ji navça Çi.Kurmênc ên navdar, wekî ku di jêderên dîrokî de hatiye, hewaldin û wan bidin nasîn[1]:

- **Mar Aqûbê Rihawî**[2] (633-708)an/Z.

Dîroknivîs û Petriyek Mîxayîlê Mezin dibêje, ku Mar Aqûb li 'Êndaba li Cûmê jidayîkbûye. Berê 'Êndaba bajarekî naskirî bû, cihê wê li rojhilata Gu.Coqê bi dora 4/km ye. Roja îro, şûna wî bajarî tê çandin, lê ew war hîn bi navê 'Endîbê tê nasîn. Li ber girê 'Endîbê, perçên berikên rengîn(fuseyfisa) tên der, guman heye ku ew binê kinîsa ku Mar Aqûb tê de nimêj dikir be[3].

Mar Aqûb ji xortaniya xwe de 'Endîb berda û çû li Gu.Til'eda ku li başûrê Çi.Şêx Berkêt e, ku wê hîngê navendeke olî ye giring bû, rûnişt. Ew demeke dirêj li wir ma, û paşê ji bo Usqufiya Rihayê, ku li wê demê navendeke Filehî ye gerdûnî bû, hat hilbijartin. Lê belê ew tenê çar mehan lê ma û vegerî Til'edayê, û li sala 708an/z lê mir û di dêra wê ya mezin de hat veşartin.

---

1 - Zanînên dîrokî û şûnewarî ji van jêderan hatine birin: Baba Bûlis Yetîm- Gotarin li ser Şûnewarên Sûryê -1977. Baba Yûsif Qoşaqcî û Baba Bûlis Yetîm: Stûnî Lehengên Xwedê ne.

2 - Mar bêjeyeke Suryanî ye, bi wateya Pîroz- mirovê pîroz- (Qidîs) tê.

3- Hat zanîn, gava ku xudanê zevî xak zeviyê xwe dûz dikir, kevirên rengîn jî kavil kirin.

**- Petryerk Yûheneyê Çaran**

Ew li gundê Kurzêla Cûmê Nasik bû û li ser stûn dijî. Gava ku deng da, Usqufên Rihayê ew wek Petryerk hilbijart û sêzdeh salan wek Petryerk ma. Ew li sala 922/Z li bajarê Serê Kaniyê - Cizîrê mir û di kinîsa mezin de hat veşartin.

**- Petryerk Yûheneyê Şeşan**

Ew li Gu.Kurzêlê Rahib bû, li ser stûnekî nasiktî dikir. Ew li sala 954zayînî wek Petryerk hat hilbijartin, du sal û nîvan ma û li Entabê mir.

**- Mitran Tawdora** (393-466)an/Z.

Tawdora li bajarê Entekê hatiye dinê. Wî ji heft saliya xwe de Rahbtî dikir. Piştî mirina bavê wî, wî hemî arziyên xwe li xelkê belav kirin, û xwe ji nasiktî û perestvaniya olî re vala kir. Wî bajarê Entekê berda û li dêra “Hiwartê” bû Rahib. Pişt re li sala 423/Z, li bajarê Sîrosê bû Mitran û nêzîkî sî salî lê ma. Li dema wî, Ebreşiyeke mezin li Sîrosê hebû, dora 800 kinîse û gundên şên bi ser ve bûn. Piraniya wan niha di nav sînorên navça Çi.Kurmênc de ne.

Tawdora baştirîn zanayên dema xwe bû. Wî gelek pirtûk afirandine, a giringtir pirtûka bi navê “ Dîroka Olî” ye, wî ew li sala 444/Z nivîsandiye. Tewdora tê de rewşên gundên Ebreşiya xwe û bajarê Sîrosê bi hûrikî salix dide, û jiyana 75 mirovên ji navça Sîrosê, ku bi çêxwaziyê navdar bûn bi bîr aniye.

**- Mar Maron** (347-410)an/Z.

Gotinên cuda li derbarê warê jidayîkbûna Mar Maron hene. Lê belê, Baba Bûlis Yetîm dibêje, nêrîna nûjen û xortir ew e, ku ew li deverên ber çemê Efrînê, di navbera Ezaz û Kilisê de, li navça Ebreşiya Sîrosê jiyaye, û li gundê Kefer Nebo, ku li ser Çi.Lêlûn e can daye.

Karê balkêştir ku Mar Maron pê navdar bûye, ew e, ku wî şêniyê Çi.Lêlûn ji perestvaniya Xwedêyê Aşûrî Nebo aniye ser ola Fileh.

Wê hîngê gelek pût û heykelekî Nebo li Gu.Kefernebo hebûn û cihê pîrozkirina xelkê bûn. Mar Maron jî gelek ji wê yekê dêşî,

lewre biryar xwe da, daku wî çiyayî bi baweriya xwe ya olî veke û şêniyê wî bibe ser ola Fileh. Wê hîngê wî xaç hilgirt, derket çiyê, demek dirêj li kêleka rûniştvanên wê deverê ma û doza Filetiyê ji wan re kir. Gava ku heyam sert dibû, ew di bin konekî ji 'eyarê bizinan de rûdinişt. Û herwiha, bi ew şêweyê zor balkêş û dijwar, wî şêniyê Ç.Lêlûn anî ser ola File, pût şikandin, heykelê Nebo jî rûxand, û bi kevirên wan kenîsa Kefer Nebo li sala 398an/z ava kir[1].

Mar Maron li Kefer Nebo canda, û guman heye ku ew li Gu.Beradê hatiye veşartin. Wê hîngê Berad navendeke bajarvanî ye şên bû li Ç.Lêlûn. Pişt re ew bû navendeke olî ye payebilind, û gelek kinîse û dêr lê hatin avakirin.

Li derbarê Maronê nasik, Usquf Tawdora di pirtûka xwe “dîroka olî” de wiha dibêje:

((Maron sirtek ji xwe re kiri bû baregeh, ew berê sirteke pîroz bû li ba gawiran, û heykelekî Şeytên lê hebû “li ser Kefer Nebo dibêje”, wî hemî şêniyê wir vegerand perestvaniya Xwedê. Pişt re pîrozgeheke biçûk ava kir û perestvaniya Xwedê tê de kir. Wî nexwaşiyên govde û derdên derûnî jî çareser dikirin, wek çekozî û hêrs, û hişmendî jî belav dikir… Lê belê Mar Maron bi nexwaşiyeke biçûk ket û mir.

Wê hîngê nakokiyeke dijwar li ser termê wî di navbera gundên deverê de rabû, her hinekan dixwast wî bibin ba xwe. Lê li wê hîngê gundek li deverê hebû, mêrên xwe pir bûn “guman heye Berad be”, tevahiya şêniyê wê hat, ew termê ku zor buha bû, ji dest hemiyan girtin û birin, mêravekî zor gewre li gundê xwe jê re ava kirin û ji wê rojê de sûda wî werdigrin, û wî bi mehrecaneke gelêrî ye salane pîroz û rûmetdar dikin…)).

Li roja çarê meha Gulana sala 2002an, şandeke mezin ji bawermendê Maronî li Sûryê, Libnan û hemî deveran hatin Beradê. Tê gotin, ku wan gora Maron li Beradê bi cih kirine, û dê her sal li roja çarê Gulanê, mehrecaneke olî li Beradê li dar xin.

---

[1] - Jêder dibêjin, Çar pût ji bîreke kevin li Gu.Kefer Nebo hatin biderxistin. Me jî ew gotin ji gundiyan bihîst û du pût jî ji wan dîtin.

- **Mar Sem'anê Stûnî** (389-459)z.

Zanînên fereh li ser jiyana Mar Sem'anê Stûnî li ser zimanê Tawdora ji sala 444 zayînî de hatine, wê hîngê hîn Sem'an li jiyanê bû. Tawdora dest pê dike û wiha dibêje: ((Sem'anê bi nav û deng, ecêba gerdûnê ya gewre ye, hemî miletên Qiraltiya Romanî wî dinasin, Firs, Med, Ehbaş, Skot… wî dinasin…)).


Sem'an li sala 389/z, li Gu.Sîs an Şîsayê hatiye jiyanê, guman heye ku ew gund nêzîk bajarê Îslehiyê yê niha be, ew di çarçewa Na.Çiyayê Kurmênc de ye, dora 25/km li bakurê sînorê Na.Efrînê ya niha ye.

Sem'ên di çûkaniya xwe de pez diçêrand, ew di gênciya xwe de li nêzîk gundê xwe Sîsê, tev komek nasik bû, û du salan pê re ma. Pişt re, xwe gihand Rihbaniya Til'edayê, ku li ber Çi.Şêx Berkêt bû, ew deh salan li ba wan jî ma. Di wê demê de, wî karên nasiktiyê yên gelek giran li ser xwe bi kar tanîn, û ji ber ku ew kar li tersî sazûmana dêrê bû, ew ji dêrê hat dûrxistin. Wê hîngê, wî li cigehê Gu.Dêr Sem'anê, warek girt û sê salan tê de ma. Li wê derê, wî çil rojî bê xwarin û vexwarin rojî digirt!.

Piştî wê, ew hilkişî pozê çiyê li cihê Kela Sem'anê ya niha, û bi zincîreke hesinî xwe bi zinarekî mezin ve girêda. Wê hîngê mirov ji hemî deveran dihatin seredana wî û xwe pê pîroz dikirin. Lê ji ber çûnûhatina xelkê, û daku xwe ji pêgeha zêde biparêze, û ji Xwedê ve jî nêzîk bibe, biryar stand ku stûnekî ji xwe re ava bike û li ser bijî.

Wî li destpêkê stûnekî bi bilindiya şeş gazan ji zinarekî çê kir û li ser rûnişt, lê belê ji ber destdirêjiya seredaniyan, wî her demekê stûn bilind dikir, ta gihîşt 36 gazan/16 mitran. Wî lave, nimêj û rojî li ser stûn dikirin û qet jê danedihat. Mar Sem'an karên zor gewre di warê çareserkirina nexwaşiyan de pêk tanîn, û bi paşeroja mirov û jiyanê jî bi xeber dibû, lewre navê wî li tevahiya cihan naskirî hat belavkirin.

Piştî ku M.Sem'an 37 sal li ser stûn derbas kirin, wî li roja yekşemê li 26ê Tîrmeha sala 459/z canda. Wê çaxê, û ji bo ku Mitranê Entekê termê wî biparêze, ew li gel tabûrek serbaz bi darebesta wî re bi rê ket. Wan darbest di gundê Şadêrê re daxistin, û



**Bermahiyên stûnê Mar Sem'an:**

**Kevirê binyat û perçak li ser.**

ji wir de bi karwaneke zor gewre çûn bajarê Entekê, û li roja yekê ji meha Êlûlnê hat veşartin. Lê piştî wê bi demeke kin, term rakirin bajarê Qustentîniyê û li wir binax kirin. piştî mirina wî, xelkê stûnê wî ji bona pîrozkirinê, parî parî kir û birin malên xwe. Dibêjin, xelkê perçeyên kevirê stûn dihêran, di avê de dihelandin û ji bo çareserkirina nexwaşiyan vedixwarin.

Li roja me, ji wî stûnî tenê tehta binyat, û perçakî gulok li ser bingehê mane.

# Ola Îslamî

Li sala 637/z, hêzên Mislimanan bi serkîşiya 'Eyad bin 'Ebid Ĝenem, destên xwe danîn ser gundên Cûmê. Piştre bajarê Sîrosê jî bi dandina Cizyê, û li ser parastina jiyana xelkê û azadiya baweriyên olî yên Fileh radest birin.

Ew rewşa nû, dora sê sed sal ajot, di wê demê de, navça Sîrosê di nav destên Misliman û Bîzentiyan de diçû û dihat, lê ji hêla Olî de, destlatsarî di destê rêberên ola Fileh de bû. Lê belê ji dawiya sedsala zayînî ya dehan de, tevlehevî û guhertinên siyasî yên mezin li tevahiya herêma Rojhilata Naverast û navça Sîrosê jî peyda bûn.

Li sedsalên yanzdeh û dozdehên zayînî, Zengiyan navçe hukum kirin, li dû wan Eyûbî û paşê jî Memalîk hatin. Di bin zixta van rewşên siyasî de, zora Filehan hat birin û hejmara wan pir kêm bû, ew Fileh yan Îslam dibûn, yan jî navçe berdidan û mişext dibûn.

Bi tevahî, em kanin bêjin, ku dawiya hebûna ola Fileh li Na.Sîrosê, ji hukmê Memalîkên Çerkez de dest pê kiriye, û li dawiya sedala sêzdehên zayînî Fileh li navçê nemane.

Li dema me, tevahiya şêniyê navça Çi.Kurmênc Misliman in, û hejmareke biçûk jî Êzdî ne. Piraniya Kurdên Misliman li ser rêola Henefî ne. Lê bi tevahî, Kurd ne olbawerên hişk in, ew gelek gerdiş û kevneşopên xwe didin pêş baweriyên olî, û ji hêla zanîna olî de jî lawaz in, çinkî ji berê de, zanayên olî li navçê tune bûn, û bandoreke cudatiya zimên e giring di vî warî de hebû, û hîn jî heye.

Lê li wê demê, ango li sedsala 13ên/z, ola Êzdî ya ku em niha nas dikin, gihîşt navça Sêgoşa Sîrosê, û bi şêweyekî fere, bi taybetî jî li nav şêniyê gundên Cûmê û Ç.Lêlûn, belav bû. Hêja ye em bêjin, ku motika peydabûna wê olê li Na.Şêxan li Kurdistana Êraqê li nêzîk bajarê Mûsilê ye.

# Rêol û Bineol
# li Çi.Kurmênc

Gelek şopedarên rêolên wek Rifa'î, Qadirî, Neqişbendî û bineolên mîna 'Elewî li Çi.Kurmênc hene. Her rêolek jî bi kes û malbatina hatine naskirin. Emê li vir rêol û bineolên sereke li navça Çi.Kurmênc, xudan û xudan dest û hin zanyarên olî jî bidin nasîn.

## Bineola 'Elewî:

Bineola 'Elewî li rojavaya welatê Kurdan tê dîtin, mîna: Elbistan, Dêrsim, Erzirom, Meletî, Meraş, Çi.Kurmênc… û hwd. Loma jî, gava ku mera li navçê digere, mera pêrgî gelek cigehên pîroz tê, ku bi navên Dede yan Baba tên nasîn, ew navnîşan jî yên bineola 'Elewî ne.

Ji wan cih û navan tê naskirin, ku şopedarên wê bineolê li piraniya deverên navçê hebûn û hejmara wan ji ya niha bêtir bû. Ew cihên pîroz ku me naskirin ev bûn: **Yaĝmûr Dede - Gu.Bêkê, Eslan Dede - Berkaşê, Îbram Dede- Hopka, Yarim Dede - Be'dîna, Sitî Zêneb û Dewsa 'Elî- Zerka, Elî Dede - Anqelê, Bizilme Dede û Sari Baba û Xidir - Şiyê, Meryem Dede û Xelîl Dede - Gundî Xelîl, Sifrî Dede - Tirmûşa**, **Şêx Me'im, Şêx Hemo, Siltan Berbe'ûş**.

Li roja me, bajarokê Mabeta navenda bineola Elewiyên Efrînê ye. Li destpêka ketina Firensiyan li navçê, Mabeta li salên 1924an û 1925an bû bû navenda kargêrî ya qeza Çi.Kurmênc.

Hejmara rûniştivanên Mabeta li gor serhejmara 1994an, 1974 kes bûn(1). Piraniya şêniyê Mabeta ji hoza Biya û ji bineola 'Elewî ya Ce'ferî ne.

Pênc malbatên şêniyê Mabeta yên sereke hene: Ala, Kapizî, Gozelek, Ziravkî û Qerpûz. Maline 'Elewî li gundine din jî hene, mîna: Şîtka, Şingêl, Xirabî Silûg... û hwd.

Bawermendên 'Elewî, ji hêla olî de, bi rêberên xwe yên li bakurê Kurdistanê ve girêdayî bûn. Her sal Dede ji hêla Dêrsimê û Wanê dihatin, û bi mehan li Mabeta diman, Dedeyê navdar jî Şêx Elî bû.

[1] - Biderketineke mezin ji mabeta heye, loma jî ev hejmar rastiyê nade.

Lê ji ber sedemên siyasî yên navdewletî, ew têkelî ji dawiya sala heftêyî de ji sedsala Bîstan hatin birîn, û nema Dede ji Kurdistanê tên, lewre li roja îro, gelek ji 'Elewiyên Mabeta xwe ji hêla olî de bi 'Elewiyên Sûryê ve girêdidin.

Rêberê olî yê Elewî ku di sedsala bîstan de navdar bû, Şêx Şe'boyê Fat'ecemê bû, ew ji malbata Gozelek bû û jê re "Baba Şe'bo" digotin. Baba Şe'bo Xudan dest bû û şûna Dede digirt. Ew li dawiya dehsala heştan ji sedsala borî mir û ta niha tu kesî şûna wî ne girtiye.

Di warê siyasî de, Mihemedê 'Eliyê Xoce ji Mabeta, ji xebatkarên gelê Kurd yên sereta bû, ew di avakirina Partiya Demoqrat a Kurd de li Sûriyê beşdar bû, ew li sala 1961an tev şoreşa Kurdistana Êraqê jî bû. M.E.Xoce li sala 1965an jiyana xwe ji dest da û li Şamê hat veşartin.

Di dema Osmaniyan de, 'Elewî li ser destê Mislimanên Sunne, toşî tengahiyên olî û civakî dibûn. Wek nimûne, goştê qurbana ku bi destê 'Elewiyan dihat şerjêkirin ne dixwerin û hwd.

Li sala 1920an, şêniyê hin gundên derdor ên Sunnî, hêrişeke çekdar birin ser Mabeta, belkî ji ber wê bû jî, gelek mirovên Mabetî di hêza Milîsên Firensî de mor dikirin.

Ji bilî wan, di salên sihî de ji sedsala bîstan, Mabeta ji hêla Mirûdan ve toşî tewatîreke civakî ye qirêj bû [1]. Belkî ji ber van sedeman, û ji bilî wan jî, hejmara 'Elewiyan li navçê dagerî û roja îro tenê li Mabeta mane.

**Ji sincî û kevneşopên şêniyê Mabeta:**

Cudatiyên pir biçûk di hin tiştan de li ba şêniyê Mabeta hene. Wek:

1. 'Elewî ji bineola xwe dizewicîn. Lê ev yek niha li ber hilhatinê ye.

---

[1] - Ji ber ku hin tiştên taybet li ba bawermendên rêola 'Elewî hene, şêniyê Mabeta bi şêxê xwe (Dede) re di şikeftê de dicivîn, û zanînên olî dibihîstin. Wê lomê, Mirûdan tewatîrek belav kir, digot, ew ji bo tiştên ne baş di şikeftê de dicivin, nezaniyê jî kir ku ew tewatîra virek, demekê li nav şênî belav bibe.

2. Şiqnekî dara zêtûnê dixin gora miriyên xwe, ev sincî li hin gundên Çi.Kurmênc ên din jî heye.


3. Ketina Rêkê: Ta ku yek kani be têkeve rêkê û bibe endamê rêolê, ew çend salan perwerde dibe. Pişt re, gava ku bawerî pê hat, ew Surrê distîne û dibe endamê Terîqetê. Dibêjin dora pêncî endamên terîqetê li Mabeta hene.

**Sê Pîrozgehên** 'Elewiyan li Mabeta hene:

1. Pîrozgeha **Siltan Berbe'ûş**: Li bakurê Mabeta li ser girekî şûnewarî ye. Kaniya Berbe'ûşê ji binê gir derdibe. Avahiya wê kilesîkî ye. Roja wê ya pîroz çarşem e, li wê rojê hatina ber pîrozgehê qebûl dibe. Berî bîst salan, şêniyê Mabeta her sal li meha Nîsanê diçûn ber pîrozgehê, qurban dikirin û şahî li dardixistin, lê niha kes bi wê erka olî ranabe.

2. Pîrozgeha **Şêx Hemo**: Li başûrê Mabeta li ber riya Gu.Dargirê ye. Mêravek, bîrên kevin û kavil lê hene.

3. Pîrozgeha **Şêx Me'im**: Li bakurê Mabeta ye. Ew cihekî Pîroz e, û mêravek lê heye. **[Nexşe 21].**




Nexşe- 21 - pîrozgehên sereke li Çl. Kurmênc

## Rêol li Çi.Kurmênc


Sê rêolên Îslamî yên sereke li Na.Efrînê hene, xudanên wan bi navê Şêx tên nasîn. Morûdên wan li navçê û li derveyî navçê jî hene. Ew rêol ev in: Neqişbendî, Rifa'î û Qadirî.

Ji bilî wan rêolan, malbatine xudî “dest û keramet!” jî li demên berê hebûn, lê li roja me piraniya wan malbatan wek bîranîn mane, mîna: Şêx Ne'san li Xelnêrê, Şêx Zênel li Reco û 'Etmana û Hemlorik, Şêx Bozan li Senarê. Hin Şêx li van gundan jî hebûn: Xilalka, Kurzêla Çiyê, Reco, Gemrûk…

Ji bilî wan, xelk navine kesine ne naskirî jî xudî dest û keramet dibîne û bêyî ku wan nas bike, rêzdariyê ji wan re dike, wek: Serkut, Şêx Silêm, Midewer... û hwd.

### - **Rêola Neqişbendî**:

Rêola Neqişbendî li ser destê Şêx Xalidê Şehrezorî (1779-1826) derbas Rojhilata Navîn bû. Şêx Xalid ji Kurdên Silêmaniyê ji Kurdistana Êraqê bû. Wî ew rêol ji Hindistanê wergirt û li deverên fereh ji Rojhilata Navîn belav kir. Gelek zaniyar û bawermend li ser destên wî bûn têkildarê wê rêolê, bi taybetî jî ji Kurdan. Ji zanyarên Kurd ên naskirî, ku di heyameke Neqişbendî de rabûne, Mile Remedanê Botî û Kurê wî Mihemed Se'îd û Miftiyê Sûryê Şêx Ehmedê Keftaro jî.



**Şêx Husênê Kurka Rêbrê rêola Neqişbendî**

Taybetiya rêola Neqişbendiyê ya naskirî ew e, ku rêbertiya wê ne bapîrane (wîrasî) ye, ew bi radeya zanîna olî tê birin.

Zanayên Neqişbendî li derbarê wê dibêjin, ew rêola herî hêsan e, û nêzîk jiyana mirov û mijûliyên wî ye, belkî ji ber wê jî, ew li ba Kurdan belav bûye.

Hin rêberên Neqişbendî li sedsala bîstan, serkêşiya şoreş û serhildanên Kurdan li hember zulma dewletan kirine, wek Şêx Se'îdê Pîran li sala 1925an li Tirkiyê, û her sê bira Ebdiselam, Ehmed û Mistefa Barzanî li Kurdistana Êraqê.

Li roja me, rêberê Neqişbendî li Çi.Kurmênc Şêx Husên kurê 'Elî ye, ew bi Mamoste bi nav dibe, û bi Husênê Melê jî tê nasîn. Şêx Husên li sala 1918an li gundê Korkê Jorin di maleke gundî de jidayîk bûye. Hoza wî Şêxî ye. Wî di zarotiya xwe de Quran li ber xoceyê Sunnî yê Henefî Şêx Kazimê Intakî xwendiye,û hinek zanînên olî jî jê birin.

Pişt re li sala 1933an pêwendiya wî bi rêola Neqişbendî re çê bû. Mamosteyê wî yê rêkê şêx Ehmedê Namî bû, ew mirovekî Tirk ji Ezmîtê bû. Piştî ku wî li sala 1940î canda, Şêx Husên mirûdîtiya xwe ya olî li ba şêx Ebdelayê Dağistanî berdewam kir. Û piştî ku ew jî li sala 1973an mir, Şêx Husên bû rêberê rêola Neqişbendî.

Di asta bilind de ji çalakbûna Şêx Husên, hejmara mirûdên wî li Sûrya, Lubnanê û li Ewrupayê digihîşt çend hezaran.

Piştî ku Şêx Husên zanîna dînî kuta kir, wî xocetî li gundê xwe kir. Û pişt re, bû pêşîmamê mizgefta gundê Sariya. Û gava ku mizgeftek li gundê xwe ava kir, dora 20 salan li wir jî bû pêşîmam û peyvdarê (xetîb) mizgeftê.

Ji bawermendên Neqişbendî yên navdar li Efrînê, Nûriddînê Diyarbekirî hebû. Ew di şoreşên Kurdî yên salên 1925an, û di ya Dêrsimê de li sala 1937an beşdar bû bû, pişt re ew penaberî Sûryê bû bû. Wî li Sûryê Şêx Husên nas kir, û li destpêkê bû Îmamê mizgefta Gu.Be'dîna, paşê jî li Gu.Mîrka bû îmam. Wî helbest bi Kurmancî, Erebî û Farisî jî dinivîsand. Nûriddîn li salên şêstî ji sedsala bîstan mir û li Şamê li cihê ku zarokên wî lê rûdinin, hat veşartin.

Gelek mirûdên Şêx Husên li Sûryê û li derveyî wê hene, Ereb, Kurd û bilî wan jî pêve girêdayî ne û wî mîna mirovekî zor çêxwaz û xudî dest dibînin.

Şêx Husên ji sala 1985an de li bajarê Efrînê rûdine, û li rojên duşemê û pêncşemê li gel mirûdên xwe li mizgefta 'Elî bin Ebî Talêb zikra Xwedê dikin. Wî li sala 1998an erêkirina Zawîyeke olî ji ewqfa Helebê standiye. Şêx Husên dora bîst salan (salên heftê û heştê ji sedsala bîstan) perpirsiyarê ewqafa Efrînê jî bû.

Têkliyên şêx Husên bi rêberên Tevgera Mirûdan re, wek Şêx Henîf û Xocê Qorta re baş bûn. Pêwendiyên wî bi Şêxên Êzdiyan re jî baş bûn, bi taybetî bi Şêx 'Eliyê Berekêt re.

Şêx Husên mirovekî hişmend û gernas e, dizane çi dixwaze û çi dibêje. Wî zanebûna xwe ji jiyana xwe ya dirêj wergirtiye.

Kurê wî yê mezin 'Elî, di warê nasandina rêola Neqişbendî de lêkolînan çê dike û pirtûkeke wî bi navê “Rêola Neqişbendî ya Xalidî ya Daxistanî” hatiye çap kirin. Guman heye ku 'Elî destê bavê xwe rake û şûna wî bigire.

Şêxekî rêola Neqişbendî yî din jî ji Efrînê heye, navê wî Ebdiletîfê Kurdî ye, ew ji Gu.Cilbirê ye û li bajarê Minbicê rûdine. Gelek mirûdên wî li nav Kurdên Kobaniyê û li deverên Urfê - Tirkiyê hene.

Hêjayî gotinê ye, ku rêberê Tevgera Mirûdan, Şêx Îbrahîm Xelîl jî bawermendekî rêola Neqşbendî bû. Pişt re şêx Henîf destê wî rakir û rêbertiya mirûdan kir. Û piştî ku Şêx Henîf li sala 1949an hat kuştin, rêbertî ji Reşîtê Îbo re, pişt re ji Xocê Qorta re û paşê jî bi Mûse Ne'sanê Bijêrek ji gundê Gewenda hat hilpesartin.

Li dema têkçûna Tevgera Mirûdan li dawiya salên çilî ji sedsala bîstan, Mûse Ne'san bi Şêxê Mirûdan Şêxefendî (Îbrahîm Xelîl) re çû bû, ew dora deh salan li ba wî li Tirkiyê ma, û piştî ku vegerî Sûryê rêbertiya Mirûdan radestî wî bû. Mûse Efendî heftê û pênc salî ye û li Helebê rûdine. Ew mirovekî hişmend û bi rû ye, baş bi Tirkî dixwîne û dinivîse, û hîn jî bi dilûcan ji Şêxefendî re dilsoz e.

Roja îro, wek piraniya Rêolan, şopedarên ku li ser rêola Neqişbendî mane hindik bûne, çinkî gelek ji wan mirin, yên mane jî kal bûne.

### - **Şêxên Şêx Êĥmo Rifa'î û Qadirî)**:

Gundê Şêx bi Şêx Êĥmo ango bi bapîrê vê malbatê bi nav bûye. Şêx Êĥmo mirovê yekê bû, ku li wî cihî rûnşit û gund ava kir. Ew berî wê li Gu.Dîkê rûdinişt.

Eger em ji Şêx Êhmo de dest pê bikin, emê kani bin kur û neviyên wî wiha li dû hev bijmêrin: Şêx Êhmo, Şêx Sîdî, Şêx Evdî û Mihmed Gulîn 58 salî ye, em jî niha di sala 2002an de ne.

Şêxên Şêx Êhmo ji hoza Şêxa ne, şêxên Qenterê û yên Qestela Kîşik jî mirovên wan in.

Malbata Şêx Êhmo malbeteke mezin e, li Gu.Şêx, Avraz û li bajarên Efrînê û Helebê rûdinin. Mamoste Emînê Şêx Gulîn ku neh salan ji ber xebata Kurdayetiyê ve di girtîgehên Sûryê de mabû û hîn jî di tevgera siyasî ya Kurdî de dixebite, ji vê malbatê ye.

Şêx Êhmo û kurê wî û neviyên wî, nexwaş derman dikirin û pirsgirêkên civakî jî çareser dikirin, bi tevahî ew cihê rêzdariya civaka xwe bûn û baweriya xelkê pê dihat. Şêxên Şêx Êhmo xudanên du rêola ne, Rifa'î û Qadirî.

Li şevên Înan, bi dehan mirûd û mirov dihatin mala Şêx, ew pîroz dikirin, û tika pêkanîna hêviyan li ber Ûcaqê wî dikirin(1).

## - **Şêxên Meydankê**:

Pêwîst e em zanibin, ku damezrawê rêola Qadrî, Şêx Ebdilqadirê Gêlanî (1076-1166)an/z ji bajarê Ceylanê bû, ew bajar li aliyê başûrê derya Qewzwînê ye. Jêderên dîrokî dibêjin, ew Kurd e /B.Nîkîtîn, rûpel 203/, û ew bixwe jî dibêje: Ez 'Ecemekî ji Ceylanê me(2).

Wek tê zanîn, hemî xudanên rêolan hewil didin, daku koka xwe ya malbatî bigihînin malbata Pêxember Mihemed. Şêxên Meydankê jî ji vê yekê ne dûr in. Lewre dema ku me li dara malbatî ya şêxên Meydankê nihêrî, me dît ku wan jî xwe gihandine 'Elî kurê Ebû Talêb. Lê gava me hesabê temenên her neweyekê kir, hat dîtin, ku navên di dara malbatê de hene, tenê 900 sal ji tevahiya temenê

---

1- Şêx Ehmed Mihidînê Rifa'î (1118-1182)Z damezrawê rêola Rifa'î ye. Ew li başûrê Êraqê jidayîkbûye û lê miriye. -Damezrawê rêola Qadirî jî Şêx Ebdilqadir kurê Mûse kûrê Cengî Dostê Ceylanî ye. Ew li bajarê Ceylanê li hêrêma rojavaya derya Qizwînê hatiye jiyanê. Li Baxdadê rûdinişt û li sala 1165/z goça xwe barkir.

2 - Dr. Ebdilrezaq Elgêlanî: Pirtûka Ebdilqadir El Ceylanî, pirtûkxana Dar El Qelem, rûpel 115 û 118.

Îslamtiyê ku 1423 sal e, digrin. Ango valahiyeke navan li dirêjiya dora 500 sal heye, ew jî nêzîka 40 navî ji wê darê kêm dike, û herwiha ev rastî gotina têkliya mirovantiya wan bi Qureşiyan re pir lawaz dike.

Di nav navên dara malbatê de, navine Kurdî yen resen hene, ew jî hîn gumanê li ser gihandina malbata wan bi Pêxember Mihemed re bilind dike.

Lê ya ku malbatê li ser li hev kiriye, ew e, ew ji aliyê netewî de Kurd in, ji hêla olî de jî Misliman in û li ser rêola Qadirî ne.

Tiştê baş naskirî ew e jî, ku bapîrê wan yê yekê "Şêx Îs" li Gu.Şêx Îs li rojhilata bajarê Tilrifadê rûdinişt. Ew di nava civaka xwe de bawermendekî bi rû bû û cihê rêzdariyê bû. Du lawên wî Îs û Salih û keçek wî hebûn[1]. Piştî mirina Şêx Îs, zaroyên wî ji wî gundî barkirin û berve Çi.Kurmênc hatin.

Ew li destpêkê li nav Robariyan li Gu.Aqîbê rûniştin, pişt re çûn Bilbilê û demekê lê ma, ji wir jî çûn gundê Bêkê-Bilbilê, û paşê hatin li Gu.Naza bi cih bûn. Li Gu.Naza, xudana gund pêşniyar kir, ku herin li cihê Gu.Meydankê yê niha rûnin, û herwiha Şêx Îsê Lawîn û birayên xwe ji wê hîngê de li wir bi cih bûne[2].

Li wê demê, radeke olî û civakî ye baş li gundên derdorê ji Şêx Îs, zaro û neviyên wî re çê bû. Rêzdariya wan a olî ra navîna sedsala bîstan dihat girtin. Xelkê ji bo çareserkirina nexwaşan, mêtina jehra maran… û hwd, xwe li wan digirt. Tiştine wan en din jî hebûn, wek lixwexistina şîşan û lîstina bi êgir û hwd.

Li serdema Firensî li Sûryê, şêxên Meydankê dijîtiya wan kir, û tu kes ji wan derbas nava Milîsên Firensî ne bûn. Li bervajî wê, Şêx Evdî kurê Xoce kurê Şêx Salih bû endamê hêza Çeta û li ber Firensiyan rabû, ji ber wê yekê jî, ew revî Tirkiyê, li wir mir û li Entabê hat veşartin, neviyê wî jî niha li Stembûlê dijîn.


Şêxên Meydankê li salên sihî ji sedsala bîstan, bi sedema Tevgera Mirûdan bûn du alî, hin bi Tevgerê re bûn, hin jî li dijî wê bûn, û li

---

[1]- Gerdişa binavkirina lawan bi navên bavan, hîn li Meydankê heye.
[2] - Belkî ew NAZ AN bi xwe be, ya ku gundê Naza pê bi nav bûye.

ber bayê wê yekê, du kesên wan hatin kuştin û Mirûdan birayê Şêx Evdî, ku berê çete bû, li sala 1938an kuşt.

Mirovê ku li dawiya sedsala nozdehan û destpêka sedsala bîstan destê rêola Qadirî hilgirti bû, Şêx Me'mo Zêno kurê Hec Osmên kurê şêx Sêlih bû. Peyebilindiyeke wî ye olî û civakî hebû û mirûdên xwe jî hebûn.



**Şêx Îsê Şêx Zêno**

Piştî mirina wî, kurê wî Şêx Îs destê wî rakir, lê li dema wî, rol û giringiya şêxitiya tevahiya rêolan li navça Efrînê kêm bû. Şêx Îs li sala 1997an mir, û bi mirina wî kizota şêxitiyê li Meydankê vemirî.

Pêwendiyên şêxên Meydankê bi axeyên Şikaka re, ku ji koka xwe de Êzdî ne, baş bûn. Têkliyên wan bi riya jinanînê, bi Axeyên mala Şorbe re jî baş bûn.

Ji nîvê diduyan de ji sedsala bîstan, neviyên şêxên Meydankê pir guh dane doza gelê xwe yê Kurd, û ji ber ve xebitîne. Parêzer Îbrahîm Ehmed di wî warî de baş naskirî ye.


Malbata Şêx Îs malbateke mezin e, bêtirî nîvê gundê Meydankê jê ye, gelek rewşenbîr, xwendevan û mirovên ku ji gel û welatê xwe re sûdar in, di nav wan de hene.

### - Şêxên Bablîtê (Şêx Ebdilhenan)

Ew ji rêola Rifa'î ji xeta Qadirî ne. Koşeya wan ya zikrê ji zûde heye, lê wan li sala 1998an rêdana fermî ji ewqafa Helebê standiye, û li şevên Înê li gel mirûdên xwe tê de zikir dibin. Xelkê bawer dikir ku Şêx Ebdilhenanê Kal xwedî keramet bû, wî şîş li xwe dixistin, bi êgir dilîst û karê çareserkirina nexwaşan dikir.

Belgeyek li ba mala Şêx Ebdilhenên heye, li sala 1926an ji hêla hin mixtar û navserên navçeya Çi.Kurmênc de hatiye morkirin, mora misteşarê Firansî li navça Çi.Kurmênc jî li bin e, li gor wê

belgeyê, Şêx Ebdilhenan kurê Şêx Mihemed, wek serokê hoza Şêxan hatiye binavkirin[1].


**Şêx Ebdilhenan**

Belgeyek ji dawiya sedsala nozdehan ji serdema Osmaniyan de li ba mala Şêx Ebdilhenên heye, morên mirovên navser û rêberên hoza şêxan li Navça Sirûcê li bin in, wan li gor wê wekaletê, rêbertiya olî û civakî ya hoza Şêxan li ((Kurdistanê, Erebistanê, Hindistanê..)) xistine destê Şêx Ebdilhenanê kal.

Navê Ebdilhenên di hin jêderên rêola Rifa'î de jî hatiye. Gava ku pirtûka /Bewarêq El-Ĥeqayêq ya Mihemed Elî El-Rrewwas, mirina wî li sala 1861ê ye/, çêre bawermendên navdar ên di navbera Helebê û Kilisê de dibe, ew wiha jî dibêje: ((Mirovek bi navê Ebdilhenan heye, ew xudî zikir û dest e…)), ji gotina wî xuya dibe, ku hîn li wê demê koşeya zikrê ya Ebdilhenên hebû.

Dara binyata malbatî ya mala Şêx Evdilhenên wan digihînin Qureşiyan ji mala 'Ebid Munaf û Ibrahîm Xelîl!!. Lê belê, dora bîst navên dawîn ji wê darê, navine ji civaka Kurdî ne, û navên mîna “Can” jî li pêş wan hene, ji bilî ku demine dirêj ji darê bê nav in, û vala ne.

Di dara malbatê de navê Şêx Misafir jî heye, ew jî navê Şêx 'Adî bin Misafir, mirovê herî pîroz li ba Êzdiyan tîne bîra mera. Di wê darê de diyar dibe, ku gelek Şêxên hoza Şêxan zanînên xwe ji kesine bi navê Pîr birine, Pîr jî pilevaniyeke olî ye li ba Êzdiyan.

Gelek caran hatiye jî, ku bapîrên wan Xerqe û Meqes ji filan kesî birine, yan filanî li xwe kiriye. Xerqe jî ciline pîroz û naskirîne li ba Êzdiyan û nasikên ola Êzdî wan li xwe dikin.

Pêwendiyên şêxitiya mala Ebdilhenên bi dewleta Osmanî re baş bûn[2]. Lê bi Firensiyan re ne wilo bû. Mala Şêx Ebdilhenên li dijî

---

1 - Di nasnama Osmanî ya Şêx Mihemed de wiha hatiye: Ew jidayîkbûna sala 1824an, xane /1/, Mezret Elxetîb a bi ser Kilisê ve, ew ji rêola Henefî ye. Gora Şêx Mihemed li wî gundî ye.


2- Şêx Mihemed waliyê Helebê Topel Osman Paşa ji Filîçê çareser kir, wî jî rabû hespek û bakûrek diyarî wî kir, ew bakûr hîn heye.

Tevgera Mirûdan sekinîn. Ev malbata li bakurê Kurdistanê li navça Sirûcê, di nav hoza Şêxan de xudî rêzdariyeke bilind e.

Li destpêka sedsala bîstan, malbata Ebdihenên gundê xwe yê berê Mezr'e (li kêleka Gu.Me'riskê ye) firotin û hatin li Kurzêla Cûmê, paşê li Maratê û paşê jî li Gu.Bablîtê rûniştin. Li roja me piraniya wan li bajarê Efrînê rûdinin.

Li sêyeka dawîn ji sedsala bîstan, Şêx Ebdilhenan şêxê rêkê bû, wî li sala 2000an jiyana xwe jidest da. Niha kurê wî yê mezin Ebdilqadir destê wî rakiriye.

## - Zanyarê Olî Îbrahîm Xelîl Îsa ((Xelîl Hemdo)):



**Mamoste:**
**Îbrahîm Xelîl Îsa**
**((Xelîl Hemdo))**

Îbrahîm Xelîl Hemdo, Zaniyarê olî û rewşenbîrê Efrînê ye naskirî ye. Gelek dost û şagirtên xwe hene, têkliya bi wan re di çarçewa şîret û şêwrê de ye.

Koka malbata wî ji Gu.Cilbirê ye. Lê ew li sala 1933an li gundê Kaxrê ji dayîk bûye.

Îbrahîn Xelîl ji salên 1939an de û ra 1942an li ber xoceyê gund xwend. Pişt re, ta sala 1949an li dibistana Efrînê ya seretayî xwend, xwendina xwe ya navîn jî li Helebê li sala 1952an bi dawî kir.

Wî di ciwaniya xwe de, ji ber sedemên civakî, ra sala 1955an di partiya Komonîst de kar kir. Lê ji sala 1955 de û ra 1959an bû Pêşîmam û peyvdarê mizgefta gundê xwe.

Pişt re, wî şihada lîse û şihada Şerî'e ji zanîngeha Şamê qedand û bû mamosteyê zanîna olî li dibistanên bajarê Minbicê, pişt re çû Erebistana Si'ûdiyê, şeş salan li dibistanên wê karê mamostetiyê kir, li sala 1983an vegerî bajarê Efrînê û ra sala 1991an di dibistanên wê de dersên olî didan, û ji wê demê de peyvdariya nimêja Înê li mizgefta Sidîq li bajarê Efrînê dike û karê Ewqafê jî hildaye ser milê xwe.

Em bawer dikin, ku pirtûkxana wî ya taybet, a herî dewlemend e li Na.Efrînê, 1709 pirtûk di 2347 miceledan de û ji her warekî zanînê tê de hene.

Ew bi zimanê Erebî dinivîse, pirtûk û berhemên wî yên nivîskî ev in:

1. “El Mewarîs di şerî'eta Îslamî de”. Vekolîneke Ekedîmîk e, ji 850 rûpelan di du miceledan de ye.
2. “Rêwresmên Ĥecê li gor çar rêyolan”, nameke di 90 rûpelî de, li Erebistana Si'ûdiyê hatiye belavkirin û li Sûryê jî hatiye çapkirin.
3. “Elwesît fîl tecwîd”. Namek ji 85 rûpelan e, hatiye çapkirin.
4. “Meqayêês, mekaîl û ewzanên kevin li raberî yên sedsala bîstan”, destnivîseke bi Erebî ye û werdigerîne Kurdî jî.
5. “El Wesît fîl mewarîs” li gel nexşeke wîrasî.
6. “ Laveyên navdar”, destnivîs.
7. “Mafê Pîrekan, bi zimanê Kurdî.
8. Helbestin bi Kurdî ji salên pêncî de ji sedsala bîstan.

## Mizgeft li navça Efrînê

Mizgefta yekê ku li navça mîritiya Kilisê hatiye avakirin, li bajarê Ezazê, li serdema Eyûbiyan ji hêla qeral Ĝiyasiddînê Eyûbî ve hatiye avakirin. Mizgeftek li sala 1495an jî li bajarê Kilisê hatiye avakirin. Li sala 1543an, Elî Axa ku şaredarê Kilisê bû, Tekiyeke Mewlewî jî lê ava kir. Mizgefta Canpolêt jî li sala 1553an li bajarê Kilisê hatiye ava kirin.

El Ĝezzî dibêje, ku li dawiya serdema Osmanî, şêniyê Kilisê zor oldar bû, û 27 camî, 12 mizgeft, 4 ûcaq û sê kinîse lê hebûn.

Lê bi taybetî navça Çi.Kurmênc, tu mizgeftên kevin li gund û bajarên wê netên dîtin, belkî ji ber ku navendên bajarvaniyê yên mezin li navçê tunebûn, gund biçûk bûn û şêniyê wan jî hindik bû. Ji bilî ku, li navçê, nemaze li gundên deşta Cûmê, ola Êzdî serdar bû.

Piştî ku Efrîn bû navenda navçeyê, avahiya olî ya destpêkê ku lê hat avakirin Kinîseke Ermenan bû, ew li salên sihî ji sedsala bîstan hat avakirin.

Mizgeftên herî kevin li navça Efrînê ji heştê salî û vir de ne. Ji mizgeftên ku li destpêkê hatine avakirin ev in:

1- Mizgefta Nebî Horî li sala 1276/g=1859/z bi ser avahiya goreke Romanî ku ji sedsala sisiyan zayînî de ye, hatiye zêdekirin, û birca gorê jî mîna minare hatiye bikaranîn. Mêravek di bin bircê de heye, lêkolînvanên şûnewarî dibêjin, ew gora evserekî Romanî ye, lê Ibin El-Şuĥnê di /rûpel 225/ de dibêje, ku ew gora Orya kurê Ĥenan e. Ew mizgeft di salên sihî de ji sedsala bîstan navendeke girîng bû ji Tevgera Mirûdan re, Şêxê wan peyva nimêja Înê lê dida, û li dema me jî nimêjên cejnan lê tên kirin.

2- Mizgeftên Bilbilê, Meydankê, Mîrka û Kaxrê li salên bîstan ji sedsala bîstan hatine avakirin.

3- Mizgefta Meydana li sala 1931an, ji hêla Şêxê Mirûdan ve hatiye avakirin[1].

[1] – Ji bo ku Xêrên wan pir bibin, Mirûdan darên giran ji gundê Bêxçe û ji Çi.Gewr hildigirtin û ji bo mizgeftê tanîn.

4- Mizgefta Selahiddîn li bajarê Efrînê. Li ser minara wê wiha hatiye nivîsandin: **(Bi pereyên Xelîl Axayê Seydê Mîmê li sala 1937an hatiye avakirin)**.

5- Mizgefta Pîrozgeha Evdilhenên, ji hêla Nûrî Dêrsimî de li salên pêncî ji sedsala bîstan hatiye avakirin. Jêderên dîrokî dibêjin, ew pîrozgeh li ser mêrava birayê Pêxember Dawûd hatiye avakirin.

Di navbera gundên Xilalka û Çeqmaqa Çûçik de, Deşta Camiyê heye, guman heye, ku berê nimêjgehek li wir hebû, yan jî ew cihekî pîroz bû, xelkê nimêj lê dikir.

Bi tevahî, em kanin dîroka avakirina mizgeftên kevin li navçeyê wiha li dû hev rêz bikin: Şiyê, Bilbil, Gomîtê, Be'dîna, Mîrka, Kaxrê, Meydankê. Ew hemî jî li dehsala sisiyan ji sedsala bîstan hatine avakirin.

Li van du dehsalên dawîn, kargêriya Ewqafa Helebê zêde guh daye avakirina mizgeftan li navça Efrînê, nemaze jî li gundên ku Êzdî tê de hene, û herwiha roja îro bi dehan mizgeft li gundên navçê hene, û hîn jî tên avakirin.

## Pîrozgehên sereke li navça Efrînê

Gelek pîrozgeh û cihên ku salixên pîroziyê li ser hene li navçê tên dîtin, û li her gundekî bêtirî pîrozgeh û warekî pîroz hene. Loma jî bandoreke pîrozgehan e giring di jiyana şêniyê Çi.Kurmênc de hebû û hîn jî heye.

Pîrozgeh bi xwe, avahiyek e biçûk û kevin e, yan jî xirabak e, carina zinarek e, yan darek e li ber jêdereke avê, yan di nav kavilên şûnewarî de û hwd dibin pîrozgeh.

Pîrozgeha kilasîkî, avahiyeke biçûk, kevin, çargoşe û bi lod e, deriyê wê teng û nizm e û bi giştî li aliyê bakur e.

Di navber avahiyên pîrozgehên çiyê û deştê, û yên Misliman û Êzdiyan de tu cidatiyên giring ne tên dîtin[1].

Li deverên çiyayî bi tevahî, darek yan komek dar li cihê pîrozgehan hene. Ji ber wê jî, mirov kane piraniya wan pîrozgehan bi riya wan daran nas bike.

Bi tevahî, qurban li ber pîrozgehan tên kirin, û tuka çareserkirina nexweşiyan, bicihanîna hêviyan, barîna baranê û tiştine din jî li ber dergehên wan tên hêvî kirin. Li hêvarên Înê, mûm yan fîsikên zêtê di wan pîrozgehan de tên vêxistin, çinkî baweriyeke heye dibêje, ku çê nabe li wê şevê pîrozgeh bê ronahî bimîne. Ev bawerî agirên perestgehên Zeredeştiyê tîne bîra mera.

Bi tevahî, li ba her pîrozgehekê mêravek jî heye, gelek ji wan di hindurê avahiya pîrozgehê de ne, ew mêrav bi paçên kesk tên pêçan û tên pîroz kirin.

Piraniya wan pîrozgehan bi navên hin navdarên ola Îsalmî, û hin navên din ku ne nasin jî bi nav bûne.

Emê li vir, li ser hin pîrozgehên navdar li Na.Efrînê rawestin, **[Nexşe21]**:

---

[1] - Pîrozgehên ku deriyên xwe bi rojhilat de ne: Şêx Hemîd li Rojavayê Gu.Qestela Elî Cindo. Pîrozgeha Parse Xatûnê li ser Ci.Parsê. Pîrozgeha Şerfedîn li rojhilatê Gu.Baflûnê jî, deriyê wê li Rojava ye.

- **Pîrozgeha Henên**:

Ew pîrozgeh li kêleka Gu.Meşalê li ber riya Efrîn-Helebê ye, ew ji hêla hemî şêniyê navçê de naskirî ye. Li demên berê mehrecaneke olî û gelêrî ye mezin li ber wê dibû, û xelk ji hemî deverên navçê lê amade dibûn, lê ew ji dora pêncî salî de li dar nakeve.

Avahiya pîrozgehê ya berê biçûk bû, mêravek di hindurê wê de heye, berê wê mêravê bakur-başûrî, mîna gorên Cihûyan e. Lê li sala 1964an, Nûrî Dêrsimî avahiyek û minarek li ser pîrozgehê ava kir, hewşek da dorê û kir mizgeft, û ji xwe û ji jina xwe re du gor tê de amade kirin. Dema ku her duyan jiyana xwe ji dest da, li wir hatin veşartin[1].

Li derbarê vê pîrozgehê, Ibin El-Şuĥnê dibêje: Li gundê Meşĥelê, ji deverên Ezazê, gora birayê Pêxmber Dawûd heye. Ew gundekî bi darûber e û çem di ber re diherike…, /El Durr El-Muntexwb, rûp 97/.

Mezelê ku li dor pîrozgehê, bûye goristaneke tevahî ji şêniyê navçê re. Berê, çend gorên Cihûyan jî li wir hebûn, lê xuya ye ew li van salên dawîn hatine kavilkirin. Li hêla goristanê ya bakur rojava gorek heye, kêlikên wê bi rengê Fûteyan hatine çêkirine û wêneyên şûran û şeşar/dabanceyên çeqmaqî yên kevin li ser hatine nîgarkirin. Li ser kêlika wê gorê ya rojava wiha nivîsandine: **[Mihemed kurê Hec Eliyê Kurdî, mirina wî li meha Recebê sala 1266g/ 1849z]**.

Pîrozgeha **Pîr Ce'fer** jî dora 50 mitrî li bakurê pîrozgeha Henên e, ew pîrozgeheke Êzdiyan e, lê ji ber navûdengiya pîrozgeha Henên, ew hatiye ji bîr kirin. Mêrava di hindurê wê de jî berê xwe Bakur- Başûrî ye.

**Pîrozgeha Menên** jî li ser bêla Menên li jorî gundê Serê Kaniyê ye, li derbarî wê jî dibêjin, ku ew gora birayê xudiyê pîrozgeha

---

[1] - Nûrî Dêrsimî li dîroka 22.8.1973an cangorî bûye. Jina wî Ferîde xanim jî li sala 1994an cangorî bû. Nûrî Dêrsmî ji rêberên şoreşa sala 1937an bû li bakurê Kurdistanê, piştî ku şoreş têk çû, ew penaberî Sûryayê bû, û ra dawiya jiyana xwe li bajarê Helebê rûnişt. Dr.Nûriddin Zaza ev helbest li boneya mirina wî nivîsandiye û li ser gora wî hat nîgarkirin. **Dil birînim bi nalîna welat: Li ser vê riya dijwar… Min jî kir pir hawar… Da ji bo we jî rojekê… Dunya bibe gulbuhar**

Henên e, avahiya wê kalsîkî ye, jêderine dîrokî dibêjin, ew jî ji dema Pêxember Dawûd de ye.

Digel ku Henan û Menan kesine ne nas in, serdem û nasnama wan ya olî jî ne diyar in, lê ew her du nav wek navine kesan, pir li navçê bi kar tên.

- **Pîrozgeha Mihemed Elî:**

Ev pîrozgeha li navbera gundên Holîlê û Kûra di geliyekî bi darûber û kûr de ye. Avahiya wê bi darên zêtûn û sindîganê hatiye pêçan. Goristaneke mezin li kêleka wê heye. Li ber deriyê wê, li hêla bakur, dareke sindîganê ye mezin heye, bi sedan paçikên rengîn ji hêla seredanî û pîrozkeran pê ve hatine girêdan.

Roja seredana pîrozgehê Çarşem e, qurban li wê rojê tên kirin. Ev roja, pîroziya Çarşemê li ba Kurdan, nemaze li ba Kurdên Êzdî tîne bîra mera. Navê Mihemed Elî li nav şêniyê gundên derdorê pir tê bikaranîn, lê belê ew kesê ku navê xwe daye pîrozgehê ne naskirî ye.

- **Pîrozgeha Qere Curnê:**

Ev pîrozgeha di geliyê Qerecurnê li ber pira Qerecurnê ye. Avahiya pîrozgehê kilasîkî ye. Roja wê ya pîroz Çarşem e, û mirîşkeke reş li ba Pîrozgehê tê şerjêkirin.

Dîroka pîrozgehê ne diyar e, lê li ser deriyê wê ev deq hatiye daliqandin: **((Ev pîrozgeh li ser navê ciwanemergê bi navê HOGIR hatiye avakirin. Ew neviyê Kahinekî Zeredeştî bû ji Gu.Endarê. Ew li sedsala yazdehan rêberekî serbazên Noriddînê Zengî bû, dema ku ew ji şerê rizgarkirina Rihayê ji destê Bîzentiyan vedigerî, li wir hat kuştin)).**

Pîrozgehê navê xwe ji curnekî kevirî û reş ku li wî cihî bû, biriye. Lê wek tê gotin, ew curn li ber lehiyeke gelî çûye.

- **Pîrozgeha Siltan Şêx Mûs**:

Ev pîrozgeha li deşta Meydana li başûrê Gu.Gewenda ye. Ew di nava goristaneke fere de ye, û gelek darên sindîganê li dora wê hene. Gelek kevirên şûnewarî yên şekirî yên mezin jî li nav goristanê û li derdorên wê li ser rûbereke dûz belav dibin. Kevirên

wan şûnewaran, şûnewarên Çi.Lêlûn ên Romanî û Bîzentî tînin bîra mera.

Pîrozgeha Siltan Şêx Mûs ji hêla şêniyê gundên Meydana ve tê pîrozkirin, li wê deverê, navê Şêx Mûs ji bo binavkirina lawan tê xebtandin. Wek tê gotin, navê diya Şêx Mûs 'Eyş bû, û xûşka wî Siltan bû, ew nav jî pir ji bo keçikan bi kar tên.

Li ser deriyê pîrozgehê bi nivîsa Osmanî dîroka 1300/g=1882/z. û navê xudanê mêravê Şêxmûsê 'Enzelî hatiye nivîsandin.

Gundî dibêjin, Şêx Mûs kesekî ji devera Şiyê bû û şivantiya bizinan dikir. Rojekê ew bi zinekariyê hat gunehbarkirin û hat kuştin. Berî ku ew were kuştin, wî tembiya xwe kir, da li deşta Meydana were veşartin. Wê hîngê çar mirovan darebesta wî hilgirt û gihandin deşta Meydana, û gava ku li wir danîn, kevirek ji serê çiyê tol bû, hat li dora darebestê gerî û li kêleka wê rawestî!!. Wê hîngê wan termê wî li wî cihî veşart. Çêrok dibêje jî, gava ku ew mirov vedigerîn Şiyê, Xwedê ew li nêzîk gundê Qerebaba kirin Beraz (xenzîr)!.. hîn jî cihek li wir heye, bi navê “Gêdûka Donĝizan-Berazan” tê nasîn.

Gundî dibêjin, carcaran, rûdawên pîroz li ber gora Şêx Mûs diyar dibûn!.. loma jî wan ew avahî li ser gora wî ava kirine.

Hêja ye em bêjin, ku heft senceqên Êzdiyan hene, her yek ji wan destnîşana pêriyekî dike, yê gewretir senceqa 'Enzel e. 'Enzelî, ango Îbrahîm El-Eenzelî jî, şêxekî Êzdiyan ji nofa Qatanî ye û hempayê Şêxûbekir e. Belkî jî, ji ber ku Şêxmûs Êzdî bû û ji nofa Qatanî bû, ew bi 'Enzelî hatiye binavkirin, guman dibe ku wî li wir nasiktî dikir, û gava ku mir li wir hat veşartin û xelkê gora wî pîroz kir.

- **Pîrozgeha Ebdirehman bin 'Of**:

Pîrozgeh li bakurê Gu.Kanîgewrkê ye. Girekî şûnewarî û kaniyeke avê li kêleka pîrozgehê hene, mezelekî kevin jî li başûrê wê ye. Pîrozgeh du ode ne. Mêravek di oda rojava de heye, kevirek li tenişta wî danîne, navê pîrozgehê û salixên wê bi nivîsîna Osmanî li ser kirine, pasewanê pîrozgehê got, gava ku avahî hat perpînkirin, ew kevir ji dîwêr derxistin, yekî bi nivîsa Erebî li şûnê danîn û ev biwêj li ser nivîsandin: Ev mêrava Ebdirehman Kurê 'Of e.

Gava ku me li ser dîroka pîrozgehê ji pasewanê wê pirsî, wî got: Ebdirehman bin 'Of (43/b.g -32/g= 581-652/z) li vir birîndar bû, û ev mêrav ji bo wî hat avakirin. Lê belê tu jêderên dîrokî bi bîr nînin ku ew Siĥabe li van deran birîndar bûye, yan jî gihîştiye vê deverê.

Mirovên ji hemî ol û netewan tên ber vê pîrozgehê, ew bi taybetî jî, ji bo hêviya avisbûna jinan tê pîrozkirin!.

- **Pîrozgeha Qaziqli**:

Ev pîrozgeh li ser Çi.Qaziqlî ye. Pîrozgeh di nava daristaneke merxê de ye. Avahiya wê odeke biçûk e, di nav goristaneke şûnewarî ye kevin de ye. Şêniyê gundên derdorê tên ber wê û qurbanan li ber dikin. Gelek kesên wan gundan bi navê pîrozgehê bi nav bûne.

Li derbarê navê Qaziqli: “Qaziq” Bi Turkî û Kurdî bi wateya (Stûn) tê, “li” jî parkîteke Tirkî ye, wek veqetandek bi kar tê. Ango wateya bêjeya Qaziqli ya tevahî dibe “Stûnî, yê Stûnî”. Stûnî jî nofek ji bawermedên ola Fileh bûn, nasiktî li ser stûnan dikirin û bi wî navî hatine nasîn. Stûniyê destpêkê Sem'anê Stûnî bû. Ev şêwe ji perestvaniyê ra sedsala panzdehan li navça me hebû. Wek me got, mezelekî kevin û şûnewarên Alefiringî li cihê pîrozgehê hene. Herwiha, li ber roniya raveya jorîn, gumana pirtir ew e, ku têkliya pîrozgehê û navê wê bi nasikên Fileh û Stûnî re heye.

- **Pîrozgeha Şêx Cemaldîn**:

Ew pîrozgeh li başûr rojavaya Gu.Coqê bi nêzîka 1/km ye. Avahiya wê kilesîkî ye. Gundên derdorê mîna Coqê, Dargirê… wê pîroz dikin. Navê Cemal jî pir li wan gundan tê bikaranîn. Tê gotin, ku Şêx Cemaldîn kalikê Şêxê Mirûdan Îbrahîm Xelîl ê çaran bû. Lê guman heye, ku ew zanîn yek ji tewatîrên serokê Tevgera Mirûdan bû, daku cîlaweke olî ye dîrokî bi ser bapîrên xwe de berde.

- **Pîrozgeha 'Elî Dede**:

Li rojhilata Gu.Anqelê li ser pozê bilindiyekê ye, ku bi ser geliyê Circim de xûz dibe. Avahiya wê dest nîşan dike, ku ew ji serdemên berî Îslamê de ye. Ji navê wê jî tê zanîn, ku ew a bineola 'Elewî ye. Şêniyê gundên wan derdoran, wek gundên Anqelê, Senarê, Hêkiçê… wê pîroz dikin.

## - Pîrozgeha Şehîd Mûrad

Ev pîrozgeha li deşta Dirûmiyê li ber kaniya Dirûmiyê ye. Şêniyê gundên Şêtana, Sariya, Be'dîna, Ereba… tên ber wê.

### Pîrozgeh li Şiyê:

- **Bizilme Dede**: Li navenda gundê jêrin bû.
- **Sari Baba**: Li nêzîk gund li kêleka rêkê ye. Avahiya wê kilasîkî ye. Dareke Çinarê ye mezin li ber e.
- **Xidir**: Li nav mezelê gund e.

Navên hersê pîrozgehan ji çanda bineola 'Elewî ne, ew jî dest nîşan dike, ku berê 'Elewtî li wê deverê hebû.

Ji hêleke din ve, Ibin El-Şuĥnê di El-Durr El-Muntexeb de, di rûpela 127an de gotiye, ku **((gora Yûsif kurê Esbat li gundê Şiyê ye))**. Lê ew gor niha ne nas e, belkî jî têkliya pîrozgehekê ji wan bi wê gorê re hebe.

# Ola Êzdî li Çi.Kurmênc

Nêrînên nivîskar û lêkolînvanan li derbarê ola Êzdî têvel in. Hinek wê vedigerînin olên Arî yên kevnar. Hin jî dibêjin ew ji bermahiyên oleke welatê Mezopotamiya ye. Hin din jî bawer dikin, ku ew perestvaniya Iblîs dikin, yan şopedarên Yezîd kurê Mi'awyayê Umewî ne… û hwd.

Lê belê, Êzdî dibêjin, ola wan li dema berê bi navê Ezdahî yan Ezdayî dihat nasîn, û ew ji dîrokeke pir kevin de, ango ji destpêka dîrokê de pêbawerên ola Xwedê bûn.

## Bawerî û perestvaniyên sereke di ola Êzdî de

Baweriya Êzdiyan bi Xwedêyekî tek û bitenê heye. Ew pê bawer in, ku wî her tiştek afirandiye û hemî afrande û Pêrî bi fermana wî dilivin. Di nav Pêriyan de heftên gewre hene, ew di paytexta Xwedêwî de xizmetkarên sereke ne. Her yek ji wan Pêriyan bi Şêxekî tê nimûnandin: Dirdaîl bi Şêxesen, Israfîl bi Şêxêfexra… şana Ezazîl "Tawûs Melek" jî balindeyê Tawûs e. Xwedê Tawûsî Melek kiriye serokê Pêriyan û birêvebirina gerdûn û afrandeyan xistiye destê wî[1].

Baweriya Ezdiyan bi dinya, qiyamet û axretê, ĥeşir û ĥesêb, ecir û sewabê, pira sîratê û gelek tiştên olî ên din bi temamî heye.

Bi tevahî, bawerî û perestvaniyên Êzditiyê yên sereke, û şêwazên pêrabûna wan ev in:

---

[1]- Balindeya Tawûz şanşûreta serbilindî, qiyametê herdemiyê ye, / Fîlîp Sîrinc, şanşûret di huner, ol û jiyanê de, rûpel 194-195/.

1. **Nimêj an Lave**: Piştî ku bawermend avadaz dike, berê xwe dide rojê, destên xwe vekirî datîne ser sîngê xwe, xwe dispêre Xwedêyê xwe û laveyên nimêjê dibêje.

2. **Zekat:** Li ser mirovê Êzdî ferez e.

3. **Hec**: Hec li Lalişê li ber mêrava Şêxadî li Kurdistana Êraqê tê kirin. Dema wê li 6 meha Tişrîna Yekê ye, û heftakê dirêj dike.

4. **Rojî**: Du demên rojiyê yên sereke hene.

- Rojiya Ferzê, yan **Rojiya Êzîd**: Sê roj in, li roja Sêşema yekê ji meha Kanûna Yekê li gor demjimêra Rojhilatî dest pê dibe, sê rojan dirêj dike û roja Înê dibe cejn û bi /**Cejna Êzîd**/ tê binavkirin.

- **Rojiya Çele**: Li du werzan tê kirin. **Yek**: Çelê Zivistanê, ji serê zivistanê de dest pê dibe û çel rojî dirêj dike. **Didu**: Çelê Havînê, li destpêka werzê havînê tê girtin û ew jî çel roj e.

## Cejin û minasebeyên Êzdiyan li Na.Efrînê

Gelek cejin û rojên pîroz li ba Êzdiyan hene[1]. Ji wan: Sersal, Êzîd (rojiyê), Çilên rojiyê, Simata Çelmîrê, Bilinde, Xidir Ilyas, Qapax, Cumayê... Lê cejnên ku Êzdiyên Efrînê li dar dixin ev in:

- **Sersal:** Cejna vejîna Tawûsê Melek e. Ew dikev roja Çarşema yekê ji meha Nîsana Rojhilatî û bi navê Çarşema Sor bi nav dibe[2]. Karûbarên wê li ber pîrozgehan dibin, qurban tên kirin û ahengên gelêrî li dar dikevin.

- **Cejna Êzîd (rojiyê):** Me berê li ser dengkiriye.

-**Cejna Qurbanê :** Ew dikeve roja yekê ji cejna Qurbanê li ba Mislimanan. Li vê cejnê boneyeke Êzdiyan heye jê re “vekirina Tac Ĥile” tê gotin. **Tac Hile** jî, heft perçe cilên pîroz in, ji qumaşekî rîsî yî gizreyî û bi rengê mor hatine çîlawkirin.

Vekirina TacĤilan li siba cejna Qurbanê dest pê dibe. Xudanê TacĤilê qurbanekê dike, pişt re perçeyên Tac ĥilê li ser stêr rêz dike, û bawermendên Êzdî tên perçeyên Xerqeyê û destê Şêx maç dikin.

---

1- Ebdilrezzaq El Huseynî: Êzdî li niho û pêşeroja wan, çapa heftan 1980.

2- Demnasiya Rojhilatî 13 rojan li paş ya rojavayî dimîne. Li demên berê, dewleta Osmanî rojnameya rojhilatî bi kar tanîn.

Tacĥile li ba Êzdiyan wek ciline Ezmanî yen Nûranî û cilên Pêriyan tên dîtin, lewre jê re Xerqeya Nûranî dibêjin. Êzdî bawer dikin, ku Xerqeya yekê ji hiriyê beranê ku bi ser Îbrahîm Xelîl de daketi bû, hatiye ristin. Xerqe jî ji van perçan pêk tê:

1. **Tac.** 2.**Kulik:** Ew her du ji bo dana serî ne.
3.**Kember best**: Ji bo dana navê.
4. **Mêzer:** Deziyên wê ji hiriyê ne, dirêjiya wê dora 2/m ye, ew dezî li hev hatine badan û jê re Peng jî tê gotin,
5. **Cube yan Xerqe**: Ji pêşiyê de vekirî ye. Du piyên xwe yên dirêj hene, di bin wan de du qulik ji bo deranîna destan hene.
6. **Keşkûl:** Ji hiriyê hatiye ristin. Bi nola qufekê yan zembîleke biçûk e, ji ber wê jî carina bi zembîl bi nav dibe.
7. **Elekanî:** Piştek e, li navê tê gerandin.

## Pileyên olî û civakî li ba Êzdiyên navça Efrînê

Du rêbertiyên Êzdiyan hene: **yek**: Civakî/siyasî, mîr wê rêbertiyê dike. Baregeha wî li navça Şêxan li Kurdistana Êraqê ye, û her tiştên civaka Êzdiyan di destê wî de ye. **Didu**: Olî, Baba Şêx li ser pileya olî ya herî bilind rûdine, pileya wî li ba Êzdiyan mîna ya Baba ye li ba Filehan. Ew jî li welatê Şêx li Kurdistana Êraqê rûdine. Bi tevahî Baba Şêx ji nofa Şêxê Fexra ye.

**Parkirina olî:** Pilevaniya olî di Êzdîtiyê de ji jor de berve jêr wiha ye:

1- **Pileya Şêxan**: Ew li gor payebilindiyê parve sê beşan dibin: **Adanî**, jê: Şêxesenî[1], **û Qatanî, û Şemsanî**: Jê Şêxên Nasirdîn, Şêxê Fexra û Şêx Mend in.
2- **Pîr.**
3- **Mirûd:** Tevahiya Êzdiyên din in.

---

1- Guman heye, ku ew ji koka xwe de wiha ye: Şêxsin (Şêx=Xweda + Sin= Hêv), ango XWEDÊYÊ HÊVÊ. Şêx Sin li ba gelê Xaltî ku ji binekokên gelê Kurd e, Xwedêyê hêvê bû. /Dr.Xelîlê Cindî, rûp 18/.

Ev kesên bawermend jî hene: **Feqîr**(nasik), **Qewal**(peyvdar) û **Koçek** (kahin, zana). Van kesan ew rewş û kar jiberxweve vebjartine. Ew li Na.Efrînê netên dîtin.


## Pîrozgehên Êzdiyan

Bi şêweyekî tevahî, mera nikane pîrozgehên Êzdiyan ji yên Mislimanan cuda bike, nemaze li gundên deşta Cûmê û devera Şikaka. Lê belê li gundên ku hîn tev Êzdî ne, pîrozgehên wan jî ji wan re mane. Pîrozgehên em kanin bêjin ku yên Êzdiyan e, ev in:

**1.Parse Xatûn. 2.Şêx Hemîd**, ew her du li hêla Gu.Qestela Elî Cindo ne. **3.Hecerkê. 4.Melek Adî 5.Çêlxane**, ew her sê li dora Gu.Qîbarê ne. **6.Pîr Cefar,** li kêleka pîrozgeha Ebdilhenên ne. 7.**Şêx Şerfedîn**, li ber Gu.Baflûnê ye. **8.Şêx Rikab**, li Gu.Şadêrê ye. 9.**Şêx Sîdî** li Feqîra ye. 10.**Şêx 'Elî** li Basûfanê ye. 11.**Şêx Berkat** li ser Çi.Şêx Berkêt te. 12. **Ebû Ke'ib** li Gu.Ebû Ke'bê ye. 13.**Menan** li ber Gu.Serêkaniyê li ser bêla Menên e. **[Nexşe 21].**

## Zanayên olî û rêberên Êzdiyan li navça Efrînê

Rêberên Êzdiyan ên olî yên navdar di nîvê diduyan de ji sedsala bîstan li Na.Efrînê ev bûn: **Şêx Elî kurê şêx Berekêt**, **Şêx Ĥus** ji Gu Turindê, **şêx Husên kurê şêx Birîm** ji Gu.Xezîwê, û **Şêx Mihemed Kalo** ji Gu.Bircê.




**- Şêx Elî Kurê Şêx Berkêt /1930-1994/:**

Ji gundê Basûfanê ye, ji şêxên Şemsanî-Nasirdînî û ji hoza Dina ye.

Ew li sala 1949an çû Şengalê û ra sala 1955an li wir ma, ew li mala Feqîrekî ku Xerqe li xwe dikir dima. Piştî vegerê, ew li Gu.Qîbarê rûnişt û ra mirina xwe lê ma.

**Şêx Husên kurê şêx Hesen kurê Şêx Birîm:**

Ji nofa Adanî, ji şêxên Şêxesenî ye. Zanîna xwe ji apê xwe Şêx Husoyê Birîm û ji Şêx 'Elî kurê Şêx Berkêt biriye. Ew li gundê Xezîwê rûdine. Şêx Husên mirovekî dilfereh, lêbordar û zarxweş e. Temenê wî 68 sal in.



**Şêx Husên, şêxê Êzdiyên Efrînê**

- **Şêx Mihemed Kalo:**

Ji Gu.Bircê ye, rêwresmên olî dizane û pê radibe.

## Rêbertiya civakî:

Di sedsala bîstan de Dewrêşê Şemo ji Gu.Qîbarê û lawê wî Cemîl, rêberên civaka Êzdî bûn. Dewrêş Axa di sala 1925an de wekaleta Êzdiyên navçeyên Çi.Kurmênc û Ezazê ji Se'îd Begê Mîrê Êzdiyan li Welat Şêx wergirt, ew bi şêweyekî fermî bû serokê hozên Êdiyên Na.Efrînê û wek kevneşopiyeke civakî, navnîşana Axe jî wergirt. Wî li sala 1931ê jiyana xwe ji dest da.

Piştî mirina Dewrêş Axa, lawê wî Cemîl delametên bavê xwe radest kirin, û bi şêweyekî fermî bû rêberê Êzdiyên bakurê Helebê. Cemîl Axa li 11.12.1972an jiyana xwe jidest da.

## Rewşa Êzdiyan li Na.Efrînê

Mişextiyeke Êzdiyan e mezin ji Na.Efrînê berve bajarê Helebê û welatên Ewrupa çê bûye. Rêjeya mişextbûna wan ji navçê %50 derbas dike û hîn jî berdewam e.


Piraniya Êzdiyên ku li navçê mane li gundên xwe rûdinin û di çandiniyê de kar dikin, yên çûne bajaran jî di gelek warên aborî de dixebitin.

Êzdî ji hêla siyasî de mîna hemî Kurdan, di hemî rêxistinên siyasî yên Kurdî û ne Kurdî de jî dixebitin.

# Hejmara Êzdiyan li navça Efrînê

Serhejmara Êzdiyan cara yekê li sala 1932an hat kirin. Li wê salê destlata Firensî li Sûryê, nasname dan Êzdiyan û wiha tê de dihat nivîsandin: /Sûrî - Êzdê - Kurdî/. Bi rastî jî, ew cara yekê û dawiyê bû, ku bi şêweyekî fermî li Sûryê li hebûna Êzdiyan û Kurdan mikûr hatiye.

Roja îro, serhejmareke fermî ji Êzdiyên Na.Efrînê re tuneye, lewre me bi alîkariya Şêx Husên li sala 1995an, serhejmareke texmînkî ji malên Êzdiyan re li Na.Efrînê çê kir, li gor wê serhejmarê, 677 malên Êzdiyan li navçê hebûn, ew jî nêzîkî pênc hezar mirov dikin. Û ji ber ku rêjeya mişextinê ji navçê %50 derbas kiriye, em kanin bêjin, ku hejmara Êzdiyan a tevahî li navçê 10000î derbas dike. Êzdiyên ku li navçê mane jî, piraniya wan li deşta Cûmê li dora bîst gundan rûdinin, lê gelek malên wan li bajarên Efrînê û Cindirêsê jî hene.


الجمهورية السورية
REPUBLIQUE SYRIENNE
تذكرة الهوية
CARTE D'IDENTITÉ
الاسم والشهرة
Nom et Prénom :
ولد بتاريخ
Né le ... à ...
الاب
Le Père :
الام
La Mère :
المهنة
Profession
المسكن
Domicile :
وضعيته العائلية
Situation de famille :
N° de la carte : ... رقم تذكرة الهوية
N° du registre: ... رقم السجل

اشكاله
SIGNALEMENT
Taille ... القامة
Cheveux ... الشعر
Yeux ... العينان
Nez ... الانف
Teint ... اللون
Signes Particuliers ... علامات فارقة
الرسم الشمسي Photographie
التوقيع Signature
طابع الابهام Empreinte digitale
اعطيت بتاريخ
ضابط الاحوال المدنية في

**((Nasnama jinekê ji gundê Kîmarê ji sala 1934an. Di warê nêv de wiha nivîsîne: Bedriyê,Yezîdiyê, Sûriyê, Kurdiyê)).**

# Beşê Heftan

# Kurtelêkolînek
# Li ser rewşa siyasî
# Li navça Efrînê

# Lêkolîna Yekê

Li demên berî sedsala bîstan, guhertinên rêzanî li herêma Rojhilata Navîn bi bûyerên cengawerî yên mezin ve dihatin girêdan. Lê bi tevahî, kencên wan bûyeran li ser navçeke biçûk mîna navça Çi.Krmênc pir hindik bû.

Ji hêleke din de, sirûşta navçê ya çiyayî û dijwar, tenêtiyeke xwezayî li ser şênî, çi yên goçeber û çi yên gundî datanî. Ango şêniyê Çi.Kurmênc ji bajar û wargehên şaristaniyê ve dûr bû, ji xwe siyaset jî li wargehên bajarî tê kirin.

Di wan reweşan de, çalakiyên civakî û rêzanî li navça Çi.Kuemênc, bi tevgerên serokên hozan û rêberên civakê ve dihatin girêdan. Lê digel wê, siyaseta giran ku di çarçewa fere de dihat kirin -wek me li jor got- li dûrî wan, ango li paytext û bajarên mezin dihat kirin.

Bi tevahî, bûyerên rêzanî li navça Çi.Kurmênc li sedsalên berê, wiha dimeşîn:

**- Ji sedsal sêzdehan zayînî de û ra sala 1516an:**

Mîrên Mendî yên Kurd û neviyên wan ên Canpolatî, hewildidan daku serxwebûna Îmareta xwe li Kilisê ji destdirêjiya hakimên Helebê yên Memalîk biparêzin .

**- Di dema 1516-1607an de:**

Di wan salan de, Îmareta Kilisê ket bin baskê dewleta Osmanî, lê mîrên Canpolatî kanîn dora sedsalekî têkliyên xwe bi destlata Osmanî re bihîştana, û mafê malbata xwe di Îmareta Kilisê de biparastana.

**- Salên di navbera 1607-1918an de:**

Li vê demê, bûyerên siyasî û leşgerî wiha digerîn:

**Yek**: Serhildanên hozên Kurdî bi şêweyekî berdewam li hember zor û setema destlata Osmanî radibûn. Hin rêberên Na.Çiyayê Kurmênc jî hewildidan, ku li navçê serbixwe bibin, nemaze li

sedsala nozdehan, nemaze li demên ku lawazî li Stembûlê derdiket. Mîna serhildanên mala Gênc, hoza Reşî, mala 'Umê…

**Didu**: Qerez û nakokî li ser destlatdariya deveran di navbera hozan bi xwe de çê dibûn, carina jî destlata Osmanî pirsgirêk di navbera wan de çê dikirin, şer û fitne radikirin û pevçûn hêgin dikirin. Mebesta dewletê ew bû, ku nakokiyên civakî herdem gurkirî bimînin û berê Kurdan ji ser dewletê û zulma wê bidin alî.

**Rêxistin li Çi.Kurmênc:**

Kes tu tiştî li ser rêxistinên rêzanî û olî yên eşkere yan ên veşartî, li serdema Osmanî li navça Çi.Kurmênc nabêje.

Lê belê mîna ku tê gotin, pêwendiyeke ne diyar bi navê **Qilûmpe** di navbera çend kesan de li Çi.Kurmênc hebû, endamên wê bawerî bi olan ne tanîn û xû û sinciyên civakî yên kevin qebûl ne dikirin. Loma jî hin caran ew kes bi Masoniyê/Fermeson bi nav dikirin. Ji endamê "Qilûmpê" ku me kanîn navên wan nas bikirana ev bûn:

**Ĥenanê Jinebiyê** ji Gu.Qota, **Ĥido** ji Gu.Şiketka, **Xelîl kurê Ĥusfatîkê** ji Gu.Gabeleka li sala 1913an miriye[(1)].

Bi tevahî, navça Çi.Kurmênc bi van rewşên siyasî yên sade û li şûnmayî derbas Şerê Cihanî yê Yekê (Seferbêrlikê) bû.

Di rewşên dijwar yên wî şerê de, şêniyê navça Çi.Kurmênc jî keti bû deraqekî pir teng, li wan salan dewletê piraniya gêncan ajotin aniyên şer û bi sedan ji wan bêxeber man û winda bûn, tu gund li Çi.Kurmênc ne man ku bêtirî merovekî û diduyan di şer de winda ne kirin.

Ji bilî wê, birçîbûneke giran peyda bû û rewşên jiyanî û civakî pir teng û kavil bûn.

Ji hêla siyasî û baweriyan de jî, digel ku encamên leşgerî û siyasî yên şerê cihanî baş eşkere bû bûn, lê xelkê bawer ne dikir, ku dewleta Osmanî dê bikeve û winda bibe. Çinkî li dirêjiya sedsalan di hişê xelkê de hati bûn çandin, ku Siltan û dewleta Osmanî parêzvaniya Xîlefeta Îslamî dikin û Xwedê bi xwe wan diparêze, loma jî gengaz nîne ku ew dewleta mezin û ew Siltanê gewre têk biçin!?.

---

[1] - Hêjayî gotinê ye em bêjin, ku gora Xelîl li ber pîrozgeha Qerecurnê ye, û stêrkên şeşper li ser kevirên wê hene.

Lê li dawiya şerê cîhanê yê yekê, hêzên dewletên Hevbend derbas herêma rojhilata Derya Naverast bûn û dewleta Osmanî hilweşî. Li ber roniya guhertinên siyasî û leşgerî yên tevahî, Mistefa Kemal Paşa “Ataturk”, Qîwayî Millî (Çete) damezrandin, û ji gelên Tirkiyê û ji Kurdan re jî got, ku piştî deranîna “gawirên dargîrker” ji welêt û vegerandina Xîlafeta Îslamî, ewê dewletekê ji hemî gelên wê re ava bike.

Belkî ji ber wê bû jî, bi hezaran Kurd di nav hêza Çete de cih girtin û şerên dijwar li dijî hêzên Firensî li navçeyên Entabê, Kilisê û Çi.Kurmênc rakirin, û di encamê de Firensî ji beşekî mezin ji Çi.Kurmênc vekşî. Pişt re, û li gor peymanên di navbera Mistefa Kemal û dewletên hevbend de, ew dever di nav sînorên dewleta Tirkiyayê ya nûhatî de man.

Û digel ku paşê Kurdên beşê Firensî ji Çi.Kurmênc pê hestewar bûn ku Mistefa Kemal pûştî li wan kir û ew bi tenê hîştin, digel wê yekê, wan bêtirî du salan li hember Firensiyan berxweda.

Lê belê, piştî tam diyar bû ku dewleta Osmanî têk çûye, û Kemalîstan jî yekcar dev ji dirûşma Qîwayî Millî di vegerandina Xîlafeta Îslamî û damezrandina dewletek ji hemî gelan re berdaye, tenê wê hîngê, piraniya Kurdan çekên xwe danîn, rêberên wan jî, hinek li malên xwe vegerîn, hin jî mîna Ehmedê Rûtê derbas Tirkiyê bûn û hin din jî mîna Eslan Axayê Şorbe xwe spartin çiyan.

Lê digel hemî guhertinan, girêdaneke xelkê ye xort bi çanda Osmanî a Îslamî re ma, û hêviya ew xelkê sade bi vegera Siltaniya Osmanî jî hîn hebû. Ji ber wan tiştan, em bawer dikin, ku helwesta Kurdan a ku bi “hesta netewî ya Sûrî” tê binavkirin, û berxwedana wan a li dijî Firensiyan, li ser bingeha hêviya vegera destlata Osmanî û Xilafeta Îslamî radibû.

Ango ew helwesta "netewî ya Sûrî", ji binyata xwe de hesteke olî ye sade bû, ji ber wê jî, wan navnîşana olî “El Cihad” li berxwedana xwe ya li hember hêzên Firensî dikir, yanê belkî ya rastir, ku ew hesta welatperweriya Sûrî hîç li ba Kurdên navçê tune bû, ji ber ku li wê demê, Sûryê bi xwe wek dewlet ne hati bû damezrandin û sînorên wê jî daneketi bûn ser zemînê.

# Rewşên siyasî li navça Çi.Kurmênc
# Li dema intîdaba Firensî

## Karûbarên destlata Firensî:

Li sala 1919an, hêzên Firensî şûna hêzên Înglîzî li wîlayeta Helebê ya Osmanî girtin. Li wê çaxê, kiryarên Firensiyan li Çi.Kurmênc di çarçewa siyaseteke tevahî de, ku li herêma rojhilata Deryaya Naverast dimeşîn de dihatin kirin. Wê siyasetê hewil dida, ku destlata Firensî bibe destlateke rewa li deverên rojhilata Derya Sipî û ji hêla xelkê herêmê de were pejirandin.

Li destpêkê, Tirkan hêza Çete çê kir û li dijî Firensiyan rakir, li wan deman gelek pevçûnên mezin di navbera wan û hêzên Firensî de derketin. Di encama bûyerên tevahî yên wê demê de, hin peyman di navbera Firensiyan û Tirkan de hatin morkirin. Li gor wan peymanan, navça Çi.Kurmênc bû du beş, perçak bi ser Tirkiyê ve çû, yê din jî bi ser navça intîdaba Firensî (Sûryê) de hat.

Lê belê, berxwedana Kurdan li beşê Çi.Kurmênc ku di bin destê Firensiyan de ma bû venemrî, û ra sala 1922an ajot, û gava Firensiyan nas kir ku têkbirina çekdarên Kurd bi darê zorê dijwar e, rabûn şêweyên xwe yên leşgerî bi şêweyên din guhertin.

Wê hîngê, berpirsyarê asayîşên Firensî li navçeyên bakurê Helebê "Liyonard Noterî", baregeha xwe li bajarokê Ezazê danî bû, L.Noterî kanî têkliyên taybet bi hin rêberên Çi.Kurmênc re danîna, wek Kor Reşîd û Dewrêşê Şemo…, û di riya wan re hîşt ku hêminî li navça Çi.Kurmêmc dakeve. Pişt re, wî hêzeke Milîsan jî ji mirovên deverê damezrand û bi rêvebiriya xwe ve girêda. Tê gotin, ku Kor Reşîd pereyên mehane yên hezar Milîsî distand. Ji bilî wê,

hêza "Koma Siwarên Kurd"  jî di bin rêbertiya 'Umer Axa birayê Dewrêş Axa de hat damezrand.

Ji bilî wan karan, L.Noterî xwe gihand gelek rêbir û eşqiyayên ku li salên şerê Seferberlikê û li pişt wê jî derketi bûn, wî ew jî bi peran bi ser xwe ve anîn, wek çeteyê navdar Îboyê Cindêr. Û herwiha di navbera çar salan de, Firensiyan destê xwe danî ser tevahiya navça Çi.Kurmênc.

Piştî ku ewlehî li navça Çi.Kurmênc peyda bû, Firensiyan navçeke kargêrî ji çar deveran lê çê kir û îdareke medenî jî jê re bi nav kir, li gor wê dabeşkirinê, hemî gundên ku şêniyê xwe Kurd bûn di nav sînorên wan deveran de hîştin, hemî karbidestên wê jî ji şêniyê navçê danîn. Firensiyan bi wê yekê du xal bi cih anîn, **Yek**: Sozê xwe bi berxwedêrên navçê re pêk anî. **Didu**: Şêniyê navçê ku bi piranî mêldarê Tirkan bûn ji xwe razî kirin.

Bi tevahî em kanin bêjin, ku siyaseta Firensiyan a wê demê li navça Çi.Kurmênc siyaseteke kedîkirinê bû, bêtirî ku tundrê be. Wan tenê nêrevaniya bûyer û guhertinan dikir, bi  teybetî jî di tenga destrdirêjiyên Tirkan re li ser navçê. Ango, wan nêrîn û daxwazên şêniyê navçê dipîvan, û li ber roniya wê û daku piraniya şênî û rêberên navçê razî bikin û bi ser xwe de bikşînin, tiştên ku li gorî wan bûn dikirin. Ji bo pêkanîna vê siyasetê, alîkarên wan ji cihaza parastinî ya Firensî û  îdara medenî ya Sûrî û alavên wê bûn.

Ji bilî wê, Firensiyan di sala 1932an de, rê da hilbijartinên perlemanî jî. Di gera hilbijartinê ya yekê û diduyan/1936an de, alîgirê partiya Kitla Wetenî ya Sûrî Husênê 'Ewnî bi ser ket.

Piştî ku hevpeyvînên Parîsê yên sala 1936an di navbera şanda Sûrî û dewleta Firensî de bi ser ne ketin, nakokî di navbera niştimanperwerên Sûrî û destlata intîdaba Firensî de çê bûn. Wê hînge, Firensiyan dîsa Sûrye kirin dewlteke Federal, û ew parve van dewletan kirin: 'Elewî, Dirûz, Şam, Libnan, Heleb, Senceqa Iskenderonê jî wek herêmeke taybet di hindur dewleta Helebê de hîştin.

Di vê karnavê de, belkî ji bo ku rê li ber siyaseta Partiya Kitla Wetenî bigirin, Kurdan jî jê bi dûr xin û bi ser xwe ve wînin, Firensiyan hin Axe û rêberên navçê vexwendin û bi Nûnerê Firensî

yê Samî re rûniştin. Di civînê de, Nûnerê Firensî pêşniyar kir, ku "îdareke otonomî" li navça Çi.Kurmênc jî were damezrandin. Lê wekî ku ji me re hat gotin, bi sedema lihevnekirina li ser rêbertiyê, û ji tirsa ku mala Şêx Sim'el destlata otonomiyê ji xwe re bibe, wê pêşniyarê ronî ne dît.

Ji bilî wan tiştan, Firensiyan lêborînên tevahî jî ji bo kesên ku çek li hember wan rakiribûn, derxistin.

Lê belê, gava ku pêdvî hebaya, Firensiyan tundî jî li hember kiryarên çekdar bi kar tanîn, mîna çawa bi komika berxwedêr Resûl Hec Reşît re hat kirin û ew bi dar xist, û wekî çawa piraniya komika Mistefa Çolaq jî kuştin, û bi top û firokan ajotin ser Tevgera Mirûdan û ew di paş sînorê Tirkiyê werkirin.

Lê ji hêleke din ve, wan guh dida belavkirina xwendinê, û gelek dibistanên seretayî li gundan ava kirin. Pir rêk û gelek pireyên giring jî ava kirin.

Di dema Firensiyan de, karûbarên pîvan û danasîna zeviyan jî berdewam kir û gelek karên xizmetgûzarî jî hatin kirin.

Em kanin bêjin, Firensiyan ,bi tevahî, hewil dikir, ku dilê piraniya şêniyê Çi.Kurmênc bi ser xwe de bikşîne û wan ji xwe bide razîkirin.

## Rol û dewleta Tirkiyê:

Li dema intîdaba Firensî, destdirjiyeke eşkere ya dewleta Tirkiyê di nava civaka Çi.Kurmênc de hebû. Wan hin kes û komik, di hin boneyan de, li dijî Firensiyan dilivandin, armanca wan jî pêkanîna du tiştan bû:

**Yek**: Helwesta xwe di guftûgoyên li ser pirsên danîna sînor bi Tirkan re xort bikin, nemaze pirsa Senceqa Iskenderonê.

**Didu**: Dilê dewleta Tirk hebû, ku navça Çi.Kurmênc bi Iskenderonê re bike yek û bi ser Tirkiyê ve xîne. Ji ber wê, û ji destpêkê de, gava ku peyemanên sînor di navbera Tirkan û Firensiyan de hatin danîn, û hêza Çete şerê xwe rawestand, destlata Tirkiyê hin rêberên berxwedana Çi.Kurmênc li ba xwe bicih kirin, û nîşanên evseran jî li wa kirin, wek Mihê Ibşaşê, û digel ku ew

merovekî gundî bû jî, lê Tirkan kurkê paşatiyê lê kir û bi Miho Paşa binav kir.

Tiştê ku wê siyasetê eşkere dike, di wêneya serhildêr Mistefa Çolaq û hevalên wî de ku li dora sala 1930î hatiye kişand, ala Tirkiyê “Hêv û Stêrk” heye /li beşê Kesayetiyan binêre/, û digel ku şervanên Kurd ew al wek nîşana dewleta Osmanî ya Îslamî didîtin, lê dewleta Tirkiyê ya nû, ew bi wateyeke Siyasî ya navdewletî ya wê demê bi kar tanî.

Li wê derbarê, nêrînek heye, Tevgera Mirûdan a ku li salên sihî ji sedsala bîstan rabû bû, wek sîxura dewleta Tirkîyê dinirxîne û binav dike, û ew têkliya berê ya rêberê wê Şêx Îbrahîm Xelîl, ku bi artîşa Tirk re hebû, wek belge û delîl dibînin.

Li sala 1936an, dewleta Tirk ji hin rêberên navça Çi.Kurmênc xwest, da xuya bikin ku ew mêldarên Tirkiyê ne, wê lomê jî, wê rabû tibabeke mezin ji şebqeyên ku wê hîngê nîşana Kemalîstiyê bû, bi riya sîxurên xwe ji hin malmezinên Çi.Kurmênc re şandin, wek mala Dîkê û mala Şêx Sim'el daku bikar wînin. Lê wan, belkî ji ber egereke olî bû jî, ew şebqe bi kar nanîn. Armanca Tirkiyê ji wan kar û hewildanan ew bû, ku di riya Kurdan re zextê bide ser Firensiyan û ji wan re wiha bêjin: “Eger win rewşa Iskenderonê li gor daxwaza Tirkiyê çareser nekin, em kanin destên xwe dirêj navçeyên din jî bikin, û sergêjiyan ji we re peyda bikin”, nemaze jî, li wê demê ewrên şerê cihanê yê diduyan bi hev diketin.

Hatiye zanîn jî ku li wê çaxê, ango li sala 1936an, komelek yan Partiyek bi navê “Ay Yêldiz” (hêv û stêrk) li navça Çi.Kurmênc hati bû damezrandin. Ji armancên wê, Çi.Kurmênc bi ser senceqa Iskenderonê ve bibin û paşê jî bidin destê Tirkiyê. Ew rêxistin demeke kin xebitî, lê dengê wê zû vemrî. Ew li salên pêncî ji sedsala bîstan, careke din derket meydanê, lê dîsa zû vemrî û vê carê yekcar winda bû. Ji endam û alîgirên wê rêxistinê yên naskirî, Nûrî Tahirê Diyarbekrî “malmidûrê Efrînê” û Mistefa Ne’so ji Gu.Mîrka bûn.

Li dema me ya îro, tu destdirêjiyên Tirkan ên eşkere di hindurê navça Çi.Kurmênc de ne tên ferqkirin.

## Partiya Kitla Wetenî:


**Mihemed Axa Robarî**

Li destpêka sala 1925an, hin niştimanperwerên Sûrî partiyeke bi navê "Partiya Gel" ava kirin. Lê li dawiya meha Gulana wê salê, ew partî hat qedexekirin û endamên wê partiyekî din bi navê "Partiya Kitla Wetenî"-PKW ava kirin.

PKW, xebata gelê Sûrî li dirêjiya dema intîdaba Firensî ajot, û li sala 1936an rêberê wê Haşim Etasî bû serokê dewleta Sûryê.

Li destpêka salên çelî ji sedsala bîstan, navê PKW bû Partiya Niştimanî ya Netewî, û ra dema yekîtiya Misirê û Sûryê di jiyana siyasî ya Sûryê de çalak bû, lê ew li dema yekîtiyê hat qedexekirin.

Ji destpêkê de, kesine ji Çi.Kurmênc bi riya dostaniyên kesane, pêwendiyên xwe bi hin rêberên PKW hebûn û paşê jî bi wan re kar kirin. Endamê wê yê sereta li navça Çi.Kurmênc Mihemed Arif Robarî bû. Têkliya wî bi rêberên PKW ên li Helebê re hebû, mîna: Se'dela Cabirî, Dr.Ebdirehman Keyalî, Hesen Ibrahîm Paşa û bilî wan jî.

Di riya Arif Axa re, kesine din ji navçê bûn endamên PKW, wek: Bedrî Efendî ji Maratê, Nûrî Tahir, Mihemedê Silêmên ji Mîrka, Qasimê Robarî, Mihemedê Gênco ji Basilê û Qadirê Henên ji Qîbarê....

PKW têkliyên xort li ser bingeha têkoşîna li dijî Firensiyan bi Tevgera Mirûdan re jî ristin.

Li sala 1939an, ji ber nakokiya di navbera PKW û Tevgera Mirûdan de li hêlekê, û destlata Firensî ji hêleke din ve, hin endamên PKW li Efrînê hatin girtin, wek: Arifê Robarî, Bedrî Efendî, Nûrî Tahir û Mihemedê Silêmên, û şeş mehan di girtîgeha Remlê de li Bêrûtê hatin zîndankirin.

Li meha Nîsana sala 1946an, dema ku nûçeya vekşîna hêzên Firensî ji Sûryê belav bû, Arif Axa li gel peyayên xwe û şêniyê gundên derdora Efrînê, xwe dan hev û xwastin derbas Seraya Efrînê

bibin, lê piştî hevdîtinê bi Qeymeqamê Navçê Şêx Rida El-Eyûbî re, û gava diyar jî bû ku Firensî dê ji ber xwe ve ji navçê bikşên, Arif merovek şand ser avahiya serê, ala Firensî danî û ya Sûrî li şûnê hilda.

Piştî derketina Firensiyan ji Sûryê, pêwendiya rêberên PKW bi bermahiyên Tevgera Mirûdan re, bi taybetî jî bi şêxê wan Şêx Henîf re xortir bûn. Bi alikariya Mirûdan, Mihemed Zihnî Robarî birayê Arif Axa li salên 1947an û 1954an jî gihîşt perlemana Sûryê.

## Tevgera Mirûdan

Tevgera Mirûdan (TM) wek tevgerek olî, civakî û rizgarxwaz li dijî zulma derebegan û intîdaba Firensî derket. TM bi lez di nav cotkaran û nofên xizan de, ku ji ber zulma derebegan dinalîn, belav bû.


Li dema hêzdariya TM, û ji ber sedemên cuda cuda, hin derebegên navdar jî li kêleka wê sekinîn, û herwiha Husên 'Ewnî li salên 1932 û 1936an li ser pişta wan gihîşt perlemana Sûrî. Ji ber nakokiyên malbatî û derebegî, hin malmezinên din jî, nemaze ewên ku li dijî mala Şêxsim'el bûn bi TM re girtin, mîna: Robarî, şikak û Hec Omer.

Rêberê TM Ibrahîn Xelîl Sowiq Oĝlo li devera Borcaya Izmîtê li Tirkiyê, li sala 1898an ji dayîk bûye. Gelek nakokî li ser netewa wî heye û baş ne diyar e, kanî ew Kurd e lê Tirk e[1].

---

[1] - Îbrahîm Xelîl Sowuq Oĝlo li sala 1898an, di maleke oldar de ji dayîk bûye. Gelek rêber û şêxên rêola Neqişbendî ji malbata wî derketine. Bavê wî, Mile Se'îd kurê Mihemed Elî kurê Cemaliddîn e. Malbata wî li beşê rojava ji Çi.Kurmênc rûdiniştin. Guman heye ku ew li Gu.Coqê yan Dargirê bû. Guman heye jî, ku pîrozgeha Şêx Cemaliddîn ku di navbera her du gundan de ye, li ser navê bapîrê wî be. Osmaniyan Bapîrê wî Elî penaberî devera Izmîtê ya nêzîk Stenbûlê kir. Bavê wî Mile Se'îd jî îmamtiya mizgeftan dikir, û rêola Neqişbendî li herêmên Qefqas û Çeçenistanê belav dikir. Lê ew li destpêka şerê cihanê yê yekê, ligel komek Çerkez penaber bû, û li nevça Entabê bi cih bû. Li wir dîsa karê îmamtiyê û xocetiyê kir. Du kurên mile Se'îd hebûn, Îbrahîm Xelîl û Ehmed Fadil. Ehmed Fadil li Helebê hat kuştin, û guman hebû ku destê destlata Osmanî tê de hebû. Îbrahîm Xelîl jî li dema şerê cihanê yê yekê çû leşgeriya Osmanî, û di şer de pileya efseriyê wergirt. Piştî ku dewleta Osmanî di şer de têkçû, Îbrahîm Xelîl ket nav refên qîwayên Millî yên Kemalîstan (Çete), û di şerê li dijî

Ibrahîm Xelîl di şerê cihanê yê yekê de evserekî artêşa Osmanî bû. Dema ku şer bi dawî hat, li sala 1925an hat Sûryê û li bajarên Şamê û Humsê zanîna olî li ser destê şêxên Rêola Neqişbendî xwend, lê destlata Firensî ew girt û derbas Tirkiyê kir. Wê hîngê ew li bajarê Îslehiyê ku nêzîk sînorê Sûryê ye, û şêniyê wê Kurd in, bi cih bû.



**Îbrahîm Xelîl Sowiq Oĝlu**

Li wir jî Kurd li dora wî civîn, lê bi sebareta çalakiyên wî yên Olî destlata Tirk jê tengijî û li payîza sala 1929an dîsa hat Sûryê û li Şamê rûnişt, wê hîngê bi alîkariya Mala Şêx Sim'el, nasnama Sûryê wergirt û hat li gundê Pelûsankê li ba Fayiq Axayê Şêx Sim'el, ku wê hîngê pir navdar bû, rûnişt.

Li wir, û di demeke kin de, gelek cotkarên xizan li dora wî civîn. Wê hîngê Axeyên mala Şêx Sim'el bi metirsiya wî hestewar bûn, û li ser berjewendî û destlatadariya xwe tirsîn. Loma jî, rabûn destlata Firensî lê tûj kirin û li meha Tîrmeha sala 1931an Şêx hat girtin, û bi gunehkariya pêkanîna sergêjiyê li navçeyên sînorî, ew ji nav sînorê Sûryê derxistin û radestî Tirkiyê kirin. Li wê demê, wî Şêx Henîfê Erebo ji Gu.Se'rîncekê li şûna xwe kir berpirsyarê warên olî û diravî, û Elî Xalib “Qurt Elî” ji Gu.Se'rîncekê jî, wek berpirsyarê pêwendiyên tevahî ji TM re binav kir.

'Elî Xalib pêwendiyên xort bi rêberên Partiya Kitla Wetenî re li Helebê danîn. Çeteyê navdar Reştê Îbo ji Gu.Bilêlko jî bû endamê TM, û mîna berpirsyarê leşkerî hat nasîn û bi karên çekdar li dijî dijberên Tevgrê rabû.

---

şoreşa Şêx Se'îdê Pîran de li sala 1925an beşdar bû. Pişt re, wî artêşa Tirkan berda û li Şamê, Humsê û Kilisê dest bi wergirtina zanînên olî kir. Wî pir guh dida zanînên sofîtiyê, û çend pirtûk di wî warî de danîne, jê: Kenz Elşimûs, Kenz Elme'arêf, Tilû', Adab El Terîqa û Mihimat El Sêr û Silûk. Ji bilî ku helbest jî bi zimanên Tirkî û Kurdî diristin. Ev e parcek ji helbesteke wî:

*Em Kurd in li me jêrbûn tune …. .. Em û Ereb yek in li me didubûn tune*

Lê dibêjin, gava ku Partiya Kitla Wetenî dest ji ber wî kişand, wî navê Ereb di helbestê de bi navê Îslamê guhert.

Li wan salan, geliyê Meydana yê suxt('asê) ji Tevgerê re bû bû baregeh, û rêxistina wê li seranserê beşê bakur li Na.Efrînê belav bû, nemaze jî li deverên Bilbilê û Reco, ango li piraniya gundên hozên Şêxan û Biyan.

Ji hêla civakî de, TM soz dida cotkaran ku ewê arziyên wan ji destdirêjiya Axĝan biparêze, û dê zeviyên mala Şêx Sim'el jî li ser cotkarên ku bê arzî ne belav bike. TM qelengê jinan jî hilanî, û dênên Axan li ser cotkaran jî tune kirin. Bi tevahî TM soz dida ku ewê gelek pirsgirêkên civakî çareser bike.

TM berxwedana li dijî destlata intîdabê ji xwe re kiri bû armanc, û gelek endam û alîgir bi ser de dihatin. Bi wan kar û siyasetan, têkliyên wê bi rêberên PKW re jî xor bûn. Li sala 1936an, li dema ku şanda Sûrî ya goftûgoyan, bi riya çîmanê ji Firensa vedigerî, 'Elî Xalib li bajarokê Efrînê, li gel bi dehan mirûdên xwe pêşwazî li wan kir, û amadebûna Tevgerê û endamên wê ji bo berxwedanê diyar kir, endamên şandê jî soz dan, ku ewê li şûna çovên ku Mirûdan hilgirti bûn, çekan ji wan re bişînin.

Li wê demê, niştimanperwerên Sûrî li ser maseya guftûgoyan bi Firensiyan re pişta xwe dida TM, wan TM dixistin xizmeta xebata xwe û dixwastin ji hemî navçeyên bakurê Sûryê re bikin mînaka berxwedanê.

Li wê çaxê, Şêx Ibrahîm Xelîl vegerî Sûryê, lê ew dîsa hat girtin, lê belê piştî du heftan e, bi alîkariya rêberên PKW hat berdan, ji hêla wan de bi germî hat pêşwazî kirin, bi serbestî li hemî deverên Sûryê digerî û li hemî deran jî bi germî ji hêla niştimanperweran ve dihat pêşwazîkirin.

Li wê çaxê, Firensî li peymana xwe ya bi hukmeta Kitla Wetenî re danî bûn xudî derneketin, loma jî rêberên PKW bi Şêxê Mirûdan re li hev kir, daku Mirûd bi berxwedaneke çakdar li dijî Firensiyan rabin. Û ji bo pêkanîna wê armancê, Şêx Xilîl û Mirûdên xwe yên ku li Helebê rûnişti bûn, li meha Mijdara (T2) sala 1938an vegerîn Çi.Kurmênc û dest bi çalakirina tevgerê kirin. Wê hîngê TM dadgeheke gelêrî li navçê damezrand, û pirsgirêkên civakî yên gundên ku dibin bandora wê de bûn, tê de çareser dikirin.

Li wê demê, û piştî ku mirûdan hêriş birin ser navenda cendirman li Gu.Zêtûnekê, Şêx Henîf wekî ku rêberekî Mirûdan bû, hat girtin. Çalakiyên mirûdan ji destpêka sala 1939an feretir bûn, û çekdarên wê gihîştin Gu.Qestela Elî Cindo ku tenê 3/km ji baregeha asayişên Firensî ve li bajarê 'Ezazê dûr bû.

Wê hîngê Firensiyan didîtin ku çalakiyên mirûdan nêzîk baregehên wan dibin, ji ber wê jî, li meha Adara wê salê, hêzeke mezin li gel top û balefirên cengê şandin navça Çi.Kurmênc, gund û baregehên mirûdan bumbebaran kirin û piştî pevçûnên dijwar di navbera her du aliyan de Mirûd têkçûn, û herwiha berxwedêran, malbatên wan û şêniyên gelek gundan ji tirsa tolvedana Firensiyan re, derbas Tirkiyê bûn û şer jî rawestî.

Piştî wê têkçûnê, şêx Ibrahîm Xelîl hewil kir, ku dîsa bi çalakiyên çekdar rabe, û li sala 1940î bi çend hêrişan ji derveyê sînor de rabû, lê belê destlata Tirk ew girt, li bajarê Manîsayê bicih kir û hinek zevî jî danê, û herwiha çalakiyên wî yên çekdar rawestîn. Lê belê têkliyên xwe bi mirûdan xwe re ne hatin birîn, ta ew li sala 1952an di rewşên nediyar de hat kuştin.

Piştî çend mehan ji têkçûna tevgerê, lêborînek derket, malbatên ku penaberî Tirkiyê bû bûn vegerîn gundên xwe û piraniya berxwdêran jî di nav de bûn, ên mabûn jî, piştî derketina Firensiyan ji Sûryayê vegerîn gundên xwe. Rewşên rêberên TM jî piştî têkçûna wê wiha çû:

**Ĥenîfê Erebo**: Ew heşt salan di girtîgehê de ma, û li sala 1946an, piştî serbixwebûna Sûryê hat berdan. Piştî ku ew ji girtîgehê derket, ew bû berpirsiyarê Tevgerê li Na.Efrînê. Wî li sala 1947an navê xwe da hilbijartinên perlemana Sûryê, lê ew di rojên hilbijartinê de li bajarê Efrînê hat kuştin û mala Şêx Seim'el di kuştina wî de hat tewanbarkirin.

**'Elî Xalib**: Ew li sala 1949an li bajarê Entabê, di rewşên ne diyar de, bi destê kurê xwe Emîn hat kuştin. Hin gotin hene dibêjin, destê Şêx Ibrahîm di kuştina wî de hebû, ji ber ku 'Elî Xalib hin tiştên Şêx ên veşartî û têkliyên wî bi dewleta Tirkiyê re dizanîn, ji bilî ku wan ji sala 1938an de li hev ne dikir, ji ber ku Şêx ew da bû alîkî û

Mihemedê Xatûnê ji Gu.Gewenda li şûna wî kiri bû nûnerê tevgerê li ba PKW.

Lê li gor nêrîna me, û li ber roniya rewşên siyasî li wê demê, guman heye ku 'Elî Xalib bi destê dewleta Tirkiyê hati be kuştin, ji ber ku destlata Tirkiyê ya wê demê, gava ku rola rêberên Kurd di pêkanîna armancên wan de kuta dibû, wan xwe ji wan xilas dikir, nemaze jî ji rêberên olî.

Piştî ku Şêx Henîfê Erebo li sala 1947an hat kuştin, **Mihemedê Xatûnê** ta dema kuştina Şêxefendî bû berpirsyarê Tevgera Mirûdan li navçê Çi.Kurmênc.

**Reşîtê Îbo**: Piştî bûyerên sala 1939an, wî dev ji tevgerê berda, û xwest navbera xwe û mala Şêx Smi'el jî durust bike.

Piştî ku li sala 1952an Şêxefendî hat kuştin, Mirûdê wî **Mûse Ne'san**, ku ji panzde saliya xwe de li ba Şêx li Tirkiyê ma bû, vegerî Sûryê û bû rêberê TM. M.Ne'san hîn li darê dinê ye û rêbertiya Mirûdên ku mane dike.

Tiştê balkêş ew e, digel ku bêtirî pêncî salî di ser mirina



**Parêzgerê Helebê yê berêtir Mihemed Mewaldî di nîvî de, li aliyê wî yê çepê Micahid: Reşît Îbo, Şêx Reşît, 'Umer 'Etûno. Wêne li salên heştê ji sedsala bîstan, li roja cejna serbixwebûna Sûryê hatiye girtin.**

Şêxefendî re derbas bûye, lê têkliyên di navbera mirûdên wî yên ku mane de zor xort in, û ji şêxê xwe û bîranîna wî re pir dilsoz in.

Piştî ku rola siyasî ya TM bi dawî hat, tu rêxistinên olî li Na.Efrînê derneketin. Li dema hêginiya rêxistina "Ixwan El-Mislimîn" li Sûryê (1975-1985), tu çalakiyên wê yên berçav li navçê ne hatin kirin. Belkî sedem jî, ji ber ku Kurd, bi tevahî, mislimanên sade ne û erkên xwe yên olî bê rik û dûrî mebestên siyasî dikin.

## Nadiya Ciwanên Kurd

Ev nadî li sala 1939an ji hêla hin xwendevanan ve hat damezrandin, ew kes jî ev bûn: **Ehmed Ce'fer Şêx Sma'îl** ji Gu.Bêxçe ew sozdarê Nadî bû, **Xelîl Behcet** ji Gu.Bircikê, **Xelîl Edîb** ji Qujûma, **Mihemed Tirko** ji Hemamê, **Îbrahîm Xelîl Mistefa** ji Mîrka, **Îbrahîm Xelîl Mihemed** ji Birîmce, **Şêxoyê Fîlik** ji Birîmce, **Heyder Hemdî** ji Keferdela Jorin.

Endamê Nadî Şêxoyê Fîlik ji me re got, ku nadî li ser dilxwazî û hestên Kurdayetiyê hate damezrandin. Loma jî, dema ku Misteşarê Firensî bi avakirina Nadî Agahdar bû, endamên wê vexwendin ba xwe, û dana pere û çekan ji wan re pêşniyar kir, belkî nêta wî ew bû, ku Nadî li hembera dijberên xwe bi kar bîne, wek Tevgera Mirûdan ewa ku li wê demê, li dijî Firensiyan çalak bû.


Di civîna ku li 6 meha Êlûla 1939an bi misteşarê Firensî re hat girêdan, endamê estixbarata Firensî Ebdilhenan Al Qoc Axa (Henûçka) ji Gu.Meşalê jî amade bû[1]. Misteşêr ew ustubar kir ku çek, per û çi tiştên ku ji nadî re gerek be peyda bike, û ji endamên nadî jî xwest, ku piştî heftekê dîsa li ba wî bicivin. Lê ji ber ku endamê Istîxbaratê Henûçka kete xetê, hemî endamêm wê ne hatin ser sozê civîna ku bi misteşêr re hati bû girêdan û nadî jî ji hev şelî.

[1] - Endamê asayişa Firensî bû, bi zulmdariyê dihat nasîn. Li sala 1998an mir.

Bi taybetî armancên Nadî û çalakiyên wê, ji ber ku dema di navbera damezrandin û jihevşelîna wê de pir hindik bû, loma jî armancên wê hîn zelal ne bû bûn, û tu çalakî ne hati bûn kirin. Ev e deqek ji belgeyên Nadiya Ciwanên Kurd, dîroka wê 6 Êlûlna 1939an e:

**((Em endamên Nadiya Ciwanên Kurd in ku me li jêr Îmze kiriye, emê li roja çarşemê 13 meha Êlûlê, digel her tiştekî werin Efrînê)). Êlûlê 1939….**

**Ehmed Îsma'îl, Xelîl Behcet, Mihemed Tirko, Ebdilmenan Xoce, Îbrahîm Xelîl Mistefa, Îbrahîm Xelîl Mihemed, Xelîl Edîb, Heyder Hemdî, Şêxoyê Fîlik, Ebdilhenan Qoc Aĝa.**



# Lêkolîna Sisyan

## Qonaqa piştî serbixwebûna Sûryê

Emê di vê qonaqê de tenê li ser çaxa berî sala 1963an rawestin. Ji ber ku dema piştî wê lêkolîneke cuda û taybet pê gerek e û em jî ne li wê ne.

Li destpêka qonaqa serbixwebûna Sûryê, hin çalakiyên civakî, rewşenbîrî û siyasî li navçeyê ji hêla xortên xwende de dihatin kirin. Armanca wan çalakiyan belavkirina zanînê bû di nav şêniyê navçê de. Lê belê netê veşartin, ku ew çalakî li ser bingeha hestên netewî ya Kurdî radibûn, ji ber ku li wê demê, bayê rizgariya netewî ku li seranserî herêmê û cîhanê rabibû, li gelê Kurd jî dida û ew jî hişyar dikir. Çalakiyên destpêkê rengên komeleyên civakî û rewşenbîrî standin. Pişt re rêxistinên rêzanî yên xudî nav derketin meydanê.

Emê li jêr navdartirîn komele û rêxistinan bidin nasîn, çiqasiya hikariya wan li ser jiyana siyasî û civakî li Na.Efrînê nas bikin û çalakiyên wan ên balkêş jî hewaldin.

### Komeleya Îslaĥî (çaksaziyê):

Li roja panzdeya meha Kanûna Yekê sala 1949an, van merovan: **Ehmed Ce'fer Şêx Sma'îl, Osman Mihemed Osman û Bîlal Mistefa**, ev daxwazname bi zimanê Erebrî ji qeymeqamê Efrînê re pêşkêş kir:


**Deqa daxwaznamê:**
**(( Ji xoşewîst qeymeqamê Efrînê yê rêzdar e…**
**Ji: - Ehmed Ce'fer Aĝa Şêx Isma'îl Zade ji Efrînê.**
**- Parêzer Osman Mihemed Osman li Efrînê.**
**- Bîlal Mistefa Bîlal Ji Efrînê.**

**Em nofek ji xortên Kurd in li Çi.Kurmênc, me pêwîst dît ku komelekê damezrînin, armanca wê ew e, ku rewşên aborî, çandeyî û civakî li navça me durust bike, sêwîyên wê bi mal bike, zaroyên wê fêr bike, navenda wê jî li bajarê Efrînê be.**

**Me çav li tozikên bingehîn û hindurîn ya komeleya çaksaziyê li navça Çi.Sem'anê gerand, me dît ku ew li gor armancên me ne.**

**Herwiha, û ji ber ku pirsgirêkên her du navçeyan mîna hev in, me ew her du tozik ji xwe re pejirandin, em ji meqama we re pêşkêş dikin, û ji we hêvî dikin, ku win erêkirina damezrandina Komeleya Çaksaziyê wekî ku me ji we re diyar kiriye bistînî, me li gel daxwaza xwe wêneyên wan her du tozikan jî şandiye, em li benda dilovanî û şîretên we yên hêja ne, û win her hebin….**

**15 Kanûna Yekê 1949)).**



الى قائمقام القضاء
إن هذا النظام والمشروع المقدم من قبل المستدعين
غايته نبيلة وسامية إذا نفذ بحذافيره ولكن
هناك محذور إذا ما انقلبت هذه الجمعية إلى حزب
يعمل لمصلحته تحت هذا الستار وكذلك نخشى من
استثمار الأمر في هذا الجبل الهادئ بالوقت الحاضر.
فإني أوافق على تأليف هذه الجمعية إذا نفذت وطبقت
مواد نظامها حرفياً دون تجاوز طرف آخر
الملازم عبد الغفور [illegible]
قائد درك فصيل جبل الأكراد ٩٤٩/١٢/١٥

Ehmed Ce'fer dibêje, gava ku ev daxwaza me ji bo lêpirsînê ji serdarê koma cendirmên Çi.Kurmênc re hat şandin, wî ev nêrîn bi zimanê Erebî ji Qeymeqêm re pêşkêş kir:

**((Ji Qeymeqamê Qezê re…**

**Ew tozik û projeya ku ji hêla dozdaran de hatiye pêşkêşkirin, eger bi temamî bicih were, mebesta wê hêja û payebilind e, lê belê metirsiyek heye, ku ew komele teqleyî partiyekê bibe û di bin perda wê de ji berjewendiya xwe re kar bike, û herwiha metirsî li ser ewlehiya ev çiyayê ku niha hêmin e, çê bibe. Ez li ser avakirina vê komelê erê dikim, eger bendên tozika wê ya hindurîn wek heye were xebtandin û bicihanîn, bêyî ku derbas armancine din bibe…**

**15.12.1949)).**



لسعادة قائمقام جبل الأكراد الأكرم

من : احمد الحاج جعفر آغا شيخ اسماعيل زاده - من قرية عنز

: عثمان بن محمد عثمان — المحامي في قرية عنز

: بلال بن مصطفى بلال — من قرية عنز

نحن فئة من الشباب المثقف في جبل الأكراد رأينا من الضروري تأسيس جمعية
تعنى بإصلاح الحالة الاقتصادية والثقافية والاجتماعية في قضائنا وبالمواد
أبنائه وتعليم أبنائه . مركزها قرية عنز .
وقد اطلعنا على النظام الأساسي والداخلي لجمعية الإصلاح في جبل سمعان
فوجدنا أنها موافقة لما نهدف إليه ونرمي إليه .
لذلك ولما كانت العلل التي يشكو منها القضاء لا تختلف عن سبل إصلاحها
فإننا تبنينا ذلك النظام وتقدمنا إلى مقامكم راجين التوسط لدى مقام
المحافظة كي يرخص لنا بتأسيس جمعية إصلاحية على الوجه المبين من قبلنا
بصورة شبيهة بالنظام المذكور وتأييدنا برعايتكم وإرشاداتكم السديدة

ودمتم محترمين

٩٤٩

Eĥmed Ce'fer ji me re got: Gava ku me nêrîna serdarê cendirman ku ji Qeymeqêm re danî ber destê wî, wî ji me re wiha got: Fermanên ku li ba me hene, riya erêkirinê nadin. Ez we şîret dikim, ku win tu xebatê nekin, yan jî winê 15 salan zîndan bixwin, û herwiha me dev ji avakirina komeleyê berda.

## Komeleya Rewşenbîrî:

Li sala 1951an, van kesan: **Reşît Hemo, Şewket Ne'san û Îbrahîm Qadir** komeleke bi navê “Komela Rewşenbîrî” li Çi.Kurmênc ava kir. Ji armancên wê, belavkirina rewşenbîrî û xwendinê bû di nav gel de, daku kani be li dijî destdirêjiyên dewleta Tirkiyê, ku li wê demê di hindurê navçê de zêde bû bûn, têbikoşe.

Komîta komelê ya rêvebir ji van kesan pêk hat: **Reşît Hemo û Ibrahîm Qadir** ji Gu.Hopka, **Şewket Ne'san** (Tilif), **Xelîl Mihemed** (Keferdelê), **Reşît Ebdirehman** (Hec Xelîl) **û Elî Husên** ji 'Elendara**.** Gava ku komele hat damezrandin, gelek xortên xwendevan û şagirt jî li dorê civîn.

Lê li havîna sala 1952an, gava ku endamê komelê 'Eliyê Husên-ji ber sedemeke cuda de hat girtin, desteya komelê hat naskirin û endamên wê, Reşît Hemo, Ibrahîm Qadir, Şewket Ne'san û Reşît Ebdirehman hatin girtin û du mehan di zîndana Mezê de li Şamê man, û pişt re ew bi saya xatirê Fayiq Axa li ba serokê komara Sûrayê Edîb Çîçeklî hatin berdan. Bi sedema wê bûyerê, dibistana ku endamên komelê li bajarê Efrînê vekiri bûn jî hat girtin.

Li civîna desteya komelê ya dawîn, ku li Gu.Hopka hat girêdan, helbestvanê binavûdeng Cegerxwîn, ku li wê demê endamê Partiya Komonîst bû, lê amade bû, wî ji wan re pêşniyar kir, ku ew derbas “Komeleya Piştgirên Aştiyê” bibin, ew komele jî ji rêxistinên Partiya Komonîst bû. Wê hîngê hinek ji wan derbas wê Komeleyê bûn, û hin jî derbas Partiya Komonîst bi xwe bûn.

Wê hîngê, rêxistinên siyasî li Çi.Kurmênc nû dihatin damezrandin, û çalakiyên xwe di meydanên civakî, siyasî û rewşenbîrî de nû berçav dibûn. Lê piştî wê demê, rêxistinên partiyan li dû hev li navçê belav bûn, ew partî jî ev bûn: Partiya Komonîst, P.El-Be'is, Tevgera Demoqratî ya Kurd, Tevgera Nasirî... û hwd.

## Partiya Komonîst a Sûrî

Ev partiya li sala 1927an bi navê Partiya Komonîst a Sûrî-Libnanî hati bû damezrandin. Ew li sala 1950î di riya Cgerxwîn re derbas navça Çi.Kurmênc bû. Wê hîngê, Cegerxwîn xwe gihand endamên Komeleya Rewşenbîrî li Efrînê û du endamên wê Reşît Hemo û Şewket Ne'san û li sala 1952an bûn endamên wê partiyê û

Reşît Hemo bû kadirekî wê. Lê li sala 1953an, Reşîd Hemo ji P.Komonîst hat dûrxistin û Wehîd Mehmûd bû kadirê wê yê li pêş li navça Çi.Kurmênc. Li navîna salên şêstî ji sedsala bîstan jî, Esmet 'Umer ji Gu.Şorbe bû perpirsyarekî P.Komonîst î naskirî.

Li demên destpêkê, hebûna derebegan li navça Çi.Kurmênc, kir ku rêxistinên P.Komonîst di nav kesên xizan û gundiyên bê arzî de zû belav bibe. P.Komonîst li sala 1953an Rêxistina Yekîtiya Cotkaran jî li navçê damezrand, wê rêxistinê li xwe girt, ku ji ber cotkarên bê arzî û xudanên zeviyên biçûk ve berevaniyê bike. Û herwiha ew partî bû xudî roleke berçav û rêxistinên wê li hemî deverên navçê belav bûn.

Hêja ye em bêjin, ku gelek kadirên komonîst çûn kurs û rahênanên siyasî li Yekîtiya Sovyetistanê kirin. Rola P.Komonîst di belavkirina zanîna civakî û xwendinê de li nav şêniyê navça Çi.Kurmênc balkêş bû, wê bi sedan xwendekar ji bo xwendinê şandin Dewletên Sosyalîst û xwendina bilind bi serî kirin. Û herwiha, alîgirên P.Komonîst li navçê pir bûn, rêxistinên wê fere bûn, û çalakiyên xwe di hemî warên civakê de hatin dîtin. Ta radekê, tevî xelkê dizanî ku Xocê Gu.Xilalka kadirekî P.Komonîst e, lê digel wê, ew dora deh salan îmamê mizgefta gund bû, bawermendan nimêja xwe li pê dikir û rewş dihat pejirand.

Di salên heftê de ji sedsala bîstan, nakokiyên aşkere di navbera P.Komonîst û Tevgera Kurdî de li ser pirsa netewî derketin. Komonîstan xwe navnetewî ditîn, ji ber wê jî, ew li dijî daxwazên Kurdan ên netewî radibûn, lê belê ew helwest ji hêla piraniya şêniyê Çi.Kurmênc ve neyînî dihat nirxandin.

Ji destpêka salên heftê de ji sedsala bîstan, cudatî û perçebûn di nav refên P.Komonîst de çê bûn, hêza wê hinbihin lawaz bû û bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetistanê û sîstema dewletên sosyalîst re, piraniya endam, kadir û alîgirên P.Komonîst jê dûr ketin.

Roja îro, partî û rêxistinên Komonîst li Sûriyê, eşkere dixebitin, ew endamên Eniya Netewî ya Pêşverû ne, û herdem endamên wan di perlemana Sûrî û encûmenên îdara deverkî de hene.

## Partiya El-Be'is a Erebî ya Sosyalîst

Ev partî di sala 1947an de hatiye avakirin. Û ji ber dozên wê yên rizgarîxwaz û civakî, alîgirên wê di nav rewşenbîr û evserên artêşa Sûrî de zû pir bûn.

Gihîştina destpêkê ya vê partiyê bi navça me re, li navîna salên pêncî ji sedsala bîstan, di riya Fayêz Îsmaîl re pêk hat. Berê dostaniyeke wî bi Dr.Mistefa Nûrî re hebû, û herwiha ew dostanî bû hevaltiyeke partîtî jî. Dr.Mistefa Nûrî kesê sereta bû, ku li Na.Efrînê bû endamê P.Be'is, loma jî ew bû berpirsyarê xeleka wê ya yekê li navça Efrînê, ew xelek ji van kesan pêk dihat: **Reşîd Îso** ji Gu.Merwaniyê**, Fethî Bedrî** ji Maratê**, Ebdirehman Mûrad û birayê wî Mihemed** ji Kefersefrê**, Hemîd Betal** ji Me'mila**, Heyder Ruf'et Al Umo** ji Firêriyê **û Mûse Wehîd** ji Cilbirê**.**

Li destpêka yekîtiya Misrê û Sûriyê, P.Yekîtiya Netewî hat damezrandin, lewre P.Be'is jî mîna hemî partiyên Sûrî yên din, hat şelandin û piraniya endamên wê derbas nav rêzên ew rêxistina nû bûn.



**Dr.Mistefa Nûrî**

Piştî ku li sala 1963an P.Be'is hat ser textê dewletê, rêxistina wê li Na.Efrînê ji nû de hat vejandin û Dr.Mistefa Nûrî bû serokê tayê wê yê hevbeş li navçeyên Efrîn û Ezazê, û bû serokê şaredariya bajarê Efrînê jî, lê piştî teqleya sala 1966an di hundur P.Be'is de, Dr.M.Nûrî ji P.Be'is û ji Şaredariya Efrînê jî hat avêtin.

Hêja ye em bêjin jî, ku ji destpêka hatina P.Be'is de li ser destlatê, û ra destpêka salên heftê ji sedsala bîstan, rola wê li navçê pir hindik bû, sedem jî taybetiya netewî ya navçê bû, wê hîngê şerm bû ku Kurdek bibe endamê P.Be'is. Lê li roja îro, rêxistinên wê li hemî deverên navçê belav bûne, bi hezaran endamên wê hene, û bi dehan kadirên wê hene û hemî jî karbidestên dewletê ne.


Di dehsalên heştan û nehan de ji sedsala bîstan, sê kes ji navça Efrînê gihîştin asta endamtiya şaxa P.Be'is li Helebê, ew jî ev bûn: Mistefa Qedûr, 'Eladîn 'Ecan û endamê Şaxê niha Dr.Ruşdî Mixtar ji

Gu.Qitmê, hêja ye em bêjin jî, ku ew Kurdê yekê ye li parêzgeha Helebê digihê wê asteyê.

Saziyên ku li navçeyê bi P.Be'is ve girêdayî ne jî hene, wek Saziya Yekîtiya Ciwanên Şoreşê, Rêxisina Pêşengên Be'is, ev her du sazî hemî şagirtên dibistanan di nav xwe de kom dikin, Yekîtiyên Cotkaran, Hevgirtina Jinan û bilî wan jî hene, ew jî bi P.Be'is ve girêdayî ne.

## Partiya Demoqrat a Kurd Li Sûryê ((Partî))

Daxyaniya damezrandina Partiya Demoqrat a Kurd li Sûryê ((Partî)) li roja 14 Hezêrana sala 1957an hat ragihandin. Damezrawên wê yên ji Na.Efrînê ev bûn: **Reşît Hemo, Şewket Ne'san, Xelîl Mihemed û Mihemed Elî Xoce.**



**Dr.Xelîl Mihemed**

Partî di riya belavoka xwe DENGÊ KURD re doza wekhevî, dadmendiya civakî û lêmikûrhatina mafên netewî yên gelê Kurd li Sûryê dikir. Û herwiha, rêxistnên Partî di demek pir kin de li navçê belav bûn, gihîştin gundên navçê yên herî dûr û cemawer bi daxwazên Partî yên netewî û demoqratik ve hat girêdan.

Ji çalakiyên Partî yên herî girîng li wê demê, vejandina dadana agirê Newrozê li sala 1960î bû. Wê hîngê, û ji ber wê yekê, bi sedan endam û alîgirên Partî û merovên Kurd hatin girtin. Endamên rêbertiya wê jî li dema Yekîtiya Sûryê û Misirê û li dema jiheveqetîna wan jî, toşî girtin û dûvdaneke berdewam bûn. Lê digel wê, rêxistinên Partî hatin parastin, nemaze jî di nav xwende, rewşenbîr û qutabiyan de.

Li dîroka 5.8.1965an, Partî toşî perçebûna xwe yekê bû, di encamê de du rêxistinên cuda hatin meydanê, Partî Demoqratî Kurdî û Partî Çepgirî Demoqratî Kurdî, vê rewşê ra havîna sala 1970yî ajot, û rêxistinên her du partiyan jî li navçê hebûn.

Piştî wê, qonaqeke nû di jiyana Tevgera Netewî ya Kurd de li Sûryê dest pê kir. Ew qonaq bi perçebûnên partiyan û pirbûna wan

tê nasîn. Lê digel wê, hîn tevgera siyasî ya Kurdî xudî cemawerekî fere û mezin e, rêxistinên wê jî roleka hikardar di rewşên civakî, çandeyî û siyasî yên şêniyê navçê de dibînin.

Rêxistinên Kurdî zanîn, baweriyên netewî yên demoqratik û pêşverûtiyê di nav gel de belav dikin, û bi şêweyên aştiyane doza mafên gelê Kurd ên siyasî dikin. Lê ji ber ku zagona durustkirina karê partiyan li Sûryê tuneye, ew di çarçewa rewşên siyasî û demoqratîk yên hene de dixebitin.

Belavokên wan partiyan bi zimanên Kurdî û Erebî tên weşandin, ew çalakiyên balkêş jî di boneyên netewî, nemaze li Cejna Newrozê, dikin.

Ji nastirîn kesên ku ji salên destpêkê de di tevgera siyasî ya Kurdî de dixebitin û vê re têkildar in, em kanin van kesan bijmêrin: **Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Şewket Ne'san, Horîk Ehmed, Ebdirehman Osman,** ev hemî jî çûne diyarê heq. **Mihemed Alî, Zekeriye Mistefa, Tahir Dîko, Emîn Şêx Gulîn, Xelîl Ezet** û gelek navdarên din jî hîn di nav xebata tevgerê de ne.

## Komeleya Murteda

Ev komele li destpêka salên heştê ji sedsala bîstan ji hêla Cemîl El-Esed ve hat damezrandin. Komele di dema hêginiya rêxistina Îxwan El-Muslîmîn de hat çêkirin. Wê soz dida ku guh bide pirsgirêkên Kurdan li Sûryê, û soz da jî ku çekan li ser endamên xwe belav bike, belkî ji ber wan tiştan, di demeke kin de alîgirên wê li Na.Efrînê çê bûn.

Çalakiyên komeleyê li navça Efrînê du salan /1981 û 1982/ berdewam kir, di wê çaxê de du nivîsgeh, yek li bajarê Efrînê ya din jî li Cindirêsê hatin vekirin, Komelê wek mehane pere jî ji endamên xwe distand. Lê belê ew Komele ji hêla dewletê ve hat qedexekirin.

## Partiya Karkerên Kurdistan (PKK)

PKK li sala 1979an ji hêla Kurdên Tirkiyê ve hat damezrandin. Û bi sedema derbeya artêşî ya sala 1980yî li Tirkiyê, gelek endamên wê li gel serokê wê Ebdella Ocelan derbas Sûryê û Libnanê bûn. Û piştî ku PKK li sala 1984an li Tirkiyê dest bi çalakiyên çekdar kir, dost û alîgirên wê di nav Kurdên Sûryê û li navça Efrînê jî pir bûn.

PKK bi karên civakî yên balkêş û bi rolên cemawerî yên berçav rabû, ji çalakiyên herî balkêş birêxistinkirina fere ya jinan di nav rêzên xwe de, ta radekê bi sedan jin ta roja îro di eniyên şer de dixebitn û bi dehan canemergî jî bûne.

PKK bi gelek çalakiyên çandeyî jî radibû, ew ra niha gelek nivîserên çapkirî bi zimanê Kurdî û Erebî belav dike.

Lê belê girtina serokê wê Ebdella Ocelan li sala 1999an, hikariyeke mezin li ser alîgirên wê kir û gelek nofên gel ji dora wê vekşîn, lê ew hîn rêxistineke xort e li navçê.

PKK li salên nodî ji sedsala çûyî, ji hêla cemawerî de rûxistina yekê bû li Na.Efrînê û di hilbijartinên perlemanî yên sala 1990î de, şeş endamê xwe li parêzgeha Helebê gihandin perlemana Sûrî, didu jê ji Na.Efrînê bûn, ew jî Se'îd Ebdella û Ebdirehman Îbo.

Tiştekî din, hin endam û alîgirên PKK helwesteke tund li dijî partiyên Tevgera Kurdî li Sûryê girtin, li ber roniya wê helwestê, gelek karên tund û kuştin jî li salên nodî ji sedsala borî li dijî endam û alîgirên wan partiyan pêk hatin.

## Tevgera Nasirî

Li destpêka yekîtiya Sûryê û Misirê li sala 1958an, destlata yekîtiyê hemî rêxistinên siyasî pişaftin û li şûna wan rêxistina “Yekîtiya Netewî” ava kir.

Em kanin bêjin, ku di bin bandora kiryarên destlatê yên tirsdar de, belkî hemî Mixtar û navserên navçê bûn endamên wê. Lê gava ku yekîtî têkçû, ew rêxistin jî ji hev şelî û endamên wê yên ku man bûn bi navê “Nasirî” hatin naskirin.

Bi tevahî, Kurdên Na.Efrînê ne bûn Nasirî, û ew rêxistin di nav Erebên navçê de ma.

Û piştî ku Cemal Ebdilnasêr li sala 1970yî mir, piranya Nasiriyan bi ser partiya Be'is de çûn, yên man jî ji hev perçe bûn û li ser gelek rêxistinên Nasirî belav bûn.

Du rêxistinên Nasirî li Efrînê hene: Partiya Yekîtîxwazên Sosyelîst, û Partiya Yekîtiya Sosyelîstên Ereb. Lê endam û dostên wan li ser pêçiyan tên jimartin.

Di toreke perlemanî de, parêzer Ruf'et Bîlal ji devera Reco, ku mirovekî Kurd e, bû nûnerê Partiya Yekîtîxwazên Sosyelîst di perlemana Sûryê de.

# Ji navdarên siyasî li Na.Efrînê

Li dirêjiya heştê salî ji jiyana rêzanî li Na.Efrînê, navên gelek merovên ku xwedî rol bûn, yan jî navên wan bi hin bûyer û partiyan ve hati bû girêdan, hene. Emê li destpêkê navên hin kesan bibîr wînin, paşê jî jînenîgariya hinên din ku me kanî bû bi dest xistana, pêşkêş bikin.

Ji **Komonîstan**: Mûse ji Basilê, Bavê Şehîn Xocê Xilalka, Mihemed Menan, Wehîd Mehmûd, Cemîl 'Ebdo, Mihemed 'Elî Rida, Esmet 'Umer… û hwd.

Ji **Be'siyan**: Dr.Mistefa Nûrî, Mihemed Mûrad, Mistefa Qedûr, 'Eladdîn 'Ecan, Ruşdî Mixtar…

Ji **Partiyên Kurdî**: Reşît Hemo, Mihemed 'Elî Xoce, Şewket Ne'san, Horîk Ehmed, Mihemed Alî, Mihemed Gûlîn Şêx Sîdî, 'Ebdirehman Osman, Seydo Eslan, Ibrahîm Arif, Sadiq Necar, Tahir Dîko, Zekeriya Mistefa, Xelîl 'Ezet, Kemal 'Ebdî, Xelîl Mihemed… û gelekên din.

**Hin din jî**: 'Erif Axa Robarî ji Partiya Kitla Wetenî, Şêx Henîf Erebo, Mûse Ne'san, Xocê Qorta, Reşîtê Îbo… ji Tevgera Mirûdan

## Reşît Hemo

Rêzdar Reşît Hemo li sala 1925an, li gundê Hopka ji devera Reco ji dayîk bûye. Wî li destpêkê li ber Xoce xwend, pişt re ta pola sisiyan li bajarokê Reco xwend, ji wir jî çû bajarê Ezazê, lê ji ber sedemên aborî dibistan berda û vegerî gundê xwe.

Li sala 1939an, çû Helebê û di dibistana Xusrewî ya olî de xwend, lê vêketina şerê cihanê yê diduyan, û rewşên aborî ku pê re hatin, kirin ku xwendinê berde, vegere navçê û karê Xocetiyê bike.



**Reşît Hemo**

Wî li wê demê, dest bi xwendina pirtûkên rewşenbîrî kir û xebitî da ku fêrî zimanên Înglîzî û Firensî bibe, ji xwe wî berê bi Tirkî dizanî.

Li derbarê jiyana xwe ya wê demê û piştî wê jî, Mamoste Reşît wiha dibêje:

((Li sala 1943an, min ji cendirmekî Kurd ku li Bibilê kar dikir, bihîst ku kovareke Kurdî ji hêla Mîr Celadet Bedirxan ve li Şamê derdikeve. Wê hîngê min ji Mîr Celadet re nivîsand, û jê xwest ku bibim pişkdarê kovarê, û herwiha pir neçû, wî sê hejmar ji kovara “Ronahî” ji min re şandin, min di riya wê re tîpên Kurdî yên Latînî nas kirin û ez fêr xwendin û nivîsandina Kurdî bûm.

Li sala 1947an jî, mamoste Cemîl Kinê ku li Reco mamoste bû, ez bi xwe re birim mala Dr.Nûrî Dêrsimî li Helebê. Wê hîngê, N.Dêrsimî li min pêşniyar kir, ku ew pêdviyên fêrkirina zimanê Kurdî ji min re peyda bike, mehanekê jî ji min re girêde û ez jî xelkê fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî bikim. Min bê erêna û bê pere erê kir, lê mixabin ew kar neçû serî.

Piştî hevdîtina min bi N.Dêrsimî re, gelek tişt di raman û jiyana min de hatin guhertin. Wê hîngê ez hestewar bûm, ku ez ji tenêbûneke zor xirab li wan gundên dûr û ji nezaniya gunditiyê ku dikir ez bifetisandama, rizgar bûme û bi jiyaneke nû ketime. Û ji wê rojê de ez herdem bi ser mala N.Dêrsimî de diçûm.

Li wê çaxê, min xwe gihand Tevgera Mirûdan a ku hîn xort bû, min nêrîn û baweriyên xwe yên netewî û pêşverû ji rêberên wan re gotin, lê wan ji min xwest ku ez têkliyan bi şêx Ibrahîm Xelîl re bikim, ew jî wê hîngê li Tirkyê dijî. Ji bo wê yekê, min namek jê re şand û nêrînên xwe tê de gotin, wî jî ji min xwest ku ez herim ba wî. Lê hin dostan ez şîret kirim, û gotin ku ew mirovekî Tirk e, û ji

Kurdîtiyê hez nake, û em ditirsin tu ji ba wî xweş venegerî, û herwiha, min ew têklî bi wî re birîn. Pişt re min di ber dersdayîna xocetiyê re, xelk fêrî zimanê Kurdî dikir û hestên netewî li ba wan diçandin.

Li sala 1950î, û daku em xwe bigihînin Komeleya Xûybûnê, ez û Mihemed 'Elî Xoce çûn Cezîrê, em li mala 'Ebdirehman Axayê 'Elî Yûnis bûn mêvan, lê mixabin wî ji me re got, ku Xûybûn ji hev şeliye û tenê nav maye.

Li sala 1951ê, li ser pêşniyara hin xortên xwende: **Osman Mihemed, Şewket Ne'san, Ehmed Resûl û Henan Mihemed,** min dibistaneke techîzê ye taybet li bajarokê Efrînê vekir, hin xwendeyên Kurd û Ereb jî li gel min ders li dibistanê didan, ji wan: **Miftiyê Efrînê Îbrahîm Ne'so, Qadî Şer'î Ehmed Mehdî Xidir û Îbrahîm Qadir.**

Li wê salê bixwe, me Komelyeke Rewşenbîrî jî damezrand, armanca wê belavkirina zanîn, rewşenbîrî û dijîtiya destdirêjiyên Tirkan bû di nav civaka navça Efrînê de. Lê belê piştî çend mehan, endamên komeleyê hatin girtin, û bi behaneya ku em dibistanê dikin xizmeta armancên siyasî, ew jî hat girtin, û dest danîn ser hemî kelûpelên wê.

Piştî wê bûyerê, ez derbas nav rêxistina “Piştgirên Aştiyê” bûm, û bi saya Cîgerxwîn bûm endamê Partiya Komonîst jî. Min li sala 1952an rêxistina destpêkê ya Komonîstan li navça Çi.Kurmênc damezrand, û me li sala 1953an “Yekîtiyeke Cotkaran” jî damezrand, û pişt re ez li parêzgeha Helebê bûm kadirê partiyê. Li sala 1954an ez bi navê Partiya Komonîst daketim hilbijartinên perlmana Sûrî û min dengine baş anîn.

Li sala 1955an, ji ber helwesta P.Komonîst a li tersî baweriyên min yên netewî min ew berda, û ji wê demê de baweriyên min bi hêla netewî, demokratîk û sosyalistê ve çûn.

Li sala 1957an, min ligel van hevalan: **Mihemed Elî Xoce, Şewket Ne'san û Xelîl Mihemed** ji Efrînê **û Osman Sebrî** ji Şamê û hevaline din ji Cezîrê, Partiya Demokqrat a Kurd li Sûryê damezrand, û ez bûm endamê nivîsgeha wê ya siyasî û kadirê Partiyê jî.

Ez li sala 1959an hatim girtin, û pişt re bi çend mehan ez ji hêla destlatê de ketim “rûniştina zorane” jî, lewre ez neçar bûm xwe ji ber dûvdana asayişan bidim alî. Lê belê li sala 1960î, ez û hin havalan li Helebê hatin girtin, û dora salekê di girtîgehê de man, li sala 1964an, ez careke din jî hatim girtin û dora salekê di girtîgehê de mam.

Li sala 1967an, li ser biryara Partî, û daku alikariya Partiya Demoqrat a Kurdistana Tirkiyê, ku nû hati bû avakirin, bikim, ez çûm Tirkiyê û dora çar mehan li wir mam, li wir jî asayişên Tirkiyê xêr bi min ne kirin û ez vegerîm Sûryê.

Piştî ku ji Tirkiyê vegerîm, hevalan biryar da, ku ez herim Libnanê û têkliyan bi rojnamegeriya cîhanê re bikim, tê de binivîsim û pêwendiyan bi rêxistinên Partî re li Ewrupa dînim, û ji ber ku ez wê hîngê ji hêla asayişan ve dihatim xwestin, min bi dizî sînor derbas kir û çûm Libnanê û nêzîka salakê lê mam, di wê çaxê de min dostanî û pêwendiyên xort bi gelek kesayetiyên siyasî, rewşenbîrî û wêjeyî re danîn, û gelek gotar jî di çapemeniya Libnanî de weşandin.

Piştî vegera min ji Libnanê, û piştî peymana 11 Adara 1970yî di navbera hukmeta Êraqê û şoreşa Kurdî de, em ji bo girêdana kongira netewî ya Kurdî çûn Kurdistana Êraqê û ez nêzîka salekê li wir mam, û bi biryara Mistefa Barzanî min serpiriştiya derhatina kovara “Elkadir” a Partiya Demoqrat a Kurdistana Êraqê kir, û pişt salekê ez vegerîm Sûryê.

Li sala 1973an, ez bi navê partiya xwe daketin hilbijartinên Encûmena Gelê Sûryê, lê ji ber gelek egeran ez bi ser neketim.

Ez ra sala 1993an, endamê nivîsgeha rêzanî ya partiya Demoqrat a Pîşverû ya Kurd li Sûryayê bûm)).

Rêzdar Reşît Hemo ji xwendevan û momosteyên navçê yên destpêkê ye, gelek kesan li devera Reco li ba wî xwendine û ra niha li ba wan cihê rêzdariyeke pir bilind e, ji bilî ku ew li navçê wek xebatkarekî hêja ji ber doza gel û welatê xwe ve tê naskirin, û li seranserî Kurdistanê jî naskirî ye.

R.Hemo, rewşenbîrekî payebilind e, civaka xwe rind nas kiriye, û digel hemî zor û êşekên ku di jiyana xwe de dîtine hîn jî dilgeş e.

Gelek nivîsarên wî di warên siyaseta Kurdî, Sûrî û navdewletî de hene, pirtûkine wî yen destnivîskî jî hene, wî jinenîgariya xwe jî bi destê xwe nivîsiye. Li vê dawiyê pirtûkeke wî li ser “Tevgera Mirûdan li Çiyayê Kurmênc” hat çapkirin.

Momoste Reşît li gel kebaniya xwe ya pêdar li gundê xwe Hopka, ku li nêzîk bajarokê Reco ye, rûdine. Ew hîn jî ji xwendinê ne bûye û mîna xortekî çalak û dilgeş dirame, dinivîse û dijî.

### Mihemed 'Elî Xoce

Li sala 1927an li gundê Mabeta ji dayîk bûye. Hîn ew biçûk bû, dê û bavên wî mirine. Ji ber wê jî, ew li Helebê di dibistana sêwiyan de dijiya. Pişt re, şihada Bekelorya stand û bû karkerê dewletê. Û piştî ku Firensî ji Sûryê derketin, wî wek mamoste li navça Qamîşlo kar kir. Pişt re bi du salan, hat parêzgeha Helebê û karê mamostetiyê li Helebê, Efrînê û Reco berdewam kir.


**Mihemed Elî Xoce**

Wî li gel hin xortên xwende, li sala 1952an komeleya Çandeyî li Efrînê damezrand, û ji ber wê yekê avêtin girtîgeha Mezê li Şamê.

M.E.Xoce li sala 1953an, derbas Rêxistina Alîgirên Aştiyê bû, paşê jî bû endamê Partiya Komonîst. Lê ji ber baweriyên wî yên netewî, ji P.Komonîst hat dûrxistin.

Ew di damezrandina Partiya Demoqrat a Kurd de li Sûryê pişikdar bû û bû endamê nivîsgeha wî ya siyasî, û ji ber ku ew xwende bû, û bi zimanên Erebî, Tirkî û Firensî dizanî, rola wî di rêbirtiya Partiyê de giring bû.


Li sala 1959an, û daku ji girtinê were parastin, rêbertiya Partî ew, Cegerxwîn û Xelîl Mihemed şandin Êraqê, wî li wir di îzgeha Êraqê beşê Kurdî de kar kir. Û gava ku şoreşa Kurdî ya Eylûla sala 1961ê rabû, ew tev Pêşmergan bû, bû serokê hêza navçeya Zaxo û ligel pêşmergeyên hêza xwe derbas bajarê Zaxo bû. Lê belê ew li ber hêrişa artêşa dewleta Êraqê, ji ber bajêr kişîn û derbas Tirkiyê bûn.

Li wê demê, lêborînek ji bo siyasiyên gunehbar li Sûryayê derketi bû, wî sûd jê wergirt û ji Tirkiyê vegerî Sûryê, û bi alîkariya

dadmend Osman Mihemed dîsa vegerî karê xwe û li parêzgeha Reqayê bû mamoste.

M.Elî.Xoce cara diduyan li sala 1965an li gel hin rêberên Partî hat girtin. Ew di girtîgehê de bi nexwaşiya “wêrana mofirkan” ket, piştî şeş mehan li nexwaşxanê mir û li Şamê li dûrî gund û navça xwe hat veşartin.

### Şewket Ne'san



Şewket Ne'san

Ew li sala 1929an li gundê Şîtka ku bi ser devera Mabeta ve ye, ji dayîk bûye. Bavê wî Xocê 'Evdî 'Eşê bi sê zimanan dizanî, Kurdî, Erebî û Tirkî.

Şewket li gundê Çolaqa li ba bavê xwe xwend, pişt re li dibistana seretayî li bajarê Efrînê xwend, û li sala 1943-1944an xwendina xwe ya navîn li Helebê bi dawî kir.

Li Helebê, dostaniya wî bi hin hevalên xwe yên xwendinê re li ser pirsa netewa Kurdî çê bû, ew heval ev bûn: **Osman Mihemed, Mihemed Menan Şêxsam'îl, Nûrî Arif, Ebdella Hesen, Ehmed Zemçî Feyo, Mihemed Ce'fer, Mihemed Arif, Mistefa Hemo…**

Wî û hevalên xwe Dr.Nûrî Dêrsimî û Cegerxwîn nas kirin, û li sala 1945-1946an Hevgirêdana Xwendekarên Kurd li Helebê damezrandin.

Şewket bawer dikir, ku mafên Kurdan ên netewî dê bi riya sîstema sosyalîstê werin pêkanîn, lewre ew li destpêkê derbas nav rêzên P.Komonîst bû.

Piştî ku xwendina xwe di “mala mamostan” de kuta kir, wî li gel Reşît Hemo û hevaline din Komeleya Rewşenbîrên Kurd li sala 1952an damezrandin û dibistaneke taybetî jî li Efrînê vekirin. Lê pir ne çû ew û çend hevalên xwe hatin girtin û dibistan jî hat girtin.

Piştî ku ew ji girtîgehê hat berdan, li bajarê Idlibê bû mamoste, paşê jî ji bo leşgeriyê hat xwestin. Wê hîngê wî li Şamê Osman

Sebrî nas kir, li wê demê Apo Osman amadekariyên damezrandina partiyeke Kurdî dikir.

Li sala 1956an, serdariya artêşa Sûryê ew şand Na.Efrînê û karên "berxwedana gelêrî" li dijî gefên Tirkan pê hilpesart.

Li sala 1957an, dema ku Partî Demoqratî Kurd li Sûryê hat damezrandin, Şewket bû endamê komîta wê ya navendî.

Li dema yekîtiya Sûryê û Misirê, li şeva daweta wî, ew û pênc hevalên wî hat girtin û dîsa şandin girtîgeha Mezê li Şamê û sal û nîvekê tê de ma.

Piştî ku ji girtîgehê hat berdan, di navbera wî û rêbertiya Partiyê de nakokî derketin û Şewket Partî berda. Ta wê demê Şewket şihada Huqûqê jî ji zanîngeha Şamê wergirt, lewre wî dest bi karê parêzeriyê li Helebê kir.

Li sala 1973an, li dema pêkanîna projeya "çembera Erebî" li Cezîrê, gelek ji endamên rêbertiya Partî hatin girtin, wê hîngê Şewket û parêzer Esmet Şehîn, berevaniya girtiyan li ber dadgeha "ewlehiya dewletê" li Şamê kirin.

Şewket netenê siyasî û parêzer bû, ew helbestvan bû jî û helbetên wî pir nazik bûn. Hin rexnevan dibêjin, eger derfet jê re peyda bibana, dê biba helbestvanekî hêja. Wî hin helbestên xwe di hin belavokên Kurdî de belav kirin, wek kovara Gelawêj li Sûryê û kovara Çiya li Ewrupayê.


Emê li vir çend rêzikan ji helbesta wî ya ku li destpêka salên şêstî ji sedsala bîstan di kovara Çiya hejmar /8) de, li ser navê Ebû Rahêb û bi navnîşana "Agirê Newrozê" belav kiri bû, dînin:

**Dibêjin :**
**Li çiyê , mêr û jin**
**Bi sedan hatin girtin**
**Li  Reco , Ĥeleb û Efrîn**
**Mexfer û zîndan dagirtî ne**
**Min dipirsî:**
**Gelo çi bûye**
**Çî ye ev mizgîn**
**Gotin:**
**Çiya hemî bûne agir**

**Stêr daketin erdê**
**li Meydana , Keferdelê û Basilê**
**li Reco , Gazê û Bilbilê**
**Girêdan**
**Govend û dîlan**
**Li roja NEWROZa ciwan**

Xebatkar, parêzer û helbestvan Şewket Ne'san li sala 1993an canda û li gundê Tilifê hat veşartin. Gelek rewşenbîr û siyasetvan li veşartina wî amade bûn. Hevalê wî endezyar Seydo Bêrem, ku pê re di girtîgeha Mezê de bû, gotinek bi navê hevalên wî yên berê got, parêzer Nûrî Arif jî gotinek bi navê parêzeran da. (zanîn ji rojnama Newroz hej 11, Şibat 1997).

## Horîk Ehmed Osman /1932-1992/



**Horîk Ehmed**

Horîk li gundê Çiyê ku li ser Çi.Hawarê ye hatiye dinê. Bavê wî Mixtarê gund bû. Horîk li ba xocê gund û gundên derdorê xwend, li sala 1948an şihada xwendina seretayî bir û pileya yekê li ser parêzgeha Helebê wergirt. Ji ber wê yekê, ew li dibistana dewletê ya hindurîn qebûl bû, û di du salan de şihada navîn bi pileya herî bilind wergirt. Lewre dewletê xwest wî ji bo xwendinê bişîne derveyî Sûryê, lê li wê demê inqîlabek li Sûryê rabû û ew biryar jî hat tunekirin.

Wî li salên di navbera 1953an û 1955an de, li Helebê kar kir. Li sala 1955an jî di wezîfa polîs de mor kir, lê ji ber sedemên siyasî, ew li sala 1962an jê hat derxistin.

Horîk li sala 1952an bû endamê rêxistina Alîgirên Aştiyê, pişt re bû endamê P.Komonîst û ra sala 1956an tê de ma.

Li sala 1957an jî, gava ku Partiya Demoqrat a Kurd li Sûryê hat damezrandin, ew bû endamê wê, li sala 1960î hat girtin û ji mafên medenî hat bêparkirin.

Li sala 1972an bû endamê komîta navendî ya Partî û demeke kin hat girtin. Li havîna sala 1973an gava ku rêbertiya Partî hat girtin,

wî li gel her du hevalên xwe Zekeriye Mistefa û Mistefa Îbarahîm xwe ji ber girtinê dan alî û rêbertiya Partî kirin.


Gava ku “rêbertiya demkî” ya Partiya Demoqrat a Kurdistana Êraqê hat damezrandin, ew li gel şandeke Partî di civîneke sêqolî di navbera Partî-Sûryê û PDK-Tirkiyê û PDK-Êraqê de amade bû, û biryara destpêkirina şoreşa 26 Gulana 1976an kete warê pêkanînê.

Horîk ra sala 1981ê endamê rêbertiya Partî bû û endamê nivîsgeha wê ya siyasî bû jî, lê ji ber nexawşiya xwe, ew di kongira Partî ya sisiyan a sala 1981ê de amade ne bû, lê belê ew li sala 1984an dîsa nêzîka du mehan hat girtin.

Digel ku pirsgirêka wî yên tendurustî roj rojê girantir dibû, lê ew herdem ji biryargeha Partî ve nêzîk bû, di gelek movikên xebata tevgera Kurdî de beşdar dibû û şora wî dihat bihîstin. Û herwiha, ra nefesa xwe ya dawîn, xema gelê xwe dixwar û rewşa pirsa wî dişopand.

Digel ku Horîkê xwendina bilind neqedandi bû, lê salix û sinciyên wî yên kesane zor balkêş bûn û şûna wê yekê digirtin.

### Ebdirehman Osman (1943-1996).



Ebdirehman Osman

Ebdirehman Osman, navekî naskirî ye li ba şêniyê Çi.Kurmênc. Wî ji destpêka jiyana xwe de di nav tevgera siyasî ya Kurdî de kar dikir, û di warê xebata Kurdeweriyê de zor çalak bû.

Li sala 1961ê, bi sedema dadana agirê Newrozê hat girtin û li sala 1984an jî dîsa ji ber çalakiyên xwe yên siyasî ve nêzîka mehekê hat girtin û toşî êşkenceyên giran bû.

Li sala 1973an, di hilbijartinên perlemanî de bû namzetê Partî, û digel ku wî dengine bilind anîn, lê nîrên hilbijartinê yên ji aliyê dewletê ve rê nedan ku ew û hevalên xwe bigihên perlemanê. Lê belê, ew di du gerên hilbijartinên herêmkî de, li salên 1972 û 1976an, bi ser ket û bû endamê encûmena herêmkî ya parêzgeha Helebê.

Ebdirehman mirovekî dilêr û zana bû, ji gel û civaka xwe re dilsoz bû. Bi sedema xweveşartina wî ya demdirêj ji ber asayişên dewletê, wî piraniya xelkê navça Efrînê nas dikir û mîna ferhengeke civakî bû.

## Wehîd Mehmûd

Wehîd Mehmûd, li dirêjiya çend dehsalan mirovê komonîst ê herî navdar bû li navça Efrînê û pir li ser dihat dengkirin. Ew li sala 1953an derbas nav P.Komonîst bû û ji wê hîngê de û ra salên dawîn ji sedsala bîstan kadirê wê bû.

Li sala 1955an, li gel şandeke P.Komonîst, di "kongira aştî û dostaniya di navbera gelan de" li Hêlsinkî paytexta Finlende beşdar bû. Di salên 1973an û 1981ê de du caran ji hêla P.Komonîst ve bû endamê encûmena gelê Sûrî.

Hêja ye were gotin, ku Wehîd Mehmûd endamê perlemana Sûryê yê yekê bû ku di dema P.Be'is de li Sûryê, û di bin bana perlemanê de, wêrî bigota ku "Kurd li Sûryê hene" û eşkere li ser Kurdên Cezîrê yên bê nasname deng kir.



**Wehîd Mehmûd li gel Ezîz Mihemed sekretêrê berê yê P.Komonîsta Êraqê "bi cilên Kurdî".**

# Beşê Heştan

# Jiyana Perlemanî li navça Efrînê

# Lêkolîna Yekê

## Jiyana perlemanî li Navça Efrînê[1]

### Jiyana Perlemanî li serdema Osmanî:

Bi şêweyekî tevahî, dewleta Osmanî dewleteke zordar bû, Siltên û berdevkên wî dewlet li destê xwe digerandin, şalyar, karbidest, walî û hemî karbidestên mezin ji koşka Siltên de dihatin danîn, ew hemî ji Siltên re dibûn alîkar û bi şora wî radibûn û rûdiniştin. Waliyan jî hakimên deveran ji nav Axe û serokên hozan vedibjartin. Ew hakimên deverkî, di komlgeheke pir li şûnmayî de dibûn xudî şor û biryar, wan ji dewletê re xû dicivand, serbaz û pêdviyên wê pêk tanîn û ji waliyan re alîkar û xizmetkarên dilsoz bûn.

Di rewşeke wilo de, hebûna hukmekî dadmend ne bi hebûna zagon û rêzanên dewletê ve girêdayî bû, ew tenê bi sincî û salixên Siltên, walî, peya û karbidestên dewletê, derebegên deveran û bi serokên hozan ve girêdayî bû.

Wek encam, gelên ku di çarçewa dewleta Osmanî de dijiyan, di bin nîrên hukmekî giran de dibûn û rê bi wan ne diket, ku di nava dewletê de bibin xwedî maf û rol.

Di wan rewşan de, kesên ku ji nijadê Tirk bûn, hemî mofirkên dewletê yên giring xisti bûn destên xwe, rêberên gelên din jî berjewendiyên xwe û destlata Siltên diparastin. Ev şêweyê hukum, vîna gelan li seranserî herêmên dewletê tune dikir.

[1]- Ji bo vê mijarê, me ev jêder bikar anîn: Fadi 'Effaş: Pirtûka “encumenên gelêrî û nûnerî li dewletên Erebî”. Berêz: Ehmed Ce'fer Şêx Sima'îl. Osman Axa Robarî. Hesen Birîmo ji Gu.Satiya, û hin kesên ku li wan deman çalak bûn, û daketi bûn hin hilbijartinan jî.

Lê belê, li dema dawîn ji hukmê Osmanî, encûmenên nûneran li hin deveran hatin damezrandin. Lê bi tevahî, ew jî ji bin şora waliyan û pêkanîna fermanên Siltên dernediketin.

Eencûmeneke wilo li bajarê Kilisê jî hebû. Hatiye naskirin, ku li nîvê diduyan ji sedsala nozdehan, mirovekî bi navê Îbrahîm (Birîmce) ji hêla axayên mala 'Umê ve di encûmena qeza Kilisê de hati bû bicihkirin.

## Perleman li dema intîdaba Firensî

Li dema dagîrkirina hêzên Firensî ji Sûryayê re, û piştî ku rewşên ewlehî hêmin bûn, û ji bo ku Firensî hebûna xwe li ser zemînê xort û rewa bikin, û piraniya nofên civaka Sûryê ji xwe razî bikin, wan hin ustubariyên xwe yên îdarî ji Sûryan re hîştin, wan kesin vebjartin, kirin karbidest û berpirsyarên ew dewleta ku nû hati bû avakirin, pişt re wan rê dan hilbijartinên perlemanî jî.



**HUSÊNÊ 'EWNÎ (1890-1994**

Li ber roniya wê siyasetê, li meha Nîsana sala **1928an**, “Komeleya Damezraw” li Sûryê, ku ji heftê endamî pêk dihat, hat vebijartin. Di wê komeleyê de, *Reşîtê Şêx Sma'îl* (*Kor Reşît*) nûnertiya navça Çi.Kurmênc kir[1].

Li sala **1932an** jî, yekemîn hilbijartinên perlemanî li Sûryê hatin kirin. Di wan de, rêberê hoza Şêxan *Husên 'Ewnî* bi ser ket û bû nûnerê Çi.Kurmênc. *Menan Niyaziyê Çirûsan* jî ku ji Axeyên Şikaka bû û li gundê xwe Sêcerazê ku bi ser navça Ezazê ve ye rûdinişt, bi ser ket û ew jî ji ber Na.Ezazê ve bû endamê perlemana Sûryê.

Li sala **1936an,** hilbiratinên prelemana Sûryê li ser du bergehan çê bûn, dîsa *Husênê 'Ewnî* bi ser ket û nûnertiya navça Çi.Kurmênc kir. Di vê gera hilbijartinî de, Tevgera Mirûdan ji wî re alîkar bû, û

---

[1] - Qeza Çiyayê Kurd, ev nav li dema intîdaba Firensî bi Erebî dihat bikaranîn, ew ji binavkirina Osmanî “Kurdax” hatiye wergerandin.

Partiya Kitla Wetenî jî namzetiya endamê xwe Erif Axa ji bo xatirê Husênê 'Ewnî kişand[1].

Hêja ye em bêjin, ku hin zanayên mala Şêx Sim'el dibêjin, ew di wan hilbijartina de tunebûn, ji ber ku ew alîgirên damezrandina Senceqekê bûn li navça Çi.Kurmênc, û ji bo ku Firensiyan Kitla Wetenî razî bikira, ne hîştin Kor Reşît dakeve hilbijartinan.

Di hilbijartinên sala **1943an** de, ev kes ji ber navça Çi.Kurmênc ve hatin hilbijartin: *Mihemed Hec Mihemed Şêx Sma'îl (Şêxo Axa), Fayiq Menan Axa Şêx Sma'îl*. Ji ber navça Ezazê ve jî *Cemîl Bafî* bi ser ket û bû nûnerê Ezazê, ew jî mirovekî Kurd bû ji Gu.Qitmê û navê xwe li ser gundê xwe Tatmeraşê, ku bi ser Ezazê ve ye, dabû. Encûmena nûneran rûniştina xwe ya yekê li 14 Gulana 1943an girêda.

---

[1]- Mercên wê demê kirin, ku Husênê 'Ewnî razî bibe gundê xwe Gomîtê bi ser senceqa Iskendeonê xîne, û paşê jî ew bi ser Tirkiyê de çû. Li wê demê, du gundên din jî, Sicê û Pêrşan, pêre çûn.

## Li dema Serbixwebûna Sûryê

### Di salên di navbera 1945-1958an de:

Li salên piştî serbixwebûna Sûryê gelek serok, hukmet, hilbijartin û perleman di ser Sûryê re derbas bûn.

Li meha **Hezêrana 1947an**, hilbijartinên yekser ji bo perlemanê lidar ketin û ev kes li Çi.Kurmênc bi ser ketin: *Xelîlê Seydo Mîmê*[1] *û Arif Robarî* ku alîgirê P.Kitla Wetenî bû. Lê vê encûmenê tenê dora du salan kar kir û li Adara sala 1947an ji hêla inqîlabciyên sala 1949an bi serokatiya Husnî Ze'îm hat pişaftin. Lê piştî ku di wê salê bi xwe de, Husnî Ze'îm hat kuştin, ew encûmen dîsa hat ser kar û danîna destûreke damezrawî ye demkî pê hat hilpesartin. Lê disa ew encûmen hat tunekirin û hilbijartineke perlemanî ye nû çê bû.

Hilbijartinin li dawiya **1949an** jî bûn, û ev namzet bi ser ketin: *Fayêq Menan Şêx Sma'îl Zade û Mistefa Betal Ehmed*[2]. Encûmenê du salan berdewam kir û bi destê Edîb Çîçeklî hat rûxandin.

Piştî wê, di sala **1953an** de, hilbijartineke perlemanî ye nû hat kirin û ev kes di encamên de bûn nûnerên navça Efrînê: *Ehmed Ce'fer Şêx Sma'îl û Fayiq Menan*[3]. Lê bi sedema inqlabeke leşgerî, vê encûmenê jî bêtirî salekê dirêj ne kir.

---

[1] - Ji ber ku Xelîl Axa nexwende bû, û ji bo ku navdana wî were pejrandin, desteya namzetiyê di belgeya navdanê de wiha nivîsand: (Ew bi Kurdî baş dizane bixwîne û binivîse), jixwe rastî jî ne wilo bû.

[2]- Ji Gu.Celemê ji neviyê Betal Axa ye, ku li sedsala hejdehan xudanê kela Basûtê bû.

[3]- Piştî vê dîrokê, dewletê navê navçê ji Çiyayê Kurdan kir Navça Efrînê.





**Nasnama perlemantêr Mistefa Betal ji sala 1949an.**

Li sala **1954an** hilbijartineke nû çê bû, di wê de ev kes bûn nûnerên navça Efrîn: *Fayêq Menan Şêx Sma'îl Zade, Ehmed Ce'fer û Ezet Xelîl* ji Gu.Be'dîna[1]. Ev hilbijartin pir ji yên berê germtir bûn û beşdarên wê jî bêtir bûn[2]. Bi rastî jî, ew cara yekê bû ku namzetên du nofên siyasî û civakî yên cuda li hember hev dadiketin hilbijartinan. Kesên nofa **yekê** ya ku biser ket Axe û derebeg bûn. Nofa **diduyan** jî demoqratên pêşverû bûn, lîsta wan jî bi navê “lîsta yekîtiya niştimanî” bi nav bibû û bi “lîsta fiqaran” jî dihat nasîn. Tenê du namzetên vê lîsta "fiqaran" hebûn, yek dozger *Osman Mihemed Osman* bû, yê din jî *Reşît Hemo* ji Partiya Komonîst bû.

---

[1]- Erebên navçê dengên xwe dan Ehmed Ce'fer.

[2]- Lê ji hilbijartinên din ne paktir bûn, di hejmartinê de nivîskarê naman li Efrînê, ku karbidestekî dewletê bû, gava ku nav ji lîstên dengdanê dixwendin, hejmara dengan şaş digot, û li berjewendiya hinekan tanî.





**Kaxezeke dengdanê ji hilbijartinên sala 1947an li Navça Çiyayê Kurmênc.**

## Li dema yekîtiya Sûryê û Misrê (1958-1961):

Li vê demê, hilbijartin ji bo Encûmena Milî hatin lidarxistin. Û ji ber ku hemî partî li Sûryê hati bûn qedexekirin, hilbijartin di çarçewa Partiya Yekîtiya Netewî de hatin kirin û di encamê de ev kes bûn nûnerên navça Efrînê: *Mihemed Zihnî Robarî, Ehmed Ce'fer (Şêx Sma'îl) û Şêx Mihemed Hec Henan Şêx Sim'el* bi navê *Bay Memed* tê nasîn. Civîna yekê ya wê Encûmenê li 21 Tîrmeha sala 1960î hat girêdan.

### Li salên 1961-1963an:

Piştî ku li sala **1961an** yekîtiya Misrê û Sûryê hat rûxandin, û tevgera cudabûnê bi ser ket, destlata nû li 1-2 Kanûna Yekê ji sala 1961ê hilbijartinek ji bo avakirina encûmeneke damezrawî û perlemanî li dar xist. Di wê de, ev nûner bi ser ketin: *Ehmed Ce'fer Şêx Sma'îl Zade, Mihemed Nûrî Arif û Mihemed Zihnî Robarî.* Tiştê balkêş ew bû, ku cara yekê bû Partiya Demqrat a Kurd dadiket hilbijartinan û Ehmed Şefî' Bîlal kir namzetê xwe. Partiya Komonîst jî Mûsê Basilê wek namzet bi nav kir, lê belê ew her du jî bi ser ne ketin.

Temenê wê encûmenê kin bû, ji ber ku li sala 1963an inqîlabek leşgerî ya Partiya Be'is çê bû û destlata Sûryê ji xwe re bir.

Piştî vê kurteraveyê li ser hilbijartinên di navbera salên 1928-1963an de, em kanin li derbarê hevbendiyên hilbijartinî di navbera malbatên navçê yên wê demê de wiha bêjin:

- Mala Şêx Sim'el û mala Dîkê, ji ber ku zaveyên hev bûn, herdem li pişta hev bûn, carina mala Cirûsan û Êzdî jî tevle wan dibûn. Û piştî ku rêberê Şêxan Husênê 'Ewnî li sala 1938an bi aliyê Tirkiyê ket, devera Şêxan, bi taybetî jî gundên Meydana û Meydan Ekbezê û Şiyê, dengê xwe didan mala Şêx Sim'el.

- Di piraniya hilbijartinan de, malên Şêx Sim'el û 'Umê haj hev hebûn, carina mala Gênc jî tev wan dibû, û bi hev re li hember mala Seydê Mîmê dadiketin hilbijartinan. Li hêla din, herdem piştgirî di navbera mala Seydê Mîmê û Robariyan de hebû.

- Giringiyeke cihê dengdanê hebû. Her namzetekî hewil dikir, daku sandiqa dengdanê bibe gundê ku Mixtarê wê li aliyê wî bû. Ji ber ku Mixtêr pêşwaziya dengdêran dikir û naza wî ji bo dengdanê jî li wan dibû.

- Bi sedema ku navendên dengdanê hindik bûn, giringiya pêkanîna navgîniyên çûnhatinê di qezenckirina dengên dengdaran de hebû. Û ji ber ku navenda sandiqên dengdanê ji hêla Qeymiqêm û karbidestên dewletê ve dihatin binavkirin, rola wan jî zor giring bû.

- Rola Cendirman û pasewanên daristanan jî di dengdanê de hebû, ji ber ku ew yekser di nav gel de bûn, û rola wan ya rojane di jiyana xelkê de pir bû.

- Rola endamên komîteya li ser sandiqan jî hebû. Çinkî wan jî kanî ji ber sedemên pir biçûk, asteng ji dengdêran re peyda bikirana û nehîştana dengên xwe bidana.

Herwiha, gelek kirde di qezenckirina dengan de hikardar bûn, mera kane bêje, ku di wan hilbijartinan de jî lîsk çê dibûn, lê belê tiştê herî balkêş ew bû, ku namzet di warê gotin û ragihandinê de, kanî û azad bû jî ku li ser hemî pirs, mijar û waran baxiviya.

## Hilbijartin di dema destlatdariya Partiya Be'is a Ereb a Sosyelîst

Li destpêka salên şêstî ji sedsala borî, zagona "durustkirina çandiniyê" li Sûryê bi cih hat. Wê yekê hikariyeke pir mezin li ser rêxistina civakî ya derebegîtiyê kir.

Li wan çaxan, ramanên siyasî yên çepgir jî belav bû bûn. Partî û rêxistinên hebûn, û yên ku nû ava dibûn jî, dest bi rûxandina bingehên ramana sîstema têkliyên derebegîtiyê dikir û agahên civakî diguhertin. Li ber bayê van guhertinên kûr û bingehîn, nof û qadine civakî yen nû li ser bingehine siyasî û ramanî yên cuda, di nava civak û dewletê de serî hildan.

Li vê qonaqê, têkliyên hozîtiyê jî li navça Efrînê gihîşti bûn dawiya hebûna xwe. Hin malbatên derbegî yekcar ji hev şelî bûn, hin jî destlatdariya xwe a civakî û siyasî pir lawaz bû bû.

Ji hêleke din ve, ferebûna çalakiyên P.Komonîst û belavbûna ramanên netewî û demoqratîk di nav Kurdên navçê de, hikariyeke bilind di guhertina gelek tiştan de dikir. Li serê wê yekê, destê malbatên derbegî yên kilasîkî ji ser rewşa hilbijartinan radibû û nema deverên navçê li ser bingeha destlatdariya malbat û hozan dihat parvekirin.

Di van rewşan de, û li heştê Adara sala 1963an, Partiya Be'is destlat li Sûryê bi inqîlabeke leşgerî radest bir. P.Be'is li destpêka destlatdariya xwe, ew perlemana ku li dema tevgera cudabûnê hati bû hilbijartin, ji hev şeland û piştî du salan “Encûmena Şoreşê ya Niştimanî” damezrand. Lê tu endam ji navça Efrînê di wê encûmenê de tunebûn.

Piştî Tevgera Serastkirinê ya 16.10.1970yî, ya ku Hafiz Esed pê rabû, “Encûmena Gel” hat damezrandin û endamên wê ji hêla destlata Be'is ve hatin binavkirin. Wê hîngê *Ebdirehman Dirê'î Berazî* ji ber navça Efrînê ve hat birin(1). Ev encûmena ra Hezêrana sala 1973an li ser kar ma.

---

1- Ebdirehman Dirê'î Berazî, Kurdekî ji Gu.Til Ziĝîrê ji gundên Kurdan ên li bakurê Helebê bû. Jina wî ji gundê Qestela Kîşik bû. Ew li bajarê Efrînê erzalcî bû, kurê wî Ebdilhemîd jî parêzer bû, û demekê bû dozger jî.

Piştî wê, yaseya nû ji bo hilbijarinên encûmena gelê Sûryê derketin, li gor wê yaseyê, hilbijartin û dengdan yekser ji hêla welatiyan de tê kirin, çarçewa navçeyên hilbijartinî jî, li gor wê yaseyê hatin guhertin û fere bûn. wek nimûne, parêzgeha Helebê bû du navçeyên hilbijartinî, **yek**: Şêniyê Bajarê Helebê nûnerên xwe hildibijêrin. **Didu**: Hemî navçeyên kargêrî ku bi ser bajarê Helebê ve ne, bi hev re nûnerên hemî navçan hildibijêrin.

Vê yaseyê pirsgirêkên rastînkî peyda kirine, jê, gengaz tuneye ku hilbijêr kani bin namzetên derveyî navça xwe nas bikin, û zor dijwar e jî ku namzet kani bin çavdêriyê li ser karê hilbijartinê li navçeyên din bikin. Ji hêla namzetan û binemalên wan yên civakî ve jî, rewş pir hat guhertin û bi aliyekî din ve çûn.

Di wan rewşên nû de, ku ra roja me hîn berdewam in, hilbijartinên Na.Efrînê li ser bingehên siyasî û partîtî tên durustkirin. Ji gera destûrî (teşrî'î) ya yekê de li sala 1973an, du hêzên hilbijartînî yên sereke li Na.Efrînê diyar bûn, **yek**: Partiya Be'is û hevbendên wê yên di nav Bereya Niştimanî ya Pêşverû (BNP) de. **Didu**: Tevgera Siyasî ya Kurdî.

Emê li jêr rewşa hilbijartinên Encûmena Gel û encamên wan dînin ber çavan, û kurteşirovekê li ser her gereke hilbijartinî, ji sala 1973an û ra sala 1998an, bidin zanîn.

### 1- Gera destûrî ya yekê- Gulan 1973an

Hilbijartinên wê di heyameke pir qerezdar de çê bûn. Qerez di navbera lîsta dewletê ya (BNP) û lîsta (gundî ya yekgirtî) de, ku namzetên Tevgera Kurdî tê de bûn, rabû. Namzetên Tevgera Kurdî ev bûn: Ebdirehman Osman, Mihemed Emîn Şêx Gulîn, Mihemed Nûrî Arif û Mihemed Menan Şêx Sma'îl Zade. Siyastvanê Kurd Reşît Hemo jî ji ber partiya xwe P.Demoqrat a Kurd a Pêşverû ve bi tenê daketi bû.

Wê hîngê, namzetên lîsta Gundî ya Yekgirtî digotin, ku hin aliyên dewletê yên fermî destê xwe dirêje encama hilbijartinan kirine û lîsta BNP bi ser xistine. Ji lewre, tenê endamên BNP nûnertiya Na.Efrînê kirin, ew jî ev bûn: *Ebdirezaq Ebdî* ji

Gu.Kurzêla Cûmê-Be'sî, *Wehîd Mehmûd*- Komonîst û *Esmet Robarî*- serbixwe.

2- **Gera destûrî ya duyem- 1977an**

Hilbijartin di meha Tîrmehê de bûn. Hin rêxistinên Kurdî -Partî jî di nav de, ne bi namzetî û ne bi dengdanê daketin hilbijartinê?? hilbijartinan, bihaneya wan ew bû, ku bi deh hezaran Kurd li parêzgeha Hesekê bê nasname ne, û ji mafê namzetiyê û dengdanê bê par in. Herwiha ev namzetên BNP bi ser ketin: *Esmet Robarî*, *Mihemed Menan Şêx Sma'îl Zade*, *Mihemed Mûrad* û *Wehîd Memûd*.

3- **Gera destûrî ya sêyem 1981ê**

Ji ber sedemên ku me berê goti bûn, dîsa partiyên Kurdî daneketin hilbijartinan. Li vê carê jî ev endamên BNP nûnertiya navça Efrînê kirin: *Betal Arif, Esmet Robarî û Mihemed Mûrad*.

4- **Gera destûrî ya çaran 1986an**

Rêxistinên Kurdî li navçê çêtir dîtin, ku danekevin hilbijartinan, û herwiha dîsa BNP bi van kesan çû perlemanê: *Ruf'et Bîlal* ji ber Nasiriyan ve, *Betal Arif, Ehmed Mixtar*[1] *û Esmet Robarî.*

5- **Gera destûrî ya pêncan 1990î**

Çirûskek azadî li wê salê hat dîtin, ji ber wê jî hemî rêxistinên Kurdî daketin hilbijartinan. Di encamê de, du alîgirên PKK li navça Efrînê bi ser ketin û bûn endamên encûmena gel. Ew jî ev bûn: *Mihemed Se'îd* ji Gu.'Etmana û *Ebdirehman Îbo* ji Gu.Aşkê Şerqî. Nûnerên BNP jî ev bûn: *Ebdurehman Nasêr, Betal Arif û Ebdilhemîd Robarî*.

6- **Gera destûrî ya şeşan 1994an**

Li hêvara hilbijartinan, Parêzgerê Helebê ji namzetên serbixwe xwast, ku ji hilbijartinan bikşên, û wilo lîsta BNP û serbixweyên ku dewletê vebjarti bûn, ji ber xwe ve bi ser ketin. Wê hîngê namzetên tevgera Kurdî ligel gelek namzetên serbixwe, doznameke nerazîbûnê radestî destlatê kirin. Di vê torê de, nûnerên navçê yên

---

1 - Efserekî Polîsan bû, ritba wî ‘Emîd (ragir) bû.

BNP û serbixweyên alîgirên wê, ev bûn: *Ebdilhemîd Robarî, Esmet 'Umer, Ehmed El-Xetîb, Fatîne Ehmed*[1] *û Betal Arif.*

## 7- Gera destûrî ya heftan 1998an

Namzetên Tevgera Kurdî xwe ji hilbijartinan kişandin, û doznameke nerazîbûnê radestî şalyarê karê hindur û dîwana serokê komarê kirin, tê de gumana xwe danîn ser şêweyê gerandina hilbijartinan û encamên wê. Û wilo, dîsa endam û alîgirên BNP çûn perlemanê, ew jî ev bûn: *Mihemed Elî Qer'a, Mihemed Cemal Huso, Fatîne Ehmed, Ebdilhemîd Robarî û Kemal Al 'Umo*.

Emê hin zanînên serhejmarî, li derbarê rewşa perlementeriyê li navça Çi.Kurmênc ji sala 1928an de û ra sala 1961ê xuya bikin. Hêjayî gotinê ye, ku ra sala 1961ê hemî nûnerên navçê Kurd bûn.

| Sal | 1928 | 32 | 36 | 43 | 47 | 49 | 53 | 54 | 60 | 1961 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Hejmar | 1 | 1 | 1 | 2 | 2 | 2 | 2 | 3 | 3 | 4 |

**((Salên di navbera 1928-1961ê de))**

| sal | Hejmar | Kurd | Ereb | Be'sî | Komonîst | Nasirî | Serbixwe |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1973 | 3 | 2 | 1 | 1 | 1 | - | 1 |
| 77 | 4 | 4 | - | 1 | 1 | - | 2 |
| 81 | 3 | 3 | - | 2 | - | - | 1 |
| 86 | 4 | 4 | - | 1 | - | 1 | 2 |
| 90 | 5 | 4 | 1 | 2 | - | - | 3 |
| 94 | 5 | 4 | 1 | 3 | 1 | - | 1 |
| 1998 | 5 | 4 | 1 | 3 | - | - | 2 |

**((1973-998))**

[1]- Keça perlemantêrê berê Cemîl Bafî ji Gu.Qitmê ye, ew li bajarê Ezazê bi mêr e.

## Hilbijartinên Rêbertiya Herêmkî

Li sala 1972an, yaseya Kargêriya Herêmkî li Sûryayê derhat. Li gor wê, encûmenên parêzgeh û bajar û bajarokan hatin çêkirin, û endamên wan her çar salan bi riya hilbijartinan tên danîn. Lê dewletê destê xwe danî ser wan hilbijartinan jî, û ew jî li gor daxwaza xwe gerandin.

Li destpêkê, li salên heftêyî ji sedsala bîstan, hin azadî di warê hilbijartinên herêmkî de dihat dîtin, ji ber wê jî, hin endam û alîgirên Tevgera Siyasî ya Kurdî li du geran /1973 û 1977/ gihan encûmena parêzgeha Helebê, hin ji wan nûneran ev bûn: *'Ebdirehman Osman, Tahir Dîko, Enwer Simo, Esmet Şêxo ji Hesendêra*..

Li destpêka salên nodî ji sedsala bîstan, hin alîgirên PKK jî gihan encûmena parêzgeha Helebê, wek: *Esmet Şêxo ji Qeredepe, Ebdirehmanê Cemîl ji Turundê û Hesenê Bêkir*..

Ji bilî wan, hemî kesên din ji navçê ku digihîştin Encûmenên Kargêriya Herêmkî, herdem ji Bereya Niştimanî ya Pêşverû û kesên ku nêzîk P.Be'is û destlatê bûn, û hîn jî wilo ye.

# Ji çalakiyên hin perlemanterên Çiyayê Kurmênc

Bidestxistina belgeyên karûbarên perlemana Sûryê, ne tiştekî hêsan e. Hemî nûnerên berê, yên ku me dîtin, û belge li ser çalakiyên wan ên perlemanî jê xwastin, tişt ne dan me, belkî jî ji ber ku ji binî de çalakiyên wan yên balkêş tunebûne!. Lê belê me kanî belgenameyên rûniştinên Gera destûrî ya şeşan (1954-1957) bi dest xistana.

Di wan belgeyan de hat xuya kirin, ku her du nûnerên Çi.Kurmênc ên wê demê **Fayîq Axayê** Şêx Sma'îl û **Ehmedê Ce'ferê Şêx Sma'îl**, bi taybetî jî yê dawîn ji nûnerên çalak bûn di perlemana wê demê de.



**Fayiq Axa**

Fayiq Axa yek ji endamên perlemanê bû ku li dijî biryara yekîtiya Sûryayê û Misirê sekinî, ji ber wê jî ew li wê çaxê ji Sûryê derket û demekê li Tirkiyê rûnişt.

Ehmed Cefer jî baş guh dida pêdviyên Na.Efrînê, wek xwendina zarokan û bicihanîna pêdviyên kargûzarî, ligel pirsên niştimanî jî.

Emê, wek nimûne, çend biran ji gotinên wan di gera perlemanî ya wan salan de bidin ber çavan.

Di rûniştina perlemanê ya yazdehan de, li dîroka 11.12.1954an, Ehmed Ce'fer gotinek li derbarê Qeza Çi.Kurmênc kir**,** û wiha got:

((Ji ber ku du sed hezar welatî li welêt hene nizanin bi Erebî deng kin, ez wê rastiyê dibêjim û xemgîn im jî, çinkî hukmetên berê guh ne didan ku wan fêrî zimanê Erebî bikin. Ji ber wê jî, ez ji şalyarê dadê daxwaz dikim, ku ew çend katan di radiyoya Sûryê de bide zimanê Kurdî(1)…)). Şalyarê dadê Elî Bozo -ji Kurdên Şamê bû- lê vegerand û ji serokê perlemanê re wiha got: ((Na ezbenî, ez razî nabim, û tu carî nêrîna wî li ser vê mijarê pesend nakim)).

---

[1] - Li wê demê, wezîrê dadê serperiştî li ser îzgehê jî dikir.

Nûner Mihemed Mubarek jî lê vegerand û wiha got: ((Min ji hevrêyê xwe hêvî dikir, ku ew bixawze wan fêrî zimanê Erebî bike, ji ber ku ji armancên îzgehê ye, ku neteweyên ne Erebî bihelîne…)).

Di rûniştina bîst û çaran de, li roja /9/ Tebaxa 1955an jî, li derbarê belavkirina xwendin û rewşenbîriyê li navçeyên sînorî, di gotina nûner Ehmed Ce'fer de wiha hatiye:

((…li navçên li ser sînor, nêzîkî milyonek merov heye bi Erebî nizan in, di vê boneyê de dibêjim: Min di gotineke xwe de xwest, ku demek ji îzgeha Sûryê ji zimanê Kurdî re were dayîn, daku wan navçan bi şêweyekî Erebkî yî durust werin perwerdekirin, lê hin kesan gotina min bi rengekî nijadperestî şirove kir. Bawer bikin ez niştimanperwerekî dilsoz im, maf û dadê ji şêniyê wan navçeyên ku ez wan dinimînim re, dixwazim. Ez vê fersendê digrim, û bangîna xwe dikim tevahiya hukmetê û we jî, daku win bi nêrîneke rast li wan navçan binêrin, û netenê bi gotinan bikin, ji ber ku dîrok dê bibîr wîne, ku me ev tişt ji we xwast. Em li benda karên we ne, dîsa jî dixwazin bi gotinên me bikin û dixwazin jî mekin!...))

Di gotineke din de jî li 8.1.1955an Ehmed Ce'fer dibêje:

((…li dema ku em dibînin gelek dibistan li bajar û navçeyên ku bi Erebî daxivin hene, em dibînin li navçeyên ku bi Erebî deng nakin, ji dibistanên navendî û lîseyî bêpar in. Lê gava ku kesek demekê ji bo weşandina hin gotinên netewî yên perwerdeyî û stranan bi zimanê wan welatiyan dixwaze, ew bi nijadperestî, tayîfî û ra bi xiyanetiyê tê gunebarkirin…)).

# Beşê Nihan

# Hin Kesayetiyên naskirî ji Çiyayê Kurmênc

## Kesayetîne naskirî ji Çi.Kurmênc

Li dirêjiya salan, gelek kes û peya di warên civakî, rewşenbîrî, hunerî û siyasî de li Çi.Kurmênc hatine naskirin, gelek ji wan di hin qonaqên dîroka navçê de bi rol û destlatdariya xwe hatine zanîn, yan jî navên wan bi hin bûyerên dîroka navçê ve hatine girêdan, navên gelekan jî di nav rûpelên vê pirtûkê de hatin gotin. Gelk kes jî hebûn, me nikanî zanînên têrkirî li ser wan bi dest xistana, di nav wan de navserên civakî, wêjevan, helbestvan, hunermend, kesên zanyar, bi taybetî jî ewên ku li welatên biyanî dimînin.

Ji bilî wan, hin kesên navdar hene, tamarên malbatên wan digihên navça Çi.Kurmênc, wek şêwesazê Sûrî Fatêĥ Muderês, diya wî Kurd e, ji Gu.Qitmê ye, wî gelek babetên berhemên xwe ji civak û sirûşta Çi.Kurmênc birine, wek çêroka Reşo Aĝa .. û hwd.

Di pirtûka /Dîroka Kilis / de, nivîskarê wê "Qadirî" jî jînenîgariya pir kesên ji qeza Kilisê, ku li hin bergehên dîrokê, di warên çande, wêje, zanîn û destlatê de navdar bûn, dane nasandin, wek nimûne: Mihemed Emîn Paşa waliyê Helebê li sala 1823an.

Gelek kesayetiyên din jî hene, navên wan di dîroka navçê de naskirî ne, wek: Mar Maron, Mar Sem'an, Usquf Tiyodora… Mîr Mend, Şêx Ezdîn, Canpolat beg, Husên Beg Canpolat… Welî Axa Hec Omer, Betal Axa, Sefûn Xatûn, Hewe Xatûn, Şêx Îbrahîm Xelîl, Eslan Axa, Husên 'Ewnî… û gelekên din jî hebûn.

Ji bilî ev kesên ku me bi bîr anîne, pir kesin jî hene rol û destê wan di gelek warên dîrokî, civakî û jiyana şêniyê Çi.Kurmênc de heye, ew hunermend, rewşenbîr, perlemntêr, şervan, siyasî…ne. Hin ji wan li darê dinê ne, hin jî mirine, hin me dîtin, hin jî me tenê navên wan bihîstiye.

Loma jî me dît dê sûdar be, eger em beşekî ji vê pirtûkê ji ew kesên ku me kanî bû jinenîgariya wan bi dest xista re dînin. Emê lêborînê ji kesên ku me nikanî xwe bigihanda wan bixwazin. Hêvîdar in, di paşerojê de kesekî din pirtûkeke taybet li ser kes û peyayên Navçê dîne.

**Têbîn**: Lidûhevhatina navan, dê li gor kevnahiya dîrokî ya wan kesan be.

# Lêkolîna Yekê

## Kesin ji dîroka nû li Çi.Kurmênc

### Silêmanê Helebî

Piraniya jêderên dîrokî yên Erebî dibêjin, Silêmanê ku Ceneral Klîper serokê artêşa Firensî li misirê kuştiye, mirovekî Helebî ye, lê ew li derbarê netewe û cihê jidayîkbûna wî tiştekî nabêjin.

Lê di pirtûka "Dîroka Cewdet" de (dîroknivîsekî Osmanî ye)[1] li derbarê wê bûyerê, û jiyana Silêmên wiha hatiye:

(( Li 21 meha Hezîrana sala 1800î, bûyreke seyr bi vê şêweyê çê bû: Dema ku, Ceneral Klîper li gel endezyarê avahiyan yê artêşê, di baxçê mala xwe de digerî û ji wî re pêdviyên berdana wê malê hewaldidan, mirovekî ne nas, mîna ku xwedî kar be, derhat, ji Ceneral ve nêzîk bû û dazxwaznamak dayê, û gava ku Ceneral ew ji dest girt û lê nihêrî, wî xençera xwe kişand, û çend caran li sîngê Klîper da. Endezyar hewil kir, ku wî têvede û bi ço li serê Silêmên da, lê wî xençerek li wî jî xist û ew jî birîndar kir.

Klîper ket xwar û piştî çend werdekan mir, kuştar jî xwe avêt baxçekî nêzîk. Û gava ku serbaz li ser banga Endezyêr hatin û rastî nas kirin, ew li dora avahiyê li kuştêr gerîn, li wê demê jinekê di pencereke nêzîk de bûyer dîti bû, wê cihê ku kuştêr xwe tê de veşarti bû şanî serbazan da û wilo ew hat girtin.

Gava jê pirsîn, got: Navê min Silêman e, li Helebê jidayîk bûme, û bîst û çar salî me.

---

1 - Dîroka Cewdet, preçe 7, rûpel 84-87, çapa diduyan 1309g/1891z, wergêr Dr.Mistefa Nûrî. Dr.Mistefa Nûrî li Stembûlê xwend, û li navîna sedsala bîstan karê bijîşkiyê li bajarê Efrînê dikir, û li destpêka salên şêstî bû serokê şaredariya bajarê Efrînê.

Ji gotinên ku ta radek bilind bawerî pê dibe hat naskirin, ku navê ew mirovê dilêr Silêman e, bavê wî Osman Axa ye, li Helebê li kuçeya “Mistam Beg” rûdine. Bapîrên wî ji malbata “Qubad Beg” ji gundê Kokanê ku li devera Cûmê bi ser qeza Kilisê ve ye[1].

Bapîrê Silêmên hatiye li Helebê rûniştiye û ketiye xizmeta mirovekî bi navê “Çelebî Efendî”, gava diya Silêmên mir, bavê wî jineke din anî. Rojekê, gava ku Silêmên û dêmariya xwe dev avêtin hev, kêrek di destê Silmên de bû, avête wê, kêr li ustûyê wê ket û ew mir. Silêman ji ber wê yekê pir poşman bû, serê xwe rakir çû Misirê û li wir li mizgefta Ezherê li dersên olî dewam kir.

Piştî demekê, gava ku ew vedigerî welatê Şamê, wî dît çawa artêşa Hemeyonî “Osmanî” ya şikestî ji misirê vedikşî, wê hîngê wî biryar da, ku tola birayên xwe yên olî vede û rêberê artêşa Firensî li Misirê bikuje, û belkî ew bi wê yekê jî kani be gunehê xwe yê kevin bişo, û herwiha vegerî Misirê û ya di serê xwe de kir…)).

Di pirtûka /dîroka Cibirtî, rûp 365 û 374/ de jî li ser Silêmên wiha hatiye: ((Ew li welatê Şamê ji dayîk bûye, mala xwe li Helebê ye, û temenê wî 24 salî ye. Bavê wî Hec Mihemed Emîn e û rûn li Helebê difroşe))[2].

Nivîskar Ebdilhadî Bekkar jî di rojnama /El-Şerq El-Ewset, hejmar 8122, dîrok 22.1.2001an/ de dibêje: ((Dema ku Silêman bîst salî bû, bavê wî ew şand Qahîra daku zanîna olî li Ezherê bixwîne. Lê piştî sê salan, û li dema ku Firensî hatin Misirê, ew vegerî cihê jidayîkbûna xwe Efrînê, lê belê wî paşê biryar da, ku vegere Misirê û Kilîper bikuje)).

Me jî ji hêla xwe de li ser Silêmên ji şêniyê gundê Kokanê pirs kir, me nas kir ku ew wê çêrokê baş dizanin, û zanin jî ku Silêman ji malabta “Os Qoper” e, ew malbateke mezin e, bêtirî sed malî heye, û piraniya wan li bajarê Helebê rûdinin. Kurd navê Osmên mîna (Oso, Os, Osik…) dibêjin… Û wilo guman namîne, ku “Os Qoper”

[1] - Ew destnîşane parkirinên kargêrî yên navça Çi.Kurmênc li dema Osmanî dike, Cûm jî deştek e, û deverke naskirî ye li navça Efrînê.
[2] - Ez bawer dikim, Osmanê ku di “dîroka Cewdet” de hatiye, kalikê Silêmên e, û bavê Mihemed Emîn e.

Osman Axa bi xwe ye, ewê ku di pirtûka /Dîroka Cewdet/ de hatiye salixdan.

Li gor wan hemî rastiyan, Silêman kurê Osman Axa ye, yan jî mîna ku El-Cibirtî gotiye ew neviyekî wî bû. Tiştê ku tu gumanê li ser mijarê nahêle ew e, ku kurê Os Qoperê yê bi navê Ĥuso, lawekî xwe bi Silêman bi nav kiri bû, ev Silêman dora sed salî jiya ye, û li salên pêncî ji sedsala bîstan miriye, yanê dîroka jidayîkbûna wî ji navîna sedsala nozdehan de ye.

Vî Sîlêmanî zanînên ne zelal li ser zimanê bav û apê xwe li derbarê "Silêmanê Helebî" digotin. Lê mixabin, ew gotin ne hatine belgekirin, belkî jî ji ber ku ew bûyer li ba malbatê naskirî bû, û pêdvî bi tomarkirina wê tunebû. Bawerî bilind e jî, ku "Ĥusoyê Os Qoper" lawê xwe Silêman bi (apê xwe yan bi kurê apê xwe) Silêmanê kujerê Kilîper bi nav kiri bû.

Jêderên dîrokî jî, ji dêvla ku Silêmên bi navê gundê wî Kokanê, yan bi devera wî Cûmê, yan bi netewa wî Kurd bi nav bikin, wan ew bi "Silêmanê Helebî" bi nav kiriye, tenê ji ber ku bavê wî li Helebê -li navenda wîlayetê- rûdinişt.

Qafê Silêmên li mûzexana "Învald" li Parîsê ye, û navê "kuştar" li ser hatiye nivîsandin.

## 'Ebdela 'Etûn

Ebdela bi navê ('Etûn) hatiye naskirin, ew ji gundê Çe'nka ku bi ser devera Reco ve ye. Jidayîkbûna wî ne nase, lê ew li sala 1908an miriye.

'Etûn li ber zulma waliyê Helebê rabû. Wî hin peya li dora xwe kom kirin û gefa kuştina Walî kir.

'Etûn xûk ji hin deverên Çi.Kurmênc distand û riya karwanên ku di navbera Helebê, Çi.Kurmênc, Lêçe û deverên Çi.Gewr de diçûn û dihatin, dibirî.

'E.'Etûn bi mêrantî û wêrekiya xwe navdar bû û li seranserî wîlayeta Helebê hati bû naskirin. Wî pir rêzdariya jinan digirt, eger jinek bi karwanekê re heba, wî riya wê ne dibirî, ta radekê, û ji bo ku karwanan xwe ji hêrişên 'Etûno biparastana, gelek caran jin bi

xwe re derdixistin, ew bi sedema wan sinciyan bi navê (Eşqiyayê bi rûmet) hat binavkirin, şêniyê Helebê jî li ser wî mînak çê dikirine û digotine: “Xwe kiriye 'Etûno”, û “Dema 'Etûno çû”[1]...

Lê piştî çend salan, Osmaniyan ew girt û li gundê “Erzînê” ku li rojavayê Çi.Gewr e bi dareke Çinarê ve bi dar de kir. Wek dibêjin, xelkê termê wî veşart, li ser gora wî lod hilda û ev biwêj li ser nivîsandin: “Şehîd 'Ebdela 'Etûn, li sala 1908an hatiye bidarxistin”, û gora wî jî pîroz dikirin.

Lawekî 'Etûn heye jidayîkbûna sala 1900î ye, ew li gundê Çe'nika ku bi ser bajarokê Reco ve ye, rûdine. Lawekî wî yî din jî bi navê Şêx Mihemed hebû, wî rêbertiya komek çekdar dikir, ew li sala 1920an li ber Firensiyan rabû, û pevçûna wan a yekê bi Firensiyan re li ber “Pira Texta”, li ser Ava Reş, derket.

Ji bilî ev mirovên ku me li jor anîne zimên, peyane din ji dîroka nûjen ji devera hoza Şêxan bi çetetî û serhildanên xwe hatine naskirin, wek **Qûşê Çigê** ji Gu.Xilalka, ew li destpêka serdema Firensî bi destê Axan hat kuştin.

### Miĥê Îbşaşê

Navê wî “Miĥo” ye, bavê wî “Îbşaşo” bû, ew li gundê Baseka li deşta Lêçe ji dayîk bûye. Ew gunda niha di nav sînorên Tirkiyê de ye[2].

Piştî nakokiyekê bi xalanên xwe û mala Reş Axa re, mala Îbşaşê ji gund bar kir û çû li ba mala Bermede li navça Hêrimê danî, pişt re çû li ba Ahmed Axayê Gênc karê cotariyê kir.

Miĥo li deşta Ĥemqê, rê li karwanek Osmanî ya postê birî û sê serbaz ji pasewanên wê kuştin, lê Miĥo hat gir û li Helebê ket girtîgehê. Piştî ku Osmanî di şerê Seferbêrlikê de şikîn û ji Helebê kişîn, Înglîzan hemî girtî berdan û herwiha Miĥo jî serbest bû.

---

1 - Têgotin: Waliyê Helebê, ji tirsa 'Etûn re, gelek pasewan li baregeha xwe bi kar tanîn. Û dema ku 'Etûn hat bidardekirin, walî dev ji wan berda û ew bêkar û bê rû man. Gava ku li ser rewşa wan ji wan dihat pirsîn, wan bi keser digot: Dema 'Etûno çû.

2 - Gotineke din heye dibêje, ew ji Gu.Gomîtê ye.



**Mihê Îbşaşê (rûniştî ye), li rastî wî Birîm, li çepê wî Bekir Gewrika**

Mirovên Miĥo yên li ku Gu.Kurzêla Cûmê dijîn, li ser jiyana Miĥo wiha dibêjin: Piştî ku Firensiyan şûna Înglîzan li Sûryê girt, hin kes li taxa Axyola Helebê li dora Miĥo civîn, û biryar dan ku şerê Firensiyan bikin, lê ji tirsa ku ew ziyanê bigihînin bajarê Helebê, mirovên Ĥelebî biryara xwe bi cih nanîn, lewre Miĥo vegerî deşta Ĥemqê û li wir dest bi çalakiyên li dijî artêşa Firensî kir.

Edhem Al Cindî li ser Miĥo wiha nivîsiye: ((Micahîd Miĥoyê Kurd, ew micahidê qehreman “Miĥo Îbo Şaşo” ye, wî fîşeka yekê di rûyê dagîrkerên Firensî de peqand, û komika wî ya berxwedanê, ya destpêkê bû ji komikên berxwedêrên Sûrî.

Destlata Firensî hêzeke cendirman bi ser Miĥo de şand, Miĥo xwe ji ber cendirman veşart, lê wan jina wî dane ber xwe û birin bajarê Hêrimê. Wê çaxê Miĥo dîn bû, wek Şêran bi pê cendirman ket û di navbera wan de pêvçûn derket, di encamê de çend cendirme ketin û yên din jî revîn, û herwiha Miĥo jina xwe vegerand. Miĥo wê hîngê Şaneyê/wekîlê Ehmed Begê Mirsel bû, navbera Ehmed Begê û pismanên wî, ku dostên Firensiyan bûn, nexwaş bû, lewre wî çek dan Miĥo û mirovine din jî li dora Miĥê kom bûn.

Wê hîngê, destlata Firensî hêzeke ji çil serbazî kir pê Miĥo, lê wî û hevalên xwe serbaz di nav êgir de hîştin, kuştiyên xwe li şûna xwe hîştin û revîn, Miĥo jî vekşî Çi.Kurmênc û çiyayên Xastiya û Qêziqli ji xwe re kirin baregeh. Vê bûyerê li navçê deng da, û wisa dora çel micahidî li dora Miĥo civîn.

Li wan rojan, dema ku karwaneke leşgerî di deşta Hemqê re diçû, Miĥo û hevalên xwe rê lê girêdan, û gava ku ew gihîşt cihekî bi pûş, wan ji çar aliyan de agir vêxistin, ew karwan di nav êgir de hîştin û erebane û tiştên ku tê de bûn û dewar jî şewitîn.

Pişt re, micahidekî Kurd î din derket, navê wî "Ĥeciyê Tek bîqli" bû[1]. Wî û hevalên xwe bi Miĥo û hevalên wî re hêriş birin ser baregeha Firensî li Gu.Ĥemamê û ew kavil kirin.

Û gava ku nûçeyên micahidê Kurd Miĥo gihîşt hukmeta Erebî li Helebê Îbrahîm Henano, Sibhî Berekat, waliyê Helebê û rêberên cendirmên wê, bi hev şêwirîn daku şoreşeke tevahî li dijî Firensiyan, li senceqa Iskenderonê rakin…))[2].

Piştî wê bûyerê, Miĥo û Tekbîqli biryar dan, ku tevle Qîwayî Millî (Çete) bibin, wê hîngê hêza Çeta li navçên Meraş û Entabê li dijî firensiyan berxwe dida, û herwiha Miĥo û hevalên xwe di nav wan de cih girtin û bi Firensiyan re şer kirin. Li wê demê, Tekbîqli hat kuştin û Miĥo jî Ritba "Paşetiyê" ji Tirkan wergirt, û parastina sînor jî pê hat hilpesartin.

[1] - Dibêjin, awira Ĥecî pir tûj bû. Rojekê hevalên wî bi wî re şert kirin, da ku mirovekî naskirî hebû, bi awira xwe bitirsîne, lê eger tê de bi ser neket, dê tekekê ji simêlên xwe kurke, dibêjin gava ew di wê yekê de bi ser neket, wî tekek simêlên xwe kur kir, û bi navê (tek bîqli) hat binavkirin.
[2] - Edhem Al Cindî, pirtûka dîroka şoreşên Sûryê, rûp12.

Lê rojekê, gava ku Miĥo li gundekî sînorî bû, ew raste komek serbazên Tirk hat, ew li hin kesên ku ji xizmeta leşgeriyê direvîn digerîn, û ji ber ku wan destûra Miĥo ne biri bû, wî nerazîbûna xwe xuya kir, û wilo ew nakokî bû pevçûn û di encamê de ew hersê serbaz hatin kuştin. Li wê demê, Miĥo ji hêla Tirkiyê û Firensiyan de jî bû mehkûm û hat xwastin.

Wê hîngê, dîsa Miĥo çiyayên Xastiya û Qaziqli ji xwe re kirin baregeh, nemaze jî jina wî ya duyem ji Gu.Tetera bû, ew gund jî li ser Çi.Qaziqli ye.

Li wê demê, xezûrê wî Birîm ji peyayên Miĥo bû, lê belê ew di bin re têkildarê Axan û Firensiyan bû. Wê hîngê Birîm zavayê xwe Miĥo di devê şikefta ku li ber gundê Tetera bû û Miĥo ji xwe re kiri bû baregeh, kuşt, û serê wî radestî Firensiyan kir[1].

**Seydê Dîkê**:

Mirovekî gernas û naskiri bû li navça Çi.Kurmênc. Gelek serpêhatiyên balkêş li derbarê wêrekî û mêrantiya wî û birayê wî Henanê Dîkê tên gotin. Wan li dawiya sedsala nozdehan û sêyeka yekê ji sedsala bîstan, rêbertiya hoza Amka dikir. Û ji roja ku Firensî derbas navçeyê bûn de roleke berçav di berxwedan li dijî wan de lîstin.

Li destpêka hatina Firensiyan, Seydê Dîkê bi sedan mirovên ji hoza Amkî li dora xwe civandin û bi çalakiyên çekdar li dijî wan rabû, ji wan pevçûnan, yek li sala 1921ê li Geliyê Tîra çê bû. Seydo Axa, Ehmedê Rûtê, Eslan Axa û peyayên wan, riya hêsin di geliyê Tîra de birîn, çîmana serbazên Firensî teqle kirin û hemî serbazên Firensî kuştî, birîndar yan jî dîl girtin[2]. Wan gelek carên din jî rê li serbazên Firensî girêdan û ziyan gihandin wan.

---

[1] - Ew şikeft li sala 1999an ji hêla kesin ji şêniyê gund de hat xetmandin, û darên gûzê li ser hatin çandin.

[2] - Her serbazê ku şihada Îslamê hildida, Seydo Axa ew berdida, û piraniya ew hêza Firensî jî ji mislimanên Afrîqa û Asyayê bûn.

Gava Firensiyan dît, ku bidawîkirina berxwedanê bi şêweyên çekdarî dijwar e, wan dostê xwe Koreşît, wekî ku mirovê Seydê bû, jê re şandin û ew bi bawerkirin da û bi xwe re bir ba serokê Istîxbarata Firensî li bajarê Ezazê. Seydê kiryarên berxwedanê înkar ne kirin û ji serokê istîxbaratê re got, ku ew di ber hemî karyarên berxwedanê û kuştina serbazên Firensî de berpirsiyar e.



**Seydê Dîkê**

Li wê demê, serokê istîxbaratê L.Noterî, Seyd kir nav du rêkan, yan dê berxwedanê berde, yan jî dê dûrewarî Na.Kobaniyê bibe. Wê hîngê Seydê soz da, ku berxwedanê rawestîne, û wilo vegerî mala xwe. Lê belê dijîtiya Firensiyan ji dilê wî derneket. Belkî ji ber wê bû jî, li sala 1938an, Tirkan bi Seydê bawer kir û tibabeke mezin ji şebqeyên Eteturkî jê re şandin, daku li ser şêniyê navçê belev bike û ji Firensiyan re xuya bike, ku gelê navçê mêldarê Tirkiyê ye û dixwaze navçe bi ser Tirkiyê de here. Lê gava ku Seyd bi armancê agahdar bû, wî ew şebqe li ser sergûyê gund şewitandin.

Seydê Dîkê li dijî Tevgera Mirûdan jî rawestî, lewre komek Mirûd hêriş mala wî kir û xwastin wî bikujin, lê şêniyê gund li hember wan sekinî û du kes ji Mirûdan hatin kuştin.

Seydê Dîkê li sala 1943an jiyana xwe ji dest da, û çar law û navê xwe jî li şûna xwe hîşt.

## Eĥmedê Rûtê

Mîna ku li ser zimanê Îbrahîm Xelîl Rêberê Mirûdan hatiye gotin, wî ev kes: Ehmedê Rûtê, Hec Henan Şêx Sim'el, Evdoyê Xoce û Seydê Dîkê li civîna damezrandina Qiwayî Millî dîtine, ew civîn li ser vexwandina Ceneral “Qere Bekir Kazim Paşa” ku ji koka xwe de Kurd bû, li gundê “Efyon Qere Hesarê” ku bi ser bajarê “Meraşê” ve ye, hati bû girêdan. Wan her çar mirovan navên xwe di Qîwayê Millî de nivîsandin û vegerîn Nava Çi.Kurmênc. Pişt re, di salên di navbera 1919an û 1922an de, bi gelek karên berxwedanê rabûn.



**Ehmedê Rûtê**

Li sala 1922an, Koreşît kanî hin rêberên berxwedanê jê dûr xistana, lê hinan jî çekên xwe danenîn, ji wan Esaln Axa, Evdoyê Xoce ji Meydankê û Ehmetê Rûtê bûn.

Wê hîngê artêşa Firensî hêreşek bi topan ji rawestgeha cîmanê ya Qurtqulaqê de ajot ser gundên Rûtê û Şorbe, mala Ehmed Şewitandin, hemî arziyên wî talan kirin û ew bi xwe jî girtin û xistin Girtîgeha Helebê. Lê belê piştî şeş mehan ji girtinê, E.Rûtê bi alîkariya cendirmekî Kurd bi navê Ĥenanê Ĥemkê û kesine niştimanperwer li Helebê, girtîgeh qul kirin, Eĥmed jê revî, derbas Tirkiyê bû û li bajarê Kilisê rûnişt, û ji ber ku ew endamekî payebilind bû di hêza Çete de, Tirkan ew bi şahî pêşwazî kir, ritbeke evseriyê lê kirin, û li demeke kin kirin serokê şaredariya Kilisê jî.

Li Tirkiyê, E.Rûtê ji qereza L.Noterî serokê istixbarata Firensî re li Ezazê, baregeha xwe li Çi.Qotîlê ku li hember bajarê Ezazê ye, danî. Wê hîngê, L.Noterî hevalê wî Eslan Axa jê re şand daku wî vegerîne Sûryê, û soz da, ku hemî arziyên wî yên nêzîka 34 hezar zêr dikir, lê vegerîne û mala wî jî ji nû ve ava bike, ew agahdar jî kir û got, ku kîjan rojê be, Tirk dê dev ji wî berdin. Lê E.Rûtê razî ne bû vegere. Bi rastî jî wek L.Notarî texmîn kir, demeke pir ne çû, piraniya endamên Qîwayî Millî yên Kurd toşî çavsoriya Kemalîstan bûn û E.Rûtê bi xwe jî di nav de bû.

Piştî demek kin, Firensiyan lawê navdarekî bajarê Kilisê li ser sînor girt, wê hîngê gelek mirovên gernas tika ji L.Noterî kirin, daku wî berde, lê wî ew berneda. Xudiyên xort xwe avêtin E.Rûtê û jê tika kirin ku lawê wan vegerîne. Wê hîngê, E.Rûtê li gel peyayên xwe, û bi cilên xwe yên evseriya Tirkan, sînor derbas kir û çû ba L.Noterî, û dema ku gihîşt Ezazê, L.Noterî bi xwe pêşwaziya wî kir, qedra wî girt, ew kes radestî E.Rûtê kir û bi xwe re vegerand Kilisê.

Wê hîngê, kesên ji E.Rûtê hez ne dikirin, ev bûyer li destê xwe gerandin û tewatîrek berdan digot, ku pêwendiyên E.Rûtê bi L.Noterî re hene, ji ber wê yekê, destlata Tirk ew dûrewarî Gu.Zilîfkê ku ji sînor dûr bû, kir. Lê E.Rûtê tirsî ku Tirk tiştekî bi serê wî bikin, loma jî, ew li sala 1926an vegerî Sûryê û li sala 1937an li gundê xwe canda[(1)].

## Ĥec Ĥenanê Şêx Sim'el 1874-1966

Ĥec Ĥenan ji malbata Şêx Sma'îl e, ew bi diya xwe re çû ĥecê û bi navnîşana Ĥecî, ne bi Axe, hate naskirin.

Ĥec Ĥenan di civîna damezrandina “Qûwayên Millî” de beşdar bû. Pişt re, serkêşiya çalakiyên berxwedana li hember Firensiyan li Çi.Kurmênc kir û postê Paşatiyê jî ji Tirkan wergirt.

Şerê dawiyê ku Ĥec Ĥenên pê rabû, şerê li cihê Ĥesarê li nêzîk gundê wî Gu.Bêkê bû. Di encama wî de, çekdarên Kurd hêzeke Firensî ye mezin biteslîmkirin da, serokê wê yê bi ritba Kolonêl dîl girtin û destê xwe danîn ser hemî kelûpelên wan[(2)].

---

1 - Jêdera zanînên li ser Ehmedê Rûtê: Mislimê Reşît Axa, Mihemed Ebdo (Xocê Qorta) û Reşît Îbo.

2 - Hêzeke Firensî bi serdariya kolonêlekî ji baregeha Qitmê derket, û berê xwe da Gu.Bêkê. Rênasê wê Simê Me'imê Şûji ji Gu.Heyama bû, wî Ĥec Ĥenêan bi hatina wê hêzê agahdar kir. Ĥec Ĥenên jî jê xwest, ku ta kani be rêka wan dirêj bike, û wan bi ser dûza Ĥesarê de wîne. Ĥec Ĥenên şandî ji Seydê Dîkê, Eĥmedê Rûtê û ji Gu.Mi'mila re şandin, û ji wan xwest ligel peyayên xwe werin. Berxwedêrên Kurd li dora dûza Ĥesarê avsûn girtin, û gava ku hêza Firensî bi wê dûzê ket, agir lê barandin, û wilo piraniya hêza Firensê çek bi kar nanîn, û tev Kolonêlê xwe dîl hatin girtin. Berxwedêran rêbertiya Qiwayî Millî bi wê yekê agahdar kirin, û ligel rêberên xwe, ew hemî dîl û talan birin gihandin bajarê Meraşê li Tirkiyê. /Jêdera van zanînan, Sewlî Xatûn keça Ĥec Ĥenên, li Gu.Meydan Ekbezê rûdine/.

Piştî ku sînor di navbera Sûryê û Tirkiyê de hat danîn, Firensiyan nas kir, ta ku kani bin destê xwe dînin ser navça Ç.Kurmênc dê gelek qurbaniyan bidin, wan soz da serokên berxwedêran, ku ewê jiyana wan biparêzin û li ser rewşek îdarî ya taybet ji navaça Çi.Kurmênc re erê bikin. Wê hîngê Koreşît birayê xwe Ĥec Ĥenan bi bawerkirin da, daku berxwedanê rawestîne, û ew bi xwe re bir ba serokê Istîxbarata Firensî li Ezazê, li wir Hec Henên sozê rawestandina berxwedanê da û bi birayê xwe re vegerî mal.



**Hec Henanê Şêx Sma'îl**

Li salên 1923an, Mistefa Kemêl Ĥec Ĥenan jî, wekî ku serokekî berxwedanê bû, vexwend civîneke fere. Civîn li derbarê guhertina xîlafa Îslamî ya Osmanî bi cimhûriyetê bû. Li wir, helwesta Ĥec Ĥenên û piraniyê vexwendiyên Kurd li kêleka Mandina xîlafetê bû.

Li ser riya vegerê, destlata Kemalîst Ĥec Ĥenan girt, û dora şeş mehan di girtîgeha Entabê de hîşt, lê bi alikariya evserekî Kurd, ew ji girtîgehê revî û vegerî Çi.Kurmênc[1].

Piştî wê bûyerê, Ĥec Ĥenan mîna hemî olbawerên Kurd ên ku di şerê rizgariya Tirkiyê de beşdar bû bûn, bi armanca Kemalîstên ku dixwestin dewleteke Tirkî ye netewî ye dûrî Oldariyê ava bikin, veciniqîn, û li virên wan hişyar bûn. Wê hîngê Ĥec Ĥenan vegerî

1 - Li ser sivra ku Mistefa Kemal ji rêberên Qiwayî Millî re amade kiri bû, meye jî hebû. Wê hîngê Ĥec Ĥenên ji mirovê xizmetkar e got: Vê pîsiyê ji ser sivrê rake. M.Kemal ew şor bihîst û kir dilê xwe, nemaze jî Ĥec Ĥenan ji alîgirên mandina Xilafeta Îslamî bû.

gundê xwe Bêkê, û ne li dijî Firensiyan, ne jî li dijî Tirkan dengê xwe kir. Lê belê li navîna salên sihî ji sedsala bîstan, ew jî mîna hemî rêberên mala Şêx Sim'el, toşî dijmantiya Tevgera Mirûdan bû. Loma jî li sala 1939an, gundê wî ji hêla Mirûdan ve hat dorpêçkirin û keça wî Sewlî hat birîndarkirin.

Li sala 1944an, Misteşarê Firensî hat seredana wî, lê ew razî ne bû ku destê xwe bidê, û got: Win dixwazin ez gawir bimirim!?

Li sala 1948an, serokê Erkana artêşa Sûrî Fewzî Qawiqcî namek ji Hec Henên re şand, û jê xwest mirovên fîdekar ji navçê kom bike û xwe bigihîne bereya Sûryê bi Filestînê re, da ku tev Artêşa Înqaza Erebî bibe. Wê hîngê Ĥec Ĥenên dora 700 mirov kom kir û çû Şamê. Li wir jê hat xwestin, ku mirovên xwe li ser yekîneyên artêşê belav bike, lê Ĥec Ĥenan razî ne bû û got ew dixwaze peyayên wî dibin fermana wî de bin, û dema ku daxwaza wî ne hat pejrandin, wî rê da peyayên xwe û ji wan re got, kesê ku bixwaze vegere mala xwe kane bi wî re vegere, yên ne xwastin vegerin jî, di nava artêşê de man û herwiha dora sed peyayî di nava rêzên artêşê de ma. Behaneya Ĥec Ĥenên ya wê helwestê ew bû, ku wî bawerî bi evserên artêşa Înqaza Erebî ne dikir. Bi rastî jî, paşê bûyeran mêlag kir ku baweriya wî di cihê xwe de bû. Wek tê zanîn, di bûyerên şerê 1948an de, çend peyayên Kurd ji Na.Çiyayê Kurmênc di şer de şehîd ketin û ji wan re mêravek li pêşiya seraya Efrînê hat avakirin û hîn jî heye.

Ĥec Ĥenan li salên dawîn ji temenê xwe, li Sûryê li Gu.Bêkê rûdinişt, û li aliyê Tirkiyê jî li Gu.Qaziqli rûdinişt. Dora 3500 hêktar zeviyên wî li aliyê Tirkiyê hebûn, piraniya wan di bin gola bendava Ava Reş de man, yên din jî cotkaran û dewleta Tirkiyê destên xwe danîn ser(1).

Ĥec Ĥenan li sala 1966an, li gundê Qaziqli li aliyê Tirkiyê canda û li aliyê Sûryê, li mezelê Nebî Horî hat veşartin. Roja îro, gora ew mirovê navdar di nav gorên din de ne tê naskirin, belkî jî ew

1- Lawekî wî ji me re got, bavê wî meraq dikir, dema ku ew pereyên bihaya zeviyên xwe ji dewleta Tirkêyê biqedîne, ewê parekê jê bide Mistefa Barzanî serokê Şoreşa Kurdistanê, lê dewleta Tirk û mirinê ew hêviya wî kuştin.

bicihanîna baweriya Mislimanên sade be, ku dibêje: ((Çêtirîn gor a kavilbûyî ye)).

## Mistefa Çolaq

Mistefa lawê Mihemedê Osê ji Gu.Me'mala ji devera Reco ye, ew bi Çolaq hatiye nasîn.

M.Çolaq li destpêka ketina Firensiyan li navça Çi.Kurmênc di nav rêzên Çeteyan de şer dikir. Lê gava ku Çete rawestîn, Çolaq û



**Mistefa Şolaq li ortê, birayê wî jî li çepê wî**

mirovine din çekên xwe danenîn, û çiyayên Xastiya, Qêziqli û deşta Lêçe ji xwe re kirin meydana şer.

Rojekê ji rojên sala 1929an, Çolaq û komika xwe hêriş birin ser Gu.Kefirsefrê, mirovek kuştin û karbidestê civandina xûkê li gel du cendirman û mirovekî ji gund bi navê Nebî Ĥec Ebdo, li gel pereyên xûkê bi xwe re birin û berê xwe dan deşta Lêçe.

Wê hîngê Misteşarê Firensî hêzeke mezin ji Efrînê û ji Rihaniyê şand, û bi Çolaq û hevalên wî re li nêzîk Gu.Çeqela bi hev ketin. Çolaq û yazdeh peyayên wî hatin kuştin, tenê didu ji wan rizgar bûn, yek ji wan birîndar bû û xwe di şikefteke biçûk de veşart, yê din jî xwe bi hespê li çembera serbazan xist û berve Çi.Gewr revî.

Piştî wî şerî, Mistefa Çolaq navdartir bû û şêniyê Ç.Kurmênc stran li ser dilêrtiya wî gotin, hîn jî gelek mirov strana “De menal menal 'Evdo kekê”, dizanin. 'Evdo birayê Çolêq bû, ew jî di şer de birîndar bû û mir. Dibêjin, sedema wê bûyerê ew bû, ku Çolaq li dijî civandina xûkê bû ji hêla Firensiyan ve.

## Resûlê Hec Reşît

Resûlê Ĥec Reşît li sala 1905an li gundê 'Elendara ji devera Reco ronî dîtiye. Wî li ber Xoce Reşîtê Gedro ji gundê Bênê xwend û bi zimanên Erebî û Turkî baş dizanî. Pişt re li salên 1932-1933an li gundê xwe bû Xoce. Wê hîngê wî guh dida xwendina pirtûkan û kesên derdora xwe bi zordariya Firensiyan agahdar dikir.

Ramana derxistina Firensiyan ji welatê Mislimanan di serê wî de digerî, û ji bo pêkanîna wê armancê, wî zeviyên xwe firotin, çek kirîn, çend mirov jî li dorê kom bûn, wek Osmanê Hemo ji Gu.Çençelya, Sîno ji Gewenda, Şêx Mistefa ji Gu.Dodê û hin din jî ji aliyê Tirkiyê bûn. Wan dest pê kir, li gundan gerîn û alîgir ji xwe re amade kirin. Pişt re xwe gihandin çeteyê kevin Reşîtê Îbo ji Gu.Bilêlko jî.

Pevçûna yekê di navbera wan û milîsên Firensî de li ber Gu.Zerka derket û di encamê de Milîsek hat kuştin.

Piştî wê bûyerê, hêzeke Firensî ye mezin hat Gu.Elendara, gefa gundiyan kir û gotin, yan dê Reşît radest bikin, yan jî ewê gund bişewtînin. Lewre Reşît neçar bû û xwe radestî Firensiyan kir, û piştî salekê, li sala 1935an li bajarê Bêrûtê hat bidarxistin. Hevalên wî: Osmanê Hemo û Sîno jî, cezaya girtina Muebed danê û her du di girtîgehê de mirin, Şêxoyê Mistefê jî, ji ber ku temenê wî biçûk bû, bîst sal hukum danê, ew li sala 1991ê mir. Bi wî rengî, ew tevgera çekdar li dijî Ferensiyan, hîn di destpêka xwe de bû hat vemrandin.

## Reşîtê Ehmed Axayê Şêx Sma'îl (Koreşît):

Ji ber ku çavekî wî şaş bû, ew bi "Kor" hate binavkirin. Wî li sala 1928an, nûnertiya navça Çi.Kurmênc di Komeleya Demezrawî ya Sûrî de kir. Ew bi cilên xwe yên Kurmancî û qiyafeta xwe mirovekî balkêş bû.



**Hec Reşît Şêx Sma'îl (Kor Reşît)**

Roleke wî ye giring di rawestandina berxwedana Kurdan de li Çi.Kurmênc hebû. Ew kesê yekê bû, ku hêza Milîsan li navçê çê kir û her mehekê mehaneya hezar Milîsî ji destlata Firensî dibir.

Koreşît dijminê Tevgera Mirûdan ê yekê bû, ji ber wê jî Şêxê Mirûdan xwîna wî ĥelal kiri bû û birayê wî Ce'fer û hin ji mirovên wî kuştin û ew bi xwe jî bi destê mirûdekî ji Gu.Xilalka bi navê "Isma'îlê Qere Osmên-Cirno", birîndar bû.

Hinek ji navdariya Koreşît, ji ber helwesta wî ji şoreşa Kurdî ya sala 1925an bû. Li wê demê, mirovek ji ba rêberê şoreşê Şêx Se'îdê Pîran hat ba Koreşît û jê xwest ku pira tirênê ya Heşargê hilweşîne, daku rê li ber artêşa Tirk were birîn û negihê Kurdistanê. Lê ji dêvla ku Koreşît bi wî karî rabe, wî Firensî agahdar kirin û ew mirov jî li girtîgeha Helebê hat girtin[1]. Koreşît li sala 1939an li Ûtêla Kontînentel li Helebê mir, û li mezelê Pîrozgeha Ĥenên hat veşartin.

---

[1] - Li destpêkê ew kes çû Gu.Xelnêrê ba 'Evdê Osê, wî jî ew bir Gu.Keferomê ba Koreşît. Navê wî Emîn bû, û bi navê Birûsk dihat nasîn. Ew berê di artêşa Osmanî de efser bû. Paşê bû pasewanekî taybet ji Mistefa Kemal re, û pişt re xwe gihand şoreşa Şêx Seîdê Pîran. Û dema ku şoreş têkçû, Emîn hewildana kuştina Atatûrk kir, lê bi ser ne ket, û ji ber wê jî hukmê bidardekirinê pê hat

## Cemîl Kinê(1)

Cemîl Kinê, bi navê Cemîl Behrî jî tê nasîn, ew li sala 1892an li bajarê Helebê ji dayîk bûye. Bavê wî ji Gu.Gorda- Cindirêsê ye. Diya wî jî Emîna Elî ji Gu.Hopka- Reco ye. Ew çar salî bû bavê wî mir, û li ba diya xwe mezin bû.



Cemîl Kinê

Cemîl li sala 1900î derbas dibistana Deryayî ya Seretayî li Stembûlê bû. Li sala 1910an xwendina xwe kuta kir û ritba “Milazêm Mîkenîkî” wergirt. Binavkirina wî bi “Behrî-Deryayî” jî ji wê hatiye. Û ji ber ku ew di xwandina xwe de serkeftî bû, ew li wê dibistanê wek mamoste hat danîn. Li wê salê bixwe, ew derbas “Kulîca Ĥiqûqê” li Stembûlê jî bû û salek lê derbas kir, lê dewletê ew ji bo rahênanê şand dewleta Înglîz û di fabrîkeyên Sorngrof de kar kir.

Cemîl li sala 1912an di şerê Balkanê de beşdar bû, û ji ber dilêrtiya wî nîşana cengê wergirt.

Ew di şerê cîhanî yê yekê de jî bû rêvebirê karxana pêşesazkirina kelkan/şeqtûran li “Bîrecikê” li ber çemê Ferêt. Li wê demê, ew bû perpirsyarê gihandina îmdada artêşên Osmanî li navbera Entab, Urfe û Bexdadê.

Li dema şerê cihanê yê yekê, bi alîkariya wî, bi hezaran Ermen, Yûnan û hinek Rûs û Înglîzî jî ji mirinê hatin xelaskirin. Ji bo wê yekê, wî gelek belgenameyên rêzdariyê wergirtin, ew jî:

---

standin. Emîn pir gerî, û li dawiyê li Urdunê rûnişt, û li sala 1974an canda. /kovara El-Ĥîwar, hej 18-19/.

1 - Jêdera zanînan: Belavoka “El Dîmqratî” ya Partiya Demiqrat a Pêşverû li Sûryê, hej 315, Tîrmeh 1997.

1. Belgeyek ji qunsulê Emerîkayê ku serokê saziya Xaça Sor bû li Helebê, pişt re bû serokê Kongirêsa Emerîkî.

2. Belgeyek ji serokê komela Hêva Sor li Helebê.

3. Belgeyek ji Qunsulê Spaniya li Helebê, wî serpereştiya karûbarên dewletên Hevkar jî dikir.

4. Belgeyeke nirxariyê ji Petryarkê Ermenên Ersozoks "Zawîn".

Li sala 1919an, ew bû rêvebirê dibistana pêşesaziyê li Helebê, lê ji ber destêwerdana destlata intîdaba Firensî di karê wî de, wî jixweberê dibistan berda û li sala 1921ê di avakirina "Komeleya Şervanên Berê û Qurbaniyên Şer" de beşdar bû û ra mirina xwe endamê wê bû.

li sala 1923an, bû rêvebirê devera Bilbilê-Efrînê, û li sala 1929an bû rêvebirê De.Dirbêsiyê li Cezîrê. Wî li Edenê-Turkiyê jî dibistaneke fêrkirina makînan û alavên çandiniyê vekir, û gelek gotar li ser wan mijaran di belvokên deverkî de weşandin. Pişt re, wî hat dibistaneke mîna wê li Helebê jî vekir.

Hêja ye em bêjin, ku ew mirovê yekê bû ku makîne derbas Helebê kiriye, /rojnama Tişrîn a Sûrî/.

Cemîlê Kinê rewşenbîr û xudî zanîn bû jî. Wî li ser daxwaza misteşarê Firensî "L.Noterî" lêkolînek li ser dîroka navça Ç.Kurmênc ji serdema Xaçeperstan de û ra roja dawiya dema Osmaniyan nivîsand.

Cemîl niştimanperwerkî têkoşer bû, serê xwe ji intîdaba Firensî re danetanî, lewre ew hat girtin û demek di girtîgehên Qitmê û Xan Stembûlê de li Helebê derbas kir. Ew mirovekî dilsoz, çalak, rastgo û dilêr bû, ji çêxwazî û mirovatiyê hez dikir, herdem li kêleka belengazan disekinî û guh dida zanîn, nivîsandin û helbestê jî.

Çend berhemên wî yên nivîskî hene, bi rengekî baş û bi hûrikî bûyerên navçeyên ku lê xebitiye belge kiriye. Ji wan berheman:

1. Pend û şîretên Kurdî û mebestên wan, çapa sala 1958an. Profêsor Ezzidîn Resûl lêkolînek li ser wê pirtûkê çê kiriye.

2. Dîroka çêkirina Aletê û pêşdeçûnên wê. Navê afranvanê aletê, cihê çêkirinê, dîroka gihîştina wê ya Rojhilata Navîn, kê cara yekê aniye û li Helebê bi kar aniye. Ew pirtûk li sala 1962 çap bûye.

3. Pirtûka /kurtahiyek li derbarê zulma Firensiyan li Cezîrê, Ferêt û girtîgeha yekane ya leşgerî li Qitmê û Xan Stembûlê li Helebê/, beşê yekê li sala 1967an çap bûye.

4. Sîstemên Deryayî, ya zabitê behrî Cemîl Kinê.

Wî çend destnivîs jî li şûna xwe hîştin, jê:

1. Şoreşa Mirûdên Kurd li dijî Firensiyan 1939- 1940.
2. Lêkolînek li ser Êzdiyan.
3. Pirtûkek li ser Pûlan.

Birastî, berhemên ku Cemîl Kinê li şûna xwe hîştine, wî dikin yek ji navdarên Kurd yên payebilind.

Hêja ye em bi bîr wînin jî, ku nasitiyeke baş di navbera wî û zanyarê Kurd Mihemed Emîn Zekî de hebûn.

Cemîl Kinê ji bilî Kurmancî, bi zimanên Tirkî, Erebî, Îngilîzî û piçek Almanî jî dizanî. Zimanê çande û fêrbûna wî Tirkî bû, carina bi wî û carina bi Kurdî jî helbest dinivîsandin. Çar zarokên wî hene, yek jê bijîşk e, keçek jî parêzer e, hemî jî li bajarê Helebê rûdinin.

Cemîl Kinê li 25.5. 1967an li Helebê canda. Li wê boneyê, dostê wî Ehmed Ebdilhekîm Nicim, helbesteke sersaxiyê bi zimanê Erebî ristiye, me jî li vir çend malik jê vebjartin:

***أرأيت قائدنا المحبب في الثرى  وهو الذي من قبل كان مظفرا***
***وأرى الذي بالأمس قاد جيوشه  ليحقق الظفر المبين المبهرا***
***فإذا الجميل اليوم في جفن الردى  يمسي ويصبح راقدا تحت الثرى***
***كانت مواقفك المشرفة التي  تستصغر الخطب الجسيم فيصغرا***
***تيجان فخر للأنام على المدى  دلت على نفس أرق مشاعرا***
***أبقيت للأجيال أسفارا غدت  كنزا إلى القراء دهرا داهرا***
***ما مات من ترك المكارم ذكره  يحيا بها فتظل صيتا طائرا***

## Reşîd Gedro

Reşêdê Kedro, li sala 1887an li Gu.Bênê ji devera Robariyan ji dayîk bû. Li sala 1909an şihada fêrkirinê ji /mala mamostan/ li Helebê wergirtiye. Wî li destpêkê li Mi'errit El-Nû'man mamostetî kir, pişt re hat li gundê xwe rûnişt û li dirêjiya 65 salan Xocetî lê kir. Û wilo gelek xwendevanên destpêkê yên wê deverê li ba wî ferî xwendinê bûn û navdar bû.

## Ehmed Ce'fer Şêx Sima'îl



**Ehmed Ce'fer**

Ew jêdera me ya sereke ye di warê pêşeroja mala Şêx Sim'el de, û çavkaniya sereke bû ji gelek zanînên giranbuha û gerdiş û sinciyên şêniyê Ç.Kurmênc li nîvê yekê ji sedsala.

Ew mirovekî hişmend e, xudî zanîneneke fere û jiyaneke dewlemend e. Wî ji bo me ev kurtenivîs li ser jiyana xwe nivîsand:

((Navê min Ehmed e, ji min re dibêjin Zemçî, li ser navê lehengekî ji destaneyên kevin binav bûme. Bavê min Ĥec Ce'fer kurê Ĥec Ehmed kurê Şêx Sma'îl kurê Ĥec Mihemed kurê Mûse ji serekên hoza Biya ne. Diya min jî Ferîde keça Mihemed Axayê Seydê Mîmê ye. Ez li sala 1918an li Gu.Bêxçe-Bilbilê hatime dinê.

Min dibistana seretayî li Efrînê xwend, pişt re çûm Helebê û ra pola Bekelorya lê xwend, lê ji ber ku li sala 1939an bavê min bi destê Mirûdan hat kuştin, min xwendin berda û vegerîm gund.

Ez ji sala 1940î de û ra 1942an bûm nivîskarê nifûsê li bajarê Efrînê. Û li sala 1947an, piştî ku Şêxê Mirûdan Şêx Ĥenîf hat kuştin, ez wek têvedankar ji wê bûyerê re hatim gunehkarkirin û 14 mehan di girtîgehê de mam.

Ez cara yekê li sala 1954an, li dema dewleta serok Çiçeklî bûm endamê perlemana Sûryê, û min nûnertiya perlemana Sûrî di kongireya perlemanî ya navnetewî de li paytexta Fînlende Hêlsinkî kir. Di salên 1959an û 1960î de jî bûm endamê Encûmena Netewî li Qahîrê. Û piştî inqîlaba 1961ê, û ji ber ku min li ser birûska

şermezarkirina Mile Mistefa Barzanî îmze ne kir, û bi tewana ku ez alîgirên Barzanî me, destlatê ez girtim û dame dadgeha Ewlehiya Dewletê, û ji wê demê de min siyaset berda. Lê li sala 1963an, dîsa bûm endamê perlemana Sûrî, û ji ber ku ez perlemantêrê herî kevin bûm ji gundan, ez wek serokê Kitla Gundî hatim vebjartin.


Li sala 1939an, me li gel hin xortên Kurd Nadiya Ciwanên Kurd li Efrînê damezrand û li sala 1949an jî me doza avakirina Komeleya Îslahî ya Civakî kir, lê ji ber sedemên nijadperestî li ser daxwaza me erê ne bû.

Ez bi zimanên Kurdî, Erebî, Firensî, Înglîzî û Tirkî baş dizanim. Ez niha li Helebê rûdinim û diçim û têm Na.Efrînê û gundê xwe)).

Û digel ku Ĥec Eĥmed heştê sal derbaskiriye, lê hîn zor jîr û çalak e, û xwe ji warê çandeyî ne kiriye.

**Dadmend: Osman Mihemed Osman**

Bavê wî Meĥmed ji Gu.Dêrsiwanê ye û li rawestgeha çîmanê ya Qurtqulaqê ku li başûrê bajarê Efrînê ye, çawîşê çîmanê bû.



**Dadmend:**
**Osman Mihemed**
**(1923-1983)**

Osmên di zarotiya xwe de li ber Xoce bi zimanê Tirkî xwend. Pişt re, ra pola çaran li dibistana Efrînê ya sertayî xwend û şihada sertefîka (pola pêncan) li sala 1936an li Ezazê wergirt. Paşê çû Helebê û li sala 1943an bekeloriya ji dibistana Xusrewî ya Şer'î wergirt. Pişt re, karê wergerê li ba parêzgerê Helebê kir û di ber karê xwe re şihada Ĥuqûqê ji zanîngeha Şamê stand, û du salan wek parêzer kar kir. Lê belê wî ew kar nepijrand û zû berda.

Li sala 1949an bû dadmendê lihevhatinê (Siluĥ) li Efrînê, pişt re li Helebê, Hemayê, Hesekê û li parêzgehine din jî kar kir. Paşê li destpêka salên heftê ji sedsala bîstan bû dadmendê Temîzê, û pişt re bû serokê dadgeha Neqdê li Şamê.

Li dawiya salên heftê ji sedsala borî, Dewleta Mîrîtiyên Erebî/Îmarat jê xwest, ku di pêşdebirina zagonên wê de bixebite, û herwiha ew ra sala mirina xwe li 1983an li wir ma.

Dadmend Osman li dirêjiya temenê xwe bi dilpakî, rastgoyî û dilxwaşiya xwe nimûne bû, û ji şêniyê gund û navça xwe re dilsoz bû. Ew rewşenbîrekî hêja bû jî, wî bi zimanên Kurdî, Erebî, Tirkî (kevin û nû), Firensî, Farisî û Înglîzî jî bi xwendin û nivîsandin dizanî û li doza gelê xwe yê Kurd jî bendewar dibû.

Osman Efendî li sala 1954an navê xwe da namzetiya hilbijartinên perlemana Sûrî û gelek deng wergirtin, lê ji ber sedemên siyasî, xwe ji gera hilbijartinê ya diduyan kişand û kuta ne kir. Me berê goti bû, ku ew ji damezrawên Komeleya Rewşenbîrî bû, ewa ku li destpêka salên pêncî ji sedsala bîstan li Efrînê hat damezrandin. Dadmend Osman li mezelê Pêrozgeha Henên hatiye veşartin.

## Parêzer Mihemed Menan

Parêzer Mihemed Menan Şêx Sima'îl Zade, ji jidayîkbûna gundê Bêkê sala 1926an e. Wî li sala 1952an şihada parêzeriyê û ya pisporiya ĥuqûqê jî li sala 1953an ji zanîngeha Şamê wergirtine. Li sala 1953an derbas Nîqaba Parêzeran bûye, û li sala 1955an wek mamoste tê de hatiye pejirandin.

Mihemed Menan li dawiya sala 1960î, li ber Dedgeha Artêşî û Dadgeha Ewlehiya Dewletê ya Bilind li Şamê berevaniya siyasetvanên Kurd: Osman Sebrî, Dr.Nûriddîn Zaza, Reşt Hemo û hevalên wan kiriye.

Reşît Ĥemo li derbarê wê berevaniya wiha dibêje: Mihemed Menan li hember serokê dadgehê got: Ezbenî, eger win îro van mirovan didin ber dadgehê, bila win zanibin, ku win Selhiddîn di gora wî de dadgeh dikin, ji ber ku ev neviyên wî ne…



**Parêzer: Mihemed Menan**

Parêzer Mihemed Menan, li dema yekîtiya Misirê û Sûryê, di hilbijartinên Partiya

Yekîtiya Netewî de, ji ber Na.Efrînê ve hat hilbijartin. Piştî biserketina inqîlaba jihevkirinê, ew di nav şandeke Kurdî de çû seredana serokê Sûryê yê nû, û ew di hilbijartinên Kanûna Yekê ya sala 1961ê de jî bi ser ket û bû endamê perlemanê.

Li sala 1973an, ew li gel nûnerên Tevgera Kurdî daket hilbijartinên encûmena gelê Sûryê, lê ji ber sedemên têvel bi serneketin. Li sala 1978an, li ser lîsta Bereya Niştimanî ya Pêşverû ya dewletê, wek nûnerê Na.Efrînê ji encûmana gel re hat hilbijartin.

Di salên di navbera 1969an û 1972an de, ji bo sekretêrê tayê niqabeya parêzeran li Helebê hat hilbijartin, û bi wê perpisyariyê di nivîsgeha herdem ya Yekîtiya Parêzerên Ereb de hat bicihkirin, û nûnertiya wê di gelek kongirên Erebî û navdewletî de kir.

Di navbera salên 1976an û 1988an de, ew di şaxê nîqabeya Helebê de hat hilbijartin û nûnertiya wê di gelek kongiran de li Sûryê û li derva jî kir. Ew di wê navberê de bû endamê rahênan û vebjartina parêzeran li şaxa nîqabê yê Helebê.

Mamoste M.Menan li bajarê Helebê rûdine û diçe û tê nav zeviyên xwe li gundê Dêrsiwanê. Ew bi xwendina pirtûkên dîrokî, felsefî û zanînên civakî mijûl dibe.

# Hunermend li Çi.Kurmênc

## Her du bira 'Evdê Şe'rê û Ĥes nazî:

### - 'Evdê Şe'rê:

Navê wî 'Evdo kurê Ehmed kurê Milĥesen (Mile Ĥesen) e. Kalkê wî li gundê Çema rûdinişt û lê mir, û ji ber ku ew di warê olî de zana bû, jê re “Mile” dihat gotin. Bavê wî Ehmed ji kesayetiyên Kilisê yên naskirî bû, lê jiya, mir û lê hat veşartin jî. Paşnavê wî “Şe'rê” jî, ji navê pîrka wî hatiye. Hunermend 'Evdo, jiyana xwe li Gu.Naza qedand, lê mir û lê hat veşartin.



**Stranbêj: Hes Nazî**

Li demên berê, stranbêj li malên malmezinên gundan dicivîn û ahengên ciwan bi saz û stran li dar dixistin. 'Evdê hunera xwe ya stranê ji wan kilamciyan biri bû.

Stranbêj 'Evdoyê Milhesen kilamên sivik û giran ên wê demê digotin, mîna: Delal, Siyamend, Memê Alan, Miĥemed Emîn, Şêx Se'îd… Wî gelek stran bi xwe jî afirandine. Lê belê ew bi sê stranan hatiye naskirin, “Dax Dewran”, stranek li ser “Fayiq Axa” û ya herî balkêş jî strana “Xarzi Mihemed” e, Mihemed xarziyê wî bû û xortekî stranbêj, semavan û çeleng bû, lê ew di ciwaniya xwe de bi jana Wêranê mir, 'Evdê jî ew stran li ser çê kir.

Evdê Şerê stranbêjê baştir bû li ba Koreşît Axa, boneyên wî yên malbatî şên dikirin û li mêvanxana wî li Gu.Keferomê distra. Wî kanî bi katan li ser hev bistira û tenê ji bo nimêja xwe stranî dibirî.

Li gel dengê wî yê xweş û xort, ew peyvdarekî zor hêja bû û tekirme digotin, wî kanî di şevbêrkekê de stranek bafîranda û bistra[1]. Lê mixabin berî ku tomarkirina dengan bigihê Helebê, 'Evd mir û ew dengê wî yê xweş ne hat tomarkirin.

'Evdê bi Tirkî jî baş dizanî, û li şerê cihanê yê yekê li Yemenê di artêşa Osmanî de bû.

'Evdê Şe'rê di dema xwe de stranbêjekî bi navûdeng bû, ew li nîvê yekê ji sedsala bîstan, kilamciyê yekê bû li navça Çi.Kurmênc, û ra dawiya jiyana xwe ji stran û semaya Filiklorî ne qetî. Ew li sala 1961ê di temenê heştê saliyê de mir.

Du lawên 'Evdê hene: Yê mezin 'Ebdilhenan e, meraqa wî ya stranê û tembûrê heye. Saliĥ jî, lawekî wî bi navê Mihemed heye, ew distirê û li tembûrê jî dide.

**- Ĥesnazî**:

Ew jidayîkbûna sala 1889an bû, û birayê 'Evdê Şe'rê yê biçûk bû. Ew jî ji stranbêjên gelêrî û navdar bû li Çi.Kurmênc. Wî ji çûkaniya xwe de stran digotin. Strana xwe ya dawîn li ser lawê xwe Nûrî, ku di şerê sala 1973an şehîd keti bû got, û piştre dev ji stranê berda. Neviyekî wî heye li tembûrê dide û distirê jî. Hez Nazî di temenê sed saliyê xwe de mir.

## Omerê Cemlo (1922-1981)

Omer kurê Cemîlê Hemo ji Gu.Xezîwê ye. Ew hîn biçûk bû, hînî lêxistina Tembûrê bû bû. Berê, wî meraqa xwe ya stranê di çarçeweke teng de derdikir, lê piştî ku tomarkirina stranan hat afrandin û stranên wî hatin tomarkirin, ew hat naskirin û navdar bû.


Cemîl xudanê dengekî xweşik û tembûreke ciwan bû. Strana ku pir jê hez dikir û pê navdar bû, 'Eyşa Îbê ye. Lê wî stranên giran ên

[1] - Gava ku 'Evdê Şe'rê li nav rezê xwe bû, jinekê mêrê wê hati bû kuştin, hat ba wî. Wê du mirîşk bi xwe re ji 'Evdê re anî bûn, û jê xwest ku stranekê li ser mêrê wê bêje. Navê mêrê wê Dağ bû, ew mirovekî xizan bû, tenê kerekî wî hebû. Lê li ser bergera wê jinê, 'Evdê strana Dağdewran stra, û tê de ew mirovê bêçare kir lehengekî bê mînak.

din jî distiran, mîna: Memê Alan, Bêmal, Delal, Zêno Zêneb û srtana Şêx Seî'd..

Hunermend Omerê Cemlo jiyana xwe li Gundê xwe Xezîwê derbas kir. Ew mirovekî delal bû û dihat hezkirin. Ew ji Kurdîtiya xwe û ji Ola xwe ya Êzdî re jî dilsoz bû. Ji zarokên wî Zerdeşt ji stranê hez dike û dide tembûrê jî.

## Hunermend Mihemed 'Elî Tico:



**Hunermend Mihemedê 'Elî Tico**

Stranbêjekî gelêrî yî navdar e û tembûrvanekî payebilind e. Ew di warê lihevanîna stranên gelêrî û stranên boneyan de xwedî behrek e. M.Elî Tico ji bêtirî pêncî salî de di warê hunerî de naskirî ye. Û digel ku wî heştê sal dîtiye, lê ew hîn li hin boneyan distirê.

Ew xudî kesayetiyeke ciwan û balkêş e, wêneya Çi.Hawarê û şêniyê hoza Amka di bejin, deng, peyv, wêrekî û stranên wî de diyar dibe.

Hunermend 'Elî Tico li derbarê destpêka pêwendiya xwe bi hunerê re wiha dibêje:

Li dema şerê cîhanê yê diduyan, du birayên min bi artêşa Înglîz re li bakurê Afrîkayê û li Filestînê xizmet dikirin. Ez jî biçûk bûm û bi diya xwe re diçûm nav rêz. Diya min herdem stranên zor xemgîn û şêrîn bi dengê xwe yê xweşik li ser birayên min digotin. Piraniya caran wê stranên xwe di wê gavê de lihevtanîn. Wê yekê pir hikarî li hestên min kir û stranbêjî jî bi min da hezkirin.

Ji bilî wê, stranbêjên gundê Naza ku nêzîk gundê me Hesen Dêra ye, wan jî pir hikarî li min kir, wek 'Evdê Şe'rê û Ĥes Nazî û min gelek stran ji wan wergirtin. Ez lêdana tembûrê jî ji bav û birayê xwe hîn bûm, û bi tembûrvanên Kurd yên li derdora Kilisê û Entabê jî hatime hikarîkirin. Çinkî wan tenê gotinên Kurdî dikirin Tirkî û awazên zor xweşik distiran.

'Elî Tico stranên sivik, giran û yên netewî jî gotine, belkî ew kilamciyê herî baş bû ku strana Şêx Se'îdê Pîran straye.

Wî stran ji gotin û awazên xwe li ser Mistefa Barzanî, Nûrî Dêrsimî, Ebdirehman Qasimlo, Leyla Qasim û li ser dîlkirina Ebdela Ocalan jî gotine. Hejmara stranên wî sed derbas kiriye.

Li sala 1976an, rêxistina UNESKO ya Yekîtiya Netewan, ew vexwend hevdîtinên hunerî di navbera hunermendên cîhanê de, ew bi wê mebestê çû Firensa û pênc caran jî çû Holanada û hunera xwe ya tembûrvaniyê û stranê pêşkêş kir.

Gelek zarokên 'Elî Tico hene, hin ji wan distirên, hin jî li tembûrê didin, keça wî ya bi navê Araz dengê wê pir xweş e, kurê wê Mihemed jî stranên xweşik dibêje.

Hin kenalên Tilfizyonî yên Kurdî hevdîtin bi 'Elî Tico re çê kirin, lê belê wî jî wekî hemî hunermendên gelêrî li Çi.Kurmênc derfeta xwe ya rewa ne li Sûryê û ne li ba dezgehên Kurdî ne biriye. Hêjayî gotinê ye, ku 'Elî Tico baş bi zimanên Tirkî û Erebî jî dizane.

### Hunermend Adîkê Ĥes Necarê

Adîk li sala 1920an li Gu.Îska di maleke Êzdî de ji dayîk bûye. Ew pêşeya necariyê ji bavê xwe fêr bûye, û tembûrên pir hêja jî çê dike.



**Hunermend Adîk**

Apê Adîk lêdana tembûrê ji hunermendên derdora xwe fêr bûye, wek Ĥus Xel ji Gu.Xezîwê. Stran jî ji stranbêjên kevin fêr bûye, wek: Ĥemûş Kûrik ji Gu.Aşkê Şerqî, Mişo ji Kobaniyê û Îbramê Tirko ji Gu.Çeqelê Cûmê.

Adîk tembûrvanekî hunermend e, ew bi şêweyekî zor ciwan awazên stranên Kurdî yên kevin dertîne. Apê Adîk bi tiliyên xwe li tembûrê dide û her kesek jî nikane bi wî rengî lê bide.

Ew di mehrecana helbesta Kurdî ya yekê de li sala 1993an li Kela Hûrî-Efrîn li gel helbestvanê hêja Tîrêj beşdar bû û awazên xweşik pêşkêş kirin.

Li sala 2000î jî, kenala Tilfizyonê ya Kurdistanê ew vexwend Kurdistana Êraqê û gelek stran û awazên Kurdî yên kevin jê re tomarkirin.


Hunermed Adîk li Gu.Kora-Cindirêsê rûdine. Û digel ku temenê wî nêzik nod salî ye, lê ew hîn çalak e, û evîna tembûrê di dilê wî de ye. Hêja ye em bêjin, ku ew li Kemaçê jî dide.

## Stranbêj Cemîl Horo

Navê wî Cemîlê Horoyê Reşît e. Ew li sala 1932an li Gu.Se'rîncekê-Bibilê ji dayîk bûye.

Cemşîl li destpêka jiyana xwe oldar bû, Quran li ezber kiri bû, û berpirsyariya komeke Mirûdan dikir.

Gava ku hevalên wî yên olmend têderxistin ku dengê wî xweş e, wan ew bi ser stranê de dilgerim kir, wî jî destûra stranbêjiyê ji şêxê xwe Şêx Mihemed Ĥeyder Bavê Şêx Re'bû xwast. Pişt re, wî hêdî hêdî civatên olî berdan û stran gotin.



**Stranbêj Cemîl Horo**

Bi demê re, baweriyên netewî jî li ba C.Horo peyda bûn, nemaze piştî vegera Mistefa Barzanî li Êraqê li sala 1958an. Ew bi sedemên çalakiyên netewî çend mehan hat girtin jî, û ji bir wê yekê ew û mala xwe derbas Tirkiyê bûn, pişt re çûn Êraqê, li bajarê Zaxo bicih bûn û Pêşmergan destên xwe di ser re girtin.

Piştî peymana 1970ê di navbera Kurdan û hukmeta Êraqê de, û dema ku Hafiz Esed bû serokê Sûryê, ew vegerî Sûryê, û carina li Efrînê, carina jî li Helebê rûdinişt.

Hunermend Cemîl xudanê dengekî bilind û xweşik bû, û stranên xwe ji dil de digotin. Wî stranên sivik û giran jî distiran. Ji stranên giran ku bi şêweyekî şêrîn digotin ew bûn: Memê Alan, Meyro, Şêx Se'îd û stranên netewî jî di nav de bûn.

Hunermend Cemîl stran jî dafirandin. Wî li sala 1979an, li dema goçbarkirina Barzaniyê nemir, stranek ji gotin û awazên xwe li wê boneyê çê kir, emê li vir çend rêzikan ji strana “Barzanî”, hewaldin:

**Hevalno kanî, kurdino kanî**
**Wa şêrê çiya kanî BARZANÎ**
**Feleka neyar mala me danî**
**Ji ber ku kurda bê te pir êşek dîn**
**Li va dinya fanî**

Hunermend Cemîl Horo li dawiya jiyana xwe li bajarokê Cindirêsê bicih bû bû û karê necariyê kir. Ew li sala 1989an mir û li mezelê Pîrozgeha Henên hat veşartin.

Neh zarokên wî hene, piraniya wan li Cindirêsê rûdinin, hinek jê li stranê û li lêdana tembûrê jî meraq dikin.

## Reşîtê Me'im Çûçanê

Hunermend Reşît li sala 1926an li Gu.Kotana ji dayîk bûye. Malbata wî ji rûniştivanên gund ên kevin e. Mala ku birayê wî Me'im tê rûdine li sala 1850î hatiye avakirin.



**Stranbêj Reşîtê Me'm ûçanê**

Reşît ji ciwaniya xwe de dest bi stranê kiriye, wî stranên destpêkê ji bavê xwe bihîstine. Bavê wî bi karwanên hêştiran re dixebitî, kurê xwe Reşît jî carina bi xwe re dibir û stranên şêrîn li ser riya rêwîngiyê jê re digotin. Reşît stiran ji stranbêjên din jî hilanîne, mîna Ĥes Nazî, 'Evdê Şe'rê û 'Eliyê Zenûbê, ew hersê jî ji Gu.Naza ne.

Lê girêdana Reşît bi stranê re, bi riya hevalekî wî yî ji Kobaniyê bi navê Mehmûd çê bû bû. Ew li dema şerê cihanê yê diduyan, di artêşa Firensî de bi hev re bûn, û li Felestînê, Misir û Lîbiya şer kirin. Çaxa ku ew di artêşê de bû, û ji xudanên xwe dûr bû, wî straneke dirêj li ser xudanên xwe û li ser yara xwe jî afirand.

Piştî ku şerê cîhanê yê duyem bi dawî hat, Reşît vegerî gundê xwe û hezkirina stranê pê re berdewam kir.

Ew li şevbêrkan li gel stranbêjan amade dibû, mîna stranbêj: Kundir û Xelîlê Rebeno ji Gu.Naza, Xelîlê Bûd, Mistê Qulûz û Ĥesenê Bicê ji Gu.Qerqîna, ew hemî jî li nîvê yekê ji sedsala bîstan, li deverên Kilisê û Bilbilê navdar bûn.

Reşît kane bi katan tekirman li hev wîne û bistirê. Ji stranên destaneyî yên kevin ku jê hez dike û kane li ser xatirê mêvanên xwe bi dengê xwe yê şêrîn bistirê, ev in:

Delal, 'Ereba Saliĥ begê, Ûsibê şer, Memê 'Ewan, Osmanli, Gênc Osman, Cebelî, Xemê Zalim "Dêrsim" (lehengê wê Eĥmedê Zilîfê ye), Dêli begê Narîn (çîrokeke destaneyî ye ji dîroka hoza Çeqlî ye).

Ma em bêjin, ku Reşît stranên xwe cara yekê li sala 1961ê tomarkirin.

### 'Ednan Dilbirîn (1956-1999)

Ednan li gundê Dêrsiwanê-Şera ji dayîk bûye. Wî ji ciwaniya xwe de stran digotin. Ew hunermendekî dengxweş bû, stranên Kurdî yên ciwan distiran û hunera Kurdî pê dewlemend dikir.

……………………………

Ji bilî ew stranbêjên ku me bi bîr anîne, li roja îro bi dehan stranbêj dengxwaş hene, ahengên zemawendan şên dikin. Lê yê herî naskirî ku stranên Kurdî yên filoklorî dibêje Ebdirehman ji gundê Kora ye.

# Jêder

- **Jêderên bi zimanê Erebî:**

1. Kevnemahiyên Heleb, pirtûka çaran û pêncan 1978-1979, û ya şeşan û heftan 1992, amojgeha kelepûra zanistî, zankoya Helebê.
2. Ebûlfedil Mihemed Ibin El-Şuĥnê 1402-1485Z: Durra vebjartî di dîroka Heleb de, pêşkêşkirina Ebdela M. Derwîş, dar El-Katêb El-Erebî, Şam.
3. Mihemed Elî El-'Ezîmî (El Ĥelebî) 1090-1161G: Dîroka Ĥeleb, durustkirina Îbrahîm Ze'rûr, Şam, 1984.
4. Ehmed bin Elî Ibin Ehmed (El Qelqeşendî), 1355-1418Z: Subĥ El-E'şa Fî Kîtabet El-Înşa, pêşkêşkirina Ebdilqadêr Zekar.
5. Kizênefûn 401B.Z: Anabasîs yan (( Rêwîngiya deh hezaran)), wergerandin ji Înglîzî Ye'qûb Efram Mensûr, pirtûxana Besam, Mûsil.
6. Subĥî Sewaf: Tarîxa Heleb ya Berî Îslamê, beşê yekê, Heleb 1972.
7. Ebdilrezaq El-Huseynî: Ezdî niha û di mêjoya xwe de, çapa heftan 1980.
8. Emîr Şerefxan Bedlîsî: Şerfnama, çapxana El-Necaĥ, Bexdad 1953.
9. Bûlis Yetîm: Gotarin di kevnerêçên Sûryê de, çapxana Îman, Heleb 1977.
10. Yûsêf Qawiqcî û Bûlis Yetîm: Lehengên xwedê (El 'Emûdiyûn li dorhêla Helebê, çapxana Îman, Heleb.
11. Dr. Şewqî Şe'is: Dîroka Helebê û dîmenên wê yên kevnerêçî, ji belavokên zankoya Helebê 1991.
12. Dr. Mîmxaîl Mu'tî: pirtûka ciyolociya, şalyara perwerdeyê li Sûryê, 1972-1973.
13. Dr. Siltan Miĥêsin: Serdemên Berî Dîrokê, zankoya Şamê 1990-1991.
14. Miĥemed Emîn Zekî: Beşê yekê, Dîroka Dewlet û Îmaratên Kurdî, beşê dudiyan. Dîroka Kurd û Kurdistanê 1937, wergerandin ji Kurdî Mihemed 'Elî 'Ewnî 1945.
15. Dr. Ebdilrezaq Kêlanî: Pirtûka Ebdilqadêr Kêlanî, dar El-Teqedum, Şam, çapa yekê 1994.
16. Şakêr Fetaĥ: Îzdî û ola Îzdî, wergerandina Dr. Dexîl Şemo El-Ĥekîm, çapa yekê, Bêrût-Libnan.
17. Corc Ĥebîb: Ezdîtî bermahiya olekî kevin, (vekolîneke dîrokî), weşangeha Bêtra, Şam 1996.
18. Dr.Elî Ebû 'Esaf: Lavijgehê 'Endarê Yê kevneşopî, çapxana Elêfba El-Edîb.
19. Ebdela Ĥecar: Kovara El-Feysel, hejmar 116, Mijdar 1986, Riyad - Si'ûdiye.

20. Şihabildîn El-Meqdisî 1200-1268Z: Du bihişt di dîroka du dewletan de.
21. Cemîl Kinê: Kurtahiyek li ser zulma Firensiyan, beşê Yekê, Çapxana El-Weten El-Erebî, Heleb 1967.
22. Ebdela Ĥecar:Kinîsa Mar Sem'an,dar Mardîn,çapxana Elêfba El-Edîb 1995
23. Kovara Lêkolînên Dîrokî, hejmar 49-50 sal 1994, zankoya Şamê.
24. Dr.Şewqî Şe's: Kela Sem'anê, weşanxana El-Qelem El-Erebî, Heleb, 1991.
25.Fuad Hîlal û Nedîm Neqiş: Delîla Helebê Ya Seybanewî, weşana çaran 1997.
26. Qis Hênrî Lamans: Lêgerînik li Çi.Lêlûn, Cûmê û gundên Êzdiyan sala 1907, di kovara ((Minew'at El-Kuliyê El-Istişraqiyê- Zankoya Qidîs Yûsif))- Bêrût, di sala 1957 an de bi navnîşana ((Lêkolînek li ser erdnîgariyê û şaristaniya gelan, Çiyayê Sem'anê û Îzdiyên Suriyê)) hate belavkirin.
27. Fîlîb Sîrînc: Şanik di huner, ol û jiyanê de, wergerndina Ebdilhadî Ebas, weşanxa Şam bo çapê û belavkirinê.
28. B.Lêrx 1822-1884: Lêkolînek li ser Kurdan, Wergerandina Dr.Ĥacî 'Ebdî, çapa Erebî ya yekê 1992.
29. Dr. Siltan Miĥêsin: Welatê Şamê di serdemên berî dîrokê de, weşanxan El-Ebcediyê, Şam, çapa yekê 1989.
30. Dr. Hîşam El-Sefedî: Dîroka Şaristaniyên rojavayî Asya, zankoya Şamê, çapa sisiyan 1993-1994.
31. Dr. Mihemed Ĥerb Ferzat: Kurtebiriya Dîroka Sûryê ya kevin, zankoya Şamê 1993.
32. Intiwan Mortkart: Dîroka kevin ya Rojhilata Nêzîk, wergerandina Tewfîq Silêman, Elî Ebû Zira' û Qesêm Tiwêr, weşana 1950.
33. Fedil 'Efaş: Encûmena gelêr li Sûryê 1928-1988, Şam, çapa yekê, weşanxana Ibin Hanêi.
34. Dr. Hîşam El-Sefedî: Dîroka sûriyê ya kewvin, zankoya Şamê 1981-1982, çapxana riyd, Şam.
35. Liyonard Wûly: Alalax qiralgeha jibîrkirî, şalyara rewşenbîriyê li Sûryê, Şam 1992.
36. Dr. Mihemed Ĥerb Ferzat: Vekolîn li ser dîroka rojhilata nêzîk ya kevin (Misir û şaristaniya wê ya kevin), zankoya Şamê 1993.
37. Cêms Mîlart: Kevintrîn şaristanî li li Rojhilata Nêzîk, wergerandin Mihemed Teleb, hûrnêrîn Dr. Siltan Miĥêsin, weşanxana Şam bo çap û belavkirinê 1990.
38. Velîrî Gulayêf: Bajarên destpêkê, wergerandina 'Arêf Me'seranî, weşanxana El-Teqedum, Mosko 1989.

39. Dr. Rozad Elî: Axaftin li ser pirtûka Dîroka Sûryê Ya Kevin (Navend) ya Afranvanê dr. Ehmed Dawûd.
40. Can Kilod Margrêt: Rûniştvanên Kevin li welatê mezopotamiya û Sûryaya bakur, wergerandina salêm silêman El-'Îsa, weşanxana 'Elaedîn, Şam 1999.
41. Dîmenin ji dîroka cotariyan li welatê Erebî, sê beş.
42. Merwan El-Midewer: Ermen di dîrokê de, Pirtûkxana El-Ĥeyat, Bêrût, çapa yekê 1982.
43. Dr. Mufîd El-'Abêd: Dîroka girîkan, zankoya Şamê 1999.
44. Basîl Nîkîtîn, Kurd Nêrîn û Têbîn, Pevgirêdana Kawa, Weşanxana El-Katêb.
45. Basîl Nîkîtîn: Kurd neviyên Mîdiyan, wergerandina Me'rûf Xeznedar, Hevgirêdana Kawa, weşanxana El-Katêb.
46. Amadekirina Dr.Farûq Îsma'îl: Zankoya Helebê 1996, Vekolînên komcivîna cîhanî li ser dîroka Sûryê, Cotmeh 1996 li zankoya Helebê, bi hevpariya zankoya Romayê,.
47. Mihemed Miĥefêl û Mihemed El-Zên: Lêkolîn di dîroka Roman de, çapa pêncan, zankoya Şamê 1992-1993.
48. Kovara Kurdname: Hejmara çaran, Cotmeh û Kanûn 1, 1995.
49. El-Bilazirî 895Z, vekirina welatan, Bêrût 1978.
50. 'Ebdilreqîb Yûsêf: Dewleta Dostkî li Kurdistana navîn, beşê Yekê, Korê Zanist ê Kurdî, çapxana El-Lîwai, Bexdad 1972.
51. Seyêd Elî El-Ĥerîrî: El-Exbar El-Siniye di cengên Selîbiyan de, Qahîre 1899.
52. Eymen Ehmed Şe'ban: Elwan ji dîroka Benî Ĥemdan, çapa yekê, weşanxana cêfra, Şam, çapxana Îxai 1996.
53. Karil Birokolman: Dîroka miletên Îslamî, wergerandina Nebîh Emîn Farês û Mu'în Bi'lbekî, weşanzana Zanîn ji Milyonan re.
54. Elî Seydo Goranî: Ji 'Emanê Ta 'Emadiyê, çapxana El-Se'adê 1939.
55. Qustentîn Bezîlî 1809-1884: Sûrye û Filestîn dibin nîrê Osmaniyan de, 1840.
56. Dr. Konter Dişner: Neviyên Selahedîn, wergerandina 'Ebdislam Sidîq, çapxana xebat, Dihok 1997.
57. Edhem Al El-Cundî: Dîroka Serhildanên Sûryê di serdema Firensiyan de, 1960, çapxana Itîĥad, Şam.
58. Esmet Şerîf Wanly: Pirsa Kurdî li Sûryê, Çele 1968.
59. Mihemed bin Mehmûd El-Ĥelebî, (Ibin Aca), Pevçûn di navbera Memalîk û Osmaniyan de, Durustkirina Mihemed Ehmed Dehman, weşanxana El-Fikir 1986.
60. Kovara Metîn, hejmar 35, Tebax 1994, ji weşanên Partiya Demoqrat a Kurdistanî - Îraq.

61. Kovara El-Ĥîwar, hejmara zo 16 û17, 1997, Kovareke rewşenbîrî û siyasî Kurdî ye li Sûryê bi derdikeve.
62. Dr. Xelîl Cindî: Ji bo zanîna rastiya ola Êzdî, sîstema qadî, 1994.
63. Dr. Ilyas Bîtar: Nivîs û neqiş li ser pereyên Erebî ji berî Îslamê de ta serdema nû, weşanxana El-Mecid, 1997.
64. Rojnama Tişrîn ya Sûrî, hejmara roja 5-25-1997.
65. Dr. Elî Mûse: Heyama Sûryê, çapxana Ĥîcaz, Şam.
66. Rojnama Tişrîn hejmar 6773, 3-29-1997, û hejmar 7508, 18-9-1999.
67. Bû'elî Yasîn: Çêroka xakê û cotkarê Sûrî 1858-1979, weşanxana Ĥeqayêq, çapa yekê 1979.
68. Î.M.Diyegonov: Mîdiya, Şam, wergerandina Wehbiye Şewket, weşanxana Ram, Şam.
69. Rapora Encûmena pevgirêdana Cotariyaan li Efrînê, dawiya 2000an.
70.Yaqût El-Ĥemwî, mirina wî 1229Z: Ferhenga Welatan, perçê Sisiyan, peşên yekê û dudiyan, ji weşanên Şalyara rewşenbîriyê li Sûryê 1983.
71. Qelqeşendî 1355-1418Z: SubĤ El-E'şa fî Kîtabet El-Înşa, perçê Pêncan, Şalyara rewşenbîriyê li Sûriyê, Şam 1983.
72. Rojnama El-Şerq El-Eewset, hejmar 8122, 22-2-2001.
73. Xêriddîn El-Esedî: Ferhenga Heleb a Raberî, çapa dudiyan, amojgeha kelepûra zanistî li zankoya Helebê.
74. Rojnama Xebat, hejmar 936, 6-8-1999, ji weşanên Partiya Demoqrat a Kurdistanî -Îraq.
75. Kovara Qelename, ya PKK ye.
76. Belavoka El-Demoqratî, hejmar 315, tîrmeh 1997, ya Partiya Demoqrat a Pêşverû Ya Kurd li Sûryê.
77. Îbrahîm Beg Ĥilmî: Dîroka Dewleta Osmanî 1904, çapa yekê 2000, damezrawa pirtûkên rewşenbîrî, Bêrût- Libnan.
78. Herdu bira Rasil: El-Êksendir 1715-1768 û Petrîk 1727-1805, Dîroka Heleb a xwezayî di sedsala hejdehan de, wergerandina Xalêd El-Cibêlî, weşanxana Şu'a', Heleb- Sûriye, çapa yekê- London 1794.
79. Mihemed Elî Şêx Ĥusên: Rêola Neqişbendî ya Xalidî Ya Daxistanî.
80. Mihemed El-Rrewas: Bewarêq El-Ĥeqyêq, weşanxana El-Beşayêr 1992.
81. Dr.Mihemed Sûhêl Teqûş: Dîroka Memalîkan li Misrê û welatê Şamê, weşanxana Nefayês, Bêrût, çapa yekê 1997.
82. Cildên rûniştinên perlemana Sûryê 1954-1957.
83. Ebdilezîz Ĥec Mûse: Kovara Sorgul, hejmar 30, Avdar 2002.
84. Tewfîq Silêman: Lêkolîn di şaristaniyên Rojavaya Asyayê de, ji kevntirîn serdem de, ta sala 1190Z. Weşanxana Şam.
85. Cemîl Ehmed û Fewzî Reşîd, dîroka Kurd a kevin.

86. Îsmaîl Ebî El Fîde, El Yewaqît we El Dereb, rastanîn: Mihemed Kemal û Falêh El Bekûr, çapa yekem 1989, mala (El Qelem El Erebî li Helebê).
87. Dr. Fîlîb Hetê, dîroka Sûrye, Libnan û Filestîn, beş 1-2, dar el seqafê, Bêrût- Libnan.

- **Jêderên ne bi Erebî:**

1. Rocê Lîsko: Çi.Kurmênc û Tevgera Mirûdan, wergerandina Kurdî Amed, Siwêd 1993.
2. El-Qadirî: Dîroka Kilis, çapa Tirkî 1932, bi Tirkî.
3. Memed Cimo, Zarav li Çiyayê Kurmênc, destnivîseke bi Firensî ye.
4. Ticar Zade Îbrahîm Ĥilmî: Memalêk Osmaniye Cêb Etlesi, 1323G, bi nivîsa Osmanî, pirtûkxana Îslam û Eskerî- Istembûl.
5. Pirtûka Wîlayet Heleb Salname, 1903 Z, bi nivîsa Osmanî ye, çapxana wîlayetê.
6. Anthropol.Sci.101 (4), amadekirina: Tekîro Ekezewa-Ensropolocî, Yoko dodo-Anatomik, Siltan Miĥêsin-Dîrokzan, Adêl Ebdiselam-Erdnîgarzan û Yocî mîzokotşî-Ansropolocî.
7. Belavoka Newroz bi zimanê Kurdî, hejmar 11, Şubat 1997, ji belavokên Partiya Yekîtî Ya demoqrat a Kurd li Sûryê.

*** * * ***

# Naverok


- **Dyarî…** **Spasî…**
- **Têbîn…** **Pêşgotin…**

………………………

**Beşê yekê**
**Çiyayê Kurmênc û Dîrok**

**Lêkolîna yekê:** 11
- Pêşgotinek Erdnîgarî.
- Beşê Sûrî, cîgeh û rûpişt.

**Lêkolîna diduyan:** 15
- Kurtegotinek li ser koka Kurdan.
- Welatê Kurdan (Kurdistan).

**Lêkolîna sisiyan:** 25
- Dîroka rûniştvaniyê Li rojhilata nêzîk.
- Serdemên berî dîrokê. Serdemên dîrokî.

**Lêkolîna çaran:** 31
- Cîgehê Çi. Kurmênc.
- Navçeyên sêgoşeya Sîros (Nebî Hûrî) di:
- Hezarê Sisiyan Berî Zayînê.
- Dema / 2000-1200/B.Z. Dema /1200-333/B.Z.

**Lêkolîna pêncan:** 45
Navça Sîrosê Di dema /636-1916/Z:
- Serdema Umewiyan û 'Ebbasiyan.

**Lêkolîna şeşan:** 51
- Navça Sîrosê di serdema malbeta Mendiyan de.
- Serdema Memlûkiyan.

**Lêkolîna heftan:** 55
- Serdema Osmanî

**Lêkolîna heştan:** 69
- Kurdax di serdema Firensî de.

**Lêkolîna nehan:** 77
Serbêtina (xulase) hebûna Kurdan li Kurdaxê.
- Qonaqa yekê: Berî hatina Îslamê.
- Qonaqa diduyan: Piştî hatina Îslamê.
- Kurd li dorhêla Kurdaxê.

………………………

## Beşê Diduyan
## Destlatiya siyasî û parkirinên kargerînî (Îdarî) yên Çi. Kurmênc

**Lêkolîna yekê:**
- Rewşên kargerînî di serdemên kevin û Osmanî de 99
- Parkirinên kargerînî yên kevin.
- Dabirînê kargêrî li serdema Osmanî
- Parkirina gelêrî ji navçê re.

**Lêkolîna diduyan:** 107
- Dabirînên kargerînî di dema Firensiyan û pişt serxwebûna Sûriyê de.
- Dîroka Bajarê Efrînê.
- Hejmara rûniştvanan li Na.Efrînê.
- Mişextî li Na.Efrînê.

…………………………….

## Beşê Sisiyan
## Cihên şûnewarî li navça Efrînê

**Lêkolîna yekê:** Cîgehên şûnewarî li Na.Efrînê. 127
**Lêkolîna diduyan:** Şûnewar li Çi.Lêlûn. 133
**Lêkolîna sisiyan:** Şûnewar li deşta Cûmê. 145
- Wargeha Şiyê. Nebî Hûrî.
- Kela Canpolêt. Kela hawarê.

**Lêkolîna Çaran:** 163
- Rê û pireyên serdema Grîkan. Riya hêsin.

…………………………………

## Beşê çaran
## Taybetiyên nijadî û civakî yên Çi.Kurmênc

**Lêkolîna yekê:** Kurd û hozên wan. 183
**Lêkolîna diduyan:** Ereb û komikên wan ên hozî. 29
**Lêkolîna sisiyan:** Qurbet (Qereçî). 245
**Lêkolîna çaran:** Ziman li navça Efrînê. 247

…………………………………

## Beş Pêncan
## Rewşên aborî , civakî û reweşenbîrî li Çi.Kurmênc

**Lêkolîna yekê:** Çi.Kurmênc-Rewşên tevahî. 253
- Li Serdemên berî sedsala hejdehan.
- Ji dawiya sedsala hejdehan de ta niha.

**Lêkolîna diduyan:** Rewşên aborî. 265
- Çandinî, Xudîkirina sewalan.
- Pîşesazî, destekarî, pîşesazkirina kelûpelên xwerinê.
- Bazirganî. Seybanî.

**Lêkolîna sisiyan:** Rewşên civakî. 285
- Mal: xanî, Adet, teqalîd, karûbar, çawahiya jiyandinê.

**Lêkolîna çaran:** 317
- Xwendin û Perwerde.
- Tendurustî. Rewşa kargêrî

**Lêkolîna pêncan:**
- Çand û hunera gelêrî li Na.Efrînê. 327
- Çand û Çalakiyên rewşenbîrî.
- Hunera Gelêrî: Stran, sazkirin, Sema, şêweyên demborandinê.

……………………………………

## Beşê Şeşan
## Jiyana Olî li Kurdaxê

**Lêkolîna yekê:** 337
Hin rûdawên olbawerî ji serdema berî zayînê.

**Lêkolîna diduyan:** 345
- Ola Fileh.
- Olmendên Fileh ji Kurdaxê.

**Lêkolîna sisiyan:** 349
- Ola Îslamî.
  - Rêyola 'Elewî.  Rêyolên din.
  - Mizgeftên kevin. Pîrozgeh.

**Lêkolîna çaran:** 371
- Êzdî li Çi.Kurmênc.
  - Bawerî û lavijên sereke di ola Êzdî de.
  - Dîroka Êzdiyan li Kurdaxê.

……………………………………

## Beşê Heftan
## Kurtelêkolînek li ser rewşa siyasî li Çi.Kurmênc

**Lêkolîna yekê:** rewşên siyasî li serdema osmanî. 379
**Lêkolîna diduyan:** Li dema Firensiyan. 383
**Lêkolîna sisiyan:** Qonaqa piştî serbixwebûna Sûryê. 395
**Lêkolîna çaran:** Navdarine Siyasî ji Na.Efrînê. 405

…………………………………

## Beşê Heştan
## Jiyana perlemanî li Kurdaxê

**Lêkolîna yeke:** 419
- Li serdemên Osmanî û Firensî.
- Dema piştî serbixwebûna Sûryê.
- Ji çalakiyên nûnerên Çi.Kurmênc.

……………………………………

## Beşê Nehan
## Kesine naskirî ji Kurdaxê

**Lêkolîna yekê:** Kesin ji dîroka nû li Çi.Kurmênc 435
**Lêkolîna diduyan:** Hunermed li Çi.Kurmênc. 457

……………………………………

- **Jêder……..** 466
- **Naverok….** 471

========================

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z- 2636 . K de, hate weşandin**
**www.yek-dem.net**
**info@yek-dem.net**

# Çiyayê Kurmênc

## Ev Pirtûk

Çiyayê Kurmênc, ji dawîneyên başûr rojava ye ji Çiyayên Torosê. Ew ji hundurê Tirkiyê, ji nêzîk bajarê Entabê de dest pê dibe û berve başûr rojava dirêj dibe û li deştên Cûmê û Hemqê li bakurê Bajarokê Cindirêsê bidawî dibe.

Ji ber cigehê navça Çi.Kurmênd yê Xaknîgarî yê giring, wê li dirêjahiya serdemên têvel, bûyerên dîrokî yên giring dîtine û di gelek rewşên civakî, siyasî û şaristanî re derbas bûye, û wan rewşan di qonaqên dîrokê de, bi xortî hikariya xwe li jiyana niştecihên wê kirine.

Ev pirtûka yekê ye, ku bi vî rengî û bi ferehiyê li ser navça Çi.Kurmênc daxive. Ew rewşên Çiyayê Kurmênc yên dîrokî, civakî, olî, rewşenbîrî û rêzanî jî belge dike, û rewşa şêniyê wê di serdemên têvel de diyar dike.

Pirtûk jinenîgariya hin kesên navçê jî tîne zimên û ji demên berê û niha re dibe jêdereke tevahî.

Pirtûkê pala xwe daye ser jêderên nivîskî ku li ser navçê axvîne, û zanîn, nûçe û bûyerên ku ra niha di bîra gel de mane tomarkirine.

Em hêvîdar in, ev pirtûk roniyê bide ser ev navça biçûk ji welatê me, û bibe jêderk ji neweyên paşerojê re, da ku dîroka navça xwe û jiyana şêniyê wê yê berê û niha binasin û ji bîr jî nebe.

afranvan

**Dr. Mihemed. E. Elî**